


HESEN HIŞYAR

**DÎTIN Û
BÎRHATINÊN MIN**

1907 - 1985



1

Institut Kurde de Paris

LIV. K.L. 378
27/06/2016
1130 HIS DIT

HESEN HIŞYAR SERDÎ



DÎTIN Û BÎRHATINÊN MIN


1914 - 1983

ÇERMÊ YEKEM

- 1 -



Mafê Çapê Parastiye
Çapa yekê - 1993 -
Libnan - Beyrût
Çapxana Emîral
2000 - 1 - 1993



1907 - 1985

Hatim jiyinê ne Giyam Evinê

Bi dil û jari va çûme neyinê

Ez çûme ev Kilişe her dimîne

Ev e min jiyin Li rûyê zemînê

H.H.S

Institut Kurde de Paris

PÊŞGOTIN

JÊDERÊ TEVAYA ZENDEGÎ ZEMAN Û MEKANIN

Belê, jêderê mekan zeman e, lê jêderê insan mekan e, dema em ji van bîrhatî an tarîxê salix vedidin, hingê ji buyer û serpehatiyên zeman û mekan dipeyivin, lewre her têkilîyên me bi zeman û mekan ve girêdayî û jêne, lê zeman li ser her madde -ên gerim û bi tevger tevan sidare, heya madde -ên sar û bê tevher jî tev de dibin sîya zeman de hatine peyda û ji awakî wergerîya ne awakî dîtir di qûnaxên zeman de her berapêş hatine û tîn, ligor zanistîya (I) baylojya tarîx û tetewir, bi dirêjahîya heqben zemanên bûriyên gelek dûr, insan bi kom û kewte -ên jihev birbûyî bela wela di zemîn de cî girtine, ew kom diwî wargehî de bi navek nejadi hatine naskirin û ketine ber mirêka tarîxê, jiber wê çendê ji peyda insan ve heya ku wan koman navek nejadî bixwe girtine û têde mayinde ne, ew merhele-ên gotî tevde bi zeman û mekan ve girêdayî ne, lewre tê gotin: hêzdariya zeman ji mekan mezintirre.

Belê, eger me got: ji sazmanek jixweve (2) pêk in û

1. Zanist (seqaff) 2. sazmana ji xweve (qanûn eltebie)

jêderê (4) tevaya zendegî (5) Ji (Husun û hub) hatine peyda, dîsa jêderê her dûyan berî mekan zemanê, ew kokên çarekîn (6) dîsa diwê lewleba zeman de pêk hatî û jêne, hêj durtir û rohnîtir divî awirê felsefa felekî de, divê em zanibin ku bê hêzdariya zeman, tevaya hebûnên ku hatine peyda wek: tevaya zemînan bi roj û tede-ên xwe ve, valahiya jor zemîn jêr û dor zemîn, ji vî zemînî pêve her zemînên rojên dîtir bi hebûnên xwe-ên sar û gerim, tevger, ruhni û tarî tiştêk bê hêzdariya zeman ne hatine peyda û nayên, dema em jivî qaîde ê bingehî (7) dūrkevin û zeman ji madde re nekin jêder, hingê bê guman emê nikaribin di qiyasên hendese, riyazîyat, felekî û fîzyayî û pirtokên (8) atomî de jî nisbetek îlmî bigrin, ew nisbet pîvan û rê zanên ku nûder ên teknilojya ên pêşketî jê pêktên.

Dema em li van awiran kûr dakevin, hingê emê ji xwe bipirsin û bêjin: dema em zemanê şev û rojên vê îstêrka lê jiyîndar li bîst û çar saetan lêkve bikin, emê bibînin û pê agah bibin bê çima bi me re saetên xweş û geş kin û saetên giriftarî û dijwarî dirêj xuya dikin, tevî ku di wan ne wek hevîyên jiyîne û dîtina me de ew saet û zeman her yekin, lewre di wan zemanên gotî de kin bûn, dirêj bûna saetê her yeke, hingê emê qenc zanibin ku ew ne wek hevî di nefsa me de welê xuya kirîye ne di zeman de, bi van agahîyan me naskir ku di derya bayî û valahî yê de em çewa di nav perda zeman de pêçandî di ronahî û tarîya hember rojê de

4. jêder (mesder menşe) 5. zende (jiyîn) 6. çarekin (enasirên erbee)

7. bingeh (esas) 8. pirtok (pirtokên nav rojê)

bê daxwaz li zozan û payiza umir koçe rin,

Her wekî dema em ji sazmanek ji xwe ve dipeyîvin û dikin jêder ê madde, ew jêder dîsa zeman e, jiber ku zeman û fizikî ji hevîn û ji hev derin, wek: made û hereke ji hev nayên cuda kirin, eger di hin teabîr û tefsîrên îlmîde bi awakî cuda jê behis tê kirin jî lê wek: av û cemed her yekin, di guhartinên sar û gerim de wan du navan bixwe digrin, lê av her madekî bingehî.

Niho divî warî de eger em ji awirên felsefe, sazmana ji xwe ve, fîzya, fizikî û felekî wergerînin dest pêka bi hevketina zemîn û wan dewrên zeman ji wan re heqbên:

1. kambirî) ku navê heremek welatê ingilîz e,
2. silorî) dîsa navê qebaîlek ingilteraye ên ku kevir pelandine,
3. kerbûnî) diwê esra ku komira kevir çêbûye,
4. (bîrmî) heremek li welatê rûsyaye,
5. dîvonî) dîsa heremek ingilîze, divî heqbî de jiyîn li zemîn çê bûye

Belê ligor zanistîya jiyolojî li zemîn ev pênc dewrên zeman lêkve dibin, her heqbek ji wan bi sedan û belkî bi hezaran milyûn salin, heya ku vî gog zemînî ev kirasê axê bi xwe girtîye û têde av çêbûye, ji teefunê jiyîn hatîye peyda, eger ligor awirên (DARWÎN) insan ji teban an (MEYMÛN) bi dirêjahîya zeman wergerîyaye kilîşa insanê îro, piştî hingê dîsa zeman bi du heqbên jêr ve lêkve dibe: ku ev herdû heqib dikevin ber mirêka edeba tarîxê wek:

Piştî ku zendegî ketin vê kilîşa kesane bi kewt û komên

pira-nî reng û reweşek (1) civatî di nav wan de pêk hat, hingê di zemîn de hatin bela kirin, wê dewrê jî du heqben zeman bi xwe girtin wek:

A. HEQBÊ (PALEOLITIK) (500) hezar sal berî tarîxê lê pelandina (2) ulema-ên ARKEOLIJÎ (3) ew zemanê dûr bi tarîxên îro ve dane girêdan, ji insanên wî heqbîre insanên-NEANDERTHAL- tê gotin, ku ji wan insanan binavê -INSANÊ CAWA(kakotek serî bi dest ketîye, çewa ku (300) hezar sal berî sipdeya (4) tarîx serîkî ji wan insanan li (PEKÎN) paytextê (ÇINÊ) hatiye dîtin,

B. HEQBÊ. NEOLITIK. evjî (50) hezar sal berî tarîx, ji insanên vê dewrê re-INSANÊ. Homo SAPIENSI. tê gotin, ew insan wek: teba-ên kovî di jiyîndarîyek hovîtî (5) de bûn, di piyana (6) serê wan de (90) santîm mukeeb mejî hebûn, ji wan herdû bêşên insanên gotî, li kurdistana îraqê (ŞIKEFTA ŞINDER) di destê mede li cildê pêşîn ~~tarîxa~~ jêderîya nejadê kurd (7) kakotên serî hene, ji/12000-70,000/ sal berî tarîx digirin yanî heqbê (paleolitik û neolitik) bixwe digre,

Di wî an di wan zemanan de her wekî li jor hate gotin: insan jî wek teba (1) ên kovî di jiyîndarîyek hovîtî de di serxwerez zeman derbaz kirine, ji wê dewrê re dewra kevîrî an jiyîna şikeftan tê gotin, jiyînek zêde dijwar bûye, ji alîkî jiber guhartinên fizîkî û felekî ji milê dî lipê xwarina xwe nêçîra teba û firokan bûn, her çiyayên bi şekeft, daristan û

1. rewîş (wezîyet) 2. pelandin (teftîş kirin) 3. arkeolojî (ilmê asar) 4. sipeyde (şefeq) 5. hovîtî (wehşiyet) 6. piyan (tas) 1. teba (heywanê kovî) -

av dikrin wargeh, di wê gerê de ew komên zende gî pêda pêda li zemîn bela bûne, di wan koçên cî guhartinan de, her kom û lekên ji hev re naskirî bi hev re mane, ligor wê jiyîne bi ziman û hin pirsên hindik hev û dû serwest dirkirin, ku dest pêka ziman bûn,

Lê ji cengdarîyên îro hêj diwartir, di nav wan û tebayên kovî ên dirinde (2) de her şer bûn, herdû alîyan hev dû dikuştin û goştên hev bi xavîti (3) dixwarin, lê jiber ku insan liser du ligan û bi dest û mil xwedî heş û bîr birinê bûn, bi zemanên dirêjve zora tebayên çar pî birin, nemaze dema ku di pêşketina jiyîne de insan agir bi dest xistin, biwê hêzdarîya agir ji (xetê istiwa û medarê seretan) ber bi bakur hilkişîyan xetê (38-39) çiyayên asê û bi teba, bi bizotên agir şikeft ji teba-ên dirinde girtin û tê de bûne wardar, di wir de jî du dewir derbaz kirine ku ji wan re (DEWRA HOVÎTÎ Û DEWRA BERBERÎ) tê gotin: di dewra berberî de êdî ber bi medenîyet û pêşketina wî zemanî ve gav dane jiyîne, hingê cihan bi navên (ARÎ.ZERÎ Û SAMÎ) hatine bir kirin, ji hersîyan (NEJADÊ ARI) berî herdûyan gavadane avanîyên gund, bajar û hendesa keleşan, çandinî, xwedî kirina pez, sewal (4) aşên avê çêkirine ku tevde divayên jiyîne bûn, ji wan merhele -ên gotî pêve êdî bi her tevger û serpêhatîyên xweve ketine ber mirêka tarîxê.

DEST PÊKA SIPEYDEYA TARÎXÊ

Her wekî, lişor hate naskirin, ji wan (5) heqben

2. dirinde (tebayên wek: gur, hirç, ên ku laşê meruv didirînin) 3. xav (ne biraşti)

4. sewal (dewar)

jiyolojiyên pêşîn bi hevketina zemîn û du heqbên peyda zendağî-PALEOLITIK Û NEOLITIK pêve, di heqbê zemanê sisîyan de mêjevanan bisê birên dîtir tarîx lêkve kirine wek:

1. dewra pêşîn (AVA KIRINA BAJARÊ ROMA) kirine bingehêk tarîxî,

2. a diduyan (LISTIKA OLUMPÎ) kirine dewra navîn,

3. (VEGIRTINA QUSTENTIN) yanî (SITANBOL) dewra dawîn û têde bixwe digre, jê û pêve, tarîxên nejadî û dînî xwe didin rix wek:

1. TARIXA KURD /612/berî zayindê ku niho /2594/ e dema (goreş) impiratorê (mêdya mezin) dawî li (aşûr û kild) anîye.

2. tarîxa zayinda mesîh ku îro /1982/ ye

3. tarîxa koçê /1403/ roja (pêxember) ji (mekê) çuye (medînê) -

Ev zemanên dawînjî kirine lengerên (1) tarîxê, tevî ku ji zemanre qiyasên rotînî ne, zeman di bir kirinê de jivan qiyasan bi gelek mezintirre, lê ligor mentîqa tarîxa serpê hatîyên insan û cihan uslûbek zanistîya edeba tarîxê mêjevanan kirine qiyas, û gotine: -zemanên bûrîyên dût, navîn û em têde,

Belê, diwan dewrên gotî de, nemaze piştî bi dest xistina agir, ji şikeft û çîyan daketin nav deştên çîyan û dest bi avanîyan kirin, ew komên gund û bajarên êdî ketin rewşek civatî, çandinî abûrî, dezgedarî, bazirganî, leşkerî û

1. lenger (ji lingên pirê re tê gotin)

cengdarî, diwan jiyîndariyên gotî de di ser xwe re zeman û esir derbaz kirine, heya ku giyane dew ra tarîxê, jibona ku ew jiyîn bi serpê hatiyên wanên zeman ve tevde bêne nivîsandin winda nebin di zemîn de bela wela ew salix hatine ber hev kirin û navê (MÊJE) û nivîsevan navê (MÊJE-VAN) bixwe girtî ye, lê diwan salixên mêjewî de eger RÊÇ (1) hebin hêj ew tarîx bingehêk (2) zanistiya tore (3) darî bixwe digre,

Lê livê hindavê divê em jibîr nekin ku, ew tarîx ji yekve ne hatine nivîsandin, her nejadek nivîsevanên wan dîtî, bîrhatî û bihîstinên xwe nivîsîne, ku ji wan re MUZAKERAT hatine gotin, weke van dîtî û bîr hatiyên min, ku ev muzakerat dibin xelekên zincîra tarîxê, lewre dewletên sitemkar di zeman û meknan de ew helqe -ên tarîxî bela wela winda kirine, jiber wî qasî her xwenda, nivîsevan' torevan û mêjevanên kurd di berhev kirina wan xelekên de xwe amade û berpirsiyar (4) bibînin berhevkin û bi zincîra tarîxa kurd ve bidin girêdan,

Dîsa divê awirê tarîxî de divê em zanibin ku tarîx ne ew e ku tenê ji serpê-hatîyên şervanî û giriftariyan salix vede, no, tarîx ewe ku berî her tiştî li jêderîya wî nejadî bingeh bigre, paşê zeman û mekanê jiyîndariya wan di her warên- hedarî, zanistî, abûrî, civatî, dez-gedarî, siyasî, heya-seyklojî, exlaqî de û adaten wan- bi mentîqa tarîxê rast û durust bide rohnî kirin, da ku dema xwendevan

1-rêç (asar) 2. bingeh (esas) 3. tore (edeb)-torevan (edîb) 4. ber pirsîyar (mesûl).

bixûnin her wekî ew danezan û salix bi çavên xwe dîtîbin, pê agahdar bibe ku wî nejêdî diwan zamanên bûriyên dûrde çî rojên reş û geş derbaz kirine heya giyane vê dewra tède, ewe pîrozîya tarîxê ku uslûbek îlmî bi xwe digre, lewre tarîx ne çîrok, roman, filiklor an komîdya ye ku merûv ligor daxwazek xwe î tekane û unsurî binivîse, jivî awirê xuwar re mîsala jêr dibe bergen wek:

Di navbera herdû cengên cîhan û dawîya cenga diduyan de, li asya û aferîqya gelek nejad ji bin sîdariya sitem rizgar bûn gavadane ser mesreha tarîxê, cîyê cîyê bûne dewlet, jiwan dewletên nûder re bû daxwaz ku ji xwere tarîx û kiyane peyda bikin, bêku zanibin an bixwazin ku zanibin, tarîx pêjin (1) rêç û siya nejadên kevin ên xwedî hezaret ku jiwan bi şûnde maye wan kilişan (2) digre, ne teknilojya ye ku meruv nû çêke, an dîplomek sexte bikire, bi awakî la exlaqî ji bona wê daxuwaza bê mentiq, tevaya tarîxa roj helatê navîn ser û bin hevkirin reş û sipî bi hev dane guhartin, şagirtên wanjî biwê xwendina ne rast diplom digrin, ewjî nizanin û naxwazin ku zanibin pê li kerameta îlmê tarîxê û muerixan dikin, liber van kirde (3) ên na kesane sukûta sazmana méjevanên cîhanî bixwe gunahkarîyek mezine,

DI warê arkolojî de jî asarên wan nejadên pêşîn nivîsandinên wan dikojînin (4) ji nûve binavên xwe dinivîsin, her wekî ew asar ên pêşiyên wanbûne. **Tevî** ku dizanin diwan

-
1. pêjin (hîs, wek: bi şev kesek xuya nake lê pêjnen lingên wan tén)
 2. kiliş (resim)
 3. kirde (emel)
 4. kojandin (mehandin)

zemanan de hebûna wan ne ketibûn ber mirêkên tarîxan, evjî ji civat û sazmana (5) arkeolojî (6) yên cîhanê re sukûtî gunahkarîya mezine,

Di warên jiyogirafya û mealimên cugrafya de nav û nîşanên cugrafyên nejadên ku di bin sîdarîya wandene, bi navên xwe wan mealiman didin zanîn, wan welatan di dersên cugrafya de bi şagirtan didin zanîn ku ji zemanê berê welatê wanbûye, çewa ku liser réyan û gastînen (7) bajaran bina-vên xwe-tîkme û heykelan-çêkirin, her wekî agahe piranîya van bedkarîyan di xerita kurdistan de pék hatîne!....

Gelo, ew çend muerix, uryantalîst (8) û seyahên li kurdistan digerin û wan bedkarîyên na kesane dibînin, dema ku wan kirdeyan bigînin mehafîlên diwêlî û li nivîsarên xweji protisto bikin ne wacibek wanî insanî û huqûqîye? divê xwedîyên wan bedkarîyan zanibin wê ew û kirde-ên xwe bihevre bikevin sergoya tarîxê.

4 gulané/1979

5. sazman (tenzim) 6. arkeoloji (ilmé aser)

7. gastîn (sahe) 8. uryantalîst (xawer şînas musteşîrç)

Institut kurde de Paris

BIRÊ YEKAN

Institut kurde de Paris

JÊDERÊ JÎYÎNA MIN KURDISTAN. BI CEMALEK FÎZÎKÎ VE!

DI BIN SÎDARÎ Û ÇAR SÎNORÊN DIWÊLI DE GIRIFTARE!

DI XERÎTA JÊR DE HATÎYE PARVE KIRIN:

Dema em dibêjin (kurdistan) hingê em ji du pirsên hev-girtî dipeyîvin, wek: KURD-navê nejade, ISTAN-navê ciyê wane, wek: daristan, gulistan, ku ciyê dar û gulan e, ev cî di etnogirafîyek tarîxî de livê hindava roj helatê navîn asya roj ava de bi jiyogirafîyek fîzîkî û felekî de li zemîné jêrekî li xerîtê bergeh digre, herwekî:

- Di başûr.roj ava de li perêvê derya mittirane (1) iskela (BÊLAN) derya sipî bixwe digre, jê û bakur di rix lêmana (2) eskenderûn re basik li çiyayê (AMANOS) (3) vedide, bajarê (OSMANÎ Û ROJ AVAYÊ MERAŞ) dike bergeh, di roj avayê çiyayê (ARMÛD DAX Û BÎNBOGA) digre di (QEYA BIBI) re li roj avayê (SÊWAS) re li roj helatê (TOQAT) di- DEMIRUZÛ.BEREKETLI. SIÛDI. di başûrê (GIRASÛN. ŞIBANKARE HISAR) de dikeve çiyayen (ALÛC.BELEBAN) di (GUMIŞ XANE) re berbi roj helat ve dizivire, diwî sînorê gotîde (KURDSTAN Û ANEDOL)

1. mitrane (derya sipîye- yanî derya di nev axêde) 2. lêman (iskele-mîna behrê. ciyê ku lêmayine liwir diminin)

ji hev téne cuda kirin, çewa ku (BIŞIKÇÎ) diwî sînori de bi zimané (turkî)û binavé (rojhelaté anedol) cugrafîya zéde héja bi xeritéve daye bela kirin, jibo wé hukumeta turk (18) sal hepis dane wî heya van nivîsaran jî girtîbûn,

JI (GUMIŞXANE) berbi roj helat di (BAYBÛT) di (RIZE) de berbi bakur di çiyayén (XANÛT Û ÇAMLI HEMŞIN) re roj avayé (ARTEVIN, MURCIRT.ÇA NÛQAT MURADIT. ÇEMÊ HOPA) de li (BATUM) dikeve (DERYA REŞ),

DI BAKURD de, ji derya reş ber bi roj helat sînori (GURDCISTAN) digre, di başûré (AHISKA) re li bakuré (QERS) de roj helat de berbi başûr dizivire, di roj helaté-XENAK. ÇILDÊR.QERIS.ARPEÇA.VEGIR ŞAPAT-de berbi başûr di bakuré (BAYEZPID-de derbazî-MAKO-kurdistana îran dibe,

JI-MAKO-ber bi başûr rojhelat, ZENGEMAR, KELAX-WEÎ-roj Helaté- HEMEDAN. KURMANŞA -de roj avayé-SUTAN ABAD-roj helaté-BIROCERD. LORISTAN XOZISTAN. DI XUREM ŞEHİR-DE roj avayé-BENDER ŞAPOR-dikeve xelîcé BESRA-

DI BAŞÛR DE ji sînori kurdistana îran di biniya (ŞEHREBAN Û MENDELÎ Û SURTA ÇIYAYÊ HEM-RÎN) re, ber bi roj ava li (DICLE) di çiyayé (MUKEHEL başûré (ŞIRQAT. ŞENGAL) di başûré bajaré (BEDIE) re dikeve (CIZÎRA sûrî, rojava digre di (CERABLÛS-ker-gamêş) a ser xetê re di bakuré (HELAB Û BAB) re di roj ava de (ÇIYAYÊ KURD.EZAZ Û EFRÎN) di xwede digre, li bakuré (LAZIQI) dîsa li iskela (BÊLAN) derya sipî bixwe

digre, ev e sînor é fizikî é ku divé kesafetê de nejadé kurd roniştmane , çewa ku jivé xerîté re té gotin (KURDISTAN), di roj helaté navîn asya roj ava de li xerîta zemînî derece-ên-38.39-heya sînoré (40) digre,

Di /1948/ de li (PARÎS) civîna cugrafî şinasén diwêlî divî warî de bi danezanek çewit, xubar dane û gotine: mesaha zemîné kurdistan/535000/ kilometre, jiber ku wan di roj ava de ji roj helaté (FERAT û di başûr de (CIZIRA SÛRI.) di îran de (KURMANŞA) kirine sînorê kurdistan ku ji çaran yek ji xerîta kurdistan dane birandin, yanî li kurdsitana turkiye ferat. li sûrî cizîr nexistine xerîté, li îraqé çiyayé hemrîn ne kirine sînor, li îran erdê kurdistan ne giyandine derya xelîc, di awakî rast û durust de eger mesaha kurdistan de kilo mitraj bé gitin hingé bé gûman wé (700) hezar kilometir zédetir derkeve,

ZEMÎNÊ KURDISTAN DI DEWRÊN JIYOLOJYÊN AGIRVEŞANÎ DE .

Di dewrên jiyolojîyên agir veşaniyên orojîni (1) ku di zemîn de çiya hilatine, diwan dewran de etnogirafya kurdistan di warên fizikî û felekî de di asya roj ava de kilîşek (2) xweser di xerîté de girtîye, diwê dewra jor gotî de pêkhatina çiyayên kurdistan di bilindahîyê de qiyasên mezin bixwe girtine, çewa ku di rojhelata başûr de ji silsila çiyayé (ZAGROS) heya (TOROS Û ERARAT) ew çiyayên ji hev-

1. orojin (wé dewra ku ji ziké erdê çiya hilavêtine) 2. kilîş (resim)

der û bi hevve girêdayî di xerîté de wek:-hîvek çar şevî di zemîné kurdistan de kevanik dide çêkirin, ji başûr ber bakurve- ZAGROS. QENDIL. SORDAŞ. SUKART. HELEGURT. ŞÊRÎN. CILOYÎ. METÎN. GOYAN Û TOROS vana tevde ji (2500-5165) mitir bilindin, tevde bi daristana xemlandî û nixumandî serdane ber ewcên felek, liwan çïyan pesar (3) û nizmanîyên çïyan kanî çem û royên weke: dicle, ferat, zab, xabûr,) jé zayindene, ji milé di tevde(gêlî gaz û gedûk şikeft û zivîng) bé jïmarin, ji bilindiyên wan çïyan hinén jér téne der péş kirin wek:

- di kurdistana bakur roj-ava de, li heremén (1) QARS. WAN.ERZARÛN- çïya- é MENKENE. 2610.M. SÎPANA XELAT. 4445.M. TENDÛREK. 3500.M. ARARAT. 5165.bîngul, 3153.M. ELAHÛEKBER. 3111.M. di yérivan de çïyayê (ALAGOZ. 4100.M. LI ROJ AVA BAŞÛRÊ (AMED) çïyayé reş, 1850. M. li heremé malatîya: çïyayé agir, 3090.M. li heremé meraş çïyayé-BIN-BOGA. 2745.M. MELETO. 3000.M. ÇÏYAYÊ SIPÎ.2890.M. ji van péve zemîné kurdistan ji %40 bela wela tevde çïyané én nizim ji-500.700-1000-mitre bilind tevde bi daristanén, her wekî hate gotin, ji pesarén wan çïyan çïrén avan ji zinarén bilind da dikevin nizmanîyén kûr jiwir derin nav bexçe aviya n abûrîya welat pék tînin,

Belê di zemîné KURDISTAN de kanî çemén mezin û piçûk ji jïmaré derin, lé hin çemén navîn û royên mezin

3. pesar (singê çïya)

ligor hatiné evin: -FERAT. DICLE.ARAS. AVAREŞ. ZABÊ MEZIN. ZABÊ PIÇÛK. ÇEMÊ DYALE. XABÛRÊ ZAXO. XABÛRÊ SÛRÎ ÇEMÊ HIZIL. ÇEMÊ BOTAN. ÇEMÊ XERZAN.BATMAN. ÇEMÊ ENBAR ÇEMÊ MADEN. ERZINGAN. MUNZUR. ÇEMÊ XERÎBÎ. SÊ ÇEMÊN ÇIYAYÊ SIPI û weke van hene, jiber wî qasî li kurdistan her tewir çandîni û darên meywan bi pîranî çê dibin, wek, genim, ceh, nok nîsk, birinc, pembû, kuncî, fsûlî, kartol, titûn, meywe: tirî, mewij, goz, biif, zeytûn, sév, mişmiş, şeptalû, û weke van, di roj helaté navînde jêderê wan kurdistane, wiha renga: pez, sewal, ga, gamêş hesip histir, zêdene,

BILINDÎYA ZEMÎNÊ KURDISTAN JI RUYÊ DERYAN:

Ev bilindahî fizikî û felekîya zemîne kurdistan, ji başûr ber bi bakur di hawa gerim û serma de bisê hereman té lékve kirin wek:

A- Ev qelmro (2) di başûrde dikeve biniya XETÊ BIROKSIL, li îraqê dekeve biniya (akrê, pêris û bêxêr) ku jêre deşta (hevlêr şemamok û silîvana) té gotin: pehnaî (kerkûk heya (xaneqîn) di xwede digre, di roj avayê (dicle heya ferat) başûrê çiyayê (torabdîn) berîya (mardîn, wêran şehir û ruha) digre, zemîne vî heremî ji/300-500/m, ji ruyê derya bilind tir re, havîne germe dereca germî digîje (45), zivistanê kém salan dikeve bin deqê, livê qelem rewê gotî

2. qelemro (muqatea)

(genim û ceh) ji herderên kurdistan zêde-tir çê dibe, ji ber ku tev de erdê çandîniye, çewa ku petrolên (sûrî û îraqê) ji tevde livî hermî der tén, çewa diwê samtê de li îraqê dertê

B- heremê (NIVATIS (1) ev herem dikeve navbera çiyayên (TORABDIN Û TOROS) ji (HEKARI. SÊRTÊ. SILÎ-VAN.DEŞTA AMED. HEYA XARPÊT Û MELATYE) digre,

Ev heremê (B) di bakur de ji roj ava berbi roj helat digîje heremên , (KALAN, dersim, ÇEWLIK, bîngul, MÛŞ. BEDLÎS. MEHABAD. ŞINO) ev qelemro havîn û zivîstan navînin, dikeve xetê (38) di pehnahîya xerîtê de, bi her awayî di navbera vî heremî û heremên (A Û C) de ne wekhevî tén dîtin, divî heremê (B) de wek heremê (a) her tewir çandîni, pez û sewal têne xwedîkirin, jê û pêve tède (meadena sifir, kurom, gule, elminyom, hesin, komira kevir, çimento, û petrola reman-dertê, ji van hereman pêve tevaya zemîné kurdistanê tevde meadenin, eger hebûna kurdistan di destê kurd de be, hingê kurdistan dibe (Siwêstra) rojhelat lê mexabin xwediyê wê hebûnê di bin sîdariyên çar dewletên sitemkarde belengazin derin welatên wek: almanya, lîbya, hîcaz, awîstîralya, amerqa-jîbo xebatê jiber ku dewletên kurdistan vegirtî ji déla-xwendegah, û dezgdarîyan, merkezên eskerî, jandirme û muxabîratan pir dikin, ji milê dî dezgedar û tucarên wanjî abûrîya welat ji nav destê kurd derdixin,

-
1. nivâtis (di zemanê médyâ de ji çiyayê (toros) re (nivad dihatin gotin]ji (hekari heya xarpêti) jêre (nivâtis) dihatin gotin

C- Jivî heremî re zozan té gotin: ku di keve xetê (39) û xwe dispêre xetê (40) di bakur de, ev herem ji HEKAR.BEDLÎS.MÛŞ-heya sînorê (GURDGISTAN. BAKO Û REWAN- bixwe digre, ev herem ji /500-1000/ ji ruyê derya bilindahîyek mezin bi xwe digre, liwan navçeyan meruv dikare bêje: havîn nîne, deşt û nav deştên navbera wan çiyayî tevde mîrg û kanî zêde é-2000- mitir ji ruyê derya bilindtîre, herdû heremên jêrîn dema payîzê rewa dikeve liwir berv dikeve, tevaya zivistanê liwî heremê zozan baran nabare heya meha nîsanê, li hin deveran zivistanê dereca sermayê digîje-10-15 bin deqê, (2) liwî heremê zozan pûş çê nabe her giya şî ne perda berfê digre ser, jiber ku welêye tevde mîrgin, zêde pez lê té xwedî kirin, nemaze mîyên sor bilind û girsin, ne tenê derin bazar gehên anedol, lê bi kerîyan derbazî sûrî, îran û digîjin awirpa jî, ji pirsê navê zozanê pêve ji wan wilayetên-MÛŞ BEDLIS. WAN. ERZARÛN. QARS. ARTEVIN- re SERHED té gotin, peyayên wan navçeyan, bejna wan bilind devê wan piçûk, rûçikê wan reng genimî, wek çiyayê (tor abdîn) serê wan mezin bejna wan qalind û rûyê wan pehin nayên dîtin, ji zemanek dûrve her û her di navbera dewleta osmanî û qeyserê rûsya de liwan wilayetan pêder pé cenggen xundar pêk hatin, nemaze di cenga cîhanê a pêşînde jî ber kuştariya wan (êrmenên) ku di nav leşkerê rûsya de bûn, ew pênc wilayet bicarek welat

* ro (ji çemên wek: ferat û dicle re té gotin) 2. deq (sifir).

berdan muhacir bûn, di nav belengaziya wê herbé tevde li der kolanén xerîbiyé mirin, ji %10 venegeriyan welat,

KURDISTAN, bi xerîta xweya fizikî û siyasi ve, nemaze (1) di rewşek jiyogirafi de, xweş té dîtin ku zemîné kurdistan ji hebûnén jixweve (2) dewlemendtirê tevaya qelemro (3) yén roj helaté navîne, çewa ku divî warî de li cildé pên-can-TARIXa KURD-awir hatiye vedan, her wekî li jor hate gotin: ji meadenén tîvel (4) péve tevaya petrolén-TURK. IRAQ Û IRAN TEVÎ SÛRÎ-ji zemîné kurdistan zayinde ne, ne ku ji wan tiştek na gîje kurd lé nahêlin ku téde karmende (5) jî bixebitin, di nav wê heb ûnê de her jar û belengaz sitemberin (6), belé ji her awayén jiyîné paş mende ne, nikarin zarûkén wan herin li bajarén wek: sitenbol, şam, beş da û tehran- li zanîn gehan buxunin, jiber ku li welaté wan xwendegeh nînin,

Çewa ku li herçar parçe-én kurdistan ré nadin ku şagirtên kurd bikevin xwende gahén herbî an firinde gehan, ji milé dî ré ne didan ku li bajarén kurdistan dezgedarî béne vekirin, jiber wê çendé sermayedar û dewlemendin kurd diçûn li bajarén enedolé dezgedarî (7) vedikirin karkerén kurd bé kar diman derdiketin welatén xerîb, jiber wê setemkarîyê ew kurdin derin anedol û én welatén der piraniya wan liwir dimînnin asîmilasyon dibin, çewa ku piraniya bajarén wan welat vegirtiyan ji kokéve kurdin hatine bişaftin (8),

1. nemaze (xasseten) 2. hebûnén jixweve (serwetén tebiê) 3. qelemro (iqlim) 4. tîvel (muxtelif) 5. Karmende (muwezif) 6. sitember (mezlûm) 7. dezge (fapriqê, meemel) 8. bişaftin (helandin)

Divî warî de, em dikarin bi xurtî bibéjin: di rojên pêşde dema erdê kurdistan ji-TURKIYE. IRAQ.IRAN Û SÛRÎ-bé veqetandin, hingé her çar dewlet bi hev re ji hézdarîya abûrî (9) û heykela diwêlî dikevin, jiber wî qasîye ku çî dema kurd jibo girtina mafê (10) xwe li hember dewletek jiwan bi şoreşêve radibin, hersî dewletên dîtir bi her awayên siyasî, abûrî û eskerî jiwê dewletê re dibin destegîr û piş-tegîr, ew yektîya sitemkarîya dewletên kurdistan vegirtî bûye sebebê dilîya wan!

Ji mile dî, diwarek diwêlîde jî, istiratîjîya zemîné kurdistan ku di nebera AWIRPA Û HINDISTAN de, nemaze heremén PETROLAN bûye gehînekek (11) réya bazirganî (12) siyasî û eskerî, wiha renga di navbera sînorê qafqas derya sipî û xelîc de jî di bergeha RÛSYA de bûye gehînek, ew istiratîjîya kurdistanê ku li nejadê kurd bûye bela sebebê giriftarî û bin destîya wan, lewre jibo wan daxuwa-zên gotî her û her mesalihên herdû leşker gehên roj ava û roj helat bi dewletên kurdistan vegirtîre girêdayîne bi kurd û doza kurde! eger carna jibo siyaseta xwe yek jiwan dewletan destek dibin ebayêre bide kurd é dîtir dijé wî dest dide wê dewleta kurd lihember rabûyî, herdûjî ne şirkete bihev re ve kin

JIBER wî qasîye ku ji destpêka esra (19) ve jibona girtina mafê xwe-é qewmî û tarîxî, kurd pêderpê (13) wek helqe-én zincîrê bi hev re girêdayî bi şoreşên zêde xûndar û maldarve

9. abûrî (iqtîsadî) 10. maf (heq) 11. gehînek (muwaselat, olaşme)

12. bazirganî (tucaret). 13- pêderpê (lipê hav) •

rabûne û ra dibin, lê sed mexabin wan mesalihên herdû
leşker gehên çep û rast ne hêştine û nahêlin ku kurd wê
daxuwaza xweya insanî bi destxin! eger ji awan bi awakî edil
û insaf bikeve bîra wan û berge li pêşîya bizava kurd ne
girin, kurd dikarin bi sîlehên teqlîdî heqqê xwe bigrin, belê
çi kurd ên ronak siyasî wê nizanibin nikarin ji kurdre
bixebittin û jiwanre havilek bi destxin!...

KURDISTAN DI CEMALEK FÎZIKÎ DE KETIYE BIN PERDA REŞ!

Her wekî di rûpelên derbaz buyî de awir livê hindavê
hatîye dayîn ku di dewrên jiyolojîyen pêşîn bi hev ketina
gogzemîn de, jiyogirefya kurdistan rewiş û cemalek bê
hemta (1) bixweve girtîye, nemaze (2) di dewrên OROJINÎ
(3) de li deşt û nav deştan bela wela çiyayên bilind di nav
telpe-ên ewran de serdane ber ewcên felek, havîné wan çiya
n wek: şaşikên melan sipî û singên wan wek: çekên seyîdan
kesk bi daristan û kulîlkên renga reng nuxumandî û xem-
landîne, ji bilindahîyên gélî û gazên wan çiyân, di nav zina-
rên bilind de avên kanîyan û berfê bi çîrên mezin şîp
dadikevin nizmanîyên kûr, wek: tewên cawê sipî tew bi tew
ew pêlên avê dadikevin erdê kumetên sipî wek: kefa sabûnê
hiltên û datên, jiwir bi pêlên girs û hûr bilef di badokên
newalan de, di bin sîya daran de tîrêjên rojek menûşagî di
nav pelên daran de jiwan dide wek: mecdîyên zîv tene

1-bê hemta (bê mîsal) 2-nemaze (xasseten) 3-orojin (wê heqba ku ji erdê çiya hil
avêtine).

jimartin û dinav cu u cûbarañ di dikevin nav mérg û kulilkan wek: lefén marén sipî lihev dizivirin derin nav bağ, beğçe, darén meywedar û avîyan,

Di şevên tarî de ew çiyayên bilind di berhev de wek: şifren dirasa (4) ezman liber çavé meruv dikin kerî, istêrkên ezmanan wek: elektirikên bi ronahî di nav pêlên derya (5) bayé de, geh hûr û geh girs xuya dikin, bayé ku di wan gélî û zinaran de wek: dengé firinde (6) én még û fantom gurî ji wan té, çewa ku di kovikên berû yan de wek: fit kén polis an difikînin, ji şikeftên bilind fişkinên pezên kovî û nalîna teyré goyîn bi zîz dikeve goyé meruv, sibehan dema roj di bin çadira ezmanek şinde tîrêjên xwe li kubetên çiyayî ve dide, dinav wan tîrêjan de pêlên dar û devîyan wek: ava zêr an roja di nav (ala kurd) de zerdikin, ew giyayên biwan dar û devîyan ve hilkişandî wek: tayên naylon an têlên tenbûra ji dûrve di ayîsin (7) gul û kulîlkên bi darave liber wan tîrêjan wek: elektirikên piçûk renga reng xuya dikin,

Ew deşt nav û nizmanîyên çiyayî, tevde mérg ji gul giya û kulilkan xemlandî wek: kalîçe-én KAŞANI (1) zemîn nuxumandî û raxistîne, di nav wan mérgên kesik û şîn de çiyê çiyê kerîyên pez wek: kavlên gundên xirabe di mişel de xuya dikin, dengê sitranên bêrivanan di bilindî û nizmanîyên dûr de di nav pêlên bayé de dizizikin û têne bihistin, ji milê dî dengê bilûrên şivan bi ser awa meqamên RAST.

4-drase (çinek, biçer) 5- derya (be-hir) 6. Firinde (tiyare) 7- di ayîse (diberiqe),

1. Kaşan (bajaré ecem)

SÊGAH, ÇARGAH Û NEHAWEND-de perdan diguhêrin, li zinarên bilind ekisé seda çédikin, li ser dar û zinaran qibe qibên kewên nêr, dengê şalûl û bilbilan dikevin hev ji sazê piyano bi gelek xweştire, dema ew berx û mî hevgel dibin, barîn û kalîna wan wek: kurdên her pénc qelemroyên (2) kurdistan di şeva NÛROJÊ de bigîne hev ew xweşî û geşî dikeve dilê meruv, çewa ku dî cihan de daxwaza her insanên azadî perest e,

Di hersî mehên buharan de, ew teyirên piçûk û mezin bi refên giranve, ji ber germa peravên deryan ber bi zozanan ve hildikişîn wek: firindan di ezmanê kurdistan de xetên nû didan vekirin, dar û zinarên çîyan biwan koçerên firoke têne dagirtin, çewa ku koçerjî bi kerîyên pez û mî kon û çadirên wan li bargîran barkirî, jin û zarûkên wan li hesp û histiran siwar, bi kewt û lekên mezin ber bi zozanan ve rêwîngîne, her koçek wek leşkerên nizamî firqe lipê hevin, belê berê wan liwê bihuşta welate, nav gul û kulîlên renga reng bayê paqj û kilisyom, wan deverên ku di meha tîrmeh de (3) gerimbûn nagîje dereca (25), ew deverên ku kurd di gund û bajaran de li nav wan gélî gaz û daristanan de jiyîndar û bextîyarin, belê her ulema-ên jiyugirfî dizanin ku di heqbên jiyolojiyên pêşîn dewrên agir veşanî de, li roj helaté navîn asya rojava zemîné kurdistan ji rûyê deryan- 200 500-mitre bilind pék hatiye yanî di nav tîrêjên rojek menûşagî deye,

Piranîya çavî, kanî û çemên erdê kurdistan ji bin çîyanên bilind dertên, ew çîyayên ku nêzîgê sedî di bilindahîyan de

2. qelemro (iqlim, muqatîe) 3. tîrmeh (temûz)

jimarén mezin digrin ji/2000-3000/ mitir piranîne, lé hinên wek- BINGUL. TENDÛRE. CILOYI QENDIL. SUKRAT. HELEGURT- digîne (4000) mitre, ARARAT- 5165- mitre bilinde piraniya wan pesarên (4(çiyar) HAVÎNGEHIN, tevde dibin siyên daran de û çirên avan ji zinarên bilind dadikevin çeman di berqef û golên kûrde li hev dizivirin kefa şîn liser avê seywan vedide, req, kevjal, beq û masî dibin xemla wan golan diwan deverên gotî de nexweşîya MALERYA nîne, ji ber ku kelmêş lé najîn, ew bayê ku ji nav gul, giya, û kulîlkan, li daran pêl ve dide, di nav pelên daran de bêjing dibe, çewa ku berê ji xaz û azot paraztîye tevde uksicîn û kilsyûme, di hilkişandina bévil û hilim berdana devde masse-én xaz û gemarê ji hunavên meruv dide réjkirin, meywe én kurdistan ligor fîzikî û felekîya zemîn diwande vîtamîn xurte çewa ku di goşt, şîr mastên kurdistande made-é protînî û di nande jî made-é kilor û şekir xurte,

Sed mexabin, kovan (1) û keserên dilbirîn ku nejadê (2) kurd koka xawer(3)zemîn , diwê buhuştta (4) welatê xwe li navwan, mérg kanî, kulîlik én giyan, daristanên pesarên wan çiyarên bilind géli û gazên kûr de li derî bi komên mezin wek kevirên kilsî û zişuran komên hestîyên jin, zaruk, kal û pîran şehîdên ku tevde bi singuyên leşkerên turk hatine kuştin! heya nihojî ew komên hestîyan li géliyê zîlan mayinde û ber çavin, hestîyên tilî û movikên di nav axêde wek:

4. pesar (tîgê çiya)

1. kovan(derd,êş) 2. nejad (qewim) 3. xawer (bi farisî roj helat) 4. bihuşt (cenet)

morîmên sedef li erdê di ayîsln (5), di şevên tarîde fosforê hestîyê wan ji dûrve wek: fanosan ronahî jiwan dere, zivistan û buharan liber lehiyên ava baran û berfê kakotên serên wan di newalan de di nav pêlên avêde ser û bin hev digindirin, di rix wan meşhedan de liser kavlên gundên xirabe bi şev dengê kundê çepel (6) té, ew çirrên avan ku ji zinarên bilind dadikevin di nav wan de rehên xûna şehîdan xuya dikin, raserê zemîné welat telpe-ên ewrên sêlbîyetên daxuwazên diwêlî li nav çavê wan her û her birûskan ve dijenin!...

Her kurd ji umrê-7-10- salî dev li tilîya xwe dikin û ji xwe-re dibêjin:- di her salixên kesane de em ji ji zendên cihan ne cudane ku tev de di welatê xwe de xweserin, lê çima em tenê dîl û bindest? gelo wê kingê ev ewrên selbî di nav bakî azadîde ji ser welatê me here daku emjî rojek rohnî û aza bibînin? ew avên çîrên mezin wê hingê ji wê xûna şehîdan bêne paraztin da ku em karibin vexun? li şûna wan komên hestîyên wan şehîdan wê kingê DIBISTAN.ZÂNINGEH. BANGEH. GASTÎNEN KOMÎDYAYÊN DIRAMI û FILIKLORÊN ME ÊN QEWMÎ BÊNE AVA KIRIN? wê rojek hebe dinav wê buhuşta welat de em di cejna azadiyê û şeva norozê de bi serbestî riqis û dîlanan bikevin dewrek dilgeşî û wan rojên reş û giriftarî bavêjin pişt perda zeman û tarîxé!?!.....çi kurdên ku buharan li erdê kulîlkên sor û daran gulên sor dibînin, keserên kûr ve didin, jiber ku wan gulan dilopên xûna şehîdan guman dikin, ew /47000/ jin

5. ayîsandin (berqandin) 6. çepel (şûm)

zarûk, kal û pîrén çemê ZILAN té ber çavé wan!

Belê, nejadé kurd jéderé arîyén roj helat diwé buhušta welaté xwe de, biwan salixén cemalek tebîî û hebûné de ma ne dîl û giriftar! di bin sîdarî û sitemkarîyén dewletén kurdistan vegirtîyén heq nenas de tevde jar belangaz bi dil birînî di rojén matemade (7) ne! ji hermafén insanî bé par û paşmende mane, ne tené ji huqûqé siyasî, civatî, abûrî lé nikarin bi zimané xwe-é maderî binvîsin û bixûnin, hingé bi gunahkarî dikevin ber mehkemeyén eskerî, yanî xulase ew mesaha kurdistan (700) hezar kilometre bi (30) milyon kurdve liwan bûye-ZINDANA MEMÊ-

Dewletê kurdistan vegirtî én ku heq, edalet û huqûq, di qamûsa wana exlaqîde nîne di KOMA YEKTÎYA MILLETAN bûne libat (1), biwé payedariya sexte jî nasekinin, dibin wé sîdarîya seywana xweya peritî de di nav xwede inkara hebûna nejadîya kurd dikin, bé şerm û fedî di civinén diwêlî û danezanén xwede dibéjin: ewén jî wan re kurd dibéjin turkén çiyandin hîné zimanê kurdî bûne, yanî diwan bed exlaqîyén xwede ew bixwe ispata hebûna zimané kurd bé hebûna kurd dikin, ku jivé gotiné xerîbtir héj kesan ne bihîstîye, ji milé dî jibona ku dolar béne waleté wan di / 1963/ de pé li qapsûné kirin, bi zimané firansewî nivîsarek dane belakirin téde gotin: li DIYARBEKIR û bakuré wé yanî (ZERGA FÎS) bajaré (BIXUD) xwedané pêşîyén kurd (HURI) é ku jére (DUQYANOS) yûnan gotine, ew tarîx bi asaranve /5000/ sal berî zayinda (mesîhe), ku hingé héj

7. matem (hezîn), 1. libat (aza)

pêşiyén turk lidor çemé zer (ÇINE) karé wan dizî héj navé (HON) negirtibûn, nejadé (HURI) impiratorén roj helaté navîn bûn, çewa ku asarén wan niho li (sûri li çemé asi) derdikevin, libaşûré (kerkûk) xirabe (NOOZO) dertén,

Biwê guman û daxuwaza faşistî, li kurdistan navên-bajar, gund, çiya û her derên mealimén cugrafî ji kurdî werdigerînin zimané xwe çewa ku (suy adî) wek qijinkê bi navên kurdve zeliqandine, divê esra bîstî ku insan liser (hîvé) peyabûne û li istêrkên malbata rojé dibin peledar (2) ew li rûyê zemîn miletek bi awayên tarîxî eserî û beşerî jixwe mezintir dixuwazin dibin baskên xwe-én rûçîkî de veşêrin , ma gelo jivan nezantir li cihan kî heye?

Jiber wan şermezariyén xwe ré nadin ku, méjevan (3) uryantalîst ulema-én arkeolojî herin kurdistan û bi kurd re bipeyîvin, daku zanibin ew kurdin, di zeman û meknan de carna hin çûne gera kuristan muxabirat bi wanrene, dema derin gundén kurd ewén xwenda an ên ku eskerî kirine gazî wan dikin, ew muxabirat di nav wan de dibin terciman û ji wan re didin zanîn ku ronîştmanén van hawîran tevde turk in, lê ew uryantalîst û muerix dibînin ku ew gundî bi turkî genc nizanin,

Lê gelo ew sazmanén (4) wek civata HUQUQÊ INSAN. KOMA MILETAN CIVATEN XAÇ U HIVA SOR. LICNA EFWE DIWÊLÎ. YEKTIYA MUERIX Û UDEBA ÊN CIHANÎ. CIVATA YONÎSKO Û wek evan ji wan re

2. peledar (mufetiş, pelandin-teftîş) 3. méjevan (muerix) 4. sazman (munezeme)

nabe daxwaz ku berî agahîyên binê deryan qutbé başûrî û bakur, lirûyê zemîn asya roj-ava, vî nejadê welê sitember (5) bi serpêhatîyên wan nas bikin,? ku yek ji bendên sazma-nên wane,

DI WÊ BIHUŞTA KURDISTAN DE CÎ Û ZEMANÊ ZAYINDA MIN

Li kurdistana bakur rojava li heremê NÎVATÎS (1) (70) kîlomitir bakur rojhelatê şehrê (AMED-diyarbekir), li navebera qeza (LICÊ Û HÊNÊ) li gundê (NÛZERG) a kevîn zemanê (HÛRÎYAN) (SERDÊ) a îro, di /1907/ de hatime dunyayê û çav li ronahîya rojê vekiriye, ku ji wê neyîna aza ketime heyînek dîlî û bindestî, di malbatek paqij û her awayên adat û teqalîdê kurd de hatim perwerde (2) kirin, ligor wî navçeyî di malek dewlemend zemîndar (3) de bi dilovanîya dê û bavek xwenda û millet perwer lidor min meruv û pisman bi delalî ji piçûkîyê giyame xortanî, ligor teqalîdên wî zemanî ji mere (EŞIRA ZIRK) dihatin gotin, di kurdistan eşîrek zêde boşe,

GUNDÊ ku téde ketime landika jiyîné gundê min di parêzgeha (amed) de tek û تنها bé hemtaye, di binya çiyayê (NÛZERG) a ku di zemanê pêşiyên kurd (HURÎ) yande dema ji şikeftên (BIQLÎN (5) derketine ew bajar ava kirine ku tarîxa asaran (5000) sal berî zayindê ye di navsera çiya de keleh heye, jê roj helat dirix kanîyê de ji zinar

5. sitember (mezlûm),

1. nivatis (ji sêrtê heya xarpêt re té gotin)

2. perwerde (terbîye) 3. zemîndar

5. birqlin (ciyê birqê-zerfe)

birandî wek: efsan kesê misrê (HEYKELEK) bilind heye, ku diwî zemanî de jêre perestîşkar (6) bûn, ew heykel berî xudanê (hûriyan-bixud) bûye, êkû yûnanan jêre (duqyanos) gotine, lê sed mexabin di /1953/ de bi gumana ku diwî heykelî de xezîne heye, di gewriya heykel de dinamît teqandin serê wî bi giraniya pêncî ton zêdetir ji heykel pengîzî niho li nêzîgê kaniyê li erdêye,

Li roj helatê wî heykelê gotî di nizmaniya çiya de çavîyek mezin av jîbin çiya dertê, cûyek raserî bexçan tê li gund derbaz dibe ji bo avdana der û aviyan, jiber wê çendê qeza (licê) di roj helat û qeza (hênê) li roj ava, herdûjî li benda meywe-ên daran û aviyên (SERDÊ), di binîya wan bexçe-ên pirde zewiyên avî wek: genim, ceh, nok, nîsk, pembû, kuncî, têne çandin, ji wê cûya didûyan a ser zewiyan pêve, cûyek dîtir dere ser aşan, çewa ku li jor hate gotin di wilayeta (AMED) de gundek bé hemtaye, bajar û deverên eserî:

Jê û bakur (25) kîlometir li ser çavîya (çemê dicle) binavê şikefta (BIQLÎN) heye, ew zivîng (7) wek bajarek mezin e di binîya çiyakî bil de çavîya dicle jê dertê, di nîveka dewra (NEOLITIKÎ) (8) de yanî piştî bi dest xistina (agir) ew pêşiyên (HÛRÎ) yên kurd ku jiwir DER ketine zemînên rast dest bi avaniyên keleh û bajaran kirine, ku ew dewra jiyîna şikeftan avêtine pişt perda tarixê, di wê dest pêkê de dest bi çar bajarên jêr kirine ku ew asar mayindene wek:

1. li navsera çiyê (serdê) binavê (new zerg) ew xirabe bajar

6. perestîşkar (jêre itaet) 7. zivîng (şikeftên di hevde) 8. neolitik (dewrek 50) hezar sal berî zayîndeye,

ava kirine, ku jêre (new-yanî-nû) gotine,,

2. li roj avayê (serdê) girê (Tewîl) (1) heye, navsera wî jî bajar ave kirine, di binîya girde asarên kevir siwar, peya, sindoq, hene, ligor xirafatan digotin bûk anîne wir kufir bûne (xuda) ew kirine kevir, héj jî jêre kevirên dawetê dibêjin,

3. roj helatê serdê (BIRYAS) ewjî kevne bajarê wane di zemanê (bixûd de héj hebîye (2)

4. bajarê çaran (zerga fîse (bajarê (xudayê hûrî-bixûd) de, ev bajar di başûrê (serdê (10) kilomitir li ser çiyakî ava kirine, ku hêj téde bingehên avaniyan mayindene, di roj ava de nişanê împiratori keviyek bi qul heye, çewa ku ew kevir li roj avayê (serdê) li pesara çiyajî heye, ew çîroka (eshabî kehif) ku di (quranê) de hatiye fermayîş kirin, jiwî bajarê zergê doqyanos pêk hatiye. çewa ku ew şikefta eshab kehif li bakurê (serdê) di çiyayê (derqam) deye, piştî hingê bajarê (AMED) ava kirine, ligor tarîxa wan asaran çewa ku liyor heta gotin: ew hukmdariya nejadê (hûrî) ku ereb jêre (hurîyên dibêjin)- 5000-berî zayind a mesîhe,

DI ASIYA DE LANDIKA INSANÊ PÊŞÎN HATIYE PÊÇANDIN

Di wan danezanên asarên gotî de tarîxên cihan me agahdar dikin ku di komên zendegî de (ARÎYÊN) asya rojava her nejadên cihan kevintirin, ligor bi destketina asa-

1. ev dewîl- li roj helatê mardîn kevne bajarê (dara) û li (jî heye) 2. biryas (bi zimanê yûnani (yas) navê jinane lê (os) wek (doqyanos) navê zilaman ne.

ran xweş dide xuyakirin ku berî dîtina agir bi dehan hezar sal dewrên jiyîna şikeftan û hovîtî derbaz kirine, ji dewrên-PALEOLITIK Û NEOLÎTİK- bi navên insanên (NEANDERTHAL Û HOMOSAPIENSI) leqabên kesane girtine, nemaze (3) li xerîta zemîn bakurê (MEDARÎSERETA) di xetê (BIROKSIL) de, ji roj ava berbi roj helat (KURDISTAN.IRAN.HIN.CAWA Û ÇIN) é dike bergeh, ev qelemroyê zemînî bingeha jiyîné bi xwe digre, divî warî de asarên dîtî rastiyê didin gotinê:

ZANAÊN ARKEOLOJÎ-li heremê (CAWA) kakotek seré insan dîtine ku /500/ hezar sal berî pirsra tarîxê, yekê dî li (PEKÎN) paytexê (ÇIN) é bi dest xistina (300) hazar sale, jé û péve li kurdistan başûrî çiyayé - BIRADOST ŞIKEFTA ŞINDER-di /1959-1961/ de şirketa arkeolojîya amerikanî, binavê (şirketa şemsûnî) dibin nêrevaniya (1) alimê asar (RALIFSOLIKI) de. hundirê wê şikeftê bi çar tebeqên-A.B.C.D.- (47) pê ax kolane şikeft ji erdê bilinde ew ax ji toza ku di nav bayê de ketiye şikefté. tebqa (a) heya tebeqa (d) (70) sal berî zayindé bûye, téde heft kakotên seriyên insanên-NEANDERTHAL Û HOMO SAPIENSI) tevi kêsek tovên şînkahî yan dîtine, çewa her heft serî di cildê tarîxa jêderiya nejadé kurd de di dest me dene (2). ev réçên welé dûr li awirpa ne hatine dîtin. heya ku ji me re (HINDU AWIRPI) bê gotin. ku ew têzên tarîxi tu mentiqê bixwe nagrin, ji wan têzan re bi kurtî bersifên (3) jêr têne

3. nemaze (xasseten),

1. nêrevan (muraqib) 2. jêderî (menşe) 3. bersif- ciwab)

dayin wek:

1. Piraniya wan (méjevanén) Ewripî agahî ji hev girtine û gotine: ew (ARÎYÊN) asiya ji (ESKENDINAFYA) çûne wir, tevî ku jiwana méjevanan (4) péve ûlema-én bi hevketina zemîn dizanin ku berî/3000/ sal miladî li wê derya (baltik) hêj erdê reş der neketibûn.

2. Lé berî zayindê li (AMED Û BAKÛRÊ AMED /5000/ sal asarén (HÛRÎ) ên pêşiyên kurd mayindene, hêj wêdatir li başûrê (seybiryâ başûr roj away derya (KASPÎN) Çemê (ALAGEŞ- yenî sî) 8000 sal berî zayindê liwê hinda vê (DEWLETA ALKANÎYA KURD BI SEREKÎYA ŞAHÊ ORUNGO) hebûye, çewa ku dîsa diwî cildê pêşîn de di dest mede herdû kevirê ber kélkén (şahê orungo) hene, diwan de donzde rêz nivîsar hene, di bawerîya wan asaran de ew têza eskendinafya ma efsane (6).

3. Ji milê dî eger arîyên asya ji awirpa hatîbûna wê pirsên zimanê wan bi xwere baniyana, lê emjî û ewjî dibînin ku di nav zimanê (arîyên awirpî) de pirsên arîyên asya mayindene, çewa ku di awirên (sematiloj û morfoloj) de jî ew salixên tarîxî liba (kurd, îran, efxan û hindîyan) té dîtin,

4. her wekî tê gotin: dûxan bé agir hilnayé-wiha renga wan muerixan ji dûxanê peyîvîne bê ko ji agir behis bikin, raste diwan heqbên zemanên gotî de yanî di dewra barbarî de ku hêj sînorên diwêlî nebûn, hin kom û kewte-én koçên pêşiyên kurd, ji REWAN Û ATROPATÎK (7) di bakurê

4. méjevan (muerix) 5. kaspîn (qezwîn) 6. efsane (istûre)

7. Atropatik (azerbaycan)

derya reş de çûne (HINGARYA) litor çemê (TONE) mane, çewa ku liwan hereman asarên wanjî mayindene, lê piştî zemanek dirêj jiber esbabên ne naskirî dîsa vegeîyane jêderê (8) xwe, diwê vegeî de li (ROMANYA) heremê (9) TIRANSLIVANYA- hin jiwn koçan liwir mane, ji wan re kurdên (DEYLEM) dihatin gotin, li (GIRAVA SIPAS-TAVOL-qirim-jî gundek jiwan koçan hene, divî warî de li dûsiyeyên (KARDÎNALÊN QUSTENTÎN RÎGA) jî té dîtîn û dibêjin:- ew koçên arîyên ku ji awirpa vegeîyane, berê jiwir çûbûn hingarya•

NEJADÊ KURD BINGEH LI TARÎXÊN DÛR DIGRE:

Belê ev nejadê (KOKA ARÎ) di rojhelatê navîn de ew çend kevne di zemîn de dewrên tarîxî di serxwe re derbaz kirine, çewa ku di bawerîya hézek ne penî (1) de ew çend nav li (xuda) kirine, wek:

- MÊTRA, AND, ÎNDO, AHÛRMEZADA, (2) HOMA YEZDAN, XUDA, ew her heft nav bi hindikî kémî du hazar sal nehatine guhartin, ji milê dî tu nejadî berî wan bîr ne birine ku jibona her tiştên peyda û hebûnan çî sar çî gerim, tevger û bê tevger di peyda de ji wan re hézek jixw ve(3) heye, dîsa diwê bawerîya gumanan de wan kesek şandekê (4) pêşwa û pîroz biwî hézî re girêdayî di zeman û

8. jêder (mesder) 9. herem (mentiqe),

1. nepenî (ne xuyiyayî) 2. ahûremezda (a jore. hûr. roje. mezd. mezin. yanî ew mezinê di ser rojêre, 3. ji xwe ve (qanûn tebie) 4. şandek (resûl, qasid)

mekanan de li nav xwe dane rakirin wek: - NAPIŞTAIM (5) MEHABAD. HOŞENG. ZORATÎ. MUZDIK. MANÎ (6) ZULFÎ (7) HÛR (8) ABRAM (9) zerdeşt (10), ev yanzide rêhberên heq nasî û dilovanîya hev biwan bide zanîn di nav vî nejadê arî de rabûne, belê di nav komên zende gî de berî her nejadî jêderê (PÊXEMBERAN) dîsa ewin,

DIXWE DERPEŞKIRINA navê (xuda) de, dîsa ev nejadê arî berî (FIR-EWNÊN)(musrê) biwê dozdarîyê ve rabûne û xwe dane naskirin, jiwanên wek: - HALIDÎ (11) (BIXÛD) xudanê (12) (HÛRÎ-NEMRÛD) ji eşîrên goş (13) vana xwe xuda dane naskirin û qebûlîkirin, ev bûne jêderê (ferafînên misir û edyanên binî sam), ev bingehên ku tarîx dide zanin ku (ARÎYÊN(asya koka nejadên arîne û wan di asya de pêçeka jiyîna insan girê dane, jiber wan dûrahîyên heqbên zemanê ku nejadê (kurd) ketîye pişt perda tarîxê liber çavê gelek méjevanan nepenî (14) bûne,

DIWARÊ zanistî û filojîya zimande, jibo insan karibin bi hin neqîş û elametên muxabirat ji dûr ve bi hev re bidin û bistînin, dîsa berî her nejdî vî najadê arî mader û peder (15) tîp (16) jibo nivîsandinê çêkirine, her wekî:

1. TÎPÊN ŞAHÊ ORUNGO) ên ku li ber kilka wî nivîsan-

5. napiş tayîm (navê nûhe) 6. manî (pêxemberê ararate),

7. zulfî, é di quranê de (zulkefilli hakurê (amed) lipişt bajarê (erxenî) ye.

8. nebi hûr) li çiyayê kurd li dor (afrine)

9. abram (ibrahîm xelil) 10. zerdeşt (navê wî zeretij) e li navbera (wan û urmiye) hatiye dunyayê, 11. halidî (perestîşgah) wî, li heremê (wanê) li (başqela) bi zêr kil-dayihûn buxt nesir ew zêr bir (habil). 13. nemurd. pismamê (azer. mihan. û ibrahîm) e du hezar sal berî milad (ibrahîm) ji (ruha çuye egebe), 14. nepenî (ne berçav) 15. peder, bave, mader, déye, 16. tîp (herif),

dîne,

2. TÎPÊN MANÎ) pêxemberê sazmana (ARARAT) ku jêre neqşên MANÎ dibê jin,

3. ew tîpên ku (HEZRETÎ ZERDEŞT PÊ AVISTA) nivîsiye, wek latîniyek bê nuqute,

4. TÎPÊN MASÎ SORATÎ (37) tîpin, /370/ berî îslamî ên kurd bûne,

5. TÎPÊN VÊ LATÎNÎYÊ, ên ku (EMIR CELADET) alfaba pêk aniye.

DUMAHÎYA JIYÎNA MIN BI TEQALÎDÊN KURD VE:

Belê her wekî li jor hate gotin gundê lê hatime jiyînê jêre (SERD tê gotin, li kurdîstana bakur rojê ava a kû dibin sitemkarîya turkê de vegirtî, zemîne wî heremî di warek jiyolojîyêkê fizîkî de liwan navçeyanê bê hemtaye (1), di quntara çiyayê (NEWZERG) de ku dikeve silsila çiya yê (TOROS), ji heqben (2) zemanên dûrve bi gelek ciyan hatîye ava kirin û di serpehaîyên tîvel (3) de hatîye xira kirin, ew kaviyên pîr hêj mayîndene, çewa ku hate gotin: li rojhelatê gundê çavîyêkê ava mezîni ji bin çiya dertê, medrebekê tê gundê ser beşçan, di rojhelatê de medrebekê dîtir dere ser aşan, û ji wir dere ser zewîyan, di navbera herdû cûyên avan de di nav beşçanê derbaz dibe, herdû rixên çemê ji darên koz, mişmiş, sêv, hinara, hijîr, şepitalî û sipîdaran hev girtîye dibin sîya wan darandê di golên avandê masî, beq û req, kevjal

1. hemta (mîsal) 2. heqîb (ji dewrên zeman re tê gotin) 3. tîvel

(muxtelif)

diser û bin hevre dizivirin û derbaz dibin, dinav pelén daran de tîrêjén rojé li pélén avé di ayîsin wek per-én zîv têne jimartin! liser daran dengé her tewir firoke én tîvel şalûl û bilbilan té, ji herdû qeza-ên(licê û hênê) pêve balîcan û qawin én serdé diçûne (DIYARBEKIR Û ERZEROM), gundé dorme tevde bejî ji rezan pêve liba wan nebûn, dema arvané xwe di anîn aşên serdê, her kerek selekek vala liser baré wan bûn, jibona ji nav beşçan (TÛ.HIJÎR) dadigirtin, jiber ku herdû ne paraztî bûn, dinav wan beşçe-én pir û daran de gund xuya nedikirin, biroj kesek li xanîyan ne disekinîn, her kar û xwarinén xwe li bin siya darén beşçan dixwarin, jiwana hebûnén meywe-én pir pêve, me zéde î (30) paket kurmên hevirmîş xewdî dikirin, bi pelên tûyên direwîn ên ku tûyan nagirin, her ersan liser zinarén raserî gund dengé kew, bilbil, şalûl û her tewir firokan diketin hev wek sazê piyano li meqaman perde bidin vegirin, çiqas dilgeşîyek mezin didane me, di pesara çiya roj ava yé gun de kevirek qul hebû nîşané împiratoriya nejadé (HÛRÎ) bû, li başûr keleha (Zerga fis) bajaré (xudanê hûrî-bixûd) diketin ber çav,li bakur de şikefta (eshab kehif) di zinarek bilnd de her mehén gulané ziyaret gahek mezin bûn, li navsera wî çiyayé (newzerg) néçîrvan bûm, lé sed mexabin wé sitemkarîya turkên mengol ji bîst salên wê kulîlka buhara umrê min pêve nehêştin ku diwê landika jiyîna pêşîn de ez bimînin, her di şoreş, zindan, û nefî ev (47) salejî li xerîbiya welatê sûrî dimînin, tené bayé kur hildikişînim ku jiwê landika jiyîna min tê xew pé berrxudar dibînim,

HER wekî agahe kurd bi xesafsê xwe-ê tarixîve bisé salixan navdarî û payedarî digirtin, ku hersî evbûn. MÊRXASÎ. COMERDÎ. DILOVANÎYA JAR Û BELNGAZ) AN jî her kesêre daxwaza pêşinibûn, biwî teqalidî LIHER gundên kurdistan dewlemendek gund mêvan xanekî binavê (WETAQ) di de vekrin, çî kesê nas nenas li gund bibe mêvan dere wê mêvanxanên lê dixwe vedixwe radizê hespê wanjî bi ka û ceh dihatin xwedî kirin bê ku zanibin ew kes kiye jî kuye an fêdekî wan téde hebe, jî milê dî jî gundîyanre jî wek (BANGEHEKE) her êvaran tevde lê vedihe-wîn, jî her awayên -abûrî, çandinî, xwedî kirina pez û sewal, awayên civatî- dipeyîvin, dinav hinan de dozêk hebe ew xwedî mêvan xanê wan digîne hev çewa ku hinên jî bajar tén bihistin û dîtînen xwe didin zanîn, di welat de buyerek çêbe hev û dû pé dihesînin,

BIWÎ teqalidê mubarek mêvan xana bavê min hebûn, jiber ku gund di navbera du qezande mêvan jî her mêvan xane-ên gundên dîtir giran tir bûn, lewre diwî zamanîde réwîngî bi siwarî an peyatî jî qeza (licê) ne digihane qeza (hênê) li gund dibûne mêvan, herşev jî (5-10) mêvan weqit bê weqit li wetaqê çê dibûn, jî gundîyan pêve ku timî semawera çayî gerim bûn, dinav wê qerebalixê de bavê min darsa min didan, jiber wîqasî niho divan nivîsaran de jî li nav zarûkên xwe min ev dinivîsin heşê min biwan ve ne diman,

DIWÊ xwedî kirina mêvanên pirde comerdiya bavê min zêde jî hudûd derketî bûn, dema diyamin xwe aciz dikrin

bavê min lê didan hingê em pênc zarukji bi diya xwere digriyan, belê biwî teqalidê tarîxî û wan mêvan xanan zêde dijwarî digiyane jin û zarûkên wê malê, lewre weqit an bê weqit çi gava mêvan bihatana divabûn ji wan re xwarin bê çêkirin, ji birin û anîna nivînan pêve, di warê abûrî de jî bavê min xwedîyê wî milkê pir timî deyindar bûn, ji ber wê çendê xanedanên kurd di zewacê de keçên xanedanan dixwestin, jiber ku di mala bavê xwe de hîne wê dayîn û zehmetî bûbûn, keçek ne xanedan nikaribûn wê dijwarîyê bikêşîne.

JINÊN KURD DI XWEDÎKIRINA ZARÛKAN Û HÎN KIRINA ZIMAN DE:

Di hîn kirina ziman de diya zarokan berî bav berpirsiyare ku zarûkên xwe bi pirsên sivik hîne zimanê wan bike, her wekî:

- ji tevaya xwarinên wek (savar, dan şorbe û wekewan re (EPO)
- dema ji zarûkan re bêjin bixwe (EMKE)
- ji her vexwarinên wek: av, çayî şerbet re (MEME) dibêjin,
- dema zarûk nêzîgê agir bibin ji dêla ku bêjin hûnê bişewitîn (BIV) dibêjin,
- ji dêla ji wan re bêjin ezê litexim (EÇÎKIM) dibêjin,
- dema zarûk dest bidin tiştê ne paqij an bixwazin bixûn ji wan re dibêjin (EKE. KIXE) yanî pîse,
- ji kurum, kêzik wek dûpişk re dibêjin (BIO) jê dûr dikevin,

- ji déla ku ji zarukan re béjin ronî dibéjin (ÇIÇÎ),
- tiştén pé bilîzin an wek (séw, hirmé, şekir bidin wan dibéjin (KAKA)

- dema jiwan re béjin xweha teye dibéjin (XUÇE)

- biwan bidin zanîn ku ev bira é teye dibéjin: (KEKÊ),

- ji dére (MAMA) dibjîn, ku navé (MADERE)

- ji her tewir firoke-én wek (mirîşik, kew, kevok çêcîk re (TÛTÛ)

- dema ji zarûkan re béjin mîz bike dibéjin (BIJE) bike,

dema zarûkan di hélan an dargûşé de dixin xewé, jibona ku heşé wan bi dengé diya wan ve bimîne ji wan re bi dengek zirav û hédî sitranén jér dibéjin, ku jére lorî té gotin: her wekî ew lorî evin:

- lorî lorî lorî delalê dilê min lorî,

- lorî lorî lorî piçûkê diya xwe lorî,

- kulîlka dilê min ronahîya çavê mi lorî,

me hûn bi xûné mijandîn bi lorîya mirfîyan hejandin lawo!

- lorî lorî lorî buhara dilê mi lorî,

- ev buhare dew lidare roma çepel (1) sitemkare lawo,

Belê bivan û wekevan sitranén dil birîn û matem zarukén xwe di xew ve dikin, ku yek ji teqalîdén wanén tarîxî û nejadîne!...

Zarûkên kurd ji dusalî heya pênc salan wek çêliyén teban ku ji qula xwe derkevin, jiber çavên dê û bavên xwe hinek bidûr dikevin, ji listiké digîne hevalén xwe, diwî umrî de ji wan re listik ji mayîna ba dé û bav bi gelek şérîntire, pirçîcar

1. jiber ku kurd zêde sitemkariya (rom) ditine niho ji turk re jî dibêjin

diwê listina nav be{xçe û kavilande di xew ve derin, an birçî dibin nikarin ji hevalan biqerin herin mal xwarin bixun heya évaré birçî dimînin, ew bêşên listikanjî wek xwendina dibistanan téne guhartin bi umrén wan ve, ji listika kapan, hingaftinên kevîrên sê rêz, listika xaran werdigerîyan listika tub,

ji pirçên dewaran gogên piçûk çê dikirin û pé dilîstin, li qulên civîkan û hélînen firokan digerîyan çêlikên wan derdixistin, bi çêlikên pising û kûçikan zêde bendwar diman, bi hékan dileyîstin, jê û péve kuştina gumgumok çêlikên maran û dûpişk ji wan re dibûne daxwazek pêşîn, êdî bi diya xwe re diçin ser şîna mirîyan, dema xwediyên wan mirîyan digrîn ewjî destên xwe didin ber rûyên xwe liwan guhdar dimînin, di şev bérkan de ji koh didin çîrokên kevin én tarîxî ku di şevên zivistanan de hin çîrokbêj dibêjin,

piştî umrê wan giya (7) salan, êdî jibona kuştina civîk û firokan tîr û kevan û dav çê dikirin, êdî ligor teqalîdé xwe dest péka hînbûna tufeng sekmanîyé bûn, di rix wande ji beré li keran û dawî 1 hespan siwar dibûn daku hîné siwarîyé bibin, êdî dicûne ber kar û berxan, sitûyên kar û berxên xwe bi qeytanén renga reng dixemilandin û nav li wan dikirin ji ên reş re ereb digotin,

Diwî zemanê gotî de li tevaya gund heya nahye û qeza-én kurdistan jî dibistan tunebûn, çewa ku agahe ji zemané (EMEWÎ, EBASÎ USMANÎ HEYA TURKÊN ÎRO) ré nedane ku kurd bi zimané xwe bixunin û binvîsin liba herçar dewletén kurdistan vegirtî vajîyé qanûnén wanin ku mile- té

kurd bi zimané xwe bixunin, jiber wé çendé li her mizgeftan îmamén mizgeftan dersên dînî didan zarûkan, ewjî zarûkên étim û belengaz dixwendin jibona ku bibin (MELA) nanek hésanî bixun, kesé zemîndar (1) sermayedar (2) an malbatén mezin zarûkên xwe ne didan berwé xwendina dînî jibo bibe mela, kesén ne belengaz ew payedarîya melan jixwe re kémanî didîtin, tevî ku dîndar qîmeta wan melan digirtihjî, lé dixwestin kurén wan di-comerdî, mérxasî û sekmanî de li nav eşîrê navdarî bigirn, tenê li bajarên mezin dibistan hebûn, kurdén bajarên dixwendin, lé xwendegahên bilind tunebûn, divabûn herin (SITANBOL) ewjî ji %1 nikaribûn kurén xwe bişînin wan xwendegahan, çewa ku gundjî nikaribûn zarûkên xwe bişînin bajarên xwe, ji milé dî ŞÊX Û MELAN digotin xwendina dibistanan îlmé esrî kufre, çewa ku wé ew kirde-én wan (şêx û melan) di cildé van muzakeratén min ê diduyan de bé dîtin, bé li (cizîra sûrî) dinav bera me û wan şêx û melan de li xwendiné çî kêşmekêş hebûne, piştî cenga cîhané a didûyan héj li gundan jî dibistanén xwendina esrî çé bûn, jiber wé çendé zarûkên kurd ji déla xwendiné ew dewir û sef di lîstiké de derbaz dirkirin,

ew lîstik vanîyên gotîjî ligor umrên xwe wek dibistanan ji sefek derbazî sefa bilindtir dibûn wek: ji/10-14/ salî ku édî destpêka buhara xortanîyé bûn, édî jiwé girtina lîstika kapan û hevalîya pisîk û boncîyén kûçikan, édî di xwede hêzadrî (3) hunerwerî mêr xasî û navdarî jiwanre dibûn daxwaz,

1. zemîndar (melak) 2 sermayedar (birjiwazî) 3. hêzdar (xwedî quwet)

çewa ku bihin karên malê wek: di gund de dora çûyîna ber pez, ji palan re xwarin dibirin, bejçe û darên meywa av didan, ji nêçîrvaniya tîr û kevan kuştina çvîkan, êdî dest davêtin tufingên nêçîrên kew, kéroşk, werdek û her tewir firoke bi tufingê dikuştin, çewa ku ji siwariya keran hîne siwariya hespan û cirîdan dibûn, di salên pêşde her berapêş gav didan,

di salên/15-18/ de ku jêre ketina dara mérani dihatin gotin: êdî ji nêçîrvaniyê pêve xwe hîne sekmanî û awayên şervanî û naskirina girtina erd û çeperên (4) dijmin dibûn, da ku di şerên şoreşgîrî de li hember welat vegirtiyên sitemkar hîne her awa û fenên şervanî bibin, da ku zanibin di eniyên (5) şerde çewa dijmin bipêçin û wan dîl bigrin, eve ku her kurd ji teqalîde xweve sekman û şervan û dilawerin!

Belê her (KURD) ji piçûkî heya mezin dibin biwî teqalîde xwe é nejadî di malên xwede hîne wê xwendegaha herbî û teqlîdî dibin, jiber wê çandeye ku di eniyên şerde li pêşîya dijmin perda mirinê radixin, biwan sîlehên teqlîdî her û her zora leşkerên nîzamî bi çekên cengdariyên giranve dibin û generalan dîl digirin çewa ku girtine, lé mexabin (1) jiber jstiratîjîya zemîne kurdistan, ku di navbera herdû leşker gehên şerq û xerb de bûye xetek istiwa siyasî her û her alîkî ji kurdistan vegirtîyan re dibe deste gir û piştégîr, nahêlin ku ev milletê bed bext mafê xwe-é siyasî û tarîxî bi destxe livê hindavê em dîsa vegrin ser teqalîdan

4. çeper (kozîk, istihkam) 5. enî (cebhe).

1. mexabin (meelesef)

DEMA xortén kurd dikevin wé rewiş û dara méranîyé, di seyklojiya wande ligor fizikîya (2) jiyogirafya û perwerde (3) bûna wana teqlîdî biwan re-DILGERMÎ. HUNER-WERÎ. BAWERÎYA BIXWE. DAXWAZÊN BILIND.NAVDARÎ. DAXWAZA WANA PÊŞÎN EWWE KU JI WAN RE PEYAKI QENC BÊ GOTIN- di rix wan daxwazan de ji wan re şahî dilgeşî evîndarî dîtina keçén xweşik û nézîgîya liwan dibe daxwaz, çewa ku-MELAE Z CIZIRÎ GOTÎYE:- HUSIN Û HUB ZATÊN QEDÎMÎN EW JI HEV NABIN CUDA- lewre keç û jinén kurd ne perde poşin, rojén cejin şahî dawetan bi mêran re dikevin dilané ku yek ji filiklorén kurd de, jé û péve di her warén civatî de jinén kurd serbest bi mêran re hevgelin, çewa ku diwarén xebat û abûrî (4) de jî bi mêran re hevpar di rojén şervanî jî bi méranre dikevin enîyén şer, ji wan re xwarin cebxane dikşînin nav çeperén şer dema hin şehîd dikevin, dîsa jin û keçén kurd lidor laşé wî civînek matem (5) çêdikin, li ser wî sitranek mérxasî û fedakîrî nû der dixin, ew sitranén ku téne gotin tevde jinén kurd derxistine, daku ji her kesé kurd re ew fedakarî bibe daxwaz, ev bûn me teqalîd û hin adaten kurd ji piçûgahî heya mezin dibin di bergaha jorde dane zanîn , da ku xwenda-én biyanî (6) jiyîna me nasbikin,

2. fiziki (tebiet) 3. perwerde (terbiye ditin) 4. abûrî (iqtisadi)

5. matem (hezî) 6. biyanî (xerib)

Ku di rojên pêş de ew jî wê ihtiramê ji mêrê xwe re bike, lewre ewê jî bibe kevanîya malekî, jê û pêve ji diya xwe hînê şuştina çek, firaxan serê zarukan, raxistina malê, awayê civatî û mévanan tevde ji diya xwe hîn dibin, çewa ku ji çêkirina xwarinê péve di çêkirina tevne û mafûr (1) de ewjî bi diya xwere jibo neqşên wê xalî an berê tayên rês û biskên rengîn di nav wê sidê(2)ya tevnê (3) de dihonin, daku her gul û neqîş di cîyên xwede bêne çêkirin, jêre hendese û hisabek hûr divaye, ji milê dî her keçên kurd di bêrîkên wan tayên hevirmîşê reng kirî û parçekî cawê sipî di berîka wande, ye biderziyê liser qenawiç hînê neqşan dibin, di rixwan karan de jî gore, lepik û kenze-ên lixwe kirinê bi şîşan çêdikin, ji bona caw hînê dolab rêsi, dibin, her jinên kurd dizanin liser tevnê jibo malê merş, çîwal, têr û xurcîkên siwaran çêkin, çewa ku tejên konên mezin çêdikirin, belê ji van karên hundur péve di her karên dervejî bi mêrên xwere tevkarin wek: dema mêrên wan paleyî dikin ewjî lipê wan qeflan hiltînin dikin gidîş (4) tevî ku av û xuwarinêjî dibin ser zevîyan, di çêkirina rezan de ew jî lipê wan miştan (5) berhev dikin, çewa ku hate gotin di zemanê şer de jî xwarin, cebxane dikşînin nav çeperên şervaniyan û biridaran ji derman dikin,

(1) mafûr (dezgedariya xali û heran)

(2) sidê (raxistina wî tayê dikin caw)

(3) tevne (ew aletên pê çawan û konan çê dikin)

(4) gidîş (koma sap)

(5) mişt (ew tiştên ji mêwan dibirin davêjin erdê)

DI HIN TEQALÎDAN DE FERQA JIN Û MÊRAN:

Li hember mêran jinên kurd hinek dûr diseknin çavên wan ji şikestîne, bi mêran re xwarin naxun, dema av vedixun berê xwe ji peyan dizvirînin hê vedixun, li ba peyayên xerîb nakenin û bi wan nakeve peyîv û gotinan, çewa liba peyan jin û keç bikenin kêmanîye, di civatan de, li alîkî hinek vekişandî bi awakî parastî rodinî, gotin ber bi wan ve nere na peyîvin, çi tiştên ku ligor teqalîdên wan kêmanî be layîqê xwe nabînin, jiber ku ew kêmanî tê ser bav, dê, bira, pisman û malbata wan tevan, bê daxwaza dê, bav, bira û pisman ên xwe nikarin bizewicin, ew kesê wan bixwaze eger dê bav û bira-ên wan wî kesî û malbata wî ne ecebînin keçik ji wî na ecebîne, jinên kurd zêde ihtirama mêt, xesû û xezûrê xwe digrin, keç ên kurd liber bavê xwe ranazên, bavê wan ji derve bê jiber radibin, tenê dema ku bixwaze wan bide yekê (turk an ereb) hingê bê emrîya bavê xwe dikin û dibêjin me navê, her keç û jinên kur pir hindik dizanin bistirên,

WERGIRTINA WANA NEJADÎ:

wer girtina mêran, şal û şapik an şerwalên diyarbekrî û niv zebûn, li serê wan kolos an kumên tiftik li dor wan kefyekî siwêsrî an cemedan lefandîye, li piştta xwe piştên (ecemî an lahur) girê didin, her kurd eger şeş agira wî ji nebe her xincerek di ber piştta wî deye ji her tiştî zêdetir ji silehhesdikin, ji kesên dîndar wek: şêx, mele an sofî-pêve kesek rih ber nade, tevde çi kal rihê wan kur kirî sinbêlên

wan hene, dema gotinek didin hinan dest davêjin sinbêlê xwe û dibêjin bivan sinbêlan, biwê sondê êdî gotin nediman, lewre bi şerefa xwe sond xwaribûn, li ba kurd ku bi hinan re liser tişteke gotina xwe da lê qulaptin şermezariyek zêde mezin e, dinav welatîyan de ji wî kesî re tu qîmetek mêran namîne, jiber ku seykojya (1) wan jî weke çiyayên wan bilind e, herkes dixwaze salxên wî bi mêrxasî comerdî, û sekmanî bê dayîn,

WERGIRTINA JINÊN KURD:

Keçên kurd di tîpên sematlojya û morflojya (2) de, bi her salixên arî nejadî li rojhelatê navîn asya roj ava bi nav û deng in, bejna wan bilind, nav mil û qorikên wan pehin, nava wan zirav rûyên wa an reng genimî, hin jiwan zêde boz û çav şînin, sipîkê çavê wan çivî tî, birûyên wan qetan, mişgên wan girs û dirêj, weke şeh li dor çavên wan sî digrin, lêvên wan tenik, diranên wan hûr sedfîne, porê wan qalind û dirêj li nav milên wan ji çar heya şeş gulî wek: marên reş dadikevin ser newqa (3) wan, biskên wan nêzîgê devê wan werib qusandî di rix hinarikên rûyên wan de hendesekî sê çikî pêktînin, awirên çavên wan zêde manyatîk dilbijok û evîndar in, bê tewalit kilê çavan potre, şampo ji cemalek ji xwe ve hatine peyda û rewişdar in,

Liwê gorê girêdana wan jî bi teqalîdê wanê nejadî ve

(1) seykoj (nefsiyet)

(2) morfoloji (rengê rûçîk)

(3) newqa (nava wan)

girêdayî, di fesalek awirpî de, tîstanê gewz û li pişta wan qez, hin ji boblinê spî fistan bi qeytanê reş xet û neqîş, bi ser da qutikek ji çûxê giran bi qeytanên surme ên zer û sipî neqîşandî, hûçik dadikevin ser rûyê destê wan, ji bin çuğan heya ser rûyê destê wan vekirî, jêre (mîtanî) digotin, hêj wergirtina zemanê (dewleta mîtanî) pirsek mayinde bûn, jiwan piştên qez ên hevirmîş pêve keçikan kemerên ji zêr an ziv girê didan' li serê kofî hawîdorê kofiyê rişyên reş ew kofî dinixumandin, lidor kofiyê ji hevirmîşê tenik bi rengên kesk, sor, zer, şîn di nav hevde honadî û di nav wan de rêzên zêran di rix hevde liser eniya wan raxistî di ayistin, di sitûyên wan de zincîrên zêr, bi wan zincîran ve zêrên reşadî û di daketina zincîrê de zêrek mezin liser singên wan wek sitêrk û hîvê di ayisîn (4), di zendên wan de bazin û tiliyên wan tije gustîlkên zêr û ziv bûn, lê piştî zewacê ku dibûn diya zarûkan ew xemlên xwe kêr dikirin, li şûna wan temezîyên serê xwe de şehrek ji hevirmîşê reş di nav de xêzê sipî didane dor kofiya xwe, ku ew xemil û girêdan tevde li dezgedariyên (AMED) dihatin çêkirin, li şûna wan kemerên zêr û ziv piştên ecemî didan pişta xwe, dema ku umrê wan li çilî derbaz dibe hêj derin şîna mirîyan û di hin munasebetan de bi mêran ve dikevin civînan, nemaze di zewaca kurên xwe de bi her awayî bi mêrê xwe re çewirdar û hevparin.

(4) ayisandin (heriqandin).

DI ZEWACA KURÊ XWE DE ..

Di zewaca kurê xwe de dê û bav zêde dilgeş û xwe bex-
tiyar dibînnin, ku berî mirina xwe kurek xwe zewicandin,
diwê şahiyêde ligor teqalidên xwe def û zirne dest bi şahî
dikin, ne tenê gundî ji deverên dûr nêzîg dost, nas û meru-
vên xwe ve dihewinin, dema ew xwedî tén siwar bî cirîdan û
di ser wan re teqînê tufeng û şeş agirane, ew def û zurnevan
derin pêşîya wan jiwan şabaşa xwe digrin, her çiqas dê û
bavê zava kal û pîr binjî di daweta kurê xwe de dikevin
dilanê xweên zava jî bi wê dil geşîya daweta bira-ê xwe di
dest xortan de dikevin dilanê ku yek ji teqalîd û adatên kurd
de, dawet heft roj dirêj dike, dema destê zave hene dikin
bavê zava sênîya henê di nav de mûm daçikandî dide ser
destê xwe û ligor sazê sitrana henê direqise.

Lê dema keça xwe di din ew dawet li mala zavaye, çaxa
ku tén keçikê dibin, dê, bav, bira, xwehên bûkê, nakevin
dîlana keça xwe, ligor teqalidên kurd kêmanîyek zêde
mezine, di zewaca kur û keçan de ji dê û bavê wanre du ser
bilndî hene, yek jê dema kurê wan diwê şevê de karibe
bizewice, keça wan jî liba mala mêrê xwe derkeve keçik,
eger ne keç derkeve hingê tê kuştin, jiber wî qasî dê û bav
di nav derya xemande wê şevê dikevin xew,

Belê bivan adat û teqalîdan xort û keç di dewrên jîyînê de
digîne zewacê, piştî zewacê bi zemanek ne dirêj ji ser mala
bavê xwe cîyê dibin, da ku ewjî bingeha mal û malbatek
datînin, ku mal û malbat jiwan barix (1) ew barix di hev

(1) barix (bavik, én ku héj dizanin bavikê wan yekbûye

gelî de dibin eşîr bi hev ketina wan eşîran gel pêktê, diwê girtina navê nejadî de ewin dibin dezgedarên tarîx di zemîn de cugrafîyek vedigrin, diwê pêkhatinê de gav didin, sazma-nên siyasî, nîzamên serdarî, zanistî, abûrî, civatî û tarîxî, ji wan re tê gotin: filan nejad, tarîxa wanjî jiwan dewrên pêkhatina wana pêşîn salix digre û jimere dide derpêş kirin ku jêre jêderê (2) wî nejadî tê gotin,

DI WAN ZEMANÊN GOTÎ DE DUKTORÎYÊN SIHIR-BAZÎ Û XIRAFAT:

HEYA piştî cenga cîhanê a pêşîn ji li tevata qeza û nahye ên kurdistan duktor nebûn, li hin wilayetên mezin eger hebunjî ji nexweşîyan re ne pêkar bûn, tevaya nexweşîyan sipartîyê sihir bazîya (şêx û melan) bûn, duktorîya (şêxan) bi tebarikê nanê wan, dest dayîn û axa mezerê bavê wan bûn, lê duktorîya (melan) nivişt bûn her wekî: - liba her melayî kitêbek erebî binav (DÊREBÎ) hebûn, ligor her ne xweşîyan jiwê kitêba insan kuj raçitekî bé derman yanî niviştê di nav piyanek (1) av de bibişêve û béje (bismîllahî , ehmanî rehîm) û vexwe, hin eşên giran hebûn nivişt biser wî ciyê eşêve dadileqandin, eger diranê wan biêşana herfa mîm, waw û eiyana erebî dinivîsîn liser textek di qulên wan herfan de bismar dikutan, eger bi muqawemta cismî ew nexweş hêsan dibûn ji niviştê mele bûn, eger dimirin digotin:

(2) jêder (mesder, an menşe, kok û bingeha wan ji ku hatiye)

(1) piyan (tase)

pêşîya qedere nayé girtin, belé dema nexweş diketin halé miriné eger ew mela-é xwediyé kitêbé li gund nebûna, suwarek dişandin ba melakî dûr é ku di nivîştan de bi nav û deng, xwediyén nexweş li dorwî péder yek dişandin ser ban bé suwar nehat, dema ew siwaré nivîşt pére dihatin wek mizgîna hêsaniya wî nexwî anîbûn, tevde lihev digerîyan, tavil ew nivîşt di avé de dibişaftin û ji nexweş re digotin vexwe tu xilas bûyî, biwé bihîstiné wî belngazîjî bawer di kirin diranén wî beş dibûn,

Wiha rene ji axa mezeré şéxan û tebariké nanê wan péve (şéx) jî nivîşt dinivîsîn, lé wek duktoré ku pére ixtîsas hebe nivîstén şéx hinek giran buhabûn, carek ez li mala şéxek mévan bûm, berî muxribé sofikî kal kuréwî lidor (13) salî ketin dîwana (şéx) wek adeté bi çarpîkan xwe giyande ber lingén şéx maçîkirin û paşé desté wî, şéx got: te xére wî got: ez gorî, kole-ê te kurémin zéde nexweşe, şéx got: qence ku te zû giyande vî dergahî, rahişte xama (2) xwe beré xwe da qublé û nivîşt péça û da desté sofî got: livir cî nîne herine mizgefté di nav avé de bibişéfe û bide kurik bi himeta (sada-tan) wé hêsan bibe, sofî ji kuré xwere got: te fermayîşa şéx bihîst? rebené kurik keyfa wî hat diranén wî beş kirin, lé di dilde ew geşî nema bûn ku karibe bikene, jiber ku jana zirav giyabûn derca çaran, tevî sofî ji şéx re berxek anîbûn ji şivjî nedawan çûne mizgefté, héj em li dîwana şéx ronîştî,

(2) xame (qelem)

jimere jiwê geşî û xweşî bihuştê û xweşikîya (suruştan)(1)
 salix dide û dirixde tirsax wê dûjeha (2) reş dide ber çavê me,
 her wekî ew bixwe midirê tapûyê herdu ciyane, sofîyê bavê
 kurikê nexweş kete hundur û liber lingê şex çokda û lingên
 wî xistin devê xwe û got: ez gorî kurê min piştî vexuwarina
 ava nivîştê zêde ew rahet û dilgeş bû şex got: sofî elbet
 mejî tiştêk nivîsî, sofî bi dilek geş vegeşîya çû, min liba xwe
 got: ew geşîya pêşîya mirinê heye, şex çû emjî razan piştî
 nivê şevê sofî li derî da û digrîyê dibêje şexê min kurê min
 mir! min got: heywan şex liba jina xwe razaye eger şiyar bû
 belkî ruhstin ji ser kurê te vegeşandana, here ba kurê xwe
 heya sibê,

Jiwan nivîştên nixweşîyan pêve jibona ku zaruk ji
 tékilîyên perîyan (3) bêne parastin, her zarûkek nivîstek bi
 nav milê wîve dalqandibûn, jinên ku jiwan re zaruk çê nedi-
 bûn, jibona wan jî nivîsarek dirêj ligor bejna wan hebûn
 jêre (berbeşin) digotin, bihayê wê nivîstê hinek giran bûn, di
 zemanên cengdarî de karê wan (şex û melan) zêdetirbûn,
 jibona ku gule di laşê wan nere her yek nivîstek biwanre bûn
 tevî ku didîtin ew xwedîyên nivîştan tene kuştinji, jibona xêr
 û bereketa malê hinan zêde be nivîstek bi ser derên xwe ve
 daldiqandin dema pez an sewalek (4) hinan bişev winda
 dibûn, xwedî berê xwe didane mala mela-ê gund digot:
 seyda zû devê guran girêde jibo nexun, mele dîgot: ka kera

(1) suruşt (hori)

(2) dûjeh (cehenem)

(3) perî (cin)

(4) sewal (dewar)

te, kéra wî vedikirin û ji (qurané sûre-ê weduha) li kêrê dixwendin û digirtin didane xwedî wan heywané windabûyî û jêre digot: te sibehê heywana xwe dît devê kêrê veke, jiber ku ew gur birçî dimîne gunehê, dema sibehê didîtin ku gur ew pez an sewal kuştîye, hingê mela digot: diser heft newalan re derbaz be devê wî tê vekirin, dema kurim diketin bistan an çandinîyan nivîstek liser textik dinivîsî û li nav wê zevîyê da diçikandin,

Tevaya nexweşyên wek: tîfo, tîfoît, taûn, kulêra-ji van tevan ra hal digotin, ji wê janê re jî hin nivîstên xêrdayîn hebûn, hin nexweş jî dixistin bin lihêfê û şêx an mela bi darek li lihêfa wî didan û digotin: binavê-mûsa-îsa, muhemed, xidir û ilyas-nixweşî ji laşê wî derkeve der here..

Nexweşîyên- esebî, nefsî, ên dîn dibûn- hin şêx hebûn cinên wan digirtin digotin xistine hundîrê qamir yanî zilikek, eger heşê wî ne hatana cî digotin cinên wî kafirin ne musulman, hin şexanjî ew dîn bi zincîrê girê didan û herroj li wan didan, xwarin jî ne didane wan ava giyayê hermil dikelandin û bi serê wan de dikirin, gelek ji wan dimirin ne xwedî û ne jî hukumet têkilî wan jî ne dibûn, her wekî nexweşê ku liba duktur di emelîyê de miribî,

Ji bo nexweşîya malarya takî benê xav dikirin heft girêk dixwendin û pif dikirin nav wê girêkê û girê didan, dixistin destê wan lê girê didan, eger lê dirêj dikirin di çile-ê zivistanê de ê ta digre diçûne ser dara tûyê, jêre digotin tu liser darê çi dikî? wî digotin ez tûyan diweşînim, digotin ma wexta tûya ne? wî digot ma wexta tane ku tene min,

Kesê falic li wan bidana jêre nivîst nedî bûn, her digotin ji

şéxan xeber daye wicaxê wan lê xistîye divê bibin mala şéx, hingê şêx destên xwe ê pîroz ew dera falic difirikandin, falic li rûyê min aliyê çepê dabûn duktor heb û derzîyên (vîta-mîn, b) dabûne min dîsa kî dihatin ba min digotin: xwedê jite razîbe tu bawerî bi şéxan nayîni ku herî bawan,

çi zarûkên ku bi nexweşîya (iltihaba -rodîyan, meede, kurçikan) bana digotin ev nexweşîyên ser û binê hîvêne, diçûne wê mala ku beroşek mal mîrat, yanî bê kesek jêre xwedî bimîne tenîya wê beroşê di enîya wan didan, li gundê me pîrek bi navê (wesika nebi) ew beroş li ba wê hebûn, di zarukîde gelek caran ew tenî li enîya min daye,

Hin zarûk jî bi wan nexweşîyan an jana zirav diketin digotin: cinan bi ên xwe guhartine, ji vê re ev mîsala min dîtî: keçek pismamê me di umrê mide keça husenê încu jêre (fato) digotin, her nexweş û bê hêz mabûn, ji dîya wêre gotin: cinan keça te guhartîy, bibe şikefta ser çavîya mezin, liwir dayîne û gazî bike bibêje : gelî cinan hûn bi xatirê (xuda) kin hûnê keça min bînin û a xwe bibin, (dîya fato) keçik kire hembêza xwe em çend zarok jî lidor em çûne şikeftê gazî cinan kir û fato liwir hişt em jê dûr ketin, fato ji tirsan barewara wêye, piştî niv saet me çû fato anî û hatin gund, pîrek lê vehewîyan hinan digotin Fatoya berêye lê hinan digotin neyadê welaî ev ji Fatoya berê çêtirre, dawî Fato biwê nexweşîyê çû,

Ji van sîhir bazîyan pêve piraniya nexweş û ji bo nexweş nekevin diçûne ser ziyaretan, yanî mezerên şêxên mirî, an di zemanê islamîye tê de ew erebin ku li welat hatibûn kuştin,

ji wan re ziyaret dihatin gotin, di çûna serwan ziyaretan de divabûn pezek bi xwe re bibin li wir serjêkin û savar ji çêkin, bidin wanên biwan re çûne an gundîyên dor ziyaretê, ji maç kirinê kevirên mezerê şex pêve, axa wî jî di avê de dibişaftin û vedixwarin, dema di devê zarûkan zar êş çêbûna dîsa muftê-ê derîyê ziyaretê an mizgeftê di devê wan didan,

NE XWENDA DUKTORÊN KURD: ⁽¹⁾

li her deverên kurdistan duktorên kurdên ne xwenda ên tecrîbî hebûn bi dermanên welat ên teqlîdî hin nexweş nemaze (1) birîndar derman dikirin, belê wan duktorên gotî zanistîya tub ne xwendibûn, lê ji zamanên dûr ve di berevanîya mafê (2) xwe-ê nejadî (3) de her û her liber welat vegirtîyên sitemkar şervanî bûn, ew birîndarên xwe bi dermênên xwe-ên teqlîdî derman dikirin, lewre li dirêjahî û pehnaîya welat duktor nebûn, dermanên wanên gotî bi hindikî evbûn:

(1) xwenday ên delal di van nivîsarên dirêj û fireh de daxwaza min dido bûn, yek jê jibona nûhatî jiyin û rewşa miletê xwe di wan zemanan de qenc nasbikin. bê çi dewr derbaz kirine, a diduyan jibona ku agahdar bibin û zanibin, wan ajanên mîtafizik bi wan bedkariya /14000) bê çi bi serê vî miletê xwe-ê bedbext anîne û kirine kole. belê ji wan hin niştaman perwerên mezin rabûne. piştî ku li xwe şiyar bûne ku li hember miletê xwe berpirsîyarin, ew rêhberên mezin û fedakar li ba me pîrozin.

(1) nemaze (xasseten)

(2) maf (heq)

(3) nejâd (qewim)

1. ji birînên gulere sê rojên pêşîn, hingiv û xweyî di nav hevde dikelandin dibûn wek: bevîr ew hevîr dikirin wek: bismaran li ser sênîyek paqij lirêzê dadanîn heya ku hişik dibûn, hingê diwê birîna gullede badidan heya ku di birîne de winda dibûn û têde di helîyan, êş û şewata wê fitilê ji gulle bi gelek diwartir bûn, sê rojan pêder pê ew fitil lê didan, birîn bi carek dikewandin, piştî hingê hêj fitilên merhemê lê didan ew merhem:

2. ji benîştê darên kizwanan, şimeê hingiv û rûnê nivîşikhersî di nav hev de dikelandin dibûn merhem, terîşek kitan dinav wê merhemê didan û lihev badidan dikirin fitil di wê birîne de derbaz dikirin rojek têde diman, paşê pêderpê diguhartin,

3. eger li dor birîne werim çêdibûn yanî iltîhab çêbûna, hingê kar an berxek serjêdikirin çerim dikişandin ser wê birîne, ew werim bi carek dadixistin, jivan pêve tu derman nebûn, biwan dermanên gotî di /1932/ de min birîna bira-ê xwe (SIRAC) derman dikirin,

4. her nexweşiyên ku nexweş ji hundirê xwe gazin dikirin, şerbeta hingiv û hinar didane wan, jê û pêve dermanê wanji nebûn,

5. jibo êşa gurçikan, seriyên diran kursan (4) dûvikên kerezan û bexdenûs dikelandin ava wan vedixwarin, xwarina wan divabûn bê xweyî, çayî û qehweji venexun,

6. nexweşiyên çermê insan wek (bîrov) giyayê botav di

(4) giyakî serê wî ji sixên hûr ketiye bihev hercar yekê jê pê tiştan ji ber diranê xwe der dixin, bihna wî ji xweş e, li deverên deşt çêdibin.

avêde dikelandin, hinek şeb jî davêtin nav bi germî li wî
ciyê bîrovê dikirin, an istîrîkên reş dişewitandin dihnê jê der
diketin tê didan,

7. jibona (romatîzîm) fîrkandin, xweyî diqelandin dixistin
kîsek û pê dera êş gerim dikirin, an ew der dikewandin,

8. jibona zekemê, ji çayî pêve gîyasêvîk-beybûnîc, gulên hîlo
û gîyayê nene dikelandin vedixwarin,

9. jibona- kunûr û pizikan-ku bê emelî derkirin, hevîr û rûn
didane ser an bi ava gerim dikewandin, dema ew pizik
derbû yanî ji serê pizîkê hinek hate vekirin, hingê çekem an
ji sabûna ne şûştî û sipîka kêkê merhem çê dikrin didan ser,
nêm û kêmbicerek jê dikişandin der,

10. dema dest an lingên hinan dişkestin, ew duktorjî jiwê
şikestî re pêkar bûn, bi tilîyên xwe ew dera şikestî
dipelandin piştî bicî naskir ew hestî şikestî digîyandin hev,
cawek dinav hêkê de tevî xweyî digelfitandin û şidandî qenc
lê girê didan, liser wî cawî di şûna cebsîn de çar textîkên
şayîk jibona neleqe li dorê ew jî dişidandin, bi we duk-
torîyê ne dihêştin ku siqet bibin, belê bi sedan sal ji wan
raçête-ên sihra şêx melan duktorîya kurd ev bûn,

ŞIRKETA GANGISTERA TERÎQETÊN ŞÊXAN LI KURDISTAN

Van terîqetên şêxan wek: şirketa gangistera (1) pehnahî û

(1) gangistira (şirketek dîzan li amerîka hebûn, gelek ji serkarên hukûmetê tê de
bûn, lê hingî bi fenek mezin pêk hatibûn, hukûmet nikaribûn wan bigre.



dirêjahîya kurdistan dabûne berxwe, ew terîqet bi gelek navan hebûn, lê ên ku kirêdîyên wan li ezman hebûn ev herçar bûn: NEQŞEBENDÎ. QADIRÎ. ÇESTÎ û SEHREW-ERÎ, jiwan her çaranjî ên ku di OLUMPIYA azmanan de zêde kas û madalya bidest xistî-neqşebendî û qadirî-bûn,

1. dema behsa wan şêxên terîqetê dihatin kirin ji behsa pîxemberan gelek mezintir bûn, bi bihîstina navê wan bê hemdê xwe laşê sofîyan diricifin wek: taya sar bê wan, pîrê vê terîqetê Turkên (buxara buhaedîn neqşebendî) ye, uslûb û tesewifa terîqetê ji dînê (BUDA) ji -şêx evdilahê dehlewî-hatîye girtin, ê jê girtî (mewlana xalid) yekê kurd de, wî ew nexweşîya (taûn) derbazî nav gêlî û gazên çiyayên kurdistan nav komên nezan û belengazan kirîye, bi sedan sal heşê wan belengazên ne xwenda morifîn kiribûn, dema çî tengahîyek an belakî biserê wan dihatin, bê ku gazî bav, bira, pis-mamek xwe bikin, gazî (xuda) jî nedkirin digotin: ya şahê neqşebend û mewlana xalid ê dubask- ji vê re mîsalek- li (norşên) heremê (bedlîsê) şêxek hebû, sofîkî wî li wan gêlîyên bedlîsê erebawî ya ga diberde, erebe ji rê derket ber bi gêlîyê kûr digindirîn, bê ku xwe bide ber erebê, destên xwe dane newqa xwe û ya hezret ya hezret digotin, erebe li binîya gêlî parçe bû gayên wî jî pêve girêdayî ew jî laşê wan parçe bûn, sofî digot: wey hezret ma te çî niha dîya wî mêrî lo,

Ew şirketa neqşebendî di kurdistan de ji tevaya terîqetên şêxên dîtir mezintir bûn, ên têde (dîploma majistir) girtî evbûn: mala seyîd taha ê nehrî-li (Hekarî şemdînan) mala xews ê hizanê (li Heremê bedlîsê) mala şêx eliyê palo kalê-

şêx seîd li palo bûn ,hezret li kela norşîn bedlîs-bûn, şêx huseyné besretî-li cizîra botan bûn, mala şêx Hamid- li rojhelatê mardîn bûn, şêxên berzan, kalê general Berzanî- li berzan singê çiyayê şêrîn-bûn, ji wan ên ku ji wê sîhir bazîyê revîyane nav komên mîletê xwe û di rêya girtina heqê wan de bi mal û can xwe feda kirine şehîd û rehberên jêrin:

ŞÊX UBEYDULAHÊ NEHRÎ, MALA XEWIS, ŞÊX SEÎDÊ PALO, ŞÊX MEHMÛD BER ZENCÎ, ŞÊX AHMED Û GENERAL MUSTEFA BERZANÎ. ŞÊX AHMEDÊ XANÎ. QAZÎ MUHEMD ji vana pêve tevaya şêxên kurd liber mehkema tarîxa kurd mehkûmin,

2. Terîqeta qadirî, pîrê vê terîqetê (şêx evdulqadir geylanî) ku ji heremê geylana îran e, vê tabûra pêncan jî li her derên kurdistan malikên gustabo (1) dabûne vekirin, di tesewifa wan û neqşebendîyan de hin ferqên canbazî hebûn, di xûn- mijî û kosmopolîtîyê de herdû yekbûn

WAN ŞÊXÊN MEZIN DIVA BUN JI HIN MELA ÊN XASUG (2) çend xelîfan peyda bikin da ku mîlet li dor wan vehewînin, wan xelîfan garanên sofîyan ve di hewandin, her wekî agahe (3) bi zîmanê erebî pîrsa (şêx) du manan digre, ji kesê kal re (şêx) dibêjin, ji serekê eşîrê re (şêx) dibêjin, lê li ba kurd (şêx) her tiştên nexuyayî dûr, nêzîg dibîne û dizane, heya liba sofîyan bawerî ewbûn ku insan çi gunah bike an dilê wî de çi hebe şêx dizane, dîsa wan şêxan

(1) gustabo (muxabîratên) merkeziya- bûn)

(2) xasûk (mahîr)

(3) agahî (elîm- agûhî- malûmat)

digotin: kesê şêxê wî nebe roja paşdawî (4) nikarin diwê pira ser dûjehê re derbaz bin, şêx wan dike kêç û di nav kurkê xwe de derbaz dike, yanî wê qaçaxa ku gumrikçiyên xuda nikarin bigrin, şêx dikaribûn qederên gunahkaran li depê (5) mehfûz de wergerîne qenciyê, wan bigîne bihuştê nav komên suruşt (6) tan, şêx diçûn ser mezelan jêve xuya dikirin ku mirî bihuştî an dûjehîye, ji wê agahiyê re (kifşil-qubûr) digotin,

Dîsa divabûn sofîyên şêx bawer bikin ku dema şêx libawan ronîştî li gelek deverên dijî tê dîtin, çaxa li pêşîya wan nimêj dike hingê li (meke) é lipê (pêxember) jî nimêj dike, bi wan (Kerametan) her şêxek bi navê (munaqibe) kitêbek wan hebûn, ku kerametên wan di zeman û mekanan de wê kitêbê didane derpêş kirin, ê ku bawer nekirina jêre kafir di hatin gotin: belê her awa û kirde (7) ên şêxan vajiyê şerîeta islamî û (hedîsên) pêxember bûn,

Ji nimêjên pênc weqit û bi hezaran kişandina tesbihên selewatan pêve, herrojên in yekşemban divabûn sofî li ba (şêx an xelîfe) di mizgeftê de li pişt perdeki bikevin (Helqê) hin kevirên şayik di dest wan de pé selewatan dijmêrin, çavên tevan girtîye kilîşa (1) şêx tînin ber çavên xwe, şêxjî lidor wê (helqê) dere û tê (xutba xocegan) yanî navên şêxên pêşîn ku jîwanre (sadat) dibêjin, biqîr û heybet dixuyîne,

(4) paşdawî (qiyamet)

(5) dep (lewih)

(6) suruşt (horî)

(7) kirde (kirin- emel).

(1) killş (resim)

dibêjin şêx liser kî bisekine ew kes buhuştîye, diwan qîran de şêx gazî dikirin (şahê neqşebend, şêx evdulqadir, qutbê çistî û sehrewerî), şêx misik li çekén xwe direşandin soffîyan digotin: béhna (nisbetê) jê tê, soffî li mala xweji dema ra dizan nikaribûn lingên xwe bi alî mala şêx ve derêj bikin gunahêk mezin bûn,

soffî dema diçûne mala şêx divabûn herkes ligor pêkarîna xwe dest vala nere, pere an kar an berxek dibirin, çewa ku cotê şêx paleyî û her karên şêx belaş bûn, lewre heqê wan çûna bihuştê bûn, her kesê ji xuda dixwestin ku şêx an kurên wî keça wan mehir bike, serfirazîyek zêde mezin bûn, lê bi dest her kesê ne diket, lewre keçik ne zêde xweşik bûna şêx mehir ne dikirin tevî ku belaş bûnjî, jîwan şêxan hinên ku di kerametan de giya bû nîşana nobil (2) ên jêr bûn,

1. Tevaya (şêx û melan) bi devek digotin: (şêx cuneydê bexdadî) bi hindikî 3 caran çûye di alema-berzex- de kişfa erwahan kirîye, yanî çûye azmanan wê devera ku giyan (3) jê hatine û piştî mirinê dîsa derin wê şanikê (4) pelandîye (5), yanî liser veşartîyên xuda mufetiş bûn,

2. soffî û melan digotin li (cebaqçûr ber çemê madragê) me lipê (şêx eliyê palo) nimêj dikirin, beqên çem kirin qurequr, şêx gazîwan kir û got: gelî beqan dengê xwe bibirin heya em

(2) nobil (ew diploma ku hin di awirekî ilmî de xizmeta pêşketina insan dîkin. nîşanek diwêliye li) siwêd didin

(3) giyan (ruh)

(4) şanik (ew nanikên hingiv)

(5) pelandin (teftîş kirin)

nimêj bikin, deng ji wan hat e birandin,

3. sofîyên gundê me digotin: şêx mehemedê serdê-mir, (şêx huseynê dêrçamê) hat wî bişo, ji wî laşê mirî re got: eselam û eleykum ya feqîrê xuda, wî laşê mirî destê rastê hilda, silav ragirt,

4. îmamê şeêrawî- ê ku di nav ereban de zêde navdarîyek bilind yanî duktora semawatan girtîye, wî zêdeyî /300/ rûpel kerametên xwe nivîsî ne, hin melan jêre gotine: péxember gotîye (elxeyib îndellah-) yanî gotîye tiştê ne liber çavan liba xudaye, -şeêrawî- gotîye: vaye- xuda di-quranê- de gotîye: (fe ema biniîmet rebike fehedis-) yanî ew qenci ya ku(xuda) daye te bibêje,

5. mesela(şêx muhyedîn ê erebî) ne tenê şêx tevaya melan dibêjin: şêx muhyedîn li (şam) lingê xwe li erdê daye û gotîye: ew xudayê ku hûn jere perestişkarin (1) di bin lingên mindeye, biwê gotine biryar (2) bi kuştina wî dane, paşê hinan gotîye hela em şûna lingê wî vedin bê çi têdeye? dema vedane dîtine ku perên pir di wir de veşartîne, yanî şêx bin erdê diditin gotîye hûn ji peran re îtaet dikin,

6. dîsa dibêjin: şêx muhyedîn- digotin: perî (3) ji bayê hatine pey da, ew û insan nikarin bi tu awayî têkilî bi hev bikin, lê çendekî şêx windabûye, dema hetîye enîya wî girêdayî bûn, jê pirsîn wî got: min periyek mehir kiribûn, me pevçînî serê min şikêrand,

(1) perestişkar (îtaet. taet)

(2) biryar (qîrar)

(3) perî (cin)

7. Li cizira surî roj avayê bajarê (qamişli) li gundê (xezna) ji xelî fe-ên wî (hezret) ê jor gotî binavê (şêx ahmedê xezna) tevaya cizirê girtibûn bin seywana (4) xwe, çend kurên wî hebûn ji wan ê ku dixwendina dînî de bilind û xwedî merkez jêre (şêx elaedîn) digotin: wî digot: min ji bavê xwe re got: baba tu tiştêk pêşme nakî? bi hêrs awir li min veda û got: elaedîn, ew li pêşiyê ez lipê, min dît erd vebû bavê min di dircikande daket û erd lê hatehev, ez mam, erd venebû mela-ê nîvro ezanda, ez çume mizgeftê ku bavê min di mihrabê de li pêşîya civatê nimêj dike, ev buyer di zemanê min de ez li cizirê bûm,

8. kurê şêx huseynê besratî şêx ibrahîm heqqî, em di civata wî de ronîştî bé şerim û fedî ji civatê re got: yek ji mirîdên me liber çem dît beq ji peravê ewlê derbazî peravê (5) wî aliyê çem bû liwir dûpişkek liser piştta beq suwar bû anî vî aliyê çem, ew dûpişk kete hewşek û derbazî bin lihêfa sofîyê me ê ku di xew de bû, lihêf hilhat û daket, mêrik zû lihêf hilda, dît ku marek xwe li sitûyê sofîyê me pêçaye dixwaze wî bikuje, dûpêşkê bi serê mar veda û kuşt lefên mar ji stûyê sofîyê me hate vekirin, -ligor gotina şêx ew dûpişk jî sofîyê wî bû,

9. Li surî li bajar (Amûdê) ji terîqeta (qadirî) binavê (şêx ahmedê kesk) hebû, ev şêx di fen û hilabazîyan de nadîde bûn, ji herderên dût û nêzîg kesên dîn dibûn di anîne ba wî, gelek ji wan dînan bi lêdan di qeyid û zincîran de birçî

(4) siwan (şemsi)

(5) perav (perê avê sahil),

dihêştin dimirin, serê hinan kur dikirin û li dor serê wan hevîr dikirin li dor kakota wan bilind û zeyt dikelandin bera nav wê tasa hevîr kirî didan dikuştin, her wekî duktorê pêre diplom hebe liba hukumetê û xwedîyên wan jî mesûl ne dibûn, ji milê dî bi dizan kerametê xwe derpêş dikirin her wekî:

Di/1934/ ku laciye siyasî ji kurdistna bakur daketim sûrî ku hingê (Firansa) lê mandater bûn, em laci qebûl kirim, diwî zemanî de li cizîrê çandinî bi cotê ga û histiran bûn, çewa ku ger bi siwarîya hespan û histiran her bar guhartin bi devan bûn, jiber ku diraktor û dirase hêj nebûn, pîraniya erdê cizîrê tevde beyar, têde zêde kerîyen pezên pir dihatin xwedî kirin, li cizîrê avanîyên gundan û çandinî ji kurd pêve nebûn, lewre ereb tevde koçerên xwedî pez û deve, avanîya gundan û çandinî nizanibûn, havînan jibona çêra pez û bi dest xistina hin genim ji başûrê ferat (-dêrazorê) dihatin cizîrê, ber bi wê hebûna kurd ve dikişîyan, li nêzîgên her gundên kurd çend konên reş xuya dikirin, hinan jibo kişandina sapê genim ji ser erdan ku bikşînin bênderan deve- ên xwe bikirê didan, jinên wan lipê palan leqat û dizîjî dikirin, hin dibûne şivan, hinan pişkulên wan pezê mala keyayê gund jibo agir didane hev, heya payîza paşîn barek an du barên devê genim bi dest dixistin û zivistanê dîsa derbazî dêrazorê dibûn, lê di rix wan karan de zêde dizên wan pîrbûn, her şev dihatin gotin: ji filan gundî ew çend pez, an histir, hesip hatine dizîn, diwan buyeran de ew şêx ahmedê kesk) ê ku li (Amûdê) liyor hate gotin, biwê canbazîya gotî xwest ku biwan dizan ji xwe re kerame bide derpêşkirin

ji wan dizan yek binavê (evdula şermûx) ji xwe re kir istixbarat, jêre got evdula- tu guhdarbî çî dema dizî çêbû tu were ba min û bêje filan erebî filan tişt dizîye li filan derê konê wîye, ezê para te ji xwedîyên mal bigrim, evdula pêderpê dihatin ba şêx digotin filan erebî filan tişt dizîye ji filan gundî liba wî. mala wîjî li filan derêye, şêx li deftera xwe dinivîsîn, hin sofîyên şêx gotin: ewên malê wan té dizîn, tevde bawerîya wan bi şêxan nayê, dema bêne ba şêx wê malê wan derxe, biwê bihîstinê malê kî dihatin dizîn xwe didane mal şêx) da ku bi kerametên xwe malê wan derxe, şêx roja malê wan çûyî û çine û çendin jîwan dipirsîn diçûne alîyê malê li deftera xwe dinêrin û dihatin nav derîyê dîwana xwe bihêrs û dengê bilind digotin zû ji minre otomopilê bînin, li ba wan dizên haram xwar ku wê karibin xwe jiber çavên min veşêrin, ji şufêr re digot bajo (hesîça) jiwir digot: bajo berîya xalî nav konê ereban, li nav konan dipirsîn konê filan kes kîjane? pêş dikirin, ji şufêr re digot: dinav şerîtan re bajo hundirê kon û zimera otomopilê lêde, biwê heybetê diketin hundirê kon û jiwî dizîre digotin: zû filan malî bîne an ezê herdû çavên te derxim, ew erebê diz gêj dibûn bawer dikirin ku ji şêx tiştekan nayê veşartin lal dibûn zimanê wî ne digerîyan, hema xwe davêtin ser lingên şêx û solên wî dikirin devê xwe, dîsa şêx biqîr digot: jitere dibêjim zû bîne berî ku tu û zarûkên xwe di erdê re herin xwar, ew malê dîzî her didan lê ji giyanê xwe ditirsiyan, wî bi jin û zarûkên xweve bi girî û hawar hawîdor cibe- ê şêx dikirin devên xwe,

Belê piştî ditina wan kerametên şêx, xwediyên heywanan zêdeyî nivê heqê wan didane şêx, hingê wîjî para şêxê xwe (Evdula şermûx) didan. bi wê bihistinê ne tenê ên malên wan dihatin dizîn, lê biwan kerametên ku li cizîrê hate belakirin ji dûr û nêzîg xelk weke pez berbi ucaxê şêx ve dihaten (Amûdê), çewa ku kesek destvala ne dihatin, hingê ezjî liwî bajarê (amûdê bûm, ev kerametê (şêxê kesik) jibo mîsalê di vir de berge girt, daku bê zanîn ku kerametên tevaya şêxan ev canbazi bûne.

10. ji vî şêxî pêve li wî bajarê (Amûdê) gelek şêxên dîtir hebûn, jiwan çete-ên semawî (mala bavê kal), solek pêşiyê wan hebû, jê re (şimika bavê kal) digotin, jibo her nexweşiyên av dixistin hundirê wê- şimka zemîni û mikrûb didane nexweşan, ê falic bi wê şimikê lidera falic lê dayî didan, jinên ku jiwan re zaruk çê ne dibûn, ew şimik li nav piştî wan didan herwekî têde hirmûnatên baylojî hebûn, yekê di bi navê (şêx sedeqe) hebûn, wî jî nan dixistin bin çengên xwe û li kuçan digeriyan didane kûçikan, dakû bêjin çiqas dilovane (1) jiber ku jiwan kûçikan peve tu sofî peyda nekiri bûn,

ŞÊXÊ TORÊ MEHÎNÂ BIRÎNDAR:

Her wekî agahe ji dirêjahîya rojhelatê çiyayê (tor abdîn) re tê gotin çiyayê torê., ku eşîra (haco axa-ê hevêrkî) têdene, di /1915/ de ku (sultan reşad) frman bi kuştina (êrmen) da, ku diwê fermanê de ne tenê mêr lê jin û zarû-

(1) dilovan (dil rehîm)

kên di pêçekê de jî dikûştin. tevî ku di wî zemanî de di navbera (musilman û filande) dil reşiyek bawermendi (2) hebûn û wan (Êrmenan) ên dinav leşkerên (rûsya) de li (erzerom, wan, bedlis û mûşê) weke wan (turkan) bi awakî tevayî jin mêr ên kurd kuştibûn jî, lê her wekî xesaisê kurd dilovaniye, ligor nufûsa wî zemanî kurd (65) hezar jî wan (êrmenan) di nav xwe de veşartin û jî kuştinê rizgar (3) kirin, di wê kuştariya gotîde, yekê (êrmen) bi jin û zarukên xweve dikeve mala şexek torê û eşheda islamî tine, şex wî dike seyisê hespa xwe û jina wîjî karê mala şex dike, ew êrmenê belangaz bin mihîna şex réj dike mehîna pênek lê dide, ew jî bêrê davêjê mehîne zikê mehîne diçire û dike ve erdê, ta mirinê wî digre, jiber ku wê soft wî parçe bikin, bi dillek şikestî çû mal, jina wî lê nêri ku rûçik lê namaye got: çibû gidî qey musilmaniya me qebûl ne kirine, mêrik got: no keccê jê diwartir re min mehîna şex kuşt, hingê rûçikê jinikê jê bêhtir sipî bû got: ma çima tu nabêjî wê soft me û zarukên me bikujin her dû jî bi ser hev de ponijîn, jinikê got: hêj şeve em birevin, mêrik got: kêçê ma sibehê jî nav softiyên welat kutah nabin (1) wê me bukujin, wê şevê herdû jî ranezan, heya dunya rohnî bû, mêrik jî nişkeve keyf kir û got: jinê metirse min rê dît, her şev li diwanê dibêjin şex dere herba kafiran, di vir de min firset dît û wê herkes jî bawer bike û şex jî mezintir be,

(2) bawermend (ehlê eqide)

(3) rizgarî (xilasî)

(1) kutah (xilas) kuta bibin-xilas bibin)

sibehê êrmenê musulman çû dîwana (şêx) ku ji mizgeftê hatiye. (çend -mela, feqe û sofî) ronîştine, milê xwe da dîrîyê diwan û got: şêxê min tu şevê dî li kubû? şêx got: ez li mal bûm çima? got ez xulam min jî dunya dîtiye ez ne hovim (2) tu ne li mal bû, mift e-ê axura hespê di berîka min de derengê şevê ez çûm ku bin mehîne ziwa bikim, min dît mehîn birîndar û li erdêye' birîna wê jî şûr e, fermo werin bi çavên xwe bibînin, bi rastî her şev li dîwanê digotin: şêx derin herba kufara lê min nizanibûn ku yek jê şêxê min e, çewa ku berê jî ez bi guman getibûm ku bi şev tu dere herbê, ji ber her sibehan min digot ev herî ji ku hat? tev de rabûn û çûne axura mehîne dîtî belê mehîn birîndar çewa giyayê vir digotin: belê şêxê min êdî tu nikarî vê jime veşêrî, deng li welat seraser bela bû ji derên dûr û nêzik bi kom û lekan li şêx vehewîyan, ji nifûsa wî péve heqê sed mehînan jî derket.

piştî çendekî şêx seyîsê hespê tenha kir û jêre got: çewa hesip hate kuştin? file-ê misilman jêre rast got, got belê ji tirsî sofîyan, wê ez û zarukên min bi kuştana, ji milê dî min jixwere got: mehîn her çû qenebe ez di nav welat de pé nifûsa te mizin bikim û sed qatjî heqê mehîne derxim, hingê şêx jêre got: aferîn kurêmin tu meruvek zêde heşmendî xuda te biparêze, lê divê ji kesî re wê rastîyê nebêjî ha û xwe jî di nav walat de direwîn der nexî, eger bibêjî kesek ji te bawer nake wê bibêjin fileye naxweze di dîne

(2) hov (nezan-wehşi-kovî)

islamé de ev bawerî hebin,

KURTÎ AN NIVIŞKA BIRÊ JOR:

Dînê islamê ji tevaya edyanan zêdetir di her awayên siyasî, civatî, nejadî, tarîxî û cugrafî de dijwarîyên mezin giyandine kurd û digînin, heya rojek ji rojan ew biratiya bawer mendîya dîndarî jî ne hatiye bîra nejad û dewletên islamê ber bi kurd, çewa ku ev danezan yek ji mentiq û rastîya tarîxêye, bawermendîya islamî di dest pêka pêşîn de, bi awayê jêr tê rohnî kirin wek:

Berî hildana ala (1) islamê ji girava (2) erebî, li roj helatê navîn asya roj ava (AYÎNEYA HEZRETÎ ZERDEŞT) seywan (3) vedabûn, nemaze li nav (NEJADÊ ARÎ.KURD.ÎRAN.EFXAN û HINDISTAN), diwî dînê pîroz de bawer mend û jêre perestîşkar (4) bûn, jiber wê çendê û hin esbabên jêr berî dînê (MÛSA Û ÎSA) dijê (5)-dînê zerdeşt û rakirina wî ji wan re bû daxuwazek yekemîn, ji wan esbaban hin evbûn:

1. jiber ku (DEWLETA SASANÎ) bi xurtî di paraztina (DÎNÊ ZERDEŞT) DE şerê leşkerên islamê dikirin, lewre ji bawer mendîya dîn zêdetir wan leşkerên îranê welatê wan talan û wêran dikirin, heya keçên wan bi navên cêriyan

(1) al (hyreq)

(2) girav (cizire)

(3) seywan (şemsî)

(4) perestîşkar (jêre tact)

(5) dij (zid)

dixistin mezadê difirotin, divî warî de li (TEMEDINÊ ISLAMÎ) xweş tê dîtin,

2. jiber ku piraniya teşrîa dînê islamê ji daketiya (AVISTA) girtibûn ne dixwestin ew asarê bi (AVISTA) bimînin da ku hin wan bingehanotêde nebînin, jiber wê çendê çiqas kitêbên (zerdeştî) hebûn binavê mecûsî dişewitandin,

3. jiber ku (dînek arî ne samî) bûn, biwê unsuriyetê inkara (pêxemberiya hezretî zeredêşt) kirine, çewa ku di her kitêbên xwede ew dînê pîroz bi kufrê dane zanîn ku dozdarîyek unsuriye,

4. lê dema kurd bawerî bi (dînê islamê) anîn, di hêzdarîyê (7) de milek dewleta (sasnî) hate vala kirin ku dijarîyek mezin bûn: lê jiwê bawermendiya kurd re jî du sebebên jêr bûn:

A. Kurd- di teşrîa (quran) ê de gelek ji teşrîa (avista) (8) dîtin,

B. hingê ji sitmkariya (rom) zêde zivêr (9) bûbûn, ji qehran xwe avêtin behran, da ku wê tolê (10) ji-rom- bigrin,

Le her ku çewa bû waqîî tarîx nayê înkâr kirin, diwan zemanên bûriyên dûr de ew çend piraniya edyan û pûtan (11) di cîhan de tevde ketin pişt perda zaman û tarîxê. di

(6) bingeh (esas)

(7) hêz (quwet)

(8) avista (kitêba zerdeşt)

(9) zivêr (aciz)

(10) tol (intişam)

(11) pût (senem)

(600) dê zayindêde (dînê islamê) di qelemroyê (12(asya de bergehê mezin girt, biwê hindikî û paşmendiy a ereb gav dane serdariya roj helatê navîn ku ji gumanê dûrtir bûn,

QURAN. DI AWIRÊN QEWMI Ê SIYASÎ DE

Her wekî agahe ku heya (xelafetiya umer kurê xitab) quran- ne hatibûn nivîsandin, jiber ku (quran) bi zimanê (erebî) bûn, ji (umer) re bû daxwaz ku bike bingeh jibo ziman û zanistîya (1) zimanê erebî, ji milê dî da ku (quran) é binivîse bixe nav bawermendên pê daku di warê siyasî de ji liser tevaya misilmanên roj helatê navîn sîdarî bike lê tîpên (2) erebî nebûn, li tevaya roj helatê navîn tîpên (mîxî) bûn, li zanîn-geha (3) besra pêşiyên (file-ên alî munzur) hebûn, dema ew zanîn geh vegirtin (4) çil şagirtên wê birin (meke) ê gelek tîpên wek: NIBTÎ. XİLIFIRÎ. MIRSADI. SANSEK-RITÎ) û wekevan dane berwan şagirtian û jivanre got: divê hûn ji nav van tîpên (erebî) çêkin, ev tîpên îro kirin alfêba, biwan ligor bir hatiyên sehaban (quran) nivîsîn bê îmla û bê zêr, ziber, û pêş (5), kesek nikaribûn bixune, heya (58) sal paşê di zemanê (usman kurê efan) de, hêj civatek xwendan jivan tîpanre hereke danîn, çewa ku ew nameya ku

(12) qelemrê (iqlim) •

(1) zanistî (seqafî)

(2) tîp (hurûf)

(3) zanîngeh (camie-universite)

(4) vegirtin (ihtilal)

(5) ziber- fethe- zêr- kesre- pêş)

(pêxember) ji (kesra) re şandî di cildê pêşîn jêderiya nejadê kurd de heye, belê biwê siyaseta umer kurê xetab) ereb bi navê dîn bûn serdaren roj helatê navîn, dewleta emewî, ebasî, Fatimî) dane mezrandin (7), çewa ku (turkên usmanî dawî) ew mertala semawî ji dest (ebasiyan) girtin, pê împiratorîyek mezin dan çêkirin, heya nuhaji em dibin wan sîdarîyên reş û sitemkar de dil û girifar pejmurdene (8)

ew kurdên ku piraniya (ŞAH Û HUKUM DARÊN ÎRAN) jîwan bûne, diwê bawer mendiya dînê islamê de, di welatê xwede bûn dil û kole ew firehiya zemîne kurdistan liwan bûye zindan.... tevaya miletan dîn qebûl kirin bawerî, tenê ulema û şêxên kurd ji baweriyê péve miletê xwe kirin rabite yanî dûvik, ji millet re digotin: emewî, ebasî, fatimî û turkên usmanî-wekîlên péxemberin, (sultan) heya seceda xwe li ser behrê ranexe û nimêj neke nabe sultan çewa ku ew sihirbazîyên bê exlaqî di jor de hatin gotin, wê di cildê didûyan van (dîtin û bîrhatiyên) minde hêj bêne rohnî kirin, ku çewa di wan xirafatan de bilétên filimên gumanan di komîdya diramiya bihuştê de dixistin destên wan, her awirên zanîne liber çavên wan diwî filimî de perde dguhartin, divê bé xatir û dil bijokî ew bi xiyaneta mezin bikevîn ber mehkema tarîxê



(7) mezrandin (teesîs kirin)

(8) pejmurde (feqîr, belengaz)

BIRÊ DIDIWAN

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

KURDÊN LEMA ARÎ JÊDERÊ PÊŞ-KETINA CÎHANIN:

ligor agahîyên tarîxî ku ji /1947- 1982/ bi tarîxa kurd ve bendewarim, di gera mesadiran de nemaze asar bi me didin naskirin ku ji ezmîne ên bûriyên dûr ve jêderê her pêş ketinan nejadê arîye, çewa ku dîsa ew zanistîya arkeolojî dide bawer kirin ku (nejadê kurd) lema nejadên arîne, di rastiya vê gotinê de, li cildê pêşîn menşea nejadê kurd de di dest mede asar hene ku /1900/ sal berî zayinda îsa, li başûr roj ava yê derya kaspîn (1) çemê alageş- bi serekîya (ŞAH ORUNGO. DEWLETA ALKANI) a kurd- hebûye, ku li cildê pêşîn tarîxa nejadê kurd de, herdû ber kêlên mezerê (orungo) di dest mede asar hene, çewa ku li kurdistana bakur roj ava li (AMED. DIYARBEKIR) û bakur liser réya (qeza licê) li xirabe bajarê (ZERGA FÎS) (5000) hezar sal berî zayinda (mesîh) liwir asarên pêşîyên kurd (HURÎ) yan hene, herwekî asarên wan li (sûrî li çemê asî ber hemis- û li-îraqê- li xirabe bajarê (NOOZO) derketine

Ji milê dî di /1959 û 1961/ de, ji- arkeolojiyên amerîkan şirketa şemsûnî, di bin nêrevanîya zana é bilind (RALIF-SULIKÎ) de li (KURDISTANA) îraqê çiyayê bira dost (şikêfta şînder) bûne peledar (2) bi çar tebeqe én- A.B. C.D.- (47- pé)axa hundirê şikefê vedane, tebeqa (A) (17-

(1) derya kaspîn (behra qezwîn)

(2) peledari (teftiş)

hezar sal berî zayindê bûye, lê ji/12-17/ diwan (5000) salîde tu pêgeh (3) neçûne wê şikeftê, gelo ew pênc hazar sal dewra (cemedê an tofana nûh) bûye ne hatîye naskirin, diwê tebeqêde kêsek ji tovên şînkahîyan yanî . nebatan dîtine birine li (HOLENDA) çandine ji gelek bêşan şînkahî ji wan çê bûne ji wan hinên wek: ber biro, kulîlka hezar pel, gîyasêvik, kulîlka nîsanê û wekevan gelek ên dîtir, ku tev de niho jî li çiyayên kurdistanê şîn tên, bivê hate naskirin ku / 12000/ sal berî (z) nejadê kurd bi çandinîyê ve bendewar bûye, ji wan şînkahîyan ev (genim, ceh) û her tewir çandinî di xwedîkirin û avdanê de wergerandine şiklên îro, ku dest pêkê çandinî, xwedî kirina-pez, sewal, hesip, kehir û wekevan ji én kovî kedî kirin gîhandine van kilişên (4), wiha renga avanî û dezgdarî û her pêşketin liwî qelemro û di nav wan nejudan de pêk hatine,

di tîpa (B) de, ku ew dewir ji /17000-35000/ sal berî (za) digre, di wê tebeqê de (ARÎYA AGIR) dîtine, ku navê pîrsa (ARÎ) jê hatîye girtin,

Tîpa (C) divê tebeqê de ji/35000-55000/ berî (za) heqbeq zemîn û zeman digre, diwirde sê kakotên serên insanan dîtine, ew insanên ku jiwanre (HOMOSAPIENSI) tên gotin, di heqbê (NEOLITIK) de ku (50000) sale an insanên (SOUS HOMMES) insanê dawîn ên ku êdî biwanre heş û daxuwaz hebû ye tê gotin,

Di tebeqa (D) a dawîn ku /70.000/ sal berî (za) 20.000) sal

(3) pêgeh (rêç)

(4) kiliş (şikil)

ji heqbé PALEOLITIK) digre, diwirde jî çar kakotén seriyén insanén (NEADERTHAL) dîtine ku her heft di dest mede li cildé tarîxa- jéderîya nejadé kurd-têne dîtin,

Bele, bi van agahîyén arkeolojî û tarîxî rastî dide sermê ku nejadê (arî) pêşengê nejadan, di pişketina zendegî (1) de berî her nejadî gav dane xebatê; ji milê dî di awirên jiyîna pêşîn felekî û fîzikiya zemînî de jî, dide xuyakirin ku lidor û bakurê (xetê sertan) li xerîta zemîn dereca/37.38.39/ de jiyîndariya zendên cihan ketîye pêçeka pêşîn û hatîye hejandin, lewre agahe ku di wî zemanê jiyîna hovîti (2) û şekertan de insan rût û tazî bûn, ji sermanan li xetê (40) nikaribûn bijîn, çewa ku di başûrê (xetê istwa) de jî zêde gerim û li herderî av nebûn lê di xetê navîn ê jor gotîde zivistan û havîn navîn bûn, tevde çiya daristan jibo nêçîrê her tewir teba (3) û firoke hebûn, çewa ku şikeftên pir, çem kanî zêde bûn, jiber wê çendê ew asarên ku livî xetî têne dîtin li başûr û bakurê gotî nehatine dîtin, çewa ku di warên çendinîn û xwedîkirina pez û sewalan (4) jî, insanén bakur û başûrê gog zemîn paş mende bûne,

heya ew- Turk, Turkmen, Teter, Tacîk, Mengol- én bakur roj helatê (îran û ARÎYAN-EVĀN) jî, ji wê nêçîrvaniya-dewra şikeftan wernegerîyan çandinî û xwedî kirina pez û sewalan, jiber wê çendê jar û belengaz diman, di giyanê wande dizî û talan kirina welatan bû tebiyetek bed karî, ji

(1) zendegî (beşerî)

(2) hovîti (wehşiyet) teba (heywanên kovî)

(3) Teba: heywan.

(4) sewal (dewar)

ber wan bedkarên şerîr (çînê) ew sedda mezin da çekirin, berê wê lehîya diz, keleş, talan kerên xûnrêj, dane (efxan, îran û kurdistan) ku heya nihojî em jiwan dûnde (5) ên hon, mengol û cengîz kutah (6) nebûne

Dîsa ji ulema-ên heqbên pêşîn bi hevketina zemîn û heqbê (orjîni) ku ji zikê zemîn çiya hilvedane, di xetê navîin li xerîta cîhan derece ên (38 û 39) bihtir çiyayên bi daristan av û kanî pêk hatinê, ew çiya û daristan baranê ber bi xwe ve dikişînin, her wekî tê dîtîin ku di başûrê (KURDISTAN) de heremê (MIZOPOTAMYA) ber bi rojhelatve heya (beşda- hile, nasirî û sînôrê (xozistan) baran lê kême, jiber wê çendê çandinî û xwedî kirina heywanan jî liwan hereman ne lêwere,

Ne wek hin nejadên ku di navbera herdû cengên cîhanê de bi sîdarîyên empiryalizmî bûne dewlet, dixwazin ligor daxwazan jixwere kiyaneke bidin çekirin, biwan bed karîyan reş û sipî bi hev didine guhartin, lê dema em jiwan dil-bijokîyên bé mentiq berê xwe biguhêrin û rast û durust mentiq tarîxê piparêzin, xwe bi mesadirên tarîxî bigrin, dîsa emê bi hêsanî zanibin ku (arîy ên asya) lema nejadê arî ne, her wekî mêjevan ê (1) KILD-BIRÛS) dibêje, dema ku pêşîyên me ji başûr ber bi bakur ve hatine (IRAQ ELECEMI), diwirde (CERAMIQ) hebûne ku ji wan kurdên (sazmana erarat) (2), dîsa danezanên tarîxî bime didin

(5) dûnde (kurên jê mayî)

(6) kutah (xilas),

(1) mêjevan (muerix)

(2) sazmana ararat (munzema ararat), bêş (qisim)

zanîne ku berî (AŞÛR) pêşiyên kurd (KASÎYAN-740) li (BABIL) hukumranî kirine ew (kild û aşûr) jiwan hîne- çandinî, xwedî kirina heywan, hendesa avanî û keleşan- bûne,

Eger em jiwan tarîxên zamanên bûrîyên dûr, ji yekve gav bidin zamanek nêzik ku em tede, hingê di rastîya wan danezanên jor gotî de emê bizanin ku heya nebera herdû cengên cihanê yanî ji /1914-1945/ jî (ereb) nizanibûn çandinî çîye, nemaze ên bedûyên koçer ku pîranîya ereb jiwan bi hevketî bûn, ne tenê nizanibûn çandinî çîye, lê bêşên (3) çandinî çîne an çendin nizanibûn, çewa ku ava kirina xanî û gundan ronîştina di xanîyan de yekcar jî wan re Tîştêk xerîb û vajî bûn dema hin jiwan erebên bedû li gundên kurd dibûne mêvan, heya raketina liber lempê an çîra ronîştî bûn. Lê piştî razanê ku ew ronahî di hatin vermirandin û ew ereb li xwe şîyar bûna ji cî diqîrîyan û digotin: (ene sirtu ema) yanî çavên min kor bûne,

Lê piştî cenga cihanê a pêşîn heya a dawîn ku di bin sîdarîya ingilîz firansa-de man, ji xwendina (dînî) wergerîyan xwendina esrî û di /1947/ de ku wan dewletên mandater welatê wan berdan bi emaret û hukumetan bûn (20) dewletên xweser (4), di şûna wan de li sûrî û îraqê (KURD) di bin sîdarîya wande dil û gerdên şikestî man, hingê şêxên wan erebên bedû jî kurdre digotin: avaiya welat tevde di dest wede ye, lê deverên çola xalî ku çêregehên pezin, werin tê de gundan ava bikin nivê me nivê we, piştî

(4) xweser (musteqil),

wan kurdên ku ji zemanê bûrîyên dûrve avanî û çandinî karê wan bûye, diçûn liwan çolan bîr dikolan û bi sed dij-wariyan gund ava dikirin, dest bi çandinî kirin, piştî ji wan hîn bûn ew kurd jiwan gundan kirin der û digotin Hûn, ji ku hatine vî welatê me, diçûne hukumetê wanî alî ereban dikirin, ev buyer tev li cizîra sûrî liber çavên min çêbûne,

Her wekî, li jor hate zanîn ku /12000/ sal berî (za) kurdistana başûrî (1) çiyayê biradost (şikefta şînder) ji bona xwarinê tovên giyên çolê xwestine wergerînin çandinî, çewa ku pêşiyên wan insanên (arî) ji giyayên çolê- GENIMOK. CEHÊ KERAN,- wergerandine (GENIM Û CEHÊ) îro, wiha renge (SÊVÊN BIN ERDIK) wergerandine (KAR-TOL) îro, ew (SÊVTIRŞ) ên ser kanîyên nav çiyên kirine (SÊVÊN) îro, û weke van heywanên kovî ji kedî kirine giyandine kilîşên îro, lewre çi şinkahîyên erdê û darên meywe (2) hene kokên wanên pêşîn hêj li erd û çiyayên kurdistan mayindene, û kurd ji hev re dibêjin filan tişt berê ev bûye,

Çewa ku agahe di jiyîna zendegîde pêşketina pêşîn (agirre) ew jî nejadê arîyên (asîya) bi dest xistine ku ji pirsra (AR Û AGIR) ew navê arî girtine, bi hêzdarîya wî agirî şikeftên çiyên ji teba-ên (dirinde (3) girtine, ji milê dî ji xwarinên goştê xav wergerîyane ê biraştî, dîsa bi hêzdarîya wî agirî karibûne di nav berf, baran û bahozan de bijîn û bigîne vê dewra îro,

(1) haşûr (qible)

(2) meywe (fiki)

(3) dirinde (tebayên kuştar)

Belê, ewin ku ew dewrên hovîti (4) jiyandariya şikeft û barbarî daketine erdên rast dest bi avaniya gund û bajar û çandinî kirine, ji gundan jî gavadane jiyînek şehrewî (5) û bûne dezgedarên tarîxê, dîsa ew (arîyên) asya bûne, di her warên jiyîna zendegîde bûne rihber û pêşeng, çewa ku asar van agahîyan bi me didin zanîn,

Ne tenê di wan zamanên bûriyên dûr de, lê heya çeng cihan a didu yan jî, dîsa-erebên başûrê cizîra sûrî, û en başûrê (kerkûk) tevan ew çandiniya Teqîdiya kevin jî nizanibûn, di warên çandinî de tevaya bajarên wan çavnêrê çandiniya zemîne kurdistan û zendên kurd bûn,

Tevî ku nêzîgê (35) sal di bin sidariya (Ingilîz û Firansa) de man jî hîne çandinî nebûn, ji gotinê re buyera (6) jêr mîs-alek dîtine ye:

Di/1941/ ingilîz û firansa) bi hevparî (7) li cizîra sûrî warge-ên kirîna (genim) dane vekirin, divabûn xebîr serkar û karmende (8) piranî kurd bûna, jiber ku ew karmende-ên ku ji (şam û heleb) dihatin, tîştêk ji çandinî nizanibûn, diwê kirîna gotîde mufetişek ereb ji (şam) hate cizîrê, ango mufetişê ziraîye û biwê xwendinê diplom girtîye, li (NAHYA AMÛDÊ) derket nihêrtina çandiniyan, gundê (TOPO) gazî keyayê gund (EMERÊ DAWID) kir û got: genim. ceh, nîsk û birxuk- pêş min bike, keya jêre got: ya

(4) hovîti (wehşiyet)

(5) şehrewî (medeni)

(6) buyer (tiştê çêbûyî)

(7) hevpar (şirket)

(8) karmende (muwezif).

efendî, vaye genim, ceh, nisk- lê birpxul, ji genim çê dikin, mufetiş xeyidî û jêre got: ahmeqî ne lazime birxul pêşmi bike an na ezê te bidim mehkema eskerî, keya gazî şufêr kir û got: kuro tu xelkê cizîrêyî ma birxul tê çandin? heya şufêr xistîye serê mufetiş ku genim dikelînin dikin birxul, ew zemanê ku êdî ereb giyabûn xwendina esrî û dewra medenî,

îro ku xwenda-ên çandinî çandek (1) û çînek (2) çê bûne herkes di zane biçîne, lê dîsa ew xwenda- ên ziraî wek cotkarek ne xwenda- kurd nizanin, lewre cotkarên kurd, liser agahîyên fizikî û felekîya zeman û zemîn her çandinîyek awayên wan dizanin, her wekî: cotê zivistanê ber bi roj ava û helat kûr dadixin xetan vekirî dihêlin, daku zivistanê di wan xetan de av bisekine û bibe cemed, jibo kurim û kêzên erdê bimirin, lê havînê ber bi bakur û başûr cot dikin û xetan vekirî dihêlin jibo roja havînê wê gerş û gemara giyayên wek: qarûş û firêzê hişk bike û azot bike erdê, jê û péve her çandinî zemanê wan bi rojan ve dijmêrin, jiber ku ji ezmîne-ên dûr ve ew agahî ji hev girtine,

îro ku li herçar dewletên kurdistan vegirtî bi sedan muhendisên ziraî çê bûne, bi teknolojya nûder aletên çandinî çê bûne, sergîne firincî ên sar û gerim, bi dermanên kimyayî bi firindan (3) direşînin çandinî yên şîn, tevî wan pêşketinan jî eger ne ji çandinî.pez û sewalên kurdistan nebe, turk, sûrî, îraq, îran- nikarin bi hebûna welatê xwe bijîn çewa ku tevaya petrolên herçar dewletan ji erdê kurdistan e,

(1) çandek (direktor)

(2) çînek (dirase)

(3) firinde (tiyare)

ASARÊN KEVIN, DEZGEDARIYÊN ŞIKEFT, KELEH Û BAJARAN JÎ KURD MAYINDENE

Belê ji agahîyên tarîxî pêve, di agahîyên arkeoloji de ji ew asar ên ku li erdê Kurdisatan mayindene bi me didin zanîn ku ev nejadê xawer zemîn (4) bingeha arîyên rojhelatê navînin, ne tenê di avaniya gund, bajar keleh, çandini û xwedî kirina pez û sewalan de, lê hêş di heqben jiyolojiyên jiyîna şikeftan de, muhendisê kolana şikeftan de pêşengên tevaya nejadên asya roj ava bûne,

Ev rastî dide gotina jor, di wê hendesa gotî de li kurdistana bakur rojava a ku di van nivîsaran de di sîdarî û sitemkarîya Turk de vegirtî, lîdor (100) kilometir bakur rojhelatê (AMED (diyarbekir) liser çaviya (DICLE) jêre (ŞIKEFTÊN BIRQLÎN) tê gotin di jiyîndariya şikeftan de Çiyê pêşiyên (NEJADÊ HÛRI) ên kurd bûy, di bakur bilindahiya çaviya (DICLE) de du deriyên mezin hene, dema dikevî hundur li ser uslûbek hendesî gelek kuçe ji hev tene qetandin, li herdû rixên wan kuçan tevde ode-ên ciyê ciyê hawîdor dik û diwar ji neqîş an tîpên wî zemanî xemlandî di kevir de kolandîne, binîya wî çiyayê bilind tevde vala bajarek zêde mezin e, jibona ku tede winda nebin musteşriqan yanî xwer şînasan (5) telîsek ka bi xwe re li erdê direşandin ku biwê kayê zanibin derkevin, li devê şikeftê heykelek ji kevir hebû,

(4) xawer zemîn) (xawer roj-helat, zemîn erd)

(5) xawer şînas (roj helat nas).

turk birin xistin mêze-xane (1) ên xwe, liser derê şikeftê di kolandina kevir de gelek nivîsandin hebûn, piştî şoreşa (şêx seîd) li kurdistan hakimek eskerî bi leqeba (mufetişê umûmî ê li-diyarbekir-jêre-abdîn uzmen-) di gotin, wî bedkarî du silime biserhev xistan û çakûç xiste destê yekî licî (hesoyê perîşanê) ew nivîsar tevde bi çakûç şikênan din, di başûrê çavîyê de şikeftêk dî devê şikeftê li erdê lê dawîya wê gelek dirêje, pêder pê ueyanalîst derin wê şikefta birqlîn (2), ew şikefte ku binavê (şikeftên sêwîyan nexweş xana birîndar û kuştîyan) min hevpeste (3) nivîsî di (kovara çiya) de hate bilakirin li awirpa,

Pêşîyên wî nejadê (hûrî) ne ku ji wê şikeftê derketine çêkirina avanîyan, ku liyor hate gotin: NEWZERG-ku îro jêre (SERDÊ) tê gotin, jê û pêve (BERDEWÎl) ku îro jêre (tewîl) dibêjin, (BIRYA Û ZERG FÎS) ku ciyê xudanê (hûrîyan-bixû) de, tevde dikevin başûrê wan şikeftan (20) kîlometir piştî avanîyên wan xirabe bajarên gotî, arkeolojîyên turk di /1967/ jibona ku dolar bêne nav wan bi zimanê firanswî nivîsarek dane belakirin ku li (diyarbekir û bakurê wê) 5000 sal berî zayindê asarên nejadê (hûrî) hene, bê ku zanibin ew (hûrî pêşîyên kurdin, ev tarîxa gotî ji asarên wî kevne bajerê (zergê) digrin, lê tarîxa jiyîndariya wê şikefta bajar ji pênc hezar salî bi gelek dûrtire, jivan pêve li kurdistan bi sedan şikeftên welê hene, dema tarîxên asarên

(1) mêzexane (methef)

(2) birqlîn (birq xuyaye-lin zerfe-wek: héklin. xweyilîn)

(3) hevpeste (muqale)

wan şikeft û di nav çiyayên de xirabe bajarên ku xelkên cî qenc nasnakî bê pelandin (4) hêj nû wê muerix û ulemayên arkeolojî bibînin ku raste bîngeha zendeğî ev welat bixwe digre,

Her wekî li gor hate gotin: jiwan şikeftên (BIRQLÎN) ku derketina avakirina gund, bajar, û keleşan, jiwê şikeftê berbi başûr daketine, ku di dest pêka pêşînde deverên jêr dane avakirin ku hêj asarên wane heya vî zemanî mayîndene wek:

1. (10) kilometre başûrê şikeftê de (KELEH) ava kirine hêj asar berçavin, îro jêre (xana kelî) dibêjin,

2. jê û başûr (BIRYAS) ava kirine, ku îro tenê binavê çemê (biryas) tê gotin, jiber ku avaniyên berçav nemane ji pêv hin kevirên asar dibin axê de dertên,

3. jê û rojava (5) kilometir di rojavayê çavîyê de li nav seraçiya bajarê (NEWZERG) ava kirine di nav de keleşek mezin û bilind heye, îro jêre (SERDÊ) tê gotin: ku gundê min e, di rix kanîyek piçûk de ji zinar (efsane kes heykelek) mezin û bilind, serê wî (50) ton giran hebû, lê sed mexabin (5) nezaniya gundiyan ku diwê heykelê de xezîne heye, di / 1953/ dinamît xistin gewriya wî û teqandin niho ew serî li erdêye, jê û bakur roj helat li pesara (6) çiyayê (hewşakevir) zindana wana zêde kûr heye,

4. pênc kilometir di roj avade (KELEHA BERDEWÎL)

(4) pelandin (teftiş kirin)

(5) mexabin (meeleşef)

(6) pesar (singê çiya)

heye îro jê re (tewîl) dibêjin di rojhelatê gund de girek mezin heye, di navsera wî de ew bajarê çaran (dewîl) hatiye ava kirin, li başûrê wî girî li ser rêya ku berê diçûne (Héné) çend Heykelên keviran, siwar, peya, sindoq, û bûk-heye, ligor xirafatên berê digotin, bûk û dawet giyane wir û hin jiwan kufur bûne (xuda) ew kirine kevir, ji ber wê çendê niho jêre kevirên dawatê-dibêjin:

5. di başûrê-biryas-newzerg) de li dor (10) kilometir (ZER-GAFÎS) heye dikeve ser rêya ku ji (AMED,) dere (licê), eve paytextê (BÎXÛD) ê ku (yûnan) jêre (duqyanos) gotine, dîsa ew çîroka (eshabi kehif) ku di (quranê de hatiye fermayîş kirin, ku ew şikeft jî jê û bakur di çiyayê (derqam) deye, ev bajarê eserî hêj gelek sitûn, qenterme, ava hebûn, lê niho divan nivisaran de, ku ji welat têne sûrî dibêjin: hukumeta turk- kevirên van asaran tevde birine kirine pirên çixir (1) a ré, di rojavayê wî bajarê eserî de keviyek bilind hundirê wî qul nişana impiratoriya (HÛRÎ) yan bûye, çewa ku ew kevirê bi qul (li newzerg) roj avayê (gundê min-serdê) jî heye, belê (turk) ji tarîxa asarên wê keleha (zergafîs) dane belakirin, asarên wê (impiratoriya hûrîyan) îro li-sûrî-nêzîgê bajarê (hemis) li (çemê asî) dertên, çewa ku li (îraqê li başûrê (kerkûk) xirabe bajarê (noozo) dertên,

6. Ev bajarê şeşan (AMED-REŞ AMED- 'diyarbekir) a ku ji navê walîyek dewleta (Emewî) binavê (Bekir kurê wail)

(1) çixir (réyên şûse én çekirî)

ew dewil) é ku li jor hate gotin, li roj helatê (mardîn) nézîgê (DARÊ hete çewa ku li (misrê) jî berdewil- heye, xuya dike tevde dibin hukmek de bûne.

ew leqeb girtîye, ev bajarê ku xwe berdane erdê rast dane ava kirin, li ser hendesekî zêde pêş ketî, ji (çiyayê reş) av anîne hundirê bajar dane bela kirin, belê di wî bajarî de (impiratorîya-hûrîyan) li roj helatê navîn sîdarî girtîye, çewa ku di (tewrat) de behsa wê impiratorîyê hatiye kirin, çewa ku di kitêba (nebî danyal) de behsa kurdên çiyayê (godî) kirîye,

Belê li tevaya zemîn û çiyayên kurdistan ew keleh, kevne bajarên eserî bi wan hendese-ên nadîde dagirtîne, ew asarên ku bawerî bi tarîxê tînin ku di wan zamanên dûr de pêke inên hendese nejadê arîyên asya roj avane, ku yek ji wan bingehan nejadê kurd de, ji hendesa kelehan hinên wek: - wan kelehên jor gotî, ji wan péve kelehên-farqîn, amed, siwerek, palo, xarpêt, keleha hoşîn, şarik û şivan, keleha zêde bi hendese keleha MEHMÛDÎ-liber çemê xuşav, heremê (wan) ê, keleha (finik) kehok, gulab (amedî), rewandiz, hevlêr, û weke van li kurdistan bi sedan hene, ku bi hindikî /2000-3000/ berî (za) hatine çê kirin, wî zamanê ku héj çekên wanên cengdarî ji keviran bûn, kelehên erdê ras dora wan beden û lidor wan bedenên xendeqên kûr û fire tije avbûn, réyek tenê dîçûne hundirê wan kelehan, ew ré jî jibona gindirandina keviran berûjêr bûn,

Wiha renga di çekirina avanîyên pirên ser çemên mezin wek:

ROYÊ. DÎCLE. FERAT. ZAB. HERDÛ XABÛR. HÎZIL. ÇEMÊ BOTAN. XERZAN. BITMAN. MUN ZUR.- û weke van avên mezin ku di wî zamanê dûr de li ser wan avan pirên ji hendese - ên îro pêşketîtir hatine çêkirin,

jibo mîsalé di başûrê (cizîra Botan) de li hember (AN-DEWÊR) liser (royê dicle) (PIRA BAFÎT) a ku di zemané (ARDUŞÊR SASANÎYAN) de hatiye ava kirin, ku têkilê bi felekî, dike, donz de bircên roj di linga mayîndene, her mehê roj di bircek de dertê, ku îro tu muhendis nînin ku karibin wî awirê felekî di hendesé de pék bînin, jiwé pira eserî û tarîxî tenê lingé roj ava ma ye, lê sed mexabin dewletén kurdistan vegirtî wê qudsîyeta asaran nas nakin, hin dewletan ew nivîsarên berê rakirine ji nûve hin nivîsar li gor daxwazén xwe dinivîsîne ku bedkarî û bed exlaqek mezin e, çewa ku ji wan fenên hendese-ên gotî, li heremé parézgaha⁽¹⁾ wîlayeta (SÊRTÊ) li (QESEBATILLO) ziyareta (FEQÎROLLA) heye di aliyê roj helat de pencerekî piçûk heye, di (21) de yanî roja (noroz) ku roj dike ve (birca hemil) şev û roj dibin yek, wê rojê⁽²⁾ Tîrêjên rojê dide ser mezeré wî, rojek dî nade, ji ber ku ji zemanek dûrveye ew ziyaret û şibake xirab bû, çend caran muhendisén turk jibona uryantalîsat û pere ê ecnebî ew şibak çêkirin, lê nikaribûn, bigînin wê hendesé ku di wê roj de roj bide hundiré ziyareté, jiber ku têde hisabek zêde fenî heye.

Çi muerix û ulemayén arkeolojî hene nikarin inkar bikin ku divan waran de nejadê (arî) bi her awayî di pêşketina xizmeta insanî de karén mezin kirine û ji xwe bi şûnde hêştine, lê nejadên (zer û samî) ev havilkarî libawan nehatiye dîtîn, her û her ew asar û welat wêran kirine û dikin.

(1) herem (mentiqe) parézgah (wîlayet) sorîyan ji navé (muhafîza) erebî girtine, bé ku zandbin (wîlayet) bixwe (farîsî û kurdiye) yanî (wala)

DÎ WAN ZEMANÊN DÛRDE KURD Û DEZGEDARÎ:

Di warê dezgedarî de tarîx bi me didin zanîn berî (kild) ji başûr ve bêne îraqa (ecemî) di wir de ji bingeha (SAZ-MANA ARARAT. PÊŞÎYÊN KURD KASÎ) hukumran bûne, di (BABIL) de/740/ hikim kirine, ew (kild û aşûr) ketine bin sîdariya wan ji wan hînê dezgedarî bûne, dîsa di ronahîya mirx ken wan tarîxên dûr de tê dîtin ku (êrmen) (630) sal berî (ze) li (ûnan) li heremê (tilisya) bûn, di jiyîndariya koçerî de, di bakurê derya reş re ji (qafqasya) daketine (REWAN)⁽¹⁾ ku hingê liwir (DEWLETA HALÎDÎ A KURD) hebûn, ew navê (hayistan) ji navê (halidî) mayindeye, jiber ku di jiyînek koçerî de hatibûn xwedîkirin, tiştêk ji çandini û avani û dezgedarî nizanibûn, liwir kurd ew hîni çandini û dezgedariyên wî zemanî ên jêr kirin, belê her karên wek:cot, xwedîkirina pez û sewal sipartin wan, jiber ku kurd heî û her di cengawiriyên berevani⁽²⁾ ya welat de bûn, ew dezgedariyên wî zemanî ev bûn:

1- çêkirina her tewir çekên cengdarî, ku êdî ji wan çekên kevîrên agirjen wergeriya bûn çekên hesin wek:şûr, xincer, mertal, tîr û kevan.

2- çêkirina alavên⁽³⁾ cotkarî bêşên hesin û dar, jibo paleyî û hûr kirina sapê genim û ceh.

3- çêkirina aşên bi gerandina avê jibo ard û nan.

(1) rewan) ew rewane ku di/1918/ de rûsya binavê êrmen tede cumhûriyet da çêkirin û kurdên wir ji xistin bin sidariya (êrmenên) ji wan hindiktir. navê (rewan) ji kirin yêrivan)

(2) bervani (difa)

(3) alav (alet)



4- çêkirina beroş û her firaşên jibo xwarin û şuştina çekan ji axé wek: kaxik û cer.

5- kevçiyên mezin û piçûk, hesik, tevde ji darên kevot.

6- çêkirina-pelas, ber, çuwal ji herî, ji pembû caw ji bo wer-girtinê, serrax û bin rax⁽⁴⁾ jibo razanê.

7- çêkirina gore-ên ligan, lepikên destan ku jin û mêran tevde bi şîş û nékan bi dest çêdikin.

8- çêkirina avanî, keleh, bedenên dor bajaran, çeperên şervanî, ku di wî zemanî de wan karan dikaribûn di welat de xwe bidin parastin li hember îrişên derve, çak tê bîra min heya nîveka qîrnê (19 an de, di kurdistan de herkes bi wan dezage û karên gotî ve jiyîndar û rewîşdar bûn, ji- şekir, çayî û donê gazê-Pêve her divayên wan ji ba wan xwe mal-bûn.

9 - Dezgedariya pembû ji bo cawê li xwe kirinê, li her gundek çend cirikçî⁽¹⁾ hebûn, ji bo wan heban ji nav pembû bidin alî, hingê pîrekan ew pembûyê malûc bi kevan dijandin û di her malek de dolaba ristina wî pembûyî, dikirin dezi⁽²⁾ paşê didan çûlakan dikirin caw, ji bo mêran cawê sipî, le ji bo jinan reng dikirin û qalibên neqşan hebûn li wî cawî didan dikirin fistan û li xwe dikirin.

10 - ji pembû pêve hevirmîş bûn, ew hevirmîşê ku me kurmên wan bi pelên tûyan çil roj xwedî dikirin, her paketek wan kurman(36) hezar têdene, her paketek bi zanîn bèn xwedî kirin (80) kilo hevirmîş dide, ku yek jê di zanîna xwedî kirina wan de ez bûm, ji wî

(4) serrax (lihéf) binrax (doşek).

1 - cirik (ewe ku pê pembû û hebê wan ji hev derdixin)

2 - dezi (tayê dirûnê)

hevirmisî jin û keçên kurd neqîş û niqûş çê dikirin, çewa ku -
temezî⁽³⁾ şeirên dor kofî, piştên qez û gelek tiştên ditir dihatin
çêkirin.

II - her malek kurd jinên wan (sabûn) ji bezê pez û sewalan, bi
ava arîya daran dikelandin û dikirin sabûn,

12 - mafûrî⁽⁴⁾ piraniya jinên kurd dimalên wan de tevne⁽⁵⁾ hebûn,
ber, xalî, pelas, çîwal, xuricik, û tejên konan çê dikirin,

13 - barûd, ji bo tufengên nêçîr û şervanî herkesê dizanibûn çêkin,
çile - ê meha temûzê de, axura pez rêj dikirin û derî digirtin ji bo
tişt nere hundur, di şûna mîza pez de wek kefa sabûnê biser rûyê
erdê diketin jê re şûşe digotin: ew şûşe û xijika⁽⁶⁾ darê bî û hinek
kirkût di nav hev de di cunê de zêde dikutan dibûn barûd,

14 - gulle, li kurdistana bakur roj ava, başûr roj helatê (palo)
bakurê (qeza pîran) li (çiyayê pîreceman), bilindahî (500) mitir,
dirêjî⁽⁷⁾ kîlomitir, pehnahî (4) kilomitir, tevde (guleye), ji wir
dianîn û li ba her kesê qalibên her tifingan hebûn dikirin gulle,

15 - ji bo karwanî û bazirganî⁽⁷⁾ ya ser avên mezin, ku malê xwe
bigînin bazar gehên bajaran (kelek) binê wan ji meşkên nepixandî
û li ser şirtik⁽⁸⁾ bar dikirin ew jî lê siwar diçûn Diyarbekir û mosil,

16 - necarî ji %60 dizanin, derî, pencere, aletên çot, sindoqan
çêkin,

17 - sol, pêlav, li her bajârên kurdistan çermê pez û dewaran diha-
tin debax kirin sol dirûnan û qondere didirûtin, ji bona li çîyan li
ser berfa hişk û cemedê karibin bigerin, ji benên badayî û qalind

3 - temezî (heprî an şerpe)

4 - mafûrî (ew dezgedariya ber û xaliçan)

5 - tevne (ew aletê pê pelas, çîwalan) çê dikin,

6 - xijik (darê şewetî berî ku bibe arî)

7 - bazirganî (tucarî)

8 - şirtik (ji şîvên daran wek selekan rast çêdikin)

sol çêdikirin ku ji wan re (reşik) digotin,

18 - jî herî şal û şapik, êlegên qalind çê dikirin ku xincer di wan der baz ne dibûn, ew cawê şal û şabikan, li ingiltere der nediketin belê ji van û pêve gelek dezgedariyên tîvel (9) dihatin çêkirin ku tu ihtiyacıya wana wî zemanî bi welatên der tunebûn,

DI WAN ZEMANÊN GOTÎ DE BAZIRGANÎ Û KARWANÎ:

Her wekî ji her kesên niho jiyindar re xweş diyare ku heya dawîya qirnê nozde an jî tevaya Asya û Aferîqa otomopîl û kamyûn tunebûn her ger, tevger û karwanî li welatê me bi histir, bargîr û keran bûn, li welatên Ereb bi (devan) bûn, li kurdistan ronîştmanên bajar û deştên erdê rast, çandiniyên wan pîr û bi xwedîkirina pez, sewal, ga, çêlek gamêş hesip û histirên wan abûriyek xurt bûn,

lê hin deverên çiyar û qezaên di wan de ku zevîyên çandinî û xwedîkirina pez û sewalan li ba wan nebûn, abûriya wan bi histiran karwanî bûn, malên tucaran ji bajarek dibirin bajarek dîtir çi dûr nêzig bar xanekî ji wanên ku ji (10 - 15) histirên wî hebûna ew jî li hespek rewan siwar û xulamên wî jî pê re bûn, tevde bi sîleh, çewa ku xwarina wan jî bi wan re, histira pêşîn zengil di sitûyê wê de sê kilometir deng di dan, daku hin rêwî an xwedî bar xwe bigînin wan, liser rêyan her (8) saet xanek hebûn, di wan xanan de xwarin nivîn, ji heywanên wan re ceh ⁽¹⁾ ka, hebûn, ev kariwan livan bajaran digerîyan:

9 - tîvel (muxtelif)

1 - di /1926/ dema li xarpêt panzde sal hepis dane min ez şandim (nîgde) di wê rêya dirêj de bi peyatî em birin, li ser wan rêyan hêj ew xan hebûn

A - Havînan li terebzûn, sêwas, Erzerum, wan, qers, ormiye, Tebrîz, Tehran karwanî dikirin.

B - zivistanan dadiketin welatên germiyan bê berf wek: Heleb, iskela bêlan, şam, Beşda, Besra - dibûn birgeha wan, her wekî agahe ku di wî zemanî de piraniya wan bajarên gotî, ji (Tehran û Tebrîz) pêve tev de di bin sîdariya dewleta - osmanî de bûn, hingê gumrik nebûn, belê di warê abûrî de malê kurdistan digiyane tevaya wan bajarên û ji wan jî di anîne kurdistan, di wê karwanîyê de ewên karwan dikirin tev de bi sîleh bûn, ji ber ku di wî zemanî de zêde li ser rêyan şêlandin çê dibûn, nemaze berî /1869/ nehan ku hêj (Tengava siwês) nehatihûn vekirin, bazirganiya ingilîz (şirketa şerq a hindê) Terebzûn) heya (Besra) bi wan karwanên gotî neqil dibûn, belê di wî zemanî de abûrî û bazirganiya kurd ev bûn,

HER HEBÛNÊN KURDISTAN TEVÎ PETROLAN NE JI KURD RE YE:

çewa ku ji her kesê re xweş diyare ku ji çandini, pez, sewalan pêve tevaya petrolên kurdistan di dest herçar dewletên kurdistan vegirtî deye, bi wê hebûna kurd herçar dewlet di rêza dewletên cihan de xwe payadar dibînin, çewa ku bi wê hebûna kurd top tang, firinde bûmbaran dikrin dema kurd bi doza mafê xwe ve radibin pê wan û gund û bajarên wan jî wêran dikin; ji bo wan petrolên kurd dewletên mezin jî her û her di wan sitemkariyan de ji wan re dibin alîkar, bi wê gunahkariya wan re dibin hevpar, bê ku birsa - edalet , dimoqirati bê bîra wan!....

2 - Ev iskele dikeve roj avayê çiyayê kurd keviya derya (sipê)

3 - firinde (tiyare)

ew heremên petrolan di sîdarîyên dewletên kurdistan vegirtiyên sitekar de li van qelemrewanin her wekî:

A - petrolên (îran) karên kurmanşa, Ehwaz, Abadan, xozistan tevde ji zemînê kurdistan dertên, di /1968/ de /140/ milyûn ton derxistiye,

B - karên petrplên (îraqê) ên ku li enzal, kerkûk, xaneqîn - dertên di /1968/ de /74/ milyon ton detketiye,

C - petrolên turk tev de li zemînê kurdistan dertên, li anedolê yek tenê jî karên petrolê nînin, li heremê (amed li sûtaxa, li hawîrê sêrtê li - Batman - dertê,

D - betrola sûrî tevde li - cizîrê - roj helatê (qamişlî) heya sînorê îraqê zêdeyî (100) karên petrolê derketine,

Belê herçar dewletên jor gotî wî zêrê reş ji erdê kurdistan derdixin, bê ku tiştek bigije xwediyê welat, ji dûxana xazê péve ku bayê welat gemar dikin bi sedan gundiyan dorwan karên petrolan bi jana zirav dikevin, diwê birina talanê de nahêlin kurdên belengaz di wê birina talana malê xwe de ji wan re bixebitin jî, her karkeran ji welatê xwe tînin, çewa ku nahêlin muhendis ên biyanî biwan kurdên dor petrolê re bipeyîvin, ji bona ku ew muhendis an uryantalîst û hin muerixên biyanî li wan rêyan derazbin, nebinin ku ronîştmanên welat tevde kurdin, ji ber wê çendê kurd ji hawîdorên wan karan rakirin, birin avêtin sehayên başûr, ku havînê dereca germê digîje (50) tevde li wan kejav û bejavan dimirin,

Di şûna wan de ji milletê xwe di anîn li ser milk û gundên wan kurdan, bê hember tiştek didane wan, îraqê Erebb ji (- Misir, yemen û Mexrib) kişandin gundên kurdên îraqê sipartin wan û kurd ji wî welatê wanê /5000/ berî (za) rakirin birin sehayên başûrê îraqê, bi wê jî nesekinîn mealimên cugrafya jî digohartin, navên gund, çem, kanî, çîyaên kurdistan tev de guhartin zimanê

xwe, çewa ku nahêlin kurd navên xwe ên kurdî li zarukên xwekin, hingê nifûs qebîl nake, turk navê wan kurdên ku umrê wan giyaye (70) salî jî bi navê (soyadi) werdigerînin navên Turkî, bê şerm û fedî di navxwede (21) wilayetin kurdistan bi (18) de milyon kurd ve inkar dikin û dibêjin: evên bi kurdî dipeyîvin Turkên çiyandin, yanî navê kurd û zimanê kurdî bê ku kurd hebe didin zanîn, herwekî li terîxên cihan navê vî nejadê xawer zemîn nîne, dema wan inkar kir wê windabibin, tevî ku dibînin insan jiyogiraiya rûyê (hivê) bi xerîtê girtiye, navê çiyakî (hivê) kirine (toros) ku çiyakî kurdistane,

JI PETROLAN PÊVE ME'ADINÊN DI KURDISTAN DE:

Ew kokên (meadenî û kimya) iyên ku di esra (20) de ulemayên (JIYOLOJÎ U KÎMYA) î naskirine û salixdana ji wan ketine dersên zanistîya nû, piranîya wan li zemînê kurdistan de hatine dîtîn, ji nav û ciyên wan pêve di dawîya vê bergehê¹ de wê bi - rumûz, jimar, wezinên atomî û rengên wan ve bêne derpês kirin, niho divê danezanê de bi awakî kin û kurt li zemînê kurdistan cî û navên meadenan ên jêrin:

I - li bakur roj avayê (AMED) başûr roj helatê (XARPÊT) ku jêre qeza (MEADEN) tê gotin, çiyayên hawîdorê wê qezayê bi bilndahî û firehîya xweve kevirên wî tevde (SIFIR E) jê û pêve gelek meadenên dîtir têde hene, ji wan jî /%5/ di nav de (ZÊR) heye, ji nîveka qirnê (19) an ve hukumetên turk wî zêrê sor jê der dixin, lê nikarin li ba xwe safî bikin, dikin wek kevirên aşan û diş-

1 - bergeh (feqre)

- înin awirpa, ew çend pirre ku bi sedan sal kutah⁽²⁾ nabe,
- 2 - ji wê (ME'ADENÊ) û bakur roj helatê gotî, yanî bakyrê qeza (ERXENÎ)heya bigîje qeza (EGLÊ) û başûrê (PALO) tevaya wan çiyayên bi zinarên bilind kevirên wan tevde (KUROM) in,
- 3 - jê û roj helat bakurê (qeza pîran) û başûrê (QEZA MIYALAN) ku jêre çiyaê PÎRECIMAN tê gotin, ew çiya (25), kilo mitir pehnaî (5) kilometir, bilndahî (700) mitir tevde guleye, ew jî ji zemanê dewleta usmanî ve tevaya guleyên tufingên hukumeta turk û kurd ji wî çiyayê mezine,
- 4 - li kurdistana başûrî heremê (Barzan) hesin heye ku ji %60/ polade ew hesinê ku jê her sîlah çê dibe,
- 5 - li bakur roj avayê (HELEB) çiyayê kurmanc, roj avayê (QEZA EFRÎN) li heremê (RECO) kevirên wî navçeyî⁽³⁾ tevde hesine, jibona ku kurd di warê abûrî û dezgedarî de jê fêdekirî nebînin dezgedariya wî hesinî li (HEMIS) çê kirin ew kevirên giran dikişandin wir,
- 6 - li cizîra sûrî li (QEZA SERÊ KANÎ) yê, bi çend çavîyan avek meadenî tevde (kibrît û kerkûke)
- 7 - li (îraqê) heremê (ENEBKA KERKUK) ji petrolê bêve (kibrît) û gelek zeyit û made - én dîtir jê dertên,
- 8 -ava (ROYÊ ZABÊ MEZIN) tevde ji (kibrît, sodyom, potasyom) tevli hevve
- 9 - avên meadenî ên gerim, li heremê (MOSIL HEMAM ELÎ), li heremê (AMED ÇERMOK) li (CIZIRA BOTAN) başûrê (ERZERUM) germikê hemizan, û gelek deverên dîtir di kurdisran de ew avên meadenî hene,

2 - kutah (xilas)

3 - navçe (ew orte),

10 - Li bajarê (BEDLÎS) kaniyek heye ava wê (GAZOZE) jê û pêve tède made ê (ensulîn) heye,

11 - karên (xweyî) li kurdistan li gelek deveran hene wek: li navbera qeza xerzan û bedlis jêre (Melefan) dibêjin, li bakur roj avayê (qeza licê) li (xweyîlîn) (I) heye, ku divê xweya kurdistan de zêde (kolor sodyom) xurte,

12 - li gelek deverên kurdistan kevirên çîyan (rixamê sipî û rengîn) hene,

13 - li hermê (Hekarî qeza şehîrnix) komira kevir liser rûyê erdêye,

14 - çimento - ji herderî zêdetir li kurdistan heye, lê bi awakî piranî ku ji turkiye pêve dere (sûrye û îraq) li (xarpêt û Mardîn) dertê,

15 - li (WILAYETA ARARAT. ELAŞGIR) meadenek (kehrebanê reş) heye jê tizbî û gelek tiştên dîtir jê çêdikin, derdikeve tevaya welatên ereb ji wan tezbîyan ku (33) libin bi /1500/ kaxizên turkî têne firotin,

16 - (qele - qetîr) ku berê pê firaxên sifir sipî dikrin, çewa ku ji gelek dezgedariyên dîtir re û cengdarîre jî lazime, li kurdistan bi piranî heye,

17 - (zêr) li (Berwarî û garisan) hatîye dîtin, kevirên ku di agir de hatîye şewitandin dîtine birine ba zêr keran ku zêre,

18 - li (kurdistana îran) li heremê (Mako, kanîreş) heye,

19 - avek meadenî ji bo vexwarinê li (ÇILDÊRAN) heye, turk bi tonan di bin anedol û derbazî awirpa jî dibe,

20 - avek meadenî a gerim li (gêliyê zîlan) jî heye, insanên bawî derin dikevin wê avê,

21 - li (MURADÎYE. ÇILDERAN. ELÎ KELE. ŞEREF BEG) kevir hene tu tiştek lê didî kup kup ji wan tê, dema dişkinî di hundirê wan de wek: kulav an pembûye,

1 - xweyîlîn (zerfe. yanî çiyê xwey. wek: hêklin. birqlîn)

22 - li kurdistana îran li hawirên (kela xwey) xweya ji kevir heye,
 23 - li roj helatê (Bayezîd) û roj awayê (Bako) hesin - heye ê selib,
 24 - li (Rizaiye) çiyayê (ormiye) hesin û ziv heye, çewa ku li çiyayê (Mukrî) jî hesin heye,

25 - li sê kuçiya çiyayên kurdistana - (îran, îraq û turkiye) (almas) heye lê hêj dewra jiyolojiî tamam nekiriye,,

- ji van bêşên meadenan bi gelek zêdetir û li deverên dîtir gelek hene, lê sed mexabin, em nikaribûne bi serbestî di welatê xwe de bigerin û wan bipelînin, dewletên kurdistan vegirti me dîgrin davêjin zindanan her wekî di wê ger û pelandina welatê xwe de me gunahêk mezin kirîye ma gelo jivê sitemkarîyê mezintir wê di cîhan de çi hebe!?!.....

li vir li ser uslûbek zanistîya kimyayî hin ji wan meadenan bi nav.

rumûz wezin jimar û rengên wan li jêr bidin derpêş kirin:

kokên wan	rimûz	jimarên atomî	wezin	bêş	reng
<i>hidrojîn</i>	<i>H</i>	<i>1</i>	<i>1</i>	<i>bê</i>	<i>bêreng</i>
<i>kerbon</i>	<i>c</i>	<i>6</i>	<i>12</i>	<i>HIŞIK</i>	<i>REŞ</i>
<i>netrojîn</i>	<i>N</i>	<i>7</i>	<i>14</i>	<i>BÊ</i>	<i>bê reng</i>
<i>oksijîn</i>	<i>o</i>	<i>8</i>	<i>16</i>	<i>BÊ</i>	<i>bê reng</i>
<i>sodyom</i>	<i>Na</i>	<i>11</i>	<i>23</i>	<i>hişk</i>	<i>zîvî</i>
<i>alminyom</i>	<i>al</i>	<i>13</i>	<i>27</i>	<i>hişk</i>	<i>sipî</i>
<i>fosfor</i>	<i>P</i>	<i>15</i>	<i>31</i>	<i>hişk</i>	<i>sor</i>
<i>kibrît</i>	<i>s</i>	<i>16</i>	<i>32</i>	<i>hişk</i>	<i>zer</i>
<i>kulor</i>	<i>cl</i>	<i>17</i>	<i>35.5</i>	<i>bê</i>	<i>kesik</i>
<i>kalisyom</i>	<i>ca</i>	<i>20</i>	<i>40</i>	<i>heşk</i>	<i>zîvî</i>
<i>kurom</i>	<i>cr</i>	<i>24</i>	<i>52</i>	<i>hişk</i>	<i>zîvî</i>
<i>hesin</i>	<i>Fe</i>	<i>26</i>	<i>56</i>	<i>hişk</i>	<i>reng sipî</i>
<i>çifir</i>	<i>cu</i>	<i>29</i>	<i>63.6</i>	<i>hişk</i>	<i>sor</i>
<i>ziv</i>	<i>Ag</i>	<i>47</i>	<i>108</i>	<i>hişk</i>	<i>zîvî</i>
<i>qeले - qestîr</i>	<i>sn</i>	<i>50</i>	<i>118.7</i>	<i>hişk</i>	<i>sipî</i>
<i>zêr</i>	<i>Au</i>	<i>79</i>	<i>197.2</i>	<i>hişk</i>	<i>zer</i>
<i>gulle</i>	<i>pb</i>	<i>82</i>	<i>207</i>	<i>hişk</i>	<i>zîvî</i>

belê ji van kokên jor kotî bi gelek zêdetir di zemîne kurdistan de hene. eger di zanistiyek kimyayî fizikî de ger û pelandinek hûr li zemîne kurdistan bê kirin, hingê wê nû bê zanîn ku ev zemîne asya roj ava qelemroyê kurdistan ji made - ên kimyayî meaden û petrolî dagirtîye. hingê bê guman wê jêre bê kotin: xezîna cihan, lê mexabin xwediyên wî dil û bindest belangaz û giriftarîn. belê kurd wek insanê dinav ava ferat de tîbe, ji jiyîndariya kesane di nav zendên tevaya cihan de bê pare,

FÎLOJÎYA ZARÊ KURD Û ZANISTÎYA EDEBÎ

DEMA ji zar û zaravên nejadek dipeyivin hingê divê berî her tiştî em zanibin ku di bingehê de di tebir û ronîkirinê de filojîya wî zimanî bê çi xurtiyê bi xwe digre, wek: di dayîn û sendinê de ku hev û dû didin serwext kirin, hingê di pîrs, hevok⁽¹⁾ mufredat, muradif, zemaîr nêr û mê de, bihev xistina pîrs û daxwazan de têde çi hêzdarî heye, ew hêzdarîye ku xurtî firehî û dewlemndîya ziman dide xuyakirin, bivan awiran em dibînin ku zimanê kurd di her warên zanistî⁽²⁾ û ferhengî⁽³⁾ de di nav zarên arîyên roj helatê navîn de pêşenge, lewre zimanek terkîbî û tesrîfiye, di ristîk û pevketina pîrsan de xweş diyare ku ev ziman ji zanistîre lêwer⁽⁴⁾ û pêkare⁽⁵⁾, belê bivan aqahîyan dikarim bibêjim tevaya zar û zaravên⁽⁶⁾ nejadên arî ji lema zarê kurd şax vedane, her wekî bawerîya bi gotinê:

Di nav zarên arîyên asya de ji hevparî⁽⁷⁾ ya koka zimanê arî pêve

-
- 1 - hevok (cumle)
 - 2 - zanistî (seqafet. kultur)
 - 3 - ferheng (qamûs)
 - 4 - lêwer (îcabî)
 - 5 - pêkar (muqtedir)
 - 6 - zarav (lehce, zar, ziman)
 - 7 - hevparî (muşterik)

di zimanê kurd de her pirsên hevgehiya jiyindariya dewra pêşin têne dîtin, ku ew bingeh di zarên dîtir de nayên û nehatine dîtin, evve ku zimanê kurd jêderê⁽⁸⁾ tevaya zimanên arîye,

Ji milê dî di dengdarîya pirsan de ku ji bo nivîsarê (TÎP)⁽⁹⁾ wî karê deng derxistinê dibînin yanî alfaba, di wî awirî de jî dîsa em dibînin ku ev herşêş tîpên arî di zimanê kurd de hene lê di gelek zimanên dîtir de ninin wek (P.Ç.E.J.G.V.) tevde di ebcedîya kurd de hene, bê wan şêşan ne temame,

Di torevanî⁽¹⁰⁾ ya - sitran û saz bendî de jî dîsa zarê kurd not û meqamatan bixwe digre û dibe jêder, tevaya meqamatên - HICAZKAR. SERADEŞT. RAST. SÊGAH. ÇARGAH. NEHAWEND - ev her şêş meqamat di sazbandîya kurd de perdan digrin, edeba kurd ew çend hevbeste ku dema saz lê dikeve her kurdên ne xwenda jin û mêr dizanin ku ev kîjan sitrane, berî ku sitranvan bistire,

çewa ku em li ber mirêka tarîxê dibînin ku di nav zarên arîyên awirpî de gelek pirsên kurdî hene, nemaze ewên bi zimanên (Firan-sewî, inglîzî, Almanî, Yûnanî, siweydî û zarê silavya) dixûnin qenc dibînin ku pirsên me di nav wan zaran de gelekî, zanistîya zarê kurd ne hatîye belakirin ku em bêjin: wan biyanîyan⁽¹¹⁾ ew pirs ji zanistîya me girtine, her wekî ji her mêjevanan re xweş diyare ku ji dest pêka îslamîyetê ve ji wê payedarîya⁽¹²⁾ zanistîya ziman bê par mane, wiha renga diwarên bazirganî û turizmî de jî kurd neçûne gera awirpa, ew pirsên ku ne xwenda - şivan û gavanên

8 - jêder (mesder)

9 - tîp (hurûf)

10 - torevan (edîb)

11 - biyanî (xerîb)

12 - paye (rutbe)

kurd pê dipeyîvin, ew pirs dinav wandene,

Dema ku hinên - awirpî - ji rastiyê birevin û bêjin: hûn ji awirpa çûne asiya jiber wê çendê ji were tê gotin: HINDU AWIRPÎ - hingê divê zanibin ku piştî bi dest ketina (asaran) ji wan (Têzan) re weznek tarîxî nemaye, ew pirs di qiyas, mîsal û bihistinê de di zimanê kurd de bingeh⁽¹⁾ digrin, lê di zimanê awirpîyan de ew bingehên tefsîra wan pirsan nîne, her wekî: awirpî pirsê navê (ARÎ) navek îrîqî dizanin, lê dema ji şivanek kurd bê pirsê kirin bê sekin wê bêje: AR, AGIRE. ARÎ, YANÎ AGIRÎ. AN XWELÎYA AGIRE - ji alîkî dî yanî-xwediyê agir, an nejadê agri,

ji milê dî di warek arkeolojî de û tarîxî de jî wan tîzên tarîxî ên bê mentiq re meydan nemaye, her wekî liyor ev behis derbaz bûye û di-cildê pêşin tarîxa jêderîya nejadê kurd-de jî bi awakî firehtir hatiye derpêş kirin, ew rêçên (2) kevnare ên qûnaxên (PALEOLITIK) ku dewra insanên (NEANDERTHAL) (500) hezar sal berî tarîx li (CAWA) û (300) hezar sal li (PEKIN) (70) hezar dal li (ŞIKEFTA ŞINDER KURDISTAN) hatine dîtin ew rêçên insanên pêşin li (awirpa) nehatine dîtin,

wan tîzên muerixan gotine: - ew nejadên ku ji wan re (Hindu Awirpî) tê gotin, ji (Eskendinafya) çûne asiya, ew muerix an ulemayên ku bi wan heqbên jiyoljîyên agirveşanî⁽³⁾ agahdar, dizanin ku (3000) sal berî zayinda (Mesih) hêj li (Behra Baltîk) erdê reş der neketibûn, lê di dest mede asar hene ku /8000/ sal berî (za) li başûr roj avayê (DERYA KASPÎN⁽⁴⁾ ÇEMÊ ALEGES

1 - bingeh (esas)

2 - rêç (asar)

3 - agirveşan (birkan)

4 - kaspîn (qezwîn)

DEWLETA ALKANÎYA KURD) hebûye, çewa ku berdû kevirên ber kêlkên HUKUMDARÊ WAN (URUNGO) bi donzide xetên nivîsara kevir di dest mede li cildê pêşîn Tarîxa kurd deye, dîsa (HURÎ) ên pêşiyên kurd li (AMED U BAKURÊ AMED) (5000) hazar sal berî (za) asar û kevne bajarên wan li zemînê kurdistan mayindene, gelo ew têza (eskendinafya) li ku dimîne,

Di sematilojya û morfolojîya kilîşî⁽⁵⁾ de jî ew salixên nejaeên arî ji awirpîyan zêdetir bi kurd re parztîne, çewa ku di seykløjî adat û teqalîdan de jî kurd ew weraseta pêşiyên xwe parztîye, di wergitina çekande dîsa xwe diyare ku awirpêyan ew pantor ji şal û şapikên kurd girtine, ji milê di bi hezaran sal berî (dansa) awirpîyan keç û xortên kurd bihevne ketine dilanê û her mesrehiyên filiklorî,

Di warên zanistî de berî her nejadên asya û aferîqa kurd ji bo nivîsandin dayîn û sendina bi hevne di wan zemanên dûr de tîpên nivîsandinê xistine rêzaneke nivîsandin, ji wan ên jêr:

1 - TÎPÊN ŞAHÊ URUNGO ên ku liber kêlka wî (8000) sal berê (za) nivîsîn ku ew tîp li başûrê (erzerum li şikefta cûnî) jî hene,

2 - tîpên manî) ku ew (MANÎ) di zemanê (SAZMANA ARARAT) de (PÊXEMBERÊ KURD) bûn, ku jêre (DÎNÊ MANÎ) tê gotin,

3 - tîpên - ku (hezretî zerdeşt pê avista) nivîsiye, wek latîni bê nuqut, zêde tîpên xweşikin,

4 - TÎPÊN MASÎ SORATÎ) ji (37) tîpan bi hev ketiye, kurdek zana di /370/ sal berî islamîyetê çê kirine,

5 - tîpên - mîxî) ên (sumuriyan) ew sumurî nejadek arî ne samîne,

6 - tîpên vê latîniya kurd ku ev nivîsar pê hatine nivîsandin, di /

5 - kilîş (resim, heykel)

1922/ de sazmanên kurdên sitembol Rêportaj girtine di /1930/ de ji emîrên botan (CELADET BEG BEDIRXAN) li (sûri) alfaba çêkir û pê du kovarên (HAWAR Û RONAHÎ) didan belakirin, çewa ku (kamîran beg) jî bi wan tîpan roznama (ROJA NU) der dixistin,

Di dest pêka islamîyetê de nemaze di zemanê (Emewî, Ebasî, Usmanî) de ku bi navê (Tîpên quranî) ev tîpên erebî dane çêkirin, hingê tevaya tîp û xwedinên ne erebî (nexde (I) kirin, ji dînên (MÛSA U ÎSA) zêdetir girê xwe bi dînê (ZERDEŞT) dane girêdan, jêre dînê (MECÛS) gotin, çiqas kitêb û nivîsarên (dînê zerdeşt) hebûn şewitandin, jiber wê çendê ji ziman û tîpên erebî pêve li roj helatê navîn nemaze li îran û kurdistan zêde ew unsuriyet şidandi ma, di wan zemanan de şuera û edibên kurd ligor filojîya ziman û dengê tîpan hin îşaret dane ser tîpên erebî wek (bê, sê, nuqut, dibûn (p) ce - sê nuqut dibûn (Ç) ze sê nuqut dibûn (J) fê sê nuqut dibûn (V) ke du xet didane ser dibûn (G) elif û y dibûn (Ê) bivan îşaretên her şeş tîpan, hêj dikaribûn bi zimanê kurdi binivîsin, belê dînê islamê ereb û turkên usmanî ji tariya zeman kişandin ronahiya tarîxê, lê kurd ji ber ronahiya tarîxê xistin pişt perdeki reş û tarî, çewa ku li rûpela (61) jor ew kirde - ên (şex û melan) hatin zanîn ku çi bi serê miletê xweyê bedbext anîne, wê di birê sisîyan de bê zanîn ku dewletên islamî çi dijarî giyandine kurd!....

NE bi dilxwazî lê bi salixên tarîxî û eserên nayê inkar kirin ku nejadê ariyên asiya pir kevnejîn di serwanre heqbên zemanan derbaz kirine, heya meruv dikare bêje: wan di vejandina zendegî de pêka insanên pêşîn pêçane, rastiya gotinê eve ku dibin wan perde - ên zemanên gelek dirêj de ew çend nav li hêzdariya nepenî (xuda) kirine, her wekî:

I - nexede (memnû. yasaq) té gotin ku pîrsek zaravé (soriye)

- /2000/ sal berî (za) ve, yanî ji (DÎNÊ ABRAM⁽¹⁾) heya niho di nav nejadê (samî) de her ji (xuda) re (allah) gotine û dibêjin, lê di ser vî nejadê arî re çiqas bi deh hezaran zeman derbaz bûne ku ewçend navên (xuda) guhartine? her wekî navên jêr:

1 - MÊTRA) mêt - xuda) rah (roj) yanî xwediyê (rojê) bi wê ji rojê re bûne perestişkar⁽²⁾,

2 - AND) gotine, di dirêjahîya zeman de (INDO) gotine ku di nav heft rojan de ew roja (ÎNÊ) roja (îndo) bûye,

3 - AHÛR MEZDA) gotine: - (a) bi mana (jor) hûr) hingê re digotin, (mezda) mezin, yanî - ew mezinê di ser rojê re,

4 - HOMA) bi zimanê arîyên pêşin yanî meznê mezinan,

5 - YEZDAN) yanî ê ku (zend) dane peyda, insan beşer aferandine,

6 - dawî (XWEDA) gotine heya îro dibêjin, (XWEDA) yanî (XWE - DA), ku ereb (REB) dibêjin,

vî nejadê ku şeş nav li (XWEDA) kirine bê çiqas zeman derbaz kirine, ev çar hezar sale ku (samî) (ellah) dibêjin, belkî çar hezar salên ditirjî ew nav mayinde be, eger em ligor wan çar hezar salan hember bikin, hingê ew şeş navên gotî divê /24000/ derbaz kiribin, ji milê dî di guhartinên wan şeş navan de çiqas edyan hebûne?

ji wan pêve ên ku binavê hêzek nepenî⁽³⁾ doza (peyxemberî) kirine ku nejadê (samî) hêj ew dozdarî û payedarî ji wan girtine ên jêrin:

- ZORATÎ - NAPIŞTAIM (nûh) - MEHABAD - HOŞENG - ZULFÎ - Hûrî - ABRAM - ZERATÎJ (zerdeşt) MANÎ - van nehan xwe şandekê xuda dane zanîn bi dinê wan giranî û piranîyê

1 - abram (ewe ku ereb jêre - I brahîm - dibêjin)

2 - perestiş (tewaf)

3 - hêzek ne penî (quwetek ne xuyî-ayî)

bawermend hebûne, lê dawî ev paydarîya semawî a (NOBIL) samîyan - bi dest xwe girtin û raserî miletên bi wî dîni bawermend bûne û dibin,

BERÎ FIRA'INÊN MISRÊ ÊN KU DOZA XUDAYÎ KIRINE:

1 - (HALIDÎ) é ku hin muerixan jêre (xalidî) gotine, (xudanê - kasîyên ku bingeha (sazmana ararat) danîne, perestişgaha wî li (Başqela) iro bûn, tevde bi zêr û zîv kildayî, lê dema (Buxtnesir) é aşûrî) ew perestişgah vegirt, ew zêr û zîvê wê bir (Babil),

2 - (BXÛD) xudanê nejadê (HÛRÎ) é ku (yûnan - jêre duqyanos) gotine, çewa di (quranê) de hatiye fermayîş kirin bi navê (Eshabî kehif), ew xirabe bajar û asarên wî li bakurê (Amed - diyarbekir) dikeve,

3 - NEMURD (nemrue) ji eşîrên (GOŞ) wezîr an ferîşte (4) ên wî ên mezin (-AZER Û MEHAN) bûn, (ABRAM KURÊ MEHAN) dijê xudanîya (nemurd) bûn revîya ji (RUHA ÇÛ EQBE) ew çûna wî ligor ensklopêdya (israîl) /2000/ sal berî (za) bûye, wî dîne bawerîya bi (xuda) birîye wir,

NEJADÊ BENÛ SAM BAWERÎYA BI XUDA

BELÊ é ku ew bawermendîya bi hêzek nepenî birîye nav (Benî sam) (ABRAM KURÊ AZAR) pismamê (NEMRÛD) ji eşîrên koş bûye, dema ji (RUHA) çuye (EQEBE) jina wî keç apa wî

4 - ferîşte (melaiket)

(SARA) pére bûn, piştî (HACIRE) ji (QIPTÛYÊN MISRÊ) mehir kir, jêre (ISMAÏL) çê bû (sara) qebil nekir ku li bawê biminin, hingê (ibrahîm) (hacire û ismail) birin li wê çola (MEKE) ê hiştin, di şûna (meke) ya îro de (pûtxana lat û uza) hebûn, wan erebên wir ew herdû (pût)⁽¹⁾ dihebandin, lê (ABRAM) binavê xaniyê (XUDA) bingeh li diwarê (mekê) danî, çewa ku nejadê (ISRAÏL) jî bi yektîya (xuda) dabûn bawer kirin, çewa ku liyor hate gotin: ew Koçmendîya (Abram) ji (Ruha) /2000/ sal berî zayinda (Mesih) bûye,

Biwê felsefa mîtafizîk wî nejadê ku diwê sehra necid de ji her awayên jiyînê paşmende, gav dane mesreha tarîxê û serdariya roj helatê navîn, ew sewana dîn raserî nejadên xwedî kiyar vegirtin, belê biwê mertala navê xuda piraniya roj helatê navîn û afrîqa xistin bin baskên xwe, di dest pêkê de ew mertal binavê (xuda) û serfiraziya roja paşdawî⁽²⁾ bûn, lê dawî bi navê (xelîfan impiratorîyek diktatorî) dan çê kirin, kuştari û talana welatan ji alikî jî aliyê di keç û jinên wan nejadên ne ereb bi navê (xênîmet) dibirin û binavê (carîyan) li bazar gehên bajaran de difirotin⁽³⁾, çî nejadên ku doza mafê xwe ê nejadî bikrina bi navê (ZINDIQE Û ŞIÛ-BYÏN) qetla wan bi şerîetê hela dikrin, çewa ku biwî navî (HARÛN REŞÏD) ferman bi kuştina kurdên (biramak) da, wan biramakên ku hukumeta (Ebasî) dabûne teşkîl kirin,

jê diwartir ewe ku ulema û bawermendên kurd ji (Eqîdê) pêve xwe û miletê xwe kirin (Rabîte), yanî ji bawermendiyê pêve bi wan ve dane girêdan, bi wê girêdanê ketin bin sîdariya (Emewî, Ebasî û Usmanî) yan tê de man dîl û gerdên şikestî!....

1 - pût (senem)

2 - roja paşdawî (roja qiyametê)

3 - divî warî de li kitê ba (temedîne îslamî) nihêrtinek divaye,

wiha renge di dest pêkê de bi dilovanîyek insanî û wekhevî dijîne de (KARIL MARKIS) awirek li (FELSEFA MADÎ) vedaye, liser wê rêzanê bûn di /1917/ de (rûsîya) pê nizama (qeyser) guhart, lê di cenga cihanê a didûyan de wanji weke wan (xelife - ên) gotî, ew felsefa madî wergerandin siyasî, eskerî û vegirtina jibona îstiratîjîyên siyasî û abûrî,

KURTÎ AN NIVIŞKA BIRÊ JOR:

EGER DIVÎ AWIRÊ TARÎXÎ DE ew xudbîn⁽¹⁾ û bedkar û sitmkar⁽²⁾ ên kurdistan vegirtî⁽³⁾, hin mêjevanên⁽⁴⁾ ku bi tarîxa kurd agahdar û bawerî ne anîne ku nejadê kurd li roj helatê navîn asyaroj ava kokêk bingehînî, lê di rojên pêş de ku zanaên arkeolojî karibin bi serbestî di zemînê kurdistan de li keleh kevne, bajar û deverên eserî bibin peledar⁽⁵⁾ hingê wê li xwe şiyar bibin û zanibin ku ji mentîqa tarîxê derketî û averê bûne, belê gelek mêjevanên ku qudsiyeta tarîxê û merkeza xweya exlaqî nas nekirine ligor dil û heş û daxwazên xwe ên tekane di zeman û mekanaan de reş û sipî bi hev guhartine, ji dêla ku biwan bedkariyan karibin nejadê kurd ji ber mirêka tarîxê nepenî⁽⁶⁾ bikin, wek: kibritê nefsa xwe şewitandine û ji xwe para bednamî û şermezarî hêştine û dihêlin,

BELE, wan bedkarên gotî ligor pêkarînen xwe di zeman û

1 - xudbîn (enanî)

2 - sitmkar (zalim)

3 - vegirtin (ihtilal)

4 - mêjevan (muerix)

5 - pelandin (teftîş - mufetiş)

6 - nepenî (ne berçav)

mekanan de gelek xelek ji zincîra tarîxa kurd qetandine avêtin pişt perda tarîxê bê ku zanibin an bixwazin ku zanibin, ew nejadê ku diwî zeminî de hatiye aferandin⁽⁷⁾ û têde ketiye landika⁽⁸⁾ jiyînê û diser xwere perde -ên zeman derbaz kirine, nabe ku wî zeminê jiyînearîya wan her tevger, buyer⁽⁹⁾ û serpêhatiyên wan di singê xwe de negirtibe û ne paraztibe ew dusiya zemîne ku jêre tê gotin tehefizatên tarîxî û emanetê wan miletan asaran diparêze û dispêre wan, divê em jibîr nekin ku zeman raserî zemîn û insane liher tevgrên wan nêrevanî dike⁽¹⁰⁾, çi tiştên ku ji wan re heyîn û neyîn⁽¹¹⁾ destpêkê dawî heye tevde dibin siya zeman re derbazî /an rojan bûne û derbazî pêş dibin, belê ew kamîra zeman ku her buyerên dûr û nêzîg kilîşên wan bi awakî rast û durust bicî û çarak digre ji mere dide derpêş kirin, ew nivisevanê ku van bingegehên edeba tarîxê nizanibe jêre şerme ku dest bavêje xameya mêjewanî û xwe biwê leqebê bixapîne,

JI WÊ sitemkarî û bê edebîya tarîxê pêve hukumetên kurdistan vegirtî diher warên huqûqê insanî de jî dijarîyên nadîde⁽¹²⁾ giyandine vî nejadê bedbext û digînin, wek: di her warên - civatî, zanestî, abûrî - bi tu awayî rê nadin ku di welatê xwe de karibin bi serbestî bijîn, her û her ji kuştariyên tevayî û wêran kirin û talan kirina welat pêve pir hindik di huqûqê insanî de ne pardarin! dinav wê hebûna welatê xwe de ku tevde ji - petrol, meadenan dagirtî jar û belengaz derin welatên dûr wek: Almanya, Hicaz, Lîbya,

7 - afirandin (xulqîyet)

8 - landik (hêlan)

9 - buyer (ehdas - buyî)

10 - nêrevanî (murevanî muraqib)

11 - heyîn (wicûd), neyîn (edem)

12 - nadîde (ne dîtî)

Awistiralya, Libnan, Xelîc, û hin bajarên wan welat vegirtîyan liwan welatan dixebitin ji jin û zarok¹ bavên xwere peran dişînin da ku pê bêne xwedîkirin, tevî ku hebûna welatê wan dikare sed milyûn xwedî bike, biserda ji wê hebûna kurdistan pê top, tang û firinde - ên bumbaran dikrin pê kurd dikujin, eger ew hebûna erdê kurdistan di dest kurd de bûna berî her nejadên asya wê gav bidana pîşketina zeman, lê sed mexabin her wekî hate zanîn welatê me lime kirine zindanek mezin di şûna xwendegah û nexweşxanan de zindan û darên sêpayan⁽¹⁾ jibome li gastînen bajarên her û her daçikandîne!...

Bi vegirtîna welatê me û faşistîyan, jî nasekinin, bi her awayên propagandan nivîsarên xwe - ên hukumî û di çapek diwêlî de jî inkara (30) milyûn kurd di jiyogirafyêk zêde -î (900) hezar kilometre xerîta kurdistan de inkara hebûna kurd dikin, ji wergerandina rastîya tarîxan pêve di kurdîstande her mealimên jiyogirafya jî didin guhartin, ev daxuwaza dijûn û çepel⁽²⁾ ji zemanek dûrve ji wan re buye daxwaz, her wekî di zemanê (Emewî) yan de walîyek binavê (Bekir kurê wail) şandin (AMED) gotin (Diyarbekir) yanî welatê bekir, turkên kemalîstî dibêjin: (diyarbaqir) ku navê yekê turke, wiharege herçar dewletên kurdistan vegirtî pê ketine asaran jî werdigerînin ên xwe û dixin (Mêzexanan)⁽³⁾ binavên xwe didin derpêş kirin,

Nemaze piştî cenga cihanê a didûyan ku hin dewletên nûder ji bin sîdariya ingilîz û firansa derketin ser mesreha tarxê, jibona ku ji xwere kiyanek bidin çêkirin, biwê daxwaza na kesane pê ketine her yek ji hindava xweve tarîxên roj helatê navîn ser û binê hev

1 - sêpa (darên îdamîne)

2 - çepel (şûm, ne qenc, mêzexane (methet))



dikin reş bi sipî didin guhartin werdigerînin navên xwe, liba wan ku tarîx jî roman, çîrok an çêkirina filimanin, bedkarî û bed exlaqîyan ji edeba tarîxan re bawerîyek nehêştine,

A gelek xerîb ewe ku - tevaya sazmanên diwêlî wek: tarîxî, zanistî, civatî û huqûqî - liber wan bedkarîyan sikût kirine, nemaze - yektîya muerixan, asaran, yonisko, cuxrafîyên diwêlî, civatên huqûqê insan û tevaya bir û bêşên yektîya koma miletan di vî warî de pirsiyarin dema kurd inkara wan sazmanên diwêlî bi mîsaq û teşrîfên wan ve inkar bike û bawerî pê neyîne ne gelek vajîye, lewre ew sifra ku meruv jê xuwarinê nexwe nikare bêje (el hemdu lilah) divê ew dewletên xwedîyên wan bedkarîyan ji tevaya sazmanên gotîre minetkarbin ku ji wan bed karîyên wan re çavên xwe digrin,

DESTÛRÊN SEMAWÎ AN IMPIRATORÎYÊN CÎHANÎ?

HER wekî ji her mêjevanî re xweş diyare ku berî edyanan ji awirpa roj helat heya asya roj ava xwdî hêz û cihangîrên mezin ROM. AN YÛNAN Û ÎRAN⁽¹⁾ bûn, di navbera herdû hêzên mezin de her û her derîyên cengên mezin dihatin vekirin, di qadên wan cengdarîyên gotîde golên xûnê çê dibûn, diwî zemanî de ji herdû impiratorîyan mezintir hêz nebûn, daxwaza herdû leşkergehan jî serdarî û cihan giribûn dirix wan daxwazan de hêzdarîyek (DÎNÊ ZERDEŞT) di roj helatê navîn de sîwan vegirtibûn, dema li erdê filistîna iro (MESÎH) binavê rûhulqudus rahişte (AIA xudayî), hingê (Rom) jî xwest ku ji hêzdarîya xwe a leşkerî pêve li

1 - heya berî islamîyetê kurd û faris yekbûn

hember (dînê - zerdeşt) rahêje wê mertala dînê (mesih)

lê jiber ku (Rom) di xerîtê û kesafeta jiyogirafya de di roj helatê navîn de ne wardar bûn, ji ber wê çendê nikaribûn (dînê mesih) bixin şûna wê dilbijokîya (dînê zerdeşt), lê her wekî (AHMEDÊ XANÎ) gotîye: sahib xerezên di weqtê first - de,

(Êrmen) ên ku heya /600/berî (za) li (yûnanistan) li heremê (tilisya) bûn, ji wir bi koçmendî di bakurê derya reş de hatine (REWAN) ku hingê ew qelerew bi hukumranîya (DEWLETA HALIDÎ. SAZMANA ARARAT) ve girê dayî bûn, wê dewleta kurdî ew (koçerên - êrmen) ligor xesaîsê xwe - ê tarîxî bi dilovanî di nav xwe de qebûl kiribûn, tevî wî çendîjî her û her dil reş û hestiyên wan şîn bûn, fîrsetek xiyanet wek siya wan biwanre, lê digeriyan, dema (Rom) kurdîstana bakur rojava û sûriye vegirt hingê fîrset dîtin mezinê wan (terdat) dev ji (pûtê) xwe (ANAHÎT) qerîyan û bi awirek siyasî dînê (misihi) qebûl kirin, jibo (Rom) ji wan re bibe piştegîr da ku liber kurd rabin, neyar-tîya (dînê zerdeşt) bikin,

Biwê pîlana siyasî û xincera du serî impiratorîya rom bi her awayên siyasî û eskerî ji (têrdat) re bûne destegîr û piştegîr, wan êrmenan lidor (WAN. MÛŞ. BEDLÎS Û SASÛN) (3000) ji - MUX. MUXBEÇ Û MAJISTAN)(2) kuştin, ronîştmanên wan hawîran di bin şûran de (dînê mesih) biwan dane qebûl kirin, ji wî zemanî heya vî heyamî ew kurdên ku bi dîn ketine nav nejadiya êrmen hej ew sematiloj û morfilojîya wan bi nejadiya wana kurdî ve mayindeye, çewa ku teqalîd û zimanê xwe ji wî wînda nekirine, dema meruv wan êrmen û kurdên wan navçan dibîne nikare jîhev bide cuda kirin, a ji tevan mezintir ew bûn ku di /

2 - navên ulema - ên - zerdeştbûn, ew nave ku pê diploma (majistir) digrin,

1915/ de dema (sultan reşad) emir bi kuştina wan da, hin hebûn ku binavê dîn ew bira - ên xwe dikuştin, wanjî nizanibûn bêjin ma ne em bira - ên wene (3) biwê sitem kariya (Rom) bûn ku jibona karibin wê intiqamê ji romê bigrin kurd bê daxwaza hukumeta xweya (sasanî) ji qehran xwe avêtine behran bûn misliman, belê jiber sitemkariya rom tev çekan xwe divê gola qitrana reş werkirin heya vê esra bîstî têde ser û bin dibin!.

DI ISLAMÎYETÊ DE PIŞTÎ XELÎFAN:

Ji dest pêka (emewî) yan ve binavê dîn dest bi impiratorîyek diktatorî hate kirin, piştî ku (îmam elî) û kurên wî ji ber xwe xistin, berê wê sitemkariyê kete welatên (kurd û faris), çî qumandanên wanên zêde sitemkar û xûnrêj hebûn ên wek: (xalid kurê welîd), (seid kurê weqas), (Hecac kurê yûsif), (yezîd kurê muhelib) û wekevan dişandin îran û kurdistan), di bername - ên wande ji kuştin û talan kirinê pêve tu daxwaz nebûn, hecac li sehayê hepisxanekî servekirî çêkiribûn, ên girtî havînê ji germa rojê û zivistanê dibin berf û baranan de dimirin,

Yezîd kurê muheleb digotin: ne liser laşê kuştîyan be xewa min nayê, sê laş jêre dikirin doşek û yek balgî hêj radiza, rêya ku tere derbaz bibûna divabûn liser wan rêyan laşên kuştîyan mêr, jin, û zarukan bi dar û devîyan ve dalqandibûna, hinan jê xwestin ku wê kuştariya welê tevayî bide sekinandin wîgot: herin wan liser tenûra aşê avê serjê bikin heya ku bi xûna wan aş bigere arvan çêke bikin nan jiminre bînin ez bixum hingê ezê vê kuştariyê bidim sekinandin, ligor daxwaza wî insan wek pez kişandin ser

3 - ji rişe - ê nejadê kurd, kitêba (general ihsan nûrî) hatiye girtin,

cuya aşé û serjê kirin, lê jiber ku xûn sar dibûn ne diherikîyan dibûne wek tert, yekî ji wan xwedî insaf got: eger hinek av bera nav vê xûna pir nedin danakev, hin av bera nav xûnê dan aş gerîya ard jêre kirin nan û birin xuwar got niho we dilê min rihet kir, hêj got ser û ber mekujin, lê talan xênîmet jimere helale,

Ew xênîmet ne tenê mal, pez, sewal û perebûn, lê insanjî xênîmet dibirin, mêr dikirin ebîd jin û keç li bazargehan li mezadê difirotin delal digotin: werin keçên laş sipî û difirotin, rojek du keçê (Hurmuz şahê îran) xistibûn mezadê, hêj (elî) saxbûn got: ev ne wicdane keçên melikan di bazargehan de bêne firotin, yek ji kurê xwe (Huseyin) adîtir li kurê (ababekir mehemed) mehir kir, kesên ne ereb dibûn misilman jî ji wan re (muwalî) digotin: ew muwalî nikaribûn keçên ereb mehir bikin, lewre ne layiqê ereb bûn, lê ereb binavê carîye keçên kurd mehir dikirin, ew mewalî di hundirê mizgeftan de jî nikaribûn li sefa pêşîn li pêşîya ereban heya nimêj bike, ew mewalî diçûne şerê milletê xwe lê ji wan re xênîmet tunebûn, nikaribûn bi ereb re nanbixue disekinîn heya çî jiberwan ma hêj dixwarin⁽¹⁾,

ji wan sitemkarîyên jor gotî pêve çî kitêbên ku bi zimanê farisî an bi dînê (zerdeşt) ve hebûn tevde dişewitandin, diwî zemanî de li (îran) zanîngeha (cind şapor) hebûn, zêde mezin di warê zanistîya bilind de weke wê li roj helatê navîn û tevaya asya tune bûn, tède - tub, hendese, riyazîyat, felekî, edebî, tarîxî û ilmê ictîmaî - dixwendin, di jêr zemîna bin wê camîê de (10) mitir çarçik jibo paraztinê hertewir kitêb hebûn, wan amir hêzên islamî tevde şewitandin, ne tenê xisara kurd û faris, lê xisarek mezin giyandin pêş ketina nejadên roj heletê navîn, wiha renge li bajarê (AMED)

1 - ji - temedinê islami - nivîsara (circi zeydan)

hingî kitêb avêtin (dicle) av reşbû belê ji alikî rakirina (dînê zerdeşt) ji aliyê dî jibo di AVISTA⁽¹⁾ de neyê dîtin ku gelek teşrîên (dînen islam û mesîh) jê hatine girtin nemaze (mîiraca) pêxember (rûhulqudus) a (mesîh) herdû jî ji dînê (zeredeşt) hatine girtin⁽²⁾,

wiha renga çî asarên ku bidîtana dişkênandin an wergeran dine navê xwe, her wekî dema (Bekir kurê wail) bi navê walîyê (Emewî) çû (amed) ji guhartina navê (amed) pêve kir (diyarbekir) çî nivîsarên di (Bedena amed) de hebûn, tevde mehandin ji nûve bi navê xwe diwan kevirande kolan, bê ku zanibe an bixwaze ku zanibe ew bedkarî û bed exlaqî gunahkariyek tarîxî û huqûqê insane,

PIŞTEVANÊ ISLAMÊ SULAHE DÎNÊ EYÛBÎ:

HER wekî herkes dizane ku (SULAHE DÎN) kurd mader û



1 - Selahedinê Eyyûbi.

1 - avista (qurana zerdeşte)

2 - li kitêba elhukema elislase nihêrtin divê.

pedere, jiber awakî ne naskirî ji (DUYÎN)⁽³⁾ bi êla xweve bavê wî çuye (TEKRÎT) liwir (sulahedîn) hatiye dunyayê, di zarukiya xwede li gelek deveran xwendîye, lê xwendina xweya dawî li (BEILBEK) tamam kiriye, diwî zemanî de li nav ulema - ên islamî xwedî merkezêk bilind bûn, bawermendîya dînê islamê de perestîşkar ji paraztina dînre berî her erebî nefsa xwe ber pirsîyar didîtin, bê ku ew sitemberîya⁽⁴⁾ milletê wî bikeve ber çavên wî ji çûna buhuştê pêve, çewa ku diwê dîndariyê de ji milletê wire heq û edaletek huqûqê insan nehatibûn dayîn, sîdariya dîn de welat û milletê wî her di kuştin, talan, wêrankirinê de tevde bûbûn goristan, ên mayî têde kole dil û bindest,

Belê (sulahedîn) biwê morofîna (mityafik) ne tenê ketibûn şerê (mesihîên) roj helatê navîn, lê ketibûn cengdariyek hember tevaya (xaç perestên) wek: ingiliz, firansa, îtalya, almanya - jibona ku ew negîjin wê perstigaha (QUDUS) ku yek ji pîrozîya wan bûn, jiber wê çendê li tevaya kinîse - ên awirpa zengilê gazîya herba (qudus) lê ket, ji (rîşard dilêşêr) pêve, qiralê (Almanya Barbaros) diwê hatinê de li çemê (ceyhan) bin av bû, biwan lehîyên leşkerên (xaç perestan) roj biroj şer giran dibûn, sulahedîn dît ku ew şerê ku têde talan tunbe ereb jêre ne amadene,

HER wekî (quran) bi zimanê kurd daketibûn û leşkerên kurd welatên ereb vegirtibûn, wiha renga paraztina dîn û welatê ereb ketibûn ser milê (sulahedîn ê dîn) û xortên milletê wî, piştî naskir ku ereb nikarin şerê leşkerên nizamî û silêhên giran bikin, gazî li milletê xwe - ê dîl û bindestê ereb kir, bideh hezaran cengawirên kurd ji - parsîn, Bayezîd, heya çiyayê (toros -) kişandin wê sehra erdê (filistîn) dinav wê qûmagerim de dane kuştin, daku welatê

3 - duyîn li bakurê (hevlêr û rewanji heya) ji herduyan yeke,

4 - sitember (mezlûm)

f.istîn biparêzin jibona ku kurd di roja paşdawîde⁽¹⁾ li bihuşta zer û nav komên suruştan azadîya xwe bidestxin, belê ligor hindikîya insanên wan zemanan (60) hezar li keleha ekka û (80) hezar li bajarê (qudsê) kuştin, dema wan cengawirên kurd li erdê filistîn şerê (xaç perestan) dikir, jiwan para (xêzên - turkemenên çepel), ketibûne kurdistan ji kuştinê peve talan û wêran dikirin, ew (xêzên) ku bi wergirtina navê îslamî hatibûn talana kurd,

jiwê berevanî, cengdarî pêve, bi hezaran malên kurd birin lidor ekka, çemê urdin, horan û çiyayê (dûreji = dirûz) hêştin, di zemanê dirêj de liwir dinav nejadiya ereb de hatin bişaftin, heya nizanin ku pêşiyên wan kurdin, dîsa wê malbata (sulahedîn) (Eşîra biraz) birin lidor (Hema û keleha kurd) hêştin ewjî asimilasyon bûn, çewa ku (usmanî yan) jî (Emareta kilis) rakirin avêtin (libnan) ji roj helatê (siwêrek) (Eşîra korî) birin libnan, çewa ku birazê sulahedîn kamil û necmedîn melikên (misir) bûn, jibona şerê memalikan bi hezaran kurd birin ew jî liwir hatin bişafitin, bakurê (sûdan) tevde ew kurdin bûne ereb, ma di tarîxa kurd jivê gunahkarî û bedkarîyê mezintir çi hebe?!....

DIWÊ KOSMOPOLÎTÎYÊ DE (EBA MUSLIMÊ XURASANÎ):

Diwî zemanê ku sitêmkariya (Eşewî) yan wek: mijê girtibûn ser tevaya welatên îslamî, li her derên welatan kuştin, talan, bertîl, ji alikî (meawîya) xezîne jibo pesindariya edaletawî li (şueran) didane belakirin, serkar û serleşkerên wî ên wek (umer kurê as) walîyê (misrê) bûn, dema ji (misir) vegeiriya - 8 - çermên gan ku

1 - roja paşdawî (roja qiyametê)

hingê dişûna (qasan) de bûn (dînar) bixwe re anî, çewa ku ji (muawîye û yezîd) kurê wî re daxwaza pêşîn ew bûn ku bingeha malbata (pêxember) ji nav ereb bidin hilanîn, bivan û weke van kirde - ên na kesane welatê dibin sîdariya wande bûbûn dûje,

Diwan alozî (2) yên gotî de bi dilbijokî û dilovanî malbata (Ebas) ku apê (pêxember) bûn, sulahedînê yekemîn ji kurdên (îran) (Eba mislimê xuresanî), bi hêzdarî (kurdên biramak) (Ebasî ji bin kon û nav devan) giyandin kevlê (3) hukumdarî, tevî ku didîtin bê ereb çiqas unsurîne, TEVAYA bajarên xwe kiri-bûn perestîşgah⁽¹⁾ wek (Meke) qublegah, (Medîne) ziyaretgah, (qudus) qiblegaha pêşîn, (şam) ciyê mehkema roja qiyametê, (Bexdad) ku berî hingê (beşçe) bûn, (ebamuslim) ji navê wê kir darulselam û meqamê ewliyan bajarên wan ew bûn, eger hinên di hebûna wê ji wan navan yek lê kirina,

piştî ku (biramakîyan), di warên - sazmanî, eskerî, îdarî, abûrî - de ji wan - ebasiyên konan re dewlet dane sazkin, ên wek (Harûnê reşîd) binavê (xilafetê) kevil girt, tevî ku bişev û roj heme-neşînê⁽²⁾ wî (ebû newas) ê geveze bûn, giyandin payedariya (kesra), piştî ku dixwede hêzdarî dîtin, çav berdan kuştina wan (Biramakîyan), ku yek ji xesaisê wane, çi dara ku meywe jê bixun an dişîya wêde ronîn divê bibirin,

serkarên (Harûn) binavê (şîubîyîn) fermana kuştina (Biramakan) bi harûn dane imza kirin, (ceefirê biramakî) zawayê (harûn) bûn, kuştin û ji (harûn) re gotin: xweha te hêvanê biramakan tê gerîyaye divê ewjî bê kuştin û kurê wê heft salî ewjî kuştin,

2 - alozî : (kêşmekêş, ne rihetî)

3 - kevil (textî an kursîya nukum)

1 - perestîşkar (tewaf kirin)

2 - hem neşîn (ê pêre ronîştî)

Herwekî berî wî pêkinê⁽³⁾ dewleta ebasî (eba muslim) xwestin dîwana (MENSÛR) berî ku bê xwedîyên şûran ji kuştina wîre xwe pêk anîbûn, eba mislim naskir ku wî dikujin got: gunahê min li bawe evve ku min hûn jiber qetilama (Emewîyan) rizgar kirin û giyandin hukumdarî jibo wê qencîyê hûn min dikujin? di bersifê⁽⁴⁾ de Eba delame got: (inne abaûkum ehlî ðedrên ya kurdo) belê di hundurê dîwana (MENSÛR) de (Eba muslim) dane ber şûran kerî kerî kirin her kerîyek Leser pirên (dicle) danîn, xwendaên kurd divê bivan danezanên tarîxî hûn xwe nasbikin û zanibin ku çima divan muzakeratên minde têne derpêş kirin?.....

Biwan sitemkariyên zêde mezin roj biroj qelşên zêde diketin diwarê hukumdarîya ebasîyan dihejîyan, jiber ku biramakî di hukumde neman ku karibin dezgîna siyaseta der û hundur bi dest xwe bigrin, nemaze di dewra xilafeta (mutewekil eleanor) bûbûn wek: sofîyek xelwe neşîn (SULTAN MURAD) ê turkên (usmanî) ew muhra (xudayî û dîploma semawî) ji wî girt, biwê guhartina xelafetê emji wek: gundên ku di zemanê (qeyserê rûsya) de ku dihatin firotin, insanên wî gundîjî pêre dihatin firotin, ji bin perdekî reş ketin bin perdekî sor bi xûnê rengdayî, jibona ku bi navê dîn sîdarîya xwe bidin ser roj helatê navîn, wan selatînên turk ji ereban mezintir şaşik dane serê xwe û cibe - ên xirqeboş lixwe kirin, wek gurên çermê mîyan wergirin daku karibin bikevin nav pez biwan canbazîyên dîndarî ji derîyê - vîyena, heya îran, misir, tûnis û cezaîr tevî hicaz - di împîratorîya xwede vegirtin!.....

3 - pêk-in (êko çêkirîye)

4 - bersif (ciwab)

DIWÊ IMPIRATORÎYA SEMAWÎ DE KURD Û TURK?

Diwê girtina navê (xelafetê) de neku (sultan murad) di warên civatî edaletek ictîmaî, abûrî, zanistî û siyasî - de rewşek nû xiste hukum, jibona ku çavê millet bigre û pê bawerbin ku (sultan) ewçend meruvek dîndare, ji tevaya - tekye xane - ên şexan, ziyaretan, derwêş xanan û ji xwendeghên dîni re meaş da girêdan, daku ew tabûra xirafatan jêre propagande bikin, jiber wê çendê wê tabûra gotî di nav wezîfên xwede digotin: sultan ûliylul emre kesê ji gotina wî derkeve kafir dibe, eger bimre jî li serwî nimêj nayê kirin, sultan heya secada xwe liser ava behrê ranexe û nimêj neke nabe sultan û xelîfe, belê biwan propagande ên wî zemanî impiratorî dane çêkirin, neku bi nîzamek pêşketî bi edil û insaf giyane wê payedariyê heya ku îro turkên kemalistijî wê impiratorîya xirafatan jixwere dikin navdarî,

Dema (sultan murad) jiwê sefera (Bexda) vegeiriya li (bedlîsê) bû mêvanê (EMIR EVDALXAN Ê EMARETA BEDLÎS), mêjevan û seyahê turk (ewliya çelebî) jî pêre bûn, li kitêba seyahet nama cildê didûan de bi awakî dûr û dirêj dibêje:

EMÎR EVDALXAN - diwî zemanî de di nav tevaya (Emîrên kurd) de zanakî bilind û alimek mezin bûn, ji ilmê şerîet û çêkirina tefsîra quranê pêve duktorek zêde mezin bûn, wî zemanê ku duktorên nexweşî nas tunebûn, hingê wî her Emelî çêdikirin nemaze emeliyên çav, çewa ku di edil, insaf, dilovanî û comerdîyê de tekanekî bê hemtabûn, jibona wan salixên jiwê dîtina min ev bûn: Dema em bi - sultan - û ewçend wezîr û zibatanve leşker

bi mera em giyane nêzîgê koşka wî liser teqalîdê kurd û mêvan perwerî bi dilgeşî hate pêşîya me em derbazî mêvan xana xwe kirin, puştî ronîştinê (sultan) jêre got: ya emîr eger li bate hemam hebe ez xwe jivê toza rê bişom qence? emîr got:belê ez benî fermo , ezjî bi sultan re em derbazî hundirê hemamê bûn, me dît ku hemam liser fenê hendesekî zêde pêş ketî hatîye avakirin, ku me ew hemam li beşda û (sitenbol) jî ne dîtibûn, diwarên hemamê tevde bi misk û enber seyandî di nav wê helm û buxara ava gerim de wê bihna xwe mejîyê meruv dadigrtin, sultan zivirî ser min û got: çelebî ev hemam li sitembol bûna min timî xwe têde bişûştana,

Dema em birin xwarin xanê hêj tiştên ne dîtî me dîtin, ew bêşên⁽¹⁾ xwarinên wî li loqante⁽²⁾ ên sitembol çê ne dibûn, jê û pêve liser masa sultan û wezîran, firaq û kevçî tevde ji zîv û zêr bûn, lê sed mexabin⁽³⁾ wan wezîr û qumandanên mezin, gelek jîwan firaq û kevçîyan dizîn, ku ligor wê heyeta sultanî şermezarî û kêmanîyek mezin bûn, biser wê mêvan perwerîya mezinde tevaya wezîr û qumandanên jî perû⁽⁴⁾ kirin, biwê dilgeşî û xweşîyê em ji bawî çûne (wan) ê,

li wir ecayîbek mezin û bê guman min dît, ew dîtin ewbûn ku li wir (sultan) ji ahmed melik paşa re got: divê tu parîkî jehrê bidî evdal xanê bedlîsî jivê navê bidî hilanîn⁽⁵⁾, ew bihistin ligor sultan û ew ihtîrama (evdalxan) min tiştêk zêde vajî û na exlaqî dît, biwî emrê welê sitemkarî ku sultan da - ahmed melik paşa - sultan

1 - bêş (qisim)

2 - loqante (ciyê xuwarinê)

3 - mexabin (meelesef)

4 - perû (xelat)

5 - qencîya ji dejminre xirabî tine.

çû - sitem bol - ez liwir mam, jiber ku tarîx nivîs bûm, min xwest ku encamîyê⁽⁶⁾ bibînim,

Ahmed melik paşa - ji wan hawîran gelek ji wan dûvikên sultan ew şêx, mela, xwedîyên tekyan, karmende⁽⁷⁾ ên ewqafan, tevde lidor xwe vehewandin û ji wan er got: - evdalxan - yezîdiyên modikan dane dor xwe û çî misilmanên ku daxwazên wî qebûl nekin wan biwan yezîdîyan dide kuştin, ma dînê islamê vê qebûl dike? sikûta li hember kirde - ên vî zindîqî duruste? daxwaza - evdal xan ku biwan yezîdîyan hêdî hêdî dînê islamê ji nav millet bide rêjkirin, ma di berevaniya⁽⁸⁾ dîn de em tevde ne mesûlin ku wan bira - ên misilman ji dest wan yezîdîyan rizgar bikin? piştî bi wan gotarên⁽⁹⁾ ji rastîyê dûr serê wan şêx û melan dagirtin şandin ba serekên eşîran,

Ew şêx û mela ne wek - (melik ahmed paşa) lê bi (Ayetên) quranî û hedîsê nebewî weiz didan û pêre digirîyan jî, digotin: ma hûn sekinîne dînê islamê çû, wan serekên eşîran jî ligor wî zemanî ji wan bawer dikirin, ku şerê (evdalxan) nekin dînê wan çû û nîkeha wanjî betal jîna wan tê berdan, biwê bawerîyê pîraniya eşîran giyane ba melik (ahmed paşa) tevî leşkerên turk berê xwe dane (Bedlîs) bê ku zanibin wê namûsa milletê xwe bidin bin ligan,

Diwê çûna ser bedlîsê de ezjî bi wan re bûm, piştî em giyane serê gêlîyê (Bedlîsê), paşa got: tevde peyabin du qamat sunet bikin û ji (xuda) bixwazin ku divê cihada muqedes de serfirazî bide me, piştî sunet û duan çend beran liber lingê paşa serjê kirin

6 - encamî (dawî)

7 - karmende (muwezif)

8 - berevani (difa - berge girtin)

9 - gotar (xitab)

û em ketin gêlîyê - bedlîsê -

Dema em giyane nêzîgê bajarê (bedlis) ê şer dest pêkir, şerek zêde xûndar û kes nedîbûn, wî şerê tufengan wergerîya şerê şûr û xinceran dest bi dest, ji nav herdû şervaniyan dengê selewatan dihatin, piştî wî şerê sê roj û sê şev bê sekin, ew cengawirên eşîrî ketin bajarê (bedlîsê), dama şer kete kuçe û kolanan (evdalxan) naskir ku li hember wan eşîran çare nema mala xwe û bi leşkerên xwe - ên kelehê ji (bedlîsê) çûne nav eşîra (modikan),

piştî bajar hate vegirtin (melik ahmed paşa) ên dil girtî wek kerîyên pez li gastîna¹⁾ nav bajêr dikuştin biwê kuştariyê (12) hezar kes liwê gastînê hatin kuştin, çewa ku tevaya imamên mizgeftan jî kuştin, ji wan alimek zêde bilind û alî cenab anîn ku bikujin, min xwe avête serwî û got: heya ez neyê kuştin ev alim nayê kuştin, lê paşa bi milê min girt û bi hêrs got: çelebî ev ne şuxulê teye, ewjî kuştin kuştina wî alimi zêde ez êşandim²⁾,

ji wê dest pêkê heya pştî herba (çildêran) wê peyman³⁾ mela idrîsê bedlîsî - yanî heya 1846 emaretên kurd biwê kuştariya yekber hatin rakirin, belê wan sultanên ku li ser behrê nimêj dikirin biwan felaketan rakirin, ji kuştina sed hezaran pêve gund û bajarjî tevde talan û wêran kirin, diwan giriftari û felaketên kurd de ew şêx û mela bi wan re hevparbûn,

PIŞTÎ RAKIRINA EMARETAN PÊK HATINA NÎZAMÊN EŞÎRÎ Û PAŞAN:

BIWÊ rakirina emaretan dewleta usmanî nikaribûn kurd bixe

1 - gastîn (sahe)

2 - belê em kurd her û her bi dîn hatine xapandin

3 - peyman (ku mela idrîs jî binavê dîn û gihîştina bihuştê miletê xwe di herba çildêran de dane kuştin)

bin sîdariya xwe, jibr ku her eşîrek wek emaretek di berevaniya welat de liber usmaniyan radibûn ne dihêştin ku istiqalala wana daxilî û qewmî vegirin, jiber ku turk ji wan re unsurek xerîb bûn, dewleta usmanî ji awan bi awakî nikaribûn di warên îdarî û leşkerî de derbazî erdê kurdistan bibin, ji hîlebaziyek pêve rê nebûn, biwê daxwaza melenet bi awayê jêr emelî dane vekirin wek:

Ji hin malmezînan beg û efendiyên bajarên payedariyên (paşa) ti dane wan, li - erzerom ziya paşa - yûsif paşa - li, diyarbakir - cemil paşa - li, siwêrek - cûdî paşa - li, wêran şehir - ibrahîm paşa - li ruha - evdurehman paşa - li hezro - seyfedîn paşa - H.D. biwan paşan û di rix wande hin şêx û melan - binavê dîn û - xelîfe - ê dînê islamê di /1362/ de hêdî hêdî nêzîgî liwan hêzên cengawirên eşîran û serekên wan kirin, ew têkilîya gotî bi navê dîn awakî rotinî bûn, wek:

BIWÊ dekarîya gotî ew ger û govenda wan - paşa, şêx û melan - pêderpê li nav eşayîran digeriyan dibûn mêvanên serekên eşîran, şêx û mela bi (Ayetên quranî û hedîsên nebewî) paşa bi canbazî bidor wan axtayên eşîran ketin, bi zemanek dirêj û gerek pir qanî kirin ku tu leşker û serkarên turk nayên welatê me, di warî gerandina karê welatde wê walî, qaîmmeqam, mudîr û tevaya serkar û karmendan⁽¹⁾ jime bin, em tu salyanan⁽²⁾ jî nadin, di warê leşkerî de em tu esker nadin dewleta usmanî, her eşîrek binavê (MILÎŞYA) qumandanê wan serekê eşîra wan bêne sazîkirin û di malên xwede bi karên xwe bendewar bin, roja ku herbek diwêlî hin dewletên ne misilman dirêjî dewleta (usmanî xelîfe - ê islamê) bikin, hingê ew hêzên milîşya wê di gazîya (sultan) de herin, yanî

1 - karmende (muwezîf)

2 - salyan (wergû-rusûmat)

di nav mede federaliyek binavê biratîya dîne ne zêde, belê heya cenga cihanê a pêşîn jî heval bendîya usmanî û kurd biwê federalîya jor gotibûn,

DIWÊ sazmana federalî de pêk hatina zemîndaran³⁾, her wekî liyor hate gotin: wan walîyên bajaran, qaîmmeqam û paşan, li deverên deşt nêzîgên bajaran dest bi ava kirina gundan, ji cotkar, pale û karkeran re dibûn alîkar jibo ava kirina gundan, piştî gund dihatin ava kirin liser navê xwe tapû dikirin, ew gundî tevde bê erd an dibûn milêba ên dîtir heqê erd didane wan, belê di wir de bûn xûnmijên milletê xwe, wek: kûçîkê şivan û gur bi hev re bibin hevpar, ew kurdên belengaz biwan zincîrên wan zemîndaran û şêx û melan bi zemanek dirêj hatin girêdan, ji milê dijî ew bûn rihberên turk kişandin kurdistan û milletê xwe xistin bin sîdarîya wan, nemaze piştî ku emaretê (BEDIRXAN PAŞA LI CIZÎRA BOTAN DI /1846/) emaretê dawîn bûn, hingê dîsa bi alîkariya wan paşa ên ajanên sultan, li hin bajarên wek (Erzerom, Diyarbekir û wan) wargehên leşkerên usmanî hatin çêkirin lê nikaribûn têkilî bi hêzên eşîrî bikin,

DI WAN ZEMANAN DE NÎZAMÊN EŞAYIRÎ:

Diwan hêzên eşayîrî de jî - beg û paşa - hebûn, ew begîti û paşatîya wan ne ew payedarî usmanî lê binavê millet ew payedarî girtibûn ên wek QULÎXAN PAŞA Ê ZIRIKÎ. HUSEYIN PAŞA Ê HEYDERÎ. FETULAH BEGÊ HESENÎ. EVDUL MECID BEGÊ SIPIKÎ û weke van, xwediyên hêzên cengawir bûn, tevî ku ev û ew paşa û begên bajaran tevde kurd bûn, lê bi her awayî jî

3 - zemîndar (melak)

hev cudabûn, ew bi hirsê qewmî teqalid û adatên kurd ve perwerde kirî, û di berevanîya kurd de armancdar bûn, çewa ku ne zemîndar bûn, wan rê nedane turk ku istiqalala wana daxilî ji ihtilal bikin, lê ew paşa û begên bajaran tevde pêgirtîyên sulatan û di teqalîdên usmanîyan de reng girtibûn, di her awayên nejadî teqlîdî û civatîde jî ji ronîştmanên gund û eşayîran bê xeber û ji hev dûr bûn, çewa ku milletjî bi çavê turk liwan dinêrîn, tu hêzên wan ji millet tunebûn ew bi xwe jî nikaribûn li çîyan bigerin an şevêk tarî ji derve bimînin ji hilanîna sileh û cengdarî yekcar bê par û paşmende bûn, belê jiber wê çendê ji destpêka qirnê (19) ve jibona girtina mafê xwe kurd pêderpê bi şoreşên xûndar ve li hember welat vegertî û turkên sitemkar rabûne têde mal û candanîne ew mezin û dewlemendên bajaran bi milletê xwere nebûne hevpar, her û her wek bizina ji tirsan bi gurra bibeze xwe dane bin siya dijmin, her û her ew mezinên derê bajaran û serekên eşayîrên cengawir bi fedakarî bi şoreşan ve rabûne û gavdane meydana tarîxê, belê her kurd dizane û nayê inkar kirin ku ne ji wan nîzamên eşayîrî bûna, wê turk istiqalala meya daxilî û hirsê qewmî jî ji navme bidana rakirin, çewa ku niho hin xortên me bi aydiyolojiyên felsefan dixwazin fikrîyen kurd ji armanca wana niştîman perwerî wek: madekî kimyayî wergerînin, bê ku zanibin liser rêya girtina mafê siyasî û qewmîne an ava rê bûne, ji wan aîyên eşîran pêve hin ronak⁽¹⁾ û şêxên dînî jî fermendariyên şoreşan bi dest xwe girtine, bi fedakirina mal û can gav dane meydana tarîxê, jiber ku li nav millet û hirsê wanê nejadîde hatine perwerde kirin, ew armanca niştîman perwerî ji bawermendîya dînî li ba wan zêdetir bûye, ji milê dî wan naskiriye ku milletê ku huqûqê

1 - ronak (munewer)

xwe ê siyasî bi dest nexê, nikare dîn, namûs û şerefa xwe û milletjî biparêze, biwê agahiya bilind jiwê meznatîya xûn mijandina millet derketine nav komên gundî û karkerên millet xwe bi wan re feda kirine, piştî wê ixlasa niştemanî em hêj wê leqeba wan ji wan re bikin kêmanî? hingê em wê kêmanîya wicdan û bê exlaqî qebûl dikn, ne ew,

DIWAN SALIXÊN JOR GOTÎ DE HIN AXA, BEG Û ŞÊX :

1 - ji bêşên paşa ên kurdên derî bajaran ên wek: Bedirxan paşa - Evdurehman paşa - ê baban - Mehmed paşa - ê rewandizî - brahîm paşa - ê milî şerîf paşa - mustefa paşa yamelkî - seyfedîn paşa ê zirikî -

2 - ji began: Elişan begê koçkerî xalid begê cibirî - hesen xeyrî beg ê dersimî - duktur fuad beg - Heqî begê licî - mustefa û salih begên hênê - sadiq begê madragî mehmed begê xeribî - ibrahîm beg û hesoyê télî ji ararat - ihsan nûrî - celadet, kamîran, sureya beg kurên bedirxan paşa - qedrî beg - ekrem beg cemîl paşa - memduh beg wanî - emîn zekî beg mêjevan - evdurezaq beg bedirxanî -

3 - ji şêxan: şêx ahmedê xanî - şêx ubeeydulahê nehrî, kurê wî evdulqadir - şêx şehabedîn û şêx elî - şêx mehmedê berzencî, şêx ahmedê berzanî - şêx seîd û şêx evdurehîm, buhadîn û diyaedîn - şêx adem ji hênê - şêx eyûb, şêx riza dersimî - qazî muhemed serek komel - şêx şemsedîn şêx fexrî, çar ji şêxên çanê - û wekevan,

4 - ji bêşên ronakan: mearuf ciyaok - xelîfe selîm, xelîl xiyalî - hemze efendî muksî, teyîb alî, fehmî Efdndî licî - kemal fewzî,

kor seidî, emîn birûsk - evdurehîmzabsû - re{îq hilmî, - mehmed
elî ewnî - reşîd kurd, osman sebrî, duktur belic şêrgo - saleh yûs-
ifi - ihsan şêrzad - mustefa remzî - ziya şerefxan - evdulsemed û
evdulsetar awşar - beytar nûrî, duktur nûredîn - îsmet şerîf, elî
seydo, gewranî - mehmed emîn gewreşêr - reşo zilân - ahmed
ramiz - û weke van gelekên ditir,

5 - bêşên şueran: - ahmedê cizîrî - feqîyê teyra - a{xokê bêdarî -
ahmedê batî - ziya paşa ê erzerumî - bêkes - evdula goran - ceger-
xûn - tîrêj - beşîr ê şebek - mela ahmedê palo mela nûrî ê hesarî,
wekevan,

6 - ji a{xayên xwedî hêzên⁽¹⁾ cengawir⁽²⁾: - simiko, cewer a{xa - esed
xuşewî - ebas mamend - sadiqê biro - silêman û rşîd sindî - emerê
faro - selîm a{xayê ziktî - heyderê emerê sadiq, yusif a{xayê dara
yeni - mehmed a{xayê xelilê xeto - ferzende - ê hesenî - keremê
qola{xasî - farisê şemê heyân - yusif a{xayê kose - feteh û reşîd
a{xayên têrkan, huseyin a{xayê şelê - evdurehman û mehmed a{xa
ên qewmê çiya - evdurehman a{xayê şernex, emerê temir, emer
a{xayê hesik - haco a{xa ê hevêrkî - yaqûb a{xayê eroh - xelilê simê -
hesen keyayê celik - ahmed keyayê serdî, mehmed keyayê feyi-
ter - mehmedê diyab - mehmed a{xayê kelê - vana tevan bi mal û
can meruv û hêzdarîyên xwe ve ji bona milletê xwe feda kirine,
dema ku em wek awirên partîyên komonîst binavên tebeqan millet
jihev bikin bir û bêş, vaye wan şeş bêş - ên millet bihev ketine
berevanîya mafê xwe, hêj bi wan re pale û cotkar hene, belê pale,
cotkar û karker giranî û pîranîyê bixwe digrin, lê ew giranî bê
pêşeng û zanan nikarin gav bidin wê meydana berevanîya mafê
xwe, ji milê dî çî militê ku huqûqê xweyê siyasî bi dest nexe

1 - hêz (quweşîr.cengawir (herbçiyên qehreman)

nikare binavê tebeqan wê yekîtiya welatîyan jihevxe hingê ew xizmetê ji welat vegirtiyên xwere dikin ne ji miletre! anjî siyasetek diwêlî ew def'î wê newala qîtranê dane bê ku zanibin destê siyasî çîye? û siyaseta û daxwazên jiyopolitikî çîye? ew kesên wan pîlanan nizanibin û ne xwazin ku zanibin, ew kes jiwan welat vegirtiyên bi gelek diwartirin, lewre ew welat vegirtî bi navê sitemkrî têne naskirin, lê ewên ku bi daxwazên hin siyasetên diwêlîve di xwazin miletê xwe jiwê hêzdarîya berevanî bixin, ew bi kirasek reş dîkevin ber mehkema tarîxê!.....

DIWÊ SITEM Û DÛJEHA USMAÎYAN DE ŞOREŞÊN KURD:

BELÊ doz yek û sitemkarjî her yek bûn, lê di zeman û meknan de her şoreşek bi fermade - ên⁽¹⁾ xwe ve ji hev cuda bûne, jiber wan zeman û mekan û navên wan, me dijêrde ew şoreş bi sê biran dewran ve lêkve (2) kirine, her wekî bi jimarê lijêr têne derpêş kirin:

1 - di /1785/ de li başûr⁽²⁾ roj helatê (Melatîya) (eşîra cihan begî) lihember dewleta - usmanî bi şoreşê ve rabûne, di cengdarîyek dirêj de ji fermade - ên şoreşê civîn xwestine û ew di civînê de girtine, ew eşîr nefiyê anedolê kirine, çend sal di konan de mane dîtin ku venagerin, jihevve gotin: em heyman divê em gundan ava bikin, jiber wê çendê navê wî ciyî ma (Heyman),

2 - di /1794/ de li bakurê (Amed) eşîrên (zirik û têrkan) liber usmanî rabûn, giranî û xisara wê şoreşê girantir bûn, her çendê

1 - fermade (qumandanê şoreşê)

2 - başûr (cenûb)

- salan dirêj kir jî lê dawî biwan canbazîyên ajanên sultan keys liwan anin bi kewt û komên mezin nefîyê (qonye kirin),
- 3 - di /1789/ li navbera (Amed û sêrtê) eşîrên (reşkot û xerzan) bi serekîyên (ferhoyê uzêr axa û qasimê xerzi) liber usmanîyên faşist bi şoreşê ve rabûn, (qasim) di meydana şerde hate kuştin, lê bihinên bêbext (ferho) girtin (li diyar bekir) li qazûx dan,
- 4 - di /1754/ de şoreşa (evdalxanê bedlîsi) ku di jorde hate gotin,
- 5 - di /1806/ de şoreşa evdurehman paşa ê baban li silêmanîyê,
- 6 - di /1811/ de dîsa li (silêmanîyê) şoreşa (ahmed paşa baban) lihem-ber Qsmanîyên sitemkarên heq nenas,
- 7 - di /1819/ de li heremê (sêwasê) li hember turk bi şoreşê ve rabûne,
- 8 - di /1834/ de şoreşa (mehmed paşa ê rewandoz) ku (reşîd paşa ê turk) bi daxwaz û bextê (sultan) ew şande (sitenbol) jibo hîle bazîyek bê exlaqî (sultan) ew vegerand lê digelîyê (Terebzûn) da kuştin,
- 9 - di /1846/ de (Bedirxan paşa emîrê Botan) ku emaretê dawîn bûn, bi xiyaneta pismamê wî (ezdîn şêr) bi (I2) de serekên eşîran ve nefî kirin (sitenbol) dawî jiwir birin (girît), ji wir jî (Bedirxan) birine (şam) di /1848/ de li wir mir, lê ji wan donzide axan tenê (silêmanê - ferho mezinê harûnan) ji (girava girît)³⁾ bi geşteki⁴⁾ yûnan revîya giya welat, lê her yanzide - ên dî diwê giravê de mirin,
- 10 - di /1843/ de şoreşa kurdên çiyayê şengal, diwê şoreşê de binavê yezîdiyan turk ser û ber kurdên wî çiyayî kuştin,
- 11 - piştî wê xiyanetê di /1853/ de şoreşa (ezdîn şêr) pênc caran li (wanê) çûye (qonsilîya) rûsya destê alikerî nedane wî,

3 - girav (cizîr)

4 - geşte (gemî)

12 - di /1870 - 1882/ şoreşa (ubeydulahê nenrî), vê şoreşa mezin li (kurdistana turkiye û îran) bergehê mezin dabûne berxwe, fermande ê şoreşê (ubeydulah) sê caran sînore qafqasya bi (generalê qeyser) re ji bo alîkarî ketiye civînê, lê dest nedane wî jî,

13 - di /1879/ de şoreşa (huseyin kenan Bedirxani) li welatê Botan,

ŞOREŞÊN DEWRA DIDÛYAN:

1 - Di /1905/ de şoreşa cengawirên kurdên (celalî) li hember (murad paşa) ê turk, wî murad paşa ê faşîst jin û zarûkên kurd dikuştin davêtin (bîran) lew jê re (quyuci murad paşa) gotin,

2 - Di /1907/ de şoreşa mezin ji mosil, bedlîs heya Erzerum - tev de bi şoreşê ve rabûbûn,

3 - Di /1912/ de şoreşa (mela Evdulselam Berzani) birayê (general Berzanî) li kurdistana îraqê, /1914/ de ji kurdên xayîn (silêman nesif)ew û çend hevalên wî li Mosil îdam kirin, di /1913/ de (mela Evdu Iselam û Evdurezaq beg Bedirxani) çûne (Teflîs) qeyser destê alî kariyê neda wan, (Evdulslam) vegriya (Evdurezaq beg) liwir ma,

4 - Di /1911/ de şoreşa (ibrahîm paşa ê millî li wêran - şehir),

5 - Di /1913/ de li heremê li nahya (Hîzan) şoreşa (mala xewis bi fermana (şêx eli. şehabedîn û xelîfe selim),

6 - ji /1919 - 1930/ şoreşa (şêx mehmûd berzencî) li hember ingilîzê sitemkar. ew ji ji (silêmanî) bi siwarî di /1923/ de çû

(Tebrîz) ji bona destê alîkarî bi (lenîn) re da û send wî jî dest neda wî.

7 - Ji /1921 - 1930/ li îran teşkîlata hukumeta (Simiko) ê şikakî.

8 - Di /1918/ de birayê (simiko, cewer axa) bi şoreşê ve rabû, şah ew xweste civîna (Tebrîz) ê liwir kuşt,

9 - Ji /1931 - 1934/ şoreşa (şêx Ahmed Berzanî) li hember ingiliz li iraq) é,

10 - Ji /1925 - 1928/ şoreşa (şêx seîd) li hember Turkên kemalî, di warê, cugrafî beşerî û xisarên kuştari de ev şoreş zêde mezin bûn,

11 - Di /1923/ li hember wê sitemkariya (peymanî lozan) şoreşa (koçkerî bi femandariya (Elîşan beg),

12 - şoreşa Ararat di /1929 - 1931/ bi femandariya (general ihsan ûrî) û qumandanên wek :Ibrahîm beg, Hesoyê Têlî, Ferzende, Nadir Memo kurên husyîn paşa, qehremanên wek: seyîdxan û Elîcan,

13 - Di /1932/ de li kurdîstana îran şoreşa (cafir sultan) li hember(rîza şah) jî (hemedan heya kurmanşa),

14 - Di /1932/ de şoreşa çiyayê (meleto) bi fermana (Ev-durehman axa)

15 - Ji /1937 - 1938/ şoreşa Dêrsim bi fermana (seyîd rîza)

DEWRA SISÎYAN:

I - ji /1943 - 1945/ li kurdîstana başûr şoreş bi femandariya (general Mustefa Berzanî) hember ingilizên sitemkar é heq ne nas,

2 - ji /1946 - 1947/ diwê pêk hatina (CUMHURİYETA MEHABAD) de dîsa ew Berzanî ê qehreman di pêk hatinê û parêztina wê cumuhûriyetê de hevkar bûn, lê bi daxwazên dewletên şerq û xêrb di /1947/ de serek cumhûr (qazî Mehemed û wezîrên) xwe hatin îdam kurin,

3 - Di /1947/ de piştî îdama serek cumhûr (Berzanî) bi şoreşgîrên xwe ve di şerê hukumeta îran de man, dawî ji wir daketin îraqê lê ingilîz zêde liwan welat teng kiribûn, ji (Turk) heqê lacîtî xwest nedan bi (530) şoreşgîran ve bi peyatî û dinav şerê îran û Turk re derbazî rûsya bûn, heya / 1958/ paşê vegeriya îraqê,

4 - di /1956/ şoreşa (kurdên ciwanrû li îran bi fermana Ezîz beg) diwê şoreşê de me li sûrî û (kamîran beg) li (parîs) di rûyê şah de binavê (jenoist) protisto dane bela kirin,

5 - ji /1961 - 1970/ dîsa - general Berzanî - bi doza mafê kurd ve bişoreşek zêde xûndar ve rabû, herçendî (rûsya) ji îraqê re bi her awayî destegîr û peştegîr bûn jî, dîsa li hember cengawirên kurd çok da, çar neçar biryar bi dayîna hukmê otonomî ji kurd re dan,

6 - Di /1974/ de ku hukumeta baîs ew biryar bicî ne anîn dîsa şoreşê dest pêkir ji şoreşa berê bi gelek mezintir, lewre (rûsya) ji berê zêdetir bi her sîlehên giran ji hukumeta baîs re bû alîkar, ji firendeyên - még 23 - péve firinde - én (soxo û bajir) jî dane wan (3500) xubera, fenî û muhendîsên rûsya ketin nav leşkerên îraqê, pévî wê jî ji /1974 - 1975/ di nav salek de (60) hezar seşkerên îraqê birîndar û kuştî çê bûn, lê mexabin wî ewrê selbîyeta (kampoçya) birûsk li enîya

şoreşê veda, peymanên (sento, nato û siyato) gef li (Berzani) xwarin û gotin: eger şoreş nesekine emê jî li wedin, bi wê siyaseta diwêlî di /13 ADAR 1975/ agirê şoreşê vemirî!....

7 - Diwê sekna şoreşê de şoreşgîr tevde derbazî (îran) bûn, di nav zemanek kin de di /26 GULAN 1976/ de dîsa şoreşgîr bi fermana (Mesûd kurê Berzani) vegeyriyan îraqê, heya van nivîsarên /1982/ şoreş li kare,

8 - Di /1979/ de ku şah ji îran derket û (cumhûriyeta islamiya xumeynî) pêkhat, kurdên îran mafê otonomî xwestin, nedane wan, partiya (duktor Evdurehman qasimlo) bi şorişê ve rabû, ew jî likare, heya van nivîsaran, dawî çî dibe hukmê zeman dizane,

Bivê danezana tarîxa şoreşên ku ji me re naskirî ji /1785 - 1982/ ku dike /179/ dinav vî zemanî de (36) şoreşên zêde xûndar û maldar ji wêran kirina welat kuştariyên tevayî zindan û nefiyên pêve pêra me di jiyindariya cihan de nebûye, tevaya wan şoreşan di istiratîjîyên cugrafi û nav mesalihên diwêlî de heq bi dest nexistine, ji ber ku zemîne kurdistan di navbera qafqasya û derya sipî û xelîc de buye gehînek⁽¹⁾ çewa ku di navbera (awirpa û hindê) de jî ew gehîneka bazirganî siyasî û eskeriye, çî dema kurd bi doza xwe ve rabûne, eger ji leşkergehên roj helat an roj ava, destek polotikî bidizî dibin ebayê re bidin kurd ê dîtir dijê me radibe, kesek naxawaze ew istiratîjîya welatê me bikeve dest ê dîtir. herdû alî jî ne

1 - gehînek (muwaselat)

şirkete ku bi hev re vekin, miletê kurd dinav wan pêlên behra siyasetên diwêlî de ser û bin dibe, her wê di tarîxa kurd a min nivîsî di cildê (5) de jivê rohnîtir agahî bi dest dikevin,

LIGOR TEQALÎDÊN KURD JI WAN SEREK AN FERMANDE ÊN ŞOREŞGÎRAN RE HIN SÎFET Û SILÛK HEBÛN WEK:

Belê wek é ku bikeve xwendegahek cengdarî ku jê re hin sifet hene wiha renga mezinê eşîrê an pêşengên welat ku dikarin femandariya şoreşek bikin, divabû di weş⁽²⁾ û salixên jêr de be:

- 1 - Divabû ew serek an pêşeng ji malbatek serek bûna, ku ji bavê xwe hîne gerandina dayîn û sendin û her divayên wê eşîrê ligor nefsiyet û teqalîdên wan zanebe,
- 2 - Bi bejin û qiyafetê xwe jî meruvek ber çav be,
- 3 - Divabû di dayîne de ji her kesên eşîrê zêdetir comerd be,
- 4 - Wiha renga di hilanîna sîleh sekmanî û mérxasî de jî deng pêketîbe, di hin şeran de navdarî girtî be,
- 5 - ji alî namûsê de divabû meruvek daw paqij be, lewre dema pîrek diketin ber zayîndê serê doxîna wan li avê didan û vedixwarin,
- 6 - Divabû umrê wî ne kémî çil salî be,

2 - weş (sîfet)

7 - Diva bû bi zanîna xwe ji di nav wê eşîrê de tek û bijarek be,

8 - çî doz û dawayên ku di nav ronîştmanan de çê dibûn, ew ber pîrsiyar bûn ku bê meyildarî wan bigîne hev,

9 - Bi navê ode an diwan wargeh û mévan xanekî wî meziné eşîrê hebû, ji mévanén xerib péve, tevaya gundiyan her évaran diçûne wê diwanê, ku diwan ji wan re wek bangeh⁽³⁾ an meclisek şewirdarî bûn liwir ji hevûdû her agahiyên abûrî civatî û nûçe⁽⁴⁾ én der digirtin, çewa ku dozén wan jî liwir dihatin safî kirin,

JI WAN SAZMANÊN EŞÎRÎ GAVDANA SAZMANÊN SIYASÎ:

Her wekî zeman pêkîne⁽¹⁾ tetewire, ji nîveka qirné noz-dean ve ji xwendinén dînî péve dewleta Osmanî gav dabûne xendina esrî, kurdén bajaran én serkar û karmendan⁽²⁾ zerukén didan xwendin, nemaze én wan beg, paşa, zemîndar⁽³⁾ û sermayedaran⁽⁴⁾ digiyan xendegahên sitenbol û hin ji wan giyane zanîn gehén awirpa, di agahiyén tîvel⁽⁵⁾ dîplom digirtin, çewa ku di bêşên leşkerî de jî hin general û qumanda-

3 - bangeh (naqı - qulûb)

4 - nûçe (hewadis) •

1 - pêk-in (ê çêkirî - pakani)

2 - karmende (muwezif)

3 - zemîndar (melak)

4 - sermayedar (hirjiwazî)

5 - tîvel (muxtelif)

nén kurd di orduya Osmanî de hebûn, wan xwendayén gotî bi hirsén xwe yén qewmî awirén zanistî û siyasî li xwe û milleté xwe é bindest vedan, di wan aweran de li hember millet û tarîxê xwe ber pirsîyar⁽⁶⁾ dîtin, di dest pêkê de wan ronakan⁽⁷⁾ li sitenbol bi peyayén jér sazman dane girédan, ku ew xebatkar û sazman lijér téne derpêş kirin:

EW RONAKÊN SIYASÎ EV BÛNE:

- 1 - xelil xiyalî efendî - ji hawîré (Bedlisé modikî) bû,
- 2 - Evdulqadir Efendî , kuré (ubeydulahé nehrî) ékû navé wî derbaz bû
- 3 - Emîn alî - kuré Bedirxan paşa bavé celadet û kamîran beg
- 4 - teqaîd - ferîq hemdî paşa - generalé eskerî bû,
- 5 - duktur profisor Evdula cewdet ji Erebkéré bû,
- 6 - Ekrem beg û qedrî beg cemîl paşa - ji diyarbekir bû,
- 7 - Memduh selim beg ji wan é bûn,
- 8 - celadet beg, kuré Emîn alî Bedirxan bû,
- 9 - Hemze efendî - ji muksé bû,
- 10 - Bediûlzeman (mele seîdé meşhûr) ji norsé - bû,
- 11 - general şerîf ji kurdén silémanî yé,
- 12 - ferîq mustefa ya melkî , ji kurdén (silémanî) yé ,
- 13 - kemal feyzî - ji qeza erxênî - bakuré diyarbekir - bû,
- 14 - kor seidî - ji - palo - bûn,

6 - ber-pirsîyar (mesûl)

7 - ronak (munewer)

15 - şex Mehmed şefiq efendî ji - arwas - bû,

16 - ji tucarén bilind - Fethula efendî,

17 - Alahî qumandané jandirman - Mehmed Eli beg,

Belé van û hin ronakén dîtir li bajaré sitinbol di /1908/ de binavén sazmanén jér di xebata mafé kurd de gav dane mesreha tarîxé,

A - Di /1908/ wé qumîta merkezî binavé (KURD TEALÎ TEREQÎ) sazman dane çekirin, ligor zeman û mekan di warén siyasî de xebitîne,

B - Di /1912/ bi hin awirén siyasî ew xebatkar bûne du bir, ku di wî birî de (Emîn alî Bedirxanî) hebû, wan jî binavé (teşkilati ictimai) dan sazkin, wan jî ligor pékarînén xwe xebitîne gav dane tarîxé,

C - di /1918/ de ji wan ronakén gotî biré sisiyan bi navé (HÊVÎ) sazmanek dî dane çekirin, ji xebatén siyasî pève dest bi zanistî ya edeba kurd kirin, di zemanê (kurd tealî) de jî kovarek binavé (ictihad) dihat belakirin, lé vé sazmané di wî warî de béhtir gavidan, binavé (jiyîn) dest bi çapa kitêban kirin wek MEM Û ZÎN. DÎWANÊN CIZÎRÎ Û FEQÎYÊ TEYRAN. MEWLUDA KURMANCÎ - û kitêbén dîtir dane çapkirin, di rix wan xebatén nişteman perwerî de roznamikî binavé ROJA KURD JIYÎNA KURDISTAN der dixistin, ev tipén me én latîni jî wan di /1922/ de pé rportaj girtin, di /1930/ CELADET BEG/ li sûrî ev alafaba çekir û pé kovar û rozname hatin çapkirin û belakirin,

DI/1923/ de yanî piştî ku di (peymana lozan) a çepel de heqé kurd dan bin ligan, hingé wan sazmanén sitenbolé xwestin wargehén xzbatê bixin erdé kurdistan nav hézdarîya

mî let, biwé daxwazé (evdulqadir efendî) liba (fethula efendî kurê şex seîd, elî riza) dît û jêre got ji bavé xwere béje: livir réya xebaté nema bila bi hin neşteman perwerén paqij û fedakar sazmanek xebaté bidin çêkirin, (şex seîd) bi wé daxwazé (lîwa xalîd begé cibîrî) bijart, di /1923/ li (Erzerum) bi navé (berevaniya mafé kurd) ji ronak û qumandanén milişya sazman hate girédan, wé sazmané di /1925/ şoreşa(şex seîd) pék aniye ku di birén pêş de wé bé rohnî kirin,

KURTÎYA TÊDE ÊN BIRÊ JOR:

Berî her tiştî divê muerix exlaq û mintiqa edeba tarîxé zanibe û biparêze lewre tarîx jikom û kewte - ên miletek û welaté wan salix vedide, naskirina wan salixén tarîxî jiyogirafî û jêderiya⁽¹⁾ wî nejadî bi awakî rast û durust nivîsandin ne tişteke piçûk û hêsane, lewre divê di her warén tîvel de her tevger, serpêhatiyén wanén zemanén bûriyén dûr navî

nêzîk bidî zanîn, jiber ku tevde bi wan û wî zemîna welaté wan ve girêdayîne, ku ew bingeh bi awayén jêr tene rohnîkirin û derpêş kirin wek:

- 1 - Bi hindikî naskirina etnogirafya wana nejadî tarîxî jiyîndariya wana tede, jiyogirafya wana fizikî û felekî zanibe,
- 2 - Rewşa wana civatî, abûrî, zanistî, siyasî û merhele ên zemanén bûrî û tede çibûne û çine??
- 3 - Eshabén giriftariyén wan diwan dewrén bûrî û niho de çibûne û çine,?

4 - Exlaq adet teqalîd xesaîs û seyκλοjiya wan çîye? divê zanibe,

5 - Her hereketên wanên siyasî bi wan zemanên wan ve ne bi zemanê îro ve hember û mîsal bike,

6 - Diwarek arkeolojî⁽¹⁾ de bi hezaretên pêşiyên wan zanibe û salixa jê bide, eger ew asar pére hebin héj çétir re,

7 - Dema hin muerixên dî wê tarîxê wergerînin zimanek dîtir, ligor daxwazên xwe an siyaseta zeman û mekan reş û sipî bihev neguhê re, bedkarî û bed exlaqîyek mezin e,

Belê ew kesên bi wan heft bingehên jor gotî agahdar û biparêze hingê ew danezanên nivîsarê ji xebatek insanî exlaqî péve, waznek zanistî edebî û mentiqê bi xwe digre û ronahî dide zatê wî nivîsevanî bi xwe ku jêre muerix té gotin,

Lê sed mexabin⁽²⁾, gelek muerixan bi awirên xwar nivîsandinên xwar û xwendina xwar awirên xwar li mesele kurd û kurdistan vedane û vedidin, çewa ku hin méjewanên biyanî û uryantalîstên⁽³⁾ ku di zeman û mekanaan der derbazî zemîné kurdistan bûne, wan jî ji awan bi awakî ew bingehên jor gotî ne paraztine, ligor hin îstiratîjîyên dewletên xwe di mentiqê de, wan jî bé şerim û fedî perdekî reş dane ser rastiye nixmandine, hinan jî agahîyên xwe ji hin serkar û karmende ên wan dewletên kurdistan vegirtî girtine û nivîsîne, belê lipê wan çûne di newalên qitrana reş werbûne, bé ku nasbikin ku wan muerixên roj helatê navîn bi xesaîsê xwe é bed exlaqî alfabaya rastî ne xwendine, ji unsuriyetê péve, inkara (30) milyon kurd di xerîtekî (650) hezar kilometir

1 - jêderî (kok û menşea wana pêşîn)

erdé kurdistan de dikin û dibéjin ev nejad nine,

jê û pêve li kevne bajar û kelehên kurdistan de çi asarên dibînin werdigerînin navên xwe û di mêzexanan de didin derpêşkirin gelek ji ulemayên arkeolojî diwêlî jî wek danezanên wan bed karan pirîcar bawer jî dikin, bê ku wan asaran bi zemanê wan nejadan ve hember bikin, ji vére mîsal her wekî:

- Her muerix û zana én arkeolojî dizanin ku pêşiyên kurd (kasî) yan /740/ sal li babil hukumranî kirine, çi asarên ku li wan nevçeyan çi asarên béne dîtin dibéjin én (aşûr û kild) de çima ku ew asar bi tîpên mismarî nivîsîne, gelo ew zana én asaran nizanin ku diwan zemanên gotî de tevaya nejadên asya biwan tîpên bismarî dinivîsin ku tîpên nejadé (sumur) in.

BIRÊ SISIYAN

CENGA CÎHANÊ LI ERDÊ KURDISTANÊ LEŞKERÊN MILÎŞYA ÊN KURD LI MEYDANÊ

Her wekî li rûpela (123) de hatiye gotin: ku piştî rakirina emeretan jî nikaribûn bi awakî resmî raserî kurd bibe, an jî wan leşker bigre tenê eşayîrên kurd bi navê milişya biryar dan ku di cengên diwêli de wê ji dewleta osmanî û paraztina welatê xwe de bibin pardar, lê wan hêzên eşayîrî her yek jî wan weke wan emaretan di berevanîyê de rê ne didan ku osmanî istiqlala wana daxilî û nejadî jî nav wan rake, tevî ku piştî herba - çildêran - ku (11) salan sultan selîm di şerê emaretan de berdewam bûn, di wî şerê emaretan de dewleta osmanî xisarên zêde mezin danîn jî nikaribû wan emaretan bide rakirin, ji hin esbabên jêr péve ew firset dane dijmin:

1 - Esbab û hêzdariya yekemîn ew bûn ku dema dewleta osmanî top bi dest xistin, bi wan topan bajar û kelehên wan emaretan kirin amanc⁽¹⁾, piştî wêran kirinê ew keleh û bajar vegirtin,

2 - seylojî û xud - bînîya wan serekên eşîran nikaribûn meznatiya hev li ser xwe qebûl bikin da ku di berevanîyê de di nav wan de yekîti çêbe, ew xudbînîya ku ew xistine van

1 - amac (nişan)•

giriştariyan heya niho jî wek siya wan bi wan re digere û ji wan dûr nakeve!.... bi wê ne yekîtiyê di /1105/ koçê⁽²⁾ de (hezretî Ahmedê xanî) keser vedaye û gotiye

- gerdê hebûya me ittîfaqek, fikir bikira yek inqiyadek
- tekmiîl dikir me dîn û dewlet, tehsîl dikir me ilim û hikmet
- temîz dibûn ji hev muqalat, em jî dibûn xwedî kemalat,
- Turk û Ereb û Ecem temami, hemiyan ji me re dikir xulamî,

- lé çibkim qewî kesadê⁽³⁾, bazar nîne ji qumaş re xerîdar⁽⁴⁾,
3 - nezanê ku nizanibû nezan e, wê miletê xwe bifroşe bi erzan e, ev gunahkarê ber mehkema tarîxê (mela idrisê bedlîsî) ye, ku ji bona mezhebên (sine û şîe) leşkerê Turk kişande erdê welat û miletê xwe di qesabxana (çildêran) de da kuştin û miletê xwe jî xiste bin wê sîdariya Turkên mengol .

Belê, ji bawer mendiya dînê islamê û xelafetiya (sultan) péve esbabên vegirtina kurd û kurdistan ev bûn lé tevî wî qasî jî heya piştî hersî şoreşên (şêx seîd, Ararat û Dêrsim) jî cumhûriyeta kemalistî bi awakî resmî kurd ne xistibûn bin sîdariya xwe, ji ber hin esbabên gotî: Turk ji awan bi awakî nikaribûn bi awakî resmî kurdistanê vegirin, her wekî:

1 - Her wekî li jor hate zanîn ku kurd di nîzamek eşîrî de perwerdekirî, jiyogirafya zemîne kurdistan ji tevde gêlî gaz û çiyayên daristan, li tevaya kurdistan réyek çixir⁽¹⁾ tunebûn,

2 - koç (hicri)-

3 - kesad (bazara sar)-

4 - xerîdar (muştêrî) •

1 - çixir (réyên şûse) •



roniştmanên wan çiyar bi fizikiya zemînê xwe ve cengawir û di sîleh şorîyê de sekman bûn, dema leşkerên turk diketin nav wan çiyayên daristan tebîetê erd liber çavên wan dihatin guhartin, ji wan ne dîtî xuya dikirin, nikaribûn têde xwe bi parêzin, jiber wî çendî zêde ê taqeta Turk bûn ku karibe kurd ji wan hêzdariyan bixe,

2 - ji (îran) jî dipelandin⁽²⁾ ku kurd xwe bi îran bigrin an (şah) destê alîkariyê bide wan, ku hem nejadê wan bûn,

3 - çewa ku ew tirsar (rûsya jî di dilê wan de hebû ku kurd ji xwe zivêr⁽³⁾ bikin, hingê dibe ku alîkarî jî (rûsya) bixwazin ku hem sinorê erdê kurdistan bûn.

Belê bi dest xistina topan dewleta osmanî emaretên kurdane ra kirin, lê piştî cenga cihanê a diduyan bi firinde ên bumbaran dijwarî digiyandin şoreşgîran, yanî ji /1938/ ve Turk bi awakî resmî kurdistan vegirt lê nikare armanca wana nejadî vegire,

EW DÛJEHA CENGA CÎHANA PÊŞÎN LI ERDÊ KURDISTAN:

BELÊ, ew agirê wê dûjeha⁽⁴⁾ cenga cihanê pêşîn, bê daxwazek kurd li erdê kurdistan véket, çewa ku agahe li sinorê qafqasya navbera wilayeta qers û erzerum meydana herbê di /1914/ de ande hate vekirin, eger bi kuştina gule qasî

2 - dipelandin (hisab dikirin)

3 - zivêr (aciz)

4 - dûjeh (cehenem).

cenga cihana didûyan insan nehate kuştin, lé mirina nexweşî, birçîbûnî û muhacirî, ji cenga diduyan bi gelek mezin tîrbûn, ku ew felaket ronikirin divir de cî nagrin, nemaze ew çar wilayetên ku rûsya ji erdê kurdistanê vegirtin, ji ber (ermen) tevde muhacir bûn li der û kolanên xerîbîyê tevde mirin, heya niho jî ew valahî nehatîye dagirtin, ew felaketa ku bi daxwaza (qeyser û sultan reşad) pêk hat,

Di wê herbê de ew hêzên mezin ên milişya - ên kurd bi çekên xwe - ên teqlîdî di enîya deşta (parsîné) nav berfa du mitrê de şervanî bûn, tevî ku çekên wan ligor welat bûn jî dîsa ji serman dimirin, lé ew Ereben ku ji bin xetê istiwa bi wan çekên xirqeboş, li serên wan Egal û şalik wergirtî, bi siwariya hespan di nav wê berfa gotî û serma dereca sifir dibin (20) re têde wek: singan çikandî tevde dimirin, beku gule li wan keve, nikaribûn ji wan enîyên dûr birevin jî, qenebe kurd direviyan, ne tenê çekên eskerî ne didane wan lé xwarin ji bo nexweş û birindaran derman jî tune bûn¹⁾, çewa ku çadir jî ne didan wan leşkerên Erebe û milişya ên kurd, cebxane û giraniyên leşkerî jî bi devan dikişandin

1 - Di /1935/ li (şam - Emîr celadet Bedirxan) bi zimanê turkî bi navê mektûp ji mustefa kemal re nivîsî, ku kitêbek piçûk yek jêre ên ditir da belakirin, jêre dibêje: xazî paşa ji zemanek dûr ve hûn li mehya kurd digeriyan wek: di cenga cihane a pêşin de ez li sînorê qafqas mezil qerargêh qumandanî - hûm. enwer paşa - hate ba min û pîrsa leşker kir, min got: leşker ji serma bê xwarin û bê derman dimrin, enbar tije ne nadin wan - hingê bi hêrs got: turkên weke te dibin axê kevin. ma tu xete ra vî miletî kêmê rûsya dibîni? li ha wî ku ez turkim. deftera zibatan ji min xwest, disa bihêrs got: ev çîye te rutbe - ên - a,b,ce) daye kurd ereb û çerkez? nizanîm tu çewa gihayê vé payedariyê?

enya erzerum nav wê berfa pir, ku deve ji berfê ditirsîyan u lingên wan dişemitîn diketin erdê, ew leşkerên Ereba ên ku ji %10 nizanibûn sîleh çîye, çewa ku ji uslûbên cengdariyên diwêlî jî bê xeber, bê gule - ê rûsya tev de ji birçînan serma û nexweşîya - tifo, tifoît, kulêra - ketibûn nav leşkerê bê derman li eniyên şer dimirin, ji wê zîvarî û belengaziyê héj mezintir, ew muhacirên çar wilayetên kurdistan ku rûsya vegirtibûn, wek lehiyê ber bi başûr welatê me ve dihatin, dema hinan ew belengaz derbazî axurên xwe ên dewar û pez dikirin, zêde minetkar diman, lê ji birçînan ne tenê mirîşkên wê malê lê pisîk jî di xwarin, piştî herbê ji %10 vegeriyane welat, tevde mirin,

Di wî zemanî de umrê min li dor heft salî bûn, ên di umrê min de bi wan buyeran ne agahdar bûn, lê jiber ku gundê me li navbera (erzerum û diyarbekir) dinav rêde qûnax û li ba me ode hebûn min her tişt bi çavên xwe didîtîn, di wan çar salan de ez giyame umrê - 11 - 12 - salan,

Her wekî hatiye zanîn ku ligor teqalîdên me ên nejadî, li her gundî ê xwedî milk binavê (ode) mévan xanekî vedike, ji civîna gundîyan péve çî kesê nas ne nas lê dibe mévan, xwarin û razanekê bê heq û bê minet lê dimînin, bi wî taqalîdî oda bavê min hebûn, jiber wê çendê ew buyer û behis min dibihîstin û didîtîn, ji ber wan mévanên pir diya min zêde zehmet didît, dema xwe aciz dikirin bavê min lê didan, hingê em du bira û sé xwehên me em jî bi diya xwe re digirîyan, di wan salan de bavê min çû peyariya xuda, apê min ode vekir, diya min ji wê xizmeta mévanan kutah

bû, édî diya me ew mesrefta odé dikirin pere aewlemend bû,
jê re daxwaza yekemîn ew bûn ku min bide ber xwendina
(qurané) ku jé û péve xwendin li gund nebûn, daku réya dîn
nas bikim jibo roja paşdawî karibim wan ji bi xwe re ji wé
dûjeha reş rizgar bikim û bigînim buhuşta zer, ji wé dax-
wazé mezintir jé re nebûn, çewa ku di nav millet de ji
payedariyek mezin bûn, liba îmamé gund ez dame ber xwen-
diné,

Di wî zemanê ku hîtona agirê herbê zêde gerim, lé rewşa
dewleta (sultan reşad) diwarén siyasî, eskerî û abûrî de -
zêde ji hev ketî bûn, ew ne xweş û birîndar tevî én ji eniyén
şer direviyan, ji eniya (qafqas) heya (diyarbekir) zédeyê
(700) kilometir bi peyatî dihatin, birê de dimirin, guran ew
dixwarin an (Ermen) ew dikuştin, ji héz ketî tené çerim û
hestî mabûn, xwediyén wan ew nas ne dikirin, ji wan gun-
dikî me binavê (reşîdê ferho) ji wê eniya şer revîyayî hatibû,
hate hucra xwendina me ziyaretiya îmam, mela jé pirsî û
got:

- Bixér hatî çima ev çend ji héz ketiyî? wî got: ji ne miriyan
é qeñç ezim tu min dibînî, ji gundiyên me çi xeber? reşîd
got: min hayî jé nîne, tené - huseyné gulîzaré - li deşta par-
sîné em di çeperek de bûn, gule li eniya wî ket min xwe
avête ser û got: huseyin deng jé nehat herdû dîstén xwe
dane ser hev û giyan biderda, mele got: biwé qurana ku min
xwendiyê hingé wî (horî) hembéz kirin,

Ez timî direviyam ne diçûme ba melé, wé diya mina ew
çend bawermend bé dilovanî li min didan, ji min re ew

xwendin gelek giranbûn, ji ber ku ji her listikên zarokan dûr ketî mabûm, ji ber wî qasî diya min ez şandim gundê xalê min (şêx Ahmed é dêrçamê) ku (metika min) li ba wî bûn, li wî gundê xalê min bêlûkek leşkerên (alman) û ser sedek wan jî li wir bûn, wî qumandanê alman bi zimanê turkî qenc dizanibûn, pirê şevan dihatin wê hucra şêx, ligor ku şêx meruvek zêde dîn perest bûn jî lê ligor xesaîsê xwe é qewmî ji wî qumandanî re ihtiram digirtin, jê re çayî, qehwa şêrîn an bastêq û benî an dendikên bihîvan û hingiv, didane wî, wî qumandanê gotî şevêk ji şêx pirsî û got:

- şêx efendî di kîjan zeman û li çi mekanî we di protkolek de îmza kiriye ku diwarên siyâsî leşkerî û cengdarî de hûnê piştevanê dewleta osmanî bin? şêx lê vegerand û got:

- qumandan beg, sultan xelife - é dîné islamê ye li ser me ferze ku em berevaniya wî û hukmê wî bikin, dîsa qumandan jêre got:

- şêx efendî dîn baweriyek ne pelandî ye, lê di herwarên - siyâsî, abûrî, zanistî, tarîxî û cugrafî de, her miletek binavê qewmiyeta xwe ji wan re daxwazên xweser hene, vaye em (mesîhî û rûsya jî mesîhî) me xwe daye rix sultan dewletek islamî û şerê dewletek mesîhî dikin, çi tékiliya dîn bi siyaseta miletek heye? lê dîsa xalê min şêxê géj nas nekir ku qumandan çi dibêje !

piştî berf ji erdê rabû di buharê de ew leşkerên (alman) ji wî gundî rabûn, jibo xatir xwestinê qumandan hate ba şêx xatir jê xwest û kéréke çerkezî deh santîm dirêj du şilf di yek kalanek gelek xweşik da şêx û got: ev bîrhatiyek min li

ba te be, dîsa şex berovajé jé re got:

- qumandan efendî, te kérek neynûkan an tesbihek bidana, ez jivé kera şervanî çikim? qumandan bi nîv hêrsek jére got:

- şex ne çend bé xeber şîara we ev ve é ku we ji bindestiyé bigîne rizgarî û xweseriya qewmî dîsa ev ve! bawerim dîsa şex nasnekir ku wî qumandanî jé re çi got?....

ERMEN DJMINÊ KURD OSMANÎ DJMINÊ WAN:

Her wekî li jor hate gotin: di wé cenga cihané a pêşîn de ji kuştina enîyén şer péve, ew perîşanî, belengazî û giriftariyén leşkerén usmanî di tarîxan de jére mîsal nehatîye dîtin û bawer nakim ku bé dîtin biser wan felaketén nadîde de jî ew gumanén ku hin (baronên êrmen) di awir û daxwazén bé qiyasde péve rabûn û bûn sebebé qetil ama mileté xwe - é belengaz, ew daxwaz jî dîsa di qiyas û nisbetek tarîxî de nehatibûne dîtin, diwî zemanî de li kurdistan (êrmen) bi hindikî li bajaran ronîştman bûn, piranî û giraniya wan li (WAN) é bûn, dîsa di kesafeta cugrafî de ji %10 êrmen bûn, ji milédî bé ku di warek tarîxî û eserî de dûr nêzîg rêçek wanjî hebe, bi daxwaza (êrmenistanek mezin ji qafqas heya kililkiya) di xwestin, biwan gumanan di newalén bé av de sobanî dikrin û liser telpe - én ewran koşka hukumdariya êrmen çé dikirin! berî hertiştî ligor progirama partî û baronén jér dest bi kuştina leşkerén nexweş û birîndaran kirin her wekî:

di /1901/ qeyseré rûsya - ji hin baronén êrmenre bi dilovanîya dîni biryar dabûn ku wé jîwanre (êrmenistanek) li

erdek bé tarîx bide çêkirin, biwé gumané hin baronan⁽¹⁾ dest bi sazmanén jêr kirin:

1 - ji sermayedaran partiya (daşnaq segan) dijê komonistî bûn⁽²⁾ heya nihojî ew partî li - sûrî û libnan) heye, meziné wan (heraj papasyan bûn, nézîgî li (xweyîbûn) dikirin ku dijminé wan û kurd turk e,

2 - RAMGAVAR) partîyek ji tebeqa navîn bûn,

3 - partiya - ermenegan - ji muhafizînan hatibûn girêdan di / 1898/ li dewleta usmanî (800) azayén wé partîyê kuştin, wé partîyê ji tevan zêdetir di nav êrmen de bergeh girtibûn, dijî (hançakan) bûn,

4 - partiya (hançak) çepén - êrmen nihojî bingehén wan hene,

muesesé (partîya ramgavar) li adene (méhran demiçyan) bûn, delege - én wanén xuyanî - şaîr uhan takiyan, liyon mikailyan, ratiş yerî van, duktor agûp tospan - ew û partîyén dîtir her çendî di hin awirén siyasî de neyek lê di doza qewmî de yek bûn, di /1921/ de civînek li (sitembol) dane giré dan, diwé civîné de biryan evbûn:

- gotin: em nikarin bi sîleh ve rabin, kesafeta cugrafya em ne tédene jiber wé çendé ji mere daxwaza yekemîn evve ku - em millet bidin xwendin û şiyar Kirin, di heşé wan de îmanek êrmenî bidin hévan kirin - ku xwedîyé wé pirogiramé - (baron tîtizyan) bûn, jiber ku liwan xeletén xwe én salén /1914 - 1915/ varqilîn ku çi bi seré milleté xwe anîn, ew xeletén tarîxî evbûn:

- di dest péka cenga cîhanê a pêşînde ku deriyé herbê li



Komek ji çeteyên Ermen yê ku di sala 1915 an de birînda- rên Kurdan dikuştin.

sînoré - (erze-rom) dest pékir, herwekî jiwan (baronén) gotîre firsetek lé hatibûn, bé ku bîr bibin û zanibin jiber du sebebana nikarin bi şoreşgîrî ve rabin, yekjê - érmen - li bajarana dezgedar bûn ne sîleh şor û cengawir bûn, a diduyana gund û welat ne jiwan dagirtibûn daku karibin di nav mîlet de béne paraztin, çewa ku (filetî û misilmanîjî) li hember hev wek: agir û barûd bûn, bé van agahîyan lidor (mûşé) ku diketin pişt enîya şer bi navé (can bézaran) hin xortén xwe derxistin çîyan, ji déla ku karibin şeré leşkerén - turk - bikin, ew nexweş û birîndarén belengaz én ku ji enîya şer vedigerîyane nexweş xane - én (diyarbekir) 700 kilomîtir bi peyatî . ji bêhêzbûnê guran ew dixuwarin an ji êş û birçînan liber devîyan bi sedan dîmirin, ew (canbézar) én gotî li (gélîyén qulpé) diketin pêşîya wan ew dikuştin di nizmanîya gélîyé kûr werdikirin, çewa ku kilîşén wan (canbézarén) na kesane lijér berçavın⁽¹⁾, ew leşkerén belengaz ne tené { turk an kurd) lé (erb, çerkez) û her tewir dinav wande hebûn, belé ew newala ji (100) mitir zédetir kûr ji laşan hatibûn dagirtin, heya ku néçîrvan rast tén û dibînin, héj gazî daket, bi kewt û koman diçûne (gélîyé qulpé), apé minjî çû dinavwan laşan de laşé bira - é xwe (elî) anî, biser dejî dema ferman liwan rabû apémin jin û zarukén ermen) jiber kuştiné vedişartin digotin gunahin,

belê biwan bedkarîyén na kesane di /1915/(sultan reşad)

1 - dinav wan kilîşén canbézaran de tené sé kes di sematlojya érmen dene én ditir çewa ku lijor li rûpela (64) hate gotin: di zemané romî û térdad) de ew kurdén ku dibin şûran de kirin file heya niho mofolojîka wan nehatîye guhartin,

ferman bi kuştina érmen da, ser û ber ew kuştina jin û zarûkan ne kémî wé hovîtiya wan (canbézar) bûn, lewre bi awakî ser ber jin zaruk kal pîr wek: kerîyén pez di pêşîya leşkerén turk de, berê wan didan şikeft, gélî û gazén nav daristanén çîyan biser hevde bi tufeng û singûyan dikuştin bé ku zanibin insanin, eger wan leşkerén cengîzî biwé dil-reşîya kuştina wan eskerên nexweş û birîndar ew jin û zarûk ne di wan kirdeyan de pardar û gunahkar bûn, dinav wan kuştîyan de kurd béhtirbûn, lé dîsa ligor nifûsa wî zemanî kurd (65) hezar mêr ne jin tenê jiwê kuştinê xilas kirine, én ku niho dibéjin kurd em kuştine, lé nabéjin em çewa xilasbûn ku îro wé qencîyé bi xirabî diguhérin, diwé kuştariya tevayî de (şéx seîd) é şoreşgér bi tevaya ulemaén kurd da zanîn k' kesé érmenek bé sileh û şer bikuje wek misilmanek dikuje, kî wan ji kuştinê bi paréze ji xérek mezin péve wacibek insanî dike,

gundé me di navbera du qeza - én (héné û licé) ye, li pişt gundé me di singé çiyade zindanek zéde kûr û mezin di zemané pêşîyén kurd (HURÎ yande (5000) sal berî zayinda (îsa) hepîsxana wan bûye, érmenén herdû bajarén gotî di anîyan liser wé şikefta berûjér di kuştin û davétin xuwaré, ew çend kûr ku bihin jé ne dihatin, di singé wî çiyayî de hijîrén reş én bejî gelek şérin hebûn, em zaruk diçûne wan hijîran diwé gera hijîran de réya me kete ser jér zemîné goristana mezin, me dît deng jé té û dibéje: (asvas) yanî (xuda) me gazî wî kir û got: tu çi kesî te çi divê? got: gelf

zarukan biwere nan heye ji min re bavéjin xuwar, me got: bimere nan nîne lé me jére hijîr davétin wî digot: yek liban liba min dikevin én di derbazî jér dibin,

piştî em çûne gund min ji apé xwere got. apé miné zéde dilovan taval gazî rinçberé xwe kir û jére got: kuré min çend werîsan û nan, şerbek avjî bixwere bînin wî derxin û jére béjin meyé gund dakeve deşta diyarbekir liba hinan bibe rinçber heya bé çî dibe, em zaruk jî bi (mihore) çûn, jére werîs berdan xwe péve giréda û kişande der, me nan û av dawî got: we divé ez misilman bim? miho got: em doza misilmanî û filetiyé li te nakin, vaye ji tere heft nanén tenûr û ev şerbé avé jî bitere, bişev here û biroj xwe li nav devîyan veşére heya tu gihayî deşté ku kesek te nasnake béje ez li rinceberî di gerim, birîna te ne tişteke seré xinçeré giyaye nav mîlê vala ne divayé dermane,

piştî çend rojan qeflekî (250) jin û zaruk ji qeza (qulpé) anîn û berbi wé jér zemîné birin, apé min gazî min kir û got: biwê qeflê re (arif beg) ê (licî) ye, yekê kuma sor liserîye here bawî béje: apé min gotîye (keç û kurek) jiwé qeflê bide me, ez û çend zaruk çûne li bin siya dara hirmé ba (arif beg), jimere got: herin navwan diduyan bibin mi got: beg ew eskerén bi singû li dorwan wé me bikujin, got: herin çavé min va li weye, em çûne nav wé koma jin û zarûkén ku li benda saetén kuştina xwene, pîrekén mezin digotin kuro me bibe em çétir di karin karé we bikin, lé em li hevalén umré xwe digerîyan mi kurek bi navê (artîn û keç binavê lûsê) ji nav wan birin, berêjî heft jin û zarûk liba apé

min û sisé liba dîya min hebûn, ew herdûjî ji déyén xwe ne diqetîyan, nizanibûn ku hercaré hinan dibin dikujin déyén wan ji wan re digotin: herin şîva me çêkin emjî évaré tén, jibo bi mere bèn! belé tevde liba me man dawî apé min jiwanre got: me tu doza mislmanî liwe nekir, niho efûya kuştina we hatiye dayîn divé em we bizewicînin hûn bi dil û rizaxwe misilman bîn emé we bidin misilmanan, eger hûn liser dîné xwene emé we bidin êrmen? wan gotin: ez benî mala te ava û xuda én wekete zéde bike em érmenin, hingé apé min got: ezé we bigînim milletê we érmen,

piştî me ew giyandin mal édî tîrsa me şikestibûn û piştá mejî bi (arif beg) xurt bûn, em çend zarûk dîsa çûn daku çi kirin jiwan belingazan, em çûn lidor bîstî mabûne di péşîya esker de dibirin wé qesabxana jér zemîné, mejî dûr da pé wan, heya giyandin ser devé wé jér zemîné, em ne wérabûn nézîg bibin lé me didît her caré sé çar dibirin û di navwan leşkeran de wînda dibûn, dihatin nivşên dî dibirin, piştî kutah bûn li erdé zarûkén wan én bi çarpîkan digerîyan én héj di péçekande liwé erdé mabûn, gundîkî me jére (emeré qeblîn) digotin ji nav rez dihatin diçûne gund, yûzbaşî - sersed - gazîwî kir û got: sofi were van zarûkan berhevke û bavêje ba déyén wan, wî got: qumandan beg ma ez çewa dikarim wan zarûkén bé gunah bikujim, hingé qumandan bi qamçîyan liseré wîda û gelek gotinén ne qenc, bi hérs ji hespé xwe peya bû û bi lingén wan zarûkan digirt li kevir diddan û davétin wé jér zemîné, dema me ew wehşiyeta qumandan dît, qîrî bime ket û em berbi gund li bihnekî bezîyan, diwé



Mustefa Kemal bi cilên dîndaran di nav dîndarên kurd de.

bezé de me her lipé xweji dinérin ku bigîje me ji weke wan bikuje!...

piştî ew çend salên dirêj ku derbaz bûne divan nivîsaran de ew dîna welé tehil té van rûpelan de dikeve bîra min, ez jixwere dibéjim gelo?

- wî zabité hov û sitemkar dilovanîya dé û bav jixwere neditibûn?

- an dilovanîya wî ji zarukén wîre çiyê ne dihatin bîra wî?

- ferqa heywan û insanén gunahkar û wan zarûké bé gunah libawî nebû?

- eger xwendina wî cengdarîbe ji pére insaf û huqûqé insan ne xwendibûn gelo?

- bi xwendiné ew weşîyeta pêşîyên wî - cengiz, teymûr û hilako - piştî hezar salî héj di xûna wîde mayinde bûn? gelo çima ew weraseté xûnréji û şerîrî intîqalé zarûkén wanji dibê? jiwî péve mîsalek jér té derpêş kirin:

diwî zemanî de - mustefa kemal - li diyarbekir qolordû qumandanî bûn, ji alîkî rojén înan li mizgefta mezin, dîbûn îmam çewa ku ew kilîşa wî li hembere, dawî ew îmam tevde kuştin: diwé îmamîyé de keçén érmen libawî bûn ew direqisandin û dema vedixuwarin ew keçikén ku, dé, bav, bira û xwehén wan kuştibûn, jiwé reqisé péve ew şîlfî tazî bera birka avé didan û li ser dikê rodinişt liwan dinérin, hingé diketin bala wî ku ev keçén welé dilbirin wé çi keyif û şahî bikeve dilé wan? ji véjî xweş dide zanîn ku xesaisé wané péşîn biwan re dikeve zaîndé weke siya wan her bi wan reye, lewre çi dema turk bi şer ketine welatek her û her

ew weraset biwanre ji kuştariyén tevayî péve ew welat talan û wéran kirine û dikin, herwekî dibirén pêşde ew bedkariya wan wé di - şoreşa şéx seîd) de bikeve berçav.

DI DILOVANÎYÊ DE XESAIŞÊ KURD:

her wekî liyor derbaz bû wan (êrmenan) bi daxuwazek siyasî diwé herbé de ew çend kurdén nexweş û birîndar kuştin, û felaketa héj mezintir di birén pêşde wé ew kuştin û muhacirîya çar wilayetén kurdîstan bikve ber çev, tevî wan bedkariyén wanjî ji dilovanî péve tu intîqam nekete bala kurd, her û her bi exlaqé insanî ew jiber singûyên turk /165/ hezar xilas kirine, dijorde (65) hezar hatiye gotin xelet, çewa ku di rastîya goténé de jiwan (êrmenan) héj gelek jiyîndarin.

divî warî de dilovanîya (Bedîul zeman)⁽¹⁾

diwé cenga cîhané û kuştina (êrmen) de (mela seîde meşhûr bediulzeman) li heremé (mûş) deşta (bulanix) amir betelyoné leşkerén milişya én kurd bûn, generalê turk (nûri weysî) jére got: divé tu livan navçeyan çiças êrmen hene çi mér çi jin û zarûkén wa hene berhev bikî û bikujî, (mela seîd) jiwan navçeyan (1500) êrmen bi jin û méranve dane hev li nêzîgê enîya xeté şer xistin newalek, xwarin da wan heya ku bû évar, ji yeké (êrmen) re got: here ba leşkerén

1 - ew - mela seîd) ji heremé (muksé) ji gundé (nûrsé) ye, ew (nûrçiyén) turk pé girtiyén wî bûn - di /1908/ de azayé (kurd teali) bûn,

(rûs) eger rê bidin we ezê we derbaz bikim, jibo te nekujin her gazî bike bêje (êrmen) heya tu bigîjî ba wan te nakujin, giya nav leşkerên rûs ew birin ba alahî qumandanê xwe, jiwanre daxuwaza (mela seîd) got: qumandan got: ew qumandanê tu şandî çi kese? wî got: kurd de, qumandanê rûs got: kurd di enîyên şerde zêde cengawirin lê ji kesên (dîl û birîndaran) re dilovanin, veşer here eger ne hîle be tu ewçend miletê xwe rizgar dikî, eger jibo zanibin em jiwere piştegîrin an na, hingê tu ji wanên wir ne çêtirî, belê ew hezar û pêncsed (mela seîd) derbazkirin, di (risale ên xwede) dibêje: ew (êrmenê) şandî heya destê sibehê nehat ez ranezam zêde xemgîn bûm, eger bibe sibe divê bêne kuştin, ezjî nikarim wan bikujim wê çewabe gelo, dema vegeriya û derbaz bûn jê mezintir ji minre dilgeşî di umrê minde çê nebûbûn,

PIŞTÎ salekî di /1916/ de ku leşkerên (rûsya) ji kurdistan bajarên erzerum, wan, bedlîs û mûş vegirtin, hingê ew (mela seîdê meşhûr) di berevaniya bajarê (mûs) ê de bûn, leşkerên turk bajar berdan, lê jibona ku muhacirên bajêr jiber (qaxaxên) rûs xilas bin, ew ma berevanê wî bajarî, diwê berevaniyê de birîndar dîl kete destê rûsya, ji wir birin teflîs liwir xistin ber mehkema eskerî di heqê wîde bi îdamê biryar dan, sipartin leşkeran birin ber gulan, wî qumandanê cebhe ê erzerum ê ku ew êrmin giyabûne bawî bihîst ku ew (mela seîde) bi îdama wî biryar dane, bi bez digaziya wîde

1 - gelo çewa rûsên polşefvîk ew wesîyeta - qeyser - bici anîn di /1918/ li (rewan) binavê (yérvan) dewleta (êrman) dane çêkirin, kurdên wir jiwan bihtir heq nedane wan ew xistin bin sîdariya êrmenên hindik?

çû ku vaye çavên wî giré didin ku bidin ber gulan, jiwan eskeran re got: divé hûn kuştina wî bihévişînin heya ji mehkemé jiwere emiré diduyan bé û çu mehkemé got: divé hûn mela seîd) vegeîrînin difa a wî libamin heye, piştî mela seîd vegeîrandin mehkemé ew alahî qumandan rabû û got:

- di filan tarîxé de vî meruvî (1500) érmen jiber kuştina turk şandine bamin di enîya şerde, ké jiwe ew çend insan ji miriné xilaskirine ku hûn bi îdama wî biryar didin? biwê berevanîyé ji îdamé rizgar bû lé bi mana ku bi misilmanén wirre civînan çédike şandin (seybîrya) ji wir revîya bi peyatî piştî sé mehan giyaye almanya paşé (sitenbol) .

dema wan leşkerén turk enîya (mûş) é berdan, liwan hawîran çend gundén kurd tevde kuştin û malé wanjî talan kirin, dozek rotîni liwan hate kirin gotin: jiber ku érmenén wan hawîran jî bi kurdî dipeyîvin me got belké ewjî érmenin, tevî ku qenc dizanibûn ku kurdin,

FILE-ÊN ERMENÊN GUNDÊ ME:

ji zemanén bûriyén dûrve bi mere jiyîndar sé mal hebûn, ji wan re mala garebéd, mélo û éxo) hebûn, mala (garebéd) cil û cawén bi qalibén rengîn çé dikirin, dinav wan de (sîmo) meruvek zéde jîr û zana bûn timî şewira apé min pé bûn, bi awirén dîni di nav me de tu ferq tune bûn, di her cejin, şahî û şînen hevde em pardar bûn, dema ferman bi kuştina wan hate dayîn, apé min herçî mérén wan şandin ciyén dûr bā dostên xwe tené jinén wan man, di malên xwede serbest

gundiyén me ji beré zédetir jiwan re dilovan bûn,

ROJEK me dît (qaîmeqamé licé) hate gund ji déla odé ve çû li mizgefté jére liser hewza avé cî çékirin û gazî wan jinén (érman) kirin ji wan re got: ji îro û bi şûnde hûn misilman û heryek jiwan li gundiyén me mehir kirin, tevde meruvén umré wan lidor (70) salî bûn, piştî ku qaîmeqam çû apé min) gazî wan kir û got: ev mehir kirin jibo hukumet wan nekuje, kesek jiwe nézîgê mala wan bibe ezé piştawan bişkinim ha, me nizanibûn ku di navbera apé min û qaîm meqam de çi heye piştî çendekî rojek sibehé em ji xwe rabûn ku leşkerén turk hawîdor ligund girtine, ew jin û zaruk tevde tevî apé minjî birin, bé ku em zanibin mesele çîye, heya ku apé min piştî - 20 - rojî hate mal héj me bihist ku ew qaîmeqam (érmen) bûye ew jî kuştin,

QAÎMIQAM Û QERWAŞA WÎ:

di mala qaîmmeqam de keçek xizmetçî musulman hebûn, wé keçiké didît çi gava ku qeflekî ji érmenan ji bajér derdixin û dibin kuştinê - qaîmmeqam - té malé dikeve oda xwe û digrîyé, ew danezana wé keçé belabû giya hukumeté, hingé li eslé qaîmmeqam bûn peledar, ji (sitenbol) kunya wî xwestin dîtin ku érmene, hingé walîyé (dyarbekir - ew xweste wilayeté, du jandirme pére emré kuştinê bi wan re birêde kuştin. niho liser réya (diyarbekir) û (licé) li pişt gundé (qetîné) ew mezelé qayîmeqam heye, divirde me nas-

kir ku divé meruv nejadén biyanî⁽¹⁾ wî qaîmeqamî li gelek gundan weke gundême jibo neyén kuştinê jinên érmen li kurmancan mehir kiribûn, lé piştî ku naskirin ew belengaz tevde birin kuştin,

EVDUREZaq BEG BEDIR XANÎ Û ŞÊX SEÎD EFENDÎ:

di /1913/ ande (MELA EVDULSELAM BERZANÎ Û EVDUREZaq BEG BEDIR XANÎ) jibo alîkarîyek siyasî çûbûne (rûsya,) mela evdulselam - ji daxuwazê vala vegeerîya lé (evdurezaq beg li teflîs) é ma,⁽²⁾ bi gumana ku cenga cihanê a pêşîn di pêk hatinê de bûn jibo kurdistana turkiye hin siyasîyên (rûsya) pére dabûn û sendibûn, diwî zamanî de li kurdistana îranjî sazmanek hebûn (evdurezaq beg tède libat⁽³⁾ bûn, lé mexabin jiwê sazmanê min tu agahî bi dest nexist, jê û pêve binavê (şoreşa mala xewsê hîzan) é çûbûn, diwê gerimbûna agirê herbê di /1915/ de (evdurezaq beg) ji (teflîs) namekî bi dest ji (şêx seîd) re şand, ku tèdeên wê nameyî evbûn:

- şêx efendî di welat de ez te ehlê fikir dibînim, tu dibinî di eniyên şerde hêzên cengawir leşkerên (mîlişya én kurd) in, bé awirek siyasî diber welat vegirtî dewleta usmanî de xwe didin kuştin, yanî dixuwazin di bin sîdarîya hukmek biyanî

1 - biyanî (xerîb)

2 - di /1918) de ji teflis vegeerîya turk ew girtin û kuştin

3 - libat (aza)

û faşist de her û her dîl û kole bimînin, ku seré wan bi morufiné dîn dagirtine, divé tu qumandanén wan milişyayén kurd bibînî ku ji eniyén şer vekişin xwe ji berevaniya mafé xwere pêk bînin, rûsya biryar daye ku bikeve erdê kurdistan heqqé me dispére me⁽⁴⁾!

Biwé doza nişteman perwerî (şéx seîd) huseyin paşa é heyderî ku heft alahî milişya di rajériya wide bûn, xweste ba xwe û jére daxuwaz da zanîn, ligor wî zemanî ku bawermendîya dîn liba kurd zéde mezin û kufra (rûsyajî) ji kufura (awirpîyan) mezintir bûn, biwé bawermendîyé (huseyin paşa) got: - ez benî me jiwe bihîstîye ku rûs kafire û (sultan xelife - é islmé) ye, şéx got: belé én ne misilman li ba me kafir emjî liba dîné wan kafirin, lé ewén jiwere gotine (sultan xelife - é îslamé divé em dibin sîdariya wî de bé heq û huqûq bimînin ne ezbûme, dema rûsya diwarén siyasî de alîkariya me bike, hingé çi tékiliya dîn pé heye? ew mileté ku di huqûqé xwe -é siyasî de ne xweser be çi kare dîn namûs û şerefa xwî bi paréze, - biwan gotinên şéx, huseyin paşa - got: min wek tiliyek xwe zanibe, lé tu (xalid begé hesenî) nebînî ez nikarim, jber ku dinav mede neyartîyek teqlîdi heye,

şéx seîd) xalid beg - jî xweste ba xwe jére got: wîjî got: eger tu - huseyin paşa - nebînî ez nikarim, şéx jére got: min - huseyin paşa - dîtîye gotina min qebûl dike, jiwir - xalid begé hesenî) rabû xwe giyande generalé turk (nûrî

4 - bihîstina ji devé (şéx seîd).

weysî) û jére daxuwaza - evdurezaq beg, şex seîd û huseyin-paşa - da zanîn, lé turk di nav wé herbé de nikaribûn dest bavéje - şex seîd) xwedî nifûsek mezin û huseyin paşa xwedî hézek mezin,

nûrî weysî - jibona bi awakî siyasî - şex seîd û huseyin paşa) ji enîya şer bi dîrxin, beré li (keleha xinûs) çû ba (şex seîd) bi kostekî jére got: - şex efendî tu dizanî ku veşartiyén eskerî nayén gotin lé jibona ku dijwarî negîje te ez mecbûr bûm, em divan rojande dikin enîya (erzerum) berdin û bi şûnde vekîşin, mala te girane hingé tuyé perîşan bibî, ji nihove bibéje: em ketine nav cebhê, giranî zéde bûye édî idare nabe, divé ez dakevim dor (diyarbekir) ba bira - én xwe wé jiminre hésantir be, (şex seîd) welé bawer kir, bé ku zanibe (xalid beg) xiyamet kirîye û weke wî ji - huseyin paşa) re jî gotine leşkeré xwe bikîşîne wilayeta (sérté), piştî (şex) ji (keleha xinûs) barkir çû (pîran) qeza diyarbekir - piştî heftekî ji diyarbekir (general mursel) çû bawî û jér e got: şex efendî, livir nézigé enîya herbéye giraniya abûrî çé bûye here dor (qonye) jivir çétirre, hingé (şex seîd) lixwe şiyar bû ku rabûna wî ji (keleha xinûs) daxuwazek siyasî bûye jére got: paşa jivir û wéda gawe tenéjî narim çî daxuwaz didilé wede heye fermo - piştî ku (mursel paşa) dît - şex seîd bi hêrs û sertî lé veğerand got: şex efendî min ji bo te got neku emrek zoré liser te heye, dema vir ji xwe re xweş dibînî, bimîne, çawa ku biwé pîlané (qulixan paşa é zirikî) ji ji enîya herbé daxistibûne - qere bexçe - dor - siwérek - liwir mir,⁽¹⁾

1 - ev danezan dîsa ji devé (şex seîd) û gohén min.

RÛSYA DI VEGIRTINA ÇAR WÎLAYETAN DE...

muhacir bûna wan wilayetan ji ber Ermen .

Di /1916/ de ku leşkerên (qeysere rûsya) ji kurdistana bakur roj ava, erzerum, wan, bedlîs û mûş - vegirtin, çewa ku berî (37) sal ji erde kurdistanê (qaris û artevîn) girtibûn, weha renga diwê herba cihanê de jî kuhukumeta usmanî jiwê tirsê (tékiliya şêx sîd û evdurezaq beg) cengawirên milîşayayên kurd ji cebhe bi şûnde kişandibûn, ew memedcikên turk) nikaribûn berge liwê lehîya leşkerê rûsya bigre ew çar wilayetên gotîjî hatin vegirtin, diwê de (evdurezaq beg) bawer kir ku wê rûsyajî wek ingilîzan ku (şerîf huseyin) dane pêşîya xwe û derbazî welatên (ereb) bûn, daku (evdurezaq beg) xwe bigîne kurd nehêle ku ji awan bi awakî muhacir bibin, lê sed mexabin rûsya ji dêla (evdurezaq) ew (êrmenên) ku bi dolovanîya kurd giyabûn navwan ew bixwere anîn û weke gurên har bera kurd dan, bi awakî kes nedî dest bi qetil ama kurd kirin û - evdurezaq beg - li - teflîsê - xistin bin nêrevanîyê, bê ku zanibe di / 1901/ de qeysere ji baronên partiya êrmen (erminagan) re biryar da bûn ku li wilayetên kurdistan ji wan re (êrmenistanek) bide çêkirin

Belê wan êrmenin gotî ên dinav leşkerên rûsya de netenê kuştin lê felaketên kes nedî biserê kurdên ronîşmanên wan bajaran de anîn, tevî ku kurd biryar dabûn ku rûsya bikeve

erdé wanjî welaté xwe ber nadin, jiber wé çendé di dest péka pêşînde dema leşkerén rûya kete hin gundén wilayeta - (erzerum) gundîyan liser xaniyén xwe (alén) sipî daçikandin, lé mexabin biwé ketin dûjeha wan (érmenén) dilreşén bed exlaq ew sitemkariya ku héj di tu hurûban de kesî nedîtibûn û nabînejî namûsa wan liber çavén wan didane bin ligan héj ew jin û zaruk biserhev de dikkuştin, bi saxî davétin nav agir, di laşén wande berîk çé dikirin destén wan dixistin nav çermé laşé wan û digotin kirifo berîka te qence, wan leşkerén rûsya liwan dinérîn û ne digotin, em dewletek xwedî qanûn û nîzamin ev çi bedkarîne hûn dibin siya mede dikin, jiber wé wehşiyeta kes nedîtî ronoştmanén wan herçar wilayetan welat berdan û muhacir bûn malé xwe li erdé dihéştin namûs û zarûkén xwe direvandin, ango wé rizgar bibin, lé nizanibûn ku tevde li der û kolanén welatén xerîbiyê tevde ji nexweşî, serma û birçînan bimrin!.... ...

Hin dewlemend û xanedanén bajarén wek (MUŞ Û WAN) ji hevre gotin: belé ew wehşiyeta (érmen) diware lé berdana welat héj diwartire, eger wan érmenan li gundan ew bedkarî kirine lé dema leşkeré rûsya bikeve - bajaran wê qumandanên wan nîzam û qanûnek bi parêzin, ji milê dî ew érmen tevde naswelatîyén me û me ew derbaz kirine, biwé gumané li (mûşé) (mala kotanan) dewlemendén bajara nerevîyan, lé wan érmenén di nav leşkrén rûsya de ew felaketa jor gotî bi seré wande anîn û paşé jin mér û zaruk bi ser hevde kuştin, ew malé ku jibowî nerevîyan ewjî talan birin, libajarê (wan) é tevaya jin û méran di mizgeftan de cevandin, ew şilfî tazî kirin û ji wanre gotin jin li pêşiyé û

mér li péwan niméj bikin, belengazan ji tirsan ew niméja tazîjî kirin dawî tevde bi ser hevde kuştin û mizgeft jî biser wande şewitandin jiwanre kirin mezelek tevayî,

Belé jiber wan érmenan tevaya kurdén wan çar wilayetan bicarek welat berdan û bi peyatî biser wé berfa pir û serma bin sifir de muhcir bûn, li der û kolanén welaté xerîbî û diwé xela ku insan goşté mirîyan dixwarin tevde mirin, kesafeta cugrafya wan wilayetan vala ma, di /1941/ ku ez li (sûrî) bûm û nivîsevané kovarén (hawar û ronahî) bûm, emîr (celadet beg) nifûsa wan bajaran jimin xwest, ligor istatitiqén turk di her kilo mitir de (6 Û 7) kes hebûn, ew bajarén ku muhacir ne bûbûn wek (sérté, diyarbekir, ruha (di kesafeté de ji (20 - 25) hebûn heya nihojî ne giyane kesafeta bajarén dîtir, jiber wé bedkarî û hovîtiya (érmen), gotinek heye dibéjin: nikaribûn bi keré li kurtan didan hukumeta turk ferman bi kuştina wan dabûn wan binavé mislmanî kurd di kuştin,

Belé érmen di zeman û mekanan de her û her wek: mîkîrobéb dizanterî çi gava ku serma û germek siyasî ketiye rûyé kurd wan seré xwe hildane, ligor pékarinén xwe di neyartîya kurde şûnde nemane û namînin, her û her di neyartîya de piropagande û nivîsarén xwe én ji rastî dûr di heqé kurd de didin belakirin, ji qafqasya heyani adene jî impiratorîyek érmenistan dixuwazin, ew welatén ku ji tarîxén dûr û nézik asarek wanjî nîne, çewa ku di kesafeta cugrafîde jî ji %1 jî tunin, eve gumana ji gumanan bépar,

FELAKET Û SERPÊ-HATÎYÊN WAN MUHACIRÊN KURD:

Belé ew felaketa wé muhacirîya kurd, di tarîxa roj helaté navîn de û belkî di tarîxén cihan de jî nehatibûn dîtin û nayé dîtin jî, di wé dest péka payîza /1916/ de ku diwé mehêde serêh çiyayén wan welatan berf digre ku diwî xetê dereca (39) de dest péka zivistanê ye, wan çar û ji hin wilayetén dîtirjî bicarek yekber welat berdan bi kewit û ko man wek péléni derya beşerî di silsila çiyayé toros re berbi başûrve dikişîyan, bêku zanibin wé kuda herin û liku bibin wardar û biçî bijîn, ji ker, hesip, histiran péve gayén wan pilû pirtî liwan barkirî û hin jîwan lihéf li nav piştawan bi erdêre digindirîn, rûyén wan hezîn, dilén wan birîn, li pêşîya wan rojén reş û tarî, dinav mija miriné de digindirîn, zarûkén piçûk liser pišta dewaran di hundirén térande serê wan ji derve, liber wé sermayé ji bévilén wan wek zincîrén zîv av dadiketin ser singén wan, desté déyén wan di bin çengén wan de, rûyén sipî bé xûn, arîya belengazîyé biser wande rijîyayî, çavén wan şikestî, lévén wan zuha, bi peyatî di nav berf û herîyéde digindirîn, mérén wanjî her lidor wan heywanén barkirî dizivirî û barén wan rast dikirin, li serén wan kolos, bivilén xwe nixumandî, di rûyén wande xuya dikirin ku ji giyané xwe bésar bûne, nizanibûn wé évaré liku bihéwirin û wan zarûkén hundirén téran liku gerim bikin,

Demá digihîştin gundên pêşîya xwe didtîtin ku gund ji wan hatiye dagirtin, liber berf û barané di kuçe kolanan de linav

wé berf û vê barané diskinîn, xwe didane ber dîwaran û bin sifirnikan, jivir û wir hin dar didane hev jiwan zarukén piçûkre agir dadidan, ji alîkî bayé sar û ji aliyé dî peşkén baran û pilfîyén berfé agiré wan vedimirandin, dema xwedîyé wî xaniyé ku liberin ew belengazîya wan didît, nikaribûn wan bi herî û gemaré û jiber sipîyén diwan de hélîn çékirine bibe hundiré xwe û wan bixe nav nivînan, ew derbazî axuran nav pez û dewaran dikirin ku cîyek germ bûn, ji keyfan wan jin û méran herdû destén xwe berbi azmanan hildidan û jiwanre dua dikirin

Lê mexabin tevde bircî wê şevé diwê axurê de kar an berxek hebana serjé dikirin û ew goşt di nav pirtiyén xwedê vedişartin û sibehé zû derdiketin, heya ku ji gund dûr ketin li nav daristanek agir dadidan û ji zarukén xwere ew goşt dibraştin û didane wan û dixwarin, ne tené kar û berx golik û mirîşik carna pisîk jî serjé dikirin û dibirin, heya ku dewarén wan an xişir û pere - én wan ber û xaliyén hebûn difirotin bi nan, piştî ku ewjî nema ew dizîya mecbûrî dikirin, havîné liçol û beyaran digerîyan néçîra kîsoyan dikrin û dixwarin, diçûne qesabxanan dema heywan serjé dikirin wan sênîkén xwe didane ber xûné di birin dikelandin û dixwarin, tevî wê çendêjî li kuçe - én bajar û gunda hersibehan lasê wan li erdê mirî her hebûn, wiha renge liser réyan dimirin, ji alîkî birçîbûn ji aliyé dî nexweşî û ji serman dimirin, ewçend xelakî mezin ku ne tenê ew muhacir lê xilkên ne muhacirî weke wan ji birçînan dimirin, ulçeka genim çû çar zérén zer û tunebûnjî, wiha renge leşkarijî diwê zîvariyé de bûn, wanjî tufingén xwe bi sé car nanan difirotin, dîsa xilas

nedibûn, liser réyan serén xwe didan serkevirek ku hinek bihna xwe vedin liwir dimirin, an gur diketin ser wan û dikuştin, pirîcar şivan an néçîrvanan tufingén wan én ku li erdé mabûn di anîn, her malek jinebî wek dîya min heft tufeng li malé bidar de bûn, ew sîlehén welé pir bûn ku (şoreşa şéx seîd) dixwede ew hézdarî dît,

çewa ku wan muhaciranjî xalîyek xwe ê ecemî didan bi elbek genim xincerén xwe û qame - én kalanén wan zîv û bi zér kildayî didan bi çend nanan, beledîyén bajaran û nexweşxanan xwe lihember wan mesûl ne didîtin, çewa ku hikumetêjî pir û hindik ji wan re ne dibûn alîkar, bi wé belengazîyé dejî hukumetê bazor wek kerîyén pez dipêşîya lişkeran de bi peyatî wê nexweşî û birçîbûnê berê wan didane anedolé, ne ku li anedolé ji wan re çarekî dîtibûn an merkezén alîkarî dabûne vekirin, çewa ne dixwestin ew giraniya wan muhaciran bikeve welaté wan daku liwirjî ew xela çêbe, daxuwaz ewbûn ku diwan rêyên dûrde tevde bimirin, çewa ku (enwer paşa) li enîya qafqasya ji (celadet bedirxanî) re gotibûn, talûka kurd ji rûsya mezintire liser turk, belé biwé daxuwaza na kesane diwan réyan de dawî liwan muhacirén bé eman hat, dîsa (celadet beg) di wé (mektûba xweya ji mustefa kemal) re behsa wan muhaciran tîne û dibêje:

- di /1919/ ez tî (girasûn) derbaz dibûm, ew muhacir hin ji wan leqé min bûn vedigerîyan welat, min jiwan pirsî û got: gelî biran deka hûn muhacir bûn ji gundé hûn lé çend kesbûn? wan got: - em (787) bûn, niho dibîni jiwan em ev (23) kes mane, emjî vedigerin welaté xwe - é xirabe bé gund û avanî, bé emé çewa karibin xanîyan ava bikin wéjî nizanin,

lé madem tu kurd,dizani ku liba kurd welat çiqas şérine!...

DI WÊ HERBÊ DE SIYASETA RÛSYA LI HEMBER KURD:

Her wekî liyor hate gotin: ji déla ku (evdurezaq beg) ji (teflisê) bixwere bînin nav eşîrên kurd daku wan nézîgê rusya bike, érmen jibo kuştina jin û zarûkên kurd bixwere anîn, lipêşîya xwe welatek ji insanan dane vala kirin, di sînorê qafqasya de miletê kurd jxwe zivêr kirin ku her û her wê sitemkarîyé ji bîr nekin,

- wiha renga dema ketin hermê (hekarî) liwirjî dest dane wan (nestor îyên) ku di nav kurd de ji hindikên welatîyanin, wê çewa wan (nestorî yan) ew eşîrên kurd ji daxuwazên xwere karibûna bitewînin? çewa ku diwê şoreşa (polşevikî) de dema leşkerên rûsya ji erdê kurdistanê kişîyan ew nestûrî bi tena xwe li hemener leşkerên turk nikaribûn pir û hindik berevanîya nefsa xwe bikin, dîsa kurdên başûr, én - zaxo, amedî û berwarî - bi dilovanî ew hembéz kirişt,dawî ew qencî wergerîya xirabî bi piştégîrîya ingilîz liwan deveran li gund xanî û zevîyên kurd asê bûn bé ku ew dilovanî bé bîra wan,

- wiha renga li (kurdistana îranê) jî, dema leşkreên rûsya ketin erdê kurdistan li wir jî ew - nestûrîyên - gotî lidor (rizaîye, şino, soma û mehabad) é sîleh kirin, tékilîyên xwe - én siyasî rast bi rast bi meziné wan (marşemûn) ve girédan, tevî ku berî lişkerên rûsya bikve iran tékilîyé sefirê rûsya é li

(tehran) bi (simiko) ve hebûn, lé dema ketin - îran - biwé gumané her çiqas (simiko) xwe nézîgî qumandanén (rûs) kirjî berê xwe jê diguhartin, tevî ku di kurdistana - îran - de (simiko) xwedî hêzén cengawir bûn, lé di /1917/ de dema leşkerén rûsya weke turkiya ji îranjî kişîyan hin enbarén xwe - én sîleh ji xwe para héştin, hingé simiko dest da serwan sîlehan, biwé hézdarîya sîleh leşker û serkarén îran ji erdê kurdistan dane réj kirin,

- li kurdistana başûrî (rûs û seyid taha), di /1916/ leşkerén rûsya ji - îran - daketibûn (rewandiz) kurdistana başûrî, li wir jî (seyid taha) bi dil geşî bi qumandanén rûsya re kete civînén siyasî, lé sed mexabin jiwane bé hévî ma tu gotinek xweş nedane wîjî,

- çewa ku di /1917/ de ku leşkerén rûsya jiwane wilayetén kurdistan én vegirtî kişîyan, diwa biwé siyaseta çewt û xwar dil bijokiya dîn li - erzerum, qars û artevîn - sîleh dane wan (érmenén) ku ew çend kurd kştibûn, jiwane re got: - jiwere her tewir sîlehén giran û sivik van sé wilayetan jxwere bi parézin, liba rûsya ku erdê miletek wek hedyeye bide pégir-tiyén xwe, çewa ku héj (érmen) biwé hedyé her û her doza wan wilayetén kurdistan dikin ku di kesafeta crgrafya de ji %2 kes érmen nînin, belé li hember wé sitemkarîya rusya kurd dest girtî neman,

- ji alahî qumandanén leşkerén usmanî (xalid beg cibirî) gazî wan qumandanén hêzén milişya - én kurd kirin û jiwane re got: hûn li benda kî sekinîne ku van érmenan ji erdê we bide réjkirin, ku ji tarîxén zamanén pêşiyén wene welatê we - é tarîxî jiwere weraset mayindeye - biwan

serhevdan û halanan (xalid beg) ew hêzên milişya xistin bin fermanariya xwe û deriyê şer liwan dane vekirin, di zemanek kinde li çiyayê (alagoz) derbaz kirin, eger lipê wan biçûna ji wir jî didane rêjkiirin îro ew kurdên wir ne diketin bin sîdariya wan.

her wekî li birê jor ev danezan hatiye derbaz kirin ku di /1918/ de rûsya ew qirara ku - qeyser - di /1901/ de ji hin baronên - êrmen - re da bûn bicî anîn ew (rewan) bi navê cumhûriya (êrmenistan) dane îlan kir û kurdên wir xistin bin sîdariya (êrmenên taşnaq) biwê kirdeya tarîxî nizanim çewa (partiya polşevîk) a ku di rûsya de hukum bi destxwe girt, vajiyê (aydiyolojî felsefê) heqê wan kurdên ku hingê ji wan (êrmenan) zêdetir dane bin lingan jiwan taşnaqên unsurî re. ew daşnaqên ku biwê kuştariya nav leşkerên rûsya di cenga cihanê de qîma xwe ne anîn di /1919/ bi awakî resmî dîsa emir bi qetil ama kurdên çiyayê elagoz dan, di navwan de (bavê ereb şemo) bixwe hebûn, heya nihojî li surî ew partîya (taşnaq) di (roznama xweya - eztak) de wê roja qetil ama kurd dikin cejinek tarîxî û qewmî.

SIYASETA INGILÎZ, FIRANSA Û PEYMANA LOZAN TEV XIYANETA ISMET, FEYZÎ Û ZULFÎ ÊN KURD

çewa ku ji her xwenda nemaze ji méjevanan re xweş diyare ku di cenga cihanê a pêşînde, ji dewletên awirpî -

ingilîz û firansa - pîranîya impîratorîya - usmanî - li asya û eferîqa vegirtin, diwê vegirtinê de di /1918/ de berî - peyman (sanrîmo) ingilîz di sûrîde bûn, héj ne sipatibûn firansa, ji ingilîz re bû daxwaz ku tékilîya xwe bi - kurdistan bakur a dibin sîdarîya turk bike, biwê daxwazê (celadet û kamîran Bedirxan) ji awirpa û (ekrem beg cemîl paşa) ji - diyarbekir - li heleb - giyandin hev û ji wanre gotin:

- eger hûn jibona girtina mafê xwe karibin li kurdistana turkiye hézek cengdarî peyda bikin, hingé hukumeta - berîtanya - biher awayî wê jiwere bibe alîkar û piştégîr? wan got:

- Belé ji wan hézén eşîrén cengawir li (heremé melatî - sereké eşîra rişwanan hacî bedir aña) di navbera me û wî de girédanek nejadî û siyasî heye, jé û péve muteserîfê melatîye (fayîz beg bedirxanî) apé meye, dema liwir em li turk deriyê şer bidin vekirin em bawerin ku di zemanek kinde emé navbir bidin navbera kurdistan û anedolê,

biwê pîlana siyasî ingilîz ji qumandané xwe - é xasûk⁽¹⁾ mécer nuêl) xiste rix wan, (nuêl) jiwan re got: divé em tenekekî zér bixwêre bibin, dema hin serekén eşîran xwe nedane ber daxwaza we, hingé emé wan bizéran bikin heval - jiwan hersîyan (kamîran) éku li awirpa xwendiyê û lé maye ji seykløjîya nejadé xwe béxeber, jiwê gotina (mécer nuêl) xeyîdî û got: ev ji tarîxa mere şermek mezine ku em bizéren ingilîz bi armanca xweya rizgarîve rabin, neh-

1 - xasûg (mahir) ew (mécer nuêl) dawî li kurdistana îraqê liba (şêx mihmûd) bû misteşarê wî é siyasî,

êşt ku zéran bixwere bibin,

biwé daxuwaza siyasî her çar kesén jor gotî, biwanre çend siwarén kurdén(raj-avayé - Heleb), tevde bi siwarîya hespan derbaz heremé (melatî li gundé (menzil) bûn mévané (hacî Bedir aña), bi awakî rast û rohnî jére daxwaz pêşkêş kirin, lé sed mexabin li gotin û biryarén ku beré ji wanre dabûn lé nebû xwedî, bi dayîn û sendinek dûr û dirêj bi dor wî ketin tu çare bi dest nexistin, şandin ji (melatîye faîz beg) jî anîn ewjî zéde liber gerîya tu havikek bi dest nexistin, hingé - mécer) ji (kamîran) re got: te naskir ku tu buyî sebebé vé bé havilîyé? te got: ji tarîxa mere şerme ku em bi zérén ingilîz bi doza xweve rabin, lé ne şerme ku ez jite çétir milleté te nasbikim? turk biwan hesîyan ji - sêwasê - alahîyek siwarî çûne serwan, biwan çend siwarîyén xwe ketin çiya biwé alahîyére şer kirin heya ku liwan bû évar dîsa bi şûnde vegriyane Heleb - biwé xiyaneté (mustefa kemal) ew - hacî Bedir - di perlimana xwede kir mebûsé melatî,

daxwaza ingilîz bi awakî rast û rohnî ne çêkirina dewletek kurd bûn, lé dixwestin biwé dozdarîya kurd turk bitirsînin ku zédetir wan mecbûré xwe bikin hin imtîyazan jiwan bigrin, ewjî bi véxistina agiré şoreşek kurd bi dest dixistin, biwé pîlana siyasî (nuél) biwanre çû, ji gotinére ras-tîya jér derpêş kirin, herwekî:

- ji /11 - 19/ é tişrîn ewel /1918/ de li (modanya⁽¹⁾) generalén

ingilîz, firansa û îtalya, bi - îsmet înu - re ketin civîné, diwé civîné de turk her daxwazén wan qebûn kirin, wan biryarên wê civîna (modanya) di /1920/ de biryarên /peymana sîvir /1923/ de li peymana (lozan) dane bin lingan bi mesalîhén xêwe guhartin,

çewa ku dema wan (sazmanén sitenbol - delege - én xwe (şerîf paşa û mustefa paşa ya melkî), şandin wê civîna aşîtiya cenga cîhané a pêşîn li (sévir) ku bi doza mafê kurdve rabûn, ingilîz, firansa û îtalya - ku her sî raserî wê civîné wan ré da delege - én kurd dilxwaziya xwe ji wan re dane zanîn û ji wan re diwé civîna diwêlî de kursî dane vekirin, di 10 tebax /1920/ de diwé mîsaq û peymana diwêlî de li bendên (6064) bi pîranî biryar bi dayîna mafê kurd hate dayîn ku dîsa siyaset du serîbûn,

1 - yekjê jibona ku kurdên îraqê xwe bi ingilîz bigrin ne bi turk da li navbera turk û hukumeta îraqa nû peyda li xetê (broksil) sînor bé danîn ku heremén petrolan bikeve bin mandaterîya ingilîz

2 - ji bona ku turk jiwan biryarên peymana (sîvir) bitirse, daku di peymana (lozan) de her daxwazén wan imza bike, biwé siyaseta na kesane (şex mehmûd kirin meliké kurdistan) di /1926/ ku jibo mesela bajaré (mosil) di istifda diwêlîde kurdên îraqê ciwaba turk dane û sînoré îro hate danîn, wan ingilîzên wesîqa huqûqé insan leşker kişande ser paytextê (meliké kurdistan mehmûd ewel)xiste bin,

- bin perda agirê firinde ên bumbaran û amanca topan, bê şerim û fedya tarîxe diwî şerê rakirina wê melikîya kurdistan

de nişan didane wan leşkerên (loyî) milişyayên aşûr,

Diwê civîna aşîtiya cinga cihanê a pêşînde diwê dozdarîya a kurd de, delege ê turk got: li tu zemanî dewletek kurd nebûye ku hûn îro wê dozê lime dikin? biwê bê edebîya tarîxê (mûstefa paşa ya melkî) lê vegerand û got:

- eger te tiştêk ji tarîxê zanibûna anjî di seylojya tede pir û hindik edebek exlaqî hebûna te vê gotinê ne digotin, gelo dema we turkan bawerî bi islamîyetê anî û ji mawera el nehir di jiyînek Koçerî de bi koçên xweve derbazî kurdistan (bayezîd) ê bûn, ên ku hûn ligor xesaisên xwe hembêzkirin û sêsalan hûn xwedî kirin ew çî millet bûn? ku tu îro inkara wan ispata di welatê mede dikî, kurd ne tenê hukumdarî û di roj-helatê navînde impiratorîyên mezin pêk anîne lê ên weke (doqyanos û nemrûd) doza xudanî kirine û gelek milletên roj helatê navîn jiwanre perestîşkar bûne, biwê gotinê turk jêre (mustefa nemrûd) gotin, belê ji daxwazên mesalihên diwêlî peve turk bi her desîse - ên dijûn û çepel ve rabû, dirix wan bedkarîyan de hin xayînên kurd jî bûne hevpar, dinav wan delege - ên turk de bixwe sê xayînên tarîxî hebûn ên wek:

feyzî begê arif efendî, zulfî beg - herdû ji (diyarbekir) û (ismet paşa) ê kosmopolît kurê (hacî reşîd ji kurdên bedlîsê) wan hersî xayînan, di peymanê (lozan) de gotin: vaye em hersî kurdin naxwazin ji turk biqetîn, ew rêya xeyanetê jibo hinên di bi turk dane zanîn ku di hundurê kurdistan de weke wan peyda bikin û bikin rûreşên tarîxa milletê wan, her wekî:

pîlana silêman sebrî paşa û walîyê bedlisê - di cejna

rojîyê de walîyê bidlîs ê çu (kufra) ji bo pîroz kirina cejna (şêx evdulbaqî), di rabûnê de (250) zêr dane şêx û got: ev jibona tekya te, di cejna qurbanan de dîsa çû (250) zêrên dîtir dane şêx efendî, piştî heftekî şande pê şêx û jêre got: şêx efendî tevaya serekên eşîrên kurd van hawîran li (wan ê liba silêman sebrî paşa) civîyane tu nayê bi min re emjî herin bê ew çî civêne? şêx efendî got: belê em hirin, biwê çûna hevaltîya walî xwe bextiyar dît, çun dît ku huseyin paşa ê heyderî, xalid begê hesenî evdulmecîd begê sîpîkî, hacî musa begê xûtî - û hin hempayên bajarê wanê jî di nav wan sêrkeke daye girêdan piştî ku şêx û walîyê bedlîsê jî giyane ser hingê silêman sebrî paşa wek mudîrê komîdyakî diramî bû, û konfiransa jêrîn girêda

BINAVÊ KONFIRANSA SILÊMAN SEBRÎ Û ŞÊX BAQÎ:

Belê diwê konfiransê de wek marê serê xwe jibo xwarina çivîkan hilde ji pişt masê bi rûyek hezîn rabû û ji civîne re got:

- gelî bira - ên musulman divê zanibin ku di warek diwêlî de li hemer me û dîne me felaketek mezin destdaye! li hember vê daxwaza diwêlî û desteka pêve rabûne em tevde hukumet û gel ber pirsiyarin, bi awakî kurt û kin ew buyera gotî eve:

- bi daxwazên hin dewletan çend (baronên - êrmen) li - sîvir - bidoza tevaya wilayetên kurdistan ve rabûne dibêjin

ev hawir welatê (êrmene) di wê civîna diwêlî de piraniya dewletan ji wan re birayar daye, jiber wê çendê delege - ên me bê gotin hêştine, di /1916/ de we dît ku wan (êrmenên) di nav leşkerên rûsya de çi bi serê we anîn, dema ev welat bi keve bin sîdarîya wan hingê jiwere qewmîyet dîn û namûs jî namîne li pêşîya we û me tenê rêyek maye ku ewjî eve divê hûn liwê civîna diwêlî birûskan vedin û bibêjin: ewên ku binavê me û welatê me liwê civîna (sîvir) bidozek siya-sîve rabûne, ew kes kî bin temsîla me nakin çewa ku em wan ji xwe jî najmêrin, ji awan bi wawkî naxwazin ji hukumeta usmanî biqetin, hingê hûn dikarin jivê felaketê xwe xilas bikin an liber we tu rê nemaye? ,

Biwê gotara - silêman sebrî xwedîyê (500) zêrî - şêx evdulabaqî - wek: kişkişê ser mesrehê, ji ser kursîyê bilind bû bi hirs got:

- em çewa birûskan ve nadin, kesê liber vê daxwaza wan dijminên kafir ranebe û nekeve berevanîyê. dîn û îmana wan nîne û di girêdana gotinên xwede dest bi xwendina (ayetên quran û hedîsan) kir wek libê tîsbîyan lipê hev dikişandin bi hêrs û dengê bilind bê ku daxwaza wanên ronîştî tevan bi pelîne û ji wan re ihtîramek şexsî jî bike, diwê hindavêde huseyin paşa - ê heyderî, xalid begê hesenî, mûsa begê xûtî, hersiyan bi hev re gotin: paşa divê em xwe liderek civînek çêkin û paşê emê li daxwazê biryar bidin, her çendî ew gotin li hesabê wî nehat jî lê ji pîrsa pekî pêve jêre nema.

Belê tevde rabûn û çûn li nav bexçekî ronîştin, dîsa hersiyan rahişte şêx û gotin: şêx bi awirek dînî û teqlîdî jite û

ên weke te re ihtîramê digrin, lê ne ku diwarên siyasî de jî hûn pêşî lime bigrin, ewçend serekên eşîrên mezin xwedî gotin ronîştî bê ku tu jî gotinek bigrî an rê bidî mejî, ku emjî xwedî gotin û daxwazin, te hema ji yekve ji silêman sebrî bawerkir û gotina wî qebûlkir ev tişt ne layîqê te û meye jî ha, dibe ku hin siyasîyên kurd biwê dozê ve rabûne bê naskirin liser gotina (silêman sebrî) em vê birûskê bidin, ew kes ne (ermenin) hin ronak û siyasîyên kurd bin, hingê emê bi xiyaneta mezin bikeven ber mehkema tarîxê kesek nikare jimere difaê jî bike dema şêx ew gotin bihîst wek: histira ku zîtikan bide û bi hêrs dîsa weke berê got:

ez berê dizanim ku liba we dîn erzane, dixwazin hûn êrmen tevî bi harsik û axçikên wan re eraqê vexun, rabin kesê bi gotina van xwe bi şûnde bide dîn îman û nîkeha wanjî nîne, biwan gotinên şêx, ji her sîyan pêve tevaya wê giranî û piraniyê dane pê şêx û çûne ba (silêman sebrî) û şêx efendî got: paşa binvîse, paşa ligor dilê xwe nivîsî wan tevan imza kir, piştî ew xiyanet bi destên xwe imza kirin, paşa got: ji dayîna vê birûskê re pere divaye, liser masa paşa (1200) zêrên zer hatin jimartin, ku paşa jîwan (500) zêrên walîyê bedlîsê zêdetir (700) zêrên dî jîwan girt, ew birûska xiyanet di peymanî (lozan) de hate pêlêkirin şêx jî giya wê xiyaneta (îsmet, feyzî û zulfî)⁽¹⁾,

1 - di /1928/ de ji bona ku turk karibe şoreşa (şêx seîd) vemrîne efûya umûmî da, jiber ku di nav şoreşê de (partî) nebûn, piraniya millet ew efû qebûl kirin, hingê ez li hepisxana (nîgde) bûm emjî hatin berdan di civînek wan girtiyên ku hatibûn berdan li sitenbol qehwekî ber behrê em gelek ronîştî, gotin em herkes gunahên xwe bêjin: hingê dinav wê ittîrafêde (şêx evdulbaqî) biwî gunahê xwe itîraf kir.

ew peymanana (lozan) bi daxwaza mesalihên wan dewletên ku diwê herbê de zefer girtibûn pêk hat, daxwaza wan bûn ku turkiye li sînorê qafqasya li hember rûsya bimîne, lê dixwestin biwê doza kurd, ingilîz turk bitirsîne da ku her daxwazên wî qebûl bikin û mosil bi ser îraqêve bê berdan ku heremê petrolan ke erdê kurdistana îraqê deye, jibona kurdên îraqê xwe bi turk negirin ne zêde,

LI HEMBER PEYMANA LOZAN ŞOREŞA KOÇKERÎ:

wê peymanana (lozan) a ku di/23 temûz 1923/de ew bendên (sîvir) bi naskirina mafek hindikên welat guhartin, ku dawî (mustefa kemal) ewjî bi qetilama kurd guhart, li hember wê sitemkariya diwêlî li heremê (sêwas, eşîra koçkerî) bi fermadariya elîşan beg - bi doza mafê xwe - ê qewmî û tarixî ve li hember turk bi şoreşek xûndar û maldar ve rabûn, lê turk weke caran bi intiqamek unsurî bi awakî seferber bi sîlehên giran leşkerek pir di bin fermanda faşistê (laz usman paşa) de ne tenê bê nîzamek eskerî û şervanî lê bê exlaq û wicdanek insanî gund tevî jin zarûk pez û sewalan dikirin amancên topan, ew qetilama wî cenwirî ne kêmi wê felaketa wan êrmen ên - nav leşkerên rûsya bûn dema leşkerên turk derbazî gundên bergeha xwe dibûn jin zaruk, kal pîr nexweş birindar bê ku wan dîl bigrin tevde dikuştin, çewa ku ji şewata gundan pêve malên wan jî talan dikirin derbazî welatê xwe dikirin, ku ew weraseta mengolî piştî hezar

salîjî hêj di xuna wan de meruv digot, hêj nû bi cengiz re ji (qereqorim) tên, belê biwan sitem karîyên kes nedîtî ew şoreş hate vemirandin, behsa wêjî weke ên dîtir derbazî van rû pelên tarîxa meye sitember bû!....

SITEMKARÎYA INGILÎZÊ EMPIRYALÎ LI KURDÊN ÎRAQÊ:

Di tarîxa kurd de (ingilîz) di heqê kurd de sitekrek yekemîne, jiber ku berî welatên ereb vegire têkilîya wî bi kurd hebûn, berî ku di /1869/ de ew tengava (siwês) bê vekirin, di rêya bazirganî de bixurtî têkilîya wî bi kurdve girêdayî bûn, jiber ku rêya bazirganîya wî şirketa şerq a hindistan - di erdê kurdistan û bin sîya mezin û serekên eşîrên kurd de derbazî (besra) dibûn, ji (tereبزûn) ku ji behrê diketin erdê reş, bi erebe - ên hespan ji - sêwas, melatî, xarpêt, diyarbekir, sêrt mosil - diçûne (beşda) jiwir li (besra) hêj diketin geşteyan û diçûne (şiketa şerq), liser wê rêya dirêj her şeş saet wek: otêlan wan hebûn, heya di /1926/ ku em bi pyatî ji (xarpêt) birin anedolê heyani sêwasê - hêj ew xan mayinde em liwan dihêwirîn, - ingilîz - wek siyaseta xwe biwî navê bazirganî li dor wê rê pêderpê - xubera, muhendis, muerix, uryantalîst, ulema - ê arkeolojî û jiyolojî - zemînê kurdistan di pelandin ku yek ji siyaseta wana xûn mijî bûn,

Biwê daxwaza gotî a bazirganî ji /1870 - 1882/ qumanda nê ingilîz şoreşgîrên (şêx ubeydulhê nehrî) talîm dikirin û ji

wan re bi awakî rotînî hin sîleh jî di anîn, hin tufengê tek fişek binavên eynelîyan hêj nehatibûn roj helatê navîn ji wan re di anîn, ew şoreşa mezin ku diwan (12) salan de kurdistan roj ava û îran tevde kiribûne bergeh, ji şoreşê pêve baca rê ku bi kurdî gumrike jîwan eşîrên dor rê re gelek hediye didan, wan daku têkilî bi malê wî nekin, di /1969/ de ku ew tengava (siwêsê) hate vekirin derya (sipî, sor û hindê) giya hev ew bazirganî ji wan ereban wergerîya geştevanî, hingê ew benê dostanîya teqlîdî û menfiet perestî dinav wî û kurd de qetîya,

Her wekî li jor hate gotin ku di /1916/ cenga cîhanê a pêşînde ku ingiliz kete sûrî û dawî di (peymanên - sanrîmo û saykis pîko) de sûrî û libnan ji (firansa ra berda û kişîya (îraqê) kurê şerîf huseyin (feysel) jî bi xwere birin (bexda), belê dema seşkerên ingilîz ji (besra) der bazî (bexda) bûn, jibona ku ber bi bakur ve gav bidin dîsa ew dostên wî ên berî (48) salî jibo siyaseta wî jêre lazim bûn ku wan bike mertalek jibo hêzdariya xweya leşkerî,

lewre diwî zemanî de erebên îraqê ji kurd ne zêdetir bûn, çewa ku ne weke kurd tevde museleh û cengawir bûn, di warên politîkî jiyogirafî û ehmîyeta istiratîjî dejî, zemîne kurdistan hesasiyetek mezin bixwe digrtin, nemaze li derbendê qafqasya ji /ARARAT HEYA ZAKROS) silsila wan çiyayên bêjimar ku vargonên tirênê bi hevve girê dayî ser dane ber ewcên felek, ji /3000 - 5000/ mitir bilind, tevde bi daristan gêlî û gaz newalên kûr, ku di şevên tarî de destê meruv jî meruv re xuya nakin, çewaku jî (ararat heyâ

helegurt) sînorê îraqê (210) mîle rêya kin ku ordûyên sor bigîjin heremê petrolan, di dest kurd deye, jiwê ehmiyeta jiyogirafya pêve, ingiliz di awirên tarîxî de jî dizanibûn ku nejadê kurd lema arî û koka rojhelatê navînin, biwan agahîyan jî di dil û heşê wiyê sitem de reha insaf edalet ne jend ku bêje divirde dema ez heqê kurd bispêrim wan, weke mêvan sifra xwarinê ji xwediyê malê re pêşkêş bike tê minetek jî nîne, çewa ku diwê peyman (sîvir) de wîjî bixwe eger çi daxwazê be heqê kurd birayar dabûn, çewa ku di warên siyasî û cugrafî de jî her wê ji ereb zêdetir ji kurd istîfa de bikrana, lê ji awan bi awakî pir hindik li kurd awir veneda ku di kesafeta cugrafî de ev millet dagirtîye çewa ku ew bîr biwê wesîqa xweya huqûqê insan jî nebir, diwan salên intîdabê de her ji sitemkarîyê pêve jê nehate dîtin!

Diser her exlaq û edaleta huqûqê insan re gavda bed-kariya hem ber tarîxa xwe berî tarîxa kurd, ji erebên hicazê (feysel) li (bexda) kir melikê îraqê ew kurdên berî (5000) sal berê xwediyên wî welatî biwê mîrxasî û cengawirîya wanve xistin bin sîdarîya nejadek jiwan kêmtir, belê ew sitemkarîya ingiliz bûn ku di /1919 - 1931/ jibona mafê xwe (şêx Mehmûd berzincî) li hember ingiliz bi şoreşek dirêj maldar û xundarve rabû, bê şerim û edebek dîmoqîratî bi sîlehê nûder ê giran ku di cenga cihanê de pê impîratorîya usmanî vegirtibûn, biwê hêzdarîya berîtanya uzma dakete şerê nejadê kurd di welatê wande, gund û bajarên wan wêran kirin, çima ku kurd xulamîya xulamê wî liser xwe qebûl nakin, hingê yek tenê jî leşkerê îraqê tune bûn ku jibona

sîdarîya şerê kurd bikin, ji leşkerên wî pêve, her wekî kurd ketibûne erdê ingilstanê.

ŞÊX MEHMÛD Û INGILÎZ LI ÎRAQÊ:

Dema ingilîz kete erdê îraqê ji /1916 - 1919/ diwan sê salan de her û her bi ingilîz re didan û disendin daku bi awakî siyasî ne şervanî bawerî bi huqûqê kurd bine, lê ji awan bi awakî ew heqnasî ne ket bala ingilîz biserda jî (feysel) kirin melik kurdjî xistin bin siya wê dewleta ku di tarîxê de nû peyda, belê piştî ku gumana kurd di insaf û edaletek ingilîz de nema hingê bawerî bi nefsa xwe anîn û li hember wê setimkarîya ingilîz bi şoreşê ve rabûn,

Her wekî li jor gotin derbaz bûn ingilîz binavê verîtanya uzma xwedîyê wesîqa (huqûqê insan) bi sîlehên xwe - ên giran leşkerek nîzamî pêve tevî milişya - ên (luyê û lifi) ku ji (aşur û kild) bihevketî berê xwe dane şerê kurdistan, ew (aşûr û kildên) ku jiber qetilama turk xwe avêtin hembêza kurd ew paraztin, binavê mislmanî û filetî ji dêla turk ve bê insaf û dilovanî kurd dikuştin, da ku ingilîz nîşanên zefera şerê kurdistan bide wan,

Diwî şerê dirêj û felaket de, çi gava ku şoreşgirên kurd dijwarîyek mezin digiyandin leşkerên ingilîz, ji (fermand - ê şoreşê şêx mehmud) civîn dixwestin, şêx bi ingilîz nebawer ku here ba wan, lê ingilîz bi xasaisê kurd dizanîbûn ku here ba wan dicivînê de weke wan pêre bê bextî nakin çewa bi tu kesî re nekirine, diwan civînen gotî de carek hin quman-



danê ingilîz li - çiyayê surdaş - li bin darek ronîştî, qumandanê ingilîz ji - şêx mehmûd - re got: hûnê bişer xisarên mezin daynin, hingê - şêx - lê vegerand û got: hûn ji pirsê navê dimoqirati fedî bikin û xwe ji bergeha me û erebê bidin alîkê û lime nêrevanîyê bikin, eger min nekîr ku ew melîkê we - ê kertoni li hundirê (bexda) qundera min boyax neke hingê zanibin ku em layîqê bindestîyê ne, lê tevî wejî di be revanîya mede sistî çê nabe ji fedakarîyê pêve, ji peyaki xwere got: wî tûrê bi darêve dalqandî daxê û liber (şêx) danî, nandk tenûrê huşk weke kevir jê derxist û liber çavê qumandanê ingilîz hejand û got: ew mîletê ku jibona heq, kiramet û şerefa mîletê xwe bivî nanê hişk hember we dikare şer bike zû direng. ez, xeynî min dikarin çavê we û melîkê we derxin, ya sitemkarên bê fedî tu hatî bimere bikevî civînek naskirina heqqê me an tu hatî gefan limin bixuyî? belê tevî wan mêrxasî û fedkaran di awirên siyasî de kêmanîyên wan hebûn, bi awakî kurt û nezaniyên jêr têne derpêş kirin:

1 - jibona alîkarîyek diwêlî dijê ingilîz bi destxe di /1923/ de (şêx mehmûd) ji heremê (silêmanî) bi siwarîya hesip çûye (Tebrîz) liwir ji qonsiliya (rûsya) bi bihstokê bi (lenîn) re jibo deste gîrîyê - pêre peyivîye bê ku (şêx) zanibe di rusya de hukmek bîroqirati qeyser hatiye rakirin, hêj partiya komonîst bi aydiyolojîya xwe karê welat û sazmana hukmê pêk ne anîne, ji milê di hêj di navbera (polşevîk û menşivîk) de li serê çiyar şer heye, ew hukumeta polşevîkîya nû divaye ku dewletên dorwî pê îteraf bikin, çî imkana rûsya hebûn ku

diser turkiyere gav bide îraqê, jibona dostaniya turk û danîna sînor du wilayetên (qars û artebîn) biser turkve berdan, dîsa aydiyoloji (lenîn) dijê şêx û rûhûyan bûn, di awirên siyasîde jî ji rûsyare heya nihojî ne daxwaze ku li navbera - qafqasya derya sipî û xelîc - binavê qewmîyeta kurd dewletek xweser hebe,

lê nizanim çima bê ku (lenîn) bêje imkana me nîne, vajiyê aydiyolojiya xwe bersif daye şêx mehmûd û gotiye: em têkilî bi hundurê dewletek dîtir nakin ew dewleta gotî empiryalîyê ingilîz di îraqê de mandeter û şerê nejadek di welatê xwede azadî xwaz dikin, ku jere ne dihatin gotin dewletek xwedî welat,

2 - diwî zemanê gotî de turk ji îraqê kişîya tenê li (rewandiz) merkezek wanî eskerî hebûn, di navbera turk û ingilîz de liser wilayeta (mosil) kêşmekêşek mezin hebûn, hingê tevaya qeza ên (mosil) ji %95 - kurd li hundirê bajarê (mosil) ji %75 - kurd û cografîyen jî erdê kurdîstane, biwê hincetê ingilîz û turk herdûjî dixebitin da ku pîraniya kurd bixwe bigrin ku istiftakî diwêlî wê çêbe, biwê daxwazê turk ji eniya (eskenderon) alahî qumandanek politikçî ji çerkezên (mîsrê) elî şerîf - bi leqba (uzdemir) şandin (rewandiz) da ku bi dor (şêx mehmûd) keve, ji alîkî jiber wan sitemkarîyên ingilîz ji aliyê dî binavê - musulmanî (uzdemir) heşê (şêx mehmûd) morufîn kiribûn, bê ku (şêx) lixwe bifkire û ji xwere bibêje: wan turkên biwê giranî û pîraniya împîratorîya mezin, ji erdê (mîsir, sûdan, fas, cezayîr, hicaz - ji ber ingilîz pişt pehin kirin li (rewandiz) sekinîne, wê çî

karibin ji minre alikariyê bikin, dîsa bê ku zanibe biwê çûna ba (lenîn) û dostaniya (uzdemir) wê ingilîz bihtir li neyartiya wî xwe bişdîne, lê her wekî agahe hukmê zeman ji mekan û her hendese - ên siyasî mezintirre, dîsa ew telpe - ên ewrên zemanên ku her daxwazan wer digerin awakî dîtir. diwê germa agirê şerê (şêx mehmûd) û wê dilreşiya ingilîzan jê, delege - ên ingilîz ji usbet elumem, ew agahdar kirin ku (koma yekitiya miletan) jibona istifta mosil heyetek dane saz kirin wê bêne îraq ji kurd bipirsin bi turk an îraqre dimînin, biwê bihistina wek rovi siyaseta ingilîz divayê guhartinêbe hingê ingilîz ji berê mezintir bi pehlewani derket ser şerît.

LI SILÊMANÎYÊ ŞÊX MEHMÛD MELIKÊ KURDISTAN:

Belê biwê siyaseta jiyopolitiki siyasîyên ingilîz birû gişiyek rovîti pêderpê bi (şêx mehmûd) re diketin civînan, biwan dayîn û sendinên gotî di encamiyek bê encamî de bi dayîna mafê kurd di kurdistana îraqê de biryar dan, ku (mehmûd ewel qiralê kurdistana başûri) tevaya kurdên îraqê di warek tarîxî, cugrafî, de di rajêriya wîde girêdayî û bajarê (silêmani) paytextê kurdistana îraqê, ew daxwaza ku ji zemanek dûrve nejadê kurd biwê armancê mal û can danîbûn, lê diwê siyasetê de daxwaza ingilîz ji ewbûn ku tevaya kurdên îraqê xwe bi şêx mehmûd bigrin ku hingê bi îraqê intidaba wîre tevî mosil dimînin, biwê siyasetê (şêx mehmûd) kirine melikê kurdistan), bi dayîna heqqê kurd û melikiya (şêx



Melikê kurdistan şêx Mehmûd.

mehmûd) berê melikê ingilîz (corc) û dawî (feysel) melikê îraqê bi awakî teşrî û mîsaqek resmî herdûyan jî imzakirin⁽¹⁾,

Biwê buyera tarîxî ku ji hezar salîve daxwaza her kurdi bûn, ji her derên kurdistan bi kewt û koman ronak, nişte-man perwer û siyasîyên kurd ber bi payitextê dewleta xwe kurdistan ve bi dilgeşî dikişîyan, di zemanek kinde di her warên teşrî, îdarî û eskerî de heykela hukumeta xwe dane sazkerin, (mustefa paşa yamelkî) naîbê melik, şêx qadir ku birayê şêx mehmûd wezîrê berevanî û fermande - ê hêzên çek hilgir, jîwan pêve her serdar û karmende - ên xwe danîn, ingilîz jî (mêcer nuêl) şandin (silêmanîyê kirin musteşarê (melik mehmûd), ne tenê li silêmanîyê lê li herderên kurdistana başûrî tevaya serkar, karmende ji kurd bi zimanê xwe - ê maderî karê welat digerlandin, jê û pêve li bajarê silêmanîyê çend rozname û kovarên kurdi derdiketin, lê hatina wê licna diwêlî jibona mosil ne dûr bûn, daku di kutahiya mesela mosil de ew melikîya (şêx mehmûd) jî liba ingilîz kutah bibe.

Di /1924/ de licna istifta diwêlî çû îraqê jibo mesela mosil, ango ew azayên diwêlî di navbera herdû alîyan de derkenar bûn, lê mexabin di ger û dest pêka estifta - ê de ew şandek ketin mesrehek siyasî ku hêj di tu mesreh û komîyaên diramîde jî ew sehne ne hatibûn dîtin, diwê temsîliya komîdyaya de hin bir û bêş bi awayê jêr ketin mesrehê:

* - Ew civata ku (usbet elumem) şandibûn, ango di navbera herdû alîyan de wê derkenar bûna, lê bi her awayî meyla ingilîz dikirin.

* - Ingilîz jî hin siyasîyên wek: (idmondiz û mêcer nuêl) xis-tibûn nav ronîştmanên kurd biwê piropaganda dayîna heqqê kurd heşê wan benc dikirin,

* - Turk jî bi (uzdemir û turkemenên kerkûk) binavê musulmanî û ingilîzê kafir di nav welatîyan de PIROPAGANDE dikirin,

* - Çewa ku peya ên melik feysel jî di nav millet de digeriyan û digotin: hûnê çewa - melik feysel ji malbata pêxember - bi - mustefa kemal bav yahûdiyê selanîk - bidin guhartin?

* - Beg û zemîndarên turkmenên kerkûk jî ji ketina bin siya dewletek kurd zêde zivêr bûn, jibona ku xelk xwe bi turk bigrin pere dirjandin,

* - Erebên ronîştmanên bajarê - mosil - ku hingê ji %20 - bûn ji sîdariya dewleta - şêx mehmûd - ditirsiyan ku di nav camîa nejadîya kurd de bêne bişaftin, li (tilefer) û hin deran jixwe re heval bend peyda dikirin,

* - Aşûr û kild jî dijê kurd, turk û ereb hersîyan bûn, wanjî dixwestin ingilîz li îraqê bimîne, bi gumana ku wê karibin wê hezareta xweya berê vegezin, tevî ku kesafeta cugrafî winda kirî.

* - Di nav kurd de jî hin serekên eşîran nemaze hin şêxên talibanîyan jî jiwê - melikiya şêx mehmûd - çav nebarî dikirin,

* - Ew civata diwêlî a pirs kirinê bixwe jî ne yek rûbûn, du genralên - ingilîz û turk - delege - ên - kurd û feyselji - biware bûn, wan azan bixwe bi dilreşî awir lihev vedidan,

Belê di wê piyasa borsa siyaseta awêlî de ew sêrk mid-rano hatibûn çêkirin, diwê gerê de çûne çiyayê - şengal - nav (yezidiyên kurd) tevan got: em ne turk û ne ji ereb dixwazain, em heqê xwe - ê qewmî û tarîxî dixwazin, yekê ji wan azayên diwêlî ji wan pirsî û got:

(Dîne - yahûd, mesîh û muhemed) hersîjî libawan kitêbek daketî heye, lê êwe tiştek nîne çima? lê veğerandin û gotin: - hersîyan jî ew kitêb jiber (avista - hezretî zeredêşt û musehefa - me a reş girtine, ew (muhemed) bixwe jime û (abram) ji (ruha) çûye (eqebe) nav wan, çewa kû bingeha (meke - ê) ji wî danîye ku ji eşîra goş pismamê (nemrûd) bixwe bûn⁽¹⁾,

Belê bi wê siyaseta pêçandî ku ingilîz ew (melikîya şêx mehmûd) di nav kurd de ji xwe re kiribûn mertal, jiber wê çendê tavaya kurd digotin em xwe bi îraqê ve girêdayî dixwazin, yanî bi (şêx mehmud) melikîya kurd ve dimînin, lê di mezher de bi feysel re bûn⁽¹⁾,

PIŞTÎ ku biwê empiryalîya heq ne nasî ingilîz daxwaz bi dest xist, di /1926/ de bi navê turkên kemalistî û hukumeta îraqa nû peyda, (mosil) biser îraqê ve hate berdan û li nav

1 - divî waride du kêmaniyên mezin dikevin herçav. yek jê diwêlî. dema wê heyeta diwêlî dit ku di kisafeta cugrafide kurd dagirtiye. ligor misaq û edalet diwêlî nehate bîra wan ku jivî miletî huqûqek siyasî û qewmî divaye ew rahêjin darê hukmê xwe?

- a diduyan divabûn ew siyasî û ronakên kurd berê dinav milet de bigeriyana û jiwanre bigotana - dema jiwe pirsîn bêjin: em ne turk ne ingilîz û ne jê melik dixwazin, em xwe bi melikîya - şêx mehmûd re xwe xweser dixwazin, dema ku em insan jimere heq û keramet diva be.

bera turk û îraqê di (xetê broksil) de sînor hate danîn, ku di cildê diduyan muzakeratên minde wê ew mesela (mosil) bi kilîşên wê heyetêve bikeve ber çav, piştî ku ingiliz ew daxwaz bi dest xist dewra wê (melikîya şêx mehmûd) jî liba ingiliz kutah dibûn , ingiliz hêzên xwe - ên eskerî kişandin-silêmanîyê, hukumeta (feysel) jî hin serkarên xwe şandin - (silêmanî û hevlêr), lê (şêx mehmûd) ew hêzên ingiliz û serkarên îraqê vegerandin, biwê dîsa di nav wan de ji berê diwartir şerên xûndar dest pêkir,

Belê ingilîzê ku xwe binavek dimoqiratî hildidan, diser wan elqaban re gavda, bi lişkerek giran û nîzamî tevî sîlehên herbek diwêlî dakete cenga kurdên ku di welatê xwe de heq û kerameta xwe ya qewmî dixwazin, ji tufengan pêve bi tang û topên meydan raserî wan firinde ên bumbaran bajar û gundên kurd xistin bin perda agirek dûjîhî tevî jin zarûk, pez sewal û çandinîyan, diwî zemanê ku turk jî kurdistana bakur kiribûn hîtona agir, kesek nikaribûn ku di gazîya bira - ên xwe kurdên îraqê de herin, belê biser wê faşistîyê de jî hêzên xwe - ên eskerî binavên mealimên cigrafîya kurdistan nav liwan kirin wek: hêzên koyî kel, hêzên - sordaş hêzên - sefin - û wekvan, bi awakî JENOSÎT derîyê herbek sitemkarî li erdê kurdistan da vekirin, diwî şerê welê zêde girande (şêx mehmud) li enîya - derbendê baziyan - birîndar dîl kete dest ingilîz, biwê birîndariyê ji welat dûr xistin birin (bumbê) li hindistan sê salan dûrketî ma,

Lê biwê dûrxistina (şêx mehmûd) şer ne sekinî bira - ê wî (şêx qadir) femandariya şoreşê bi dest xwe girt, belê ingilîz

nikaribûn bi agir û hesin wê daxwaza azadî û berevanîya welat ji heş û giyanê kurd derxin ew daxwaza ku ne tenê insan heya di giyanê her heywanî de jî weke madde û hereke ji hev nayê cudakirin, jiber wê pîrozîya armanca kesane her û her şer likarbûn, biwê tol vedana ku ingilîz mosil ji dest turk bi derxistibûn, biwê hincetê di enîya bakur de hin leşkerên turk ji (rewandiz) heya (şeqlawe) daketibûn alîkarîya şoreşgîrên kurd,

Ji tîrsa ku turk an îran jiwan şoreşgîran re bibin alîkar wê hingê şer bergehê mezîna bigre, xwestin (şêx mehmûd) ji hindê vegeerînin bi gumana ku şêx (mehmûd) ji hindistanê vegeerînin, biwê vegeerê karibin bi hin fen û fûtan şer bidin sekinandin, lê ew gumana wan bero vajî liwan vegeerîya, piştî (şêx mehmûd) ji (bumbî) vegeerîya (silêmanî) yê ji hawirdorê walat kurd bi kewt û koman ber bi ziyaretîya wîve dikişîyan, diwan du rojan de her dinav wî û siyasîyên kurd de şewir bûn, roja sisîyan dîsa (şêx) ala şoreşê hilda, wî zemanê ku (simiko) jî lacî ji îran hatibûn îraqê bakurê hevlêrê li gundê (dêrê) diman, diwê şoreşa dawîn de, ingilîz zêde tirsîya ku (simiko) jî bigîe (şêx mehmûd) wê şoreş ji kurdîstana îran heyani îraqê bergeh bigre, jiber wê çendê mendûbê samî - yanî hakimê siyasîyê ingilîz (hinrî dibis), bi (şahê îran) re da û send ku binavê civînek dayîna mafê kurdên îran (simiko) ji îraqê bikşîne îran, biwê pîlana gotî (rîza şah) di roz naman de da bela kirin ku efûya (simiko û peyaên pêra) hate dayîn ku vegeerîna civîna aşîtiyê, her çendî siyasî û nişteman perwerên kurd liber gerîyan û jêre gotin:

ismaîl axa mere wê (şah) tejî weke bira - ê te (cewer axa) bikuje, lê wê mêrxasîya wî nehêşt ku jêre tirs çêbe got: şah naskirîye ku bê dayîna heqê kurd di îran de aşîti nayê paraztin, wê mafê otonomî bide me, biwê bawerîyê (simiko) bi hin siwarîyên xweve derbazî îran bûn, qumandanên sînor jêre gotin: ligor ku bime dane zanîn wê li (nexede) şah bi tere bikeve civînê, berî ku bigîje (nexede) leşker li pêşîya wî kemîn girtibûn, dema giyane gastîna ber serayê ji hawîdor gulle liwan barîyan, tevde biser hevde hatin kuştin,....

(şêx mehmûd) her ma şoreşgîr, lê diwê herba dirêj û hêzdarîya wî inglîzê sitemkar de welat tevde wêran bûbûn, di warên abûrî de belengazîyê weke mijê girtbûn ser welatîyan, ji muhacirîyê pêve çî dever ên ku diketin nav enîyên şer şoregîran enî ber didan jin û zarukên xwe jiber agirê şer direvandin, jiber wî qasî roj biroj şervanî kêmîtir dibûn, wanjî weke şoreşên dîtir destek siyasî ji derve peyda nekirin, lewre mesalihên diwêlî bi dewletên kurdistan vegirtîyan re heyê⁽¹⁾.

1 - tevî wê empiryalîya inglîz ji meruv gelek xerib dibîne ku çewa (melik corc) lixew qiyas kir ku bi awakî jiyopolîtîkî melikiya (şêx mehmûd) imza kiribûn, heya ku daxwaza xwe bi destxin liwê gotina xwe biqulibe? ku hingê ji (kongo heya keneda) impiratoriya wîbûn.

DI NAV WAN PERDE ÊN ZEMAN DE DÎSA JIYÎNA MIN DIBE PARDAR

JIBER ku jiyîna mina gelerî bi gil ve girêdayî ew qûnaxên wan zemanan di ser xwere derbaz kirine her awayên civatî bixwe digre¹

divê bergihêde dîsa jiyna min hin awayên adet, teqalîd û bûyeran bixwe digre,

salek berî cenga cîhanê umrê min şeş salî bavê min mir, jixwe bi şûnde em dubira û sê keç ketin dilovanîya diyaxwe, ligor wî zemanî û ew navçeya em têde, xwedî zevîyên avî û çandinî, bexçe, rez, pez û sewal dewlemendê gundê xwe bûn, piştî bavê me giyan siparte peyarîya (xuda) diyame deriyê mêvan xanê girt, di warê abûrî de ew mesrefa odêjî li hebûna me vegerîya, ligor teqalîdên me - ên qewmî û malbatî pismamek me ku me tevan jêre (apo) digotin, wî oda mêvanan da vekirin apê minê heq, yanî bira ê bavêmin navê wî (MIHÊ) bê dunde du keçên wî hebûn, jibona ku malê wî ji mêrên keçên wî hinên xerîb re nemîne hêj umrê min çar salî bav û apê min mehra keça piçûk limin û a mezin li kur apê min ku bavê wî mirî (mehemedê sadiq) birî bûn, wî biribûn, lê a min heyânî ku em mezin bibin, ew

1 - çî kesên ku navên wan divan nivîsaran de hatine gotin tevde mirî an hatine kuştin. jiber wê çendê navê wan didim zanîn.

bavê herdû keçikan apê min berî bavê min mır, ew xanîyê mezin kirin du par, lê hewşa mezin ji herdû malan re bûn, diwê nêzîgî û tevlî hevîyê de, her û her di navbera diya min û jin apa min de pevçûn bûn, wê destgirtîya minjî xwe didane rix diya xwe liber diyamin radibûn, ji ber wî qasî dilê min jê reş bûbûn bîr nedi birin ku wê malê apê bixwere bibe,

dema bavê min sax ji - diyarbekr - kitêbên dibistanê anîbûn, jiwê xwendina quranê pêve wî dersa min didan, piştî mirina bavê xwe min (quran) xilas kiribûn, diwê cenga cîhanê de her wekî liyor hate gotin muhacirên çar wîlayetan bi ser mede rijîyan, ji muhacirên (mûşê) jêre (mihmed efendî) û kurê wî (haşim efendî) muelimê (lîse) bûn, diya min xanîkî bê kirê da wan jibona ku ew haşim efendî dersa min bide, diwan sê salande, havîn, zivistan, her dersa min didan ku dewra didûyan xwendina min bûn, êdî umrê min li dor yonzde salî bûn, wî haşim efendî ew felaketa ku êrmenan bi serê wande anîbûn behis dikirin, di dawîya wê herbêde êdî min gavdabûne buhara jiyînê hêvîya xortanî û evînê di giyanê min de dilivîyan,

jiwan muhacirên (mûşê) pêve ji zazayên (cebqçûrê) binavê (mehmûd ê kekan) di xanîkî medebûn, dişek wî binavê (amîne) çend sal jimîn mezin tîrbûn, ew bedor min ketibûn, ez li evînê şeyar dikirim yanî li dibistana evînê **alfaba** bi min didane xwendin, belê (amîne) keçek bejna wê navîn, rûyê wê gilovir, enî pehin, birûyên wê reş weke qeytanek kevanî li enîyê û raser çav re xetek girtibûn, mijagên wê dirêj û reş li dor cvankan rewşek derpêş dikirin,

çavên reş û fireh sipîkên çav reng çefîtî, hinarên rûyan sor û sipî reng ji hev digrtin, di morofolojiya kurdîde bi her salixî xweşî û geşî didan dilê meruv, singê wê bilind, nav mil û qorik pehin, nava wê wek bazinek, guliyên pir li newqê diketin, gerdenek dirêj biwê xemla fizikî bejna wê weke liber rojê siyek liser avê vede, divan nivîsaran de ku umrê min giyaye (75) salan hêj ew filimê bejin û bala (amîne) liber çavê mine, lê mexabin diya min nehêst ku em di jiyîne de bibin hevpar, digotin: muhacirek bidu peran, ji milê di hêj ne çaxa kurê min û zewacêye,

piştî giyame gewziya xortanî û çaxê, min berê xwe jiwê keç apa xweya mehir birî guhatibûn, dilketibûm keçek pis-mamek xwe ê dîtir, lê wî apê me - ê ku mezinê me tevan ne dihêst û digot: ma çewa ji keç apa xwe biqere ku lê mehir kirîye, diwê hindavê de îmamê gund li bermin xefik vdabûn, bê ku zanibim da xwaz çîye, her wekî,

ew îmamê gotî yek ji bira - ên (şêx seîd efendî) binavê (şêx tahir) meruvek zêde geveze fesad û çav nebar bûn, çewa ku tu hêvîyek insanî jixwe ne dikirin, timî liber dîwaran bi pîrekan re civîn çê dikrin, ji gundiyên mere ji her digotin: çi zevîyên qenc û avî, bexçe û aşên avê di dest mala sadiqan dene, ma evjî insafe, biwê hîlebazîya ku apê min razî bike daku ez keça birayê wî bînim û wê mehir birîya xwe berdim da ku ew mehir bike û bimere bibe şîrikê wan zevîyên ku her jêre xiyal bûn, ez biwan melenetan nizanibûm, bidor min ketibûn digot: ezê apê te razî bikim, jiber wê çendê ez timî lidû şêx bûm ku ji min re wê qencî

bike, biwê daxwaza gotî bi apê min ve bû qijnik jê ne qerîya, heyani ku apê min razî kir xeber da me,

piştî diyamin û miruvên me çûn xwezgînî û birîna qalîn, yek hat gazî min kir ez çûm ku şêx bidu kasanve li derê oda apême sekiniye ji min re got: apê te dibêje eger wê keç apa xweya mehir kirî ber ne de ez nadim, minjî bawer kir diwê xortitiya gunditi û nazaniyê de ji alîkî, ji aliyê di diwê serxweşiya evîna zewacê de bê ku zanibim daxwaz çiyê û çewa wê keç apaxweya bed bext jibo çi berdim, belê diwê gêjaniyê de şêx keç apa min bimin berda liber wan du şahidan piştî ez zewicim wek: miriyê serê wî li tehtë keve lixwe şiyar bûm, ku çewa min keç apa xwe bê gunah berda û pê hesiyam ku apê min ew doza berdanê limin ne kiribûn, şêx direw limin kir, hingê min got: ezê şêx bikujim, diyamin got: kurê min eger tu şêx bukuji tukes li tu welatî me nahewîne, ji milê di ji diyarbekir heyani qafqas millet pêgirtiyê (şêx seîd) de, tê bê kuştin, dawî şêx ew keç apa min bir û bimere bû şirikê mal, belê heyani vî umrijî li xerîbiyê ew kederê wî ne şêx bi minre weke siya min digere!....

ÇÛNA MINA ESKERÎ Û DESTPÊKA FELAKETAN...

di wan zemanan de ku li hin deverên nêzigên qeza û wilayetan hin qanûnên usmanî dest pêkiribûn, jîwan qanûnên zemînî, kesê ku zeviyên wî liser navê wî ne quçan kirî bûna ne dihatin naskirin xwedî, ew tapûjî bê nifûs ne dihatin

dayîn, dema kesê nifûs bigirtana hingê wê eskerîjî bikirana, jiber wî erazîyî piştî zewacê bî du salan ez xwestim eskerî di bêluka jandirman de li qeza (farqîn), hingê di nav jandirman de xwenda nebûn, pirañiya bê xwestina eskerî meaş hin kesên fiqîr dibûn jandirme, bêlik qumandan ji min pirsî tu xwendayî? min got belê, ez bi hin nivîsandinan imtihan kirim, dît ku nivîsandinek xweşik tevî imla dizanim gelek keyfa xwe ji min re anî û di nivîsegaha xwede ez kirim nivîsevan, jê û pêve yûzbaşî ji zazên (siwê-rek) jêre (nûredîn beg) digotin, dît ku zimanê dinbilî dizanim hêj bêhtir dilgeş bû, wan jandirme - ên kevin gotin: çima ewjî nayê teelmê û payîne nake, min got ya qumandan di siwarî û nişande ez ji mala xwe hînbûyî me fermo, em derketin telîma siwarî di ser pênc xendq û sê dîwaran re derbaz bûm bi serbestî, ew diwan xendeqan werdibûn, nişanjî min li qol sê caran amanc hingaft, qumandan pirsî tu li ku vê hînbûyî? min got: ez nêçîrvanim û bi siwarîya vî hespê xwe min timî bi tajîyan nêçîra keroşkan kirîye, dibînî ev hespê nêr dema ez li pêşîya wî derim. ew lipê mine ez diser keviyek re çeng didim ewjî xwe di ser wê kevirê re çeng dike, hingê qumandan enîya min maç kir. şeş agirek zabitan damin û panzde roj jî îzin da min ku herim mal,

piştî vegeeriyam ez şandim qereqola (pira batmanê) şeş nefer dibin emrê minde (34) gund biwê qereqolêve girêdayî bûn jîwan neferan sisê turk sisî kurd bûn, tevî wê serbestiyê jî zêde jiwê eskerîyê zivêr bûm, nemaze min ne dixwestin ji kesê re pate hildim, heya wî yûzbaşiyê kurd jî, her û her

neyartîya hukumeta turk di dil û heşê minde cî girtibûn, dema derdiketin wan gundan liwê mentiqê sê mihkûmên binav û deng hebûn, divabûn em wan bigrin her û her jimin dihatin xwestin, ew hersî (yemo ê sêdeqîn - hesoyê fatê ji boşatê, xelîlê mistê ji deyî kan) hersîjî bi şev dihatin malek ez diçûme bawan ji farqîn esker der diketin taqîba wan hingê min xeber dişandin,

ew eskerîya mina rûtînî giyabûn sala /1924/ ku diwî zemanîde sazmanek siyasî bi serekîya (xalid beg cibirî - li erzum) pêk hatibûn, jibona şeyar kirin û heval pirkirinê azayên wê sazmanê li nav welatîyan digeriyan biwan hin nivîsar imza dikirin, çewa di rûpela (139)de hatiye nas kirin ku kurd ji teqalîdên eşîrî gavidane siyasî, ku wê (sazmanan erzerum) ji lima wan sazmanê (sitenbolê) şax veka bûn di / 1924/ de bi awakî veşartî hin azayên xwe li her derên welat dabûne belakirin bi mezinên eşîran ronak û hin kesên xwedî gotin daxwaznamekî imza dikirin, rêzanên, jêr didane berwan ku evbûn:

- 1 - di welat de peydakirina hevalan nemaze kesên xwedî nifûs û hêzên çek hilgir,
- 2 - şeyar kirina millet bi doza wana qewmî û tarîxî bi hazirîya şoreşê,
- 3 - ew nivîsar ku yek bidana sazmana koma miletan ku di / 1920/ de bi wî mafê kurd biryar dabûn,
- 4 - nivîştên dîtir wê bidana cumhûriyeta turkên kemalistî piştî ku wê sazmana diwêlî û turk goh nedane daxwazê wê bi şoreşêve rabûna,

diwê hindavê de ez ji - pira batmanê hatime - farqîn - jibona mehîyên xwe û her şeş neferên xwe, li qehwekî rastî kur apê xwe û bira - ê (şêx seîd mehdî) hatim, ji min re gotin: divê tu nivîsarên me ji bajêr derxî - (ziyareta hezneqî) emê liwir ji te bigrin, lewre me guman kirîye ku lime nerevanîyê dikin, min ji wan re bire wê dera gotî û hatin min da wan û çûn,

piştî çendekî jibona muayena hespê xwe ez çûme (diyarbekir) li rix (xana hesen paşa) derbaz dibûm, liwir dîsa ew kur apê min (mehemedê sadiq û mehdî) giyane min û gotin: divê tu êvarê bê mala (hacîyê şîran li tirba sipî), êvarê piştî eşa ez çûme mehelê (tirba sipî) min li derî da keçek derî vekir min jêre got: mehdî - livir re? jiber ku çekên eskerî limin got: bisekine û çû hundur, vegeîya got: navê te min got: ez filanim, dîsa çû û zû vegeîya got: fermo, min derîyê oda mêvanan vekir ku - amir betelyon û du amir lek - yanî bînbaşî û du yûz başî - li rix wan ronîştine, bi gumana min ku ew girtine ezjî biserda min silavek eskerî ji wan re lêda, bînbaşî bi kurdî bi got: were ronî bê wê pata dijmin, hingê ez dilgeş ronîstem, dawî min naskir ku ew bînbaşî (IHSAN NÛRÎ HERDÛYÊN DÎ RASIM Û XURŞÎD) ji kurdên a areqêne, lê di qolordûya heftan a li - diyarbekir - li (Hekarî dimînin, ku di birên pêşde wê şalix jiwan bê dayîn, wanjî got: hin nivîsarên me di zerfek zerde li çarşîya (melik ahmed) dukanê - (lal miço) ne divê tu bixwere derxê jêrê

pira deh çavî, ez sibehê çûme dukanê (lal miço)⁽¹⁾ ez nas nekirim limin da mandelê û got: tu bi heşê xweyî an te vexwarîye, tiştê dibêjî liba min nîne, min got ez biheşê xwemê lê tu biçekên eskerî jimin guman dikî heqê te heye, ez veg-erîyam min - mehdî - dît û jêre got, ew di kenarê jêr de çû dukanê ez di kenarê jor de derbaz bum da ku min pêş wî bike, hinek dûr çûm heyani qehwa cenderê û di kenarê jêr de zivirîm çûm dukan, berê min li hundurê dukanê zerif da min min dibin çaket de xiste paşla xwe bişkuk qufaltin û derketim, çûme alahîyê ku ji tewlê hespê xwe derxim, qelema alahîyê gotin: qumandan te dixwaze, ez çûm bawî ji min re got: divê tu herî qelema qolordûyê ewraqên wan hene bi xwere bibî bidî tabûra leşker ên - farqîn - ê, ez çûm wanjî zerfek weke wê zerfê dane min, ez vege-erîyam min hespê xwe ji tewlê derxist siwar bûm li (xana qazançîyan) peya bûm, min ew zerfa (lal miço) xist bin doşeka ser zîne hespê û zerfa general di paşla min siwar bûm û ber bi derê (mardîn) ve diçûm, li hinda (balixçîyan) min ji xwe para nêrî ku kur apê min û mehdî - jî lipê min tên, ez giyame nêzîgê qereqola ber derî polisek li nivê rê sekinandî jimin re

1 - tevaya fermandarên wan şoreşan tevi şoreşgiran, eger ligor zirûfên zemanên wan biwanre hin kêmani û nezani çêbûnji lê armanca wan pîroz bûye ku bidoza mafê milletê xwe - ê bindestve rabûne bi mal û can xwe fda kirine, milletê kurd di cedwela tarîxa qehremaniya wanve xwe serbilind û bextiyar dibîne. divê em uslûba xebata wan biwî zemanê wanre hember bikin. neku ligor awirên hiyanîyan em wan binavên nizamên eşayirî wan fedakaran bed nam bikin ku jêre xiyaret tê gotin, eger ne ji wan hêzên eşayirî bûna sed sal berê em dihatin bişaftin, çewa ku heya kurd heqê xweyê siyasî bi dest nexa ew girêkin hêzên eşirî divane.

got: divê tu li qereqolê peyabî, ez lê hêrs bûm û min got sik-
tirbe ji devê rê, wî got: rica dikim tu eskerî nikarim têkilî te
bibim dema tu peya nebê emê polîsên eskerî bixwazin, ez
çûm li qereqolê peya bûm, ji min re gotin: di heqê tede
ixbar bûye eger tu destûr bidî me, emê li te bigerin anna
emê polîsên eskerî bixwazin, min destûr da wan rabûn limin
gerîyan dema bi min re zerf pelandin berî ku derxin gotin:
iştê yanî eve, hingê min zanî ku ixbara wê zerfa dîtir bûye,
gava ji paşila min derxistin û dîtin ku ewraqên qolordûne sar
bûn, li xurcika ser hesp jî nêrîn û jminre gotin bibihure dilê
xwe negrî çewa wezîfe dizanî.

Dema wan polîsan ez li qereqolê peya kirim, hingê (kur
apê min û mehdî) ji min pare bûn dîtin, di derê avê de
revîya bûn di nav beççan li pirê derbaz bûbûn, li bilindîya
ziyareta (qirqleran) li nav darên guwîjan sekinî bûn, min
nêrî kesek xuya nake, ewraqên eskerî bi minre ez nikarim
herim gundê xwe bidim wan hêj herim farqîn, liwir ez
heyirîm, min dît ji jorde gazî min kirin û daketin zêde xerîb
dîtin ku çewa bi minre ne dîtine? min got: wê zerfa general
xwe xiste şûna wê zerfê, liwir min siparrte wan û bi dilgeşî
çûm, ku min xebatek niştamanî kir.

Çûme (farqîn) û jiwir çûme qereqola xwe (pira batman
mala badê) piştî çendekî min izin girt û çûme mal, berî ku
herim (kur apê min û mehdî ji apê min re ew serpehatî goti-
bûn, jiber wê çendê (apê min) ez birim nav beççe em libin
darek ronistin ji min re got:

Kurê min, bavê te mir tu piçûk bû , lê malê we hebûn

diya we li ser we ma nezewici hûn xwedi kirin, yanî hûn ne mihtaçî min bûn, lê heşê min bi we ve û ji we re dilovan bûme çewa hûn dizanin, livir ezê pirsek ji te bikim divê tu ji min veneşêrî tu ketî wê sazmana (erzerum) an na? min got:

Apo ez tiştêk ji sazmanê nizanîm û kesê teklîfê minjî nekiriye lê carna min ji wan re hin xizmet kirine, ji min bê ezê bikim ji lewre armanca wan girtina mafê me ê tarîxî û qewmîye - wî got:

- çewa ku ji dest pêka qirnê nozade milletê me - ê bed bext di vê berevanîya mafê xwede mal û can bider dane, divê tu zanibî ku divê rêde mal wêrani, belengazî, birindari, zindan û lêdan, dûr bûna ji welat, vana tevde te dane ber çavê xwe? biwî eqil û nefsiyeta xortaniya gundîti min got: belê apo - hingê destê xwe li piştê min da û got: heqê min lite nema.

Bê ku ji van rojên reş tiştêk zanibim an bîr jî pê bibim, heyanî ku dinav pêlên derya xurbet û felaketan de ser û bin hev bûm, hêj ew gotinên apo dikevin bîra min, yanî piştî (58) salî ku van dinivisim belê apê dilovan gotinên wî tevde pêkhatin, para te çêtir ket ku te li (diyarbekir) liser kursîya sêpayê di nav pênc deqîqande bi fedakarî û mêrxasî giyan biderda û giyayî karwanê şehîdan, lê jizanim ezê çewa giyan bispêrim axa sar û bê deng.

Belê jiwê eskerîya gotî min gavda bin çadira felekê a reş, çepel û dijûn, giyame (şoreşa şêx seîd) di /11 şubat 1925/ de, ji wî zemanî heyanî vî hehyamî min umir bi şoreşgîrî, zindan û xurbetê derbaz kir rojek poşman nebûme û nabim, tenê keser ewe ku umrê min têrê nekir.

Institut kurde de Paris

BIRÊ ÇARAN

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

DI DAWÎYA CENGA CÎHANA PÊŞÎ DE REWŞA TURK Û BEHLEWANÎYA KEMAL

Diwê cenga cihanê a pêşinde - Mustafa Kemal - li eniya (sûrî û urdin) bûn, li çemê (yermûk) alahî (fexredîn beg) jî pêre, ew nefiyê (misrê) kirin, Mustafa Kemal bi leşkerên xweve li hember leşkerên - ingiliz - wek: toza li pêşîya bayê ji sûrî hatin rêj kirin bihna xwe li (intab) veda, çewa ku (Ekrem beg Cemîl paşa) jî diwê qolordûyê de bûn, jiwir çû (amed - diyarbakir) di qolordûya heftan de general bûn, wî zemanê ku leşkerên (rûsya) daketibûn (mûş, bedlîs êşek meydaniya cebeqçûr heya sinorê - dersim - Sitenbol - ji (ingiliz, Firansa û Îtalya) veqeretibûn, pîraniya qumandanên turk nefî kiribûn (girava malta), yûnan jî (tereqiya, izmir û afyûn qerehesar) vegirtibûn, çewa ku (Firansa) jî ji başûr ve giyabûn (adene, intab, meraş û ruha) vegirtibûn, (ingiliz) li (Îraqê) giyabûn (zaxo û rewandiz), ne dihatin guman kirin ku (Yûnan û Firansa) wan deverên vegirti ber de û hersî dewletên mezin jî (Sitenbol) berdin, biwê bê hêvîtiyê ji zemînê Kurdistan û hêzdarîya cengawirên kurd pêve (ji Mustafa Kemal yahûdêyê donme ê selanik kurê alvêrt⁽¹⁾) re nema bûn.

Tevî ku ji turkîtiyê bê hêvî mabûn jî lê ji awakî ew mez natî her heşê wîde wek: siya wî pêre digeriyan, ew daxwazî bi hêz darîya kurd bi dest diketin û guman ku diwê

pehlewaniya ser şeritan de bibe (sergel û ata kurd), jibona vegirtina wî filimî di per da pêşînde li (diyarbekir) bi (fermanda hesen xeyri beg dersimî) leşkerek kurd bi çek û teqlaîdê kurdî, şal û şapik kum û kolos, xincer diberwan de da girêdan, du meruvên me (jiwan leşkeran) carna bi îzin dihatin mal, jê û pêve her linav eşîran digerîyan li odayên axayên eşîran nimêj dikirin, dema dest bi xuwarinê (bismillahi rehman rehîm) degotin hêj dixuwarin, diwê gerêde li - qeza xerzan serekê eşîra (pencinar - cemilê çeto) kir bira - ê xwe li (farqîn - sadiq beg) kir bira, li (qeza licê gundê hezan (şêx selim zavayê hezret) kir bavê xwe ê manewî, li (diyarbekir) ji (ekrem beg cemil paşa) xwest bibe - biraê wî lê (ekrem beg) qebûl nekir, jiber ku di eskeriyê de pêre mabûn, ji milê dî (di sazmana kurd tealî û tereqî) aza bûn, Kemal û daxwazên wî qenc nas dikirin, ji milê dî pêderpê ji serekên eşîran re name dişandin û digotin: jibona parastina welat herkes cengawirên kurd li dorxwê vehewînin⁽¹⁾, çewa ku binavê (berevanîya wilayetên şerqê) sazmanek jî da girêdan.

Jiwan pîlanan pêve di dest pêka /1919/ de dest bi civînên konfiransan kir, berê li diyarbekir tevaya ronak û serekên eşîran civandin êdî diwî zemanî de ez bîrewir bûm, lê biwan buyerên siyasî ne agaydar bûm, tenê apê min jiwê konfiransê hat, li odê gondîyan jê pirsî û got: civîna we bi Kemal re çibûn? apê min got: Mustafa Kemal xwê kurd per - l - di /1925/ li mehkema eskerîya (xarpêtê) evdurehman axayê ruha bi îdamê qirar dan, wî got: şoreş negiyaye çiyê me û tu têkiliya min bi (şêx seid) nîne gunahê min çiyê? gotin: tu herê biwê dozêve rabûyi hingê ew mektûba (Kemal) bi imza û xelê wî pêş wan kir, biwê mektûbê (evdurehman axa) beraet kirin.

werek dide nişandan, dixwaze dewletek kurdî bide çêkirin, lê ligor hin dauwazan em ne giyane hev, ew dibêje: hukmê milkî sipattiyê kurd lê eskerî divê di dest turk debe, bivê ew û mezinên kurd negiyane hev, jiber ku hêzên lişkerî dema ne dest kurd de be diranin wê dewleta kurd dema bixuwazin bidin rakirin.

Ji milê di her û bi ulema û şêxan re diketin civînên dînî û rojên înan jî mizgefta mezin dibûne (îmam) çewa ku diwê îmametî de resmê wî hye, her heftê carek mewlûd çê dikirin û liser çokan dibûn guhdar, digotin: her rojên înan divê li mizgeftan (hedîsên buxarî) bîn xwendin.

Piştî wê konfiransa (diyarbekir) konfiransa duduyan li (sêwas) da girêdan, lê liwirjî weke hate gotin biwan daxwazên vajî tu havil bi dest nexist, ew daxwaza ku bila eskerî didest qumandanên turk de be daxwaz ne ewbûn ku karibe wê dewleta kurd wergerîne, lê bawerî ewbûn ku ewê bibe serek komelê kurd, wê ew hêzên leşkerên kurd wî ji hukum dîr bixin, ne ku ew çend turk perwer bûn.

Di /23 temûz 1919/ de li (erzerum) konfiransa sisîyan da girêdan diwê konfirasêde daxwaza wiya yekemîn ew bûn ku (xalid beg cibirî) karibe bigîne xwe, jiber ku di Kûrdistan de meruvek zêde xwedî nifûse, jiber wê çendê hinên wek (mûsa beg xûtî, evdul mecîd begê sipikî), û hinên di heryek jiwan (100) zêr dabûne wan daku di konfirasê de piraniyê bi destxe, lê (xalid beg cibirî) ew firset neda wan pîlanên wî.

Piştî ku jiwan dek û dolaban havilek bi dest nexist hingê jî (diyarbekir) wîjî berê xwe da (çiyayê bozantîye) ku generalên turk hevalên wî di nav wan darên çam de xwe

veşartî û piraniya eskerê wanjî kurd bûn, ji wanre got: min xwest bi cengawirên kurd li wilayetên şerqî hukumt bidim girêdan lê mezinin kurd di xwestin hukumet bi navê wan û her quwet di dest wan de be, ew jî min nekir.

Diwê eniya şerê yûnan de heya /1920/ ê ku bi qehremanî ketibûn berevaniya anedolê ser qaumandan (çerkez edhem û çerkez reşîd) bûn, lê bi daxwaza ku - Mustafa Kemal - bikeve şûna wî, piraniya qumandanên turk kir aliyê xwe, ji dêla yûnan ve li (isparta) girtin ser (edhem) piştî şerek xûndar (çerkez edhem) mecbûr derbasî nav leşkerên (yûnan) bû, herçendî wî û (reşîd û hacî samî) çend caran qesta kuştina (Kemal) kirin jî lê tu havil bi dest nexistin, jîwir çûne qibris paşê sûrî û dawî li (urdir) diman.

Piştî (edhem), Mustafa Kemal femandariya leşkerî bi dest xwe girt, lê jiber ku zêde pîrek perest bûn (xalide edîb) aku yahûdiya donme bi rutba (çawiş) ewjî pêre bûn, diwê zefera (seqariya û izmîr) de bi qehremanî û cengawiriya siwariyên kurd ew navdari bi dest xistin lê ji Mustafa Kemal re yaşa hat gotin, çima ku diwî şerîde birîndar bû, piştî ku bi daxwazên diwêlî ew yûnanên hindik jî erdê xwe bider xistin kurê (alvêrt)⁽¹⁾ bû (ataturk)

1 - berî çend salan hin roznamevanên turk nivîsîn ku di herba /1878/ ku leşkerê usmanî li eniya (romanya) zora leşkerên - qeyser - birin KATRÎN - hate ba qumandanê turk libawî raza, hêj qumandan leşker bi şûnde kişand - liser wê radyoya mosko got: ataturkê we jî zabitê mulheqê serfaretî alman (alvêr) te ku (zubeyde) libawî qapatme bûn.

Wiha renga li eniya (Firansa) jî, li eniyên (mêraş, û ruha û entab) jî binav û bawerîya dînê islamê bê awirek siyasî, tevaya eşayîrên kurd bi dengên selewatan dirêjî lişkerên Firansa kirin, jiwan bajaran dane rêj kirin, nemaze li (ruha) zêde lişkerên Firansa hatin kuştin, heyanî çend sal berêjî sit-ranek bi turkî hebûn digotin (vûrîn kurd uşaxi namûs gunîtir) lê dawî turk uşaxi gotin ku yekjî diwî şerî de tune-bûn, çewa ku ew navê (qehremen mêraş) wê çaxê hatiye gotin lê ew fedakarîjî ji qumîta kemalîstî re bû serfirazî.

Wiha renga li Kurdistana bakur, di /1917/ de di şoreşa (poleşevikî) de ku leşkerên (qeyser) ji herçar wilayetên Kur-distan kişîyan, hingê li (erzerum, qars, artivîn) sîleh dane wan (êrmenin) ji kuştariya turk revîya bûn nav leşkerên rûsya, sîlehek pir dane wan û gotin van wîlayetan jixwere bi parêzin, çewa ku di /29/ gulan /1918/ de hukmê polşevikî li rewan binavê êrmenistan cumhûrîyeta taşnaqan dabûne çêkirin.

Di /1920/ de (xalid begê cibirî) li (erzerûm bi qumandanên milişya ên kurd civînek siyasî û eskerî girêda gotar da û ji wan re got:

- geli qumandanên milişya serekên eşîrên mêrxas û cingawir, hûn dibînin ku piştî rûsya ji welatê me kişîya weke hedyekî çend wilayet ji erdê me sipartine hin çete - ên dixê ên êrmen, ev welatê ku weraserta pêşîyên we jiwer mayindeye, ew (qars û artevîn) ku di herba /1878/ de ketibûn bin sîdariya qeyser tevî (erzerum) sipartine (êrmen), divê hûn zanibn ku rêjkirina pêgihên wan êrmenan ji welat barê weye

ne ê turke, belê wan cingawirên kurd, di /28 ÊYLÛLÊ 1920/ de weke toza li pêşîya bayê ew êrmen jîwan hawîran dane rêj kirin di çiyayê (alagoz) de qulabtin deşta (rewanê) yêrivana - îro, ew serfirazî jî dîsa bû navdariya turk, biwê serfirazîyê di /3 KANÛNÊ PEŞÎN DE 1920/ de li (gumrî) rûsya bi turke kete civînê li hember rêdana rêyaderya vanîya (posfor û çanaq qele) de (qars û artevîn) biser erdê Kurdistan sîdariya turk ve berdan, û di nav xwede sînorên îro danîn.

Çewa ku di /1921/ de Firansa jî ev sînorê sûrî bi turk da qebûl kirin, jiwê dêlêve di /24 TEMÛZ 1923/ de /peymanî lozande ew bendên peymanî (sîvir) ku bi mafê kurd biryar da bûn dane bin lîngan.

A gelek xerib eve ku, diwê cenga cihana pêşînde hêj amerîka bi awakî siyasî û leşkerî gav nedabûn awirpa, em nîzanî çîma serek cumhûrê amerîka (wilson) çîma bi donzde bendên xweve diwê peymanî lozan bû gunahkar li hember heqqê kurd û tarîxê, ku her û her (êrmen) lîser zîmanê wî bûn, ew (êrmenên) ki ji 10% cugrafî, beşerî ne qasî kurd bûn, çewa ku bû destegîrê turkî ku herdû ji hevve selbî ne îcabî bûn, gelo çî dilreşîya amerîka bi kurd hebûn?

Pîştî cenga cihanê turk û rûsya herdû birindaran vegezan din birînen xwe bihev bidin derman kirin, piştî cumhûrîyeta kemalîstî binavê (turk millet meclîsî) bi awakî dîktatorî da saz kirin, piştî hingê bi çend rojan yanî di /24 TEBAX 1920/ de civatek şandin mosko di navxwe de peymanek dostanî imzakirin, rûsya tavil serfirê xwe şandin (anqere) turkî serfirê xwe (general Elî Fuad) di /8 tîşrinê diduyan 1920/ de şan

din (mosko), di /16 adar 1921/ de ew peyman li herdû perlimanan hate imzakirin, bi kurti ew bendên peymanê ên jêr bûn:

1 - dema ji herdû aliyan yek senedat û wesaiqê ê ditir qebûl neke ê ditirjî divê qebûl neke - 2 - divê turk mîsaqa milîya sofyê bi a wakî resmî nasbike, 3 - çi peymanên ku usmanî û çarînên rûsya bi dewletan re imza kirine tevde betalin, 4 - di navbera herdû dewletan de dostanî abûrî, bazirganî ji berê zêdetirbe, 5 - divê herdû dewlet sînorê navbera (turk, gurg û êrmen) bawerî binin ku sînorên diwêlî ne, 6 - beri her kesê herdû dewletan ittîraf bi hukmên hev kirin û rûsya bû wasîte di naberê (turkiye û efyan) de wanjî dostanî bi hevre imza kirin.

Jiber wê çendê di /1924/ de (sazmana erzerum) jibona alîkarîyê daxwaz namekî (kamîsarya) karê dervekarîya (rusya) jiwanre pir û hin dik di warên siyasî de nebûn alîkar, bê ku zanibin di navwan û turk de peymanek hatîye imzakirin.

Çewa ku di /1913/ de (mela evdulselem û evdurezaq beg bedirxanî) ji biwê daxwaza alîkarîyê çûne (teflis) dest nedane wan, bê ku ewjî zanibin ku di /1901/ qeyser soz dabûne partiya (ramgavar) ê (êrmen) ku wê ji wan re (êrmenistanek) bide çêkirin, wê çewa ji kurd re bibûna destegîr û piştegîr?

Her wekî şoreşa (Ararat) di dawîya sala /1929/ de piştî ku teşkilata xweya hundurî dane sazkerin, wanjî daxwaznamekî dane (qonsilîya rûsya) li (mako) û gotin: em dixwazin biwere bikevin civînek, lê pêş kirina ci û zeman sipartîyê weye biwê daxwazê bersifijî liwan venegerandin, jiber ku bi dirêjîya deh salan di /1926/ de bi (turk, Îran, efxan) re peymanek imza kiribûn, jiber wê çendê ew dinav xwede lacî jî qebûl nekirin bizora xwe derbazî (Îran) bûn, bi gumana ku rûsya karibe wan hersî hukumetên (turk, îran, efxan) di hembêza xwede bigre, lê di /1936/ de ku ew peyman kutah bû, di /1937/ ingilîz biwan hersî dewletan (pemana seidê abad) da imzakirin, ew hisabên rûsya ligor wê hendesa siyasî tu bingehêk qiyasî bixwe ne girt.

Çewa ku di cildê (5) can van muzakeratan de wê bêhtir bê rohnî kirin ku di zeman û mekanan de, di zemanê (qeyser) de kurd (8) caran, di zemanê (polşevikî) de (12) de caran ronak siyasî û şoreşgîrên kurd bi (rûsya) ve çûne, lê mexabin ji awan bi awakî pir û hindik dest nedane wan, ji ber ku mesalihê xwe - ê siyasî di mede ne dîtine, belê weha rege jibona jiyopolitikîya zemînê Kurdistan dewletên awirpî jî berî me ew mesalihên siyasî liba dewletên Kurdistan vegirti dîtine, belê çi kurdê kû berî her tiştî wan mesalihên diwêlî nas neke, ew kes nikare ji kurd re bixebite, tenê nefsa xwe dixapîne ku dikare!..

Di /20 tîşrînê yekê 1921/ de li (anqera) di navbera (turk û firansa) de peyman hate imza kirin ku leşkerên firansa li hiniya xetê trêna toros bisekine ku ew sînor di navbera -

turk û firansa - de xetek diwêlîye ku bi navê dewleta (sûrî) a nû peyda dimîne.

Di /22 adar 1922/ de dewletên diwê herbê de heval bend û selahîyet dar ligor şîrûtên jêr ku liwan biryar dayî herba (turk û yûnan) dane skinandin û bihevre xistin civinê her wekî:

- divê li navbera herdû dewletan mentiqekî bê leşker bê vekirin.

- di wê mentîqa bê leşker de divê ji dewletên mezin nêrevan hebin.

- jibona ku bigîne hev divê sekinandina şer sê mehan dirêj bike.

- jiwan bendên (sîvir) jibo - turk - di abûrî de bê tedîl kirin.

DI /27 TEBAX 1922/ KONGIRÊSA (MODANYA)⁽¹⁾

Gurêdana wê kongirê ji (generalên ingilîs, firansa, îtalya) û îsmet bi hev ketî bûn, hersî dewletên heval bend diwê kongirê de du civik bidarek kuştin, jibona ku turk her daxwazên wan liser xwe qebûl bike da ku di (peymanana lozan) de wan biyarên mafê kurd ên ku di (peymanana sîvir) de pê hatibûne biryar dayîn bidin bin lingan, biwan qebûlkirinên turk, jibo derketina ji erdê turkiye bi şîrûtên jêr (yûnan) jî mecbûr kirin, çewa ku pêveka wê peymanê di (peymanana -

¹ - modanya (qezakî liser behra mermere ye).

mondros) de hêj bihtir qumita kemalîstî her daxwaz qebîl kirin, jiber wê çendê hersi dewletên (ingilîz, tîransa û îtalya) ji turkre bûne piştêgîr şerûtên jêr liser (yûnan) ferz kirin. wek:

A - di roj helatê (teraqya) de (edirne) heyanî piravên çemê (merç) divê di nav panzide rojan de yûnan jê bikşîyê û bis-pêre turk.

B - piştî wê kişandinê di bin nêrevanîya hersî dewletan de dinav (30) rojîde tevaya serkar û karmende - ên yûnan bi ên turk bêne guhartinê.

C - heya dawîya (peymana lozan) li teraqya divê (8000) jandirme ên turk hebin.

D - piştî imza kirina wê aşîtiyê posfor û derdenîl ji turk re hatin berdan.

H - heyanî cî anîna wan bendan wê ew qomsonîya (ingilîz, firansa û îtalya) li (sitenbol) bimînin.

Belê wê siyaseta mesalihên diwêlî (tereqya, izmîr) bê şer li turk veqerandin û jibona wan mesalihan jî di peymana lozande heqê kurd jî dane bin lîngan, ne biwan fortên - înono meydanî û seqarîya zeferî wê birîndarîya Kemal û tufinga - xalîde edîb, wektê gotin:

«Erd zad tîne cotkar pesnê xwe dide».

Diwê cenga yûnan de, piştî derketina yûnan ji (izmîr) wan ceneralan nav çiyayên (anqere) kirin wargehek hêzdarîya hukumek eskerî, ji ber ku nikaribûn li (sitenbol) daxwaza hukumek cumhûrî bi destxin, di /20 K.2. 1921/ de wan generalên hevqirtî bi rakirina hukmê (sultanî) dan, di /1 T.2. 1922/ de di perlimana xweya şiklî de jî dane qebûl kirin, ku

ew sutlan bi (357) ji malbata wanjî welat derxistin û dest dane ser tevaya malên wanjî li mezadê difrotin.

PEYMANA LOZAN AN BORSA SIYASÎ?

Wê peyman a bedkar û sitemkar ji /1 KANÛN.2 1922/ heyani /20 tîşrîné 2. 1923/ dirêj kir, jiber ku turk hin daxwazên hersî dewletan hêj bicî ne anîbûn da ku wan biryaên sitemkarî jêre bidin, jimilêdî îttîraf bi cumhûyeta kemalîstî bikin û resîdê¹⁾ sultan an ê di banqa diwêlî de wergerînin ser navê cumhûrîyeta turk, daku binavê wan sîke bê derxistin, di dest pêkê de banqanotên turk li (london) hatin çapkirin, dinav wê sala gotîde ku turk her daxwazên wan qebûl kirin û diwê perlîmana şiklî de jî dane qebûl kirin, hêj di / LOZAN/ de heqê kurd jî cumhûrîyeta kemalîstîre wergerandin huqûqê eqellî ewjî turk da bin lîngan, hingê (ingilîz, firansa, îtalya) û biserda serek cumhûrê - amerîka wîlson - jî îttîraf bi turk kir, di rakirina wan bendên (peyman a sêvir) de bû alîkarê turk, çewa ku di (peyman a lozan) de sê xayînen kurd (îsmet înono, feyzî û zulfî) begên (diyarbekir) jî hebûn, diwan biryaran de delege - ên (ingilîz, firansa, îtalya, amerîka, yûnan, japonya, romanya, yogislafla) û hin dûvikên wanên dîtir bûn, biwan bed karîyên diwêlî di /29 tîşrîn 1. 1923/ de bi awakî resmî (cumhûrîyeta turkên kemalîst hate îlan kirin, belê ew peyman a (lozan) di tarîxa

1 - resîd pîrsek erebî (kesên pere ên wan di banqan de hebe (resîd) tê gotin.

kurd de rojek mateme, çewa ku li hember wê peymanê çepel li heremê sêwasê eşîra koçkerî bi fermanda (elîşan beg) bi şoreşêve rabûn.

Piştî wan sitemkarîyên diwêlî û pêk hatina cumhûrîyeta turk ew sazmanên kurdên (sitenbol) ê ji xebata wir bê hêvi man, bi daxwaza ku malikên xebatên siyasî bixin erdê kurdistanê, serkê (civata kurd tea li tereqî - evdulqadir efendi) di rêya (elî riza) kurê (şêx seîd) re bi (şêx seîdre) didan û disendin, da ku li Kurdistan kesê bi daxwazêve zana û pêkar peyda bikin, (şêx seîd) bi wê daxwazê ve ê bijarek (qumanda nê liwa xalid beg cibirî) bijart, di /1923/ sazmanek siyasî li erzerum binavê (berevanîya mafê kurd) û bi serekîya (xalid beg) ew sazmana tarîxî hate sazkirin, heya /1924/ di nav salek de wê sazmana tarîxî di nav millet de bergehên mezin girtin, piranîya wan libatên⁽²⁾ sazmanê ji serekên eşîran qumandanên milişya bûn, çewa ku di ordûya turk de hin qumandanên eskerî ji hebûn.

Di /1924/ jibona şerê wan nesturîyên ku di /1916/ de (rûsya) li (hekarî) weke wan (êrmenên) jor gorî (sîlehek pir dabûne nestorîyan), jibona ku wan jiwê hêzdarîyê bixin, ji (qolordûya heftan) aku li (diyarbekir) leşker çû (hekarî), di nav wande pênc qumandan û zibatên kurd hebûn jiwana (bînbaşîyê erkanî ehsan nûrî, yûzbaşî - xurşîd, rasim û tewfîq

2 - libat (aza) bi kurdî - libat - tê gotin.

cemîl - milazimê ewel riza) û hinên dîtir hebûn, pîranîya leşkerên wan qumandanan kurd bûn, her pênc qumandan jî (libatên sazmana erzerum) bûn, ji azayên sazmanê millet wekîliyê (bedlîsê - yûsif ziya) li (sitenbol û anqera) ji partiya turkên dijê kemalistîyan (ittîhad tereqî) hinên wek: fethî uqyar, reûf paşa, bînbaşi îlmî - û hinên dîtir, bi fortên vala serê (yûsif ziya) dagirtibûn ku ewê jî bi kurd re bi şoreşek ve rabin, bê ku zanibe li anedolê hêzên cengawirên eşîrê tunin, wê çendê turk ji rewşa şoreşgîrî ketîye nikare pêve rabe.

Bê wan agahîyên gotî, di payîza navînde (yûsuf ziya beg) ji (sitenbol) tê (bedlis) ê, liwr namekî bi dest ji bira - ê xwe (riza) re dişîne ê milazimê li (hekarê) û dibêje: xwe hazir bikin: (riza) wê nameyê dide (bîn başi ihsan nûrî), bawer dikin ku ew danezan ji (qumîta merkezîya sazmana erzerum) hatiye dayîn, tawil binavê munewerekî eskerî (1300) leşkerên xwe dikşînin çiyayên hekarî, diwî zamanîde jî li Îraqê şoreşa (şêx mehmûd) ji alîkî, ji aliyê di di navbera (ingilîz û turk de jibo mosil) kêşmekêşek mezin heye, vana çend rojan li çiya man, jiwanre xeber hat ku sazmana erzerum ew danezan nedaye ji kêr eqilîya (yûsuf ziya) pêve.

Turk biwê buyerê hesîyan zêde tirsîyan ku ew û şoreşa (şêx mehmûd) bigîne hev an tilîya (ingilîz) tê hebe, hema bê hêvişandin firqa diduyan ji (sêrtê; bi fermanda (general Eli beg) leşker kişande ser wan, piştî şerên çend rojan herçar qumandanên gotî binavê lacîyên siyasî derbazî Îraqê bûn ingilîz bi terhib ligor siyaseta xwe ew qebul kirin ji xwarin

geha generalên ingilîz jiware xwarin diçûn, li (bexda) herçar qumandanên jihevî gotin: yusuf ziya - bi nezani û sergermîya xwe dijwarîyê mezin giyande me û sazmanê jî, jiber îro dinabera ingilîz û turk de jibo mosil kêşmekêşek mezin heye em bivê dikarin istifadekî bikin, ku ingilîz me derbazî Kurdistana Îranê ba (simiko) bike, dema ku li Kurdistana bakur şoreşê dest pêkir, hingê emê bi hêzên (simiko) ji alîyê wanê derîyek şer li turk bidin vekirin, ingilîz bi siwarî ew derbazî ba (simiko) kirin, lê mexabin bi (simiko) ê ser hişk ew daxwaz bidest nexistin, jîmilê dî diwî hereketê wan turk bi meselê hesîyan.

PÎŞTÎ ku turk biwê nezaniya (yûsif ziya) û hereketê (hekarî) biserê werîsê siyaseta kurd girtin û her tişt naskirin, diwê meha payîza navînde li (erzerum) bişev leşker girte ser mala (xalid beg) ew girtin û deftera navên libatan jî pêre girtin, alahîyek siwarî pêre wê şevê ji erzerum derxistin berê wî dane (bedlîsê), ku (yusuf ziya) jî liwir girtibûn, tavil mehkemekî eskerî ji rutba (xalid beg) kêmîtir bihin zibatan dane çê kirin ku tavaya wan ji usulê mehakeman bê xeber, di zemanek kinde herdûjî (îdam) kirin, tevaya libatên qumîta merkeî jî xwestin lê kesek ji wan neçû, diwan hêzdarîyên eşîrî de hukumeta turk jî nikaribûn herin wan bizor bigirn, sîleh xwestin kesê sîleh jî nedan, hingê (elî saîb) bîn başî bi tabûrek esker ve çû ba xalid (begê hesenî) esker li dor gund hêşt ew û çend zibat çûne oda (xalid beg), bi gumana ku pêre tabûrek esker heye û dor li gund girtîye, bi sertî û ziman dirşjî bi (xalid beg) re peyîvî, jiyekve (xalid

beg) şeşagir ji berxwe kişand û xiste devê wî. xulamên wî ji bi xinceran heryek liser serê zabitek li benda gotina (xalid beg) sekinin, ji (elî saib) re got: zû kaxiz binivis û bi zabitek xwere ji wan eskeran re bişîné divê pênc kilometir ji gund bi dûkevin hêj emê weji biginin wan an na hûn tev dimirin, hey ker ma tu nizanî ku kurd liber pirsên ne layîq dest girti namine û nemaye.

di/1 ŞUBAT 1925/ de wan libatên qumîta merkezî li (çiyayê çanê) kong re dane girê dan ku (şêx seîd) ji tede pardarbûn, diwê kongerê de (şêx seîd) femandariya şoreşê bidestxwe girt. di/11 ŞUBAT 1925/de li (qeza pîran) di nav peyayên şêx û jandirme-ên turk de şer dest pêkir ku bû dest pêka şoreşê, wê di birên pêşde bê rohnî kirin.

jibona ku bi awakî sefer ber leşker qada şerê şoreşê di perlimana kemal de, kêşmekêşek mezin çê bû, partiya (mustefa kemal) xeliq parte sî) pîraniya merkezên hukum bi dest xwe girtibûn, tevî ku partiya (tereqî) jiwan bêhtir û kevintir bûnjî, jiwê diktatoriya (kemal) ne razibûn, jê û pêve partiyek di binavê (cumhûriyet firqesi) hebûn ewji dijê partî xelq bûn, di /17 TIŞRÎN/ 2/1924/ de dijê wan biyan namekî da bûne belakirin tede didan naskirin ku diwarên civatî û siyasî deji rewşa xelq partîsî nerazî nêmaze jiwê diktatoriya (mustefa kemal), ji wan pêve gelek bir û bêşên ronak û welatîyan tevî rozname-ên (tenîn, millîyet, sibîl-reşad, û gelek ditir tevde dijê wê diktatoriye bûn, wan partîyên gotî ne dixwestin ku bi awakî serber leşker here qada şoreşê, lê kemal û (xeliq partîsî) sefer ber dixwestin bidin



çêkirin, lê ji (xeliq partîsî) pêve tevan gotin: di qolordûyên (7 û 8) di kurdîstande esker hene ji jandirman pêve, çî divaye ku em wek: herbek diwêlî sefer ber bidin çêkirin, biwê daxwaza (xeleq) li hember (130) millet wekîlî ji partîyên (cumhûrîya û tereqî) bûn (93) jî hevalên serek wezîr (fethîqyar) wanjî hevaltiya herdu partîyên jor dijê daxwaza sefer ber deng dan, jiber wê çendê partiya generalan û mustefa kemal a (xeliq partîsî) bê havil man, jiber wê çendê ji inqilabek pêve jiwan re daxwaz nema.

Di /28-ŞUBAT-1925/de-mustefa kemal-bi generalan li (çanqaya) civînek eskerî da girêdan, wê şevê pêve diwê civîné de man, dawî biryar bi inqilabê dan, bi hêzên leşkerî girtin ser wê perlimana ku berê şiklîbûn, tevaya mebûsan tevî serek wezî (fethîuqyar) girtin xistin hepsê çewa ku jiwan pêve gelek qumandar girtin jiwanên wek: reûf û kazim û hin siyasî û ronakên ne di daxwaza wande tevde xistin ber mehkemekî eskerî, binavê xiyaneta wetan, bê bijartinek qanûnî (îsmet înono) kirin serek wezîrê bê wezaret, jibona şerê şoreşê bi awakî seferber biryar dan, ji herdû qolordûyên heftan û heştan ku li -diyarbekir û erzerum- bûn ji anedolê jî qolorduya nehan bi femandariya -general nacî) kişandin eniya (diyarbekir), ji alahiyên jandirman û çetan pêve (108) hezar leşker kete aniya şer, jiwan û pêve hin leşker héj dihatin biçekên sevil hin jiwan dil ketin destme, me jiwan pirsî gotin: li bajarên anedolê di sahande def û zurna lê didin, emjî bê ku zanibin çiyê, em çun ketin wê dilanê, piştî piranî çêbû leşker dorme girtin û em birin şube-

én eskerî û ajotin vir, sîleh daneme lé héj em bi çekén xwene, belé biwê inqîlabê jibona qetilama kurd, seferber dane çekirin, jibona partiyén hember xweji di hukm de nehélin bé heyatek teşrîf yanî qanûnî -mustefa kemal- biwan generalan biryar li hin qanûnén jér dan û xistin kiriné wek:

1. bi awakî seferber divé leşker bi sîlehén giran û sivik di uslûbek herbi de leşker dakeve enîyén şoreşê kurd,

2. di /4 adar 1925/ de jibona dijé hukumeta turk binavé xiyaneta weten jibona îdam ceza û nefî qanûnek dane çekirin,

3. qanûnek îdam ceza û nefî qanûnek dane çekirin,

4. di/7 adar 1925/ de ji hin qumandanén eskerî binavé (istiqlal) mehkemesî bé awak û rêyek qanîni yek li (diyar bekir) a dîtir ji bona wan millet wekîliyén perlimanê-serek wezîr fethî oqyar-partiyén jor gotî û hin qumandan li (anqere) dane sazkin, li herdû mehkeman jî hukum yekcar bûn, temîz, istînaf, tune bûn çewa ku ji girtiyén ber wan herdû mehkeman re, destûr nebûn ji xwere aboqatan bigrin da ku berevaniya wan bikin, dîsya nebûn çewaku kesé diçûne wê mehkemé an qesab xané diwé saeté de îdam an ceza bûn beraet her nebûn, dema wî girtiyî difaa xwe dikirin jî jibona şahidan an tedqîqatê tecil tune bûn, ligor daxwaza xwe ceza an îdam didane wan, wê mehkemé û ji derve hézén leşkerî her di şewata gundan û qetil ama yekber de ber dewam bûn, wê faşîstiya kes nedî ji (11 adar 1925) heyani (16 GULAN 1928) diréj kir, ew jenosîtî wê di bir û rûpelén pêşde bèn dîtin,

Piştî wan kuştariyên (700) hezar jin û zaruk û îdamman, ditin ku miletek weke (kurd) Boş bi kuştinê winda nabe, hingê xwest wan ji teqalidên wanên qewmî wergerînin, li kurdistan herê wergirtina çekan wek-şerwal an şal û şapik û kum û kolosan biwan bidin guhartin, da ku hin méjevan an uryantaliyan dema herin turkiye kurd bi wan teqalidên wanve nebînin û zanibin ku ne turkin, jibona wê daxwaza na kesane herê (wergitina şerwal, şal şapik) dane nexede (1) kirin ma kum û kolos, jibona ku wêjî bidin rakirin, (mustefa kemal) di gerek xwede di /24 TEBAX 1925/ de li bajarê (qestemonî) şapqe da serê xwe daku ji turkre bibe wergirtinek medenî, jibona wê qebûl kirinê bi akî dûr û dirêj gotarek (2) politikî da û got: ji şapqe péve divê ji serî heya lingan em béne guhartin, diwê gotinê de daxwaz ji şerwal şal û şapikên kurd bûn, lewre ji şapqê péve turk tu çek neguhartin, di /25-KANUN-1-1925/ debi awakî resmî wergirtina şapqê li tevaya ronîşt manên turkiye dane qebûlkirin, kesê nedana serê xwe diwan mehkemên gotî de sé salan bi hepsê hukum dikirin, li hepsixana (nigde) sé mela én turk liba min jibo şapqê di hepsê de bûn, diwê salê de teqwîma koçê resîmî bi teqwîma (zaîndê) dane guhartin, roja yeksemê jî di şuna (îné) kirin ango biwan guhartinan wê nézîgî li medenîyeta awirpa bikin, tevî ku şîara xwe (gur) qebûl kirin,

Piştî wan kirdeyan jiwan bû daxwaz ku di nifûsan de

1. nexede (yasaq)e

2. gotar (xitab)e,

navén kurd hin pirsén turk binavê (soy adi) binavên wanve bidin girêdan, daku bê zanîn ku pêşiyên wan turkbûne ew nav biwanre mayindeye, lewra di nifûsan de navên kurd û turk ji hev cuda bûn, wek: navén kurd (genco qenco, keleş, mîrza, kamîran, sertip, qulixan, bedirxan, şevgêr, dilawer) û wekevan, ji navên (tûran, durmîş, şakir, takîn, erdoxan) cuda bûn, belê jibona guhartina wan navan ji di/1934/ de ew (soyadî) xistin da îre-ên mufûsan,

Piştî navên kesane guhartina mealimên jiyogirafya jiwanre bû daxuwzek unsurî û bedkarî, véketin di xerîta (21) wilayetén-kurdistan-de navén-çiyân, deşt, navdeşt, çem, newal, kanî, gund, bajarán- ji navên kurdî tevde wergerandin navên turkî, bé bîra wî dilé wané sitem û bed kar, jixwere neji kurd re bibéjin: divé asra bîstide cugrafya (hîvé) hatiye girtin ji çiyayén kurdistan (navé toros) li çiyakî hîvé hatiye ş kirin, emé çewa karibin (600) hezar kilomitir mesaha kurdistan livî gog zemînî bidin veşartin?

Lé gelo erebén sûrî ji çewa ew bedkarî û bed exalaqîya turk lixwe qebûl kirin? wanji li cizîra sûrî tevaya navén gund bajarán ji kurdî wergerandin erebî,

MUFETIŞÊ UMÛMÎ ABDÎN UZMEN:

Ji dest pêka (şoreşa şex seîd) ve ku ew hêzên leşkerên mezin kişiyane eniyên şoreşê û ew mehkemeên eskeriyên jor gotî hatin danînin, di rixwan de (li-diyarbekir) binavê (mufetişê umûlî) liser tevaya wilayet én-kurdistan (hakimek

mutliq) hate danîn, ji/1925-1928/ jêre (ibrahîm telî) dihatin gotin ku bi eslê xwe ereb bûn, piştî wî yekê turk binavê (abdîn uzmen) lişûna wî li (diyabekir) bûn, tevaya malikên muxabiratan biwî mufetişî ve girêdayî bûn, jê û péve tékilî bi hézên leşkerî jî di kirin, çewa ku bi tevayî rakirina ronîştmanên kurd ji hin hereman û nefî kirina (anedolê) ewjî sipartiyê wî bûn.

Jê û péve hukumeta turk jibona ku bi turkan di kesafetan de kesafetek cugrafî bigrin û zmanên kurd jî bi anîna turkan bidin guhartin, dest pêkirin muhacirên (Bulgarya) bi kewt û koman anîn kurdistan, li dor bajarên, réyên şûsa û nézîgên eskerî û jandirman jiwanre gund ên nimûzicî dane avakirin û ji kîsê hukumetê dihatin xwedî kirin, kesê jiwan keçek xwe bidana kurd an jî kurd bi anînyana perekî zêde didane wan jî bona ku bi malabtî tevlihev bibin ango wê kurd binwanre hîné zimanê turkî bibin, lê piştî çend salan (îsemt paşa) li dor (dyarbekir) çû serdana wan gundan û ji wanre got: gerek we li dor xwe kurd hîné ziman kirine? wan got: yek tenê jiwan hîné zimanê turkî ne bûne lê em hîné zimanê kurdî bûne, hingê-îşmet-got: meruv hîné zimanan bibe ne xirabe, jiber ku jê û péve jêre gotin nebûn.

Biwê daxwaza bedkarî û sitemkarî, wan mufetişan bi awakî res libajar û qesebe-ên kurdistan. emir dan ku çi kesê bi zimanê kurd bi peyîve divê her pirsek pénc kaxiz ceza bide, biwê danezana dijûn û çepel kesek jî gundan neçûne bajarên, jiber wî qasî-bê xuwarinên wek: -goşt, hék, mirîşk, rûn, mast, penîr û wekewan neçûn bajarên. jî milê dî ézing

û gomur jî jîbo şewatê neçu bajaran, xelakî mezin li bajaran çê bû, çewa ku şagirtên dibistanan jî bihevre bi kurdî xeber bidana her yek jiwan deh dar libin lingên wan didan zarukjî neçûne xwendinê, piştî naskirin nikarin biwan awan miletek bidin bişafitin, jê qerîyan,

jiwa kirdeyan pêve wî (abdîn uzmen) é nakesane, dest bi rakirina asarên kurd kiribûn, li nav welat digerîyan çî asarên ku bidîna dişikinandin, bê ku exlaqek insanî bikeve faşistî, jiwan asaran li deverên jêr wek:

1. di bedena (amed) de binavê (dewleta dostikiya kurd) di kevirde asarek kolandî hebûn, ew kevir jê rakir bir winda kir,

2. li (pira ser çemê bitman) di bilindahîya başûr de jî nivîsarek bi (kurd) ve hebûn, çend silim bi ser hevve girêdan yek derxist bi çakûçan ew nivîsar jî tevde şikênan,

3. liser çaviya (dicle) şikeftên (birqlîn) hene ku di zemanê jiyîna şikeftande ew der jêderê pêşiyên kurd (hûrî) yane, li ser deriyê şikeftande mezin di kevirde kolandî hin nivîsarên wan zemanan hebûn, liber derîjî (heykelek) hebûn, pênc silim biser hevve dane girêdan û pênc sed kaxiz dane yekê ji qeza (licé) binavê (hesoyê perî şanê) derket ser wan siliman bi çakûçan ew nivîsar şikênanandin û ew heykel jî birin, jiber ku vana jî cî nedihatîn rakirin, ên ku karibin bibin dibirin ew nivîsarên berê xirab dikirin û ji nûve binavê xwe werdigerandin û dibirin dixistin (méze xane) ên xwe, divî warî de (sûrî û îraq) jî jiwan kirdeyan bi şûnde nemane, **xwendinên cengdarî ji kurd re nexedenc:**

Jiwan zemanan heyani vé nivisara/1983/ jî herçar dewletên kurdistan vegirtî ji awan bi awakî ré nadin ku kurd bikevin xwenda gahên herbî, neji dezgedariyên çekên cengdarî, wek (radar, elektirûn, komipotir an firinde vanî wekevan-eger li hin bajaran bi gumana turk hin ketibin wan xwendegan jî lê jiber ku nifûs li kurdistane rutbeên bilind nadin wan,

TURK JI QEHRAN XWE AVÊTE BEHRAN:

Ji tirsax doza kurd û kurdistan turk weke bizîna ji tirsax bi gurra bibeze, binavê peymanên dostanî xwe davêtin hembêza dewletan, her wekî: di/24 TEBAX 1920/ de peymanek dostanî bi girêdana şex bendan turk bi rûsyare girêda, di/8 TIŞRIN-I -1920/ de sefirê xwe (general elî fuad) şandin (mosko) di/16 ADAR 1921/ de ew peyman û danîna sînor li herdu perlimanan hate imza kirin, (1),

Di eyûla/1939/ de ji tirsax ku diwê herba (alamn) de ingilîz û firansa li sûrî û îraqê mandater bûn, destên siyasî bidin kurd, di/10 TIŞRIN-I-1939/ binavê parastina derya sipî peymanek bi (ingilîz û firansa) re imza kirin, diwê peymanê de şertê turk jiwan ewbûn ku di hundurê turkiye de tékiliyên siyasî ji awan bi awakî bi (kurd) nekin (2)

1. sazmana erzerum) bê ku biwê peymana (turk û rûsya) zanibin di/1924/ de ji rûsya destê alikarî xwestin.

2. di nav (turk, ingilîz û firansa) de ew peyman hatibûn imza kirin, jibona hin daxwazên xwe-ên siyasî (ingilîz û firan sa) her bimerejî didan û disendin, (civata xweyibûn) jî hévîyek jiwan dikrin!...

Di/18 HEZÎRAN 1941/ de bi (almanya) rejî peymanek imzakirin ku di erdê xwede cî nade leşkergehên ingilîz û firansa, ji (alman) jî xwestin ku awan bi awakî tékilî bikurd nakin, di/1942/ fon papîn- sefirê almanya-é li-anqera- ji-îsmet paşa) re got: hûn dibînin leşkerên (almanya) serîkî giyaye (setalîn girad) û seryê dî (li-elemeyin) basik vedayê, hûn ji çi didirsin ku bi mere nakevin herbê? serek cumhûr (îsmet) lé vegerand û got: eger di rix wede tufenga me biteqe (kurdistana) mezin çé dibe, çewa ku siyasîyên kurd jî liwê digerin, çewa ku jîwan hisabatên gotî du peymanên (mondros) yek di/KANÛN-1-1918/ de a dîtir di/20 TEMÛZ 1936/ de jibo teng ava (derdenî) hate imzakirin, daku di zemanê herbê de ew boğaz bikeve bin nérevanya awirpîyan,

Di nav wê cenga cîhanê di dîduyan de ku li herçar muqatîeên kurdistan, péderpé şoreş û diwarên xebatên siyasî de jî, mesela kurd ji mentiqî bû dozêk beynel mehel, li (surî û libnan) kovar û rozname ên kurd bi doza kurd û kurdistan ve bi awakî resmî dihatin belakirin û digihan dirêjî û firehîya erdê kurdistan, jê û péve gelek nivîsar bi zîmanên ecnebî dihatin tercime kirin, di/1946/ li kurdistana. (îran) car a -pêşîn bûn ku li (mehabad cumhûrîyeta kurd) hate îlan kirin, jiber wan **çendan di /4 NÎSAN 1949/ de turk keta (peymana nato),**


Institut kurde de Paris

BIRÊ PÊNCAN

Institut kurde de Paris

JI SAZMANA ERZERUM BI DOZA MAFÊ KURD RABÛNA ŞOREŞA ŞÊX SEÎD EFENDÎ

Her wekî ji her xwenda nemaze ji her méjevanî re xweş diyare ku di cenga cihanê a pêşîn de, vegirtina împiratoryîa (dewleta usmanî) li rojhelatê navin û aferîqa xerite-ên zemînî û cugrafîyên menatiqan hatin guhartin, ligor daxwaz û mesalihên dewletên empiryalî gelek dewletên piçûk û mezin derketin ser meserehên siysîa û ketin ber mirêxa tarîxê, ew nejadên ku bê dezgedarên xwe wan dewletên empiryalî nikaribûn û nizanibûn dewletek bidin saz kirin, çewa ku serkar û karmende-ên wan jiwê daxwazê re ne pêkarbûn, belê wan dezgedarên gotî jibona gerandina karê wanê welatî wek: zarûkên dibistanan ew hîné kar gerandina hukum nîzam û qanûn kirin, diwê piyankoya diwêlîde tek û tenha nejadê kurd bi kurdîstana mezinve ji du bindestiyên turk û îran pêve ketin bin sîdarîyên (surî û îraq) ku herdujî di bin sîdarîyên (ingilîz û firansa) de giriftar bûn, ji du parçe ên gotî ên xerîta kurdîstan wek: xalîya eywana kesra- bi çar parçan hate parkirin ku téra xurcikek li (rewan) para (êrmen) jî ket, belê ji nav wê dûxana herbê em tenê bi çekên sipî û di dest siyasîyên kurd de defterek sipî bê hisab û bê mafek kesane di cihan de man!...



Serdarê Şoreşa 1925 an şêx seîd.

Tevî ku jibona xweserî ya xwe kurd ji/1500/ her û bi emaret û şoreşan ve rabûbûn, çewa ku ew cenga cihanjî li kurdistan hatibûn vekirin, ji her miletên cihané zêdetir diwê cenga dûjehî de kurd tede mal û can danîbûn, diwarên xebatên siyasîde ji her wekî li rûpela(139)hatiye zanîn ku ji /1908/ ve pêderpê sazmanên siyasî dabûne girêdan, di/ 1920/ de doza xwe giyandine sazmanên diwêli û civatên aşîtiya wê herbê, tevî ku ew dewletên nûder jiwan xebatan tevan bê par bûnji giyane wê serfiraziya bê xebat, biwê hendesa siyasîetên dewletên empiryalî liher derên kurdistan nejadê kurd dihejîyan, çewa ku li hember wê sitemkariya (peymana lozan), li heremê (sêwasê) kurdên (koç kerî) bi şoreşêve rabûn, li kurdistana başûrî (şêx mehmed) li hember (ingilîz) di şoreşek xûnder de bûn, li îranê serekê eşîra şîkak (simiko) bi doza mafê xwe ê qewmî û tarîxî ve li hember (rîza şah) di şerên giran de bûn, jê û pêve liher derî siyasî û ronakên kurd bê sekin lihev digeriyan, bikeser ji hevre digotin: ew nejadên ku bi her xesais û seykløjîyên xweve jime kêmîtir bibin dewlet em kurdên xwedî tarîxî û hezaretek kevin di welatê xwede dîl û bin dest bimînin!... ma jimer mirinek bi ezîzî ne cêtire ji jiyînek rezîli lo!

her wekî li rûpela (139) hatiye naskirin, navên wan ronak û sazmanên kurdên li (Sitenbol), biwê waqîi tarîxî jiwanre zêdetir rojek matem bûn, jiber ku ew numayende-ên wanên ku çûbûne (peymana sévir) di a (lozan) de nebûne parder, wê peymana ku dewletên empiryalî ji bona mesalihên xwe ên sitemkarî mafê kurd dabûne

binlingan (1) qumîta mustefa kemal jî binavé (turk cumhûriyet) dane ilan kirin, biwan buyerén tarîxî édi ew sazmanén (Sitenbol) é nikaribûn liwir xwe ji setemkariya wé cumhûriyeta nû peyda bi parézin ku di erdé kurdistan û nav hézdarî ya giranî û piraniya kurd de malikén xebaté bidin vekirin. biwé armancé jîwan ronakén (Sitenbol) é (sereké sazmanén-kurd tealî û tereqî-kuré şex ubeîdulahé nehri-evdulqadir efendî), bi wasîta (elî riza-kuré-şex seîd efendî) ku diwaré bazirgan î de kerîyén pez dibirin bazar gehén sitenbolé- li duxana (fethulah efendî) dit û évaré li mala (fethulah efendî) pére kete civîné û jére got:

- ji bavé xwere béje:-evdulqadir-gotîye: livir jimere réya xebaté nema, me divé tu bi zanîna xwe li kurdistan, bi hin kesén zana û ji da xuwazére pékar sazmanek siyasî û armancdar bide sazkirin, çewa ku em wé hîmeté téde dibînin-herweki ew sazman li (erzerum) bi (serekîya alahî qumandané eskerî-xalid beg cibirî) hatiye derbaz kirin, çewa ku wé di bergeha jérde jî béhtir bé rohnî kirin,

LI ERZERUM SAZMANA BEREVANÎYA MAFÊ KURD:

Di dawîya sala/1922/ yan û dest péka/1923/ de ew sazmana

1. dibin wé perda sitem û van nivisaran de bir hatinéde min digot eger mesalihén leşker gehén roj helat û roj ava bi awakî huqûqî û edebî bira mafé (30) milyûn kurd di xeritekkî (600) hezar kilometir de nebin, welaté me di navbera (qafqa derya sipî û xelîc) deji siyaseta xwere xetek antîmanyatikî bibînin. lé karibin liber huké zeman û tetewirén siyasî her û her me welé dil û bé huqûqé insani bihélin?

jorgotî li kurdistan bakur roj ava li bajaré (erzerum-bi-serekîya (xalid beg-cibiri) pêk hat, sazman ne di teşkilata partîyek lé herekete binavé qewmîyeta kurd û doza huqé siyasî bûn, jiber ku diwî zemanîde kurd di nizamén eşayîrî û reşek bîroqiratî de bûn, jiber wî qasî ji xwenda én bilind û ronakan zédetir, qumita merkeziya sazmané ji hin mezinén rûhî wek şex û melan péve, tevde serekén eşîran û qumandanén leşkerén milişya pêk hatibûn, didest wan qumandanan de ji cengawirén hézén eşîrî peve, di xwendegahén cegdarîya -sitenbol- da ji dewre dîtî ûçar- salan li derbendé qafqasya li hember leşkerén (qeyser) şervanîbûn, belé piranîya hézén şoreşgîrén (şex seîd) jiwan pêk hatibûn, ji/1923- 1924/ ligor progirama xwe di bername-én xebaté de begehén fireh di nav welatîyan de dane berxwe, çewa ku di rûpela (33) de hate gotin jibona şiyar kiriné û berhev kirina imzan li her derén kurdistan digeriyan, jibona pêk anina şoreşé.

Di/1924/ de wé sazmana (erzerum) gongirések dane giré-dan ku a pêşîn bûn, diwé kongirésa tarîxî de awir li siyaseta derve vedan, jibona rojén pêş û berevanî xwestin destek alîkarî û dewletek hevalbend bi destxin, diwan guft û goyan de, hinan gotin: em li-sûrî-xwe bigînin (firansa), hinan gotin: li-îraqé em xwe bigînin (ingiliz) didoyan jiwan gotin: vaye (rûsya) néziğtir bi sînoré meveye, hingé tevan bi yek dengî li herdûyan rabûn û gotin: rûs dewletek bê dîne em tu hévî jé nakin, diwé civiné de (şex seîd) jî ronîştî bûn, got: hinan ingiliz hinan firansa gotin: kesek jiwe nexeyidîn, lé dema ku wan behsa rûsya kir hûn zivér hûn, hûn di warek siyasî de

dostanî û alîkarîyek diwê li dixwazin, hingê çi tékilîya we bi dîné dewletan heye? -şêx-jî bé ku zanibe di/1920/ de (rûsya û turk) li (gumrîyé) peymanek dostanî bi hevre imza kirine, dest nadén wan,

lé liser gotina (şêx seîd) kongiré daxwaz namakî bi téde én jér nivîsîn, siwarek bi siwarî li sînoré (gurdistan bajaré ahîska) derbez bû da civata karé wané derve (KAMISARYA) ku nivîsar evbûn:

-hûn bi cigrafiya kurdistan ve dewletek hem sînorén me û ji her dewletén awripî çétir mesele û tarîxa me nasdikin, çewa ku ji ersa (19) ve hûn pédarpé şoreşén mejî yeko yeko dizanin, jé û péve dîsa hûn dizanin ku miletek xerîb, di bawer mendîya islamî de ji (mengolya) der bazî welaté me bûne, lime hukumdikin, sitemkarîyek welé ku bawerî bi huqûqé me-é nejadi û tarîxî jî nayînin, dixwazin me di welaté mede asîmîlasyon bikin, heya nahélin ku em bi zimané xwe-én maderî bixûnin û binivîsin, ji tevaya mafé insanî em bé par kirine, diwarén civatî û abûrî dejî her û her dijarînin mezin digînin me, aydiyolojîya we alî karé miletén bin destte, dema em bi doza xwe ve rabin, hingê em hévi ya alîkarîyén siyasî ji we dîkin, berî kutahîya nivîsaré em ihtîrama xwe ji were pêşkêş dîkin, çav nêrén bersîfa wene. jibona civînek zeman û mekan sipatriyé weye, biwê daxwazé bersîfa wan ev bûn -em dizanin hûn nejadé arî koka roj helaté névînin, ji ezmîne-én dûrve hûn diwê etnogirafiyé de her mayinde, ji milêdî em dizanin ku di welaté xwede sitemberin kesek nikare vé inkar bike, lé em

tékilî bi hunduré hin dewletén dîtir nakin, çewa ji destek alîkariya sîyasî re jî em ne amandene, lé dema ku hûn bi doza mafé xweve rabin em alîk arîya hukumeta turk jî li hember we nakin,-

Piştî wa bersifa rûsya ber bi tu dewletek dîve neçûn, bawerî bi nefsa xweya zatî anîn, tékiliya tu dewletî bi tu awayî biwé soreşé nebûn, ji doza mafé xwe-é qewmî û tarîxî péve jîwanre tu daxwaz nebûn, çewa ku her şoreşén kurd bi daxwaza xweve rabûne,

ÇIMA BERÎ PROGIRAMA BIRYAR DAYÎ ŞOREŞ ÇÊ BÛ?

Her wekî ligor di rûpela (222) hatiya zanîn ku di /1916/ de dema (rûsya) çar wilayetén kurdistan vegirtin, hingé dakete (hekarî) liwir weke (ermen) silah da (file-én nestûrî) yén wir, di /1924/ de jibona mesela (mosil) ku turk leşker kişande ciziré û hekarî hingé jîwan (nesturî yan) sîleh xwest, wan sîleh nedan jiber wî qasî ji qolordûya heftan a li (diyarbekir) leşker kişîya şeré wan nestoriyan, ku tabûr û bilik piraniya wan kurd û qumandanén wanjî kurd én wek: binbaşîyé erkanî ihsan nûrî (1) yûzabşî-teffîq cemil, rasim, xurşîd, milazim gelek bûn ji wan (riza) biré (yusuf ziya) û gelek zibatén sefjî nebûn, her wekî li jor derbaz bûye, ku diwan

1. ew binbaşî (ihsan nûrî) bûn ku ji/1929-1931/ femandariya şoreşa -ARARAT- bi dest xwe girtibûn, di/1976/ tehran bi hingaftina motosikil hate kuştin-esbabek siyasi an qeder, nehate zanîn,

eyaman de mebûsé (bedlîs yusuf ziya) ji (sitenbol) hatibûn, liwir hin partiyên dijé (mustefa kemel) én weke: (ittihad tereqi, (cumhûriye) û hin hevalbendén sultanen bi fortén va la seré wî dagirtibûn ku ewé jî di nézîg de liber hukmé (kemalistî) rubin, wîjî bawer kiribûn, bé ku zanibe turkén anedolé ji zemanek dûrve ji hézdarîyén sileh û şoreşgîrî ketine, belé (yusuf ziya) bi xudbinî û sergermêyek tekane ji bira-é xwe (milazim riza) re namekî bidest dişîne û dibêje:- xwe hazirbikin (riza) wé nivîsaré dide (ihsan nûrî) ewjî bawer dike ku ew danezan ji qumita merkeziya (erzerum)e. biwê gumané herçar qumandanén gotî bi navé muneweré leşkerén xwe kişandin çiyayén hekarî én (çele mérg û heytulşebab) piştî çend rojan ji wanre xeber hat ku ew danezana (yusuf ziya) xeletek mezin bûye, lé ji firqa didüyan a li (sérté) bi fermana general elî leşker Vîşandin serwan, piştî şerek ne diréj herçar qumandanén kurd bi navé laciyan siyasî derbazî-îraqé-bûn, ku hingé-ingilîz- lé mandater bûn, dinav -ingilîz û turk-de liser (mosil) kêşmekêşek mezin hebûn. di polilitkia siyasî de ingilîz ne tené qebûl kirin, lé zêde liwan werhatin, ji (mosil) birin (bêxda) xuwarina wan û (generalén ingilîz) yek bûn, lé heşé wan jîwan bi şûnde biwé xeleta (yûsuf ziya) li dest péka şoreşek bûn, bi daxwaza ku karibin ji alîkarîya şoreşere hézek dîtir bi destxin, ji (ingilîz) re gotina: vé ketina agiré şoreşek li turkiye liser rojane, emjî diwé sazmané de azane dixuwazin bigîne kurdistana (îrané ba-simiko), ligor wî zemanî ji siyaseta-ingilîz- re lé werbûn ku seré turk bikeve géjanîyan, lé jére nebû

daxuwaz ku ji şoreşere bibe alikar, ku biwê dazêve (şêx mehumd) pêre şervanî bûn, lê daxwaza herçar qumandanên kurd qebûl kir (16) hezar dînar ji dane wan û bi jêpên xwe-ên eskerî ew derbaz kirin ba (ismaîl axayê şikakî), berî ku herin ba (simiko) xwestin bigîjin (şêx mehumd) ingiliz-ew rê ne dawan û got: (şêx mehumd) dostê turkane hûnê çewa herin hawî, jiberwê çendê çûna ba (simiko) jiwane bû daxwaza yekemîn, lê sed mexabin piştî ku di/11 ADAR 1925/ de (şoreşa şêx seîd) dest pêkir, wan herçaran ji simikore gotin: divê emjî ji heremê (wan) ê derikî şer li (turk) bidin vekirin, lê bi tu awayî (simiko) qanî nekirin (1).

GIRTINA XALID BEG SEBEBÊ DESTPÊKA ŞOREŞÊ

Belê ligor progirama şoreşê destpêka şoreşê wê dawîya gulanê bûna, lê wê buyera hekarê turk li veşartîyên sazmanê şiyar kirin wek: tê gotin: gule-ê ku ji devê tufengê derket dîsa venagere wê qawanê, piştî ew qumandan cderbazî îraqê bûn, tavil bê hévişandin şevek li (erzerum) leşkerên qolordûya heştan girte ser mala (xalid beg) ew girtin, deftera navên (libatan) jî pêre, diwê şevêde alahîyek siwari lidore berîwî dane (bedlîs) çewa ku (yusuf ziya, hacî mûsbegê xûtî) û hinêdî jî li (bedlîsê girtibûn,)

Diwê réwîngîyê de li heremê (lela melazgir) karwanek (heyderan) libergeha wan derbaz dibûn, (xalid beg) bi

1. jiwane qumanda nan ev danezan ji devê (yûzbaşî tewfiq cemil) jiminre date zanîn-



General Khalid begê cibrî.

zimané kurdî jiwanre got:

- Silavén min li (saleh beg) bikin, ez bé xercîme bila minre (500) ka xizén tek tek û nû jiminre bişîne va ez derim (bedlîs) é, salih beg ne li mal bûn wan karwanan évaré li dîwané ji (huseyîn paşa) re gotin:

- (Xalid beg) wek girtî xuyabûn, siwar û lidorwî sowariyén leşkerén turk jimer got: va min dibin bedlîs bila (salih beg) jiminre (500) sed kaxiz én nû tek tek bişîne - bé ku -huseyin paşa) bîrek mana pirsé bibe got:

- ha ha kenîya û got: xalid beg-doza meznatîya kurd û kurdistanek dike, di berîka wîde pencsed nîna- şeva dîtir kuré wî (salih beg hate mal, jére got: salih, hevalé te-xalid begé cibrî) li kela melazgir weke girtîbe lidor wî gelek siwarîyén turk dibirin (bedlîs)é ji karwanên mere gotîbe: bila saleh ji min re (500) kaxizên tek tek û nu bişîne. (salih beg) gazîwan karwanan kir û pirsî kingé bûn? wan got: pîr bûn, salih beg, bi herdû destan liseré xweda û histiran ji çavén wî rézkir zivîrî ser û got: ango tujî generalek milişayî ma te çewa nas nekir ku ew pîncased kaxizén nû tek tek-yani xortén cengawir bişîne pêşîya me- lé sed mexabin û hezar keser giyandin (bedlîs), belé bexté reş eger hingé (saleh beg) li mal bûna (xalid beg) jiwan digirtin

Her wekî li deverén dî gotin derbaz bûye, li (bedlîs) çend zibatén ji rutba (xalid beg) piçûktir û ji uslûbén mukeman ji béxeber ew mehkeme dîkin, çewa jére destûra gitina awqatek jî nedan, jiber ku mehkeme bé qanûn bûn, bi awakî şiklî çend rojan wek listikek komîdyakî diramî biwan

re çend civîn girêdan û dawî li idama (xalid beg û yusuf ziya) biryar dan li gestînek hedlîsê ciyê wê qetil ama (ahmed milk) herdû bi derve kirin, piştî hingê ligor deftera girti libatên wê sazmanê tevde xwestin ku yek jiwan (şêx seîd), lê kesek bi daxwaza wanve ne çûn, her kes li nav eşîrên xwe man, turkjî nikaribûn here wan bizor destî bigre, çewa ku ew daxwaza zorkerî li nav eşîra (hesenan) biwan da zanîn.

Piştî ku ji girtina azayên sazmanê bé hévî bûn, naskirin ku biwê hézdarîya skilehên eşîran tu havilan bi destxin, hingê ji te vava eşayîrên kurd sîleh xwesin, lê tevaya eşayîran bi sertî bersifa ne dayîna sîleh dane turk, ji qolordûya erzerum (bînbaştî elî saîb) (1) bi leqeba (kel elî beg) ku raspotînek kemal bûn, bi hezar leşkerî çû gundê (xalid beg)é -hesenî), biwî leşkerî dor li gund péça çend zabit pére çû dîwana (xalid beg), ji dest hilanîné bikeve, (elî saîb) bi hêrs û dengê eskerî ji -xalid beg-re got: xalid em jiwe sîleh dixuwazin hûn goyên xwe kehir dîkin, bé virda û wêda divê tu tevaya sîlehên eşîra xwe bîni û teslîm, an na emê te én wekete edeb bikin, biwê ziman dirêjîyê (xalid beg) şeşagîr jiber xwe kişand û xiste devê wi got: hey serserîyê bé edeb tu lihember kî dipeyîvî? ezê nuho mejîyê te bikim dew, zibatên hevalên wî bi hev re got: xalid beg em ji te rica dîkin, elî saîb ne bi heşê xweyê berî em bigîne vér eraq vexuwar, xalid beg deng li peyayên xwe kir û got: van tevan

1 ew-elî saîb) di/1925/ mudefî mehkema eskerîya (istiqlal) bûn, di wan sê salan de bi deh hezaran kurd idam kirin, çewa ku ew (xalid) beg bixweji idam kir, lê ew gunahê ku (xalid beg) di/1916/ de esrarê (şêx seîd û evdurezaq beg) dane (nûrî weysî) hingê xwest ku bi destê turk xwe û milletê xwe bide idam kirin.

bigrin, her peyaki liser zabitek peya bu u bi pesira wan girtin piştawan li diwar dan, xalid beg jere got: ji leşkerên xwere kaxiz binivse u bişine bila gund penc kilometir dur kevin, hunêje bigine wan an em divirde we tevan biser hevde bikujin, çewa ku yek tenêji ji eskerên weji xilas nabe, (elî seîb) tavil jîwan zibatên bi leşker re nivîsî ku divê hûn ji dor gund durkevin bidin ser rêya (erzerum) emji digîne we, piştî ew leşker ketin ser rêya erzerum paşe jîwanre gotin: rabin siktirbin, bi peyatî çûn giyane eskerên xwe, piştî giyane erzerom ew serpehatiya xwe ji-general kazim-re danezanîn, lê tu hereke general çê nebû,

Piştî idama (xalid begê cibirî u yusuf ziya) tevaya azayên sazmanê xwestin kesek goh liwan nekir, a diduyan bi berhev kirina sîleh ve rabûn biwê daxwazê jî tu havil bi dest nexistin, tevaya eşîran welê bi sertî birsifa wan dan, jîwê payîza navîn heyanî meha şubatê turk u kurd herdû jî bê tevger man, heryek jîwan li keyis u fesalek digeriyan, nemaze dinav wan azayên qumîta merkezî de zêdetir dayîn u sendin u şewîrên siyasî hebûn, ku civînek mezin jîwanre divabûn,

KONGIRISA ÇIYAYÊ ÇANÊ (1)

Di/I-ŞUBAT- 1925/ de ji azayên-sazmana ezerum- rona-

1. çiyayê çanê li kurdîstana bakur roj ava dikeve (cebeqçûr) keviya bakurê (ferat), bakur roj avayê (mûşê) di nav eşîrên zaz deye. gundek şêxane) çewa ku-ceger xûnwerin rabin geli şêxên di çanê - binêrin hûn livê axir zemanê- jîwan şêxên çanê (12) de kes li-diyarbekir- îdam kirin,

kén siyasî, qumandanén milişya, serekén eşîran, dinavwan de hin şex û mela- jî nézîgî (300) kesî li (Çiyayê çané) kongrisek siyasî û tarîxî hate girêdan di gotin daxwaz û biyaran de, wê civîné séroj dirêj kir, zêde é nivî gotin: divê em heryek di mentîqe-én xwede bi serkarén hukumeta turk re bidin û bistînin gumana hereketek me ji heşê wan dûrxin, heyanî ku em bigîjin zemanê berê biryar dayî dawîya meha gulanê, ji bona ku niho leşker nekişînin van navçeyan, diwan guft û goyan de, (şex seîd) liwan guhdar bûn, lewre di sazmanê de (şex seîd) azakî fexrî bûn, diwê hindavê de rabû serxwe bi hêrsek mérxasî û şoreş girî gotar da û got:

Gelî ronak qumandanén milişya û serekén eşîran, livir we sistîya xwe da zanîn piştî ku turk bi serê werîs girtîye ji nû û para hûn dixwazînin bêjîngê bikin perde liber ronahîya rojê, ne turk lê hûn dixwazînin nefsa bixapînin, eger em bivan sistîyan xwe bispêrin gumanên we ên gotî turk xwe bi gumanan nagirin, wê weke (êrmen) we bi jin û zarukanv e bidin ber sungûyên memedcikan, ji milê di çewa hûn vé bê bextîya tarîxî lixwe qiyas dikin, ku serekê sazmana we tevî yusuf ziya girtin biwî xesaisê xweyê mengolî bi darve kirin, em ji nûve xwe ji daxwazaê bi şûnde bidin hingê emê li hember millet û tarîxê çi bersifê bidin? tevî ku mérxasî cengawirî û sekmanî gedê wene, bê daxwaza siyasî we çar salan şerê leşkerén qeyser kir, lê gelo çima hûn nikarin bikevin berevanîya namûs şerefa xwe? di nav wede ez meruvek kal umrê min diser heftê salîreye û di dest mindejî tesbîh, vaye min tesbîh avêt û rahişte tufengê, mal zarûkên min jiwe bêhtirin, dirêya mafê milletê xwede ez tevan fida dikim, her

wekî xanî fermayîş kirîye:

bê ceng û cudal bê tehewir - qer vî şuxulî mekin tesewur-
- ya qenc ewe ku em siwarbin - bi sileh û barbin - bê ceng û
cudal bê tehewir - qet vî şuxulî mekin tesewur

- caran û cewşenan di berkin- miqfar û zinferan liser kin

- guzan bihejînin û rîman bi bazînin- ev renga memê ji mîr
bixwazin

- wer mayî musur liser înadê- emdê bigirin rengê cihadê,

- buhtan bigirne reqis û govend- da bêne temaşayê şeker
xwend,

Biwan halan û nav tédanen (şêx seîd) ew telpe-én ewrê
sistî û tirsê ji ezmanê wê civîné hate rêjkin, jinûve bi
dilgermî ketine civîné di dayîn û sendinan de ev bername
dane berxwe- di biryara pêşînde (şêx seîd) bi fermanîya
şoreşê biyar dan û cedwela jêr dane ber:

1. ji qumîta merkezîya sazmanê péve qumîta cengdarî dane
çêkin,

2. liber bêşên siyasî tektîkên xebatê û cedwela kirinê danîn,

3. jibona yektîya xebatê pêkanîna aşîtiyê di nav eşîran de,

4. jibona şiyarî û hazirîyê gera şêx seîd di nav welat de,

GERA ŞÊX SEÎD

(300) peyayên cengawir di paraztina (şêx seîd)de derkete
gera nav welat, ew qeza û nahye-én ku di nav hézdarîyên
eşîran de, turk nikare tékilî biwan bike, piştî gera wan here-
man û pelandina millet û serekên eşîran, wê dîsa vegriyana
wargeha berê diwê gerê de çî havil bi dest xist wê bidana

qunîta merkezî a çiyayé çané, hingé héj biyar li zeman û mekané şoreşé bidin, bergeha wé gerê ev dever bûn:

- wilayetdara yenî, qeza licé, héné, pîran, erxenî, eglé, palo, çewlik- jiwir dîsa vedigeriyan wargeha jé çûyi ku (çiyayé çane) bûn,

1. didest pêkapêşînde bi-300- peya én bi sîleh sîleh berbi başûr deweke (wilayeta dara yenî) (1) li mala (hacî îsmâîl axa) peya bû, ku sereké eşîra (yexkîg) tevde dinbilî bûn, leşker û jandirme-én turk nikaribûn tékilî biwan bikin, liwi sereké eşîra (zikté selim axa) alahî qumandané milişya kuré (îsmâîl axa) yosif axa ewjî qumadanê milişya, jê péve (sadiq begé madrag bînbaşiyé milişya-mehmed begé xerîbé) û hin serek û qumandanén dîtir bi (şéx seîd) re ketin civîné,

2. jiwir beri başûrve, li mala (emeré faro) bînbaşiyé milişya û sere eşîra-botîyan peya bû, liwir jî (heyderé emeré sadiq bînbaşi û sereké eşîra-tewsela- sereké eşîra-mistan û hinén dîtir pére ketin civîné û bi daxwazé ve li nefsa xwe biryar dan.

3. jiwir ber bi başûr dakete (qeza licé) li mala (heqî beg) peya bû, liwir ez giyame wan, liwirjî mîrekén (licé) péve tevaya serekén eşîra (zirik) ku-licé, hezro û héné- ew sé qeza tevde zirike. biwan rejî kete civîné derî girtî, liwir (qaîmeqam) jî hate ziyaretîya (şéx seîd), ku daxwaza wî

1. dar yeni-dikeve keviya royé-ferat-hingé wîlayet bûn (niho bi na vé nû (bîn gul) kirine wîlayet ku kurd jére (çolek) dibéjin.

gotin: digem ma amede, ez bi wan re siwar bûm em çûne ba (ihsan nûrî), nivîsarek ji emîr cengê tehran dane wî ku divê hûn sîlehên xwe teslimê leşkerên îran bikin, ihsan nûrî bersif nivîsê da wan têde gotibûn:

- Em nehatine ku di îran de liber we asê bibin, me heqê lacîtî ji we xwest we neda, tevî ku hem nejadên mene û dizanibûn nêzîgê niv milyon jin û zaruk ji birçînan dimrin, me xwe li ser we ferzîkr, em nêzîgê sînorin û leşkerên turk lihember çavên me sînor dagirtine, em livir sîleh daynin û hûn me bispêrin turk me tevan biser hevde dikuje, çewa ku hûn biwê kuştina çemê zîlan dizanin, rê bidin me em bigîjin bajarên weke: (Mako, kelaxwey, Rizaîye an Mehabed) emê tevaya sîlehên xwe bicarek bispêrin we - biwê birsifê vegeriyan çûn,

Roja dî sibehê me nêrî ku leşkerên îran hawî dorên wan gundan li me pêçane, dîsa deng lime kirin ku sîleh teslîm bikin, dîsa bersifa berê dane wan û dest bi şer kirin, em û gundî bi hevve gullebaran kirin, gulle - ên topan li xaniyan diketin ew gundiyan belengazî bimere dihatin kuştin, em sê rojan di nav wê qijvijêde man, li hawîdorên me laş û birîndarên jin û zarukên me û wan gundiyan îranê li erdê bûn, lidor (50) kesên ku ji başûrê çiyayê (toros) - em giyabûne nav şoreşê, me ji kurdên îran xortek rêhber peyda kir, di erdê îran de bişev em berbi başûrve daketin, sê şevan em giyane sînorê - wanê ji wir em dîsa derbazî welat bûn, herkesê jime berê xwe dane ciyên xwe giyane nav wan mefreze - ên ku ji nav wan çûbûn, ên ku belewela liher derên welat di cengdariya kumandosî de bûn,

(farqînim), lé ne weke te ev çend sert, jibona ihtîrama (şéx) niho jiwan biqerin, piştî em jivir çûn destê hukümet é diréje hûn dikarin wan bigrin, bi tu awayî çawîş razî nebû, min ji hevalanre got: bila bibin, lé (neboyé keleş) (1) ewjî ji çawîş serttir dema (çawîş) rahişte milé wan herdû mehkûman û liwan da hingé nebo ji tufeng xiste singé çawîş û kuşt, jandirme berbi merkeza xwe revîyan tavil giyame ba (şéx) min jére buyer da zanîn, şéx gelek ji buyeré zivér bû û got ev çi nezanîye, ji bira-é xwere got: zû xwe bigîne ba zabité wan û jére béje: emé herdû mehkûman tevi (nebo) pispêrrin we, lé dema (şéx evdurehîm) nézîgé merkeza wan bû, tufeng berdane wî (şéx) gazî kir û got: em tén biwere bipeyîvin neku şeré xwe bikin, lé nesekinîn du peyayén bi (şéx) re birindar kirin, ji hawîdor peyan merkez a jandirman kirin amnc, her çendî (şéx) gazî wanjî kir tu féde ne da hin jiwan hatin kuştin én dîtr xwe teslim kirin, lé mesele xira bû, biwé sergermîya çawîş û sertîya (neboyé keleş) ré li péşîya wé gera (şéx seîd) hate girtin, bé ku em bigîjin (erxenî, egil, palo û çolek), em bi şûnde vegriyan héné, jiwir gundé me û mala emeré faro û ji wir (şéx seîd) payayén pére çûne (dara yenî) bû dest péka şoreşé.

1. neboyé keleş) li nav eşîra cibirin: û hesenan binav û deng bûn. roja (şéx seîd) ji (kela xinûsé) bider ketibûn, é péşîn ewbûn ku giyabûn (şéx) ku ji şéx re zéde fedakar bûn,

BIRÊ ŞEŞAN

Institut kurde de Paris

DESTPÊKA ŞOREŞA ŞÊX SEÎD EFENDÎ

Her wekî li jor hate gotin: di/11-ŞUBAT-1925/ ku li (pîran) te-qîya (şêx seîd) vegebiya (wilayeta dara yenî), liwîr ew qumîta wana merkezî a li (çiyayê çanê) ewjî giyane wî, liwîr sazmanek cengdarî û enîyên şervanî dane vekirin, diwan sé şev û du rojande (şêx seîd) tenê çar saetan raza, li hember leşkerên turk enîyên jêr dane vekirin:

A- enîya (palo û xarpêt)-18-hezar şoreşgîr bi fermendarîya alahî qumandanê milişya (şêx şerîf) dane vekirin,

B- enîya (varto) bi fermenderîya (baba beg) û qumandanên wek (evdula hé melekan, elîrîza kurê şêx seîd, xelîlê xeto û hinên dîtir bi (12) hezar şoreşgiranve, navbir xistin rêya (mûş û erzerum),

C- enîya (diyarbekir) (20) hezar şoreş-gîr bûn, (10) hezar li roj hel té -dicle- bi fermendarî (heqî begê licî) (10) hezar roj avayê dicle- bi fermendarîya (emerê faro) bûn, biwan her yekê re jî gel zibatên dîtir hebûn, ku tevan di leşkerîya milişya de terbiye dîtibûn, ev enî li hember qolorduya heftan bûn,

D- enîya paxir medan, (7) hezar şoreşgîr bi fermanda (şêx evdurehîm) bira-é (şêx seîd) pére (kemal feyzî, mîre-é sadiq) û hinên dî muste şar hebûn, ku ewjî li hember qolordûya heftan bûn,



H- enîya silivan- bi fermanda (şêx şemsedîn) pére hin serek û ronak ji eşîrên silif

şêx dodan û sînan -hebûn, şoreş-gîrên wê enîyéjî (10) hezar bûn, diwan her şeş enîyande lidor (70) hezar şoreşgîr di berevaniya mafê kurd de şervanî bûn, ew enî tevde li erdê rast liser uslûbek herbek diwêlî şer dabûne vekirin, (1)

Ew enîyên gotî tevde hatibûn teşkîl kirin lé héj neketibûn wan enîyên gotî (şêx seîd) jî héj dane ketibûne welaté me, di/7 ŞUBATÊ de ji hénê poste biwanre mehkûmek kelepçe kirî du jandirme pére dibirin licé, di nav gundé mede derbaz dibûn, me ji hevre got: her diz û xwedî yé mal bihev hesîyane emé çima vana di ser xwer derbaz bikin, me herdû jandirme tevî posté girtin, é girtî (evdulahé şêx elijî) berda ew jandirme şandin (dara yenî) ba (şêx seîd),

Piştî pénc rojan jimere xeber hat ku alahîyek siwarî ji (diyarbekir) tén wê herin (qeza licé), gundéme û sé gundî-nén dîtir em çûne deşta (fîsé) péşîya wan, li hindava kaniya (zerga fîsé) me liwan teqand em lidor (50) tufengî bûn, di dest péké de wanjî şer kirin lé dema ku dîtin em wan dixin çenberé siwar bûn û bi şûnde revîyan, lé teva ya giraniya xwe li erdê héştin, lé jime (şehîdé) diwé şoreşé de pismamé min (ahmedé saleh) hate kuştin, di cenga cîhané a péşînde ketibûn şeré rusya û li deşta parsîné dîl kete desté rusa, sé salan li rusya ma, dawî kete nav polşevîkan şeré menşevîkan

1. biwé xeleta ku li hember hukumetek bi her tewir sîlehén giran û leşkerek nîzami, me li erdê rast cebhe girtibûn, biwé nezaniya cengdari me xisarén mezin danîn heya ku piştî şeş mehan héj me şoreş gîrî wergerande herbek kumandosi, hingé xisara me hindik a wan zéde bûn. biwé cenga kumando sésalan diréj kir.

in.

kir, di/1918/ de bi hesip û sîlehê xweve hat welat, lé liwir bi gule-é turk hate kuştin bû pêşengê karwanê şehîdan,

Wan gundên qada şer én ku nehatibûne şer dirêjî bişûnde mayên wan siwarîyên turk kirin, çadir, cebxane kirin, şervanî biwan re xeyîdîn û gotin: wextê şer hûn liku bûn, diwê hindavê de me dît (şêx seîd) bi hin siwaran ve li qada şer peya bûn, (şêx seîd) got: bi wanre me xeyidîn bila bibin jibo ku ewjî xwe li şervanî bişidînin, jiwî şerê me-ê tekane pêve êdî hézén jor gotî bi awakî resmî eniya diyarbekir hember qolorduya heftan (1) enî girtin,

Liwir (şêx seîd) got: em herin ba (şêx selîmê hezan) (2) ku nêzîgê wê qadê pénc kilomitir bûn, em qedere sî siwarê pére çûne ba şêx selim- xelîfe- é hezret û zavayê wîbûn, şêx seîd- jêre got: şêx selîm ev mîletê me-é ku bi sedan sal her û her ihtirama me girtine, em li ser xwe mezin ditina eger binavê dîn bejî, gelo emjî li hember wan û mafê wan ne berpîrsiyarîn? dema mîletek bi huqûqê xweve ne xweser be, çi kare namûs şeref dîné xwe jî bi parêze? divê em zanibin ku ev kurdîstane ne bustane em û dijmin bi hev re bixun, ev mîletê bed bext dîl û bindest jî me heq dixwaza nê buhuştê, dîsa divê em zanibin ku em û tevaya kesên xwedî nîfûs liber mehkema mîlet mehkûmin berê ku biryara îdama me bidin, divê em bi fedakarî jibo mafêwan bixebitin, divê warîde ber-

1. di nîzama eskerîya turk de (30) hezar eker re qolordû dibéjin,

2. ew şêx selim-zemanê ku-mustefa kemal-li diyarbekir bûn ew şêx.kirinbûn bavê xwe-e manewî, çewa ku tarîxa mala? (hezert û xewsé hîzan ji her kesêre diyare ku hezret li hember wê şoreşa mala xewis) nçixiyane kirîye,

sifa te çiyê? wî got:

- şêx efendî li tevaya kurdistan weke te giraniyek millet bi mere nîne, lêezêjî van gundên dor xwe vehewînim û emê bigîjin we-lê maxa bin piştî em ketin şerê ser diyarbekir şêx bû çete é turk-

EMELIYATÊN HER PÊNC ENÎYAN:

ENÎYA XARPÊT- her wekî liyor hate gotin ew enî bi (fermandariya şêx şerîf) û alîkarê wî (alahî qumandanek dî selîm axayê ziktî) û hinên dîtirjî hebûn, di dest pêkê de leşkerên wilayeta (dara yanî) tevî serkar û karmende-ên wê tevde dîl girtin, di şûna walîyê turk de (hesen fehîmî é modan) kirin walîyê kurd, jiwir (qeza çolek) vegirtin, liwirjî qaîmeqamê xwe tevî serkaran danîn û derbazî (palo) bûn, liwirjî weke qeza-ên dîtir qaîmeqam û serkarên xwe bi én turk guhartin, ew lehîya şoreşgîran ber bi (xarpêt) ve bera pêş kişîyan teslim bûn, lê mexabin ji sé kêmânîyan fireset dane dijmin:

1. Dema bajar vegirtin dûrî bajar réyên ku ji (diyerbekir û melatî) tén (xarpêt) ne xistin bin perda şoreşgîran, ku eskerek pir giy bajar şerê kuçan dest pêkir,

2. bé pelandinek firqa hendesî şoreşgîran dirêjî wê enbera cebxa ne a li (huseynîgê) kirin, ew enbera mezin biwanve teqîya, bi dehan insan weke kerem peran bijor zemîn ketin

parçe bûn (1) ji én doré péve xisarek zéde mezin giya şoreş-gîran,

3. ji quman danén eskerî û mebûsé (dersim) (hesen xeyrî beg) hingé li (huseynîg) ciyé wé enbaré bûn, (şéx şerîf) jére got: divé tu bi mere bé em herin desim ba (seyîd riza) divé ewjî (erzincan) vegirin û jiber hatina leşkerén turk réya (séwasé) bigrin, daku leşker ji anedolê negîje qada xarpét,-lé (hesen xeyrî) pére neçû, tené ji xarpén bi telefûné bi (xozat) re peyivî û got: liwir tu tevgeré mekin heya em béne wir (2), wan her sê nezanîan hévişandinén cengdarî ré dan ku di zemanek nêzîg de dîsa turk (xarpét) vegirin.

ENÎYA VARTO:

vé enîyéjî qeza-én (gînc, êxnût, gêxî û varto) vegirtin û li varto, wargeh girtin, jibona ku leşkeré qolorduya heştan ji (erzerum û mûşneyén) qada şer, wanjî leşker jandirme û serkarén turk liwan navçeyan bi én kurd guhartibûn, lé tu tevger jiwé qolorduya (erzerum) a (kazim paşa) çé nebû, heya ku ji anedolê- qolorduya nehan- dirêya tirênê de giya (mardîn) û jiwir li enîya (diyarbekir) kete şeréme, héj ew qolorduya erzerum- da kete enîya (vatro), jiber wé çendê

1. di cenga cihan a pêşin de. tevaya silehén erzerum anibun wé enbara huseynigé a ku teqîya,

2. ew (hesan xeyrî beg) li hepisxa (xarpé) é îdam kirin-ku hingé em li ba hev bûn, dema xatiré miriné jimin xwest, min jére got: xeyrî firest dayina dijmin vé tine seré meruv û miletê meruv!...

(mustefa kemal) ew (general kazim) jî xiste ber mehkema eskerîya (anqera),

ENIYA DIYARBEKIR:

Her wekê li rûpela (256) hatiye gotin: piştî em ji ba (şêx selîm) vegeerîyan, xeber ji mere hat ku tabûrek eskerên piyade ji (diyarbekir) tén dixwazin herin (licé), édî liwir şoreşgîr lime zéde bûbûn jibona ku em dakevin dor (diyarbekir), ji-deşta fisé-ciyé şeré wé alahîya siwarîyan ber bi başur em liser réya (licé û diyarbekir) derin, em giyane (deré pîresin) ku édî ji çiya emé bikevin deşté, wé tabûra gotî ji dûrve em dîtûn, liwir di nav pûş û palaxé de li erdé çeper girti bûn, çekén wanjî ji rengé axé, dema me nézîgî liwan kir, ji nişkeve lime teqandin, diwé seqîl tûtané de gelek birînder û kuştî jime çé bûn, én péşîn li paşî vegeerîyan pesara çiya, (şêx seîd) ji para giya serme û got: çi liwe qewimî? ma hûn şerim û fedî nakin jiber memedén turk direvin, di cîde ji hespé peya bû û tufeng ji desté seyîsê xwe (çerkez) girt, rexté fişekan di ser şaşîk û riyé xwe é sipî re derbazî nav milé xwe kiri û herdû dawén xiftané xwe li nava xwe péçan û bera péş ber bi wan eskerên turk ve çû, dema şervanîyan dît ku (şêx seîd) bi wî umré kalî rahişte tufengé û diréjî çeperén dijmin kir, hingé tevaya şervanîyan pére vegrîyan tevaya wé tabûré é kuştî û birîndar én dîtir tevde dil ketin desté me, di enîya şerde ev dîtina mérxasiya (şêx seîd efendî), diwé péşve çûné de li devé newalek ez rastî

tabûr qumandané turk hatim, ku birîndar li erdêye, şepqa wî gindiribûn newalé, li çavên wî rehên sor vedabûn, limin dinêrîn lé nikaribûn bipêyîve min ji metere-é xwe min av dawî, piştî av vexwar giyan bi berda, min rahişte dûrebûna wî, hin şoreşgîr giyane serme gotin: tu çi lé dinêrî? min got: gelfî xortan birîndar û kuştî divê em jiwanre dilovanbin wek ên xwe, yeké jiwan dest tixte berîka wî perekî hindik pére lé satek sarkisof tevî qapaxan tevde zêr ji berîka wî der xist, dilé min nebijiya ku çima min dernexist, lewre ew neyartî nikaribûn perda di lşerî bigre ser wê dilovanbûn min ku bi minre zayinde bûn.

Piştî teslîm girtina wê betelyoné évaré em li gundé (hewré û karaz) bûn mévan, bişev posta me hat û got: fir-qekî esker (bajaré héné) vegirt, ronîşt manén bajaré tevde muhacir bûne xwe dane çiyân, liwir (şéx seîd) û qumîta cengdarî jimere gotin: divê hûn bi şev nerin bajaré hawîdor lé bigrin, da ku sibehé hûn deverén dijmin nasbikin em nivê şevê giyane dor (héné) ku jime péve kurdén wan hawîran bajar pé çane, em man heya ku bû sibe, me dît ku em di nav kom û kew te-én jin zaruk û muhacirén bajar dene, em qederé (60) pî.şî li roj-helaté bajaré (pira şikestî) de me çeper girt, bimin hesîyan ku me ew ji hawîdor péçan, bi awakî bé nişan bi beteriyek heft topan ew hindavé em lé dihingaftin, lé ciyé ém lé newal gulle-én topan di ser mere derbazî wî alyé newalé dibûn diteqîyan, ew jin û zarukén bajaré ditir-sîyan, me nav diwan didan û digotin: metirsin ciyé we nizme gulle deser weré derbaz dibin, heya bibe évar hûné bibînin

ku emé çewa tola we jiwana bigrin,

Piştî ku perda tariya şevê girte serme, me berê xwe da bajêr nav leşkerên turk, ku êdî ji hawîdor şer véket, diwî çar kilomitrên navbera me û bajêrde netenê bilez lê zêdetir em bi bazdan diçûn, heya em giyane perê bajêr (mehla emşîgê) êdî şerê qumber yanî narincikên dest, dest pêkir, em giyane gastîna (1) nav çarşîyê ku eskerê turk wek: keriyên pez li hev kom sekinîne, lê tevde dest vala berî me şoreşgîran ew ji sîleh xistibûn, lewre jime péve ji bakur û rojava îriş berdabûne ser wan, jiwir em daketin ser çavîya mezin ku liwir jî esker bi kewt û koman lihev sekinî di navwan de li erdê hin kşutî hebûn, ewjî tevde bê sîleh, em zêde liber xwe ketin me got: sibehê ku me dîl û sîleh teslimê amir hézan nekirin, wê bêjin we dirêjî çeperên dijmin mekriye, tevî ku em bi bezjî çûbûn, jiwir em berbi mizgefta piçûkve çûn, liwir em rastê hin eskerên museleh bûn di şerek sivik de xwe sipartin me, me nêrî li xanîkî ronahî heye û deng lê té, em hilkişîya jor ku qedere (40) eskerî di hundurde li dor tifika agir ronîştî û nan li tifikê didin, tufengê wan tevde sipartîyê diwarin, liber ronahiya agir em ne dîtî ji nişkeve me tufeng xistin sigên wan û tufeng berhev kirin, yekê jiwana got: bibin emjî jiwana xilasbin, liwana herdû ciyan (165) esker û tufeng ketine dest me hinek bîna me fire bû,

Dunya bû sibeh em ketin kuçe û kolanên bajar me tevaya wan (12) hezar eskerên wê firoê berhev kirin, çente-ên wan

1. gastîna (sahe).

ji talana ba jar dagirtîbûn, hûr û mûr xîşir heya de çente-ên hinan de firaxên sifirjî hebûn, tevde li xanîkî dihatin valakirin û nobet liber heya ku muhacir vegerin her kes malên xwe nas bikin, me herdû mizgeftt xanîyé mustefa beg jiwan esîran da girtin, jiwê firqé tené (36) revî bûn çûbûn roj avayé bajér gundé (muqrî) sibehe gundîyan ewjî dîl girtî anîne (héné), bela dinav şeş saetande fireq biwé giranî û piranî ya xweve dîl ketin dest (450) şoresgîran, eger ne cengawirî kurd be nayé bawirkirin ku çarsed an bécised peya firqekî eskeré nizamî dil bigrin, ew muhacirén bajér weke lehîyé ji newal çiya û nav daristan dikişîyane bajér, me beré dibirin ber wî wanîyé ên mala xwe nasdikirin dibirin, wan muhacirán li me dinêrîn dikenîyan û digotin: we ew fortén xwe-én do tevde bicî anîn her bijîn mér xasén me, jé û péve dused nefer me bevir û bér dane destén wan da ku ji kuştîyén xwere xendeqan bikolin jibo veşartina wan,

Piştî nêvro (şéx seid) bi qumîta cengdarîve hate (héné) li xanîyé (hemdîn beg) peya bûn, piştî pîrskirina rewiş û buyerén şeré şeya çû, bé kuştî û birîndarén me çine? paşé hingé got: ka qumandanén turk likune? me got: di nav eskerén xwede girtîne-got: ev ne durust û neji xesaisé meye, ku nefer û qumandanán bihevre bixin ciyek, herkes ligor merkeza wan jiwandre huqûqé dilî heye, divé hûn ji milaziman û berjor ji nav esker derxin û divé em bi hin qumandanán re bipeyivin paşé emré jér da û got:

1. tevaya çekén cengdarî çi sivîk û çi giran, tevî çadir, zexîre, cebxane, histitén topan û bar kilgir, tevan ber hev

kin bixin xanîkî û payîn liberbe,

2. ciyé esîran divé fireh û serbestiyé bidin wan û jiwanre dilovanbin ku yek ji xesaîsé kurd de,

3. bi awakî tekuz divé dewriye-én me lidor bajér nemaze réya (diyarbekir) bixin bin sîdarîya xwe,

4. xuwarin péjén esker jinwanre béjin ji zexîre-én xwe jixwewe xuwariné çékin, hûnjî ji zexîre-én wan jixwewe xuwariné çékin,

5. mizgeft an xanîkî bikin nexweşxane û bila duktorén wan birîndar én xwe û meji derman bikin,

6. tevaya dermanén nxeweşan û derzîyén wan bixin destxwe tiştén ku jinwanre lazim bûn bidin wan,

Paşé jîwan qumandanan general û çend alahî û tabûr qumandanén turk anîn ba (şêx seîd) xatiré wan girt û got: té bibuhurin ku şeva dî şoreşgîrén me ligor merkeza we ihtîrama we negirtine, em heqqé we ligor xasaîsé xwe divé nasbikin, ne weke we hûn me digrin dikujin tevî ku hukumet xwe qanûnin!

Piştî nîvro gewriya ser réka (diyarbekir), du siwarîyén turk, bi wanre anîn me jîwan fre got: bé tirs rast béjin hûn ji kuve tén? wan got: em alahî siwarî dumdarén vé firqéne ji (diyarbekir) tén, alahî qumandan em şandin bé vi firqe qumandanî da ku em béne bajér an li der bimînin, heşt kilometir em li basûr li nav çiya û daristanén (goma saleh) sekinîne, me taviil (şêx û qumîte) xeberdar kir, hingé bi awayé jér em dane saz kirin:

Di bin fermana (emeré faro sereké eşîra botîyan û bîn-

başiyé milişya) de em (500) kes ber bi wé alahiya siwariyén turk ve çûn, wan li (goma saleh) ew zinarén bi daristan girti-bûn, jibaşûrve mitralyoz lime girédan, me xwe da çemé (gaban) û em daketin dinav wan dar û devîyande em ji dûrve ew pêçan, heya ku bû évar me kevir û devî jivan didi-zîn hew dîtin em ketin nav çeparén wan, édî di dest wande nizama eskerî nema cengawirî û mérxasiyé péve li hember kurd jiwére jî ne pékar bûn, herçendî dest bi qumbere-én destan kirinjî lé dişerek nav sé saetande teslîm bûn, hinén jivan di nav daran de én xwe veşartibûn jî, me eskerén wan derxistin ser zinarén bilind û bi turkî gazî wan dikirin û digotin: alahî qumandan (cemîl beg) (1) dibéje werin hawîdor liwe hatiye pêçandin berî ku hûn béne kuştin werin ba me, biwé gazî kiriné her hinek bi hevve jî nav daristanan der diketin û dihatin, me tevde li erdé rast kom kirin, ciyé me agir dadan em lidoré heya bû sibeh, berê wanjî da (héné) ba wé firqa dîl girtî me leşker xistan navwan sîleh û cebxane siparte qumîta cengdar û (cemîl begé bi simbél) û çend zibat pére me birin ba qumîta cengé û (şéx seîd efendî).

Dema ketin hundur û dîtina ku (generalé wan) ronîştîye, jére patekî eskerî lédan, general got: ew resmîyat nemane herin ziyareta (şéx seîd), ber bi şéxve çûn (şéx) desté wan girt hejand û got: fermo ronîn, liser çokan ronîştin, şéx (got: xeş ronin libamin beré û nuho ew îtaeta şéxan nîne nahélîm

1. li sûrî min behsa wî (cemîl begî) kir, (qedrî beg cemîl paşa) got: ez wî-cemîl begî-xweş nas dikim. kurd hûr.

ku zarûkek li ba min liser çokan ronîn çewa dest maçî kirin yekcare nîne û nebûye, lê eger hûn ji general é xwere wé ihtîramé digrin ew tiştekek diye, general ji wan re got: kurên min rahatîya xwe bigrin gotina şêx efendî ye, paşê hingê (şêx) ji jêre got: (cemîl beg) gohên me li tebûn te do ji esrek heyanî eşakî te şerek dijwar kir, te bawer dikir ku tuyê karibî jiwê çenbera wan cengawirên kurd tu xwe rizgar bikî? wî bersif da û got: şêx efendî wacibatên eskerî bûn, biwê bersifê şêx lê vegerand û got:


- we ji-fas cezair, libiya hicaz û misir-jiber- ingiliz û firansa -pişt pehin kir, tevaya eyaletên welatên -ereb- we berdand û revîyan li van sînorên dezgedariyên îro sekinîn, ev wacibatên eskerî ne hatin bîra we, lê li hember kurdên di welatê xwede azadixwaz hatiye bîra we? ev cengawirên kurd bûn ku binavê islamî bi zendên xwe ji derîyê (viyena heya misir) jiwere impîratorî dane çêkirin ne van memed cikên turk, tevaya wan serê xwe bera berxwe dan deng jîwan nehat, (şêx) biser xist û got:

Her wekî seîdî şîrazî gotîye: -nejadê kurd ji diyaxwe pola hatîye zaîn, kesê bixwanze bi pola bilize wê dest û tiliyên wî bişkîn- roja dîtir tevaya wan leşkerên dîl girtî şandin (cebeqçûr dara yenî) (200) kilometir bakurê enîye (diyarbekir) ba wela û serkarên kurd ên şoreşê ew danîbûn, çewa ku li tevaya wilayet û qeza ên ku ketibûne bin sîdariya şoreşê serkar û karmende ji kurd bûn, bi wanre em (350) siwarî çûn, ligor fermayîşa (şêx seîd) tevaya zibatan me siwar birin, piştî em ji (hênê) derketin me jîwanre got: jîwe

kî nexweş an biçî û çî lazimîyên we hebin jimere bêjin em bi her daxwazên weve brpirsiyarin, ligor xesaîsên xwe-ên qewmî ne ên turk, ku hûn ne tenê esîran lê birîndar nexweş, jin zaruk kal û pîran biser hevde dikujin, belê biwê dilovanîyê piştî sé rojan me ew giyandin (wilayeta dara yenî) sipartin (walîyê xwe hesen fehî), herçî zibat li bajêr dihêştin, her rojê mecdîyek zîv didane wan, lê esker li nav gund û eşîran didane belakirin.

PÊÇANDIN Û ÇÛNA SER DIYARBEKIR:

Piştî hingê tu leşker ber bi enîyên şerve nehatin, lewre-firqa li (sérté) mala eliyê yûnis qewmê çiya enîyek nû li berwen vegirtibûn, çewa ku lipêşîya wan enîya (silîvan) bi fermanda (şéx şemsedîn) hebûn, firqa (xarpét) çewa hate gotin, şoreşgîrên (lîwa şéx şerîf) ew ji hev bela kiribûn, tenê tabûrek jiwan ber bi (paxir maden) ve hatibûn, ewjî bira-é (şéx seîd şéx evdurehîm) ew dil girtibûn, çewa qolordûya (erzerum a general kazim) ji dest péka şoreşêve ji ciyê xwe ne livîya bûn, jiber ku ne hevalé (mustefa kemal) bûn, lewre (şéx seîd) ji (kele xinûs) qeza erzerum daketibûn pék anîna şoreşê, ku navbra-diyarbekir û erzerum zéde î (600) kilometir hebûn, çewa ku liyor hate naskirin ku leşkerên qol orduya (diyarbekir) tevde dil ketibûn, firqekî li (xarpét) firqekî li (héné), firqa (sérté) jî di enîya (qewmê çiya û yaqûb axa yé eroh) de mebûn pêçandin, ên li-diyarbekir- mayî herçar derîyên bedenê lixwe girtibûn û leşker diwan çeperên ser



Bedenê Keleha Amedê.



Yek ji enbarên bedenê (Amed).

enbarén bedené lixwe girtibûn û leşker diwan çeperén ser enbarén bedené enî girtibûn, qolorduya nehan jî héj nehati-bûn qadén şer. (1),

Piştî wé pergende pergende bûna leşker ji qumîta merkeziya şoreşê re bû daxwaz ku diyarbakir begirin, hingé di başûrde wé bigîjin sînorek diwêlî yanî sûrî ku hingé -firansalé mandater bûn, wé (dewleta kurd) bidin îlan kirin, biwé daxwazé bi hézdarîyek giran em ji çîyan daketin dor (bajaré amed), ku hawîdor deştekan rasté, di rojhelaté bajar de (royé dicle) derbaz dibe, di bilindahîya roj ava de bajar di nav bedenek weke (seda çîné) de pêçandî ji çar derîyan péve ré nare hundur, jiber topén ser keleha hundiré ku bi hevve enda xet dikirin, me deh kilomitir dûr bajar da pêçandin, liwir du enî hatin vekirin her wekî:

1. enîya roj avayé -dicle- dibin fermanariya (emeré faro) û hin qumandanén weke wî de (10) hezar şoreşgîr hebûn,
2. li enîya roj helaté (dicle) zéde î (10) hezar şoreşgîr bin fermana (heqî begé licî) û hin qumandanén dîtir de şoreşgîr hebûn, nézîgê (40) rojî ew bajar welé ma pêçandî, jiber wan (50) topén ser kelehé kesek nikaribûn birojî nézîgê li bajar bike, çewa ku kesek nikaribûn ji-diyarbakir-jî biderkeve, lé nizanîm çima hingé em daneketin (mardîn û ruha)? da ku em bigîne dewletek wek firansa belkî pére peymanek kirîna sîleh çekirana û réya (tirénê) jî diketin bin sîdariya

1. nehata leşkerén turk di perlimana wande partiya (fehî uqyar û cumhûriyet pé biryar ne didan, heya ku liwan inqilab çekirin héj bi awakî sefer ber leşker anîne eniyén şer.

me, turk nikaribûn diwé xeté tiréné de wé qol orduya nehan bigîne enîya diyarbekir, bé ku wé berevaniya cengdarî û siyasî bînin bîra xwe, tené jimere girtina diyarbekir bûbûn daxwazek yekemîn, di qumîta merkezîde hinan gotin: diyarbekir jiber ku bedene dijwar té girtin, (umer kuré as) ew çend lidoré ma nikaribûn vegire, hingé (emeré faro): ew - umer kuré as bûn- lé ez jî (umer kuré faro) me, heya destê xwe liserê wanleşkeran vir negerîni em debazî derek dî nabin, em derin ba begén (hezro, siwérek) dibéjin: heyani ku hûn (diyarbekir) ve negirin em nakevin şer,

Di évara /8é adarê 1925/ de her dû eniyén rojhelat û rojavayé Dicle- bihevre bé fenek siyasî û eskerî firqa meya hendesî di bedenê de hin réyan bide vekirin em kişiyane dor bedenê, ku ew êrişa me bi şev sa'et heft bûn, lewre ji ber wan topén ser kelehé bi roj em nikaribûn nézîgê bajêr bibin, di dest me de heft topén wé firqa (héné) hebûn, me xwest ku biwan topén xwe di ser bedenê bajêr re gulebaranbikin, ew jî (şex seîd) nehişt û got: ma em di bajêr de jin û zaruken xwe bikujin, her wekî agahe ava vexwarin bajêr ji derve derbazî hundirê bedenê dibe, me xwest ku avé ji ser bajêr bibirin da ku xwe teslim bikin, disa (şex seîd) qebûl nekir,

Herçar deriyén bedenê jî girtî hawîdor çeperén ser bendenê jî tije leşker bûn, ji tufeng û mitralyozan péve dema em nézîgê bendenê an deriyan dibûn jor de qumbere li me dibarandin, em li deré çiya bûn, bi tu awayî me ré nedî ku em bikevin bajêr, ciyê ku me çeper lé girtî tevde kevirin reş

(1) liber gule-én topan parçe-én keviran zéde dijwari digiyandin me birîndaç û kuştî ji me çé dibûn, jibo xuya kirina me bi dehan ronavéj davétin, jiber wé çendé me nizîgî li bedené kir em giyane nav goristanan da ku bikevin bin gule-én topan. di wé nézîgiyé de şer zéde gerim bû, lé mexabin bé amanc bé ku kesek ji me xuya be, çewa ku wan ji bé amanc li dengén tufengén me ber didan, tené me bera çeperén ser bedené û ronahiya agiré devé topan didan, em li pişt kevirén mezeran li erdé ramedanî û baranek hûr jî dibariyan, sofîyek li pénan di nav wan gulehên wek barané de digeriyan, hate raser me jî sekini û got: geli biran gulle-én xwe bera bedené medin, bera birûskén devé topan bidin, ew li pénan her wekî ew gule liba wî kelmés bûn ew pé ne dihatin kuştin, di zimané kurdî de çewa ku pîrsa xort ji xurtî hatiye, belé xortanî çewa ku bi her awayî hézdare wiha renge dil germe jî, li nav wan mezelan dibin baran û sermayé de gule jî weke baran dibariyan weke wan jî gule ez di xew ve çûbûm, kuré xaltîka min (huseyné babéxî) gazî min kir û got: mala te xira nebe tu di nav van gulan de razayî.

Ji me hézén (deré çiya) péve li herçar deriyan şer bûn, li (deré-mardîn) alahîyek siwariyén Turk ji réya (mardîn) ve dihatin diçûne hundur, berî bigîne deriyé bedené li (xana qereçiyân) derbaz bûn ketin nav bera şoreşgîran û leşkerén xwe, her çiqas gazî dikirin digotin: onikincî alahî-yanî alahiya danzidan, lé leşkerén wan bawer nekirin ku leşkeré

1. ji (siwérek) heya (amed) tevde kevirén bikani yani-agirveşani- heya keviya (dicle) liwir yek tené li rojhelaté Dicle tunin.

wane, wan ji pêşve û şoreşgîran ji para heya tevde hatin kuştin,

Hézén deré (ruhayé), çewa hate gotin ji çar deriyén bedené péve ré nediçûne hundiré bajaré (amed) lê jibona ku hin kesén bazirganî dema malé xwe derbazî hundur bikin bac-gumriké nedi hukümeté di deverande di bedené de qul dabûne vekirin, lé herbé de ew qul girtibûn, wan hézén wir qulek ji wan vekirinbûn (61) peya ketibûn hundir û ji wané wir re gotibûn: xeber bidin hevalan bila li pé me bikevine hundir, lé mexabin jiber ku nizan nebûn, xeber nedabûn hevalan, şev nivî bû me dengé şerek giran di hundiré bajér de bihîst, lé guman kir ku kurdén hundiré bajér bi şoreşé ve ra bûne, lé di zemanek ne dirêj de me dît şer vemirî, ji eşîra (Emeré faro) Elo xîç-hate bame berî ku béje ez jî di nav wî şerî de û çi hate seré me got: ew tufengén me évaré digot: ev çi tufengén? evbûn ha, me got: te ji ku anî wî got ma ne ez jî di nav wî şeré hundur de bûn em dido tené jé filitîn én dîtir tevde sehîd ketin û bi awayé jér da zanîn û got:

Me li binya deriyé Ruhayé qulek bedené vekir em bi serekiya şehîde bilind (mihé helé) (1) em ketin mehla Elî paşa, li pelkonén xaniyan pîrekan ji me re dilîlandin, mela én muzgefta mehelé derket pêşîya me şeş agaira xwe berda heya cercûr vala kir û hilkişîya ser minaré wé nivê şevé jibo

1. (Mihé helé) ji zaz ji eşîra (Emeré faro) bûn, ji qehremaniyé péve peyaki zéde girs beden ten bûn, min carek kefa desté wî pîva bihustek min bûn, du tufeng du rext jî bi wan ve bi destek bi devé herdû tufenga digirtin ji erdê ra dikirin, ew çend meruvek bi quwetbû.

serfiraziya şoreşé bang da (2), em ji wir çûne deré mardîn ji pişt wan ve me tufeng xistin pişt wan topçîyan me ew topçî yén wé beteriye tevde kuştin, em di çarşîya mezin de ber bi bakur ve giyane (senaf), ji nişkeye em ketin devé derî herdû payîndar ji dest hilanîn ketin, me tufengén wan ji wan girtin û em ketin hewşé, di ode én jorde esker li xwe xurcilîn, me reşek tufeng di şibakan re berd wan da û got: teslîm bibin an na em yeké tené ji we nahêlin, tevde daketin me ew jî ji sîleh xistin, tevde kirin odekî derî li wan dada û payîna xwe ber wan û em çûne ser qerqeshûn camiyé ku enbara sîleh bûn, li wir piştî payîndar û zabitek hate kuştin ew jî teslîm bûn, me ew jî xistin hundir me payîn da ber wan jî (mihé helé) ji me re got: gelî biran xuyaye kesek lipé me nekete bajér, niho divé em herin hepisxana mezin tevaya girtiyan berdén û bînin wé enbara sîleh, wan sîleh bikin û bi xwe re bigrin ser merkezén eskerî ku jé û péve ji me re ré nîne lé bi vé rézané em bajér vegirin.

Lé sed mexabin, berî ku em bigîne heposxané li biniya kaniya (şéran) alahîya jandirman- liwir li pişt kîsén axé sîper girtibûn, her çendî me şerkir lé bi tu awayî me ew ji wan çepran ra nekirin, dîsa em bi şûn de vegeyriyan texte qela, ji wir me beré xwe da derîye çîya ku ji we re bidin vekirin, em giyane ba (xana hesan paşa) me dît ku ji deré çîya ve wek lehî dagirtî û ber bi me ve tén, me bawerkir ku we derî vekirîye û hatin, ji ber ku elekterîk nebûn ku em negiyan e ber

2. ew mela é ku li mehla Elî paşa wé şevé azan xwend wé sibehé leşkerén turk ew bi singûyan kuştin,

hev me hev nas nekir, dema em giyane ber hev me dît ku eskerin wan jî dîtin ku em şoreşgîrin, me herdû aliyan tufing xistin zikên hev heyani em herdû tenê xilasbûn ew hêj dihatin, ev tufing jî min ji ser laşê wan anî û em herdû tenê xilasbûn, di hewşa mizgefta mezin û -enzelê- re dîsa daketin di wê qula ketî de em derketin,

Hukumeta kemalistî weke xesaisê xwe é-mengolî- dukanên bajêr ve kirin talan kirin û dane bela kirin ku (eskerên şex seîd) dukan talan kirine, tevî ku li erdê zêr liber wan rijandibûna nikaribûn di wî şer é welê dest bi dest da rahêjin (1).

Êdî dunya li me bû sibeh divabûn em ji dor bajêr jiber hingaftin a gule-ên topan dûrkevin, belê bé ku di şerê wê şevê de em havilek bi dest xin em dîsa vegehiyane ciyên jê çûyî, lê bajar weke berê ma pêçandî heya ku ji andolê qiolorduya nehan hat.

ENÎYA ME'ADEN Û ERXENÎ

çewa ku li jor hate gotin: femande-é vé bira-é (şex seîd-

1. Di/1928/ de ku ji hepisxana anedolê vegiriyam, li-diyarbekir-Eşref beg yedî bela) li mala xwe ji min re got: wê sibehê delal dan gazi kirin ku kesek dermekevin, em sê roj di malên, xwe de man girti, paşê gotin werin ber-xana hesen paşa- em çûn wan laşên xwe tevde rakiri bûn ew (59) laşên me li erdê heryek topek caw hin qalibên sabûn û hin şekir xistibûn berika wan, me ji hev re got: ev kerin an me nezan dibinin, sê şeve ku her baran dibare, çekên wan tevde bûne av, lê ew topên caw ên xistine ber rextêwan pişkek baran li wan nehati, sabûn hêj kaxizê serwan şil nebûye, şekir li erdê zihaye, ma wan eqil oivê direwa xwe ne giyandin?

şéx Evdurehîm) bûn, ji wé payderiya şéxîti û biratiya (şéx seîd) zédetir bi desté xwe cengawir û qehremanek tek bûn, çewa ku li hin deveran hevaltîyek min pére hebûye, ew mér-xasiya di wî de min dît kém dihatin dîtin, di wé enîya gotî de wî jî (pîran, Egil, Erxanî û Me'aden) vegirtin, di rojava de xwe giyande rix hézén enîya-diyarbakir- çewa ku li-pira biné bedenê- tabûrek leşkerén turk peyayén hindik ji kuş-tîyan péve dîl kirin,

ENÎYA SILÎVAN -FARQÎN

Li jor hate zanîn ku ferman-dé wé enîyé (şéx şemsedîn) bûn, lé li, wé enîyé leşker tunebûn, jiber ku leşkerén -diyarbakir- péçandî bûn, firqa diduyan a ku li (sérté) qewmé çiyé mala Elîyé yûnis - berge- li wan a girtibûn, tené (qeza farqîn) de hukumé Turk bi é kurd guhartin, nehy a (sînan) vegirtin, cengawirek (boşatî) binavé (hesoyé faté) li (farqîn) (sadiq beg) kuşt, ku di/1919/ de- mustefa kemal-ew û -sereké eşîra penc nar-cemîlé çeto) herdû kiribûn bira-én xwe.

ENÎYA XERZAN ÇIYAYÊ MELATO:

Ev enî bé şewirdariyek (sazmana erzerum û şéx seîd) ligor armanc û hirsé xwe-é qewmî dema bihîstin ku bi doza mafé kurd ve şoreşek li hember turk rabûye hingé wan jî xwe amade û ber pirsîyar dîtin, di destpéké de (Hezo) vegirtin, ji



Ebdirehman axa (qewmê çiyê).

wir çûne ser (qeza xerzan) ku wé jî vegirin (cemîlé çeto) é ligor gotî jibona payîna hukumeta Truk kurek xwe şadibûne (xezan), wan nehişt ku vegirin, jiber ku di nav wan de mer- vatîya jinan hebûn (fermandaré qewmé çiyé-evdurehman axa) ne xwest ku ew û (pencinarî) bikevin şeré hev.

ENÎYA CIZÎRA BOTAN:

Ev enî jî weke çiyayé meleto bi armancek qewmî ve bi (fermanderîya yaqûp axayé eroh- û cengawirén (dêrşewî) yan ve û di nav wan de (şehîdé gewre şéx evdurehmané Garisî) hebûn, cemîlé çeto-kurek xwe jî jibona parazatina hukumeta Turk bi hin peyan ve şandibûn (serté) çewa ku serek é eşîra (jîliyan- resûlé mehemed) jî weke cemîlé çeto destegîré hukumeta Turk bûn, nehéştin ku wilayeta sérté vegirin, çewa ku dawî ew sereké (eşîra jîliyan resûl axa û cemîlé ceto) (1) bûn çete di rex leşkerén Turk de ketin enîyan şeré şoreşé,

Di wan heşt enîyén jor gotî de tevaya wargehén hukumeta Turk çi leşkerî çi milkî ji welat dabûne rakirin, diwî zemané kin de cara pêşîn bûn ku kurd ji bin wé perda reş sitem-

1. Tevî wé xiyaneta mezin di/1925/ de cemîlé çeto bira-é kemal-li diyarbekir idam kirin, çar kurén wî ji panzide sal hukum bi min re li hepîsxana (nigde) jinén wan karên Turkan û zarukén wan pars dikirin, di/1928/ de ku bi efû em vegeerîyan welat (herçar kurén cemil) di mala wan de girtin birin li (géliyê télan) kuştin.

ew sereké (eşîra jîliyan Resûl bira û meruvén) xwe ve dawî ji ber Turkén dosté xwe reviya derbazî (suri) bû li wir mir,

karîya Turk derketibûn, bi her awayî xweser bûn, tevî ku li her aliyî şer bûn jî, ew hawîrên ji Turk réjkirî di firehî û dirêjahîyek jêr de bûn her wekî: ji (diyarbekir-heya-vatro (550) kilometir, ji (cizîra Botan-heya-xarpêt) (700) kilometir Turk jê hatibûne réjkirin, di zemanek kin de!....

HATINA QOLORDUYA NEHAN JI ANEDOLA HEŞTAN JI ERZERUM

çewa ku li jor hatiye zanîn ku di/28 ŞUBAT 1925/ de (mustefa kemal bi desteka xwe ya (generalan ve di hundurê perlîmandê inqîlab li wîzaretê (fethî uqyar) çêkir, tevde girtin xistin zindanê û ber mehkema eskerî,

Di/7 adar 1925/ de ji bo şerê şoreşê bi seferber biryar dan ji qolordiya nehan pêve pêderpê leşker kişandin qadên şer, bi wî hereketê eskerî binavê (istiqlal mehkemsî yek li-diyar-bekir- û yek li (anqerê) dane vekirin, da ku li hember xwe partî û siyasiyên Turk bide réj kirin, çewa ku di jêrekiyên rûpelên (252) de hatiya zanîn ku serek wezîr (fethî uqyar) û pîraniya perlîmanê biryar nedan ku wî leşkerên pîr bikşînin qadên şer.

Pîştî wê inqîlaba perlîmanî jibona ku di xetê tirêna toros re leşker bînin qada diyarbekir, bi firansa re ketin civînan, jiber ku di /20 tîşrin ewel de-1921/ de ku firansa di navbera Turk.û sûrî de sînorek dewletek nû danîn, diwê pirotkolê de herdû dewletan biryar dan ku di xetê toros de firensa û Turk nikarin diwê tirênê de leşker derbaz bikin, çewa ku di/24

temûzé 1923/de di peyman a lozan de dîsa ew bend hatibûn imza kirin, lê Turk bi dayîna hin imtiyazan -firansa- bi arek diwêlî û tarîxî pé liwé pirotkolé kir di tiréna xetê toros de ré da Turk, qolorduya nehan bi fermenda (general nacî) (36) hezr li istasyûna mardîn peya kirin, jiber ku di wî zemanî de jiwé xetê péve li tevaya Turkiye xetek dî é tiréné nebûn, di /1927/ de héj xetek giyandin (qeysêrî).

Ew qolorduya nehan a gotî ji (mardîn) heya (diyarbekir (95) kilometir de bi peyatî ber bi (diyarbekir ve dihatin, li (şukrlî) ketin enîya şeré me, ji wé qolorduya péve li her bajarén anedolé li gastiñén bajarán li def û zurne didan, dema xelk lé kom dibûn ew digirtin û dişandin enîya şeré soreşé, ew bés péderpé dihatin tevde biçek én xwe-én malé dil di ketin dest me, me ji wan dipirsî çima hûn biçekén evîlin? mesela def û zurné ji me re digotin, niho heya ku mektûbên me nerin meruv û malén me nizanin ku çi bime hatiye, jiber wé çendé em héj bi çekén xwe ne, ji milé dî ji me re dibéjin: şexek yezîdîyan rabûye dixwaze dîné islamé rake, ev herbek muqedese,

Belé di/26 adar 1925/ de ew qolordûya nehan a (general nacî) li heremé (şukrlî) kete enîya şeré me, çewa ku di wé hindavé de ji (erzerum) jî qolorduya heştan bi fermenda (mûsa kazim paşa) ew jî ber bi başûr ve daketin enîya (varto) di wî zemanî de çi çekén cengdariyén giran û sivik di dest Turk de wek herbek diwêlî daketibûn şeré me, liwé enîya diyarbekir li pişt esker pénc beteriyan topan bihevte end a xet dikirin di ser esker re li pêşîya wan ré vedikirin,

çewa ku di ser wan re jî firindan pêşîya esker yanî çeperên me bumbaran dikin, tevî wê giraniya leşker û sîleh û erdê rast, diwî (15) kilometirî de ku berê wan li diyarbekir bûn, me bi sé cîyan ew giranî ji hev qut kirin, di wê qet kirinê de ew zêde dihatin kuştin, ji ber ku em li erdê enî girtî û ew dihatin ber guleyên me, lê top qumbera-ên findan dijwarî digiyandin me jî, lê ji ber ku li hember wan sîlehên giran di dest me de tenê tufeng bûn, jiber wê çendê her çiqas ji wan hatin kuştin ji lê me nikaribû pêşîya wê lehîya mezin bigrin derbazî hundurê bendenê bûn, nêzîgî deh rojan ew jî weke qolorduyan heftan tède mane pêçandî, çewa ku bi şev jibona li pira ser Dicle derbaz nebin, (50) siwariyên me li pirê payîn dikirin, lê mexabin lihember wê seferbera Turk me jî hin tevdîrên nû negirtin, an ew eniyên erdê rast bi gêlî û gedûgên çîyan ne guhartin, weke li hawîdorên diyarbekir sekinîn, çewa ku li enîya xarpêt jî welê, tenê civatek ji hin ronakan şandin (dêrsim ba seyîd riza) daku ew jî bi şoreşê ve rabin û réya (séwas û melatî) liber hatina leşkerê anedolê bigrin, lê mexabin wê civatê bi tu awayî (seyîd riza) qanî nekirin, her wekî ji kurd cuda û roj lipêşîya wî jî nîne, lê dema (şêx seîd) bi (48) azayên qumîta merkezî ve di şevê de li (diyarbekir) bi darvekirin, hingê (seîd riza) bi heyetek ve çûne (diyarbekir) ew faşistîya Turk pîroz kirin,

DI RIX TURK DE ÇETE ÊN XAYINÊN KURD:

Li wilayeta-sértê- serekê eşîra pencinar (cemilê çeto) serekê eşîra jîlîyan (resûlê mehemed), serekê eşîra reman

(Eminé perixané) li wilayeta-mardîn- sereké eşira surgêçi xwedî diplomek (şiwésrî kamil beg ewênî), li heremé (palo) sereké eşira oxé (necib axa), li heremé géxî (eşîrén xiromek) ku vana tevde eşîrén mezinbûn, li (qeza pîran seîdé mela mustefa) li qeza (licé) ji pégirtiyén (şéx selim) mehmed keyayé kerwesî, vana jî bi xiyaneta welat navén xwe li tarîxa kurd de bi bedkari û şermezari qeyid kirin, ev xayîné çepel û dijûn jî qolordûyek hebûn, çewa ku beré jî di şoresé de nebûna pardar, her li benda wé xiyaneté bûn, (şéx seîd) esîran wan berdidan û ji mezinén wan re mektûb dinvîsîn û digotin: mane ev karé we bûn ez péve rabûme ji we re ne şerim û are ku kalé weke min rahéje tufengé hûn jî rahéjin tufené dijmin

JI WAN ÇETAN PÊVE SÊ QOLORDÛ DI MEYDANA ŞER DE:

ENÎYA DIYARBEKIR

di gumana me de ku ew qolordû jî weke qolordûya heftan emé di hunduré bedena (diyarbekir) de pêçandî bihélin, çewa ku pêçandî ma, çewa ku agahe (royé dicle) li roj helaté bedené di nizmaniyek (700) mitir de ber bi başûr ve derbaz dibe, ew nizmaniya kûr ji me nepenî bûn, di wir de qayikén ser avé bi hev ve zincîr kirin û ser wan jî text li herdû peravan bi singén hesin én mezin ve girédan kirin pir û di serre derbaz bû gundé (til elo), di wî gundî de xelkén (licé) bûn, dibin perda tarîya şevé de ji nişke ve ew qolor-

duya nehan kete gund, her çendî wê hindikîyê biwê piranîyê re şer kirin, lê gund herdan, çewa kû agahe kurd bi silêh ve tê kuştin lê tucar dil nakeve çewa ku neketiye ji hingê em li bakurê (amed-diyarbakir) rojavayê (dicle) bûn, poste sibehê giya me û da zanîn kû ew qolordû ji wê pêçandinê derket giyaye (til elo), bê ku em zanibin pir û hindik çiqas ji wê çenbera bajêr derketine, ji (tilxom) em qedere (300) peyayî bi kelekên ser avê em derbazî rojhelatê (Dicle) dûrê gund li nizmaniya (çemê hewrali) enî girt û bi dûrebînan me leşker terasut dikirin, leşkerên Turk dest pê kiribûn ji biniya gir heya serê gir çeperên şer lipê hev wek kemeran ligir dizivirandin li serê gir heteriyek top bi hev re endaxet dikirin em kiribûn amanc lê devera em lê nizim gule di ser mera derbaz dibûn, ji milê dî hawîdorme şov û herî bûn gule-ên topan lê diketin ne di teqîyan, jiber wî qasî dest bi şerepnalan kirin, yanî ew gule-ên ku digiyane semtame û li hewa diteqîyan parçe li me dibarandin, em li benda tariya şevê bûn.

ji bona îrişa évarê pêderpê şoreşgir dihatin digiyane me, jiber ku her û her îrişên me di tariya şevê de dest pê dikirin, piştî ku ew şoreşgir bisê biran lêkve bûn héj me navê şevê (ELO) danî, em û gundên dorme lidor (150) peya serekê me wê şevê (şehîdê héja- mihê deyab) bû em ji rojhelat ve bê deng diçûne gund, ango wê licî bi serekîya xayîn (xalibê fato) ve wê ji bakur ve bihatana, xelkên hênê wê ji rojava ve bihatana, em giyane ser benderên gund, yekê tirosk ji licê binavê (heso) her li pêşîya me dere û tê dibêje: ma

hûné herin nav esker me pêre dixeyidîn û digotin, tu çi dimrî ma ev giş ne wek te ne? ji tirsî ku em merin gund wî nakesî tufeng teqand, ew eskerên ku ji évar di ji tirsên tiliyên wan liser ligên tufengên wan, bi nev re em gule barankirin, taladekî tune em tevde li nav rasté di dest péka pêşin de heft şehîd ji me ketin, me dît ku em li wir xwe bavéjin erdê jî dîsa jî yek tené ji me namîne, me bi nava tufengên xwe girt û bi bez ber bi wan me xwe giyande nav xaniyan, ji wir di talda xaniyan de me xwe giyan de quntara gir, li gund kesek nebûn tevde muhacir bûbûn, em sed mitir ketibûn ber çeperên wan, ji wir me dît ku herdû qolên liciyan û héneyan nehatin, me binavé (elo) gazî dikirin da ku zanibin me gund ji esker girtî belkî bèn, me nizanibûn ku bişûn de vegeziyane nehatine.

Di wî şerê giran û hindikîya me de, esker nizanin ku em hindikin wê hawîdor em bipêçana yek jî ji me rizgar ne dibûn, çewa ku me jî nizanibûn leşkerê qolorduyê em pêre ketine şer, ji wan para her ronavêj lipê hev tén avétin, em ji hev re dibéjin: lédin lédin waye direvin, mebêj ku péde tén, lé em héj jî bawer dikin ku emé hercar wan ji dest hilanîné bixin, çiqas şev dere şer meztir dibe, édî şev giyabûn nîvî, medî ji navsera gir ji nav çeperên esker bi kur-mancî nav dixwedan û gotin: werin ma hûn liber Turkan sekinîne?

Me ji hev re got: livé fedîkarîyê ku ji évarde em divê hitona agir dene, vaye hevalên me hatin û ew ji sileh jî xistin, çewa li tevaya çepê dengê tufingên wan jî bihev re

sekinîn, em ji cî rabûn û me bihérs diréjî ser istihkamén wan kir, beré pîlan hazir kiribûn, dema em giyane ser çeperén wan dest bi narincokén-qumbere-én destan kirin hingé me zanî ewén bi kurmancî nav dixwedan çete-én surgéçî én (kamil begé ewéni) (41) bûn, belé diwé irişé de jî me neh şehîd danîn ku di nav wan de (sereké me mihé deyab) bûn, em bi şûn de vegeŕiyan bin dîwar é herdû xaniyén kevokan, belé me di wir de (16) şehîd danîn û heft birîndarén me jî bi me re ne lé şer saet ji a beré girantir dibûn, édî sipeydeya sibé li rojhelat sitûn vegirt, me ji hevŕe got: divé em enîya şer berdîn û dûrkevin da ku ji armanca topan bidûrkevin, em di rézîngén çeperén wan alî bakur de bi şûn de vegeŕiyan, em giyane seré newala gundé (şerabi) dunya lime rohnî bû héj di amanca topan de bûn, ji wir em giyane gundé (Qadiyan) ku merkezék me li wir bûn, (7) kilometir bakuré ciyé şer bûn, ji me pirsîn me ji wan re buyer da zanîn, çewa ku nehatina herdû qolén gotî jî ew pé agahdar kirin, birîndar bi me re lé me navén şehîdan wan, bi me re fişek nemane birçî û bê xew, em di wan danezanan de jî (diyarbekir) firendekî zéde bilind hate ser me û vegeŕiya çû li wî gundé me şer lêkir liba esker danî û bi wan dazannîn ku li gundé pêşiya we leşkeré şéx seîd hindikin, me bi

1. ew kamilé ku ji (siwésre) pére diplom hebûn, da ku bi wé xwedina bilind ji mileté xwe re xizmetek bike, lé mexabin dirix dijmin de mileté xwe dikuştin û namûsa wan didan binlingan dijmin, tevî ku çend car me çe teyén wî digirtin (şéx seîd) ew berdidan û jêre mektub ji dinivîsin da ku namûs bikeve bévila wi lé bé fédebû,

dûrebînan li wan nérewanî dikirin, me dît ku leşkerek pir nesor û ne jî binî xuyadike herdu aliyên rast û çap siwarî û ber bi me ve tén, topan jî ji wan bi şûn de bi hev re endaxet dikirin li pêşiya eskerén xwe ré didan vekirin û wek: lehiyé dihatin, héj me naskir ku şevé dî péve me lihember wé piranî û giraniyé şerkiriye,

Li hember wé piraniyé û hindikiya me ku bi me re fişek jî nemabûn çar neçar meréya (héné) ji wan re berda û xwe de milé rojhelat bi her awayî ji hézek cengdarî em ketibûn, ji milé dî hespén me jî li bergeha me gundé (heftgermé) bûn, apé min jî bi me re laşé wî giran nikaribûn bi peyatî bimeşe, siwariyén milé rasté esker jî dixwestin pêşî li me bigrin, ji gule-én topan ku em di dûxané de géj kiribûn, em li ber wé alahiya siwarîyan veketin û me li wan giréda çewa ku siwarî nikarin şeré erdé bikin û dijarî zéde digîje wan serî li binî qelibîn bi şunde şikestin, em giyane gund li hespén xwe siwar bûn û me xwe da surta çemé zuha liber darén godîşan peya bûn, ku dikeve rojhelaté bergeha wé lehiya esker û réya (héné), ji nihértina dûrebînan péve di dest me je havilek dî nema bûn, beteriya topan jî li pêşiya ré didane vekirin, li ser leşker û dor û gundén pêşiya wan jî firindan bi qumberan dibin imza (Fayzî kuré Arif efendî) de kaxiz dirijandin (1) ku xwe teslim bikin goh li (şéx seîd) û fesadiya wî nekin, beré xwe bidin cumhûriyeta Turk û madeniyeté.

1. (Feyzi beg) ew xayinê ku tevî (ismet û zulfi beg) di (lozan) de ew xiyaneta tarîxî kiribûn, héj ji wé xiyaneté ne diqerîyan,

Em di wé nérevaniyé de leşker giya milé devé ku li ser réya (héné) ber bi bakur ve derin, di wé hindavé de ji rojavayé (Dicle) nézîgê (700) cengawirén eşîra (emeré faro) dibin qumanda wî de li ber pala giré de vebîn bi serî li wan qelibîn, dinav wî pûşê sipî de weke parçekî kon dakeve erdê welé li pêşîya wé lehîya esker erd girtin, şerek zéde xûndan di wé qadé de pékhat, di nav wî pûşê sipî ku zemîn nuxumandî ku insan û ew pûş û palax lihev diherbilîn diwé tevgera reş û sipî de weke behir pélan vede, zéde î du saatan wî şeré dûjehî diréj kir, lé dema ku ji şoresgîran gelek şehîd ketin şûna sistiyé de béhtir hêrs bûn.

navbera me û wan sé kîlomitir hebûn, me dît bi dengek tevayî qîrî bi wan ket û ji cî rabûn û îrişî çeperén wan kirin, dest bi dest tufeng dixistin zik û pişt wan, di wî şeré dest bi dest de Turk nikarin û nikaribûne şer bikin, ew leşker weke garana dewaran dane ber xwe li ber çavén me ji pişt wan ve dest davétin situyén wan bi şûnde li erdê didan, gelean tufeng davétin û herdû destén xwe hildidan xwe teslim dikirin, ew leşker lehev qulibûn bero paş heyanî giyane gundé qadiyan nav giraniya xwe ya dawî, hingé jibona em cebxane bigrin û bi wan re bikevin şer em giyane qada şer ku ji laşan weke pez bikve mixel, ji herdû aliya lé ji 80% ji Turk hati-bûn kuştin,

lé her wekî té gotin pirani û hézdarî berge li méraniyé digre ji qolordûya nehan péve qolordûya heftan jî tevî wan bûbûn ku çar firqe leşker, her firqekî (12) hezar yanî (48) hezar leşker di wé eniya teng de ketibûn şer, di îrişa

diduyan de ji leşkerén hember péve li herdû baskén çep û rasté me jî enî girtin, ku bi wé piraniya gotî re silehén giran û firinde-én bumbaran, jé û péve leşkerek nizamî lipé wan xwarin cebxane dihatin qadé tevî duktor û dermanén birîndaran ew qada şer berdé, pénc kilomitir bi şûnde li (kaniya keçikan) me cardin péşî liwan girt, cara sisiyan édî roj li ava me li (giré hesenbeg) enî girt, piştî (48) liwir héj niv xwarinek bi dest ket, ew şoreşgîrén rojavayé (diclé) bi tevayî xwe giyandin wé qada şer li gundé (sûtaxan) qumandanén şoreşé civîn dane girédan, biryar bi îrişa wé şevé dan, û talimatén jér dane şervaniyan û gotin:

- leşkerén Turk bi şev nikarin ji cî bilebitin, cî li xwe asé dikin û disekinin, divé hûn bi sé biran lékve bibin, dibir di herdû milén rast û çepé wan de bé deng û péjin derbaz bin heya dawiya wan, biré sisiyan li hember li wan biteqînin, hingé herdû baskén dî jî li wan biteqînin hûné wan bixin nav sé agiran bé pergal dibin wé dijiwariyén zéde mezin bigîje wan, çewa ku dizanin di şeré şevé de ne pékarin,-

ligor wé danezana gotî ji piştî muxrib heyani desté sibehé di wî şerî de ber batîyek kes nedî bi seré wan de hat, ku taxalis li tu eniyén dî bi seré wan nehatibûn, berî ku sibeh li me rohnî be û em bikevin ber amancén gule-én beteryén topan li wé deşta dûz, pénc kilomitir bi şûn de ber bi bakur li pişt (gundé axwéran) li pesara çiya me eniya péncan girt, da ku emé di wir de çétir istifade-é zemîni bi dest xin, lé sé rojan ew leşkerén giré hesan beg li wir man birîndar û kuştîyén xwe dikişandin (Diyarbekir), heya ku giraniyek mezin

tevî çete én xayîné-surgéçi én kamil beg, çete-én reman én Emîné perixané, tevde giyandin hev bi tevaya top û sîlehén herdû qolordûyan roja çaran héj ketin enîyén şer bi awakî fireh berge girtin, bi gumana ku emé li keviran çétir karibin şer bikin lé mexabin ew guman nerast bimere derket, gulle-én topan û qumbere-én firindan parçe-én keviran li me dikirin hezar gulle, encamî ew cebhe-é dawîn bûn ku me berda, bi wé berdana wî cebheyî tevaya eniyan hatin berdan jiber buyerén jér:

lewre çi devera leşkerén turk digîyan gund dişewitandin, jin zaruk, kal, pîr, nexweş, birîndar, yekser dikuştin an dixistin xaniyan té de dişewitandin, ku weraseta péşiyén wan (cengîz, Teymûr û Hilako) bûn, jiber wé çendé şoreşgîr çi dervera esker bigîjana nézigé gundén wan bi jin û zarukén xwe ve, dibeziyan, jiber wî qasî di nav me de ew sazmana şoreşgîri jî felişî, roj bi roj saet em kém dibûn.

jiber wé çendé enîya dawîn bûn ku me berda ew leşker xûnréj (héné û licé) vegirtin û derbazî nav welat bûn mija miriné girte ser millet û welat, çewa ku wan çete-én xayîn én surkiçi reman û kerwesiyân di rix wé şewat û kuştariya tevayî de welat talan dikirin, (şéx seîd) di wé felaketé de bi me re bûn, heya em giyane gundé me ku dikeve nav bera (qeza héné û licé), lé sibehé me hew dît ku esker giya nézigé gund, me rewşek şeré wan kir heya jin û zaruk an jî gund xwe giyandin çiya, jiwé mala ew çend giran diya min bixwe re (tasek avé û secade kî xalî) tené bi xwe ré anîbûn, di gunde jinek binavé (hewika xoce) du kurek binavé (Bi-

şaré evdo) û keçek bi navé (Medika rihiké) ketibûn dest esker, jinik bi daré télé ve girédan û (18) gule bera wé dabûn, lé herdû zaruk umré wan lidor deh salan hebûn kesé laşé wan nedî nizanim bi xwe re birin ku, li seré çiyayé (eshab elkehif) me agir dadabûn û zaruk lidoré berf jî bi ser wan de diberiyan, nizmaniyén navberén çiyayê ji dûxana şewata gundan wek beheré xuya dikirin, lihawidor me dût nêzîg dengé tufengan dihatin, dinav gundî û esker û çetan de, lé bicarek millet ji manewiyat û şerek tevayî ketibûn, ew jin û zaruk bimere bi peyatî dibin wan berf û baranan de em ber bi bakur ber bi eşîra zaz én xalé bavé min (Emeré faro) ve dikişîyan, diwé réwingîyé de jinek kete ber zayîndé li nav ré û liser berfé, diwé hindavé de hin eskeran nêzîgî li me kir, me bi wan re şerkir heya ku jinik xilas bû bi wî halî réya serma û nav berfé bê ku tiştek gerim hebe bixwe an vexwe û bé derman, bi wé belangazîyé (30) kilomitir em giyane (kakhik) gundé (emeré faro) ku (şêx seîd û qumîta merkezi) berî me giyane wir, li wir civînek siyasî dane girédan bi awayé jêr biryar hate dayîn:

- divé (şêx seîd) û qumîta sazmané derbazî (ferat) bibin ji wannén wé eniye re jî bidin zanîn, ku şoreşé cebhe-én diyar-bekir berdaye û dikin derbazî ba (simiko) kurdistana îran bibin, da ku bi (simiko) ji ali (wan) é ve derîyek nû bi hêzén giran li Turk bidin vekirin, bé ku zanibin ji/1924/ de Ihsan nûrî, Rasim, Xurşîd û Tewfîq cemîl) herçar én ku ji (Hekarî) derbazî îraqé û ji wir çûne ba (simiko) jibona wé daxwazé lé simiko xwe nedaye ber,

Belé bi wé gumané ew qumîta gotî (şêx seîd) û sed siwarî péré ji nav aşîra (zikté) bi şev ber bi (ferat) ve diçûn, (qesimé ahmedé silémîn) (1) herengifi wan bû, jé pirsîn ku gelo hézén me hej di (varto) dene an na? jiber ku pénc roje poste ji wan nehatiye, qasimé-xayîn got: Belé ez niho ji (varto) ba wan tém, hingé şêx jé bawerkir û got: madem pira varto di dest medeye emé herin piré, bira-é şêx seîd û hersî kurén wî xwe giyandin (şêx seîd) û jére gotin: ez benî tu çewa bawerî bi (qaso) tîni bé pelandin derî pira varto? piştî ditin ku şêx bawerî bi qaso ani hersî kur û bira-é wî nézîgé (40) siwarî ji wan qetîyan ne çûne pira, şêx seîd-bi (60) siwariyi ve çûn, dema giyane ser piré ji herdû aliyan esker liwan rabû, liwé navbera erd û ezman tevde dîl ketin dest leşkerén qolordûya erzerum firqa (usman nûrî) tevi wé xurcika zéran ku li histirek barkirî bûn.

Belé biwé dîl ketina (şêx seîd) û hereketé leşkerén (erzerum) yekcar manewitén millet, şikest (şêx seîd) û hevalén péré ji (varto) şandin Diyarbekir, ber wé mehkema eskerî a ku bi navé (ÎSTIQLAL MEHKEMESÎ) a ku di /7 adar 1925/ ew qesabxane dabûne vekirin, di wé mehkema bé qanûn û huquq de herroj îdam hebûn, lê (şêx seîd û hevalên wî) sê mehan mehkeme dikirin, di /27 hezîranê 1925/ de (şêx seîd) û (48) di şevê de li -Diyarbekir- gastîna (deré çiya) îdam

1. Qasim heg pismamé (xalid heg cibiri û hevlingé-şêx seîd) bûn, qaîmeqmek eskerî ew xiyaneta mizin kir, (şêx seîd) û hevalên wî xisdest dijmin, dema insan ji zayindé çepel be xwendin jére çî féde ye.



Piştî şikestina şoreşê û dil ketina şêx seîd û hevalên wî, û li dora wan cendirmên Turkan û xinizê mezin (Qaso). Ji hêla rastê: şêx şerîf, şêx Ismaîl, şêx seîdê pîran, şêx Ebdulah û nimra (100) li ser sînga Qasoyê xinize.

kirin, ku niho li wir (heykela kemal) dane çékirin.

Ew (40) siwarén ku li nézîgê pira varto ji (şêx seîd) veqetfyan ew bi wê gumana gotî çûne îran, li (kilîsekend) é leşkerén îran di şerk de leşkerén îran çend peyayén héja ji wan kuştin én dîtir xistin hepsé, dawî giyane ba (simiko) her çendî bi dor simiko ketin û nav tédan ku karibin ji roj helat ve derîkî cengé li turk bidin vekirin, ji awan bi awakî nikaribûn havilek bi destxin, dawî ji wira daketin -îraqé ku hingé-îngilîz lé mandater bûn, ew lacî qebûl kirin, livir dîsa em vegerin ser leşkeré erzerum eniya (varto).

Her wekî li jor heta zanîn ku ji meha şubaté heyanî dawîya gulané ew qolorduya (erzerum) ji ciyé xwe nelebitî, lé piştî ku şoreşé li hember qolorduya heftan û nehan bicarek eniya şer berdan û leşkerén herdû qolorduya tevaya heremén eniyén (xarpét û diyarbekir) vegirt héj lê erzerum dakete eniya (varto), tevî ku kete şeré şoreşé jî dîsa desteka (kemalistî) ew jî xistin ber mehkema gotî, wê qolordûyé weke qolorduya heftan û nehan yekser dest bi qetil ama kurd ne kirin, lé di nav wan de jî li dor (gêxî exnût) hin çete-én (elewî) én (çarek û xuromek) biwé nezaniya (mezhebén elewî û sinî) gelek kurdén sinî én wan navçeyan eşandin û welat talan kirin,

Enîya, (xarpét), du firqe esker ji (séwas û melatîye) bi sîlehén giran ji rojava ve li rojhelaté ferat ketin enîya (xarpét) heya (palo û cebeqçûr) li hember wan herdû firqan gelek enî vegirtin û dijwarîyén mezin giyandin herdû firqan, lé piştî ku leşkerén erzerum jî ji para deriyén ser li wan hev bela wela kirin, ji %80 hatin kuştin én dîtir sîleh xistin,

li welaté botan jî (herdû xayînéw wek-cemîlé çeto û resûl axa) dijwarîyén mezin dibin sîdarîya eskerén Turk de giyandin kurdén wan navçeyan, nemaze li (xésxéré) qesabxanekî mezin dane çêkirin, lé qencî ya mustefa kemal ew bûn ku ew xayînéw hevalén xwe jî bidar vekirin.

GUR BÛ DOSTÊ BERANÊ QELEW (1)

Her wekî liyor hate zanîn ku ji herçar zabitên kurd én ku li (hekarî) di/1924/ ji êraqé derbazî ba (simiko) bûbûn, bi daxwaza ku dema şoreşa (şex seîd) dest pé bike ew jî bi wé hézdarîya (simiko) ji alîyé wané ve derîyek şer li Turk bidne vekirin, lé herçendî pére ketin civînén dûr û dirêj lé mexabin hevilek bi dest nexistin ji serhişkî û xudbînî (simiko) pévé ku bidaxwaza xwe ya tekane ve diman.

Herwekî hate gotin, ji wan péve sé kurén (şex seîd û biraé) wî jî tevî hin fermande-én şoreşé û (xalid begé hesenî) bi nézîgé sed û péncî siwarî ve ew jî bi wé daxwaza gotî çûne ba (simiko) wan jî ji awan bi awakî (simaîl axa) razî nekirin, lé ne dihêştin ku ji ba wî dakevin (îraqé) jiber wé çendé ji ba (simiko) bi şev revîyan ku diçûne (îraqé) lé siwarîyên wî bi péwan ketin bé ihtîram bi awakî sert hin ji wan girédayî anîn diwana (simiko), wek meruvek serxweş

1. Ev danezanén (simiko) tev de ji devé rehmeté (yûzbaşî tewîq cemil) ku yek ji wan herçar zabitan bûn, di/24 payiza navi-1975/li-hesiça çû rehmeté, ji min re ew buyer gotine.

lipénan li hunduré dîwané diçûné û dihat û digotin: bi tirba (cewer axa) eger hinan ji min re nekirana xiyanet divabûn ez we tevan bi ser hev de bi kujim, ma ez ne weke ingilîzm ku hûn dixwazin herin ba wî? bi wé dirêj kirinê (xalid beg) bihêrsek zéde rabû ser çokan û got: -simo li ciyê xwe veweste te zéde ji edeb û exlaqê kurd gavda wek meruvek serxweş an hirçek di şikefta xwe de, bike, îro te em di qadek şer de dil girtine an em xulamén tene, ma tu ji xwe û van caméran fedî nakî jî divê meznatiya teqlidî de û bi hêzdariyén eşîrî jî tu xwe jî me jî xweş nasdikî ku ev çavsorî jî te û bavê te re jî zédeye ha.

lé a qenc ew bû ku bi wé lé vegerandina (xalid beg) héc neket sekinî lé guhdarî kir, bé ku tiştêk lé vegerîne jî dîwané derket û çû, piştî hinek me dît amir hézek wî hat û ji wan re got: (îsmâil axa) fermayîş kir û dibêje: dema ku dixwazin ji ba min herin ré li ber wan vekirîye.

Hingé li wir bi du biran lékeve bûn, ji qehran (xalid beg) bihin peya-én xwe ve dîsa vegerîya welat, dil kete dest Turk li diyarbekir- îdam kirin, lé hersî kurén (şéx seîd-elîriza, xyasedîn, sulhedîn) û apéwan (mehdî) bihin ronak û peyayén bi wan re ji kurdistana îrané daketin kurdistana -îraqé- bi navê siyasî xwe sipartin -ingilîz- ku hingé li -îraqé mandeter bûn, li (Koyî sencek) ba (melayé gewer) diman,

SIMIKO Û TURK DI KOMÎDYAKÎ DIRAMÎ DE

-tewfîq cemil got: piştî çûna wan jiba (simiko) bi çendekî,

rojek me nêrî ku (12) baré histîran tufeng û fişeng ji sînore (Wan) é ji (simiko) re hat, bé ku hayî herçar zibatên kurd ji tiştik hebe, bi Turk re ketibûn dayîn û stendinek jibo mirina xwe, dema ew sîleh dîtin jê pirsîn û gotin: îsmâil axa ev çi sîlehe? wî bi sergermî got: di nav min û walîyê wanê de tifaq çêbûye ku ewê sîlehe bidin me em li hukumeta (riza şah) bidin, biwê hemaqeta (îsmâil axa) herçar zabitan pîlan û da xwaza Turk bicî naskirin û herçaran bi hev re gotin:

-îsmâil axa- divê tu çak zanibî ku tu bi destê xwe fitîla agir dixî bermîla barûdê bime û millet é me diteqînî, Turk ne dijminé -îran-û ne jî dostê tene, lé li kurdîstana Turkiye şoreşek mezin heye, ji ber wê çendê Turk ji van hêzên te-é cengawir pax dike, dixwaze ku serê te bixe herba îran daku ewjî ji para li te bide, ev pîlana siyasî a duserî dinav herdû dewletan de bernamekî eskerîye, divê tu vé bicî zanibî û di awirek eskerî de ji me bawer bikî, ha!...

lé herwekî té gotin: dermané her nexweşîyan heye, lé dermané nezaniyê nîne, nemaze ew nezane ku nizane ku nezane, dema wan ew girêka siyaseta Turk jêre vekirin û pé dane zanîn, bi wê nezani hişkî û xud bîniya xwe liwan veqerand û got: ev ne îşê we û wan kitêbokên we xwenidine, gotin: axa eger nizamên eşîrî bûna te jime çétir teqalîd û seykojîya wan dizanî, lé siyaseta û nizamên eskerî divê em ji te çétir zanibin, jiber ku me erkanî xwendiyê jibo van agahiyan,

lé wan şîretên siyasî di serê axê de cî negirt, wek: goza bavêjî ser qubê, bi wê ser hişkî û daxwaza xwe ya tekane

derîyê herbê li (îran) da vekirin bê kû zanibe an bixwaze ku zanibe we dawî çibe, axê fermaîş kir ku divê (îhsan nûrî) emîr ceng be (tewfîq cemil) destgirtiyê wî (rasim) amir hêzê millê rastê (xurşîd) amir hêzê çepê, bi wê sazmana cengdarî êrîş berdane ser leşkerên îran, weke caran leşkerên îran xwe liber suhna cengawirên kurd negirt, di dest pêkê de çend bajar û qesebe ji îraniyan vegirtin, lê herçar qumandanên gotî her gohên wan ji wan û bi bişûnde li êrişa tûrkbûn, roja pêncan (îhsan nûrî) ji hevalan re got: ligor gumana min leşkerên Turk derbazî erdê îran bûn.

wê rojê berî nivro posta wan hate eniya şer û got: leşkerên Turk, ji sînorê (wan) ê ve bi topên meydan gund dane ber gulle baranên topan û pêve tén, jin û zarûkên van gundan di nav agir û pêtî de têne biraştin û welat wêran dikin, hingê herçar qumandanên ji (simiko) re gotin: axayê siyasi te niho naskir ku te biwê xudbînîya xwe çi biserê vî milletê bed bext anî? her çiqas me jîtere got: axa ew dostaniya wali yê (wan) ê bitere wê dawî ev be, lê te biser hişkîya xwe ya nezan welat û millet xiste nav du agiran, fermo bê tuyê niho çewa karibî şerê du dewelatan bikî? te liber çavê xwe didîtin ku (şoreşa şêx seîd) li hember wan Turkan şervanî ye, çi gundê ku leşkerên Turk vedigirin yekser jin zaruk, kal pîr, nexweş û birindaran didin ber singuyan, lê çewa wê bite re bibana dost?! vé serhişkî ya te tu giyandî xiyaneta mezin, em niho li vir hev dû bikujin bê ku esbab bê naskirin emê ji bi xiyanet bêne guman kirin,

Belê, bi wê nezaniyê (simiko) kurdên-îran-xistin nav



Simko axa yê şikakî.

hîtona agiré du dewletan, tené jin û zarûkén xwe dibin sîya şoreşgiran de welat berda û xwe giyande kurdistana iraqé, nezani û xudbîni vé felaketé biseré millet tinin, tu daxwaz û hézén şoreşgir bé agahiyén siyasi nikarin û nikaribûne xwe biparézén û bigîne daxwazé, dîza biwé ser hişkîyé di /1930/ bi şah xapiya vejeriya iran li (nexede) ew û siwarén pére li wir bi ser hev de kuştin, dawîya nezanan eve!....

PIŞTÎ BERDANA ENÎYAN TURK DI QETIL 'AMA KURD DE

Her weki li jor hate gotin: piştê tevaya eniyén şer hatin berdan ji-xarpét heyasérté (1000) kilomitir, ji (Diyarbakir) heyani (Erzerum (1000) kilomitir kete nav dûjeha kuştariya leşkerén Turk, ku ji sé qolordû leşker péve li her welayetek alahiyek jandirme hebûn, qolorduyek ji çete /150/ hezar ketibûn nav welat, ji kuştariyén tevayî péve tevaya gundan dişewitandin, ji seré çiyani dema me li nizmani û nav destén navbera çiyani dinérin ji dûxana şewata gundan wek behrek şin dikirin, di nav destén me de jin û zaruk, ji déla gundan me şikeft û daristan bihev di guhartin, li hawîdor li nav géli û gazén çiyani bela wela dengé tufeng û mitralyozan diketin hev, ew leşkerén ku rastî wan komén gund berdayî jin û zarukan dihatin di nav wan de her û her şer û kuştin bûn, tevaya wan heremén jor gotî li ronîştmanan bûbûn dûjeh, ew felaketa ji zemané cengiz, Teymûr û Hilako -ve li tarixan nehatibûn dftin,

di nav wé qijvijé de em ji nav eşîra Botiyan (Emeré faro) dîsa vegeŕîyan çiyayén xwe, jibona ku em hinan li çiyân bibînîn û serpehatiyén welat ji wan bipirsîn, em ji -çiyayé eshabulkaf-daketin çiyayé (zerga fis) xirabe bajaré (Bixûd-Duqyanos) xudané pêşiyén kurd (nejadé Hûrî) li wir (hesen keya é celik) li dor wî nézîgé çil peya li şikefté agir dadayî ronîştî bûn ji min pirsî û got: birazî hûn çewanîn? dilgerim an dilsar bûne?..

Min lé vegeŕand û got: apo ma dilgermî li ku maye? dema em di enîyén şer de bûn jin û zarukén me di malén xwe de bûn, çewa ku me ji ji bona paraztina wan xwe didan fedakirin, hingé em bi dilgermî şervanî bûn, lé îro ji malavanî pez sewalan péve tevaya jin û zarukan bi me re ketine bin perda agiré Turk, ma ji vé diwartir çi heye? wî vegeŕand û got: - wah, wah, birazî tu xortek çak ji malbatek çak û te mérxas di zanim, divé em ji her diwarîyan diwartir bin, xudé neke eger te li van hawîran kesek bi sîleh û dilgerim nedît dîsa vegere ba apé xwe tuyé min weke beré bibînî,

Bi wan nav dimedanên em ji ba wî bi dilek gerim rabûn, vegeŕîyan ba jin û zarukén şikefta jé çûyî ku dîya min jin û hersî xwehén min ne li wirin, min pirsî ji min re gotin: dîya te got: wé kuré min li ser me bé kuştin, em jî xilas nabin, emé xwe bigînin (Diyarbekir) bajar mezin e emé li mehlekî ne nas xanîkî kiré bikin û téde ronîn, belkî li wir em béne paraztin, ji ber ku bi dîya min re zérên sor hebûn, xwe ji wé giriftariyé rizgar kir, lé baré min her weke beré ma lewre jin û zarukén millet di nav destén me de bûn, me nikaribûn

terka wan bikin,

Belê, -Hesen keya- pişti çend rojan ew nav di xwedan wergerande kirinek navdariya tarîxî, di wê gera çiyân de (Hesen keya) bi me re em qederê sî peyayî évarek li gundé (şela heydan) héwirîn, gundek vala kesek lé nebû, réya esker jî bi wî gundî neketibûn neşewitan dibûn, ézingén pir me agir dadidan wê şevé em gerim bûn, lé desté sibehé payinén me-én dora gund em agahdar kirin ku esker dor li me girtiye, me got: ew bilindahî û derberêjra kaniyé ketin wir jî? wan got: no em diwirdene, em di wê ré de tufeng liser destén me û derketin, di derberjéra kanîyé de lipêşîya esker hebûn, lé dema ku ditin me nézîgî liwankir béku béne xuyakirin reqereqa potînén wan dihatin bihîstin xwe jî bergeha me didane alîkî bé teqandin em jî nav wan derketin, lé heya ku em giyane ber çemé ser çavîya (dicle) dunya lime bû ronî, jî amanca tufengan héj der neketibûn esker jî tufengan pévé bi mitralyozan em kirin amanc, dibîniya kendalé devé çem de em ber bi rojava ve çûn, heya ku dûr ketin hilkişîyane çiyakî bilind, li wir me bi dûrebînan nêrî ku çendek jî me bi şûn de ber bi rojhelat ve çûne û li çem derbaz bûne li newalek wê tabûra esker ew pé çane, ku (Hesen keya) jî di nav wan de, me tufeng rakirin ser nişanê tamam jî gule - ên me amanc li wan ne digirtin me gazî wan dikirin û digotin: roj avayé we vekiriye ber bi me ve werin, jî wan heftan tené didu é bav file xulamé (Hesen keya) é dîtir kur apê min (mehemedé sadîq) bûn, kur apê min gulle li çengé wî ketibûn, xûn nedisekinîn û êşek zéde bû me jére

got: çima én dîtir nehatin? wî got:

çewa ku we dît şevê dî (Hesen keya) nexweş bûn, nikaribûn ku bazdin herdû kurên wî (Bekir û selîm) jî nikarin ji bavê xwe biqerin, herdu (Hesenên) me jî dibêjin: emê çewa pişt bidin wan û wan dinav vî agirî de bihêlin û birevin kerameta xwe bidin erdê û bi hevalên xwe re jî bêbextî bikin, ji me re mirin çêtin re- belê her pêcan di newalê de piştta xwe dane hev û şerê hezar leşkerê dijmin kirin, li dor xwe (55) esker kuştin û qumandanê wan jî birîndar kirin, her pênc jî weke kurdên (keleha merîwan) şehîd ketin, di tarîxa kurd de ew fedakarî û mérxasî bi ava zêr nivîsîn û ji nûve di dilê şoreşgîran de manewîtek xurt dane çêkirin.

ew manewiyatê ku bi me re nemabûn em di gazîya wan de neçûn, heya ez xwe û wan hevalan li hember wan û tarîxê berpirsiyar dibînim, belê netenê wan qehremanan dilgermî da şoreşgîran lê wiha renga tirs û lertz xistin dilê leşkerên turk, nikaribûn weke berê dirêjî her çîyan bikin, ku giyanê wanê pîroz bû parêztina wan jin û zarukan.

KURTÎ AN NIVÎŞKA BIRÊ JOR:

Di her şoreş xebatên, leşkerî û cengdarî de xeta én hundur û selbîyetên der dikevin rûyê wan, ku ew pêkhatî tevde buyerên tarîxî ne, zeman û mekan bi xwe digrin û di bin perda zeman de derbaz dibin, wiha renga diwê şoreşê de jî hin xeta û nezaniyên siyasî berî cengdarî bi awayê jêr pêkhatin her wekî:

Di awir û agahîyên siyasî de ku sazmana (Erzerum) di/ 1924/ de ji rûsya destê alîkariyek siyasî xwestin, di wê daxwazê de bê ku li rewşû siyaseta rûsya varqilin buyerên jêr bînin bîra xwe û ji hev re bibêjin:

A. Di/1918/ de vé-rûsya polşevîk- li (rewan) é bi navé (yéri-van) cumhûrîyata (érmen) da çêkirin, ku hingé kurdén wir ji érman eger ne zéde tir ne ji kémtir bûn, ew kurd xistin bin sîdariya (érmen) bê ku di awirek siyasî de ji awir li -kurd-vede,

B. Di/1921/ de jibona ku di sînoré xwe de (Turk) bike dost, di pirotkola (gumrî) yéde, dinav xwe de sînor danîn, jibo réya (posfor û derdenîl) bajarén (qars û artevîn) li Turk veg-erandin,

C. Di/1923/ de (şêx mehmûd) ji (silémanî) yé bi siwarîya hesip çû (tebrîz) ji wir di qonsiliya rûsya de têlêfonê bi (lêmin) re peyîvî wî jê alîkarî xwest, -lenîn- got: em tékilî bi hunduré dewletek dî nakin gelo ew dewleta gotî kî bûn? ne (ingilîz é empiyalî bûn).

D. wê dewleta (polşevîk) hukumek (qeyser) wergerandibun sazmanek hevparî, hêj ligor aydiyolojiya xwe di welat de karê hukum nedabûne sazkinin, liserê çiyar hêj şerê (polşevîk û menşevîk) hebûn, ji milé dî dixwestin dewletén dor wî îtiraf bi wê sazmana wan bikin, wê çî karibûna destê alîkariyé bidin kurd ji wan re selbî bûn, ew selbîyeta ku heyani van nivîsaran ji diruyé kurd de meyinde ye,....

XETA Û NEZANÎYN ŞOREŞGIRÎ:

nezanîyên - me ên şoreşgîrî û cengdarî héj awirên me-ên siyasî bi gelek mezintir bûn, lewre ew nezanî bûn sebebê ji hev ketina şoreşê û heq negirtinê, bi kurtî ew xelet evbûn:

1. Bé tenzîmek eskerî silêhên giran her şoreşgîrek bi tîfing û restek fişek, ji çîyan em daketibûn deşta (Diyarbekur li erdê rast me enîyên şer li hember hukumetek girtibûn, ji me para ne xwarin, ne jî cebxane û neji jibona birindaran derman di hatin qadên şer, biwê nezanîyê me xisarên mezin dadanîn ji wêran kirina gundan péve!...

eger me bîra cengek şevgêrî yanî herba komandosî jî ne dibir, lé me ew enîyên şer li gêlî û gaz nav daristanên çîyan bida vekirin û leşkerên dijmin bikişandana nav çîyan, dîsa me dikaribûn dijwarîyên zê de mizin bigînin dijmin, nikaribûn biwê sitemkarîyê wê dijwarîya mezin bigînin welatîya, gundan bişewitînin û dest biwê qetil ama kurd bikin, jiber ku pîranîye zemîné kurdistan tevde çîya daristan gêlî û gaz leşkerên biyanî diwê fizikîya zemîni de li hember me ji şervanî re ne pêkarbûn, lé mexabin me li erdek rast bi tufengan şerê topên mezin dûravêj û firinde-ên bumbaran dikirin!...

2. Nezanîya dîtir ew bûn ku me bajar vedigirtin û téde (walî, qaîmmeqam, mudîr û her serkar û karamende-ên xwe dadanîn, her wekî me erdê welat ji pégehên dijmin dabûne réjkirin û di nav xwe û wan de sinorek diwêlî danîbûn, bê ku ew hézdarîya mezin û ji wê daxawzê re bi me re hebe, an jî me destek alîkarîyek derve ji peyda kiribûn,

Belé di wan zemanan de kémanî nezanî û xeletén me -én berevanî û şoreşgîrî bi kurtî evbûn, tevî ku armanca şoreşê û şoreşgîran pîroz û girtina mafê xwe é tarîxî û qewmî bûr., bi wê armançê bi mal û can xwe feda kirine em bi wan xwe bextiyar û navdar û dibînin, heya rojek ji dunyayê bimîne em ji giyanê wanê peyarî re minetkarin,

Lé ew danezanên xeleten jibona ré nasîya rojên pêş divane, ew rojên bûrîne ku dibin mirék jibona rojên pêş.

Institut kurde de Paris

BIRÊ HEFTAN

Institut kurde de Paris

6

Institut kurde de Paris

ŞOREŞ DI CENGA KUMANDOSI DE

Her wekî li biré heftan bi awakî kin û kurt hate zanîn ku kurdistan seraser li miletê kurd bûbûn dûjeh, ji alîkê kuştariyek tevayî, ji aliyê dî şewata gundan tevî jin zaruk, kal û pîran, em diçûne kavlên wan gudên şewetî dinav wê ariya reş de laşên wan jin û zarukan weke darên şewiti komên hestîyan liser hev kom û kewte bûn, ji dêla gundan ve ronîştmanên welat li şikeft û daristanên çîyan bi tebayên kovîre bûnbûn heval û niştemani, tabûr û bilikên leşkerên Turk biser wan komên jin û zaruk de digirtin, li herderên welat di nav gélî û gazên çîyan de bela wela dengên tufengan diketin hev, di nav xwediyên wan jin û zarukan û leşkerên Turk de her şer bûn. é ku ji wan re gazî û hawarek hebe tevde bi ser hev de dihatin kuştin, wan hevalên wan teba û kovîyên bé bextî goşté wan dixwarin,

Belé di wan felaketên na dîde de (QAÎMEQAMÊ ÇEWLÎ-HUSNÎ BEG (1) ji qumita şoreşé re namekî şand û got:

- ez ji dûrve rewiş û pergala (2) weya şervanî gelek vajî û xwar dibînim, tevî ku ligor agahiya ne, wan qumandanên ku

1. ew qaîmmeqam-çerkez bûn. biwê danezana wî li mehkema eskeriya (Diyarbekir (100) sal bi hepsê hukum kirin.

2. pergala (weziyet) şewa tê gotin: filan bé pergale-yani hé weziyete.

di cenga cîhané a pêşîn de bi van hézén cengawirén kurd çar salan li enîya qafqasya şeré leşkerén (qeysere rûs) kirine, çewa ku di wan nizamén eşayîrî de jî di şerén çîyan de hatine perwerde kirin, çewa ku di nav-qumîta-we de jî bivé nevé wé hin peya-én zana hebin, lé nizanim di awirén cengdarî de we li hember leşkerek nizami cebhe girtiye ?! ku jî sazmanén her şoreşan re ev progirama weya şervani gelek vajî û ne di ci de ye, çewa ku hûn dibînin di wan şerén enîyan de we xisarén mezin danîne,

lé eger hûn awayén şervani wergerinin cengdariyek (KUMANDOSÎ) bi mefreze-én ji (30) î ne kémtir û ji (50) ne zédetir, li tevaya welat bela bin li her réyén teng, géli, gedûk én çîyan li esker xin û cî bihev biguhérin, bişev bigrin ser wargehén eskerî û e nbarén wanén çebxane berhewa bikin, bivan uslûban hûné leşkerén dijmin géj bikin, xisarén mezin bidin wan béku bigînin we, bivé hûn dikarin daxwazé bi destxin-

li ser wé danzana (HUSNI BEG) qumîta şoreşé li (çiyayé xaçûk) (1) civînek leşkerî dane girédan, diwé civîné de biryar hate dayîn ku li herderé şoreşgîr awayén şer wergerînin cengdariyek (kumandosî), belé ji wé danzana (husnî beg) péve, di manewîtan de wé vedakarî û qehremaniya her pénc (şehîdén şala heydan (hesan keya, selîm, bekir,

1. xaçûk-dikeve hakuré (qeza licé) kurdén (dinbili) eşîra (emeré faro) ku vana jî (biramak) én iraqé hatine (melato) hin liwir mane ku ji wan re (qewmé çoyé) té gotin, én dîtir çûne (xaçûk) liwir emeretek dane çêkirin ku jêre (huseyin begé dinbili) digotin,

hesené inco, heşenê babêxi) bingeh liwê sazmanê girtibûn, biwê xûna xeweya pîroz ew ber name-ê cenga fedakarî û kumandosî ji mer re nivîsî bûn,

Belê piştî biryara wê civîné şoreşgîr li der û heremên jiyositratîjî hatin belakirin, di jimarên jor gotî de mefreze ketin şerê dijmin, lê bingeh û wargeha (qumîtê) di (çiyayê xançûk) de ma, jiber ku li wan hawîran ronîştmanên sé eşîrên (botîyan, mistan û tewsela) tevde ên kuştibûn ên revîya bûn, tevaya gundên wî nevçeyî jî weke deverên dîtir şewitandibûn, di nav me û lişkerên turk de mabun heremek (tamponî (2) jiwan mefreze-ên kumando péve, ji heft rojan carek (bira-ê şêx seîd şêx evdurehîm) der diketin ser kevirek bi nav tédan û ser heldan gotarên zêde dilbîrin didan û digotin:

-ma ji me re neşerim û fedîkariye ku biçavên peyan lihev binêrin? an di méréké de li rûçik û bejna xwe binêrin ke em jî mérin, dema ku memdên Turk ji anedolê bèn, di welatê me nav çiyân de me biçîn û zarûk kal û piran ve weke pez serjê bikin û serên me biser sigûyên wan ve bibin bajaran dalqînin, dema em li hember wan bedkarîyên kurên cengiz çavên xwe pehin bikin û héj bixwazin di nav vé mija mirinê de jiyîn darbin, ma gelo jivê şermezarî û bednamîya tarîxê mezintir wê ji me re çi hebe? çewa ku gotina me kurdane dibêjin: mirina bi mérxasî gelek çétire ji wê jiyîna bi rezilî.....

2. Tamponî-ew devera di nav du dewletan de bé sîdariya alîkî mayî re té gotin.

Di wan gotarén halan û serhvdan de, nivîsevanek defterek di dest de, kesê destê xwe hildana navén wan dinivîsin, xwedîyén wan navan ji (50) kesî bi hevketî, tevde siwarî bi hespén Turk û çekén eskerén Turk di va bûn biroj liser réyén mezin dakevin wan heremén ku eskerén Turk té de ne, daku li wé rastî leşkerén Turk bén divé li wan din, berî çûné bergeha geré û rojén péve ji wan re didane zanîn, ku li wan hindvan wé pê di şeré dijmin de bigerin û dîsa vegerin wargeha jé çûyî, çend caran di wan gotaran de ez jî hazir min navé xwe ne nivîsî, lé rojek ew gotar zêde dilbirin bûn min jî navé xwe da nivîsevan:

EV MEFREZA BI NAVE ŞIKEFTÊN SÊWÎYAN NEXWEŞ-XANA BIRÎNDAR Û KUŞTÎYAN:

Weke hate gotin, (50) siwarî bi çekén eskeré Turk sipartin min, devera ku em tere derbazbin jî hin qutîkén goşt û jibo birîndaran hin derzîyén ku me ji eskerén Turk girtî binavé (îtalya herb paketî) jî dane me û gotin hûné vana li bergeha xwe li (şikeftén birqlîn) (1) bidin wan zarukén séwî û birîndaran, dema em ji wargehé derketin dunya évar hîva sé şevî weke devé dasek liser çiyayé rasté kilîş girtibûn, diwan çiya gélî û nav daristan de ku perda tarîya şevé dadike zemîn desté meruv ji meruv ve xuya nake, şiveréyén teng û zirav

1. Ev buyera vé ditiné min da (kovara çiya) a ku (Heme Reş) derdixistin li (al-manyaya) téde hate bela kirin, ji ber ku diréi bûn di du jimarên de da çapkirin û bela kirin,

wek: kemeran li pesarén çıyan dizivirin raser meruv lipés û dor meruv kombetén serén çıyan ku dikevin rexhev wek: şufre-én dirasan di nav istérkan de xuya dikin, li dorme newal û géliyén kûr di wan de dengé xuşıya avan, li şikeftén çıyayén dûr û nézıg fışkénén pezén kovî û nalínén teyré (goyın) bi ziz dihatin bihîstin, bayé kur di kovikén berûyan de wek: fırkén polisén şevé difıkandin, di pélén bayé sar de istérkén li ezmanan geh hûr û geh gırs di ayısın, bi nihértına çavan meruv péşıya xwe ne didît,

ji ber wî qasi me gem é devén hespan sist kiri û réderî sipartibûne awirén wan, du siwarıyén péşıya me û didoyén dumdar lipéme bé deng û bé vexwarına cıxaran em li ré bûn, me dît ku herdû siwarén péşın, ji min pırsın û gotin: livan hawıran gundé ava mane? min got: no, divé nizmaniya rix mede gundek binavé (newala sévé) xelkén wî gundî jî weke gundén dî tevde kuştine, gotin: goh bide di nizmaniya çıya de dengé giriya zarukek té, piştî goh dané min jî ew deng bihîst û ji wan re got: dido hespén xwe bidin dest hevalan û dakevin bé çı denge, dido daketin piştî çaryeka sa'eté li fitiké dan, ez û didoyén di jî liwé nizmaniya gelek kûr dake-tin bi wan, me dît ku newal ji laşén kuştıyén jin zarûk kal û pıran dagırtıye, ew zarûk héj piçûk li ser singé dî ya xwe digere û dev dixé çıçikén wé di wan de şır nîne, di wa kuş-tiné de di hembéza diya xwe de çewa bé birin maye em lé géj bûn, min pıl da ser laşé diya wé ku digera şır de bi pan-cén xwe ji birına diya xwe xûna sor bi wan tilıyén xwe-én zirav wek liser kaxize sipî xetén mazişkol nivıs bûn, bi wé

dîtina zéda tehil û dilbirin ew heval tevde girîyan, min ji wan re got: ev zaruk tevî kuştîyan ji we tolvedané dixwazin negirîné, rahéjin di hembêza xwe de bixin bi qapûten xwe, em hatin giyane havalan û ketin ré, lé biwé dîtina me û bihîstina hevalan agir ji me dirijîyan ku emé heya sibé liko tola wan vedin? nivé şevé em giyane şekeftén birqlîn (1) li nizmaniya başûrê şikeftan ji binya wî çiyayî ser çaviya (dicle) derté li wir em sekinîn ez tené ber bi devé şikefta mezin ve hilkişiyam, dema nêzîgî devé şikefté bûm, ji pêş min ve yeké deng li min kir û got: tu kiyî min tukuştî, min got: bira ne biyani ez jî hevalé te me, got: tené pêşve we re, ez giyame bawî ku kalek umré wî lidor şést salî di çeperé de ji tufengé péve komek qumbere-én destavéj liber wî komkirî di payîna şikefté de ye, min nêrî û got: keyfa te bi wan çekén dijmin hatiye ku te wergirtiye? min got: apé delal em péncî siwarî tevde bi van çekanin jibona ku em karibin nêzîgî li xwediyén çekan bikin, hingé got: ev jî fenekî qence, héj min gazî hevalan kir ew zaruk û herdû barén wan qutikén goşt û derman dane milén xwe ew jî hilkişiyane ba me, em derbazî hunduré şikefté bûn, şikeft dibin çiyakî bilin de bajarek pék tîne, zéde diréj û fireh bi gelek kuçan lékve dibe, li herdu rixén wan koçan tevde deriyén menzelan hun-

1. Ew şikeftén birqlîn- jêderé pêşin kurd nejadé (hûri) hûye, dema ji wir der ketine dest pêkirina avaniyan (newzerg, berdewil, zergafis û amed) ava kirine, (zergafis) ciyé (xudané hûriyan-bixûd) de ku jêre-duqyanos-hatî gotin; ligor asarén wan kevne bajarén xirabe, hetîye naskirin ku (5000) sal beri zayin da (mesihe), ew çiroka (eshabikehif) ku di (quranê) de hatî gotin: ew najadén (hûri) ne.

durén wan hawîdor ji kevir dik û di navé de ji kevir masekî heye, li dîwarén wan tevde neqûş û nivîsar hene, jibona berxwe dîtîné bi fanosek piçûk em digerîyan, li hin deran jor de av dihatin xwar, ji çî zemanén heqbén dewrén kevirî de bûye ku ew ava daketî ji made-én kilsî di nav wé avé de jêr ve û jor ve weke situnan ew kilsa kevirî hindik maye bigîje hev, di zemané beré de ku héj elektirîk an pîl nebûn, uryantalîst û ulema-én-arkeoljî- dema diçûna wan şikeft û zivîngan, telîsek (ka) lipiştâ yeké lipé xwe direşandin û diketin hundur, daku di vegeeré de bi wé réya kayé zanibin derkevin, an na hingî bajarek zéde mezin e nikaribûn réya derketiné nas bikin,

Belê dema em ketin hundur dirix du menzelén kuça pêşî de tije zarukén séwî én dé û bavén wan hatine kuştin, li wir kom kiribûn û hin pîrek jî hebûn ew zaruk xwedî dikirin, me ew zarûka xwe ya ji nav laşan anî ew jî me siparte wan, gotin: we ev ji ku aniye? me ji wan re got: hingé wan got raste sé roj beré qeflekî jin zaruk ji nav eşîré (mistan) anîn li wir tevde weka caran kuştin, wan gazî jinikek ji menzela rix xwe kirin û jêre gotin: were vaye ji nav wan kuştiyén zarukek anîne bé tu nasrakî? dema jinik hat û çav léket poré xwe kişand û bi girikî bilind got: keça xweha min e, me ji wan pîrekan re got: ev zaruk çiyé wene? gotin: em û tevaya jinén kurd déyén wanén qewmîne ew jî zarukén mene,

ji wir em derbazî ba duktoran bûn, ku tiştekek reng sor vaye dikelînin me ji wan pirsî ev çiyé wan got: hingiv û xweye-

piştî kelandiné ku bû weke hevîr, hingé dikirin wek: bismarén qalind û liser sênikan dadanîn heya ku zuha dibûn, hingé ew bismarén welé hişk dixistin birînan téde dihe lîyan, sé rojan derman ew bûn, ji bona ku birîn ne axive, piştî wî dermanî-şimaé hingiv, bedîştén kizwanan û rûné nivîşk-di nav hevde di kelandin û dikirin merhema birînan- û péve tişteke dî nebûn, heya li ba wan îspirto jî tunebûn ku pé birînan paqij bikin, duktorén gotî ji tevde ne xwende duktorén kumancî bûn, gotin: dema birîn di axivin hingé em pez serjé dikin û çerm dikişînin ser wé birîné, ew axiftin dadikeve, dema me ew derzîyén (îtalya herib paketi) dane wan, gelek dil geş hûn, ji wan re got: seré derzîyé bixin birîné û dawîya derzîyé lastîk bigivêşin ew derman li alîyé dî der dikeve, birîné bicarek dikewînin nahêlin ku birîn bi axévin, ev kitané dermankirî jî li birîné bipêçin,

Min got: én ku bivan birînan dimirin hûn wan li ku vedîşérin? dibin birûyén xwe-én qalind de awirek tehil li min veda tiliya xwe da ber devé xwe û ber bi min ve hat û hédî got: malava tu dizanî divan ode-én rix me de tevde birîndarin, tu bi dengê bilind pîrsa mirîyan ji min dikî ma raste lo? min got: ka em herin nav birîndaran?

Rahêste fanosa xwe ya piçûk û da pêşîya min, em çûn ku birîdar biçekén xwe ve liser pûşan liser pelén devîyan dirix hevde paldayîne, min dil dawan û got: gelî biran ev fedakarî û payedarî ji her diplomén bilind mezintire ku hûn di berevanîya mafé nejadé xwe-é dil û bedbext de birîndar bûne, ew xûna van birîné we-én pîroze ku li şerefa kurd

ala me reng vedaye, ew ala ku wé liser bané azadiya millet
pél û kél bibe ku rengé xûna we lé vedaye, ma ji vé navdarî
û paya bilind mezintir çi heye û hûné çi bixwazin, çewa ku
em jî livé réne,

ji wir ez birim goristanên servekirî, di şikeftê de şehîd
tevde, di ber hev de dirêjkirî, kefenên wan çekên wan di
serma şikeftê de, laşên wan weke muruvên sax, ruyên wan
te digot bilkî di xwdene, belê wî hawayê zivîngan (1) laşê
wan tehnît kirkbûn, li wir jî min ji giyanê wanê pîroz re got-
ara jêr da û got:

- Hey şehîdên gewre pîroz û peyarî, heya rojek ji dunyayê
bimîne em minetkarê gedê wene, tenê bi mal lê we ji bona
azadiya milletê xwe ê bindest giyanê xwe ê şêrîn feda kiriye,
ma ji vê comerdîyê mezintir û giran buhatir wê çi hebe?
belê we bi xûna xwe dara azadiyê av daye, ew azadiya ku bi
xuna weya pîroz hatiye girtin, li hember tu tiştî nayê firotin,
çewa ku di cedwela mêrxasan de biwê xûna we tarîxa me
reng girtiye, bi van qehremanîyên we di cîhan de milletê we
bi we pesindar û navdar û ser bilind de, hûnin pêşengên me
û we ji mere ev bername - ên dilawerî û fedakarî danîne va
em li ser wê rêzana we rêwingîne, daku em jî liser wan ber-
name - ên nişteman perwerî bigîne nav karwanê we şehîdan,
va em liser rêne divan saetên pêşde hin ji me dibin mêvanên
we daku em jî di wê cedwela mêrxasan de bi were bibin
navdar û pardar, her bijîn fedakarên welat û millet-!

Biwan gotaran ji wê şikefta tarîxî bider ketim giyame
hevalan em ketin rê, êdî sipeydeya sibehê ji roj helat ronahî

vidabûn, em giyane gundê (Markê), êdî rojê tîrêjên xwe - ên zer li kumbetên çiyân vedabûn, cara pêşîn bûn ku me gundek ava ku rêya wan eskerên cengizî pê neketiye, me hawîdor li gund pêça ez û çend siwar em çûne gund, min ji wan re got: çawa kurk hûn ne kuştine? wan got: ji bona vê kara xwey ku li bameye da ku em ji wan re (xwey) derxin, lê piştî demekê girtin ser wan jî tevde kuştin, em ji wir giyane binîya (xwylîn) ji dûr ve hin reş xuya dibûn, min dûrebîn da ber çavê xwe ku panzide sewariyên turkin liser rê ber bi meve tîn, di wê hatinê û çûna mede em giyane ber hev, siwarê wanê pêşîn ba çawîş bûn, dema dît ku nîşanên min yûzbaşîye ji min re silav girt, libawî ku em leşkerên wanin, hevalan bi zimanê dinbilî ji min re gotin: (ma sekî) yanî em çibkin, min got:

- şewa vêrt şima çi vîna - yanî şevê dî we çi dît? bi gotinê ji hawîdor tufeng xistin singên wan tevde di hespan werkirin, min got: rahêjin tufeng û fişengên wan, hespên xwe - ên bêkêr bi ên wan buguhêrin û bikevine rê,

ji wir liser rêya (diyarbekir û licê) em giyane (textê engul) ku dikeve başûr roj helatê gundê min, liwê bilindahîya ku ji başûr û bakur ve nizmanî, me li newala pişt xwe di nav daran de hespên xwe girêdan û ronîştin berê me li rêya (diyarbekir) re, me hew dît eskerek dest vala derket, dema em dîtîn gelek tirsîya min jê pirsî tu ji kuyî got: ez ji (qulpê) me, min teskere girtîye derim mal, min got bira - ê delal metirse em ji bo we xwe didin kuştin, wî got: ji vir xwe bidin alîkî, dema ez hatim sed siwariyên leşkerên turk li ser

(kaniya zerga fisê) peya bûn, wê niho bèn, mi got mizgîna teya xêrê be, em jî li wan digerin berî ku ew lime bigerin,

Min şoreşgîr li herdû milên rê li nav kevir û daristanan bicî kirin, ên dîtir lipêş û jî wan re got: herdû siwarên pêşdar berdîn bila derbaz bin dema piraniya wan giya filan hindavê ku pêşîya wan giya wî kevirê sipî divê serên we liser tufengên we û tiliya we liser linga tufuhgên we be, ku min li fîtîkê da daku hûn bihevê berdîn wan û atlahî medîn ku karibin peya bin, ligor wê rêzanê dema hatin cot cot dirix hevde ketibûnî, rê bi lédana fîtîkê her pêncî tufeng bi hevê teqîyan ew û hespên wan di ser hev re diqulipîn, bê atlahî her yekê sê dest fişek bera wan dan, bi kuştî û birîndaran (63) jî wan li erdê man, bê ku yek tenê jî jime birîn bebe, (35) jî wan di badeka rê de bişûn de vegeşîyan deverek bilind girtin, hevalan xwestin herin wan min ne hêşt, ku herin wan emjî xisarek bidin,

Ji wir me berê xwe da roj ava nav (têrkan) jî wir di roj helatê dicê re berê me kete bakur, nav eşîrên zazên (heremê qerebegan û síwan) başûr roj helatê (palo) û di başûrê (ferat) de dîsa vegeşîyan war geşa xwe, di wê gera (400) kilometirî de em donzide roj man, rojek tenê em bê şer man, her û her di nav me leşker û çetan de şer bûn, divegerê de me (17) şehîd (15) birîndar bi xwere giyandin wargehê, lê jî dijmin zêde - (400) kuştî çêbûn,

Di virde me awa û rêzanên cenga kumandosî da zanîn, wê cenga ku liherderên kurdistan weke wê cara me dest pê bûn, tenê min ew cara xwe da zanîn ku divê bê zanîn ku sêsalan li herderê ew şervanî likarbûn, di danezana tevaya mefrezan de ne pêkarbûm ku ciyê ciyê divir de bidim rohnî kirin, ji milê dî di wê cengdarîya gotî de ez gelek nemam birîndar dîl ketim dest turk, ku di rûpelên pêşde felaketa wê girtinê hepis û îdaman nefîya jin û zarukan bikeve berçav jiwê kuştina tevayî pêve du sazmanên faşîstî li kurdistan danîn ku herdû sazmanên cengîzî ên jêrekî bûn.

MUFETIŞÊ UMÛMÎ Û MENTÎQE QUMANDAN:

Belê ji wan giranî û pîranîyên eskerî ku li tevaya kurdistan dest bi kuştariyek jenosit kiribûn pêve ji bo wê faşîstîyê li her qezan mentîqe qumandan jî hebûn, deverên ku ji ber wan leşkeran rizgar bûbûn wan jî ew diniqandin, çewa ku di pareka pêşde wê bê derpêş kirin ku wan bedkaran çikirine,

MUFETIŞÊ UMÛMÎ, ev fermandarê bi her awayî xweser bi esil erebê (şam) jêre (ibrahîm telî) dihatin gotin: li (diyarbekir) rodinişt liser (16) welayetên (kurdistan) hakimek xweser bûn, ji ber ku jinawî dostika (mustefa kemal) bûn ew payedarîya mezin dabûne wî, muxabiratên wî nakesî li dirêjahî û pehnaîya kurdistan hatibûn belakirin, ji alîkî ji nav welat nişteyman perwer dinqandin, ji milê dî bi sedan malên kurd bi jin zaruk kal û pîran ve, bi peyatî di pêşîya

eskeran de derbazî andolê dikirin, pirên wan birê de dimirin, ên digiyandin anedolê jî bê ku ji wan re alîkariyek bikin, pîrekan karên turkan dikirin pê nan dixwarin zarukên wan jî pars dikirin, bê ku bi anqera bişêwire ew nefî û kuştari bi emrê wî mufetiş an fermandarê xweser pêk dihatin, çewa ku diwan zemanan de hukumek milkî îdarî qezai ne mabûn, tevde bi daxwaza wîve girêdayî bûn,

Ji /1929 - 1933/ mufetişek dî bi esil turk cengizek didûyan jêre (abdîn uzmen) digotin, meruvek dev lalik ji exlaq û xesaisên kesane bê par meruv digotin qey hêj ji hevalên cengiz û teymûr ji (qerequrum) hatiye, wî bedkarî ji muxabiraten gotî pêve tevaya serkar û karmende (1) ên hukumetê liser millet kiribûn casûs, naskir ku bi kuştinê kurd kutah nabe, jibona wan bi nejadîya turk ve bide bişaftin, yanî asimilasyon bike jibo anîna turk pirogiramek jêr xiste kirinê:

Her wekî agahe dayîn û standina wan mufetişan rast bi rast bi mustefa kemal - ve girêdayî bûn, her danezanên we - ên mehê carek didan (kemal) çewa ku ew pirogirama ku di hin deverên kurdistan de kurd rakin û turk bînin şûna wan, mustefa (kemal biwê daxwazê biryar dabûn ku wê daxwazê ligor bernama mufetiş bicî bê, her wekî:

ligor wê pirogirama gotî: ji dor wilayetan, qezan, nehyan, xetên tirênê û dor wargehên jandirman, kurd jiwana hereman rakirin birin anedolê û di şûna wan de muhacirên turkên ku ji (bulgarîya) anîbûn di anîn ciyên wan, liwan deverên gotî ên dibin sîdarîya hukumetê de ji wan re gundên nemûzecî

1 - serkar - ên wêk: walî, qaimeqam, karmende (mamûr - an muwezif)

didan avakirin û di warê abûrî de ji wan re alîkarî dikirin, jê û pêve bigumana ku karibin nejadê kurd biwê pîranî û giraniya wan ve di nav gerîya turk de bidin bişaftin qanûnek dî bi xasê wan muhaciran dane belakirin, ku evbûn:

- çî turkên jiwan muhaciran keça xwe bidana xortek kurd, an xorte turk keçek kurd mehir bikrana, ji herdûyan re perakî pir dihatine dayîn, biwê daxwaza ku ji seykojîya kurd re zêde vajî û qiyas û nisbetek îlmî bixwe ne digirtin, kesek kurd keçên xwe nedane wan û ji wan jî ne birin, piştî wê pîlana felişî, ji wan muhaciran re dane zanîn ku divê di warên civatî de hûn bi gundên dorxwe zêde têkilî bikin, da ku hûn wan hînê zimanê turkî bikin, lê wê avêtina gozê jî liser qubê cî negirt, piştî sê salan (îsmet paşa ê kosmopolît) di gera kurdistan de çû wan gundan û ji wan pîrsî û got:

- gerek we kurdên hawîdorî xwe hînê zimanê turkî kiribe? wan got kurd bi nejadîya xweve zêde hişkin, ji dêla ku em wan hînê zimanê xwe bikin, em tevde hînê zimanê kurdî bûne, hingê (îsmet) ji ber wê rûreşîya xwe ji wan re got: - meruv hînê zimanan bibe ne xirabe, (1)

l - herdû rûpe ên wan muzakeratni ê pêşî û paşî li hembere. tède - ên wê muzakerê di /1956/ de me li roznama (beyrûti hurîyet) bi zimanê erebi da belakirin, ew muzakera ku muxabîratên me ji qelesa wî anîbûn, daku ew sitemkarîyên turk hêne naskirin. lê mexabin daxwaz vajî lime vegerîya. reisê muxabîratê surî ê li (hesîça - mehemed talib) ew roznama goti:

a ku me li (beyrût) didane belakirin pêder pê dixwendin, wî û waliyê (hesîçe-

Belê wî (abdîn uzmen) jiwan bedkarî û faşistîyan pêve, li her derên zemînê kurdistan, li keleh, xirabe bajar, şikeft, beden û pirên - kevinde li asarên kurd digeriyan- dişkênan din, an winda dikrin, ji wan:

- bi bidana diyarbekir de (dewleta dostikî) nivîsarek di kevir de hebûn şikênand, li pira batmanê di başûrê linga roj ava de dîsa nivîsar hebûn ku (sasanîyan) ew pir ava kirine, ewjî şikênand, liser deriyê (şikefta birqlîn) binavê (hûriyên kurd) nivîsarek hebûn çar silim biser hev xistin û pênc sed kaxiz da yekê hilkişîya bi çakûçew jî şikênad, li (zerga fis) asarên (bixûd duqyanos) xudanê hûriyan - ewjî birin, û weke wan li gelek deveran asar winda kirin,

DI JÊNOSÎTA KURD DE MENTÎQE OUMANDAN:

Ew hersî qolordûyên gotî di şonzide wilayetên kurdistan de binavên (mentîqe qumandanî) yan hatin parvekirin, di hin wilayetan de firqe an alahî, li qezan (tabûr) li nahyan (biluk) jibona kuştin, girtin û nefiyê hatin saz kirin, ji hêzên jandirman û çet - ên kurtêlxur pêve, ji şerê şoreşgîran û gundiyên derve pêve li hundurê bajarên mezin jî, kesên ronak û nişteman perwer bê sûcek wan hebe digirtin an dikuştin, jiwan kirde - ên du mentîqe qumandanan ku pê dizanim û di heremê mede bûne bi kurtî didim rohnî kirin, ên tevaya kurdistan jî liwê gorê zanibin ku ew herdû karên bed exlaq evbûn:

li (qeza - ên - licê, pasûr, silîvan û hezro) tevan (bînbaşî

seid seyid) weke (uzmen) reportajek dane şam. di /1962/ de (150) hezar nifûs ji kurdên cizirê girtin, bi dirêjahiya sinorê turkve tevya erazi deh kilometir ji kurd girtin erêb anîn şûna wan û ji wan re gundên bi av û elektrîk dane avakirin,

elî heyder bûn, li (qeza hênê - heya - dicle - eşîrên - têrkan - heya bakurê (diyarbekir) (bînbaşî elî barûd) bûn, liwê gorê li her qeza û nehye - ên kurdistan ew mentiqe qumandanî hebûn, wan herduyan çî kirine ên dîtir jî ne kêmi wan dikirin, dema kirde - ên wan didim zanîn ên tevane,

Belê (elî heyder) li hawîrên gotî her di kuştinê de bûn, lê jibo mîsalê (li qeza pasûr) dema tevaya gundî jin û zarukên (mala têlîaxa) kuştin, jinek dergûş di hembêza wêde dema gule lêket ew zarûka di pêçekê de ji hembêza wê pengizî li erdê ket, - elîheyder - ji neferek esker re got: wê zarukêjî singû bike, ê esker got: qumandan beg zarûkeke piçûke, hingê wî tebayê hov û na kes şeşagir ji ber xwe kişand û xiste serê wê dergûşa bê newa serê wê ji hev bela kir, zivirî ser wî eskerî û got: ey ker kurê kerê ma tu bîr nabî ku ew zarûk mezinbe wê jitere bibe bela?

Di virde meruv ji xwe dipirse: gelo wî binbaşîyê hov dijûn û çepel malbat, dê, bav û zarûkên xwe nedîtibûn? diwê xwendina dirêj de bivê, nevê tiştêk ji exlaq, insaf, ferqa insan û heywan, an jin, mêr, zarûk kal, pîr çîye nas nekiri-bûn? dîsa nizanibûn ku miletê kurd biwê zarûka piçûk û dîya wê re nayê kutah kirin? roja dîtir ew (elî heyder li roj helatê (qeza licê) gundê (zimag) ê şoreşgîr ketin pêşîyê ji leşkerên pêre (63) kuştî û birîndar tevî giraniyên xwe jî li erdê hêştin û revî bi çar pîyan di nav devî û daristanan de xwe giyande hundurê (qeza licê) ji hundurê çarşîyê (17) kesên ku mehkema eskerî berdabûn girtin birin liroj helatê bajêr (newala qij biîvê) bi ser hevde kuştin, di nav wan de

(hacî hesenê eyşoya hemê) umrê wî (83) salibûn, jiwir çû gundê (serdê¹⁾ û (derqam) (57) kesên belengaz û dest vala bi hev ve girêdan û dane ber gulan biser hevde kuştin, di nav wan de pismamek min bi navê (evdulahê emer keya) diranên wî zêr bûn şikênadibûn ji devê wî der xistibûn, piştî çend rojan em rastî wê koma kuştîyan hatin ku gur laşên wan dixun hêj me veşartin,

Dîsa ji eşîrên (zazên sîwan - qasim axa) ê kose - dil kete destê wî xûnxwarê (elî heyder) sitemkarîyên kes nedî biserê wîde anîn, ava kelandî biserê wîde dikirin, tewqên hesin di agirde sor dikirin û bera sitûyê didan, bi kelbetanan diranên wî neynûgên tilî û lingên wî tevde rakirin, di wan felaketan de jêre digotin: qaso tu vî halî çewa dibînî? wî digot: heydo ev halê mêrane lê karê sitemkarîyê kurê qehpane, jêre - olan sus) digotin, wî digot: ma ji mirinê wêdatir çi heye lo? bi wan felaketan liser piştî histirê girêdayî bi xwere li gundan digerlandin, êdî dît ku dimire, li binîya (nêriba axan) ji ser piştî histirê danîn erdê û ji esker re got - tevde rahêjin kevirên piçûk û lêdin heya ku bimre, heya ku kevir liser laşê wî bûne qûç jî wî ji namûsa wî û şerefa kemal re xeber didan, belê milletê kurd bi qehremanîya wan qehremanên xwe ser bilind û xwe bextiyar di bîne, çewa ku min ev agahî dane (qedrî beg cemîl paşa) di muzakeratên xwe de nivîsîne, lê mexabin ne gotiye min ji ku girtiye, tenê mektûba wî li hembere,

wî xûnxuwar û bedkarê (elî heyder) ew faşistî jixwere

1 - serd an serdê - gundê mine

navdarî dizanî, biwê ser germîya xwe ji (general mursel) ê qolorduya heftan a ku li (dîyabekir) xwest ku alahîyek esker bixin bin fermana wî wê bê ser wargeha şoreşê - çiyayê (xañûk) wê bingehê jiwir bide rêj kirin, eger ew xebat bidest nexist hingê her mesûliyên eskerî liser xwe qebûl dike, (mursel paşa) alahîyek esker xiste bin fermana wî û berbi çiyayê (xañûk) ve dihat, ji (diyarbekir) (şewqî beg) xeber şand ku (elî heyder) bi alahîyek esker û hertewir çekên cengdarîve, ji roj helat asîyê (pêçar û kavar) ê de hat enîya şerê we, her wekî agahe libame telefûn nebûn ku ji kîjan alîve leşker bê xeber bidin hev, lewre heremê em lê zêde fireh bûn, lê di şûna (agirê gawe) de teqandina tufengan bûn, ji kîjan aliyê de dijmin bihatana li serê çiya sê tufeng liqêhev dihatin teqandin, hingê me zanî gazî ji wir veye, herkes ber bi wir ve di çûn, ji ber wê çendê li wî heremî sé tufeng liser hev teqandin neşede (mimmû) bûn, rojek me dît ji roj helat aliyê (çiyayê kavare) ew îşaret hate dayîn, em ber bi roj helat ve kişîyan, lê navbera me û qada şer zêdeyî du saet rêve çûn hebûn, hêj em dûr, şer gelek giranbû, lê di şervanîyê de uslûbên me û leşkerên turk ji hevre bero vaji bûn, lewre em bê sekin berapêş û ji herdû kêlekan erd ji wan digrin, di zemanek ne dirêj de me herdû baskên çep û rast deverên bilind tevde ji wan girtin, êdî tevaya esker ji paş û pêş herdû rixan hatibûn pêçanî, ji mile dî bê ku zanibin ew pêçandin jibo êrîşa şevêye, niho wê perda tariya şevê dakeve ser wan, dinav wan çiya û daristanan de wê şoreşgîr dest bi dest bikevin nav komên wan,

belê di êrişa wê şevê de me tabûrek ji wan dîl girtibûn pêji nehesîyan, dema roj hilat dîtin ku em û ew dinav hevde ne, di şerê desta de leşkerên turk û xeynî turk nikarin şerê cen-gawirên kurd bikin, jiwî (3000) leşkerî tenê ji wan (1230) esker rêya revê bi destwan ket, ên ditir tevde dîl ketin destme, çewa ku tevaya giranîyên xweji li erdê hêştin, birastî ji mere alîkarîyek mezin anîn, (elî heyder) di revê de bi tena xwe ji eskerên xweji dûr ketibûn, di nav çiyayên (ka-varê) de ketibûnav goma pez û dibin kurtanê kerê de xwe veşartibûn, berî bigîje goma pez ji tirsan nîşanên xweji avêtibûn, ji wir bi peyatî du rojan heya giya (licê) ji wir çû (diyarbekir) general mursel) ew xiste ber mehkema eskerî,

ji wan bedkarî û sitemkariyên wî (elî heyder) û tevaya mentîqe qumandanîyan) yekjê ew bûn, ku di qadên şer de-dema digiyane ser birîndarên şoresgîr, biwan singûyên kol bi saxîtî serê wan jê dikirin û dibin li gastiñên bajaran dal-diqandin, bigumana ku biwan kirde - ên cengîzî wê miletê kurd bitirsîne, bê ku zanibin biwan kirde - ên na insanî zêdetir agirê dilê kurd gerim dibe û li tolvedanê xwe dişdi-nin, yanî benzîn li agir direşînin,

Biser wan bedkariyên xwede rojek li (diyarbekir) li (mehfela zabitan) bê şerim û fedî biwan kirdeyan pesnê xwe da û got:

di wan sê salan de min ew çend jin û zaruk kal û pîr kuştin û di xaniyan de şewitandin, her wekî ne insan min dikuştin. ji awan bi awakî dilê min biwan ne şewitî her wekî tebayên çolê ên kovî dikujim, min tevaya gundîyan xiste xanîkî du

tebeq liser qeyakî bilind ava kirî⁽¹⁾ û agir berdane xanî bû qîjewîja wan, du xorten umrê wan lidor (13 - 14) salî jiber agir bazdan eywana jor da ku xwe bavêjin lê dema dîtîna ku zêde- penci mitir bilinde,

pêtiyên agir jî wek tewên cawek sor lidorwan vedidan, herdûyan hev û dû hembêz kirin û di nav wê pêtiya agir de liber çevê min winda bûn, hingê jiminre hate xuya kirin ku du insan bûn,

carek diji ew dîtîna bimin re çêbû, dişa weke hercar min tevaya gundîyan bi jin zaruk kal û pîran ve xistin xanîkî yek tebdq agir ber da xanî esker jî bi singûyan li hawîdorê xanî lê ez li hember derî bûn, dişa di nav agirde bû qîjewîja wan kurek lidor (12) de salî da nav derî ku derkeve dema çav limin ket bişûnde vegehiya nav agir, li wir min jixwe pirsî û got: gelo tersa min liba wî jî agir diwartirbûn an hingî milletê kurd enîde ne xwest xwe bavêje bextê dijminê xwe? belê her wekî hate gotin bi kirde - ên van agahim, lê her mentîqe qumendanên gotî ji wan bedkarîyan ne kêmtirbûn,

MENTÎQE QUMANDANÊ HÊNÊ ELÎ BARÛD:

ev (RASPOŦÎN) ê çepel diwan sitemkarî û bedkarîyan de bi awakî dîtîna bûn, kesên xizan û belengaz dikuştin an dişandin wê qesabxana mehkema eskerîya (diyarbekir), lê kesê ku zanibûna libawî mal û pere hene, ên li hundirê bajêr ku

1 - ew xanî li qeza (farqîn) li gundê (hesda) bûn, dikeve çiyayê muqûrê.

tu sũcek wĩ jĩ tunebũn, jẽre manakĩ didĩt ũ digirtin, perekĩ
pir jẽ dixwestin ku malẽ xwe jĩ difirotin ũ didane wĩ, ew
perejĩ divabũn (zẽr) bin, piŝtĩ ew rũt dikirin ber didan, eger
guman bikrana ku hẽj tiŝtek libawĩ maye dĩsa digirtin, ewa
ku li (Hẽnẽ) simsarek wĩ binavẽ (Ahmedẽ kekũr) xayĩnek
hebũn, li hundurẽ bajẽr ũ gundẽn etan jĩ lista navẽ
dewlemendan didane (Elĩ barũd) ew digirtin piŝtĩ lẽdan ũ
felaketẽn mezin, wĩ (simsarĩ) jĩ xwedĩyẽn wan re diŝandin ũ
digotin: bila bẽn min bibĩnin, dema xwediyẽ girtĩ dihatin ba
wĩ, jĩ wan re di gotin: meruvẽ we dibin daran deye, guman
dikim wẽ derxin bibin bikujin, ez gelek liber wĩ dikevim,
herin i malẽ wĩ heye bifroŝin an deyin bikin giyanẽ wĩ riz-
gar bikin, ma eger ew hate kuŝtin wẽ ibke jĩ wĩ malĩ, pere
bĩnin belkĩ em karibin wĩ jĩ dest vĩ zalimĩ derxin, bi wan
sitemkarĩ ũ canbazĩyan li wẽ qezayẽ wĩ pere nehẽŝt teneke -
ẽn zẽran dadigirt ar tilĩ ser wan zẽran rũn digirtin ser ũ
diŝandin (qereman) mala xwe, jĩ wẽ sitemkariyẽ pẽve dest bi
birĩna darẽn gozan kiribũn, hin necar girtibũn jĩ wan re goti-
bũn, gunahẽ we zẽde girane, eger ez we biŝĩnim ber
mehkema eskerĩ, bẽ guman hũn ıdam dibin, liba min jĩ
darẽn gozan textan derxin, ew texte diŝandin lẽ kesẽ nas
nekir kiŝandin welat meruvẽn wĩ necar hebũn, an liku difiro-
tin,

Bivan danezanẽn cengdarĩya kumandosĩ ũ mentiqe
qumandanẽn kuŝtinẽ, ẽdĩ ez jĩ di qada ŝerek de birĩndar li
erdẽ mam ũ ketim dest esker ũ bi dilovaniya zabitek giyan-
dim ber wẽ mehkema bẽ qanũn, ewa divĩ berẽ nehan de
wẽ ew girtin ũ mehkeme bẽne rohnĩ kirin,

Institut kurde de Paris

BIRÊ HEŞTAN

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

QESABXANA ÎDAM Û NEFÎ BI NAVÊ

ISTIQLAL MEHKEMESÎ

Her wekî li birê jor hate naskirin ku di dest pêka (şoreşa şêx seîd) de perlimana turk bi serek wezîriya (FETHÎ UQYAR) biryar nedan ku hukumeta (kemalîstî) bi awakî seferber leşker bişînin qadên şerê şoreşê, ji ber wî qasî (Mustefa kemal bi desteka generalan) ve di/ 28 şubat 1925/ inç, ab li (wisareta - fethî uqyar û perlimanê) çêkirin hukmê eskerî û (Ehkamê urfî) dane îlan kirin, piştî elana hukmê eskerî piştî neh rojan yanî di/ 7 adar 1925/ de binavê (istiqlal mehkeme sî) yek li diyarbakir - ji bona tevaya kurdistan, adîtir li (Anqere) ji bona partî û sîyasiyên turkên dijê xwe, du qesab xane-dan vekirin, ku di wan herdû mehkeman de di nav wan sê salan de zêdeyî (20) hezar îdam û milyûnek kurd ceza û nefî kirin, ew mehkeme ên ku diwan de difa, şahid, taxîr û girtina awûkatan jî tune, çewa ku bê temîz û istînav wan mehkeman tavil ew hukmên îdamê tenfiz dikirin, ji ber ku neh mehan liber wê mehkemê mame heyânî ku dora min hatîye, di wan neh mehan de bi hezaran xatirê mirinê ji min xwestine, jiber wê çendê di jêrde ew dîtînen min ên hepisxanan rweşa mehkîmê û nefiyên anedolê bi awakî kurt û kin têne rohnî kirin, ku tevde dîtîne ne bihîstînin,

Dil ketina min: di enîyek şer de em hatin pêçandin ji her

aliyî ji me gelek birîndar çêbûn ku yek jê ez di nav wan de, heya ku tarîya şevê girte ser me, hingê weke hercar şoresgîran li alîkî esker qelaştin û ji wê pêçandinê derketin, imkan nebûn ku me bi xwe re bibin, em liwê qadê li erdê man. heya ku roj hilat esker daketin nav me, ji berêve digihan birîndaran û serên wan jê dikin, pêda ber bi min ve jî dihatin min fişek xistibûne devê tufengê li erdê li ber min bûn, daku dema bigîne hindava min ezê bera wandim, da ku ew jî bi tufengan bera min din hêsantire ji wê ser birîna bi wan singûyên kol, ez di wê dayîn û sendinê de yûzbaşîyek nêzîgî limin kir, min dest avête tufenga xwe û sekinîm da ku hinekdî jî nêzîg biba, da ku bi dest bixim singê wî dema ji dûr ve ez dîtîm û got: yaho sen bûrade ne ararsen - yanî - tu livir çi digerî? min lê vegran û got: tu li çiyê xwe digerî? dîsa got: xwedê xêr bike, tu ji kuderê xwe birîndarî, hisaban meke, ez di alîkarîya te deme, min ew pîrskirina wî gelek xerîb dît û got: li rehnê min ketîye, got: te grê nedaye? min got: mala te xirabe hemî destmalek sipî ji berîka xwe derxist û ber bi min ve hat, destê min ji tilîya tufengê sist bû, û min ji xwer got: ka ev çikese, hema hat û di ser birînê re gerêda û got: tu min nasnakî? min got: no, wî got: lê çewa min tu ji dûr ve naskirî? min got: te liku ez dîtîme? got: ez ji wan esîrên firqa (hênê) me, we em birin (Darayenî) di wan sê rojên wê rêde ew qencî û dilovanîya ku te ji mere kirîye, eger ez jî ji dê û bavek paqij bim divê ez jî wê qencîyê lite vegeînim, ez bi namûs û şerefa xwe ji tere sond dixum ku heya serê min neyê jêkirin, kesek nikare serê te

jêke, birîna te jî hestî negirtîye wê zû hêsan be, eger wan eskern tu neditîbûna minê tu bikrana xwe û li nav devîyek danyana, berî esker bên ji deftera berîka xwe kaxizek nivîsî û da min û got: li nexweşxanê zibatên duktor bên nav we, bipirse ê ku navê wî (xeyrî be) bide wî.

Esker jibo serjêkirina min hatin wî ji wan re got: vewestin ev ji meye dîl ketîye dest wan bîzor sîleh dane wî û anîne qada şer, rahêjin, du eskeran destên hev girtin ez liser zendê wan berepaş siwar bûm û herdû destên min liser milên wan ez birim yûzbaşî jî di rix min deye, em giyane serê newalê ku otomopîla nexweşxanê liser rê sekinîye, devê xwe xiste goyê yekî nizanim ew jî kurd bûn an jêre çî got: kîlokî xûn bera reha destê min dan, wan jî pirsî ev çî kese? ji wan re jî weke ên dî got, ez jî di nav birîndarên wan de giyame nexweş xana eskerî, ji ber ku çekên min jî ê zabitan û rut-bamina soereşê jî yûzbaşî bûn, êdî ez jî ji wan hatim nas-kirin, birîna min emelî kirin, min ji wî bînbaşîyê duktor navê wî pirsî got (xeyrî) min ew kaxiz da wî, xewnd û bi dilek geş limin nêrî û got: te ew yûzbaşî nasdikirin? min got: no lê wî got: ez jiwê firqa hênê me, te ji mere qencî kirîye; wîgot: tu navê wî dizanî? min got: navê wî (yasîn beg) got: ma navê turkan yasîn. heye? paşê turk tu carî qencîyê bi qencî vedigerînin? kurê min ew kurd de ji xelkên (meraşe) lê tursoke ne wêrabûye ku bêje ez kurdim, lê ez liher derî û liba herkesî dibêjim ez kurdim, zivîrî ser wan xizmetçiyên nexweş xanê û temîya min li wan kir, wan ji min dipirsîyan û digot: ser tebîb meruvê teye? min ji wan re got: no

meruvek ji wuyê xwe ve dilovane, min bawer dikir ku birîna min hêsan bibe wê bi navê zibatên xwe min berdin, lê hêj birîna min qenc hêsan nebû ez ji nav wan derxistim birim sipartim nav girtîyên şoreşê ku tevde xelkên bajar bûn, liwir yanî li (Hênê) ez birim ba alahî qumandan û çend zabitên dî lidor wî li xanyê (Hemdîn beg) tebeqa jor bûn, ji min pirsîn û gotin:

- Rast bêje te çend zibatên weke me kuştine? min got: ne min û ne jî hevalên dî tir jî ne zibat û ne jî neferek eskerên dîl kuştine û na kujin, bi wê bersîfê biser min de bihêrs û qîr got: tu ji mere pesna edaleta kurdên mutewehîş didî? bi hêrs ji wan eskerên bi min re got: bibin, ez li pêşîya wan giyame ser derincê wan eskeran ji para pêkî li piştta min dan, ez di wê dernca kevir de heyane binî gindirîm, destên min jî kelepçe kirî nikaribûm bavêjim derek, li bine derncê li erdê ketim bê heş, li wê hewşê hin eskeran qerewane çê dikirin, bêku kesek ji wan re bêje di tebiyetê wan de werasete her yekê ji wan da daran û hatin ji hawîdor li min didan, tevê ku di wê werbûna dirncê de laşê min ji hev ketî ser û rûyên min di xûnê de mane, çewa ku di berîka min de saet pirtî pirtî bûbûn, ewên bi min re rahêştin min, ez ji bin dar û lingên wan derxistim, wan jî çend sewte limin dan destê wan bi xûnbû destên xwe bi çekên min paqij dikirin û ji min re xeber didan ku çima destê wan bixûn bûye, ez birim di hewşê de derîkî vekirin hundurek tarî, di nav derî de dîsa ji para pê li piştamin dan ez bi dev û rû ketim erdê, dengê hate min û yekê got: kuro ev hesene xistine vî halî?

yekê dî got: ka wî sewîlê avê em ser û çavên wî ji wê xûnê bişon, ez kişandim ser pelasek xwe û herdû ferên solên min dane bin min, ez wê rojê heya roja dî bê heş mam, roja diduyan min çavên xwe vekir ku sê kesin libamin, dido ji (Hundrê bajêr yek ji (gundê babêxê) bûn, min ji wan pirsî çî wexte? gotin esre do vê çaxê tu avêtin vî hundurî, min dest bire berîka xwe da ku binêrim çî wexte, dema min dît ku saet tevde prçe di berîka mindene, parçekî nanê hişik dane min bi ava wî sewîlî min hinek nerim kir û xuwar, lê her çendî ew jî di berîka minde pelixî bûn lé ew qutîya pelixî tije tutûn bûn min vedixwarin, êvarê eskerek çend sominên reş û hişk avêtin nav me, di wê avêtinê de eger liserê me kê ketana wê xûn jê bihatana, me ji payîndar re got: arqedaş tu xêra xwe ji me re vî sewîlê avê dagre da ku em pê van suminan nerim bikin, gelek xerîb ku ji mer av dagirt û da me,

Roja sisîyan berî muxribê em derxistin her dido bev ve kelepçekirin çar eskerên bi singû lidor me wan hevalên bi min re gotin: deh roje em di vir de girtîne zêdeî (40) kesî anîne ba me û êvaran derdixistin dibrin li şikefta roj helatê (Hênê) kuştine, ji sedî sed me jî dibin wê şikeftê didin ber singûyan, min ji wan re got: dema ku we dî berê me dane wê şikeftê emê bazdin jibo tufengan bera medin ji wê kuştina bi singûyan gelek hêsantire, dinav taxê de me dibin, min dît dostek min û hevalê minê nêçîrê (mela Hesênê Hacı Hesên) liber deriyê xwe sekiniye, dema çav limin ket kete hundur û derî li xwe dada, tirsîya ku silav lê bikim wî jî bigrin, em ji bajêr derketin ku tabûrek eskerî li nav mezelan

sekinîne dikin herin (licê), em birin ba wan û sipartin wan, ji wan re gotin: vana hûnê bi xwe re bibin nav giřtîyên (licê) û zerfek ewraqjî dane wan, wê şevê em ketin rê, eger ne ji zor û tirsêbûna min nikaribûn gavek tenê bavêjim, jiber ku hêj birîna min qenc hêsan ne bûbûn, ji aliyê dî biwê lêdan û werkirina dirincikê yekcar ez bê hêz bûbûm, çewa ku birçîme jî, rê jî tevde newal, kaş, derberjêr û herîye, hema gav bi gav min diber giyanê xwe didan, di wê kefte lefta mirinê de, biser de eskeran çar çente - ên xwe jî li piştame kirin, ku tevde tije firax û hûr û mûrên talanê bûn, bi wê hilgirtina wî çente - ê giran êdî mirin liber çavê min wek fîlim xuya dikirin, lewre eger ketim erdê min didin ber singûyan û derin, çewa ku li ba wan adetbûn, min nikaribûn bêjim: ez birîndarim û limin dane, min ji wan re got: erqedaş ez nexweşim, biserda li min dan, min dît yûzbaşîyek bi siwarî li rix me derbaz dibe min got: qumandan beg, ez nexweş nikarim birê ve herim ev çente jî li piştamin kirine, ew ji wan nefe-ran xirab tir, qamçîyek li nav serê min da û got bimeş, xinzîr oşlu,

Biwê na kessanîya wî zabitî êdî di jiyînê de tu hêviya min nema wê gavê an gavgdî dikevim erdê divê li laşêxwe singûyan bijmêrim, min dî çawîşek sinbêlên wî liber bêvila wî tik, nêzîgê rix min bû, min jêre got: çawîş axa ez nexweş nikarim rêve gerim ev çente jî li pišta min kirine, gazî kir û got: xwedîyên çentan kîne zû werin, midî çar esker hatin û jêre silav girtin, ji wan re got: hey ne insan kurên keran zû wan çentan ji pišta wan bigrin, çawîş nêzîgî min bû û got: tu

zazî dizanî? min got: wekete dizanim, bi zazî ji min pirsî û got: tu jikuyî? min got: ji gundê (serdê) li pêşîya meye, cigare vêxist û da min ji çente - ê xwe - ê kêlekê sominek paqij û nerim jî da min, û got: eger henan têkilî biwe kir binavê (silêman çawîş) gazî min bikin, min got: tu jikuyî? got: ez ji (palome),

Diwê giriftariyê de berî roj hilat em giyane (licê) wanên ku malên xwe berdabûn û ji ber kuştina xwe muhacir bûbûn, esker di xaniyên wan de bûn, em birin ba wan eskeran heya ku me bibin girtî xanan, li wir min ji (silêman çawîş) re got: ku ez birîndarim, hersî hevalên min birin (xaniyê bilal efendî) nav girtîyan, lê ez birim hepîsxana kevin ku têde bi navên (hecî hesenê hemo, huseynê nazlîyê û ahmedê huseynê sêwî) sê birîndar ji xelkên wî bajarê (licê) hebûn, her sibehan zabit dihatin wê hepsê li wan didan û pê li birî-nên wan dikrin, ji min jî pirsî min got: ne berîndarim, merhem û hebikên ku (bînbaşî xeyrî beg) dabûn min hêj bi minre mabûn min pê birîna xwe derman dikirin,

Di wir de a hêj diwartir birçîbûnî bûn, ji wan hersî birîndaran re ji malên wan xuwarin dihatin, lê esker dixwarin pêş wan ne dikirin carna nanek an du nanên zuwa didane wan, ez duroj mam yekî ji wan birîndaran niv da min, di wê belengazîyê de êvara roja sisîyan (Mehmed beg û Bira - ê wî ziya beg - ên xerîbê) ji zazên çebeqçûrê ew jî xistine bame, berî ku em xêr hatinê dihev bidin gotin: hesen - libate nan tune? min got: sed mexabin du roje ez jî divirde birçîme, çixare xwestin min got: ew jî nîne, lê yekê birîndar sê

çigare dane me, her wekî tê gotin: nexweş û birîndar dikarin razên lê xwa birçîyan nayê,

Roja dîtir piştî nivro leşkerên her derî bi navê min gazi kirin, ez nikaribûm rast herim derî min bi dîwaran girt xwe giyande nav derî ku diyamin liwîre, yûz başîyek reş jî liwîr sekinîye jimînre got: bi dîya xwere serbest bipeyive, min got: dayê hûn tevde saxin li ku dimînin? got: em li wan pênc malên gundê (Bateyt) in, di nav çiyade rê pênaqeve diwir de ew gund maye, min got: tu çewa gihayî vir? got: jî sibehêve ez liber wî dîwarê hember hepisxanê esker ne dihêştin nêzîg we bibim, ev zabîtê ereb sibehê derbaz bû dît ku ez liwîrim, niho di vegere de disa dît ku ez hêj liwîrim jî min re got: ez sibhê derbaz bûm tu livir bûn, te xêre liwîr yek jî mere bû terciman min got:

qumandan beg kurê min di vir de gritiye min jêre xwarin anîye esker nahêlin ku ez herim bawî bê heye tune, wî got: bimin re were camêr ez anîm, ew zabît liwîr sekinî heya ku dîya min çû.

Diyamin jimere tûrek tije nanê sêlê, satilek divsa tirî jî nêvî û pêve rûnê nivîşk di serde û nêzîgê kîlok tutûn û kaxiz jî anîbûn, jiber wê lêdana (hênê) birîndarî û birçînan min nikaribûn rehêjim bibinm hundur, min gazî (ziyabeg) kir hat li dîya min pirsî (I) û rehêste wan bire hundur, diya minjî di maç kirinêde ruyê min bi histirên xwe şilkir û çû belê dema ew nanê nerim divis Û rûnê nivîşk liberxe me danî bê çiqas

I - di cenga cihanê a pêşinde ew (mehmed beg û ziyabeg) jî welatê xwe muhacir bûbûn li gundê mi-diman liwîr jimînre nasbûn.

me xwe bextiyar û dewlaemen dît tenê Teqdîra hingê dizane, nemaze ew tutûna zer liber me, (mehmed beg) got: hindik bixun hûnê gêj bibin, lê zikê birçî ew gotin qebûl nekir, piştî me têr xwar ew diwarên hepsê lidorme çûn û hatin me serê xwe danî erdê qederek man xweydanek gerim bi me ket: dîsa (mehmed beg) ji mere got: destê xwe li nan bigrin bê carekdî (ruqîye) digîye je me an na, ji wir derin derek dûr an tên kuştin, anjî nan bi dest wanjî dikeve nakeve?

Lê hêj xwarina me kutah nebû, liwir (muftî, kurêwî û hacî evduske rîm) bê mehkeme bi darve kirin û tevaya girtiyên (licê) em rakirin birin (hênê), em (350) kesbûn, em Justin mizgefta mezin berî me jî dused girtî lêbûn, hêj liwir resmên me û navên me girtin, liwir rojê du somin didane me, em mehek liwir jî man, êdî birîna min têde êş nema çewa ku dewsa lêdan û werbûna dirincikê jî her çend reş bûbûn lê di wan de jî êş nema bûn, êvarê xortek ji (darayenî) binavê (Elê uso) ê ku alahî qumandan kuştibûn anîne mizgeftê, ez û ew li reix hev razayî, destê sibe hê du eskeran ez ji xew şiyar kirim û gotin tu derî diyarbekir, ez birim pişt derî ji min pirsîn navê te çîye? min got: hesen - gotin tu (elêuso) yî? min got na, yekê girtî gazî wanj kir û got: êku dirix wîde razayî ewe, ez bi şunde vegerandim ew ji xewê rakirin û jêre gotin: tu derî diyarbekir, ji min re got: nan heye bidî min? min sominek dawî em çûne rûyên hev û birin, sibehê me ji eskeran bihist ku li çarşiyê bi darve kirine, eger navê min ne pirsîyana ez bidarve dikirim û

dawî wê ewjî bidarve kirana,

Du şev paşê me dît efendîkî ji kelepçe pêve lale di situyê wî de zincîrek dirêj li newqa wî pêçandî xistin misgeftê, ne anîn nav me didawîya mizgeftê de dikek xana sofîyan xistin wir û di navbera me û wêde jî nobet hebûn, ez çûme hember ji dûrve min nêrî ku (teyîb alî) ye⁽¹⁾, jiwir gazî min kir û got: hesen - libate nan hebe bigîne min, min jêre sominek ji hevalan girt û çûme hember lê esker nahêle ku herim bawî, min ew somin ji dûrve avête ba wî, ê nobetçî hate min û ez dame ber qundaxa tufengê zêde limin da ji xeberan pêve, lê ez zêde dil geş bûm ku min nan giyande wî, roja dîtir biwê giriftariyê bi peyatî di pêşîya siwariyên esker de birin (diyarbekir) liwir bidarve kirin, jiber ku libatek ji sazmana (Erzerum) bûn,

piştî çend rojan ew girtî tevde emjî rakirin birin (diyarbekir) tevde her dido bi hevve kelemçe kirî û bi peyatî, lidorme dised siwarî hebûn, ji (hênê) heya (diyarbekir (70) kelomitir bûn, li (axwêran) du kes hatin bi qumandan re peyivîn ew çûn, medî (şahîn axa) ê (hênê) ji nav me derxistin kêleka rê û dane ber gulan kuştin, bê ku em zanibin bê çima, didest min de yekê (licî) binavê (uzêrê xodîgan) umrê wî lidor (60) salî hebûn, piştekh lahor⁽²⁾ li piştawî, çawîşek çav birdabûn û digotin: (sofî bû qûşaxî bena wer) yanî digotin: sofî wê piştê bide min - min jêre got: xalê (usêr) bidewî wê

1 - teyîb alî - kurê ismail efendî mutewelî) ji çebeqçûr ewjî di cenga cihanê a pêşinde muhacir li gundê me, lê ev milazim di lêşkerê usmanîde li (iraqê) bûn, carna mezûn dihatin ba bavê xwe,

2 - lahor - bajarek - hindistane - ew pişt liwir dihatin çêkirin.

te bikuje, wî digot: min bi du zêrên zer kiriye çewa bidimwî lo, çawîş her di rixmede ye û jê dixwaze heya ku em bi tevî çek û solan li çemê dicle derbaz kirin meda wê hevraza binîya bedena bajêr, dîsa jê xwest nedawî, çawîş dit ku bikeve nav bajêr êdî nikare jê bigre, xwe vekîsand û pozê tufengê li kêleka (uzêr) da kete erdê ez jî pêve, jiber ku pozê tufengê li nav parsûyan derbaz bûbûn nişanê pêşin li parsûyên wî di alîyan der ne diketin lingê xwe da ser laşê wî û serê tufengê bîzor jê kişand, uzêr di cîde mir pişata wî vekir û derbaz bû, em herdû li erdê zabit hat ji min pirsî min got: ji dove çawîşek jê dixwestin wî neda kuşt û piştawî vekir û çû, destê min jê vekirin, herdû dstên min kelemçe kirin û birin, laşê uzêr liwir ma, em di derê çiya de ketin hundurê bedenê, ji wir derbazî bedena diduyan bûn ku sera hukumetê û keleha amed têdeye dibin siya wan darên ber serayê de li nav wan gul û giyan pal da, zarukên bajêr lidorme kom bûn, ji kanîya şêran ji mere avasar di anîn, her çendî eskeran liwan jî da ku çima ji mere avê tînin lê nikari-bûn wan zarukên kurd bitirsînin, em têr av kirin, medî laşê (uzêrjî) anîn di nav mede danîn daku wîjî bimere teslîm bikin, jibona ku mesûl nebin,

BELÊ a qenc ewbûn ku em pênc saetan li sîya wan daran û nav wê şikahiyê de man diwê betilandina mede tiştêk zêde hêja bûn, hera ku ji mer cî peyda bikin, lewre li hepîsxane mizgeft û kinîsan jî ji girtîyan cî nemabûn, dawî em birin mizgefta (behram paşa) berî mejî gelek lê hebûn! lê mizgeft zêde mezinbûn, me ji wan pirsî gotin: nan nadin me, kesê

meruvên wan li bajêr hebe ji wan re xuwarin tînin, an divê pere bidin eskeran ji wan re binin, ava henefîyan a gerim em vedixun, çend şevan carek hinan bi şev ji nav me dibin dikujin kuda dibin em nizanin.

ÊN ku libajêr meruvên wan hebûn ji wan re xwarin di anîn. lê bê ku hevdû bibinin, dadanîn hewşa mizgeftê û ew dikirin der paşê navên liser kertonan nivîsandî biwan firaşanve girêday gazî dikirin werin nanên xwe bibin, piştî ku xwarinên xweş dibirin, dinav wan xwarinan de ê min jî hebûn, keça xaltika min (horê) ji min re di anîn, lê ji nanê zuha pêve min nedît, piştî ku em birin hepîsxana mezin êdî meruvên me dihatin bame. liwir (horê) hate ba min, min jêre got: mate timîji min re nanê zuha dianîn? wê got: kurê xaltika min welahî min tucar nanê zuha ne aniye ji xuwarinê qenc pêve.

EM lidor sê mehan liwê mizgefta (behram paşa) man, ji nanê zuha û ava henffiyên gerim pêve ji mere xwarin û vexwarinnebûn. biserda jî rojê ducaran lêdan hebûn, sibehan carek û esran careke di ji mere digotin herin avdestxanê, kesê neçûna zêde lê didan, esker ji deriyê mizgeftê heyani avdestxanan zêde - î (50) mitr hebûn li herdû rixan esker sekinandî û dar di destên wan de. dema em ji derî der diketin û diketin bin darên herdû alîyan bi hev re lime didan, dema vedigeriyan dîsa diketin bin wan daran heya diketin hudur. ew lêdan jî dibin nêrevaniya yûz başî debûn, dihatin disekinîn hêj em dikirin der. destê wî diber qayîşê piştî wêde û lime dinêrîn. em nikaribûn liber pencere - ên

mizgeftê li der binêrin hingê lêdanek mezin hebûn.

Girtî her dihatin ba me, ji ba me jî her çend şevan carek piştî muxribê dihatin nav me û navên (15 - 20) kesan dixwendin û digotin: hûn derin (Xarpêt), me jî bawer dikir ku dibn(xarpêt), lê girtiyên nû hatin ba me û gotin: ewên ku ji ba we bişev derdixin wan dibin dikujin, hûn jî vê dizanin? me got: ma em divirde girtî kesek nézigê me nabe heya ku em ji hinan bi bihîzin,

Her wekî hate gotin liber wan pencere - ên mezin dema em rabûna an ronîştana me piştî xwe didane pencarê û rodiniştin, jiber ku her pencerekê eskerê bi tufeng liber sekinan dibûn, dema henan li derdinêrîn wî eskerî tufeng dixistin singê wî û digot: li cîyê xwe bise kine, gazî esker dikir û digot: herin hundur ê li pênan sekinandî binin, dibirin û dixistin bin daran jiwê halî dixistin halekedi, rojek piştî min li pencer ez ronîştîme, eskerê ber pencerê gazî min kir û got: berê xwe bide min, min got: eger bext bidî? sond xwar ku têkilî te nabim, tenê dixwazim tu binêrî bê ew jinika liber dîwarê hember mizgeftê ji sibehê ve liwir û livir dinêre tu nas nakî? dema min nêrî ku (dîya mine), ev pênc mehe ez nedîtime eger tu bihêlî ez bikevim pencerê min bibîne tu qenciyek mezin dikî, got: derkeve, ez derketim dîya min boxçikê çekên min hilda pêş min kir, min ji esker re got: arqedaş pênc mehe ev çek liminin bila wan çekan bavêje ba te di nav hesinên pencerê de bide min, esker got: Lider em hersî eskerên ber van penceran kurdin, çû qozîya dîwar ku zabit xuya nake, bilez ve çek ji dîya min girtin û

giyandin min, min got: tu ji kuyî bira got: ez ji (bedlîsê) me,

Piştî çar şevan em (23) kes navê me xwendin, dema me xatir ji hevalan xwest kî kihatin rûyê min histirên wan dihatin xwar, li ba wan û mejî ku mejî weke - ên dî dibin dikujun, lê me dît berê me dane serayê ew tirsjî ne kêmi wê kuştina derbûn, lewre çî kesê diçûne wê mehkemê îdam an cezabun, berê wan diketin hepisxane - ên anedolê, min li nivîsara ser derî nêrî ku (isticwab) e, min ji hevalan re got: hêj livir nû, nav, umur û ciyê me dipirsin, piştî wan pirsîyarîyan em birin hepis xana mezin, ku di wir de bi hezaran girtî hene,

DIWÊ hepisxana mezin de li hondirê odan cî nemabûn, libin darên wê hewşa mezin insan wek: kerîyên pez li erdê di berhevde radizan, lê li wir rojê du somin didane mi û meruvên me dihatin bame, jiber ku midîrê hepsê û qerdîyan ne esker milkî bûn, liwir diyamin hate ba min, lê dema ku dît ez gelek xira bûme bi minre xeyîdî û got: şîrê min lite ne helalbe xuyaye tu dîtirsî lew tu welê zeif bûyî, - min nikaribûn jêre bêjim: yadê min gelek lêdan û birçîbûnî dîtîye ev pênc mehe min xwarinek gerim ne xwarîye, çewa ku şûştin her tûne, ev pênc mehe ez bi çekên xwe - ê ne şûştîve mame sipîyan ez xwarime, divê havînê de me piyanek avasar ve ne xwarîye,

Li wir jî weke mizgeftê her qefle jibame dibirin xarpêt, jê û pêve her sibehan lîsta navan dihatin xwendin, ên ku dibrin

mehkemê, (1) berdan her tunebûn lê ji %40 îdam ên dîtir ji /DEH/ heya /SED/ salî ceze û dişandin hepîsxane - ên anedolê, dema lîsta navan dihatin xwendin her kes lê guhdar diman bê roja dawîya umrê kê hat, ji mere awqat tune bûn di difaa mede jî şahid an taxîr tunebûn, di wê saetê de ceza an îdam bûn, kijan roj mehkema meye an doza lime dikin çîye me kesê nizanî bûn, li diyarbekir ew qesab xane li (kinîsekî êrmen) bûn, îdam û ceza û nefî her roj bûn, her hevalan jî me xatîrê mirinê an şûna anedolê dixwestin histîrên me herdû alîyan liser rûyên me digindirîn,

ŞÊX SEÎD EFENDÎ û (63) kesên ku pêre liser (pira çar-buhrê) girtibûn ew jî li wir lê ne di nav mede bûn, li nezaretên jor ne dihêştin ku kesek jî me here ba wan an ew bêne ba me, ew gelek rojan dibirin mehkemê, di mehêde nêzîgê (20) carî dibirin, ji wan re jî weke me awqat di difaêde tiştêk nivîsandin tunebûn, tenê intiqamê û derpêş kirina meznatîya xwe ew dibin, ji milê dî jîbo proragandê da ku bê gotin: mehkemekî qanûnîye lewre ew çend mehkema wan dirêj kir, ew îfade - ên (şêx seîd) ligor daxwazên xwe reş û sipî bihev diguhartin di (roznama zeman û akis mecmûesî) de didane bela kirin, (şêx seîd) bixwe ew roz name dix endin û digotin: ev pirs jî me nehatine kirin û mejî ev bersif nedane lê dîsa dinav wan ewrên reşde carna hin îstêrkên rast diçiri-

1 - her wekî hatiye gotin: ew mehkeme jî çend zibatên bê wîdan û ji uslûbê mehakemanjî hêxeber ên wek: elî saîp. ahmed suraya. hezen sezayî - û çendek wekewan ku ji tevaya teşrîh qanûnî bê xeber, ji pîrsa îdamê pêve tiştêk nizanibûn, bê perlîman û serek cumhûr îdam dikirin,

sîn wek: Belê di hin jimarên wan rozmanan de di îfade - ên (şêx seîd) de sual û ciwabên jêr dihatin dîtîn ên ku hingê me biwan not digrtin bi awakî kurt û kin ên jêr bûn -

S - şêx efendî tu dikarî inkar bikî ku pêk inê vê şoreşê ne tuyî?

C - jibo çî û li hember kî ez inkar bikim? ne li pêş û ne jî li paş min di navê de bibînin,

S - ne li pêş û ne li paş dîtina te çî mana digre?

C - yanî berî min bivê doza mafê xweve rabûne û wê piştî minjî pêve rabin heya ku wê daxwazê bidestxin, jiber wê çendê min di vêde bibînin,

S - tu şêx û alimek rûhîyî rijandina xûna misilmanan bi desthev di dîn de durust bûn?

C - hun bi navek siyasî bawerî bi hebûn û mafê me nayînin, çî mertala dîne hûn bi dest xwe digirn? kurd doza huqûqê xwe - ê siyasî û insanî liwe dike biwê daxwazê we dest bi qetilama me kirîye, em diwê berevanîya heqde têne kuştin, lê hûn di sitemkarî têne kuştin, ew pirsra durust û ne durus-tîya dîn divirde çî qiyase?

S - çima hin ji hevalên te ên şoreşgîr vê rastîyê inkar dikin?

C - ewên inkara doza xweya heq dikin, jiwe ditirsin lê ji mehkema millet û tarîxê natirsin,

S - liba me hin agahî hene ku bi pere û fîta ingilîz bivê şoreşê ve rabûyî?

C - kesê tî be bê gotina hinan bixwaze ku avê vexwe, ev sîlehê bê barûd nikare deng bide ji propagandan pêve,

S - çima te û siyasîyên hevalên xwe diwarek civatî diplomasi

de ji hukumeta turk ev heq ne xwest û dest bi şerkir?

C - tu leşkerên me nehatin anedolê, we bi awakî sefer ber leşker kişande şerê me û qetilama jin û zarukan, ji milêdî me ew hêvî dinîzam û exlaqê wede nedît, çewa di peymana lozan de ew edil û insaf hate xuyakirin, jiber wê çendê me û her nejadên sitember naskir ku maf bi girtin ne bxwestin bi dest dikeve,

S - jivan bersifên te dide xuyakirin ku tu jiwan gunahkarîyên xûnrêjî ne poşmanî û pêve mayindeyî,

C - kesek ji rêyek rast û dûrust ve negerîyaye heya ku ez an em jê vegerin,

Biryar: bivan îtîrafan edaleta qanûna turk me biryar bi îdama we (48) gunahkaran da, hûnê wê gumana istiqlala kurd û kurdistan li bin darên sêpayan di nav wan şerîtên sitûyên xwede bibînin,

C - dema hûn me bi îdamê dikujin, lê divê zanibin ku hûn nikarin miletek bikujin an karibin pêşî li doza wan bigrin, ev xûnameye wê ala azadîyê jê reng vegire, - her bijîn qehreman,

DIWÊ MEHKEMA ÎDAMA WAN DE TIŞTÊN

KES NEDÎ ÇÊBÛN WEK:

1 - Diwê biryara îdama (şêx seîd) de (reisê mehkemê - Hesên sezayî) bidevê xwe da zanîn û ji dêla hukumeta turkve bi qelesa xwe qanûnen îttîraf kir ku di turkiye de cugrafî, tarîxî û beşerî mîletê kurd heye ber şerîtê sêpanjî

biwê dozê xwe feda dikin,

2 - Dema (şêx seîd) girtin anîn hepisxana (Diyarbekir) qolordû qumanê qolordûya heftan (Mursel paşa) ji (şêx seîd) secadekî nimêjê û mesînek ji zîv şande hepisxanê, piştî (şêx) hate îdam kirin qerdiyanê hepsê ew (secade û mesîn) jêre birin, ji wan re got: bidin melakî bila ji giyanê wîre (xitmek quranê) bixuyîne,

3 - Wê şeva ku (şêx seîd) tevî (48) kesan bihevre birin derê çiya bin darên sêpayan, (mehmûd beg kurê mustefa begê hênê) ku berî du salan bidozek milkîve sêsal hukum kirî bûn, ew jî bi bavê wî û apêwî salih beg) re birin îdam kirin, libin darê îdamê bavêwî got: ez hêvî dikim hûn min berî kurê min bi darvekin, lê wan kurêwî berîwî bidarve kirin,

4 - Wê êvara ku wan bibin bindarê îdamê esrekî du xezeteçî hatine ba (şêx seîd) û jêre gotin: şêx efendî em hatine jibo wesîyeta te bê mal an pere - ên te libakîne ê kî libateye jibo em binivîsin, (şêx seîd efendî) awirek tehil liwan veda û got: kesî wesîya xwe li dijminê xwe nekirîye, malê min malê miletê mine, milet tevde warisê mine, malê min liba kî hebe ê wane, lê eger rast hûn wî huqûqî nas dikin, dema liser pira (varto) em hatin girtin xurcek zêrên min liser histirê kete destê (osman nûrî paşa) bila bidin zarukên min, çewa ku (90) hezar zêrên minjî di banaqa (sitembol) de ne bidin kurên min, lê ez wêjî jiwe bawer nakim, xêra xwe jî min bi destê xwe daye mal û canê jibo miletê xwe - ê dîl û bin dest feda kirîye, ma jivê xêrê pêve çî bidim?

5 - li meydana derê çiya:

(49) darên îdamê li rêzê daçikandbûn, yeko yeko wek pez davêtin şerîf, tevaya zibat serkarên turk tevde hatibûne temaşê herwekî nû impiratorîya usmanî dabûn çêkirin, eskerên, mûsiqar jî bando lê dixist û digot: gog semanin dîbinde, al bayraxin altin de, yenî tûran biyûdî - (mursel paşa) jî mase danîbûn û li pişt roniştî û (şêx seîd) bir di rix xwe de liser kursî danî destên wî ji kelebçê vekir û jêre got:

- şêx efendî fermo ji tere qelem liser kaxisî tişteq binvîs da ku liba min yadîgar bimîne - şêx seîd - jêre got:

- min daxwaza te naskir neku yadîgara min ji tere daxwaze, lê tu dixwazî nas bikî li hember vî darê îdamê bê kare tişteq binivîse an na? lê ew kesê fermandarîya şoreşek bi destxwe bigre, bîra vê rojê dike, rahêste qelema wî û ev nivîsî:

(kesê sitemkar ew dilreşîya wan perde digre ser heşê wan nikarin bîra exlaq û insanîyetê bibin, heya çavê wan jî kor dike, lê divê hûn zanibin bivê îdama me hûn nikarin pêşî li daxwaza millet bigrin, hûn vê sitemkarîyê li milletê xwe dikin, ku wê çewa ji wan ev intiqam bê girtin, çewa ku me esrek ji milletê xwere goar da)

Berî birina bin darên sêpayan di pencere - ên nezareta raser mede gotarên jêr dan:

1 - Berê (şêx eliyê çanê) derkete ber pencerê bê ku tirsî mirinê lê xuyabike dest bi şîirê melaê (cizîrî) kir û malikên jêr xwend:

«ji derbên turk û hindîyan - dibezim her wekî goyan,
dema ku têne meydanê, - bi dawa tên me yaxmakin
sewaş û fitneyan rakin - bişûr ew têne talanê»

2 - piştî wî ji gonîgê (mehemedê xelîlê xeto: bi bejna xweya bilind û sinbêlên sosinî derkete ber pencerê û got:

- gelî biran ez û tevaya hevalan bivê mirinê xwe dilgeş û bextiyar dibînin, ku me jibona azadiya millet û welatê xwe me gavdaye vê meydana tarîxê û giyane nav karwanê, kolosê xwe - ê bi - rêşî û destmelek hemewî lidorê pêçandî ji pencerê jorde avete nav me û got: ev kom şerefa kurd de bila li bin darên sipayan nekeve bin lingên leşkerên turk kurên cengîz,

3 - piştî hingê (şêx seîd efendî) hate ber pencerê, dît ku çi şîn û matem ketiye nav girtiyan, got: - ya qewim, divê zani-bin ku hûn bi giranî û piranîya xweve mezin û pîrozin, bi kuştina me miletek namire lê digîjin jiyînek serbest û xweser, dîsa divê hûn zanibin û bawer bikin ku bi xûna me û şehîdan dara azadiyê wa tê avdan, em û her xebatkar û fedakar ji kokaweya pîroz hatine vejandi û di jiyînê dene, jêderê hebûna me hûnin warisê vê tune bûnamejî dîsa hûnin, em divê fedakarîya giyanê xwede jibo we ne poşmanin, lê xwe bextiyar dibînin, tenê hêvî û daxwaza me jiwe ku hûn ji me razibin, daku (xudajî) jime razî be, çi kesê ku milletê wan jiwan nerazibe xudajî jiwan ne razîye.

«Ez li hember wî bûm, tilîya xwe ber bi minve îşaret kir û got:

- divê hûn van sitemkarî felaket û serpê hatiyên milletê xwe yeko yeko binivîsin û bispêrên nû hatîyan, ku yek ji uslûbên mentîqa tarîxê û xebata millete belê bivê gotarê vaye em derin neyînê di kurdistanek xweser de ew jiyîn liwe pîroz be»,

ji wan îdaman pêve sê sal û çar mehan li tevaya kurdistan de kuştina tevayî jin zaruk, kal, pîr, nexweş birîndar û şewata gundan bê atlahîbûn, çewa ku jin zaruk kal û pîr weke kerfîyên pez bi peyatî di pêşîya eskeran de ji dûrahîyên wilayetên kurdistan darbazî anedol û teraqya dikirin, liwir bê ku ji wan re alîkarî bikin bera wan kuçe û kolanên welatê xerîb dikirin, bikarên turk, û zarukan pars dikirin, ji wê kuştin û şewata di xanîyan de pêve kuştina di hepsan de, bi gelek awa û felaketên jêr dikuştin, her wekî:

1 - gelek şevan piştî eşa dihatin ji nav me çend dibirin, saetek an dido paşê di anîn, bixûnê vedireşîyan, me ji wan dipirsîn: kuro çi bi serê anîn? digotin: em bi dev û rû xistin, kîsên di wan de qedere pênc kilo ax hebûn li nav piştta me didan, heya ku şewatek digirtin hundurê me em bivê xûna verşîyan hêj em rakirin anîn - dil û gurçikên wan diqetîyan wê şevê an roja dî dimirin,

2 - hinên dîjî biser piştê dixistin, serê wan dinav du singên hesinde raserî wan henefîya avê dilop li nav enîya wan diket piştî saetek her dilopek wek kevirek li enîyawan, dibûn xir xira wan ra dikirin, dîn dibûn da ku îfade jiwan bigrin, hin ji wan çavên wan hewil dibûn, hin ji wan dîn diman, hin dimirin,

3 - hinên dî bi kelbetanan neynûkên tilî û destên wan ra dikirin, di ranên wanjî tevde radikirin bê derman diman dimirin,

4 - hinjî av dikelandin û tev çekan jorde bi serê wan dikrin, dikuştin

5 - hinjî bi hevve girê didan û derpîyên wan tije kevir dikirin
û di golên çemên kûr werdikirin,

belê ji wê kuştariya gundan û şewatê pêve ew felaketên
kes nedijî yek ji teqalîd û xesaisên turkên mengol bûn, çewa
ku diwan sê salan de roj bê îdam tunebûn, li gastînen nav
(diyarbekir û xarpêt) herroj deh û panzide bi darve diman
heya nivro, laşên wanjî ne didane xwedîyên wan da ku zani-
bin mezelê wan li kuye, liwê mehkema şiklî a (diyarbekir)
îdama dukesan ji hevve bero vajî bûn, yek bi qehremanî êdî
bi xiyaneta millet û welat bi destê hevalên xwe dijmin hete
îdamkirin:

Ê QEHREMAN DUKTOR FUAD BÛN:

Ev şehîdê mêrxas û qehreman ji kundên (diyarbekir)
nêzîgî li şoreşê jî ne kiribûn, lê ji ber ku meruvek niştaman
pirwer têkilîya wî bi wê sazmana erzerum) hebûn, ewjî liwê
mehkema şiklî îdam kirin, ligor nîzama turkan kesê îdam
kelebçe kirî sê rojan dihêştin hêj dibirin bin darê îdamê,
roja diduyê biryara îdama duktur qardîyanê hepsê gazî min
kir û got: duktur fuad - te dixwaze, min got: gelo xêre? wî
ji min re got: jina wî hate bawî qedere saetek derî girtî
libawî ma paşê derket û çû wî got: gazî hesen ke, ez çûme
ba wî û min got fermo duktur te çi divê? got: here ba (ezîz
beg) mudurê hepsê jêre bêje: ji duktur re av lazime ku xwe
bişo, ez derketim ba mudîr û jêre got: wî got: şeveke dî
dere bin darê îdamê çike ji şuştinê? min jêre da zanîn ku



Dr-Fûad beg.

jina wî hatibûne bawî guman dibe çûye nivîna xwe lewre dixwaze xwe bişo, biwê bihistinê mudîr bi herdû desan liserê xwe da û got: heywax ku qehremanên welê ji nav me didin rêjkirin⁽¹⁾....

liser darê îdamê gotara wî:

- hey sitemkarên hov û xûnrêj, divê hûn zanibin ku daxwaza heq ji

- hêzên sitem mezintirre, liser van darên sêpayan heya ku di laşê

mede xûna gerim hebe (ALA - KURDISTAN) di dest medeye, piştî ku laşê me sar bû wê ji destê me bikeve, lê nagîje erdê wê hinên dî rahêjin heya ku di nav pêlên bayê kurdistanek xweser de bê daçikandin, bijî miletê kurd û fedakarên azadîxwaz bimrin hukmê faşist - biwê gotarê sitûyêwî xistin şerît bû feda jibo miletê xwe,

Her wekî li rûpela jor (188) de hete gotin: mudîr kaxiz damin ji bo qardîyanan ku (duktor fuad) bibin hemama hepsê jibona xwe bişo, piştî bêhnekî gazî min kir ez çûme hemamê ba wî, got: destê min nagîje pišta min lîv bike, min jêre got: duktur jitere bîst û çar saet maye, ma tê jibo çi xwe lîf û sabûn bikî? diser xwede awir limin veda û got: bawerîya min bite hebûn ku tuyê mêrek qenc bî lê mexabin

1 - liwr dema çûbûn nivîna xwe. ji jina xwerc gotibûn. eger ji tere kurek çêbe. navêwî bike (fuad) piştî bekelorya send bû birewir hengê jêre bêje: kurê min tu ji bavê xwe - ê îdam kirî hatîyî peyda, divê bikevî xwendegahek herbî da ku karibî tola wî hildî - lê turk ew bihistibûn, piştî xwendina dawê û bekelorya send, bi nexewşiyek kete nexewşxanê dukturan derzî lêçûn ew (fuad) ê diduyan kuştin,

ez dibînim tu mirinê tiştekek mêrbîn dibînî, çi ferqa van bîst û çarsaetan û bîst û çar salan heye? liber zeman û felsefa jiyînê, çi tiştê ku jêre bidayet hebe wê jêre nihayetjî hebe, rojên kêr û zêde ne tiştekin mêr bin mêr bijîn mêr bimirin, me vî laşê ku nêzîgê (50) selî xweşî û gişîyan de giyanê min bixweve gerandîye di bin perda zeman de, ma ne divaye ku ez wî paqij bikim û jê xatir bixwazim?....

MIRINA BI REZALET Û XIYANET:

Ev mirî (cemîlê çeto) axayê eşîra pencenar - bûn, di / 1919/ de bi/ must efa kemal) re biratî da girêdan, di /1925/ de ku (şoreşa şêx seîd) bidoza mafê kurd ve rabû, ew (cemîlê çeto, emînê perîxanê, resûlê mehemed û kamil begê ewênî) herçar bi eşîrên xweve bûn çete - ên kirê girtî û di rix leşkerên turk de şerê şoreşgîran dikirin, lê piştî ku sê qolordû leşkerên turk ketin qadên şer û (şêx seîd) jî hate girtin ew çete bûn wek tajîyên bê nêçîr ji dijmin re lazimîya wan nema, ew (cemîlê çeto) li (diyarbekir) diwê mehkema bira - ê xwe - mustefa kemal) de hate îdam kiririn, ku ew xizmeta (kemal) jî mere bûn, çewa ku çar kurên wî jî her yek ji wan panzide sal hepis li bajarê (nigde) liba min ew jî di hepsê de û jin û zarukên wan jî li kuçe û kolanên (nigde) karê turk dikirin jibo nan, (resûlê mehemed û emînê perîxanê) ew jî revîyan sûrî binavê lacîyên şoreşgîr (firansa) ew qebûl kirin, hevalê wan (kamil begê ewênî) tevî qundirota xwarina qolordûya nehan tevde girtibûn serxwe û

zêdeyî (15) de hezar çeteyên wî jî li qadên şerê bûn, ew jî bi mala wîve nefîyê sitenbol) kirin, liwan kuçan geber bû, (feyzî begê pirinc zade) bi wê xiyaneta (lozan) nesekinî, wî jî bi firinde - ên bumbaranên turkre li enîyê şer nivîsar didane bela kirin ku: gelî kurdan ji (şêx seîd) dûrkevin xwe bavêjin hembêza hukumetê, hukumet ji were dilovane - belê bila her xayîn vê dawîya xwe û mehkema ber tarîxa van rûpelan ji bîr nekin!....

JI DIYARBEKIR ÇÛNA XARPÊT AN ROJA MEHŞERÊ?

wê mehkema jenosit di gerim û serma yêde cî diguhartin, havînê - diyarbekir - zêde germe, diçûne (xarpêt) lê zivistanê (xarpêt) zêde sare da diketin (diyarbekir), diwê gohartina cî de lugor lazimîya qesabxana wan diva bûn hin girtîyanjî bixwere bibin, tevî ku li herdû cîyanjî ji hepîsxanan pêve mizgeft û kinîse jî dagirtî bûn, di /27 hezîran 1925/ de ku (şêx seîd) bi (48) ên qumîta merkezîve îdam kirin, êdî destpêka meha tîrmeh - bûn, ji (diyarbekir) çûn (xarpêt) em (400) kesjî lipê wan birin, xarpêt - heye ku ên wir têra îdamê nekin,

Biwê nîzama xisaîsê turk em (400) kes ji (diyarbekir) birin (xarpêt) her dido bihevve kelemçe kirî (200) cot lipê heve di nav mera jî ji ê dawîn heya ê pêşîn şerît di kelemçan re derbaz kirî em kirin wek: gêra dewaran liser benderê, hawî dorême alahîyek siwarî bi şevan li ser û goyên mejî didan,

henekên xwe jî bime dikrin û digotin: ji hev bela bin, biwê hev girêdan û lêdanê de me pê lihev dikirin solên kî ji lingên wan ketin nikaribûn daqol bibe û rahîjê pêxwas diman, dest avên mejî di pantor û şerwalên mede da diketin hundurê solên me û erdê, ji bêhnê pêve diwê germa dûjehîde mêş lime kom dibûn, diwê giftariyê de li navbera (erxênî û meaden) min dît ku hespê min dibin eskerek de çav limin ketîye timî xwe ber bi minve dikişîne, esker her gem li devê wî dide nizane bê çî mesela wî heywanîye, jiber ku ji piçûkahîve min ew xwedî kiribûn û timî pê nêçîra keroşkan dikirin ji min re bûbûn wek havalek, minjî ji hevalê destê xwe re got: dibîni ew hespê mine ez nas kirime timî xwe ber bi min ve dikişîne, hevalê minê ziman dirêj ji esker re got: arqedaş ew hespê vîye lewre ber bi wîve tê, hema tavil berê hesip guharte ser min, wî heywanî serê xwe xiste pişt sutûyê min û fişe fişa wî bûn, ê esker jî her bi şivan lîser û goyên min didan û digotin hespê teye min digot: arqedaş direw dike hesip ne ê mine, her limin didan heya ku ez di xûnêde sor kirim, diwê çûna roja mehşerê û mêzîna xêr û gunahan de kî nexweş an kal nikaribûna rêve here li kêleka rê ew singû dikirin û digindirandin newalê û em derbaz dibûn, di kûrana (meaden) ê de pirîcar em li çem derbazî vî alî û wî aliyî dikirin me tevî solan li avê didan, ne di hêştin ku em mista xwe li avêdin û vexun, di rix avêde pez em didane mixel her meterekî av bi pênc quruşên zîv didane me,

Lê qenc bûn ku dema em ji diyarbekir derxistin dîya mina dilovan xwe giyande min, te digo belkî wê felaketa tîbûna

rê dizane elbek ji kerton tije şekir û xweya leymûn xiste berîka min, dema tî dîbûm min hinek davêtin devê xwe,

Li pêşîya me (xana kêzînê) hebûn ku êvarê liwir em bidana mixel, em êvarê giyane xanê me dît ku di hewşêde kanîyek du çavî av davêje, zêde keyfa me hat ku emê îşev têr avê vexun û dest û rûyên xwe bişon, lê mexabin eskerek bi singû payîn dane ber kanîyê, dîsa bi kirînê tenê ji bo vexwarinê bidest me diketin a dijwar hêj razan bûn, dinav wê toza hewşa xanê de tevde bi hevve girêdayî biser piştta xwe veketin, lê qulaptin û rabûna me dijwar bûn, divabûn ku herdû hevalên rix mejî bimere rabin an, na yekê Tenê bi xwestana raba jî nikaribûn, lewre ew şerîtê kû de nav mere derbaz kirî ketibûn ser singê me, heyanî sibê me istêrkên ezmanan dijimartin, heya ku em tevde bi hevve rabin,

Sibehê em rakirin li roj helatê (gola golcîkê) qederê çar kilometrem ji rê derxestin, liwê çolê liser xendeqên kûr û dirêj wek: pez dane mixel, zabitan xwe dane bin darên godîşan û esker wek gurên herin ser laşan ketin navme, saet, gustil solên kî nû bûna jime girtin, min liser solên xwe çokda daku nebînin solên min qencin jimîn negrin, lê fêde neda sol ji lingên minjî derxistin birin, hinên dîndar gazî dikrin û digotin: gelî biran ev xendeq mezêlê meye eşheda xwe bînin, lê hinên bîr bir gotin: kesek jime eşheda xwe nayîne û bivê mirina teresî me ew bihuşt jî navê, ma ne evên me dikujin bira-ên me-ên musuman xwedîyên eşhedêne? diwê çav nêrîya kuştinê de me dît tevaya esker rabûne li hember xwe dinêrin, mejî nêrî ku du jandirme ên

siwarî bi beztên û di destwande destmalên xwe diweşînin û ber bi meve tîn, hatin liba wan zibatan peya bûn û kaxizek di zerbê de dane wan, piştî bêhnek em jiser wan xendeqan rakirin dîsa anîn serêya xarpêtê û ketin rê, bêku em zanibin çima an karibin bipirsin, lê ew tiştên ku jime girtibûn lime venegerandin, diwê rêde ez mabûme pêxuwaz, di umrê xwede min bê pêlav lingê xwe ndabûn ser erde hundurê malê, dinav wan kevir û zixurên wî çiyayê deve boyîn de, nemaze piştî ku gore qetîyan, bê çi biserê min hat ez ew zeman dikarin zanibin! heya xarpêtê hêj du qûnax rê li pêşîya me hebûn, şeva dî em giyane xana (kevanê) liwê hewşê razana ser piştê û şerît liser singê me, lê/şewat/ û/ pêtiya lingên min hêj diwartir bûn, jiber ku çermê lingên min tevde çiriyayî xûn biser ketibûn, ji min pêve çi kesên pêlavên wan nû bûn weke min biserê wan hat, belê sibehê, dîsa biwan birînên ligan em xistin rê ku hêj (20) kîlomitir (xarpêt) mabûn, her wekî agahe diwî zemanî de li tevaya kurdistan rêyek (çixir-şûse) tunebûn, çewa ku hê otomipîl jî ne giyabûne (kurdistanê, roj li nêzîgê roj ava em giyane rix bexçe-ên xarpetê, liwir dîtinek welê ku heyani vî umrê (76) salîjî hêj ew dîtî liber çavên mine-

Diwê giriftari belengazî toz û gemarame de, ku me tavan êdî ew rojên xweşî û geşî di jiyîne de ji bîra kiribûn, ji mirinê pêve tiştekan di bala mede nema bûn, di nav wê toz û gemarê de çavên me weke golek niv çermişî xuya dikirin, di rix mede xortek umrê wî lidor (22) salan zêde çeleng çekên wî hêj ên zavatiyê şerwalên diyarbekir û piştekan terebzûnîli

piştê, fesa xwe liser porek reş û raserî enîyek pehin nêzîgî birûyên reş û qalîn xuwar kiribûn, jina wîjî hêj ji wî xweşik-tir di umrê wîde, destê xwe tevî bazinên zêr di qolê mêrê xwede a landî dibin siya daran de ketin kuçe-ên bexçan, wek nezerîya (ayniştayîn) min jixwere got: zemanê me û wan herdûyan yeke, lê halat ji hev dûr û cudane, belê diwê felaketa mede ew ditina jiyinê çiqas giran buhabûn ku heya niho wek: filim li ber çavê mine,

Biwan xiyalan û êşa pîyên daye dilêmin em ketin nav bajarê (xarpêt), wek kerîyek pez li xanan bigerînin, em birin hepsixana mezin cî tunebûn, em birin çend mizgeftan tevde tije, em birin kinîsekî zêde mezin ku berî me (900) girtî têde bûn, lê mudîrê wê kinîsê yûz başî (1) biwê bihna genî em derbazî nav hepsîyan nekirin, tenê hinên ku çekên me ne ewçend gemar an çekên paqij di çente-ên nav piştê mede hebûn me guhartin hêj em derbazî hundur kirin, ên dîtir ji nav bajêr nêzîgî (10) pîrekên çekşo anîn tevaya çekan dane wan ku bişon û bînin, xwedîyên wan bê çekên paqij şilfî tazî xistin hundurê xanîkî kinîsê di wir de man tazî heya roja dî di êvarê de çek hatin her kesê heqê wan dan û lixwe kirin hêj xistin nav girtîyan,

Kinîse zêde mezin û bilind serban ji qermîtan girtî, hawîdor (52 pencere-ên mezin li ser wan jî her yek sê pencere li ser wan ew çend bilind, her pencerekî nobetek esker liber bûn, diwê meha tamûz heya Tişrîn hênik bûn, lê

1. Ew yûz başî ji (mardîn) insanek zêde nakes jêre (usman beg) digotin: ji mala nazo bûn, wî û beluka eskerê xwe ewçend dibirin bin darên îdamê,

dema bû serma tevaya caman şikestî bê agir em têde diqefilîn, li kinisê jî av nebûn ku vexun, eskeran hercarê çend teneke di anîn disipartin yekê ji (palo) navê wî (şero) çavek wî kor bi şirikatiya wan eskeran bi tasan difirotin me, tasa wî piçûk bi niv quruşê didane me, lê her em tîbûn, av nebûn ku em dest û rûyên xwe bişon, çewa ku xuwarin jî roj du sominên hişk û reş didane me jê û pêve tiştê tunebûn,

Çewa ku xuwarina wan sominên hişk û zuha diwar bûn, lê mala ser qardîyan (mustefa çewîş) ava, şirîgatîya du girtîyan di nav mede çayxanekî da vekirin, jibo fêda xwe rojê zêde-î (3000) qedeh çayî dinav hezar kesîde dihatin firotin, me somenên xwe pê dixuwarin her wekî belaş bidame ew çend em dilgeş bûn, lê av her tunebûn, dawî bixêra hin roznamevanan evjî bi destme ket:

Rojek ez li navderiyê kinisê çend roznamevan ji sitenbol ewjî xistin navme, xwediyê rozanma (weten-ahmed emîn yalman) û xwediyê roznama (sebîlureşad) bûn, ji min pirsra hemze efendiyê muksî û şêx mehemed şefîq arwasî (1) kirin min ew birin locên jor ba wan, ji hevre nas çûne rûyên hev û ronîştin, pirsra rewşa me kirin, me got: hûn dibînin dunya lime cemidî tevaya şibakan bê cam, dinav vê sermayêde jî av tune, ji milê dî dizanteriyek diwar ketiye nav me ji îdamê behtir pê dimirin, jiber ku tenê du avdest xane ne,

1. Hemze efendî û mehmed şefîq) li-sitenbol-diman. Lê (hemze) filikora (mem û zîn) dabûn çapkirin ku edebek kurd de, (mehmed şefîq) ji (dîwana şîrên mela-ê cizîrî) dabûne çap kirin û di pêş gctinê de gotibûn: min ev xizmet jibo milletê xwe kiriyê. biwan gunahkariyan heryek jiwan bi deh sal hepis hukum kirin.

em ji hev vedigrin, me ew sominên reş di nav wan de ax û pirtokên telîsan hebûn, ji mere gotin: li ba we çayê heye tune? me got: eskeran bi şirîgatiya du girtîyan çayxanekî dane vekirin, gotin: sibehan li xurînî hinek çaya zuha bavê-jin devê xwe û qedehê çaya bê şekir biser de vexun û heya nîvro tiştê nexun wê nava we zuha bike, birastî jî biwê şîreta wan em jiwê mirina dizantirî rizgar bûn, jê û pêve sominek ji rozname vanê wilayeta (xarpêt) re şandin di roznamê de hate bila kirin, sominên me paqij bûn, dîsa wan nivîsarek di rêya wî midîrê çepel û dijûn de dane (mehkemê) ku çewa (1200) insan li girtî xanekî bé av bin, biwê gilîya wan li hewşa kinîsê ji mer du bîr hatin vekirin, em jî wê piyana (şero ê kor) xilas bûn, çewa hatiye gotin: yek hêjaye hezarî, hezar ne hêjaye bi yekê.

liwer me ji wan girtîyan pirsî û got: berî du meh û sê mehan ji (diyarbekir) çend qefle hevalên me ji bame rakirin û ji wan re gotin hûn derin (xarpêt) em kesek livir nabînin? wan got: ji we pêve tu girtî ji (diyarbekir) nehatine vir, ji vir jî hin radikirin ji wan re jî digotin: hûnê herin mehkema (diyarbekir) me anîn wir? me got: no gotin: ma ji vêre jî pirs kirin divaye ew tevde hatine kuştin,

Li wir jî weke hepîsxana (Amed) umrê me ji mehan û salan ketibûn rojan, her sibehan lîsta navan dihatin xwendin, yanî lîsta mirinê, di locên jor de raserî me dihatin xwendin, çî kesên ku xwarin li ber bûna dema lîste dihatin xwendin dest ji wê xwarinê dikişandin, heya ku xwediyên navan dibirin hêj dixwarin û digotin heya sibehê (xuda mezin e) yanî

wê şev û rojê ji xwe re umrek dijmartin, ji ber ku kesek nizanibûn ku wê çî dozê lê bikin, çuyîn jî ew car bû, di wê carê de şahîd difa an girtina awqatan ji me re tune bûn, di wê sa'etê de an ceze îdam bûn, bi uslûbek mehkeman bi şahîd dozek nivîsandî liser kesî tune bûn, teva ya şoreşgîran bi yek dozê ve hatibûn girtin, çîma hin îdam û ceza dibûn ev bûn, di mehkemê de ji ewraqan zêdetir li wan dibûne nêrevan, çî kesê ku peyakî berçav an di peyvê de zana xuya bikirana ew îdam dikirin, ên ku didîtin weznek wî é siyafî nîne lê cengawir dide xuyakirin ew ceza dikirin, ez çar mehan li (Diyarbekir) û pénc mehan (li xarpét) mam ji çar kesan péve kesek berneda, tevî ku di wan neh mehan de zêde î (5000) îdam û zêde î (20,000) bi cezayên ji (10-25-100) salî ceza û dişandine hepşên anedollé, bi peyatî ji (erzerum, qarîs, wan, hekarî, mûş' bedlîs, sérté, diyarbekir û bajarên dîtir dibin sitenbol, anqare, teraqya, qestemonî, denizlî, izmîr ûr wekvan, zêdeyî mehek bi peyatî di pêşîya esker de dibin, her wekî li diyarbekir hate gotin: li (xarpét) jî du kesên îdamé ji hev re vajî yek jé jinek bi qehremanî û efendîtî ê dîtir bi rezalet li ser da ré sépayé giyané xwe siparte sergoya tarîxé-yeké jî liber miriné hinek kémanî anî serxwe ligor teqalîdén kurd, ku di pêş de wê béne zanîn!.

Ji wanén ku kémanî anî ser xwe (HEQQÎ BEGE LICI) di şoreşé de amirhézé rojhelaté (dicle) bûn, ji mîrekén (licé-kuré mehmûd beg) meruvek mér ne tirsok bû jî, li (xarpét) biryara îdama wî dan, ligor nîzama Turk én îdam kirî sé rojan kelemçe kirî di jêr zemîna wê kinîsé de dihéştin û şeva

sisîyan di ber banga sihé de dibirin bi dar ve dikirin, (Heqqî beg) tevî heft kesên dîtir di wê jêr zemîné de bûn, serqerdîyan gazî min û got (Heqqî beg) te dixwaze, ez çûme ba wan heqqî beg ji min re got: here ji (Hesen xeyrî beg) re (1) bêje bila bi navê min birûskek bide (Mustefa kemal) ew min nas dike, dema li (Diyarbekir) bûn çend caran bûye mévanê me, jêre bi nivîse ezê gundê xwe bifiroşim ji orduya Turk re tiyarekî bikirin bila îdama min wergerînin ceza- ez vegerîyam min ji (Hesen xeyrî beg) re daxwaz got, wî got: xwezî ev kémanî ne anîyana serxwe, niho ez ne nivîsin liber kirinê dilê wî dimîne, weke min (Mustefa Kemal) nasnake, ev meruv li ba wî dost exalq wicdan û insanetî nîne, birûsk da piştî du rojan di rêya mehkemê de bersif lê vegarand û got: belê ez te nas dikim min nanê we jî bi xizmetek ihtîram xwarîye, lê kesê liber qanûn û nîzama Turk rabe ew ne nas û dostê min e, ji milê dî eger nizanî divê zanibî ku Turk dijminê xwe bi mal naguhêre,

Piştî çend rojan navê (Hesen xeyrî, keko û beledîye reîsê çimiş gezek) Mehmed zekî- hersî birin mehkemê, medî disa vegerîyane ba me, me jê pirsî got: piştî îfade-én dirêj tişteke ji me re negotin em vegerandin, me tişteke xerîb dît, lewre

1. Hesen xeyrî beg) ji xelkên (Dêrsimê) di /1919/ ande (mustefa kemal) dema li (Diyarbekir) leşkerê kurd da teşkil kirin. qumandanê wan leşkeran hingê (hesen xeyrî) bûn, dema (şêx serif) xarpêt vegirt jêre got: xeyrî beg-bi min re were em herin ba (seyîd riza) jibo rêya (sêwas û melatî bigrin ji leşker ji anedolê negîje qada me. pêre neçû-wê naçû-wê neçûna wî firset da dijmin ku wî bi nezaran birayên wî idam bikin wek cezîrî gotiye: ta li ku hate firset muhlet jê re heram e. min umrê nûh nîne ku saqî were bilez xweş.

kesek bê îdam an ceza ji mehkemê ve negerîyaye ji vê carê, nêzîgê roj ava me di mudîrê hepsê (usman) ne beg gazî herşiyar kir, piştî birin derîyê kenîsê hate girtin, sominên me di qula pencerki de dane me, me pirsî ev çi dawaye-mustefa çawîş) got: hersî îdamkirî me xistin bin kinîsê wê îşev wan bibin bi darv kin, çewa ku bakurê (xarpêt) jî esker kişandin wan hawîran, jiber ku li sînore (Dêrsim) bûn, lew ji wan re negotin îdam û du şev jî nehêştin di wê şevê de hersî birin bi darvekirin,

ÎDAMA MIRÎYAN

Ev îdama gelek xerîb û kes nedî (ZULFEQAR AXAYÊ DEŞTA GEWRAN) bûn, di xwedina wan liste-ên navan de navê wî û çendekan hate xwedîn me got çend roje bê derman nexweş bûn şeva di mirîye vaye li erdê, ên di birin mehkemê ji wan heşt tevî (zulfeqar axa) îdam kirin, anîn xistin bin kinîsê, rahiştin laşê (zulfeqar axa jî) mirî birin li nav wan danîn heya şeva sisîyan ew jî bi wan re bi darevekirin,

MIRIN BI TERESÎ DI SERGOYA TARIXÊ DE VEŞARTÎ

Ev kesê ji her awayê qewmîyeta kurd bê par(qedri efendî) ji (paxir maden) ê bûn, ew jî wek rovîyek bikeve nav şêran li wê mehkema eskerîya (xarpêt) bi îdama wî hate biryar dayîn, dema birin bin darên sêpayan berî ku sitûyê wî bixin şerît, ji dêla ku weke şehîdên di ew jî gotinek nişteman perwerî an tarîxî bi bêje got: her bijî cumhûrîyeta Turk û bijî

ẖazî Mustefa Kemal Paşa û şerît xistin sitûyê wî weke kûçike ku beledî dikuje,

Çima ku mektûba wî bi (şêx seîd) re hatibûn girtin, her çiqas me jê re digot: qedrî ne efendî ma (şêx seîd) mekûba te da Turk? ew bi xwe hate girtin, ji mektûba te pêve tevaya nivîsarên qumîta şoreşê pêrê hatin girtin, ma gunahê wî çiyê û şoreşê çiyê? her razî ne dibûn, ji ber wê çendê ew şermezariya tarîxê weke (duktor şukrî mehemed sekban) qebûl kir ku ew xayîn jî ji (maden) bûn.

DI TARÎXA ŞOREŞGÎRAN DE QEHREMANÎYA JINEK KURD:

Her wekî hate gotin: bi navê mehkemê her roj îdam ji (5-20) hebûn kuşariya nav welat rojê bi sedan bûn, weke caran rojek di sipeydeya sibê de (18) kes birin li gastîna rix mizgeftê bin darê sêpayan, di nav wan de şoreşgîrek jandirme ji kurdên cbeqçûrê bi çekê jandirme hebûn, de wan bidarve dikin, ê candirme dibîne esker lê derbaz dibin dinavwande bişûnde dimîne, wî jî xwe dijmêrin, jiber ku hêj tariye lê varnaqilin ku destên wî li piştî kelemçe kirîne, ew jî hêdî hêdî ji nav wan der dikeve li kuçê dizivire, lê kuçe dirêj û raste dema lê varqilîm xilas nabe her xwe dide derîyan, derîyek vekirî rast tê dikeve hundur û bi diranên xwe ji para derî çanqil dike û dere dikeve kulîna malikê, piştî esker (17) kesan bi Jarve dikin hêj dibînin ku ê (18)

deyan ne xuyaye, lî wê kuçê dinêrin heya serê tiştêk xuya nake, derîyên hewşan jî dipelînin wê şefeqa sibê tev de girtî her kes di xwedene, rê nebirin ser,

Sibehê jinika xwedîyê malê dere kulînê da ku ji zarukên xwe re xwarînê çêke, dibîne meruvek têdeye jinik vedicinçe tu kiyî di vir de? dibêje: xuşkê ez ne dizim, li ciyê xwe bisekine û goh bide min û paşê tu zanî min ji bin darê îdamê bazdaye, derîyê we vekirî mabûn ez ketim hundur û min derî dada û bi diranên xwe çanqilkir, kesek ez nedîme eger zanibûna ez ketime vir wê bihatana ez bigirtama, lê çewa ku em kurd dibêjin: şêr ku şêr e çi jim e çi mêr e-hêvî dikim tu nebî sebebê kuştine min, van kelemçan ji destê min bişkîne û di vir de min bi parêze heya dunya bibe tari ezê derkevin û herim, jinik xwenda pêre beklorya heye dewlemend xwedî gund mêre wê jî ne li mal roja berê çûye gund jê re dibêje bira-ê delal metirse tu serçavê xweha xwe hatî, ma ne tu jibona namûs û şerefa me hatî îdam kirin, bi çakûç kelemçe-ên wî dişkîne jinika cîranê wan jina serkarek Turk e di ser dîwarê nevbera xwe û wê hewşê re tiştêk ji cîrana xwe wê bixwaze, dibîne jinik li navderîyê kulînê ronîstî çakuç di dest de şingîna hesin tê û mêrek li pêşîya wê xuya dike, hema bi şûn de vedigere, piştî muxribê ê îdamkirî derket çû tufeng jiba hin dostên xwe bi destxist û çû li serêya wan herdû xayînen ku di mehkemê de liwê şehadetî dabûn, divegerê de hatin ser wî herdûjî kuştin û giya nav şoreşgîran, em vegeirî ser jinika Turk:

Ya qenc ew bûn ku mêrê jinika Turk nîvro nehate mal, li

ba hevalek evalek xwe firavîn xwaribûn û li qehwê mabûn heya saet heştê şevê hêj tê mal, jina wî jêre dibêje: ev jinika cîrana me ez pê bawerbûm ku bibe nav komek mêrên xerîp jê ne ditirsîyam, lewre jinek mêrkanî zana û serbest, lê mexabin du roje mêrê wê çûye gund, di ser dîwar re min firaxek jê dixwestin, min dî li nav deriyê kulînê şingîya hesin tê, min nêrî ku serê peyakî di pêş wê de xuyaye ez bi şûn de vegeyîyam û min gelek xerîb dît mêrê wê ji cî bilind bû û got: te çi xiyamet ber bi xwe ve anî: vê siba çû jibin darê îdamê yek revîyaye û ew çend gerîyan ne dîtîn, ew bûye û ew şingîna hesin jinikê kelemçe-ên wî şikênan dine, sibehê tavil xeber da hukumetê ew jinika qehreman girtin,

Me dît jinikek bi çekên medenî anîn xistin xaniyê keşe, me ji mustefa çawîş pirsî got: ewên me birin îdamê di nav wan de ê (jandirme) revîya ew çend em gerîyan me nedît, mebêj ketîye hewşa vê jinikê ew veşartîye heya ku bûye êvar derketîye û çûye, jina muwezif dîtîye û şahadetî lê daye ku eve girtine divê di şûna wî de ev bê îdamkiein, roja dî me dît efendîkî hate bawê û pêre şer dikirin, me got: ew kiyê? gotin mêrê wê ye, jêre digot: tu mêrikê îdam kirî veşêrê û rizgar bikî û xwe bixî şûna wî ma ji vê girantir çi bi serê te û min bê lê? wê digot:

- Ya camêr ma ez ketime nav şoresgîran û min şerê hukumetê kirîye? an li hember te min qebahetek kirîye, an min ew ji bin darê îdamê revandîye,? bê hayî min ketîye hundur, sibehê min dît xwe avête dest û lingê min û got: xweha min kesek nedîye ez ketime vir tue nebî sebêbê qetla min,

minê çewa biçûna xeber bidana û ew bidana girtin? ma di dilovanî û insanîyetê de jin û mêr jihev têne cudakirin, çike bûye çuye eger tu ji xwe ditirsî bikevî belamin, min berde da ku tu xilas bî,

Lê mêrik tişteke xirab têde nedîtibûn û ji milê dî zarûkên wê hebûn wê çewa jina xwe berdana? ketibûn navbera-xelil û celîl-her roj carek dihatin ba wê her rûyê wî tehil û xeydan bûn, çend car jinik birin mehkemê, ji mêrê xwe re got: navbera vir sînemayê ku mehkeme lêye dûre ji min re cotek potînên mêran bîne hêsantir re, bê ku mêrik zanibe çi daxwaze jê re potîn ligor wê anîn, bi wan diçûne mekemê, mudeî am (elî saîb an kel beg) jê pirsî û got:

- Tu jinek medenî xwenda û delemmend, te çima potîne mêran pê kirîne, tu kari ji min re vê bidî zanîn?

- Ev tişteke xasê min e, ne divayê pirskirina te ye?

- Wî got: ez dixwazim zanibim daxwaz jê çiyê? wê got:

- Ezê wî kederî ji dilê te derxim an zêdetir bikim, lê ne ji te re ji vanên ku di kursiyên sînemayê de dagirtî û gohdar ji millet re dibêjim: evder bûye sahekî cihê xûna şehîdan, sahekî tarîxî û mûqedes e min layîq nedît ku lingê jinan bikevim vê saha pîroz, te niho naskir an na? wî got:

- Belê min berê hin guman kiribûn lewre ji te pirsî, livir te xweş da zanîn ku ne bi atifî lê te bi armancek siyasî ê îdamkirî daye revandin, bi van îfade-ê te mehkemê bi îdama te biryar da ku di şûna wî de wê sitûyê te bekeve wî şerîfî û li ser darê îdamê tuyê wê qudsîyetê bibînî wê got: mehkeme her bê usûlên qanûniye, lê dema ku hinek fikir bi we re

hebe bawerim ku nikarin min bi darvekin hingê (Ahmed Sureya) got: - gazî jinek pîrikî bikin divê bê muayenkirin, piştî muayenê pîrikê bi wan de zanîn ku jinik bidu giyanane, ew hukmê îdamê kirin sed sal û şandin zindanên anedolê, (1) lê di/16 gulan 1928/ de bi efuya tevayî ew ji bi payedari û navdarîyek qehremanê vegebiya walat ba zarukên xwe.

MEHKEMA ZARÛKÊN BER PEZ:

Ji ber ku ji dest pêka/1900/ ve ji bona berevaniya girtina mafê xwe nejadî û tarîxî her û her bi şoreşên xûndar û maldar ve rabûne û radibin, milletê kurd di wan alozî û giriftariyên kuştin û wêran kirina welat de hatine perwerde kirin, ew felaketên jor gotî ji wan re wek: komîdyakî diramî didan xuya kirin, jiber wê çend zarûkan jî henekên xwe bi wê sêrka mehkema Turk dikirin, her wekî: hinga em li wê kinîsa xarpêt de girtî, li (kêzîna) binîya (xarpêt) zarûkên ber pez di listikê de mehkeme çê kiribûn, di wê mehkemê de, ji hevalên xwe yekê binavê (şêx seîd) biryara îdama wî didin, werîsek davêjin darê da ku bi henek situyê wî bixin helbuqa werîs û dîsa dayînin, lê rast hatinek ecêb situyê wî dixin werîs û gur dikeve nav pezê wan, bê ku situyê wî ji werîs derxin hêj herin gur, wî dihêlin û berbi gurve dibezin, heya vedigerin ku ew zarukê hevalê wan mirîye, ev buyer me ji wan eskeran û paşê di rozanman de jî hate bela kirin,

1. Ji dosiya mehkema wê jinika Qehreman jimar (1798) hû.

MÊR-XASIYA MISTOYÊ REWTECANÎ:

(REWTECAN) navê gundek eşîra (yexkîg) li başûrê (royê ferat) li (cebeqçûr), çewa ku hate gotin: gund şewitî (Musto) di nav çiya de ji jin û zarukên xwe re li devê newalek koxek çê kirî û têde bûn, zivistan navek berf li erdê, hin çete - ên xayin esker birin ser wê koxa wî, dane ber tufeng û otomatikan, Musto qayîşê tufengê dixê ser piştê xwe û tufeng liber sing û nav lingên wî de, pelasek bi serxwe de dike û serê xwe bin berfê û bi çarpîyan bi dibin berfê re bi erdê re dere heya digîje newalê, li wir di nizmaniya newalê de li wan dizivire, li hember koxika xwe deverek bilind digre, surma tufenga xwe ji berfê paqîj dike, dibîne ku esker bi qumandanê xwe ve liser koxa wî kom bûn, laşên jin û zarukên wî kişandine serberfê û li laşê wî digerin, berê qumandan dike amanc tê kuştin, esker jî nizanin bê gule ji ku ve têne wan, lidor koxê neha jî wan di kuje laşê wan jî dide rix zarukên xwe.

Lê her wekî agahe dema qumandan û mîlazim hatin kuştin eskerê bê emir herkes di hindava xwe de revîya, mosto ê dilbirîm weke gurek har li nav newal û deristanan dabûn ser piştê wan, esker bi wan potînan di nav berfê de diçikîyan Musto dest bi dest dixistin piştê wan nikaribûn lê vegezin, pîrî car bi gulekî dido sisê di kuştin, (45) ji wan kuştin û vegerîya ser koxa xwe jin û zarukên xwe kişandin hundurê koxê û bi ser wan de hilweşand ji wan re kir gor da ku gur laşê wan nexun û giya nav şoreşgîran bi ser bilindî û dil birîni,



FEDAKARÎYA KURDEKÎ ÇIYAYÊ MELATO:

Çiyayê (melato) dikeve roj avayê (xerzan) ku jêre mîrê çiyân tê gotin, esker dere gundê (xutê), du kurên yekê umrê wan (4-5) salî digre ji bavê wan re dibêje: tu ciyê (evdurehman axa) pêş me nekî ezê herdû kurên te bikujim, wî got: qumandan beg ma ez zanim ciyê wî çiya mezin û têdeye, dema hûn nikaribin bibînin ma ezê çewa karibim, sîtilek av da ser agir heya ku av keliya kurek wî avête nav wê ava kelandî, dîsa got tu pêş min nekî ezê êdî jî bavêjim nav wê ava kelandî, yekê gundî ji ber esker xwe veşartibûn di hundirê xwe de bûn, bihîst hema bi lez ve giya ba qumandan û jê re got: gumandan beg te çima zarukê bê gunah avête nav vê ava kelandî tê kir helîse!? were ezê ciyê evdurehman axa pêş te kim, dê pêşiyê qumandan û seker li pê wî birin ser zinarek bilind û got: qumandan beg tu tenê were ezê şikeftê pêş tekim, qumandan giyan de ser zinarek zêdeî (200) mitir bilind jêre got: tu di rix min de hinek xwe xwar bike ez pêş te kim, dema qumandan xwe da rix wî û bi alîkî xwe xwar kir mêrik dest di qayîşê piştê qumandan re derbaz kir û got: keremke ev dere ha, xwe û qumandan tê werkir da kuştin, ma ji vê fedakarîyê mezintir çi heye? lê sed mixabin navê wî min nasnekir, livir dîsa em vegerin mehkema(xarpêt),

ÎDAMA TÛMASÊ ERMENÎ:

Tûmas-ermenê (palo) bû, ew jî di nav eşîra kurdên ku tê de ketibûn soreşê, ji (palo) (60) esîrên leşkerên Turk dibin

(çebeqçûr), li gundek dibin mêvan, esîr tev de xanîkî de û -tûmas) liber wan payînê dike, keya ê gund ji wa re nan çêdike, dibêjin çendek livir bin herin nan bixun û vegerin êm dî jî herin bixun, -Tûmas-dibêje: tevde herin ezê tenê li ber wan bimînim dema hûn hatin ezê herim, derin li ser nan rodinî dibînin dengê tufengan hat, dibêjin derî li wan girtî û Tûmas ji derve liber derî gelo revîyan çewa bû? dibezin tên dibînin ku tûmas di nav derî de û ew dane ber gulan nêzîgê çilî kuştî û birîndar ji wan çê kirine, jê re dibejin: kuro çima te vana kuştine? ma tu nizanî ku esîr nayên kuştin kesê wan bikuje divê ew jî bê kuştin, Tûmas dibêje:

Ez liber we me, ez livê firsetê digerîyam da ku Turkan bikujim, min jibo Tola wan Ermanên (1915) dan hildaye, hûn min bikujin jî ne xeme, xwezî her Ermenek çil ji Turk bikuştana bila ew jî bihatana kuştin, bi wê kirdeyê Tûmas digînin ba axayê wî, da ku wî bikujin, axa dibaje:

-Tûmas-ligor xesaisê me û emrê qiyada şoreşê divê em te bikujin lê em ditirsin ku bê gotin: Ermen bûn lewre kuştin, ev jî hetaketî ye, te zêde ne insanî û bê wicdanî kirîye lê ji ber wê gotinê ez te nakujim, belê ew Tûmas dawî kete dest eskerên Turk, bi wî gunahê wî nizanibûn, an na wê di ci de bikuştana, ew jî li wê kinîsa -xarpêt- li ba me girtî wî ji me re buyera xwe gotibûn, di mehkemê de bi wî gunahî agah bûn ew jî îdam kirin û anîn di nav çend şoreşgîran de xistin jêre zemîna biniya wê kinîsê, wê şeva ku wê sibehê wan bibin bi darên sêpayan, piştî eşa ji eskerên qardîyan xwestibûn ku wî derxin bame xatir ji me bixwaze, me dî Tûmas

anîn nav derîyê kinîsê û got: gelfi hevalan îşev ez derim lê hevalên dî şeveke dî dirin, daxwaza min û hatine min ji we eve: hêvî dikim hûnê min jî wek ên xwe dema ez birim ezê gazî wekîm, li pê min jî divê hûn azan bixunin, neku ez bûme misilman no, lê bira min ji we cuda nebînin û keyfa wan li min neyê,

Bi wê daxwaza -Tumas- di nav -melan- de guft û go çêbû, hinan gotin çî divaye em li bê -Ermenek azan bixunin, ji wan (mela yûsifê kêzîne) got: ê ku li pê Tûmas azan bide ez im, sibehê dengê -Tûmas- ji eywanê hat û got: gelfi hevalan ez çûm bi xatirê we, bi gotina wî mela yûsif azan xwend, dengê Tûmas het got: niho ji vê mirinê re merheba, lê sibehê midîrê hepsê (yûzbaşî osman beg) zêde li (mela yûsuf) da, çewa ku çiqas şehîd dibirin wan mela-ên girtî lipê wan azan dixwendin û wî midîrê çepel li wan didan jî nikarîbûn wan bide sekinandin, belê li (Diyarbekir û xarpet) her roj deh û panzide li nav sahe-ên bajêr weke pez bidar ve di man heyanî nivro, di rixwan de jî seriyên jêkirî ên ku li gundan esker ew kuştine dalqandî û liser pîr û rêyên mezin bi rêzê dadanîn, wê sitem kariya cengîzî sêsal û çar mehan dirêj kir, ligor danezanên xezete ên Turk (700) hezar insan li kurdistan hatin kuştin ku ji %70 jin û zaruk kal û pîrbûn,

HESÊ HUS MÊRÊ KOZIKA PÊŞÎN:

(Hesê hus) ji eşîra (emerê faro) dikeve bakurê (qeza licê) çiyên wan zêde asê ker histir nikarin lê bigerin, derin bi piş-

tîyan jibo şewatê daran tînên, dere ji xwe re piştikî êzing bîne, dibîne du jandirme siwar jêrve tên ber bi (darayenî) ve dirin, -hesê hus-ne bihîstîye ku me cebhê diyarbekir- berdaye, dema wan dibîne dibêje: ev kûçikan li vir çi digerin ma ev der ciyê wane? bi Hesê hus re tenê bivirê daran heye, dibêje ez van di ser xwe re derbaz bikim, wê (emerê faro) bêje: Hesê hus te digot: ez mêrê kozika pêşnim, jor de ji bilindahîya çiya gazî herdû jandirman dike û dibêje: teslîm teslîm, û bivirê xwe dihejîne û wan ve dadikeve, mebêj herdû jandirme qelawizên pêşiya eskerin, di wê hindavê de tabûrek esker der dike û dibêje: Ew çi dixwaze? dibêjin ji me re teslîm dibêje, bînbaşî ji esker re dibêje: hawîdor li Hesê hus dibin xelek ew her bivirê xwe diweşin û dibêje ber bi min ve meyin, hêj jî dixwaze bi bivirê xwe ji nav hezar eskerî xwe rizgar bike, bi sed felaketî wî digirin, ew jî anîn wê kinîse em lê.

Hew min dit Hesê hus kete nav derîyê, min gazikir xal hes xal hes-lidora xwe dinêrî û digot: la eno kamo veyindeno- yanî ev kiye gazî dike? ez rabûme piyan û min destê xwe hil da ez dîtîm û hate ba min û got: xwarzî () tu livirî xweda bike tu birîndar girtine? min henek kir û got: na, ji cî veciniqî û got: xwarzê te çi bi serê xwe û me anî xwarzê me bê birîndarî dîl bikeve dest dijim, emê liber xelkê çi bersifê bidin? min got: vaye tu jî birîndar nebûyî û hatî girtin, hingê mesela xwe bi bivir û şerê tabûrek esker got: min got: te îfade çewa daye, got: weke bûye min wer gotiye, min got: xalo bi vî îdiayî tu îdam dibî, bêje: ma dikeve serê we ez bi

bivirê daran herim ser eskerê bi sîleh, min dar dibirîn min esker dîtî ez revîyam wan ez girtime, hingê wê bawer bikin ku raste wê te berdin, awir li min veda û got: Xwarzê ma tu direwan layîqê min dibînî?!

MÊRXASÎYA FEQE EVDULAHÊ XERZÎ:

Di wê kuştariya tevayî de bi wan esker û qumandanên Turk re şifqetek insanî nema bûn, her wekî nêçîrvanên heywanên goştîxur insan dikuştin lê nizanim çima wê sitemkarîyê bi wan re edeb û exalq jî ne hêştibûn? ji ronîştmanên (çiyayê melato) weke hercar qeflekî jin û zaruk anîne farqîn ku wan nefiyê Anedolê bikin, qumandanek eskerî di nav wê qeflê de çav li jinek gerand bi qolê wê girt wî bajarî de bi lêdan bir, zarûkên wê û tevaya wan pîran bi hev re kirin qîrîn û hawar, (feqe evdulahê xerzî) da rix wî da ku zanibe ciyê qumandan li ku ye, piştî ciyê wî naskir ku jinik xiste wî xaniyî, dunya muxrib ji nav taxê tufengek peyda kir û çû serdarek li hember pencera qumandan dît ku dest davêje jinikê û jinik di ber xwe dide, ji ser darê tufeng xiste serê qumandan û mejîyê wî ji hev bela kir, piştî kete erdê jinik revîya di nav taxê de hate veşartin, lê esker li dor xanî bûne kom, kesê bîra serdarê nebîr, (feqe) dît ku esker ji wir çûn bi mêrxasî daket û çû rizgar jî bû.

PIŞTÎ NEH MEHAN EZ JÎ KETIM BER WÊ MEHKEMA NUREMBORG:

Her wekî hate gotin, her roj sibehan lîsta navan dihatin wê kinîsê di lîsta /12.12.1925/ de navê min û panzide kesên dî hate xwendin, em her şonzide kelebçe kirin lidor me (20) eskerên bi singû em birin wê sînema ku mehkeme lê ye, her panzide dozên li wan bi hev ve girêdayî ew xistin hundur û herdû destên min li ser hev kelemçe kirin ez li nav eskerên ber derî mam, deh leşker bi singûyan bi wan re ketin hundur, zêde yê du saetan man, me dît hundur de zêde qerbalix çê bû, pênc eskerên dî jî ketin hundur, di derxistinê de mi dî esker li wan didin, min ji yekî girtî pirsî û got: çi mesele ye? wî got: ji hevalan (10) îdam kirin weke hercaran wanê îdamê dirêjî mehkemê ku bi kelemçan li wandin di nav wan û eskeran de pevçûn çêbû, hêj jî ji der ve di nav wan eskeran de jî jî -Mustefa Kemal qanûn û hukumeta wî re xeber didan û wan sekeran jî bi qundaxên tufengan li wan didan û ez xistim hundur,

Min dît ku sînema kirine mehkeme di locên jor de nêrevan û gohdar da girtîne, heyêta mehkemê jî li şûna derpêş kirina filim û pêşîya wan çax kirî jibo ên îdamê xwe negînin wan, ji xwe re got: vana vê qesabxanê wek filimek dibînin, herdû destên min kelemçe kirî li hember xwe li ser textek dame ronîştin, du esker li rix min singûyên wan wek: serê du marên sipî di rix guyên min de diketin ber çavên min, di navbera min û mehkemê de polîsek sekinan dî destê wî liser

şęşagira wî ji piyan heya serê min li min dinêre, ji min re got: eger Turkî nizanî ez zar zanim yanî tercimanîm, min got: wek te dizanim, got: niho wê kirdê-ên te bêne xwendin gohdar be jibo tu bersif bidî.

1. Tu birîndar di qada şer de dîl ketî dest eskerên me, ji vê re şahid ne divaye ku tu li hember hukumeta Turk rabûyî,

2. Dema ku tu ji gundê serdêyî dîsa xiyanete te nayê inkar kirin, lere dema li (pîran) dinav jandirme ên me û peyayên (şêx seîd) de teqîya we jî di gundê xwe de poste girt û mehkûmê bi wan re we ew jî berda da ku di dest pêka pêşîn de hûn bi şoreşê bibin pardar,

3. Dîsa berî her kesê we we (midîrê -hênê -û qaîmmeqamê -licê dîl girt û we şandin (girnós) ciyê esîran,

4. Ji-Hênê (xurşîd beg û birayê wî ziya beg) li ser te şahidin ku tu di şerê deşta Fişê, derê pîresin, firqa hênê, elî bardaxan, til elo û diyarbekir- de pardar bûyî ji şervaniya kumandosî pêve, ji van gunah-karyên ji bejna te mezintir çi bersifa te heye rabe bide?

- min got: birîndariya min doz û pêve rabûnek tevayî bûye ne kirdekî tekane pêve rabûme,

- gundê min ji gundek kurdistan e, li ba we tevaya gundên kurdistan li hember hukumetê gunakar in,

- şehadiya herdû begên gotî di heqê min de qanûnen cî nagre, lewre bi dozek milkî dinav me û wan mehkeme heye, jibona rastiya gotinê hûn dikarin li (mehkema qeza licê) birûsek vedin,

Cewa ku di wê nehkema şiklî de şahid xwestin û hêvişan-

din tunebûn birûyek tehil û xudbîna gotin: -jibona ku giyaye (şêx seîd) û dişoreşa kuştina esker de bûye pardar, ligor qanûna ceza a Turk benda (45) bi xiyaneta weten mehkemê biryar bi îdama wî da heya mirinê, -piştî biyare derbazî oda muzakerê bûn û di veqrê de gotin: me li dosîya wî nêrî ku ûmrê wî (21) salek û heft mehe, me îdama wî guhart bi (15) sal hepis wê li anedolê li hepisxana wilayeta (nigde) biqedîne, lê venagere walatê xwe lewra bi xiyaneta mezin ve hatiye naskirin,-

Bi wê guhartina hukum -polisê hember min got: ji-xazî Mustefa Kemal û cumhûriyeta Turk- re dua bike ku tu ji mirinê rizgar bûyî-min got: jibo çi dua bikim, ma ew giriftariya panzide sal hepis li xerîbîyê ji mirinê hezantir e? bi wê gotinê kulmek li çengûya min da, min bawer kir ku çengûya min ji hev ket, û got: xizîr kurên xizîran ma ji we re merhemet divaye ji kuştinê pêve, wê civatê ne gotin te jibo çi lêda, emê ceza kirî jibona nefiyê birin hepisxana kevin, hingî tije bûn di navbera hepisxanê û mizgeftê de derî vekiribûn, em derbazê nav girtiyên mizgeftê kirin, heya em giyane hepsê her bi qundaxên tufengan li min didan jiber ku wan eskerên ku bi min re li mehkemê ji wan re gotin: vîya ji îdamê xilaskirin ji xazî paşa re dua nekir,

Bû êvar somin dane me li wir jî çayî hebûn, jiber ku rûyê min werim û çenguya min zêde êşek girtibûn min nikaribûn nan bixum, di nav qedeha çayî de nan hûr dikirin û bi kevçiya çayî bazor dixistin nav diranên xwe, yekê girtî umrê wî li dor (50) salî gazî min kir û got: birazî birazî te xêre? min

got: apo goh me de, ji hevalên bi min re yekê got: axa cehalete, got çima çikiriye? wî got: berê bi îdama wî biryar dan dawî hukum wergerandin ceza polis jêre got: ji hukumeta Turk û xazî paşa re dua bike wî nekir bokis li çenguya wî daye nizanin şikestî an ji cî derketiye, hingê wî got: hey ser mezin ew cahile lê tu heşmende yî ne welê, me bikujin jin û zarukên me di xaniyan bişewitînin, bi ser da jî em ji wan re dua bikin! gazî min kir û got: biraziya delal tu were ba apê xwe ezê derman bikim, li ba wî papor hebûn ji peyakî xwe r got: wê paporê vêxe, av gerim kir û bi pêşgirê ji min re kewand, herçendî min jê re digot: apo bide min ezê bikewînim, ewî her eniya min maç dikir û digot: divê ez bikewînim, welê mêr bin kêmaniyan li xwe qebûl mekin ma ji mirinê wê da wê çibkin, bi wê kewandinê hinek êş sekinî ez razam, sibehê dîsa du caran wî bi destê xwe kewand devê min ji serhev hate vekirin, hê jî girêkek piçûk têde maye jibona ku ew sitemkariya Turk ji bîra min nere, paşê min naskir ku apo (evdurehman axayê sor ji şernexê) çewa ku piştî me ew jî îdam kirin!....

* * *

BIRÊ NEHAN

Institut kurde de Paris

DIJWARÎYA RÊ Û NEFIYA ANEDOLLÊ:

Ew nefiya hepisxanan jî wek îdamê her roj qefle pêderpê dibrin anedolê, çewa ku jin zarûk jî weke kerîyê pêz di pêşiya eskerên Turk de bi peyatî dibirin ku hingê li Kurdistan ji çend rêyên navbera bajarên mezin pêve çixir (şûse) tunebûn, wiha renga otomopîl û pas jî nebûn, belê, di çile-ê pêşîn de berf li erdê zêde sar ji wanên ceza kirî em (18) de kes her dido bi heve kelemçe kirî ji bajêrê (xarpêtê) lidor me siwarî em derxistin, li pêşiya me rêyek dûr û dijwariyên wan eskeran li me, li roj avayê bajêr liber xaniyê pênc biran meruvên hin girtiyên hatin ba wan ji wan re pere û çek anîbûn, lê kesek min nehatibûn, lewre gundê min heft qunax ji xarpêt dûr gund şewitî piranî hatibûn kuştin, wê dîya mina dilovan ji kê bibihîstina û bi min ve bihatana, çekên min ên zêde ji nav piştê min de di çente de, ebakî erebî jî wextê razanê min li xwe dipêçan û heft zêr jî bi min re hebûn, lê wê rêya dirêj wê têrî min bikirana heya ku bigîjim hepisxana (nigde)?

Em xistin rê di nav wê berf û sermayê de lipêşîya hespan jendirman de û her bi şivên dest xwe li ser û gohên me didin, di nav me de hinên kal û efendiyên nazik jî hebûn, lewre ew jandirme dîl ketibûn dest şoreşê ji ber wê çendê ew çend dilreş bûn, me ji wan re digot: ma dema ku hûn dîl ketin destê şoreşgîran kesê li we da ji dilovanîyê pêve, rojê

şeş saet em di wan giriftariyan de rêve diçûn, êvarê li xanek dihewiriyân ew xanên ku berî/1869/ ku (tengava siwês) bê vekirin, bazirganîya (ingilîz) ji (terebzun) diketin erdê Kurdistan heyanî (mosil) di xelîc de diçûne (şirketa şerq-a ku li hindistan- hêj li ser wan rêyan ew xan meyinde bûn di wan xanan de xwarin, sobe ji hespan re ka ceh hebûn weke otêlan li çolê, tevî wê lêdanê jî xwarina wan jandirman jî li ser me bû, çewa ku çend ji hevalan jî bi wan re pere nebûn min heqê nanê wan jî didan ku heval û bira-ên mebûn, roja didûyan berî ku em bigîne (ferat) li der berjêra (komirxanê) em ji pare giyane qeflekî mezin tev de jin û zarok bi peyatî wek kerîyek pez dipêşîya esker de wan jî nefiyê anedolê dikirin,

Dema em çav li wan ketin yekcar jiyîn liber çavê me reş bû, ew belnga zîya wan jin û zarûkên piçûk ku ji me pêve tu miletî di zeman û meknan de neditine û nabînin, em di nav wê qefle re derbaz dibûn jiber ku lêdan li me hebûn, min dî jinek umre wê li dor (35) salan hebûn, zarûkek hêj di pêçekê de li ber sigê wê, yek jî lidor sal û nîv li ser milê wê bi serê diya xwe girtibûn, yekê dî lidor pênc salî wî jî bi dawa dîya xwe girtibû pêre dimeşîyan, diser milê xwe de zivirîm û min got: xuşka belengaz bi vî halî tuyî bigîjî kîjan bajarê anedolê? jinik bi hêrs awirek zêde tehil li min veda û got: -bê şerim û fedî hêj dipeyîvin jî her wekî ew jî xwe mêr û insan dibînin! her wekî jin û zarûkên xwe weke xelkê pa razine, ma ji me û pêve kîjan millet li cîhanê ketîye van giriftariyan? dîsa jin û zarûkên kê di xaniyan de hatine sewitandin!?...

Wan serhevde-ên jinek kurd zêde ez êşandim, ku heya van nivîsaran (58) sale ew rûyê wê ê hezîn û tehil li ber çavê min û pirsên wê digohên min de bûne guhar, jiber ku her kurd nikare bi ser bilindî bersifa wê bide lê tevaya sazmanên cihanî ên huqûqê insan li hember van sitemkarîyên na kesane ber pirsiyar û frdîkarin!... belê bîwê dîtin û bihîstina dilbirîn em ji wan derbaz bûn, jiber ku diber singên hespan de û dar li ser mene, roja sisîyan em giyane bajarê (melatî) wê şevê em xistin nav girtîyên hepîsxana milkî,

Ji ber ku bajarê kurd û girtî jî tevde kurd bûn, deng dane hev û gazî kirin û gotin: eskerên (şêx seîd) hatin, tevde ber bi meve hatin rûyê me û digotin: biser çavên me de hatin, her sê çarek em birin qawisên xwe zêde li werhatin, doşek hawîdor me balgî ber me cigare kom dikirin, her wekî meruvek wan ji xerîbiyê hatibûn, pêre jî her pesnê me didan û ji hev re digotin: ji van re mêrxas û fedakar tê gotin ku jibo doza mafê milletê xwe xebitîne, têde mal û can danîne her yek ji wan deh panzide heya sed sal ciza ve berê xwe dane zindanên anedolê, me weke me jibo tiştê ne hêja hevdû kuştina ketine hepsê,

Paşê hingê ji me pirsîn û gotin: ev çima welê ser û gohên we tev de birînin? me got: em peya û jandirme siwar bi şivan li serê me didan gotin: daxwaz namekî di rêya midîrê hepsê de bidin qumandanê jandirman bila ji kîşê we dirêj divê sermayê de bi peyatî herin, min got: ji me re pûl kaxiz binin ezê binivîsim, wan ji me re pûl kaxis anîn min bi navê me hijde kesan daxwaz name nivîsî û di rêya midîr de şand,

wan hepsîyan nivînên xwe dane me her didu bi hev re razan, me got: gelfî biran ev neh mehe ku me nivîn ne dîtine em naxwazin hînê nivînan bibin, lê gotin: çewa hûn li erdê û em linav nivînan razên,

Bû sibeh, zabitek qaf mezin û zik tilêr li hewşa hepisxanê liber ciya ava ku di hewşa hepsê re derbaz dibûm sekînî gazî kir û got: -eskerên- şêx seîd derkevin, em tev de derketin got: li rêzê bisekinin, û got: ê istida nivîsî pêşve were, ez dugav ber bi wî çûm û min silav lê kir, bê gotin weke kûçikek har hate min û ez dame ber sewtan, hingî li min da xûnê di herdû qulên bêvila min re davêt, ez nikaribûm xwarbim, bi singê min ve dihatin xwar, piştî çû di wê semayê de min biwê ava cûyê li çekê xwe dikirin daku xûn pêve hişk nebe, a qenc ew bûn kû manqa lên agirên hepsîyan hebûn û hinek direng ji me re erebe anîn, min liber agir çekên xwe zuha kir, heval tevde lidor min kom bûn û gotin: ji bo me te ew çend lêdan xwar, min got: hûn û ez kîne, bi wê dîtina tevaya wan girtîyan zêde dilbirîn man.

Sibehê em derxistin oda midîr her dudu destên me xistin kelemçekî lê her yek ji me jî tewqek hesin binavê (lale) xistin sitûyên, em herşêş di erebekî de zincîr di wan lalan de derbaz kirin û herdû serî jî qifaltin di wê serma-yê de ji destên me pêve ew tewqên hesinê cimidî jî di sitûyên me de û li dor me (10) siwariyên, jandirman em li çarşiyê derbaz dikirin di ereba pêşîn de ji peyayên (ferzende) binavê (şemso) sed sal hukum kirine, dest xistîye goyê xwe distire û dibêje: girtî birin lo girtîno lo li pira suluxê derbaz kirin lo

mehkûmo lo- bi wê qûre qûra (şemo) li herdû rixên çarşiya (melatî) wek lehîyê insan bi me re di meşîyan, me her çiqas gazî-şemso dikir û digot: çi bela te ye lo şemso? wî digot bila kurên kurd vî halî bibînin ku ji wan re rojên tarîxî ne, heya ku em ji bajêr derketin ew lehîya insanan li herdû rixên rê bi me re bûn,

Çawîşek bi wan jandirman re meruvek sert dema deng li jandirman dikir liber wî diricîfîn, sinbêlên wî li herdû rix bêvila wî tîk, me ji hev re got: evê hinan ji me bikuje, piştî em ji bajêr dûrketin erdek rast, me di çawîş li pêşiya hersî ereban sekinî û got: erebeçî bisekinin hersî erebe di cî de sekinîn mê go wê çi bi serê me bîne, lê me dit bi zimanê kurmancî gazî me kir û got: gelî biran gelî apan ez xulamê we me, ji vir heya (sêwas) neh qûnaxe ez bi were me, çi lazimîya we hebe ji min re bêjin: ez di xizmeta we de amademe, ezê niho wan laleyan ji sitûyê ên we derxim, tenê di destê we de kelemçe bimînin, dema hûn di hundurê ereban de cemidîn an qerimîn dakevin hinek rêve herin, ligor daxwaza xwe bin çewa ez ligor daxwaza we me, jivê pêve lome ji min mekin, eger bi min û we havilek bi dest ketana minê destêrt we yekcar yekirana mey ê ev sîleh ji van jî bigirtana, lê ji me, pêve bi sedan mêrxas li çîyanin dema ew havilek nekin emê çi karibin,

Belê çawîşê ji me re zêde dilovan, hêj zêdeyî saetek di man ku em bi gîjin xana êvarê wî hespê xwe-ê kumeyit dibezandin diçûn ciyê me çê dikir û sobe gerim digir ji xwedîyê xanê re digotin: mêvanê te hene ji wan re xwarinê

çêke, dema em digiyane xanê ku hertiştên me pêkhatî ne, berê cî didane me paşê jandirman, weke jandirma-ên (xar-pêt) ê ji kîsê me jî xwarin ne dixwarin ji kîsên xwe dixwarin, bi serda jî de ma dît ku em heqê xwarina (şemso, wîrza mehemed û usê topal) - em didin jiber ku bi wan re pere nebûn, wan neh rojên bi me re wî xwarin da hersî yan, heta heqê kirya wana ereban jî wî da,

Di nav me de yekê kal umrê wî lidor (70) salî jêre (mela mehemedê nuhacir) digotin: kîsek ax pêre bi wê axê destnimêj digirtin û ronîştî bi me ve kelemçekirî di hundurê erebê de nimêj dikirin, çawîş dît ku tûrek ax pêre û destê xwe lê dide, got: apo ew çi axe? jêre got: ka kîsê te, liba apo ku wê têxe xurcika xwe da destê wî, çawî di newalek kûr werkir û got: welahî heya ku bi were me ez bibînim kesek ji we nimêj dike bile ezê li ser nimêjê tufengê bixim pişata wî û we bikujim, hingê ez wacibek niştamanî dikin û kesê we bikuje liba hukumetê jî rutba wî jî zêde dibe, di nav mede, (umere axayê hesam) ji xelkê (şernex bû jê re got: çawîş axa nimêj ji bo (xudaye) wî got: xudayê we nîne, eger hûn evdê xude bûna diva bû nehêle hûn bikevin van sitemberiyên mezin, Turk ev dê (xuda) ne eger hûn ji wa re nimêj bikin û ew jî ji (xuda) re nimêj bikin ku ew raserî we kirine hingê lêwere, belê çawîş ji-melatî heya sêwas nehêşt kesek ji me nimêj bike, jiber ku çawîş bi xûna şehîdên kurd sond xwaribûn ku wê wan bikuje, çawîş bi ser xist û got: ma (ingilîz, firansa alman)û dewletên xaç parêz hûn dîl girtine? ji bira-ên we-ên musilman pêve? ew xuda nasên û van

felaketên kes nedî biserê we tînin û hêj jî hûn bi tifaqa wan berê xwe didin qubla nimêjê ma hingê ji we bê namûstir wê kî hebe lo?!... dema nêzîgî (sêwasê) bûn me ji çawîş re got: dibe ku di ewraqan de nivisandî be ku di sitûyên me de lale hene, jibo tu li bawan ber pir siyar nebî dîsa bixe sitûyê me, wî got: we sed arî liserê min kir, we jibo doza mafê miletê xwe mal û can bi derdaye heryek ji we ji (10-100) lixwe qebûl kiriye berê we li zindanên welatek xerîb, bê ku zani-bin jin zarûkên we jî hene tunin hatine kuştin an li kune, we tu ber pirsiyarî nejmart, lê çawîş wê mesûl bibe tê bîra we, eger min hûn bi lale sipartin wan ew jî wan bixin sitûyên we hingê ez berpirsiyarim

Dema em goyane (sêwasê) û em sipartin jandirme-ên wir ji wan re got: van kesana tevde bê gunah hatine hukum kirin, bawerîya min ew çend bi wan hatîye ku niho ewraqên wan bidin wan wê jiber xwe ve herin wan hepisxane-ên ku ji wan re hatine biryar dayîn, tevde insanên xwedî exlaq û edîbin, daxwaza wî ku tu dijwarîyan negînin me,

Ji wir heya (qeyserî) jandirme ji (çerkezên dax) bûn, wan jî ew felaket ji destê Turken dîtibûn, ji ber wê çendê zêde ji me re dilovan hinên ji me nexweş destê wan ji kelemçan vedikirin û bi dor li hespên xwe siwar dikirin, ji wir heyânî (nigde) jandirme-ên qeyserî ne wek çerkezan lê tu dijwarî jî ne giyandin me, ji-xarpêt heyânî-nigde tevî mayîna bajaran (24) çar roj di wê giriftariyê de giyane nigde, li vir divê xwendevan ji bîr nekin ku min ev dîtinên xwe dane zanîn çi kurdê hatin girtin û nefî bûn tevan ew dijwarî û belkî mezin-tir dîtin,

LI HEPISXANA NIGDE:

Li ber deriyê hepisxana (Nigde) destê min ji keleşa hevalê min vekirin, lewre ez li wir dimam ew hêj dibirin (qestemonî, isparta, denizli û muxlê) qunaxa nêzîg a min bûn, liwir em çûne rûyên hev xatir ji min xwestin, min ji (mudîr) re got: mudîr beg bivê nevê ji xerîban re hin xatir divê, wî got: raste lê ne ji we re, ez derbazî hepîxanê kirim, qardîyan jî di rix min de, yekê gazî kir û got: va eskerê (şêx seîd) kete hepisxana me, tevaya hepsîyan li dor min kom ûn û li min dinêrin û ji hev re diebêjin: ew jî insanek weke me ye, qardîyan ez birin nav deriyê qawîşek û ji keyayê qawîşê re got: ji vî re ciyek bide vekirin û vegerîya, berf li erdê û sar her hinek liber manqalek egirin, min silav li wan kir ku hinek bêjin keremke, lê lesê silava min vengerand, xortek ji qozîyê gazî min kir û got: arqedaş berî gel-yanî heval vir de were ez çume ber manqala wî camêr bi dilgeşî ez hember kirim çigare da min û ji min re qehwe çêkir û got: tu serçavan hatî, ji min got: ji kurdên diyar bekir im, di wê hindavê bira-ê wî ji der ve hat û jêre got: xêre te otêl vekirîye kî bê tuyê gazî wan bikî, min got: arqedaş wê niho ji min re cîbidin vekirin ez jî ji van girtîyan yek, bira-ê wî zêde xeyîdî û jê re got tu bira-ê minê mezinî lê hema çî bê devête tu bê fikir dipeyîvî ma ev jî duruste? ev camêr xerîb ji kurdistan nefî vir kirine kesek nasê wî li vir nîne ezê çewa gazî wî nekim, hingê bira-ê wî got: hi berî niho min li qawîşek qumar dilistin deng hat û gotin eskerê (şêx seîd) hat

nebe ku ev ve wî got belê, hingê hate rûyê min û got: ez
 rica dikim tu di min bibuhurî min guman kir ku xelkê virî,
 tu serçavê me hatî û tu jî bira ê me ê sisîyan, min ew dilo-
 vanî gelek xerîb dît, min dît çu der pêre yekê dî hat û ji min
 pirsî û got: ez hemamçî me tu xwe û çekên xwe naşoyî? min
 got: belê ji min re şûştin divaye lê mexabin ez giyame vir
 tenê du quruşên zîv bi min re maye, wi got: rabe xwe û
 çekên xwe bişo kingî ji te re pere hatin bide nehatin li te
 helal, min got mala te hezar car ava, ez pêre çûme hemamê
 û çekên paqij ji çente-ê xwe derxistin bi xwe re birin, min
 ser û laşê xwe şûşt û got: arqedaş ji kerema xwe tu piştî min
 lîf bikî, piştî min lîf fikir û got: hey hey ev çiyê sipîyan
 çermê te qul kirîye serê wan têde, dema sipî jê dane rêj
 kirin ava gerim li şûna devê wan dibûn dişewitîn, min xwe
 şûşt û hatim bawan ku ji min re çayî çê kirine, êvarê jî şîv
 çekirin me xwar lê ez difikirim niho ezê çide razêm, ebakî
 ereban pêve nîne lê zêde sare ezê bê serrax û binrax û balgî
 çewa razêm, jiber zehmetê rê û min laşê xwe jî şûştibûn xew
 da çavên min, bira-ê piçûk nave wî jî (hesen ê mezin ciwan
 elî) ji min re got: xuyaye xewa te tê? min got: belê ji min re
 ciyek vekin ku razêm, min dît got: hesen wî destê nivînan
 daxe, min nêrî destek nivîn girêdayî raserî wan bi mîxê
 dîwar ve dalqandî, dexistin, doşek lihêf du balgî û merşek
 mezin raxistin ez jî bûme weke wan, min got: we ev nivîn ji
 ku anî? ciwan elî got: ez çavê te me min bi qumarê ji yekî
 birîye û xwedî derketîye, kengê donzide kaxizê min anîn
 emê bidin wî an tiştêk dî bidin wî jê bikirin, niho tu razê,

min ji xwe re got: eve ku (ahmedê xanî) gotîye:- şuxul hene xirabin, fêl hene sûretê sewabin-

Min ji xwe re got: vaye di nav Turkan de jî meruvên dilovan hene, di wê hindavê de keyayê qawîşê jêre (şakir çawîş) digotin: ji min re got: ma tu jî elewîjî? min got: ez çima elewî bim, wî got: te niho devê balte li kevir da herdû hevalên te (elewî ne), wan herdûyan gotin: ev gotina te valaye em berî (dîn û mezheban) bi xûna xwe ve yekin û tu mezheban ji hev nayên cuda kirin, min ji wan pirsî eslê we ji ku ye? gotin: eslê me û te yeke em ji kurdên (Dêrsim in) kalê me nefiyê vir bû me ziman winda kiriye lê nejadîya me paraztîye, ew jî bi xêra vî mezhebê me ku me jin nedan Turkan û ji wan jî ne anîne, hingê min naskir ku ew dilovanîya wan ji min re ev bûye, çewa ku em kurd dibêjin:- xûn nabe av-

Belê meha dehan bûn ku ava gerim bi laşê min neketibûn, ji wê qirêj û wan sipîyan ez paqij bûbûm tevî wê dijarîya rêya dirêj ketim nav nivînên gerim û nerim, wek kevirê bavêjî bin gola avê ez wê şevê têr razam heya taştîyan, her dû camêran gazî min kir û gotin: rabe taştê bixwe belê min bi wan re nan dixwar lê min didane heşê xwe, ma ez li ser nanê van camêran biminîn? panzide sal hepis û welatê xerîb ezê bê pere çewa bikim? gund û mal tevde şewitîn nizamim kî sax û kî hatîye kuştin, diya min bi herdû bira-ên minên piçûk û sê xwehên min ve, eger hebin jî nizamim li kîjan welat û ew bi çi dijîn heya ku ji min re jî pere bişînin, ezê mektûb ji kî re bişînim ku ciyê wan nizamim ew jî ciyê min

nizanin, piştî me nan xwar pišta min li dîwar û ez diwê derya xiyalan de noq bûme, min dî - ciwan elî- ji derve hat û got:

Kurd Hesên were bînbaşî te dixwaze, min got: piştî hukmê panzide salan bînbaşî ji nûve çî dixwaze? wî got: birader ew jî weke te hepsî ye dixwaze te bibîne, min got: fermo ez birim qawişa ku bînbaşî lê, di quncikê de cî girtî dîwaren dorxwe bi secade-ên xalî lê wergirtî û manqalek tûnc tije agir liber ronîştî ye, belê çekên zabitan lê bê nîşanin, bi dilgeşî ez hember kirim destê min girt em ronîştin, piştî xêr dimandanê cigare da min û ji min re qehwe da çêkirin, ligor teqalîdê kurd piştî vexwarina cigare û qehwê hêj ji min pirsî û got:

- Xortê delal ji kurdistan kîjan wilayet qeza û gundî yî?
- Ez ji wilayeta-Diyarbakir-qeza-licê-û gundî Serd im
- Di gundê we de bi navê (ahmed keya) meruvek zana û alîcenab timî li encumeyna Diyarbakir de aza ew liku ma?
- Ew kesê dibêjî apê min e, ez hatin girtin ew li çiya ma, wî got:
- Sed mexabin eger ew bê girtinê îdamê ye-min got:
- Bînbaşî beg tu çewa zanî ku wê îdam bikin? wî got: (1)
- Belê dizanim ku hukumeta kemalîstî ji nav we peyayên zane dineqîne niho tu dostek minî hêja derketî, di cenga cihana pêşîn de tabûra eskerê min liber pira biniya bexçan bûn, lê zivistan sar heya xwarin jî nebû, ez wê zivistanê li oda apê te dimam, çewa tu min nas nakî ez li pişt caxan liser

1. Birastî jî di pişt girtina min re. apê min jî hatibû girtin û li Diyarbakir îdam kirin.

textê nivînên odê radizam, min got:

- Niho hate bîra min di wê herbê de şekir peyda ne dibûn me bi miwîj û tûyên hişk çayî vedixwarin, carna ku kes li odê nediman em zaruk diçûne odê, weke dibêji: zabitek li wir hebû şekir didane me, got:

- Navê wî zabitî nayê bîra te?

- Belê jê re-îlmî beg-digotin, got-ez bi xwe me- got:

- Rast bêje û fedî jî meke tu û xercî çewanin?

- Bînbaşî beg bi min re du quruşên zîv mane nezêde, dema em ji (xarpêt) rakirin kesek negiya min, bi min re heft zêr hebûn ew jî heya em giyane vir ew jî kutah bûn, got:

- Tişteke zêde xerîb û ecîb, ew gundê we ku têde xanîkî yek tebaq ne bûn, ew çend dewlemend gundê avî çar aşên avê hebûn, ji çandinîyên wek: genim û ceh pêve zevîyên pir tevde kuncî û penbû, qeza-ên (licê û (hênê) herdû jî sibehan li benda meywe-ên dar û bistanên (serdê) bûn di wê hebûnê de û ev perîşanî zêde xerîbe! min got:

- Dema me gund berda dîya min ji wî malê gotî tenê tasek avê û beta nîyek bi xwe re anî çiya û esker giya gund ê talan û agir berdan gund tev de şewitandin, netenê gundê me tevaya wan gundên qezayê kaviîl ên xirabene, çewa ku ji gundê me tenê (45) kes hatine kuştine, niho ez nizanim kî heye û li kune, bi wê bihîstinê zivirî ser hevaleyê xwe û jê re got: tu dibihîzî hukmê Mustefa kemalê faşist û hin xeberên dijûn dan û ji wan re da zanîn û got:

Gundê wan bihuşteke cihanê bû, ne tenê li wilayeta-Diyar-bekir lê li tevaya kurdistan gundek welê nebû, xwedî çandinîyên her tewir ji pez û sewalan pêve di gund de nêzîgê

(50) hespên siwarbûnê hebûn, her malek ji firaq û hûr û murên malê pêve zêdeyi deh dest nivîn li ba wan hebû hotêlek belaş bi navê odê apê wî dabune vekirin bixwarin razan çê rêwiyên lê bibûna mêvan nas ne nas lê dibûn mêvan, niho hûn dibihîzin xwedîyê wî malê pir û dewlemend panzide sal hepis li welatê xerbiyê pêre du quruşên zîv heye, ne tenê ev her kurd ev felaket biserê wan hatiye, dibin sitemkariya cumhûriyeta kemalistî de!....

Derxist (65) kaxiz dane min û got: ez li kurdistan gelek mame, kurd dibêjin xelkên bajaran xwedîyên sinîkên piçûkin, min ev jibona ku tu ji xwe re destek nivîn, papor, çaydan beroş û hin tiştên zerûrî bikirî, lewre evên li vir ketine hepsê tev de diz û qumarçîne eger zêde bidim te wê ji te bidizin, piştî te ew tiştên gotî kirin ez her ji te re amademe

Min got: berî her tiştî divê têlgrafek bidim welat, wî got: ma ne tu dibêji ez nizanî meruvên min li ku ne hene ana? migot: li hundurê qezayê (bi navê mehmûd axa) meruvek me heye û kale belkî ew heye, wî got: Mehmûd axayê evdulahê ubeyid- min got: belê, got: tu xweş fikirîyê ez wî nas dikim, zêde qurnaze eger jineh jinebî mabî ew ji maye, min liser navê (mehmûd axa) birûsk veda, bînbaşî bi ser xist û got:

- Xortê delal qenciya we li ser min zêde mezin e, ez vê odê tije zêr bikim buhayê wan rojan nagre, cezayê min panzide sal û e te ji eger tu bixwazî divê ciwanîya xwe de van rojan vala bernedî hingê tuyê liba min bixûnî bê ez dikarim wê

qenciye vegeřinim, ewa ku dersên te liba min hene, min got:

-Te ji zanengeha cengdariya (múyinx almanya) diploma girtíye ewa xwendina min li ba te nîne ? ji mile dí rica dikim tu behsa wê qenciye nekí, ewa ku dizani ew mévan perwerí ú comerdí yek ji teqalíd ú xesaísê me-ê qewmí ye ne ku mineteke, lê dema tu vé qenciye bi min bikí hingê ez minetkarê te me, lewre xuendina min li dibistanên resmí mine ji xwendina xas pëve ku ev ar caran xwendina xas, ku evcar wê mezintir be.

Ez vegeřiyame ba herdú hevalên xwe ú ew ewrê xiyalan hinek ji heş bidúr ket, ji alíkí min birúsk dabún welat, ji aliyê dí bi min re xercí ê bú, min ji herdú hevalên xwe (hesen ú ciwan elí) re go: eger bi we re bixum divê em deft-era hisab bigrin, wan got: tiştên ku ji mala me tê wek: savar, rún, hêk ú komir, vane nakevin nav mesrefê, lê tiştê ku em li vir dikirin te divê wan binivise, diwê hindavê de xwediyê nivînan hate ber derê hepsê ú got: eger tişteşk dí bidin min bila nivîn ji we re bin, min pênc kaxiz dane wí ew cû, donzide kaxiz jî dane-ciwan elí- lê camêr nigirt, piştí end rojan ji min re (500) kaxiz hat, min (65) kaxizên bînbaşî jêre bir zêde xeyidí ú got: ezê bavêjim agir ha, ma min bi deyîn dabún te, lewre her iqas ji te re dibêjin ji te re pere divê divê tu dibêjî na, eger min tu nas nekirana minê bigotana tucar camêrî nekirine law min comerdíya we ditiye.

Belê ji hatina peran pëve min xeber ji díya xwe bira ú xwehên xwe girt ku li-diyarbekir- xaníkí kirê kirine ú lêne,

dîya min re zêr hebûn lewre dema bavê me mir em tevde zaruk bûn, dîya min deriyê oda mêvanan girt, ew hatina meya pir tevde di destwê de dikirin zêr jibo wan rojan, liwê hepisxana (nigde) ez bi xurtî xwedî kirim û ew jî hatine xwedî kirin û paraztin, nêzîgî sê mehan liwê hepisxanê ji min pêve kurd nebûn, ku ez bi zimanê xwe bi wan re bipeyîvim daku hinek bihna min fireh be, ji ber ku ew bîrhatina ziman jî nefsa bîrhatina welat û millet e, hirsê qewmî bixwe digre, lê pêde hatin ba min liwê hepisxanê em (24) girtiyên kurd çêbûn, li wê gorê jî ji derve jî (270) mal bi jin û zarûkan ve hebûn, jiber ku dused û heftê istida min ji wan re nivîsibûn.

Li tevaya wilayetên anedolê ew jin û zarukên menfî dagirtibûn, de ji kurdistan digiyandin wan bajarên ji wan re biryar dayî, bê cî û xwarin bidin wan, li wan kuçe û kolanan welê bê hêvî dihêştin, zimanê Turkî jî nizanibûn, daxwaz ew bûn ku ji nexweşî û belengazîyan bimirin ên mayîm jî pakdawindiya wan bixin bin lîngan, da wan ji exlaq û teqalîdên wanen qewmî jî bixin, lê bi wê agahiyê wan jin û zarûkan hev û dû ber nedidan lihev dibûn kom, eger bişev bigiyana bajaran wê şevê xanan radizan heya ku li wan bibe sibe berê xwe didane hepisanan, dizanibûn ku girtiyên wan lê henê, daku ji wan re çarekî rêyek pêş wan bikin, ji ber ku bere ez tenê li wir hatibûne ba min û min ji wan re istida nivîsî bû pê cî û tayîn girtibûn, wan jî ên nû hatî re digotin: yek binavê (hesen) li vê hepisxanê heye wî ji me re nivîsî tavil me cî û tayîn girtin,



Ji ber wî qasî her sibehan qerdiyanan gazî min dikirin û digotin: dî meruvên te hatine, ez dihatim ku çend pîrek û li dor wan zarûk kom bûne ji kêm xwarin û zehmetkêşîya wê dûr û bi peyatî xûn di wan de nema ye rûyên wan sipî lêvên wan zuha, çekên wan tevde zîvar û ne şûştî porê wan lihev gerandî, tevan bi hev re li min dinêrîn hêvîyek di min de didîtn min navên tevan digirt tevî welatê wan û diçûme hundurê hepsê min ji wanre istida dinivîsî ku berê min pûl ji wan re hazir kiribûn, vedigerîyam ser wan û min ji wanre digotin xûş kê n delal herin sera dirix me deye eger hûn Turkî nizanin jî pirs bikin û bêjin: walî, van nivîsaran bidin walî ewê we bişîne ba midîrê iskan wê cî tayîne her yek ji wan du sominan bidin we, di/1915/ de ji êrmen pêve romên anedolê jî tev kuştibûn ew xaniyên wan didane wan, jê û pêve tiştekan jî ne didane wan, bê ku tiştekan hebe pê wan sominên zuha bixun, an beroş û papor li ba wan hebe ku ji wan zarukan re xwarinek gerim çêkin, ji milê dî bê ser rax û bin-rax li erdê radizan, heya ku karibin li ba malên Turkan ji xwe re xizmetek peyda bi kin û zaruk ji li rojên înan liber derên mizgeftan pars bikin hêj ji xwe re pelase an betanîyek bikirin, tiştê jiber ma ji xwe re beroş û çend firaq kûzê avê û tasek bikirin.

Belê çî kessên min ji wan re istida dinivîsîn bê hêvê şandin di wê rojê de cî û xanî didane wan, bê ku zanibim-walî-jî kurdên (Hekarî) ye û iskan mudîrî-jî kurdên (Erzerum)e, ji min bêhtir ji wan re dilovan in, di vî warî de me çewa behsa wê belngazî û felaketa wan jin û zarukên nefî kir, di

vê pêre bike bîra me ku nefîyan her bajarên anedolê di wê belengazîyê de bûn, ji karên nav malan -pêve karên der ve jî wek: eşêfa nav bexçan û paleyîya çeh û niskan jî dikirin, bi erzani caran heqê wan jî dixwarin zarukên kurdên mal mezin û serekên eşîran liber derê mizgeftan parsdikirin, da ku ew jî bi dèyên xwe re alîkariyê bikin,

Di vê em jibîr nekim ku girtîyên hepsan jî gelek ji wan diwan belangaziyan de bûn, her wî di wê hepîsxana (Nigde) de, dido ji hevalan sed sal û yek panzide sal hukum kiribûn, bi wan re yekcar xercî nebûn û kesek wan jî ji wa ne tiştek ne dişandin, ji (300) xîram nanê ziwa peve ku tayîna wan bûn, me di nav xwe de ji wan re çekên wergirtinê çê dikirin û caran çend kaxiz didane wan, lê her wekî: tê gotin bîr ji binî av nede bi peşkên baranê tije nabe-sibehan ku derîyên qawîşan dihatin vekirin hersî zû diketin hewşê jibona kirina quncikên cigara,

Di berevaniya wan hersiyan de ku di wê girtixanê de ji wan re karek peyda bikin, karên gotî ev bûn, di hepsê de hemam û çekşo, dukanek, çayî xane û berber hebûn, ew jî tevde di destên girtiyên turk de bûn, ji bona ku karibin ji wan karan yekê bi destê wan hersiyan xin, ji qebedayê wan re (Eşref dayî) digotin, min ew xweste qawîşa xwe tevî çend hevalên wî min ji wan re xwarin meywe çayî qehwe da çêkirin bi mesrefek mezin, di nav peyvê de min ji wan re got:

Gelî hevalan îro livir em tevde girti sitember û dil şikestî bi hev re ne, divê wek biran em ji hev re dilovan bin, hûn liber çavên xwe dibînin ku sê hevalên me yekcar bê hêvî û perîşanin, ji van karên di hepsê de ji hemam û çekşo de wan jî bi xwe re bikin heval jibo bijîn hingê hûn wacibek insanî dikin û em jî minetkarên wene - lê ji yek ve got:

- Hûn hatine vir di dawa mede ronîştine û dixwazin rahêjîn riha me ev der turkistan e ne çiyayên kurdistan e, min lê vegrand û got: - Eşref ligor teqalîdê me tu liser cilla min ronîştî bersifa te nadim, lê piştî rabûnê ezê liderê derî bersifa te bidim, bihêrs da xwe û rabû, liber derî min jêre got: li çiyayên kurdistan em bi tufeng hûn bi tufeng, top û firinde - ên bumbaran bûn, di her qadên şer de me zora we dibirin û hûn dil digirtin, livir em biker hûn jî bi kêrin ferqa vir û çiyayên kurdistan liba me nîne,

Ji bo şerê pêş me dest bi kirîna kêran kir, min pere didan wan jinên menfî ên der wan ji me re kêr di anîn, heft kêr min kirin jibo wanên bê pere û kêr pere, hevalên dîtir wan jî kirin, bînbaşî gelek dixeyidî û ji min re digot: Ez vê tevgerê ligor te gelek çep û vaji dibînim - min jê re digot:

bînbaşı heg ew belengaziya wan hevalên me ên mêrxas min dajo ser van hereketan, berevanîya heq li ku be her yeke, em (24) bûn herçar kurên (cemîlê çeto) bê ku îdama bavê wan ji wan re bibe îbret, dema dîtin ku wê di nav me û turkan pevçûn çêbe, ji qawîşa me ciyê xwe guhartin çûn qawîşa (Eşref dayî), du hevalên me jî zêde kal bûn em man (18) yekê turk jî binavê (nuxutin hilmî) hate rix me bûn (19), lê girtîyên turk (250) ne,

Rojek ez ji avdest xanê derketim wan dirêjî min kir ez birîndar bûm, lê min jî dido ji wan birîn kirin û hevalên me ji qawîşan bi dirketin şerek tevayî dest pêkir, bi wê piraniyê jî nikaribûn xwe liber me bigrin, jime ez û ê turk birîndar bûn, ji wan heşt birîndar ku yek jê (eşref dayî birîna wî zêde giranbûn û yekjî ji wan bi tufingên esker hate kuştin esker daketin hundurê hepsê tevde xistin bin daran tevi herçar kurên (cemîlê çeto), lê jiber ku birîndar bûm darek jî limin nedan, tevi ku birîna min sivik bûn jî, herçi birîndar em birin xestexanan, di hepsê de jî dana sibehê em derdiketin hewşê, dana êvêrê ew hera hewşê didan ji bona carek di ew pevçûn çênebe, piştî em ji xestexanan vegrîyan ji wan çi kesên weke - eşref dayî - ên çavsorî li hepsîyan dikrin dibûn sebebê wan aloziyan tevde jiwê hepisxanê şandin hepisxane - ên wilayetên di ew jî weke me ketin xerîbiyê, lê ji ber ku mehkema eskerî em li tevaya wilayetên turkistan teqşîm kiribûn, milkî nikaribûn ciyên me bidin guhartin em li wir man.

Piştî ew sergerimên bê tore û zikreş ji hepisxanê dane rêjkirin ên mayîn insanên neşerûd hatin ba me û gotin: arqedaşan hûn çi bixwazin em liber wene? min got: em doza

serdestîyek liwe nakin ji wekhevî pêve, tenê jivan karên hepisxanê yekê bidin van belengazên me jibo ew jî karibin bijîn, wan got: dukan, qehwe, pakêt sermiyanê wan nîne, berberî jî nizanin bila - hemam - ji wan re be, me got: mala we ava, di hemaê de zêde halê wan xweş bû û gelek pere ji dane hev, hingê min ji (bînbaşî⁽¹⁾) re got: doza min evbûn ku bi birîndariya min ev belengaz jivê zîvariye rizgar bin, eger te dît ji îro û pêve min têkiliya xwe bi kesek anî hingê jimin gazin bike,

Em di wan hepisxanan de salek berî ku turk efûkî tefayî bidin yanî di /1927/ de, ji xetê toros pêve xetek tirênê nû giyandin (qeyserî) ji wê havilkarîyê (îsmet înono) ê kosmopolît hate qeyserî bi wê munasebetê gotar da û got: cumhûriyeta turk - di welat de ev pêşketin pêk anîne tevî ku ew peyman a çekirina rêya tirênê hêj (sultan di /1903/ de bi (almanya) re imza kiribûn, lê (îsmet) ji kuştin, wêran kirina kurdistan ne peyîvî, ku di wê salê û zemanê gotarên wî de, hukumeta turk binavê ku li tevaya kurdistan nufûs wê nû bêgirtin, emir dan ku di filan rojê de kesek ji malên xwe merin derek ji bona nufûsê: lê di wê roja gotî de libajar û qezan nufûs birhev dikirin, lê li tevaya gundan dest bi qetil amê dikirin, da ku wan bicarek ji nufûsa turk bi mirinê derxen, di /1928/ de (Roznama Miliyet) di sitûnek xwede ced-

1 - bînbaşî (ilmî beg) ji (sitenbol) libatê (ittihad tereqî) bûn. ew jî li mehkema (anqara) hukum kiribûn, diwan sê salan de min libawî xwend kitêb ji wî ji sitenbol ji min re di anîn ku diya wî dişandin, piraniya wan kitêban navê (sihûlet kitabxanesî) liser wan bûn.

welek da vekirin û dinivîsî ku ji /1925 - 1928/ li wilayetên şerqî bê ku karibin bêjin kurdistan de (700) hezar insan hatîye kuştin, belê di gotara (îsmet) de pêş ketin ew bûn, yanî turk di kuştariyê de dv çend pêş ketine,

HER wekî di birên jor de hatîye gotin: di wan sê salan de li tevaya kurdistanê bi cengdariyek kumadosî şoreşgêran li herderê dijwarîyên mizin digiyandin leşkerên kemalîstî, bê ku dijwarîyên mezin li wan bibin di nav çiya, gêlî, gedûk û daristanên kurdistan de leşkerên turk li hember şoreşgîran bê pergal mabûn, roj bi roj hêzdarîya şoreşgîran zêde dibûn, generalên turk bixwe didane zanîn ku ji vê herba komandore tu çare nayê ditin ku emê karbin ji awan bi awakî dawî li wan bînin, lewre ciyên wan nayên naskirin dinav çiyande bi durebînan lime tersut dikin, heya ku eskerên me kete gêlî û gazez asê û bê keys hingê lime didin piştî dijwarîyên mezin giyandin mi xwe didin alî bê ku em wan di îriş û vekîşandinê de jî bibînin,

JIWÊ bizava şervanî pêve diwarên siyasî de jî ji nav şoreşgîran hin ronak û siyasîyên kurd daketibûn - sûrî ku hingê (firansa) lê mandater bûn, çewa ku ji awirpa jî (celadet, kamîran, sureya beg) kurên (bedirxan paşa) ji misrê (memduh selîm wanî) di şewirdariyê de (general şerîf paşa) jî (parîs) jibo pêk anîna civatek siyasî bi wan re didan û disendin, ew siyasî û ronakên gotî tevde li (sûrî) giyane hev, di /15 gulan 1927/ de li çiyayê (libnan - bihemdûn) civînek siyasî dane girêdan, diwê civîna tarîxî de binavê (XWEYÎBÛN) sazmanek siyasî dane mezrandin, jibona zanistîya zimanê kurd ew riportaja ku di /1922/ de - sitenbol

- hatibûn girtin jibo ebcedîyek xweser (emîr celadet) bivan tîpên latîni (alfabaya) kurd pêk anî, bi zimanê wê sazmana (xweyîbûn û şoreşgêrî) kovarek binavê (HAWAR) der dixist, belê wê (civata xweyîbûn) doza kurd û kurdistan ji çenbera wê pêçandina turk giyandin mehafilên diwêlî, mesela kurd bû dozek beynelmelel, dema hukumeta kemalîstî dîtin ku ne tenê şoreşgîr di kurdistan de lê bi xebatên siyasî ji derve gavadane xebatek mezin, ew xebata ku bingeha rêjîma turk dihejîne, bi kuştina jin û zarukan nikarin berge li pêşîya wan bigrin, ji hîlebaziyan pêve ji wan re rê nema, xwistin bi efûkî umûmî şoreşgîran ji çiyar daxin û wan siyasîyên derve jî bikşînin hundur da ku bi hin awayên xwe - ên cengizî hêdî hêdî yeko yeko wan bidin winda kirin, lê ew gumana wana siyasîyên der vala derket, dema efû dane îlan kirin kesek ji wan siyasîyên gotî ew lixwe qebûl nekirin ji hinên hindik pêve,

BIWÊ DAXWAZA MEL'ENET Û SÎYASETA NA EXLAQÎ

BELÊ biwê daxwaza hîlebazî efûkî tevayî dane îlan kirin tevaya girtîyan ji hukmê (5 - 100) salî di /16 gulan 1928/ saet heşt û nivde em ji hepisxanan derxistin, ber derê hepisxanê biwê jehra ku di nav şekir de dabûne me, her wekî rehmek mezin bime kirine yeko yeko - walî, qumandanê jandirman - jimere gotar didan, qumandanê jandirman got:

- Hukumet dawî pê agahdar bû hûn hatin xapandin - yanî

ligor gotina wî ku hin dewletên biyanî em xapandibûn, min got:

tu kesek em nexapandine û nikarin me bixapînin, biwê gotinê awirek tehil li min veda lê ne dibûn ku di wê piropogandê bê li min bide, lê di vegeerê de dema min kaxizê vegeerê bir ku imza, bike, di daîra xwede bi sewtan gelek li min da,

Di wan gotaran de digotin bêjin: her bijî cumhûriyeta turk û xazî mustefa kemal paşa, ji tirsan girtîyan digotin, lê min negot, dirix minde kurên (cemilê çeto) bûn (feramez) ji bira - ê xwe (evdê) re got: ma tu nabînî ji devê hesen bijî derketîye, walîjî gotar da lê gav neda wan gotinên qumandanê jandirman, dawî got:

- Kurên min, dinav wede yekê timî ji wan jin û zarukên menfire istida dinivîsîn, ji we kîbûn pêşve werin? ez ber bi wî ve çûm û min silav lê kir, wî bi erebî got: dibêjin elihsanû biltemam - min got: fermo paşa? wî got: eger tu daribî ji saet (9 - 12) de bê li ba min ronêyî ev menfiyên belengaz derin ji xwe re di xebitin hin heqê wan nadin an di nav wan de pevçûn çê dibe, derin istidakî bi pênc kaxizan dinivîsin ku rojek heqqê wane, rojek jî li daîran digerin dibe du roj, jiber ku turkî nizanin, xeber bidin, tevde bila rast bêne bamin tu ji wan re bibî tercuman hingê tu xêrek mezin dikî, min got: paşa ev yek ji daxwaza mine ku ji wan re her xizmetê bikim ji xêrê peve ez û ew minetkarên tene, got: bijî

wek daxwazên hrroj sê saetan ez diçûme daîra walî, çi dema hin ji wan menfiyan dihatin çi nivîsar di dest wan

bûna dihêştin û digotin: bnêre bê çi dixwazin, piştî ku min daxwaz pê didane zanîn, tavil kaxiz dinvîsî û didane wan û digotin: bibin ba mezinê polîsan eger daxwaza we bicî ne anî dîsa vegrin vir bamin, roja sisîyan min jêre got: paşam ez cigare vedixum, tu nbêjî ev xortê ha terbiyekî malbatî nedîye lewre ne rojeke, got: yaho te çîma negotiye, vexwe û dûxanê bera nav çavê min bide, ez bi meaşê xwe dixebitim ju insanî dixebitî,

PIŞTÎ em ji hepisxanan derketin ez sê mehan hin şeş mehan jiderve man, hrroj esrek em diçûn li daîre - ên polîsan me imza dikirin ku em livirin, heya navên me di roz man de bihatana belakirin, hêj me daxwaz namekî tevî wê roznamê didane walî wî jî hewale -ê qumandanê jandirman dikirin, hêj kaxizek jibo vegra welat didane me, ne tenê mêr heya jin jî divabûn herin imza bikin, rojek ez li daîra serqumsêr (jina şêxfexrî) jî hat, jêre got: pîça xwe serçavê xwe bavêj bê ez zanim tu kiyî, min got: bey efendî çi heqê te heye? eger pîçe hilda tuyê çewa zanibî ew kiye? ên ku bê pêçene ji muhra wan pêve tu navê wan dizanî? heya ku vê nasbikî, ji min re got: têkilî bi wezîfe - ê min meke ji tere ewçend desttûr nîne, min ji jinikêre got: perî - pêça xwe hilmede û derkeve bê wê karibe çi bike, (perî) derket ez û ew bihev alîyan destê xwe hilda, min bi qolê wî girt û got: li hember xwe insan bibîne bêheş nebe, got: sibehê li daîra walî ezê bi te bidim zanîn,

roja dî hat ba - walî - û ji yekve got: paşam ev meruv bê edebe têkilî bi karê min dike, walî bi xeyid lê vegerand û got: gotina xwe li xwe vegerîne û tu edebê nasbike, ev

meruv zêde - ê gumana min û te exlaq perwer û edebê dizane, ku bê hember tiştekan vê xizmetek insanî dike, lê ez û tu li hember meaşek vê xizmetê dikin, biserda jî em jêre bêjin tu nezaketê nizanî? berê xwe da min û got: mesela te û serqumsêr çiyê? min jêre buyera di nav mede da zanîn, hingê walî got: gotina wîye eger jinikê pêça xwe helda ji xweşikî û ne xweşikîyê pêve tuyê çi nasbikî? divê em zanibin ev menfî jî weke me insan û xwedî teqalid û şerefin, madem muhira wê pêrebûn û berî hingê ew muhir li defterê heye hildana pêçê çi divaye ya qumsêr? min got:

paşam, eger serqumsêr emir bike, hatina pîrekan ne divaye, ezê muhrên tevan bixim kêsek û bigrim ba xwe her esran ezê ji dêla wan ve muhir bikim, lewre ew belengaz biwê hatinê heqê nîv roja xwe dixisirin, dema esrek jikar diqerin xwedîyê kar heqê nîv rojê dide wan, ser qumsêr got: heger kesek ji wan revîya tu digrî serxwe? kanî senedekî resmî imza dikî, min got belê, walî got: na kurê min vê megre ser xwe min got: paşam navbera ciyên jê hatine zêdeyî (1500) kilometre, wê ev pîrekên belengaz bi zarokên xwe ve çewa di ser ew çend qereqolan re derbazbin û birevin? ji milê dî ji wan re efû hatîye derin welatê xwe wê çima birevin?

Bi wê gotinê her wekî keysa wî li min hatibî hema zûka senede liser min nivîsi û da walî, walî xwend û got: ez vê qebûl nakim û nahêlim ku tujî imza bikî, min got: bi destûra te ezjî bixunim, têde - ên senedê ev bûn - eger ji wan xwedîyên muhran yek winda be an bireve hingê biwê mesûliyetê ez dîsa panzide salên hukmê berê di hepisxana

nigde de liser xwe qebûl dikim - her çendî walî xeyîdî jî lê min imza kir, hingê walî got: madem ezjî imza dikim divê nivîstek jê li ba min be jî ber ku ezjî têde hazir û şahidim,

piştî dayîna wê senedê min tevaya muhrên wan girtin ba xwe rêya wan jî wê daîra çepel da birin, wê şevê - midîrê iskan û duktorê sihe - herdû derin mala - walî - jî wan re dibêje: kurd giyaye fedakarîyek bilind, wî xortê liba min tercuman jî bona dilovanîya jinên kurd ew seneda bi hukmê panzide salan hepis liser xwe imza kir,

piştî derketina jî hepisxanê kete meha çaran jibo vegera welat navê min li rozmanan der neket, min jibo xwe istidaki nivîsî û da walî ku, vaye vegera me xuya nake karmendekî bidin min da ku pê bijîm, lewre gund û malên hatine şewitandin û kuştin, ên ku hene jî muhacir bûne em nizanin cî û warên wan likune, li vir jî hukumet tiştê nade me, walî ez şandim ba - reîsê beledîya nigde mustefa beg lord bûn - min silav lêkir û daxwaz nama xwe danî ser masa wî, bê ku rahêje çav lê gerand, paşê serêxwe hilda û jî min re got: zatê te dikare jî min re bide zanîn ku hûn li hember kîjan hukumetê rabûne? biserda jî bê fedî jime dilovanî û huqûq dixwazin? em di berîka xwede mar xwedî nakin, ew meaşê ku bidin te xortên turk hene ezê bidim wan te naskir? min got:

Belê min naskir, çewa berê nas dikim, tevî vêjî ez jî te memnûnim, got: tu li hember çi jî min memnûn bûyî? min got: dibûn ku rojek hinan jime bigotana ne divabûn ku em welê bi sertî ketin rûyê turk, me bi reyên resmî de biwanre bidana û bi sendana belkî hêvîyek di wan hebûna? lê te

bime da zanîn ku tucar wê hêvîyê jime mekin û ji were nebe gumanjî, bivê danezanê jite memnûn bûm tejî naskir? biwê bersifê awirek zêde tehil li min veda ez ji ba wî derketim,

Vegeriyame ba walî, pirsî, û got: jitere çi got? min got: paşam goh mede, got: çima goh nedim bê jitere çi got? tiştê ku ji min re gotibûn min jêre got tevî ku min bawer dikir ku walî jî turke, piştî xwe da kursiyê û kesrek kûr veda û got: çibkim kurê min gilîyên xwe bi (xuda) bikin û kaxizek nivîsî da min û got: here ba - mudîrê sihe - di çûnê de li salonê min xwend ku ji - mudîrê sihe - re dibêje: jivî xortê giran buhare ligor pêkarîna xwe alîkarbin, min ew kaxiz da (duktor - xwend û got: fermo ronîştim di nav mede mase, ligor adetê cigare da min û du qehwe xwestin piştî me vexewar ji minre got: arqedaş ezê sê pirsan jite bikim di vê tu bi awakî rast û rohnî bersifa min bidî, ku pirs evin:

A - di dest pêka şoreşê de di nav mehek de we (33) merkezê, hukûmî vegirtin ku di nav wan du wilayet hebûn, ew hêzdarîya weya birûskî di cengdarîyê de çibûn? bersif.

- ew hêzdarîya welê birûskî ji dilawerî û cengawirîya kurd re ne tiştêk xerîbe, lê vegirtina meya hajaran xelet bûn.

B - dinav sê mehan de we cengdarîya cebhe berda û dest bi cenga kumando kir ji ber çibûn? bersif,

- ew herba cebhan ji ewilve xeletbûn, divabûn ji dest pêkêve me dest bi cengdarîya komandosî bikrana, xisara me hindik / A/ esker zêde,

C - we di şoreşê de daxwaz bi dest nexist esbabên der û hundur di nav we û rûyê wede çibûn? bersif,

- Yek jê di zurûfên wî zeman û mekani de me destek diwêlî

bi dest ne xist, a diduyan, dinav şoreşê de sazmanek siyasî nebûn ku vê efûya turk qebîl nekin, vê efûyê şoreş sekinand, - piştî wan pirsyarîyan ji min pirsî û got: tu walî çewa dibînî? min got: vî walîy î gumana min guhart, ligor agahîyên tarîxî û xesaisê wanê nejadî min digot: di turk de insanê, adil dimoqîratî û bi insaf nayên dîtin, lê dibînim ev walî zêde insanek adil dimoqîratî û ji kesên belengaz re dilovane, wî got:

ew gumana te tiştê tarîxî û îlmîye lê walî ne turke apê me ji kurdê (hekarî mala terxano) ye, ez jî ji (kela melazgir hesenî) me (mudîrê iskan ji (kurdên erserum) e, êvarê li filan qehwê be ezê bêm, em herin mala (walî) hêj nû min nas-kir ku dema min ji wan menfîyan re istîda dinivîsîn tavil cî digirtin û tayîn jî didane wan camêrîya (walî û mudîr ê iskan) ê bûye ew tercimanîya min ji wan belengazan re dîsa ew hirsêwî ê qewmî buye, êvarê em herdû çûne mala - walî) ku (mudîrê iskan) jî lêye,

Diwê şevbêrka tarîxî de berî her tiştî pîrsa şoreşê di her awayên cengdarî, şewata gundan tevî gundîyan qetil ama jin û zarûkan ew mehkeme şeklî îdam û nefî çî di jwarî bixwe girtine ji min dipiorsîn, min jî bi awakî kurt û kin ji wan re bi agahîyên xwe didane zanîn, di bihîstina wan felaketên welê nadîde de bi dilbirîni ewjî bûne pardar, liser wan guft û goyan hersîyan bi awayê jêr rayên xwe dan:

1 - walî got: sebebê van felaketan nexwendine nejadê ne xwenda nikare daxwazên siyasî bi dest xe û serbest bijî çewa ku nikare xwe ji sitemkaran jî bi parêze, çî weqta ku di her gundên kurd de bi hindikî sê çar bi wan re sertevîk û birovê,

yek dido bi wan re beklorya hebe hingê dikarin xwe rizgar bikin, lewre xwenda - ên bajaran ji hirsê xwe - ê qewmî, teqalîd û adatên xwe jî cuda bûne,

2 - iskan mudîrî got: belê nayê înkâr kirin xwendin û zanîn her daxwazan bi dest dixê, lê sutfe - ên zeman jî daxwaz bi dest xistine, çewa di herba cihanê a pêşînde biwê sutfê çend dewlet ên ereb û aferîqa derketin ser mesreha tarîxê bê ku bizavek wan jî hebe, diwê herbê de em lixwe ne şeyarbûn, eger herbek dî çêbe emê jî jê fêde bikin çewa ku kirine,

3 - duktor got: heşmendîya we awirên îlmî û tarîxî de rastîyê di hingêfin, lê berî ku herbek didûyan çêbe di nav mîlet de sazmanên siyasî yanî partîyên armançdar tunebin, wê çî karibin di wan zurûfan de havilek siyasî bê destxin,

BIRÊ DEHAN

Institut kurde de Paris

Institut kurde de paris

VEGERA MIN JI NIGDE

BER BI WELAT

Her wekî li jor hate zanîn ku vegera me ji anedolê ne bi emrê wilayetan bûn, wezîrê daxilî her carê listekî navan didane roznama (mil îyet) piştî ew navên listê di roznamê de hatin belakarin hêj destûra me didan, jê û pêve navên me bi sûcê meve bişûn de dişandin wilayet û qeza - ên me, da ku ji awan bi awakî yeko yeko me winda bikin, çewa ku ew emeliyâtên kuştina me di welat de wê li pêş bêne naskirin.

Ligor wê resmîyata gotî, di meha /eylûl - 1928/ de navê min û çend hevalan di roz nama gotide hate belakin, me bi tarîx û jimara roznamê daxwaz namekî me da walî wî jî hewale - ê alahî qumandanê jandirman kir ku herdû imza bikin hêj wê daîra emen wesîqa veogerê bideme, dema çûme ba qumandanê jandirman hêj ew gotina mina ber derê hepsxanê di bîra wîde bûn, tevî ku wesîqe imza kir jî lê wî bê edebî gelek li minda, belê herçî xwendan hersibehan jibona derketina navan di roznamen de berê xwe didane - xelqewî - ku her bêşên roznamen jî dihatin wir, ew jin û zar ûkên ku diçûne xebatê divegerê de ew jî lime xwendan digeriyan pirsra derketina navên xwe jime dikirin, ên navên wan derdiketin herwekî jê mezintrî ji wan re mizgîn nebûn, da ku jiwê giriftariya xeribiyê rizgar bin,

Heya ku li wir bûm ez li navên wan digerîyam û min ligor tarîx û jimara roznamê ji wan re istida dinvîsi û didane pêşîya wan li daîran bi wan re digerîyam, jiber wê çendê dema navê min derket ji wan belengazan re şînek çêbû, ku wê kî li navên wan bigere û wan li daîran bigerîne heyânî ku wesîqa vegeerê bi destxin, wiha renge berê min li welat lê heşê min bi şûnde di nav wan de ma,

Jiber ku heqê kirya rêya me liser hukumetê bûn, rêya vegerêjî wan didane ber me, ji (nigde) em bi siwarîya erebe - ên hespan şandin (olûqîşle) istasyûna xetê (tirêna toros) liwê em xistin tirênê, di (adene) re em giyandin istasyûna (binîya mardîn) ji wir bi makîne em çûne (diyarbekir) ji adenê min birûsk li (diyarbekir) veda bûn, deme em giyane ber bedenê li (deriyê - mardîn -) bira - ê min (emer) li benda min çavê wî li otomopîlan digerîyan, me bixwere hilda em çûne otêlê, liwir jiminre got:

Herdû bira - ên (şêx seîd - evdurehîm û mehdî - bivê efûyê ew ji - sûrî - hatine li (otêla anedolin) em çûne ba wan û min ji wan re got: gelo çima hûn hatin? hûnjî diwê sazmana siyasî (CIVATA XWEYIBÛN) de aza bûn, ma ew jî tevde bi efuya turk vegerîyan? gotin na, lê me di siyaseta diwêlî de li ber xwe rohnîyek nedît, inglîz û firansa sînôrên îro bi turk dane qibûl kirin, hukumeta kemalîstî li hember qafqas sînôrê rûsya kirine sênc, rûsya polşevîk ji dinav xwe û turk de sinorek nû danîne (qars û artevîn) jî biser de berdane da ku di sînôrê wan de turk dost bimîne, lê ew daxwazên diwêlî bimere nehêstine, jiber wê çendê em vegerîyan, min got: ma em nerin gund? jiber ku (mehdî) li gundê me



şêx Ebdirehîm

bûn, wan got: jiber ku em ji derve hatine divê em. - mufetiş - bibînin hêj herin, mufetiş jî ne hazire heya ji - anqara - vegere, divê tujî nerî di hin awan de lazimîya me bite heya heya em tevde herin, diwê hindavê de (wekilê mufetiş) jêre (mumtaz) digotin⁽¹⁾ jimere got: hûn mêvanê muftîşîyê ne otêl û xwarina we liserme, divê yek ji we bi min re bê ez xwarin gehê pêş kim da ku ji were rojê sê dan xwarinê bînin otêlê heya ku - mufetiş bê ez bixwere birim (merkez loqantasi) jêre got: vana li (anedol otêlêne) divê hûn ji wan re herroj lîsata xwarinê bişînin çî xwestin ji wan re bi şînin li cî ftera xwe liser mufetişî binivîsin,

piştî ji loqantê vegeyriyam herdû şêxan got: hesen - dibe ku xwediyê loqantê peyayê wanbe dinav xwarinê de derman nedin me, divê em - xwediyê wê xwarin gehê nas bikin bê turke an kurd de, ez dîsa vegrî - yame loqantê û min jêre got:

- efendî ez dixwazim adresa te bigrim, jiber bajarê meye emê timî bîn û herin bila dinav mede nasî hebe çêtire, wî got:

- no divê daxwazê de tişteyê heye, min got naxêr,

- dema jiminre navê bav û ciyê xwe da zanîn, min dît ku (bedlîsiye) ji minre got: te naskir ku ez kurdim û weke we xwe û wacibên xwe û wacibên xwe jî nas dikim, gumanên ku

1 - belê ew wekilê mufetiş kurdên istenbol - bûn, hin xebatên wî ên qewmî hebûn, nemaze di cenga cihanê a didûyan de lê mexahin hin heval ên me - ên ku di singê wande ciyê veşartinê nebûn, da ne eşkera kirin ku hingê em li sûrî di /1943/ de turk ew camêr winda kirin bê ku jin û zarûkên wî laş û mezelê wî bibînin!....

hûn dikin xeletin, bivê mana xwarin dayînê ezê jî bitere bêm otêlê, em tevde çûn, min ji wan re da zanîn ku jimeye, hingê şêx evdurehîm - jêre gumaname da zanîn, wî got:

qenc bûn ku we ezjî livê gumanê şiyar kirim, heya ev xort neyê ez ji were xwarinê naşînim, jiber ku dibe bi hin şagir-tan van tiştan bidin kirin, dema ev hat ezê nû liberwî ji beroşên tevayî ji were xwarinê dagrim û ewjî bi wan re ji were bînin, jê û pêve ez jî hin agahîyan bidim we, evên li oda hember we bi navê mêvanan cî girtine tevde muxabira-tin, liser we nêrevanîyê dikin, bê kî tê ba we, dema hûn der dikevin jî li dorwene, jiber vê çendê em nikaribûn bêne ba we, niho ez vegezi wê gazî min bikin, lê ezê bêjim mufetişîyê ez bi xwarina wan teklîf kirime, ez çûme ba wan ku firaqên me liba xwe nehêlin û ji wan re çiqas xwarin divane divê xeberê bidin min,

piştî pênc rojan mufetiş hat: tevî ez ji hundur hatibûm çûna ba mufetiş ji min re ne divabûn, lê ez jî bona van agahîyan biwanre çûm, mufetiş jêre (ibrahîm telî) digotin, bi esil ji erebên - şam - bûn, meruvek zêde canbaz bûn, ji (şêx evdurehîm) pirsî û got: şêx efendî (en esiliniz nedir) yanî ji koka xwe ve hûn çine? şêx got: ji koka bingehîve em kurdin û kurdî di roj heletê navîn de nejadek bi her salixên tarîxî û exlaqîve şerîfe, - wî got: şêx efendî rica dikim min bê dax-wazek siyasî û neqîd jite pirsî, lê te bi awakî ne tebîî bersif da, şêx got: no min ji waqîe mentîqa tarîxê salix da ne zêde, wî got: çima hinên dî weke te nabêjin? wî got jiber ku ditir-sin, di rix xwede ê ronîştî ji (ziya beg) ê (hezro ji mala sêv-dîn paşa) pirsî û got: ziyabeg, eslê we çiyê? wî bê şerim û

fedî got: eslême erebe - jiber ku (şêx) dizanibûn têkilîya min bi tarîxê heye, zivirî ser min û got: divê gotina (ziya beg) de çi agahî liba te heye? min got: eslê wan ji kurdistana roj helat ji mîrekên (erdilan) in, lê jiber ku bihîstîye mufetiş erebe xwe digîne wî ku hingê bawer nakim mufetiş wî ereb qebûl bike? liba mufetiş ku ez jî ji malbata şêxim, berê xweda (şêx evdurehîm) û got: walahî hûn di nav kurd de malek serîh û şerîfin, çewa bawerîya meruv bi neyartîya we tê wiha renga bawerîya meruv bi dostanîya we jî tê, û ji wan re got: hûnê li çi deverê bibin wargeh daku em zanibin jibona ji were alîkarî bikin, şêx got: niho em jî nizanin jiber ku rewşa welat hatîye guhartin çi devera ku lê hêwirîn hûnê zanibin,

Em ji ba wî vegeerîyane otêlê, roja dîtir mulazimek hate otêlê û got: şêx evdurehîm - jiwe kiye? merkez qumandani dixwaze kermke ba wî, dîsa şêx ji min re got: bi min re were, em herin ba wî bê daxwaza wî çiyê?

Em bi mulazim re çûne ba (husnî beg merkez qumandani) di xaniyê mala (qoce usêp) de bûn, bi awakî politîkî di rûde bi dil geşî em hember kirin, ji mer qehwe anî û bi destê xwe cigare dane me, wî jî di nav gotinan de du pirsên berovajî ne di cîde gotin: lê şêx biwê mîrxasiya xweya mak zayî ji mufetiş serttir bîrsifên wî dan, ku gotinên wî evbûn:

- şêx efendî dema tu bi peyayên xweve berbi sûrîve diçûn, li çiyayê mazî leşkerên me hûn pêçabûn lê me emir da ku rê bidin wan bila herin mîrxasên welê ne - ên kuştîne, an na hûn nikaribûn wê zincîra esker biqetînin û jê xilasbin - şêx evdurehîm got:

- qumandar beg eskerê we dişerde ew dilovanî bi kesîre nekirine heya ku bi mere bikin, lê cengawairên kurd ew zincîra gotî liberxwe dane vekirin em derbazî sûrî bûn, dişa got:

- şêx efendî, neho tarîx bime didin zanîn ku (zaz) bi eslê xwe turkin

- şêx kenîya û got: ji gotina te ev tê zanîn, dema ku (zaz) turkbin hingê bê şik kurdên dî jî turkin - berê xwe da min got: tukarî bi agahîyên tarîxî bersifa qumandan bidî? min got: eger qebûl bike? got: belê,

min got: qumandan beg ez bawerim ku tu dizanî, di bawer mendîya islamî de dema hûn ji - mawera elnehir - derbazî kurdistan (keleha bayezîd) bûn, ên binavê bawer mindîya dîn hûn bi dilovanî hembêz kirin kurd bûn lê (zaz) ku em ji wan re (dinbilî) dibêjin, ji lema nejadê kurd şax vekane zimanê wan (pehlewîya kevin) ne, eger em xwe bi tarîxê bigrin hingê mentiq eve, mejî bivan agahîyan tarîx xwendîye eger tarîx tevde xelet bin an em bawerî bivan rastîyan neyînin ew tiştêk diye.

belê biwan guft û goyan jiba - husnî beg - jî derketin hatin otêlê got, min jitere got: tuyê ji mere livir lazimbî, roja dîtir herdû şêxan - çûn xatir ji - mufetiş - xwestin em ji (diyar-bekir) der ketin,

BER BI KAVILÊN XIRABE NAV KOMA SÊWÎYAN:

BELÊ em ji (amed) derketin ber bi landika jiyîna xweya pêşîn gundê xweve diçûn, ku ji amed (70) kilometir dikeve

bakur roj helatê (dicle), pişti me deşt kutah kir giyane kemera çiyayê (toros) çi gundên ku diketin bergeha me tevde şewitî kaviîên xirabe bûn, li nav wan kavilan, jin û zarûkên şehîdan lidor wan kaviîên xirabe lehev kombûbûn, wek teyrên li dor hêlîna xweya xirabe binêrin, lihev dizivirîn û li rûyên hev dinêrin, tevde belengaz, çekên wan zîvar, te lirûyê wan dinêrin weke arî biser wan de bi bare, diponijîn û keser ve didan, her wekî di jiyîne de hêvîya wan nema-bûn, liwan kavilan dinêrin ku wê çewa karibin dinav wan kaviîên lihev ketîde wê ji xwe er hin koxikan çêkin ku zivistan nêzîge berbi wanve tê, berî ku li xwarinê serrax û binra-xan bifikirin, dinav wan pêlên derya xemande mat mabûn, ew dîtî çiqas dijwar bûn ku (58) sale hêj di kodakên çavên minde kilîş girtî mayindeye...

Em giyane gundê xwe ku ew jî ji wan kaviîên gundên dîtî hêj kambaxtirre, gundî meruv û pismamên ku hin ji wan mabûn berbi meve dihatin ku dilê wan geşbe bikenin, lê wan dilên birîn û şikestî ji kenêre perwaz ne didan tenê bê ku rûyên wan geşbe diranên wan sipî dikirin, histirên çavên wan birêz li hinarikên rûyên wan digindirîn, yanî bê gotin di dilê xwede digotin: tu nizanî ku çi felaketên nadîde bi serê me hatine ji wan tenê diya min xwedîyê dilê xurt bê girî ez hembêz wek dema (nebî dawid kirasê yusif bihin kir)⁽¹⁾

BELÊ ji min re jî rojek matem bûn, lewre di nav wan de

1 - Ew diya min bûn ku destê em li - diyarbekir - li mizgefta (Behram paşa) girtî. me nanê ziha bi ava henîfyên gerim dixwarin, rojê du caran ji lime didan, dema em birin hepîxana milki hate ba min, dît ku ez gelek zeif bûme, jiminre got: şîre min li te heram be. xuyaye tu ditirsi. min nikaribûn jêre felaketê bêjim.

piraniya meruv, pismam, hevalên me tunebûn, tevde hatibûne kuştin, sêwîyên wan pêşmin dikirin, hin ji wan sêwîyan ku dêyên wan jî hatibûne kuştin li ba meruvên xw diman, gund tevde şewitandî kavlên xaniyan dinav arîya reşde kiras girtî bûn, tevaya gundiyan li nav bexçan libin siya daran bûn, payîz lê zivistan berbi wan dihatin bê ku zanibin wê çibkin, rê û rêwan liber wan winda bûbûn, xwarin jî ji garisê zer pêve li ba wan nebûn, nan û şorba wan her ewbûn, tenê meywe - ên daran hebûn dibirin deştê teverên ne şewitî didane bi genim, jiber ku hindik bûn wek: bavêjî nav avê, ew garis jî gundê me avî di meha gulane de tov peyda kiribûn û çandibûn, lê gelo wan gundên bejî ên ku libawan meywe nebûn bê wan çi dixwarin?

Me dizanibûn ku turk biwê efûyê em ji çiyar daxistin bin destên xwe daku hêdî yeko yeko me biniqinin, biwê agahiyê (herdû şêx çûne başûr roj hesatê (palo - çiyayê sipî) ku deverên asê rê pê nakevin, lê tevî ku min dizanibûn ku ji wan hepisxane - ên anedolê ewraqên me - ên wê mehkema eskerî li qeza - ên me veqerandin, lê min nikaribûn ji wan jin û zarûkên belengaz biqerim, wan bê xanî libin siya daran bihêlim, min ji xwe re got: heya ewraq ji anedolê veqerin û ji minre çarekî bibînin belkî jivan belengazan re çarekî peyda bikim hêj ezêjî ji gund herim, ji min re daxwaza yekemîn ew bûn ku berî dest pêka zivistanê karibin ji xwe re xaniyan çêkin, biwê daxwazê min - keyayê - gund û her - aza - dane rix xwe, jibona alîkariya avaniya xaniyan me daxwaz namekî da (qaimeqamê - licê) wî jî em hewale - ê (diyarbekir mufetişî) kirin, min ji - mufetiş re got: ev gund

liser rêya wilayetê û nav du qezan de merkezek kontirole ên hatine gund li bindarên bexçanin, jibona avakirina xaniyan jiwan re alikari divaye, çewa ku di awirên şiyasi de ji gund liser rêya seyahane bê avakirin ji hukumetêre jî lêwere, biwan propagandan mufetiş ji alikariyê re biryar da û em hewaleî qeza - ê kirin, qaîmeqam û azayên xwe ji gund re pere teksîs kirin di bin nêrevanîya (yûzbaşiyê jandirman) de wê her çend rojan carek bê binêre bê ava dikin an nakin. pere dane keyayê gund û pê muhir kirin, em hatin gund mizgîn kete nav wan belengaza, min ligor navan li wan lêkve kirin û ji wan re got: hûn jixwere bixebitin, tenê ji bo beşit, derî û şibakan pere bihêlin ên dî ji xwe re bidin tiştên zerûrî, gundiyan gotin: hûn sê birane divê sê paran bigrin min got no ji parek pêve ez nagirim, jiber ku di qata binî de çar axurên me nehatine şewitandin em di wan de ne, lê ên we yekcar nînin, her çend rojan carek - jandirme qumandanî - dihatin dinêrin bê gundî avaniyan çê dikin an na, her ku dihatin jiber ku xanî û cilên me nebûn min ew dibirin bin siya darên bexçan, cara dawîn ji min got: ev kurdên dor diyarbekir tevde turkin zîmanê xwe jibîr kirine bi kurdî dipeyîvîn lewre li diyarbekir (aqqoyinlî) yê turk hukum kirine, min got:

- beg efendî berî zayinda (îsa) (5000) sal pêşiyên kurd (HÛRÎ) di virde û asarên wan mayindene, - biwê bersifê awirek tehil limin da û got:

- ji zûve ez lite û weşa te dinêrim, lê te gumana min wergerande rastî min ji xwe re got: evê ji min re belakî çêke, lê me dawîya peran girtibûn piştî du rojan min bihist

ku yûzbaşî ji licê niqlî farqîn bû, di wê çûn û hatina qeza ê de hin dostan ji min re digotin: tu çi xwe dixî ber çavê hukumetê, ka apê te ji gundê we (45) ensan hatine kuştin û dizanî li ser gundê we awirên hukumetê çiyê? an tu bi pirsra efû xapîyayî? min digot: tiştên dibêjin dizanim lê gera min hûn dizanin jibo wan belenga zane, piştî ji wan re xanî hatin çêkirin û hin mesrefên wan jî çêbû, liber min ew biyên jinên şehîd mabûn ku, heryek ji wan min li yekê xwedî jin mahirdikin, ên ditir pîreka umrêwê (40) salî li xortek (20) salî markirin daku ew zarûkên piçûk bêne xwedî kirin,

li nav welat li her mentiqekî çil siwarî bi mulazimek ve binavê dewrîye digerrîyan, êdî li hin deveran dest bi kuştinê kirin, ji wan (kurê emerê faro elî û zavayê wî - eliyê hacî mustefa) herdû daketibûn deşta diyarbekir ba hin dostên xwe da ku çend çîwal genim bi destxin licê dewrîya ku ji - diyarbekir - derketibûn çûne gundê licê ji wan pirsîn wan wesîqa qaîmmeqam a ku çûne ba wî efû qebûl kirine, herdû girtin û pêlav jî ji piyên wan derxistin di nav wan estîrîkê havînê de pêxwas dane ber singê hespan zêde î (30) kilometir birin li deveboyîn dane gulan û di wê newalê werkirin,

Herwekî li jor hate gotin ku (bînbaşî Elî heyder) ji hundurê qeseba (licê) ji nav çarşî qeflekî berhev kirin birin li roj avayê - lic ê (newala qij biif ê) bi ser hev de kuştin bê ku gunahêk wan hebe, çewa tahir axa - ji - licê liwê kinîsa (xarpêt) li ba min bûn, piştî ez nefî bûm wî perekî zêde li xwe dan hate berdane, lê meruvek zêde zana bûn li mala xwe ronenişt, çend histir kirin û xulamek pîre di şûna kamyûnên

îro de malê tucaran di nav bajaran de neqil dikirin, kesek çiyê wî nizanibûn, şevêk bi şev tê malê da ku di nimêja sibehê de derkeve, lê casûs dabûne ser mala wî, ew girtin birin di jêr zemîna bin mizgeftê de bi şerîtên telefûn xiniqandin,

ji eşîra - têrikan feteh axayê hacî delî ew jî wan dewriyêên gutî girtin birin (hênê) awakî felaket kuştin,

Di berê (X) de hate gotin ku çar kurên (cemîlê çeto) bi min re li hepisxana (Nigde) bi wê efûyê ew jî vegeyîyan welat, li qeza xerzan li gundê eyîn qesrê - diman wê dewriya gotî herçar di mala wan de girtin birin li - gêliyê têlanê - bi ser hev de kuştin, liher derên kurdistan,

rêr wekî li rûpela (422) hate gotin, wê dewriya - Diyarbekir ku (kurê emerê faro reîsê eşîra Botîyanê zaz) kuştin, du pismamên wî (Ahmê Huseyin û Mihoyê xemlikê) jî edliye mufetiş û du jandirme - ên pêra kuştin, jiber wê çendê, tevaya eşîra Botîyan bi jin û mêran ve girtin, anîn (licê) di yek çiyek de hepis kirin û her roj li wan didan, jin di pêşîya esker de di birin avdest - xaneên mizgeftê, heya ku mecbûr bûn imzakirin ku emê wan herdûyan teslîm bikin, hêj berdan, piştî herdû teslîm kirin li Diyarbekir îdam kirin, belê li herderên kurdistan dest bi wê siyaseta faşistî kirin, çewa ku bi hev jî didane kuştin, ji ber wê yekê di sa bi awakî bela wela şoreşgîr derketin çîyan, nemaze ku şoreşa ararat) dest pêkir,

ji ber wê nizama faşist di meha payîza dawîn de ji gund çûme (Amed) da kû bajar mezine ez çendekî tede bême paraztin, li mehla tirba - sipî min xanî kirê kir û zivistanê li

wir mam, rojek liber deriyê serayî di îlanatên resmî de min dît ku - mudirê tapû ê qeza qulpê nîne şûna wî valaye kesê bixwaze divê istidakî bide (mudiriya tapû a Diyarbekir) ku serê mehê li wê daîrê imtîhan heye, lewre di qanûna turk de ceza - ên siyasî ne dibûn manîi huqûqê medenî, bi daxwaza ku di karmendîya hukümetê de belkî çêtir bême veşartin bê rewşa siyasî çi reng digre? min ji istida da daîra gotî û ji ba awaqatan hin qanûnên feraxet û intiqalê weraset girtin min li wan nêre vanî dikirin, bi roj ji li daîra tapû min belaş wezîfe didît da ku usûlê nasbikim,

serê mehê jibona wî ciyî em şeş ketin ber imtîhanê li hember çarde sualan, ji her şeşan min bersifa (12) de pirsîyaran dabûn, ên ditir ji (9) an û berjêr man, mudirê tapû ji min re got: divê tu herî ba (tehrîrat katibê walî) bê çi rêzanê dide berte û vegere hêj ewraqan bidim te min jixwere got wê çi rêzana walî bi (tapû) hebe? ez derketim ba - tehrîrat katibi bi awakî resmî ji min re got:

ji mufetişiyê ji me re ve emir heye: tevaya karmendan (muwezifan) di berîka wan de defterek hebe, çi bihîstin û dîtînen dijê hukümetê dîtî an bihîstin, divê binvîsin her şeş mehan carek bidin qelema istixbarata mufetişî, eger nekin ji wezîfe têne derxistin - jibo vê tamînatê divê tu nivisarek binav û ciyê xwe imza bikî ku ji vê daxwazê re amade me bidî me emê bişînin qelema mufetişî min got: pekî ez îro hinke ne hêsanîm sibehê nabe? got: berî çûna te kingê be ferq nake,

ez ji ba wî derketim û min ji xwe re got: jiber peşkên baranê ez ketim bin çirê avek mezin her ev xîyanet bi min



nabe lê gelo ezê bi çî rê xwe xelaskim, birastî bi wê daxwaza na kesane zêde heşê min kontak bû, lê ji alîkî ve min agahî bi destxist ku tevaya karmendan li millet casûsin, wê şevê jibo dîtina çarekî li heşê xwe kûr daketim, dawî hate bîra min ku kesê eskerî tamam nekiribe di qanûna turk de nikare bibe karmende,

sibehê min nivîsarek da (mudîrê tapû) û pê da zanîn ku şeş meh eskerî liser min heye ne hatibûn bîra min wî got: nabe tenê ev heye emê yekî dî wekîl bişînin şûna te piştî tu ji eskerî vegrîyayî hingê tê vî wezîveî bi dest xwe bigrî, ev jî divê tu dibin imza xwe de vî esbabî binvîsî û bidî me, da ku ji me re mesûlîyet çê nebe ku ê imtîhan daye ne ev muwezîfe, min nivîsar da wî û derketim,

jiber - diyarbekir - di hundurê bedenê zêde germe di wê havîna /1929/ de ez çûme gund da ku payîzê dîsa vegerim diyarbekir, çendekî ligund mam, ji min re ji (licê) xeber hat ku jibona kuştina te (qaîmmeqam) tufeng daye yekê gundîyê we divê tu hayî ji xwe hebî, ew gundîyê me jêre (ahmed digotin leqeba wî (çîlo) bûn, dema ez li anedolê meruvên min xalê wî kuştibûn, min ew ferkir û jêre got: Ahmed livê belengazîya xwe binêrin bê kî bi serê we anîye min an wî qaîmeqamê ku jibo kuştina min tufeng daye te? ji milê dî eger te ez kuştim tu jî tê kuştin, lewre meruvên min pirin tu hilfîrî ezman xilas nabî, a sisîyan dema xalê te hate kuştin ez li hepîsxana (Nigde) bûn çî sûcê min tê heye? a dawî gelo çîma ji te re nabêjin ê xalê te kuştî ye wî bikuj lê dibêjin Hesên - bikuje? livir jî tu li xwe şiyar nabî? wî sed sond xwar ev tişt nebûye ma ez korim eger ne ji te bûna sala

par emê tevde liber baranan ji serman bi mirana, min jê bawerkir ku ew danezan derewe,

lê dawî gundîyan çend caran bişev tufeng didest de lidor xaniyê me dîtin û ji min re gotin: dîsa min ew tenê kir û jêre got: ez naxwaz im bibim seabê kuştina yekê kurd, çewa pirfîcar çete ên kurd dinav esker de diketin enîyên şerê me, min devê tufengê ji ser wan diguhartin di gotin nezanin wê zarûkên wan belengaz bimînin, niho tuyî, ez naxwazim te bikujim, lê neku rê bidim ku tu min bikujî jibona hin peran û bi devê dijmin, dîsa bi sondan ket û got: carna ku ji nêçîrê tîm li min dibe direng belkî diber xaniyê were derbaz bûme hinan dîtîye, şevêk tevaya meruvên min hatin malê û ji min re gotin: te qenc naskiriye ku (çîlo) li kuştina te digere û tu nahêlî xortek wî bikuje, biroj nikare lê bişev dikare derbek li te de û bireve, dîsa min rê neda gotina wan, rojek ez ne li gund bira - ê minê piçûk (sîrac) û kur apê min (xelîl) dibêjin me nas kir ku hesen nikare (çîlo) bikuje, lê ewê bi piştevaniya qaîmmeqam wî bikuje, hingê emê jî wî bikujin bikevin çiya bê (Hesen) derin liber derê paleyîyê (çîlo dikujin) dibînin ku tufenga (qaîmmeqam) pêreyê gundê ez lê min bihîst û naskir ku ji wan pêve wê qaîmmeqam wê kuştinê bixe sitûyê min, jibo kuştina wî ajanê xwe esker tevaya gundîyan xistin bin daran û gelek peya bi xwe re birin qezayê, piştî çûne esker ez hatim gund min ji (keyayê gund mehmed çawîş) pirsî, got: herçendî me tevan got: diduyan kuştîye û - Hesen - jî ne li gund bû, lê (Mustentiq û mudeî elame) ewraqên kuştinê liser (te, sîrac, xelîl Evdulah û Mehemedê kal) girêdan, bi wê buyerê cara

diduyan giyame nav şoreşîran,

KURTÎ AN NIVÎŞKA BIRÊ JOR

Di vê encamîyê de hêvî ji xwendevanan dive ku ji wan re guman çê ne be ku li ba min tesubîyek qewmî hebûn, nemaze gerek di xwendina birên (V U VI) de we ev rasti naskiribe, dema hûn agahîyan dûrkevin bê guman hûnê ji rastî û waqîê mentîqa tarîxê dûrkevin û di nefsa xwe de wê teesubîya gotî peyda bikin, lewre tevaya danezanan bi jîyîn û dîtînên min ve girêdayî bi zeman û mekanên wan ve hatine derpêşkirin,

ji milê dî ji wan felaket û serpê hatîyên kurdîstana mezin de ji %10/ min nikaribûne buyeran berhevkim û bidim zanîn, jiber ku ji dîtînên min nepenî û dûr bûne, danezanên wan felketan ne jibo teesubî û intîqamê, lê jibo paraztina qudsiyeta tarîxê awir li daxwazê hatîye dayîn, da ku ew helq - ên tarîxî di zeman û mekana de weke helqe - ên berê ji zincîra tarîxa me neyên qetandin û dibin perde - ên zeman de winda nebin, lewre ev serpê hatîyên îro tevde dibin mirêk jibo rojên pêş ji nuhatiyan re, ku di armanca edeb û mentîqa tarîxê de daxwaza yekemîn ji min re evbûn, çewa ku li hember milletê xwe bivan daxwazan min xwe berpir-siyar didîtîn.

BELÊ daxwaz ji nivîsarê ne tenê ew bû ku - kurd - bi van serpê hatîyên xwe zanibin, lê daxwaza min ew bû ku tevaya nejadên (awripa, asîy aferîqa) tevî sazmanên cihan û diwêlî

pê agahdar bin û zanibin ku vî nejadê bed bext ji zemanek dûr ve di welatê de bê çî felaket derbaz kirine û hêz di wan giriftariyan de ne, eger di van awirên tarîxî de me zemanên bûriyên dûr pelandin hingê emê bêhtir bibînin ku vî nejadê me - ê bextreş bê li hember wan lehîyên leşkerên - kild, aşûr, rom, yûnan, teter, mengol, ku di zeman û mekanan de wek kulî bi ser kurdistan ve rijîyanê, di berevaniyê de bi mal û can bê çî rojên reş û tarî derbaz kirine xwendinek tarîxan divê, nemaze ji /1400/ salên bûrî û vir de, binavê (xuda û destûra semawî) di bin sîdariyên dewetên îslamî de çî giriftariyên nadîde derbaz kirine û hêj têde digevizin,

Liber wan sitemkariyên gotî, kurd bê hêz nemane her û her di berevaniya mafê xwe de bûne, nemaze ji destpê kirnê qirnê (19) an ve di rakirina (emaretan) dewrên nizamên eşîrî ve, bê atlahî pêderpê bi şoreşên xûndar û maldar ve rabûne û radibin, nemaze piştî cenga cihanê a pêşîn ve ku di navbera roj helat û ava, sînorê qafqasya derya sipî û xelîc de, zemînê kurdistan hesasiyet jiyogirafya bi xwe girt, hingê ji dewletên kurdistan vegirtî pêve kurd bi welatê xwe ve ketin nav du kevirên aşên siyasetên leşkergehên roj helat û roj ava wek: genim têne hêrandin, ew dewletên ku binavê (heq, edalet, naskirina huqûqê insan û dîmoqirati) xwe didin zanîn ji sitemkariya wan pêve me tiştêk nedî,

Belê di navbera herdû cengên cihanî de, bi daxwazên her dû leşker gehên çep û rast gelek nejadên ku netenê ji îlim û meirifet lê ji teqalîd û adatên civatî de ji paşmende gav dane mesreha tarîxê bûne dewlet giyane sazmana koma yek-tîya miletan jî, lê kurdên ku di rojhelatê navîn de koka

(nejadên arî) di welatê xwe de man dîl û bindest, bi wan daxwazên diwêlî di zeminê kurdistan de çar sinorên dewletên nû peyda hatin kişandin, ew erdê kurdistana (600) hezar kilomitir li wan buye zindan, ku di wê kesafeta cugrafi de (30) milyon kurd dagirtî bê huqûqê insanî giriftarin, heya nikarin bi zimanê xwe - ê maderî bi xunin û binivisnin.

Çi dema bi wî mafê xwe ê kesane ve radibin, netenê dewletên kurdistan vegirti lê dewletên mizin jî di wê sitemkariyê de jî wan welat vegirtiyên me re dibin alîkar û destegîr, dema ku jî caran bi dijiwariyên mezin doza xwe giyandine hin mehafilên diwêlî jî gotine: ev tiştek daxilêye, yanî ew keleşên ku ketine welatek wan dikujin û talan dikin ew in xwedîyê welat û wê pirsax daxilî li hember vê sitemkariyê wê bersif a koma yekitiya miletan, civata huqûqê insan, efuyê diwêlî, jibo esîran mîsaqa cênif, civatên xaçê sor, mehkema edlê diwêlî, yonisko wê çibe? an wê çewa karibin xwe jiber vê mesûliyetê rizgar bikin?

BIRÊ YANZDAN

Institut kurde de Paris

ŞOREŞGERIYA DIDÛYAN Û DER- KETINA JI WELAT

Her wekî sebebê ku cara diduyan ketim çiya nav şoreşgîran hate zanîn, bi wê siyasetê ne tenê ez lê ên ku ji hepîsxanan, ji derve hatin an ji şoreşgêran ber bi wê efûya Turk ve hatin, gelek ji wan bi awakî dane kuştim an girtim, ên dîtir gelek weke min bi çiyayê ketibûn, li herderî bela wela mefreze bi şerê kumandosî dirûyê leşkerên Turk de bûn, ji bona ku giranî nekeve eniya-şoreşa Ararat - ku /1929/ de dest pê bûn, belê bi wê armancê wan mefreze - ên welat liherderî dijwarî digîyandin esker bê ku dijwarî bigîje wan, ji wan mefrezan hin ev bûn:

1 - Li - çiyayê Meleto - ku dikeve rojava bakurê (qeza xerzan) çiyê bi (fermanda Evdurehman axa Elî yê yûnis) ne bi mefreze bi şoreşê ve rabûn, ku firqa eskerê - sêrtê - a diduyan di eniya şerê wan de bûn, çewa ku di şoreşa (şêx seîd) de jî pardar bûn.

2 - Çewa ku ji heremê (cizîra Botan) eşîra (garisan) ronak û niştaman perwerê bilind (şêx Evdurehman), bi mefreza xwe ve di bizavê (nidalê) de bûn⁽¹⁾.

1 - (şêx Evdurehman) zêde li (dêrika sûrî) dima, mufetiş - ji diyarbekir çû cizîra Botan ha (qaîmeqam bekrî) ku kurdê dor (ruha) bû. jêre got: çekên kurdi wergire û here (dêrikê) liwir jibo kuştina (şêx) hinan peydake, bekrî - cû ji peyayên (şêx) Necmo - ê sêrtî) qani, kir, dema derketin ser heval çûne gund - necmo û şêx - tenê man liser nimêjê tufeng xiste piştê şêx kuşt û serê wî jî jêkir bir da qaîmeqam.

3 - Li (qeza - farqîn - şêx fexrî) mefrezekî wî xurt hebû, ji jandirme - ên farqîn - pêve ji diyarbekir esker diçûne qada şerê wî.

4 - Li (qeza licê û hênê) mefreza min ji emeliyatan pêve millet bi armanc bi doza wan ve şiyar dikirin û her hîle - bazîyên hukumeta Turk bi wan didan zanîn, ji milê dî bername - ên jêr didane ber wen şoreşgîran wek.

A - Divê hûn millet jixwe zivêr nekin

B - barê zêran di ber we re derbaz be divê hûn têkil nebin

C - li nêzîgê gundan derîyê şer li seker medin vekirin
bi hin navan yektiya millet mekin bir û bêş

D - bi çekên eskerên Turk herin çete - ên xayîn

E - dema leşker gelek kete heremê hûn lê û dijwarî giyandin ronîştmanan herin li deverêk dûr şerê eskerên wêmentiqê bikin da ku ew giranî ji ser wan ronîştmanan rabe, li wir ji dîsa wan bikşînin deverêk dîtir

Ê - ji mehê carek mefreze li çiyakî bigîne hev ligor rewşa hin buyerên nû rêzanan bidin berxwe

F - kesek nû bigîje mefreze - ên we divê nas bikin kiye malbata wî kiye çima hatîye, tevî wan pelandinan jî pê esker bidin kuştin û ji gundîyan re bêjin vî li filan derê ew çend esker kuştin, jibo nikaribe vegere

G - jiber wê çendê ji - tevaya mefrezan bêhtir taqîbata eskerî li ser min giranbûn û meruvên min zêde dihatin êşandin.

5 - Li navbera (qeza Hênê û Diyarbekir) ji eşîra - rêrikan (mefreza Mehemed ê perî û îbo) li navbera wê qezayê û wilayetê her û her berge li pêşîya hatîna esker digirtin û dij-

wariyên mezin digiyandin wan.

6 - Li bakurê (qeza licê) ji eşîrên zaz (eşîra Mistan) mêrxasê bi nav û deng (Mûso ê Mehmed Eli) ji her mefrezan zêdetir xisarên mezin digîyandin ekerên Turk nemaze şete - ên xayîn, lê mexabin xayînek kurd ew û pênc hevalên wî di xwede kuştin⁽¹⁾.

7 - ji eşîra (Emerê faro) zazên Botîyan ku jêre - xançûk - tê gotin, dikeve roj avayê - eşîra Mistan, dikeve ser rêya (Diyarbakir û Erzerum) li wir jî mefreza (Ahmê Huseyin) di wê rê de bûbûn kelemek, çi dema esker di wê rê de derbaz dibûn li wan didan,

8 - li - cebeqçûr (bîngul) a îro li bakurê - Ferat (mefreza zaza Huso) li ser rêya (xarpêt, palo, cebeqçûr û erzerum) berge vegirtibûn, mefreza wî zêde cengawirbûn,

9 - li rojhelat başûrê (palo) li gêliyê (baxîn) û heremê (sîwan) mefreza (Hesen axayê meman) heya (pîran û qerebegan) bi cengdariyek kumando ve berdewam bûn, ji van pêve ji min re ne nas liher derên kurdistan belawe la mefreze di berevaniya mafê xwe de şervanî bûn, ango jibo vemirandina agerê şoreşê turk efû dabûne îlan kirin.

li vê hindavê divaye ku partîzan bi awirek kûr lê hûr bibin

1 - jiber ku eskerek pir tevî çetan ketin nav eşîra Mistan (Mûso) bi mefreza xwe ve dakete ha min. min jê re got: Mûso - livê mentiqê (mifrezekî Evdurehmanê henî) heye, tucar lirûyê esker tufeng neteqandiye ji kuştina gundiyan xwe pêve, ji milê dî pêgirtiyê (şêx selimê hezane) ku (şêx) bavê mustefa kemelê manewîye, divê tu nêzîgî lê nekî. ew gotina min nexist serê xwe giya wî xayîne gotî di xwede ew û hevalên wî kuştin çû ba hukûmetê, belê ew mefreza ku bibe havalên wan ên ku bi dostê hukum ve bin wê çi bawerî bi wan bê.

ku di wan zemanan de li kurdistan ev bir û bêşên partîyan tunebûn, lê çewa û bi çi kurd di berevaniya girtina mafê xwe de giyabûn wê fedakarîya yekîtî? di vî warî de bersif eve: ji ber ku ji pirsra kurd û kurdistan pêve ji wan re tu daxwaz û armanc nebûn, divê em vê zanibin eger nexwazin zanibin jî, her milletên cihanê jibo millet û welatê xwe xwe feda kirine û dikin, lê jibona felsefe - ên miyafizîk û maddî niwarên biwê comerdiya mal û can xwe feda bikin çewa ku nekirine, jê vê re mîsal:

ji /1965 - 1980/ di nav wan panzide salan de xortên xwenda bi dilbijokî yên aydiolojîyên felsefan, ji wê daxwaza hirsê xwe - ê qewmî qerîyan û di saha kurdistanî de (33) partî bi yek aydiyoloji bi navên muxtelif ew çend bir û bêşên partîyan bi navên muxtelef bi daxwaza jiyo politikîya biyanîyan dane saz kirin, lê gelo çima nikaribûn wê yekîtî û fedakarîyê di nav giranî û pîraniya welatîyan de pêk bînin? jiber ku bi armanc û xesaisê wanê qewmî gazî wan ne dikirin, lê binavê - soro - gazî dikirin - şêro -, ji milê dî nizanibûn bê di nevbera herdû leşkergehên roj helat û roj ava de jiyogirafya kurdistan ci ehmiyek istiratîjî bi xwe girtîye, nemaze ji cenga cihanê a pêşîn ve kurd bi wê ehmiyeta cugrafya kurdistan ketine nav du kevirên aşên mesalihên diwêlî tede tene hêrandin, ji dest pêka esra nozde anve her çiqas bi şoreş ên xundar û maldar ve rabûne wan daxwazên diwêlî li pêşîya wan wek: sedê çînê - her selbîyet çêkirine û dikin, belê di bingehên xebatên siyasî de bê ku bivan agahdarbin, diser zeman re gav didan. wek: berî ku huqûqê siyasî bi destxin an ji wan re bibe daxwaz, dest bi edaletê civatî diki-

rin, wek: kesê hêj erd nekiriye, çîmento û hesin jî peyda ne kiribî derî û penceran bide çêkirin,

Bi tu awayî ji daxwaza pîranî û giraniya millet re ser netewandin, herwekî ew şivan û millet jî keriyên pezên wan bûn, bê ku zanibin an bixwazin ku zanibin, xebatkar xizmetkarê milletin, neku amirên wan, dema bi zanîn ixlas û fedakarî gav bidin meyda tarîxê hingê ew kirinên wan ronahî didin ser kilîş (resim) û navê wan dikevin cedwela mêrxasan di tarîxa millet de, ku wê payedarîyê jî dîsa millet dide wan ne ku ew dikarin bidin xwe.

Belê dema ji van bingehên rêzanan derketin nikaribûn û nikarin tu havilan bi destxin, nemaza (13) partiyên kurdistan mezin, xwe bivan rêzanên gotî negirtin, bê ku berê millet bidin xwe binavên tebeqan kirin bir û bêş liber hev-rakirin, dîsa bê ku zanibin her muqediratên wan bi milletê wan ve girêdayîye, digot: mesîrê me û -silvador uruguayî ve girêdayîye, birêzaneke siyasî civatî û şoreşgêrî xwe negirtin millet jî ji xwe dûr xistin, di /1980/ de ku li turkiye hukmê eskerî pêk hat bê ku karibin bi herbek kumandove derkevin çiyane wek kefa sabûnê di erdê de winda bûn.

Ev danezana tarîxî divabû di cildê (5) dîtin û bîrhatiyên - min, de biketana ber çav, lê di munasebetê de bara pêş gavda vî zemanî,

Di civînek wan mefreze - ên jor gotî de biryar hatedayîn ku bigijim - şoreşa Ararat - da ku dinav me de girêdan hebe ez bi çend hevalan ve di /1930/ de giyane wir, lê di navbera me û wan de (700) kilometir hebû,

ŞOREŞA ARARAT DI SAZMANEK CENG DARÎ DE

Her wekî di rûpela (244) de hatiye gotin: ev şoreş ji nefsa şoreşa (şêx seîd) û bi wê armancê ve bûn, ewên ku efûya turk li xwe qebûl ne kirin xweda ne çiyayê (Ararat) nav cengawirên (celalî) Hesoyê yêlî û ibrahîm beg), bi wê hev giyandina cengawirên kurd di /1929/ de yanî piştî heşt mehan efûya turk şoreşê dest bi şerê turk kir.

cara pêşîn bûn ku ji cengdarîya teqalidên eşîrê şoreşek gavda sazmanek eskerî û cengdarî, daxwaz û armanca şoreşê her wekî hate gotin: her yekbûn bi armanca mafê kurd û rêjkirina biyanîn welat vegirtî ji zemîne kurdistan, bi wê armanca ku ji destpêka qirne nozde - an ve wek helqe - ên zincîrê bi heve girêdayî di berevaniyê de pêderpê şoreşên mezin maldar û xûndar ve kurd ra bûye û ra dibe.

Fermade - ê wê şoreşê (GENERAL IHSAN NURI⁽¹⁾) bûn, di rajêriya wî de qumandanên qehreman ên wek (Ferzende, Elîcan, Seyîd xan, Efif, Memo, Nadir hersî kurên Huseyin paşa) ê Heyderî û hinên dî hebûn, çewa ku hate gotin emîr ceng (Ihsan nûrî) wezîrê berevanî (Hesoyê têlî) bûn, bi gumana ku wê hin dewlet îttîraf bi wan bikin, di /

1 - Her wekî hatiye zanin ku di /1924/ de - Ihsan Nûrî, Rasim, Xurşîd, Tewfîq Cemil - herçar li (Hekarî) liber Turk rabûn, laci derbazî îraqê bûn, inglîz ew laciyeñ siyasî qebul kirin, ji wir çûne ba (simko) dawî dîsa vegeyriyan îraqê, dema şorea - Ararat - destpêkir hingê (Ihsan Nûrî û Rasim) ji - rewandîz di erde - iran de diçûne - Ararat - bi rêde - Rasim şehîd ket, Ihsan Nûrî xwe giyande şoreşê.



General Ihsan nûrî paşa.

1930/ teşkilata xwe a hukum dane çêkirin, (serek komel ibrahîm beg têli) ligor hereman qaîmeqam mudîr serkar û karmende dane çêkirin, hingê nivîsarek dane - qonsilîya rûsya a li - mako îranê, jê xwestin ku em dixwazin bi we re bikevin civînek, lê danezana zeman û mekan sipartîyê weye - lê mexabin tu bersif venegerandin.

Di qada cengdarîya (Ararat) de leşkerên turk (29) alahî bi her tewir çekên cengdarîyên giran ve, li ser wan du general (salih paşa umurtaq û Ebdulah alipdoxan) di enîyên şer de debûn, tevî wê piranî û giranîyê ji lihember wan emeliyatên ku (ihsan nûrî) didane vekirin nikaribûn xwe liber suhna cengawirên kurd bigrin, ji çemê (zîlan) heyanê (seramexinan) dişikestin, piranîya giranîyên xwe tevî kuştî û birîndaran ji xwe bi şûn de li qadên şer dihêştin, roznama (Ararat) a ku ew emeliyatên herbê didane belekirin digîyane her derên kurdistan nemaze - sûrî - lewre ew çapa roznamê (civata xweyîbûn) ji wan re şandibûn,

ji enîyên şer pêve, qehremanên wek: Ferzende, Elîcan û Seyîdxan - bi cengawirên xwe ve bi siwarî derbazî pişt enîyên şer nav ordûgahên leşkerên turk dibûn, wek: gurên bikevin nav kerîyên pez bêlik û tabûrên wan ji hev belawela dikirin, bi mal û can zirarên mezin digîyandin wan, ji wan îrişên gotî carek (ferzende) bi (50) siwarîyan ve derbazî nev eşîra xwe - Hesenan - bû, alahiyek siwarîyên turk ji erzerum daketin şerê wan ji leşkerên turk (83) kuştî û (107) birîndar çêbûn, ji wan (7) şehîd û (9) birîndar çêbûn, ew serfiraziya şoreşgêran ji alîkî alîyê dê,

yûzbaşîyek bi bêluka esker ve çûne gundê (germava ade-

man) ji keyayê gund û kurê wî re gotin: di vê gotin ji me re ji qezayê eraq bînin wan got: emê niho ji gundiyan siwarek bişînin ji we re bînin, wan got: nabe divê tu û kurê xwe herin, piştî ew şandin dest avêtin jin, bûk û keçên keya, dema vegriyan jina çû pêşiyê û jîre ew felaket da zanîn, wî û kurê xwe ji hundur tufengên xwe - ên veşartî derxistin û gazî gundiyan jî kirin, bi hev re ketin navderîyê odê ew gulebaran kirin, tevde bi ser hevde kuştin, lê sed mexabin jinên xwe jî kuştin bê ku gunahê wan hebe, hatin giyane nav şoreşgiran, ew bê exlaqîya nakesane ji herdû generalan re tevî buyera (Ferzende) bû mane ku hêj wê edebîyê mezintir bikin, pêderpê birûsk li - anqera - vedan û gotin:

- ji şerê şoreşgêran pêve - eşîrên Hesenan û Ademan - lipişt eniyên şer eskerên me dikujin, bi wê daneza bê esas emrê kuştariyê girtin, ji nav eşîrên - Ademan, sîpikan, zîlan û Hesenan - ji (180) gundî (47000) hezar jin, zaruk, kal û pîr - berhevkin birin li çemê (zîlan newala dêrê) tev de dane ber tufeng û mitralyozan bi ser hev de kuştin, esker li nav laşan digeriyan ên birînda jî singû dikirin!... heya niho ji turk jê re (zîlan faciyesi) dibêjin, lê ji tarîxa kemalîstî re ne tiştêk xerîbe, ku bi sedan gund bi jin û zarûkan ve dişewitandin, dema em van serpehatiyên milletê xwe bi wan sitemkariyan bidin zanîn ji vê re bê gotin: teesuba qewmî hengê divê xwediyê gotinê xwe nasbikin bê ji me dixwaze ronahiyek rastiyê bixe bin wê tarîya dilê xwe? tevî van jî dema em behsa turk dikin hingê ji wê sitemkariya hukum ne a milletê turk dikin,

piştî wê kuştariya mezin li her eniyên şer şoreşgêran

êrîşên mezin berdane ser leşkerên turk jibo tolvedana wan şehidên pîroz ji tevya şerê salek zêdetir dijarîyên mezin giyandin wan leşkerên sitemkar lê ji esîran re ligor xesaisê xwe her dilovan bûn, bi ser wê felaketê de jî carek heft sed eskerên turk esîr girtibûn ber bi pişt enîya şer ve di anîn, wan jin û zarukan nan didane wan, jinikek celalî umrê wê lidor (60) salî dît ku potîna eskerek qetandî û bê goreye, ji lingê xwe gora xwe derxist û da wî eskerî, wî eskerê ku çil û heft hezar jin û zaruk kuştî bûn, xesaisê wan ew sitemkarî bi xwe digirtin, ê jinika kurd jî ew xesais ê xwe - ê qewmî û tarîxî bi xwe re weraset girtibûn.

Belê piştî ku xisarên mezin bi wan sitemkarîyên wan giyane leşkerên wan, ji serfiraziya enîyên şer bê hêvîbûn weke her car xwestin bihin hîlebazîyan havilek bi destxin ji fermandariya şoreşê civîn xwestin, çewa ku agahe kurd nikaribûn bi bextê wan bawerbin herin li ba wan bikevin civînek, lê wan xesais û bexte kurd di her zemanî de naskiribûn ku tucar bê bextî bi kesek re nekirine eger ji siyasetê re qaîdeye jî, belê bê tirs civatek ji zibatên wan hatin nav şoreşgîran li (pira şikillî) bi hev re ketin civînê, numayinde - ên turk bê fedî gotin:

- xazî mustefa kemel - biryar daye ku hûn şer bisekinînin ji bo we tevan efû di de wê hukûmet tevaya gundên we ava bike û di warên abûrî de jî wê bi xurtî ji we re alîkarî çêbe - numayinde ê kurd got:

- hûn fedî jî nakin ku van pirsên ji uslûbek siyasî ictîmaî edebî û huqûqî dipeyîvin, yanî hûn me mucrim dibînin û me efû dikin, du sal berê me ew pîlana we ya siyasî bi navê efû

dît, divê hûn meana herdû pirsên gunahkarî û reha kirinê (efuyê) nas bikin em di welatê xwe de ne, hûn nijadek xerîb hatine ketine nav çavê me, bi sitemkarî heqê me - ê qewmî û tarîxî didin binlingan, gundên me wêran dikin jin û zarûkên me weke teban bê dilovanî dikujin, edebîyen huqûqîyen mucrum hûnin, dema ku hûn bawerî biheqqê me bînin û ji erdê me derkevin, hingê divê em we riha bikin ne hûn, ji milê dî çima we gundên me şewitandine û çima hûnê ava bikin ku çi dema hûn bixwazin dîsa dikarin wêran bikin, lê deme ew bi daxwaza xwe ava bikin hingê tu kes nikare wêran bike, dema hûn bi vî eqlî hatibin vegezin ciyê hûn jê hatine belê ji wê civînê bê havil vegeziyan, tenê hin girtiyên kurd bi wan hatin guhartin.

Di alîkarîyên propagande û abûrî de: civata xweyîbûn li sûrî her buyer û nuçe - ên şoreşê di kovar û rozmanan de didane bele kirin, çewa ku ji wan re çapxanekî şandin, jin î xsûya (ihsan nûrî) ji - sitenbol - giyandin ba wî, kurdên (Rewan) ên çiyê (Alagoz) berî ku - rûsya - sînor bide girtin bixwarin û pez pir hindik ji şoreşê re dibûne alîkar û dihatin û diçûn.

PÊÇANDINA SÎNORÊN DIWELÎ LI ŞOREŞÊ:

piştî hukumeta - mustefa kemal - naskir ku bi hêzdarîyek şervanî nikarin şoreşê ji hêz bixin, weke caran bi dek û dolaban jî nikarin wan ji a wan bi awakî bixapînin, weke hercar li alîkarîyek diwêlî gerîyan, berî her kesê bi (rîza şah) re ketin civînek siyasî û eskerî ku di huqûqê kurd - de herdû

diz û keleşê niqebek bûn, jibona ku şoreşa Ararat di warên eskerî û abûrî de bidin pêçandin, turk çend gund li sînorê (wan) ê bi ser îran ve berdan, îran jî li rojhelatê - Ararat - çend gund bi ser kurdîstana turkî ve berdan eskerên turk ketin rojhelatê şoreşê jî, bi wê hevkarîya siyasî destê kurdên îran û turkiye ji hev dane birandin,

jibona ku sînorê rewanê (yêrîvan) ê û (Bako) jî li şoreşê bidin girtin, da ku celeliyên rewan kurdên Alagoz, û yizidîn şêxan - nikaribin têkilî û alîkarîya şoreşê bikin, bi (yektiya sofyet) re ketin civinê. û ji wan re gotin: tiliya (ingilîz) di vê şoreşê de heye, ji milê dî berê hingê muxabiraten turk dirêya hin ajanên xwe - ên nav partîya komonîst de wan jî nivîsarek bi nefsa gotinê dabûne partîya komonîstên rûsya, a dîtir ji dest pêka /1918/ ve ji siyaseta (yektiya sofyet) re ne lêwere ku di navbera sînorê qafaqsya derya sipî û tengava xelîc de bi navê qewmîyeta kurd dewletek pêk bê, bi wan daxwazên herdû alîyan rûsya jî di /1931/ de sînorê xwe li şoreşê bi leşkerek pir dagirt ku kesek tenê jî di şevêk tarî de nikaribûn lê derbaz be¹⁾ piştî herdû peymanan leşkerên turk

1 - Her wekî agaha di /1926/ de di navbera (Rûsya, îran, turk û Efxan) de peymanek dostanî, abûrî bazirgani - hatibûn imza kirin, heya /1936/ jiber wê çendê tenê girtina sînoran heya laciyan şoreşa (şêx seîd û Ararat) qebûl ne kirin ji navê pîrsa qewmî pêve. piştî herdû şoreşan hersi hukumetên (turk îran û Efxan) diji kurd û Rûsya ketin peymanan (seîdê abad) jî.

Di vî warî de mêjevanê bilind (musyo Rempo) dibêje îstiratîjîya kurdîstan jî kurd re bûye giriftari. çî dema dewletek awirpi destek rotin jî bidin wan. dewletên şerqî diji wan radibin kesek naxwaze ew îstiratîjî bikeve destê di, herdû jî ne şirkete bi hev re bidin vekirin.

bi awakî seferber û ji sîlehên berê zêdet kete enîyên şoreşê.
Tevî wan pêçandinan jî di warên cengdarî de bi wê hêz-
dariya turk di enîyên şer de tu guhartin çê nebûn, lê di
warê abûrî de dijwarîyek mezin giyandin şoreşê, li her
qadên şer sîleh û cebxane ji eskerên turk dihatin girtin, di
enîyên şer de bi wan sîleh û cebxane - ên wan li wan ved-
igerandin, lê xwarina ku ji wan dihatin girtin têrê nedikirin,
çewa ku welatek fireh bi ronîştmanan ve dibin sîdariya
şoreşê de hebûn, tevde bê abûrî û xwarin man ku dijwarîya
ji şer mezintir ew bûn,

Belê di her zeman û mekanan de dewletên kurdistan veg-
irtî bihêzên xwe nikaribûne agirê şoreşan, vemirînin lê her
û her wan mesalihên diwêlî şoreşên kurdên di welatê xwe de
azadî xwaz vemirandine û vedimirînin

di wê peymanê sê kuçî de ku şoreş dane pêçandin, li nev
welatîyan û şoreşgêran roj bi roj xwarin kêmbûn, heya ku
bicarek zad nema, dest bi xwarina pez û sewalan kirin, heya
ku ewjî kutah bûn, di wê aloziya abûrîde mijek belengazî û
mirina bê gulle girte ser şoreşgêr û welatîyan bi hev re, li
hember wê giriftariya nadîde berê ji (rûsya) û dawî ji (îran)
huqûqê lacî xwestin, ku diwêliyên, exlaqîyên dozek muqedes
bûn, lê mexabin herduyan jî bersifa ne qebûl kirinê dane
şoreşê,

Hingê qomîta merkezîya şoreşê di civînek siyasî de biryar
dan ku bi hêzdariya şoreşgêran divê bîzor derbazî îran bibin
qebûl kirina xwe liser wan feriz bikin, liser wê biryarê tevaya
şoreşgêran bidu biran lêkve bûn, birek di pêşiyêde êriş ber-

dane ser leşkerên sînor wek: silinder ew li erdê raxistin li pêşîya jin, zaruk, kal û pîrên bê sîleh dane vekirin, birê ditir jibo paraztina wan ji leşkerên turk herdû rixên wan û dawîya wê lehîya muhaciran de berevanî dikirin, heya ku tevde li sînorê îran derbez bin, diwê rêwîngîya gotîde gelek jin û zarûk bi gulle - ên dût hatî dihatin kuştin, ji esra teng heyane sibeha ditir roj hilat dawî derbazî erdê kurdîstana îran, li roj avayê kela xweyî bakurê (rizaiye û mako) bûn, zêdeyî (40) gundî vegirtin, ronîştmanên wan gundan eşîrên kurd, bi teqalîdên xwe - ên qewmî û tarîxî bira - ên xwe bi dilovanî hembêz kirin, bi comerdîyek mezin em hember kirin, li tevaya wan gundan çî mala hebûn nan û xwarina hazir lu ba wan tevî teşî û beroşên avê li ber derên xwe li kuçan rêz kiribûn. wan jin, keç û bûkên ciwan ên ku libor teqalîdên xwe li hember mêran av ve-nedixwarin, lê jiber ku çar û pênc roj tiştê ne xwaribûn birçî mabûn. wek peçên herin ser xweyî biser û çav xwe davêtin ser wê xwarina kuçan, bê heşê xwe dixistin devê xwe tevî toz û axê dixwarin, wan jinên gundîyan liwan dinêrîn û digrîyan, li tebvaya wan gundan duxan bûn, ên nan li tenûran didan ên di beroş û sîtilên mezin û navîn de, savar an birinc çê dikirin, her malin ji wan pez an dewar serjê kirin, mala kê mî şêş heft mirîşîk serjê kirin, wê rojê heyane îvarê tevaya wê lihîya insanan têr kirin, kesek jime birçî nema rojên ditir tevaya jinên bi mere û jinên wan gundan çekên me dişuştin,

Roja didûyan piştî nivro me jêpek eskerî alek sipî bi wan re di nav bayê de pêl û kêl dibe ber bi meve tê, hate gundê em lê, pirsîn û gotin: Emîr cengê şîma? min got: li ew koye,

gotin: digem ma amede, ez bi wan re siwar bûm em çûne ba (ihsan nûrî), nivîsarek ji emîr cengê tehran dane wî ku divê hûn sîlehên xwe teslîmê leşkerên îran bikin, ihsan nûrî bersif nivîsê da wan têde gotibûn:

- Em nehatine ku di îran de liber we asê bibin, me heqê lacîtî ji we xwest we neda, tevî ku hem nejadên mene û dizanibûn nêzîgê niv milyon jin û zaruk ji birçînan dimrin, me xwe li ser we ferzîkr, em nêzîgê sînorin û leşkerên turk lihember çavên me sînor dagirtine, em livir sîleh daynin û hûn me bispêrin turk me tevan biser hevde dikuje, çewa ku hûn biwê kuştina çemê zîlan dizanin, rê bidin me em bigîjin bajarên weke: (Mako, kelaxwey, Rizaiye an Mehabet) emê tevaya sîlehên xwe bicarek bispêrin we - biwê birsifê vegeriyan çûn,

Roja dî sibehê me nêrî ku leşkerên îran hawî dorên wan gundan li me pêçane, dîsa deng lime kirin ku sîleh teslîm bikin, dîsa bersifa berê dane wan û dest bi şer kirin, em û gundî bi hev re gullebaran kirin, gulle - ên topan li xaniyan diketin ew gundîyên belengazjî bimere dihatin kuştin, em sê rojan di nav wê qijvijêde man, li hawîdorên me laş û birîndarên jin û zarukên me û wan gundîyên îranê li erdê bûn, lidor (50) kesên ku ji başûrê çiyayê (toros) - em giyabûne nav şoreşê, me ji kurdên îran xortek rêhber peyda kir, di erdê îran de bişev em berbi başûrve daketin, sê şevan em giyane sînorê - wanê ji wir em dîsa derbazî welat bûn, herkesê jime berê xwe dane ciyên xwe giyane nav wan mefreze - ên ku ji nav wan çûbûn, ên ku belewela liher derên welat di cengdariya kumandosî de bûn,

Piştî hatina me îranê ew şoreşgrên ararat - ên ku sax mabûn lacî qebûl kirin, hin jîwan xistin hepîsxanan, (ihsan nûrî) li tehranê zor cî kirin li wir ma bê tevgerek siyasî, lê mexabin di /1976/ de likuçekî tehranê motosikil lê hate qulibandin hat kuştin!... em pê agah nebûn bê qeza û qeder an (savakên şah) an (mitên turk) ew kuştin.

Belê ew şoreşa aramdar jî bivan salixên gelek kurt û kin weke şoreşên berî xwe dinav wan telpe - ên ewrên silbîyetên mesalihên diwêlî de winda bû, tenê behsa jê derbazî van rûpelan bû jibona xwe nasiya hin partiyên dilbijokên bê awirên siyasî, dema ku di mirêka van buyeran de karibin xwe bibînin? lê weke şairê bilind (ahmedê cizîrî) gotiye:

- ger qabilîyet tunebî - hikmeta ustazî çiket -

şermezarî û bednamîya li hember tarîxê ji wê sitemkariya turk mezintir evwe ku, turk liserê (çiyayê - ararat) mezelek çêkîrin li berkêlkê kolosê kurd û gotin (ew kurdîstana xiyalî divir de veşartîye) yanî miletek bi her daxwazên wanên insaniye veşartine, ku ev gotin ji hêzariya insan mezintire û jêre tu qiyasek îlmî nîne, kurd bi doza kurdistan ve her û her mayindeye lê wê xwediyê daxwazan di axa kurdistan de bèn veşartin,

JI ARARAT Û ÎRAN, DÎSA VEGERA WELAT

HER WEKI LI (244) de li rûpelên jor derbaz bûye ku piştî wê efuya turk, di welat de bi cengdariya komandosî li herderî mefreze hatin sazîkirin, her çendî ew bir û bêşên wan mefrezan hindik bûnjî, lê xisarên mezin digiyandin dijmin.

lê pişti ku dawî li şoreşa (ararat) hat, ew leşeker vegeriya nav welat, li her qeza û nehyan tabûran merkez girtin, li qeza licê - (binbaşi derwêş beg) zêde meruvek xûnxur û faşist bûn, her nikarîbûn bihêzên eskerî wan mefrezan bidin rakirin, lê zêde dijwarîyên kes nedî biserê meruvên me, dost an gundên me lê dixwarin, bi awakî kitûber digirtin û dixistin bin daran, jiber wî qasî me tevan çiyên xwe guhartin çûne derên ne nas, li wir jî me hen navên dî li xwe kirin,

Diwê ci guhartinê de ez çûme roj helatê (palo - çiyayê sipî) ba herdû bira - ên (şêx seîd, şêx evdurehîm û mehdî) ku di rûpela (1430) ew behsa min û herdû şêxan - mufetiş û merkez qumandan - derbaz buye, ku ew ji derve ji (sûrî) biwê efûya gotî vegeyabûn welat, lê jiber ku bi hukumeta turk û efûya wan ne bawerbûn, xwe dane wan çiyayên asê nav eşîrên zaz hereqere began pesara (çiyayê sipî). di payîza navîn de ez çûme wir, - şêx mehdî - ligundê (wişkila) bakurê çiyayê (pîreciman ên gulleh) bûn, (şêx evdurehîm) li pesara çiyayê sipî li gundê (sêrîn) xirabe gundê filan bûn, di dest pêkê de ez çûme ba (şêx mehdî) ji ber pismamê min (mehemedê sadiq) pêre bûn, liwir em lidor (7) kesî hebûn, lê liba (evdurehîm) zêdeî (15) de şoreşgir hebûn. hinan ji (şêx evdurehîm) re digot: tu vana li xwe ve dihewîni ji te re li ba hukumetê wê ne qenc be, wî digot: dema ku ez xwe ji wan dûr bigirim hingê ji her daxwazên wan xwe dûr dikim û nêzîgî li hukumeta turk dikim, hingê rabûna me bi şoreşê ve çibû? lê ez gelek caran liba (şêx evdurehîm) dimam,

Êdî zivistan ber bi meve dihat, ku liwî çiyayê siî di meha payîza dawîn de berif dikeve, heyânî adarê rê û rêwan

bicarek têne girtin jiber ku du mitir berf zemîn di nixumîne, liwî gundê - wişkila - ku ez lê, lipêşîya malan binavê ziyaretêk bê goristan darên pir hebûn, gundî newêrabûn darên hişk ên li erdê jî bînin bişewitînin, digotin: kesek jî darên ziyaretê bîne mala wan wêran dibe, me got: mala me berê wêran bûye dema ku ziyaretjî di rix turk de dijê me rabe ewjî bê minete, heyanî buharê me tevaya wan darên mezin birîn û şewitandin, her ku me dar dibirîn di gunde çend sofî hebûn wek mirişkên tu serê wan jêkî li erdê dipêpitîn,

Her wekî liyor hate gotin: piricar ez diçûme wî gundê (şêx evdurehîm) lê, jiber wê ixlas û mêrxasîya wî mi zêde jê hesdikirin, lewre di mêrxasî dilawerî û cengawirî de likurdistana dibin sîdarîya turk de bê hemta bûn, di şubata (1932) de ku hingê berfek pir li li erdê, ba û bahoz serma dibin sifir re zêdeyî (10 û 15) dibe, nivê şevê payîna dor gund hat û jî (şêx) re gotin:

- vaye (zaza huso) bi mefreza xwe û jinên wan jî bi wan re tevde siwar jî (gêliyê baxîne) da ketine, liroj helatê gund liser rê sekinîne dibêjin: esker liser rêçame lipê meye, em hêne bawe an na?

şêx peyakî şand ez jixew rakirim çûme bawê ji min re buyer da zanîn û got: divêde fikra te çiyê? vaye camêran gotîye esker lipê rêça me tê, yanî sibehê esker rêçê tînin gund, hingê em û esker dikevin pêşîra hev divê berfa pirde, tu bersifa wan bidî biwan pîrekanve evjî gelek dijwar vajiyê armanca şoreşgêriye dawî tu zanî - destê xwe da enîya xwe. kûr bonijî, serê xwe hilda û got:

- Hesen, em ne ji wan çêtir û jinên mejî ne ji ên wan çêtirin, xuyaye wargeha wana zivistanî ji dest wan çûye divê zivistanê de bi destxistina wargehek di dizanî bê çiqas dijawabê, dema em ji bona hêsanîya xwe bersifa wan bidin û xwe jiber wan bidin alikî, hingê tê zanîn ku didest pêka pêşînde em ne jibona wan bişoreşêve rabûne, divê em wan bigrin ba xwe, dema ku em û ew tevde biser herfê ketin hingê lomawan jime namîne û me jî wacibê xwe kir nezêde - min lê vegrand û got:

- sipas jite û malbata tere ku ev ixlas û dilovanîya we wek: siyawe her bi were digere, niho jibona em wan binin gund û esker rêçawan ne yînin ser me rê evve: divê çend peya - ên me herin bawan bila ew bi peyatî bêne, gund û her yek jiwan li hespek siwar û yekê lipêxwe bikşînin jiwê rêya hatî der nekevin, herbi başûrve herin heya ku liwan bû sibeh, wê dakevin binîya (pîreciman), hespan liwir berdî û di rêyek dîre bi peyatî vegrin, wê esker lipê wê rêçê jime û wan dîrkeve,

Biwê rêderiyê (şêx gelek) dilgeş bû, weke mi got welê kirin, sibehê leşkerek pir lipê rêça wan ji (gêliyê baxîn) ê daketin û dane ser wê rêçê heya giyane binîya (pîreciman) dîtin ku hespên bê siwar li wan newalan digerin, lê ji gundên dorme casûs dişandin gund dawî naskirin ku li ba (şêx evdurehîmin), çewa ku têgotin: kurmê dar ji dare,

wê zivistanê ew ji li wir hatin praztin heya meha adarê, wan rojan dîsa ez çûbûme (sêrîn) ba (şêx evdurehîm, çarê meha adarê ku êdî beroyên çîyan nû pelekên reş ketibûn wan, wê sibehê begçîyek ji gundê (girdo) di başûrê gundê

şêx de hate ba şêx û got:⁽¹⁾

- midîrê miyeran - du jandirme pêrene, dibêjin: destûr heye em bêne ba şêx? şêx jêre got: kuro tû kurdî ji min re rast bêje bi wan re esker heye an na? begçiyê çepel sond xuwar ku ji du jandirman pêve kesek pêre nîne, hingê şêx bawer kir û got: bila bête, piştî begçî çû - (şêx) ji - zaza huso û hesen axa ê meman - re got: hûn xalkên - palo ne, we nas dikin herin bikevin (aş) bila we nebînin, hesen û evdas axa nas nakin, ji piştî gund binîya çiyakî bilind çavî der dikietin li pêşîya çêviyê aşek avê hebûn, ji wir cûya avê di binîya malan re derbazî ser zevîyan dibûn, gund xirabe şêx û peyayên pêre li rêzê berbi wan li başûr wek: vargonên tirênê, xanî ava kiribûn, ew tevde çûn em çendên ku liwir ne nas û (şêx man) jimere jî got: tufengên xwe bikin aliyê malê jibo nebêjin vana her jibo şer pêk hatîne, ji xizmet-

1 - ew gundê (girdo) ku divê filiklora (keça muhacir) bê çekirin di /1916/ de ji mihacirên (alaşgir) malek heya giyaye wî gundî, diwan çiyayên dūrde ereba wan şikestiyê herdû gayên xwe ji xwarine, pirtiyên xweji dane bi nan, du lihêf û du pelas bi wan re maye, li kadîna gund cî girtine, goştê kûsiyan dixun, keçik gelek xweşike xortên gund ji bavêwê dixuwazin dibêje: keçik bi destgirtiyê, bê ku zanibe ew destgirti heye tune kuve çûye, lê nikare kerameta xwe bişkine ji teqalid û adatên miletê xwe biqere, ku wê hinek halê wiji xweşbe, karibe ji dêla goştê kûsiyan nan bikire, rojek keça wî dere jibo şewatê piştîkî dar ji çolê bîne, xortek sergerim wê bi zor direvine dibe çiya dixê şikeftê, keçik bi mana çûna der derdikeve ser zinarek zêdeyi minarekî bilind, liwir distirê û her dibêje: lo lo lo lo mihaciro - gazi destgirtiyê xwe dike heya ku mirin liberwê erzan bû xwe diwî zinarî werkir û hate kuştin.

ez çûme wî gundî ku wî xortî hikujim, lê dane zanin ku ewji di neçira pezê kovi de weke keçikê di zinar werbû hate kuştin.

çiyê xwere jî got: here bila qehwe biqelîni û bihêrin bêj mêvanên me tên,

libaşûrê gund binîya cûya avê de lidor kîlomitrek erdê rast tevde zevî, jê û berjêr nizmaniyekek kûr gundê begçî jê hati diwê nepenîyê de bûn, em li oda mêvanan Ronîştî berê min li pencerê, min dit ku jîwê nizmaniya gundê - girdo - leşkerek pir derket bi firehî dane berxwe û ber bi meve tên, min got: şêx tu binêre bê çewa esker weke kulî biser mede rijîyan bi tufeng otomatîk û mîtralyozan gund kirin amanc, diderî û penceran de gulle derbazî hundur dibin diwarê hember dihengêvin em dinav tozêde mane, şêx ji xizmetkarê xwere got (miho) bazde ji alî malê jimere tufingan bîne, çewa ku - miho - kete nav derî bidev kete erdê pênc gule bihevre lêketin, şêx nav diminda ku herim tu bersif min ne da, piştî ku deng jimîn derneket, bihêrs da derî pê li piştî miho kir û derbaz bû

lê ji min ve ne xuya bûn ku giya hundur an hate kuştin, min xwe didane enîşka derî û penceran dinêrîn, hew min dit ku (şêx evdurehîm) di rextan de pêçandî wek: gijolekek ber bi esker ve çû, heya giya wê cûya avê û jiber çavên min winda bû, min nizanîbûn dinav wan gulle baranan de hate kuştin an di hundurê cûya avêde çû wan eskerên ku di - kinîsa - xirabe de çeper girtine,

çiqaş diçûn şer gerimtir dibûn ew gulle - ên di pencere û derîyan de di hatin hundur weke berê bûn, ez di wir de mame girtî li xwe fikirim û min ji xwere digo: gelek caran jivê zêdetir lime dest daye lê me her û her ew perde lidor xwe çirandîye, ev jî carek ji wan carane nezêde, lê eger ez



divirde mam û neketim şer, hingê ligor ol û taqalîdên me divê li nav şoreşgîran nemînim, belê bi wê bîr anînên min jixwere kuştin çê tir dît ji cî rabûm û di nav wan gulehan de derketim û giyame aliyê malê, rahişte rexit û tufenga xwe, weke şêx ber bi dijmin ve çûm, diser cuya avêre çeng bûm û xwe avête kortalek û li çeperên dijmin çav digerlandin hin hevalên dîjî weke min di pinceran de lişer nêrevanî dikrin, dîtin ku ezjî weke wan pêçandî mabûm vaye çûm û li hember dijmin çeper girt wan jî welê xwe li gulehan qulaptin hatin qada şer, ji wan (evdal axa) jî serhedê mala (mûcîn axa), dema diser wê cuya avêre çeng bû û dîtî ku min di kortalê de cî girtîye, got: welleh hûn kurdên jêr ne tiştekin li welat me bi suwarî şer dikirin, çend gav jimîn derbaz bû midî (evdal) bidev kete erdê, min gazî wîkir got: keko weleh ez hingaftim, min got: xwe bavêje kortala di rix xwe de an wê gelek dî te bihingêfin,

Mîn nêrî ku leşkerk pir ji wî kavlê (kinîsê) direvin ku diketine ber amancên me, mebêj ku hingê (şêx evdurehîm) di hundurê wê cûya avêde çûye - kinîsê - ji para li wan daye çendek ji wan kuştine nizanibûne ku ji kuve gule têne wan, medî ji kavlê kinîsê gazî azî kurê xwe (zulkîf) kir û got: here aş bê çima û li benda çi ew sekinîne? umrê zulkîf heft salî da nav wan gulan û xwe giyande aş ji (zaza huso) û hevalên wan re got: bavê min dibêje: çima sekinîne? wan got: me gotîye belkî qebûl neke em bikevîne şer, dema ji aş derketin ku bêne qada me, lê ji ser kumbeta çiya li wan teqîya, wî eskerê serê çiya û çetan bişev ewder girtinbûn, dema dîtin ku esker raserî wan çiya girtîye, bi nava tufengên

xwe girtin û biçiyave hilkişîyan, leşkerên di enîya mede û ên jor tevde li wan dan heya giyane serê çiya di hundirê çepera şerde serekê çete - ên kirê girtî (eloyê keçel) ji - tirmalê - tevi hin eskeran kuştin ên revîyan ên ditir dil girtin bixwere anîn enîya ku em lê şervanîne, piştî ku ewjî giyane me dinva çend saetan de ew leşkerê pir şikest ji xwe bi şûnde (9) kuştî û (13) birîndarên xwe li erdê hêştin, jume yek şehîd û yek birîndar, lê emji bi jin û zarûkan ve biser berfê ketin,

Ji wir ez giyame gundê jin û kurê min (sulahedîn) lê min ji (şêx mehdî re) got: wî jî bimera gund berda, belê dijwariya mezin ew bûn ku em tevde bijin û zarukan wek: teyrên hêlîna wan hilweşîye biçolê ketin, ku li wî çiyâ meha adarê ji zivistanê tê jimartin berf li erdê û sare, kurê min li nav piştamin girêdayî û keçamin - meqbûle - li nav piştadîya xwe girêdayî me nivîn û her tiştên xwe ji li erdê hêştin, biwê giriftariyê ji gund der dikevin, sofîyek daye rix min û dibêje: me ji were got: wan darên ziyaretê mebirin - min jêre got: hey sofîyê ker û ahmaq, madem ziyaretê ev biserê me anî lê çima nikare dijwarîkî welê bigîne tuirk ku van sitemkarîyan biwe dikin, diwê gêjanîyêde min çend qundaxên tufengê li sofî dan.

Diwê derketinê de em bi du beran lêkve bûn (şêx evdurehîm) û peyayên pêre ber bi çiyayên (egil) ve çûn, em û (şêx mehdî) bijin û zarukên xwe daketin çiyayê (pîre cimani), li wir ez gelek basik şikestî bûm, jiber ku jin û herdû zaruk bi min re û welat xerîbe, nêzîgê nivro payîna me) got: va yek ber bi me tê, me got: bila bê bê kiye, hat

ku pismamê min sadiqê inco - ye wek ji min re mizgînek jê mezintir nebûn, min zaruk û dîyawan pêre şande welat barê min sivik bû, lê (şêx mehdî) jin û zarukên xwe li gundê (pîreciman) hêştin, hatin girtin,

Ji milê dî (şêx mehdî) bi kêrî şoreşgîrî ne dihatin, jiber ku weke bira - ê xwe (şêx evdurehîm) bi şoreşgîrî ve nemabûn, goh li me jî ne dikir, jiber wê çendê gera pêre dijwar bûn, li bakurê (pira dibnê liser dicle -) em li şikeftêk şevê şargeh bûn, êvara dî em çûne gundek me nan xuwar, piştî ji gund em derketin, şêx got: em dîsa herin wê şikeftê, me got: şikefta em lê mane careke vegera wê ne duruste, goh lime nekir, dema me nêzîgî li şikeftê kir ji her aliyê lime hate teqandin, ku li ha awîdorê şikeftê esker ciyên hêja tev girtibûn, şeve ne roje ku em ciyên wan nas bikin da ku herin wan, em dicîyên xwede bela man heya ku sibeh lime ronî bû, me naskir ku leşker pir û deverên bilnd jime girtin biwê nezaniya (şêx mehdî) wê rojê heyani êvarê liwir dişerde man, çewd ku hate gotin tevaya deverên bilind jime hatibûn girtin em mabûne pêçayî, libenda tariya şevî bûn daku kari-bin ji çenberê derkevin, baranjî her dibariyan, linav wan çiyar daristanan ku şeva tarî destê meruv ji meruv re ne xuyaye, me hev dû winda kir, bi îşaretek meyî xas min fikand, biwê fikandindîne yekê dî fikand, ez berbi wîve çûm, dema giyame nêzîgê wî tufing bera min da, mi naskir esker bûn ji hevalan qetiyame di nav esker de mame,

Piştî ji dîtina hevalan bê hêvî mam, li ser rêzana şerê şevgêrî mim (durbîna) xwe ji qab derxist xiste sitûyê xwe bîst an sî mitir pêşîya xwe terasut dikirin û dipelandin bê ew

reşê xuya dike kevir, dar an insane, hêj berapêş diçûm, pelandina gotî hêdî hêdî min devî bi devîyan guhartin heyane ji nav esker derketim, ew der ji min re ne nas lê tenê dizanim ku (hênê) roj helatê mine, ez giyame ser rêya ku ji (pîran) dere (hênê), min da ser wê û diçûm, ne tenê ew herem ji min re ne nas heya gund û ronîştman jî ji min re ne nasbûn, jiber wê çendê ez nikaribûm herim gundek, ji tîrsa ku wê min bigrin bispêrin hukumetê, perekî pir bigrin, çiqas baran zor dide min ez jî zor didim rêve çûnê, heya ku di nav wan telpe-ên ewrên reş de ji rojhelat perda sipdeya sibê sipî kir, bi singê çiyakîve hilişîyam min çav li şikeft û berqefan digrandin lê mexabin tu şikefatan xuya nekir,

Liwî çiyayê (nêribê) şikeft nînin tenê darên (hevirs) lê pirin her yek ji wan cîyê cîyê weke çadirên piçûk libin wan dalde hene, ji ber beranê liser çokan û bero paş ketim bin wê (sîwana-hevirsê), min xwe da erdê wek liser balgîki ronîştim, didestê rastêde tufeng min bi destê çepê binxwe peland bê çiyê? destê insanek kete destê min, hema ji cî pengizîm jibin wê hevirsê derketim li hember wê ketim bin yeka dî, heya ku dunya limin rohnî bû, min bi durbinê hawîdor çî deverên bilind hebûn tevde qenc pelandin, hêj ber bi wê hevirsêve çûn da zanibim ew çibûn? dema çûm ku jinek kuştî liser piştê ez liser singêwê ronîştibûm, min pozê tufengê xiste bin serê wê hilda porêwê li erdê ma min naskir ku ji zûve hatîya kuştin dinav berf û sermayêde laşêwê xira nebûye, te lirûyê wê dinêrîn her wekî di xewdeye, ligor taq-alî dên kurd jin an keçek têkilîya hinan pê bêkirin wan diku-jin.

Dîsa vegeŕiyame bin wê hevirs (1) xwe, bi roj helatê baran sekini bû , lê jiber ku dû şev û rojek min tiştekek nexwari bû , her çiqas min pal dida lê kesê birçî nikare razê, piştî nivro şivanek pezê xwe ji min berjêr anî pesara çiyê, min jixwere got: nêzîgî roj ava ezê xwe berdim ba şivan eger hin kertolên nan di tûrê wî de mabe ezê jêbigrim, lê min nizanî bûn ku wê gurê piştî di gazîya min de bê,

Min palda lê min dît bû qîrewîra şivan û kûçikên wî, ez rabûm min nêrî ku gur daye bizinek û dibe, bizinjî pêre dibezîya rast û çepê min dibirin, min bihustek pêşî a wan girt û berda gur û bizin dihev werbûn, dawî gur revîya bizin li erdê ma, şivan licî sekini, hawîdorên xwe dinêrîn bê dengê tufengê ji ku hat, ez rabûm û min gazî şivan kir û got: zû serjêke eger mirar bibe ezê te bukujim, bazda bizin serjêkir ez çûme ba wî limin dinêre bitirs, min got: limin menêre tu min nasknaki hingê divê ji min jî ne tirsî, zû kezeba reş, dil, û gurçikên wê ji min re derxe, min darên hişk dane hev agir çêkir û bi xincerê ji devîyê du şivên zirav terişandin kirin şîş, tevaya mêlaga reş, dil, û gurçik bi her dû şîşanve kirin û min liser agir biraştin, tevî niv nanjî bi şivan re hebûn tevde xuwarin,

Şivan got: pezê min bela bû ma tu izan min didî ez herim? min got belê here tu daxwaza min bi te nema, ji zikê bizinê hûr û rodiyan bavêj daku hinek laş sivik be rahêje û here, daxwaza min ew bûn ku hin tişt ji hevalê minê gur re

1 - (hevirs) dare li zivistan, havîn timî şîne di şûna pelandê istirîkin,

bimîne, lewre wî ez têkirim, ji milê dî em tavaya tebayên kovî li nav dar û çiyar bihevre jiyîndar û niştamanin, ez ketim rê êdî eger du rojên dî xuwarin bi destê min neketana jî ne xema min

Êdî roj jî çû ava dîsa min da ser wan şiverêyên newal û nav daristanan baranê jî dest pêkir, diwê rêwîngîyê de nivê şevê derbaz bû hem baran hem jî ez betilîm çewa ku cigare jî bişev birê de me venedixwarin, min dinav perda tarîya şevê de lidor xwe dinêrîn ku şikef an berqefek hebe ji ber baranê xwe bidim bin, hinke bîna xwe vedim û cigarekî jî lê vexum, min dît li bilindîya milê çepê xanîkî xuya dike, li bamin ku goma peze, ez çûm derîyê hewşê pîstikek liber bûn, ez derbazî ber deryê xanî xiliqandî tu deng nayê, li pêşîya xanî hik ser girtîbûn, di rix derî de min piştî xwe de dîwar û liser çokan ronîştim, min dema ku agirjen da ber cigara xwe berê min kete hewşê, min naskir ku ziyarete ne male, min got: hêj çêtir, lê min pêjna tevgera insan kir di hundur de, çewa ku li firaqek qulibî ew firaq gindirî hat li derî ket, dengê niç niça wî jî an wêjî kete gohê min, li ba min goma pez an ziyaret ferq nebûn lewre min dizanî ew propagande-ên şêxan tevde vala mirî ranabe û gelek caran tek û تنها di şikeftên wargehên gur û hirçan de razame tu pax û perwa ji min re çê nebûye, lê biwê bihîstinê ez ji cî bilind bûm û min berê tufengê xiste derî û paşo paşo jê derketim, lê di rê de her ji xwere dibêjim gelo ew çibûn? şeva sisîyan ez giyame gundê xwe da ku carek dî di saxîya xwe de ez wê dîya xweya dilovan bibînim, lê dema ez çûme mala xwe ku jina birayê min (emer) tenê li male, min got (fatê)

ka diya min û bira-ê min got: ji bo te birine-diyarbekir-
dibêjin belkî wan nefî bikin, tevî ku du sale ji welat çûbûm
ji lê dîsa nikaribûm wê şevê li xanîyê xwe razê,

Ez çûme mala xweha xwe ku liser bexçane, dema limin
biteqe ez dikarim xwe bigînim nav bexçan, min ew şiyar
kirin ji min re agir dadan û tevaya wan çekên minên şil bi ên
zuha guhartin, ji min re çayî çê kirin û xwarin, min ji zava
û pismamê xwe (hacî nûrî re) got, şeva berê ji (hênê) wêde
li filan hindavê ez ba agahî ketim ziyaretek, min liwir wer
dît, wî got: ho ma tu çima neçûyî hundur gundîya me
(helîma dîn) diwê ziyaretê deye, xelk jê dipirsin tu livir çî
dikî dibêje: (min şêx mehir kirîye), min got: xwedê kir der
neket diwê tarîyê de ew efora porê wê minê bikuştana, hecî
rabûn û kerametên şêxan her evbûne, êdî sala /1933) bûn ku
dîsa vegeerîyame nav wan mefrezên welat, lê (şêx
evdurehîm) bihin şoreşgêran derbazî sûrî bûbûn, ku hingê
(firansa lê mandaterbûn em laçî qebûl dikirin,

XELETÊN ŞOREŞGÊRAN DIJWARÎ DIGÎNE WAN:

1. Her wekî liyor hate gotin: piştî ji (çiyayê sipî) vegeerîyame
welat jiwan mefreze-ên gotî a zêde dilawer û cengawer
(mûso ê mehmed elî) ji eşîra (mistan), bi mefreza xwe ve
hate bamin, jiminre got: hatina mina bate dizanim wê esker
zêde bikeve vî heremî û meruvên te bêşînin, lê jiber ku
eşîra min tevde limin rabûn ez divayê vê hatinê bûm, min
jêre got: mûso-di pîrsa kurd de-ez, tu, em û hûn-nîne, dema
ku doz û berevîniya me yek armance, hûn ji wir heyra vir

biser herdû çavên min re hatine, tenê du daxwazên min jiwe hene, yek jê livan hawîrên min hûn pir, hindik serdestî û zor destî li ronîştmanan nekin, hingê millet lome ji min dike ne ji we, adudûyan, livê (qeza licê) mehkûmek adî binavê - evdurehmanê benî- heye , ev nakes têkiliya wî ji awan bi awakî bidoza mafek siyasî nîne, tucar şerê esker an jandiman jî nake, dibêje hingê em dibin mehkûmên siyasî, tenê li kuştina gundiyên xwe û (reşîd keya) digere, roja îne dema gundiyên wî li mizgeftê ketin nimêjî, bi peyayên xweve kete hundurê mizgeftê ji para ew gule baran kirin (18) de kuştî ên dî tevede birîndar kirin, a dudûyan pêgirtiyê (şêx selîmê hezan) ê, dema ku (Mustefa Kemal) li (Diyabekir) bûn, ew (şêx selîm) kiribûn bavê xwe-ê manawî, ew kesî bi ajanek hukümetêve girêdayî be eger neyê kuştin jî divê nêzîgî meruv nebe, dema hûn ji awan bi awakî giyane wî, hingê divê jimin dûçevin, ango gotina min qebûl kir,

Biwê giyandina min û mûso zêde esker kete welat diwarîyên mezin digiyandin welatîyan, lê nemaze meruvên min tevan gund berdand revîyan deşta Diyarbekir an ketin hundirê bajêr, jê û pêve hukümetê zêde çetên kirê girtî dane çêkirin, nemaza ronîştmanên hundurê qeza (licê) devde e bîzor kirin çete û xistin pêşîya esker, her wekî agahe ku diwî zemanîde tevaya ronîştamanên (licê) bi histiran karwanî dikirin, ku hingê kamyûn û rêyên çixir (şûşe) tunebûn, abûriya wan tevde liser karwanîyê bûn, jibona ku sîleh daynin me rêyê karwanî bi awaên jêr tevde liber wan girtin, her wekî:

- Rêya navbera (licê û Diyarbekir) min û (mûso) girt, me

nehêst diwê rê re herin û bên,

- Rêya ku ji (licê) der (erzerum) mefreza (ahmê huseyin
û selê yemaze girtin,

- Rêya ji (licê) dere (mûşê) mefreza (sebrîyê mistî) girt,

- Rêya ji (hênê) dere (Diyarbekir) (mefreza-mehemedê
îbê perê) girt,

BI WÊ pêçandinê ew qesba (licê) wek: masîyên ku av
jiserwan bê birîn di warê abûrî de dijwarîyek mezin
giyawan, hingê tevaya wan çetan çûn ba qainmeqam
tufengên xwe tevde liberwî kêş kirin û got: an divê em sîleh
dayînin an divê hûn tevaya me jin û zarûkên me pût bikin,
biwê daxwazê hukumata turk ji wan qerîyan mejî rê dane
vekirin,

XELETA MÛSO NE BAWERÎYA BI MIN:

Ji wan çetan pêve leşkerek pir ketîye welat, nemaze piştî
sekinandina (şoreşa ararat), her wekî agahe ne tenê em lê
jinên mejî mehkûm, bûn digirtin bi peyatî di pêşîya esker de
dibirin anedolê, jina min li gundek veşartî bi mehek tenê
qebûl kirine, meh tamam bû min got (mûso) divê ez herim
ciyê pîreka xwe biguhêrim, wî got: li kîjan gunde? min got:
ev pîrskirin ne divaya, wî got: ma ji mere jî? min got: belê
dibe di şerde hevalak birîndar bikeve dest eseker zêde wî
bêşînin hingê wê bêje, ne tenê jin lê wê ew gund jî pîre
bêne nefî kirin, wî got: tucar ev nehatiye bîra min, min got:
divê her tişt bê bîra me, diwê gotinê: de ji hevalan (mihoyê
şerikê) got: berî çendekî min hin pere deyin dabûne gun-

diyê (tillê) divê ezjî herim pere - ên xwe bînim (hesen) dibêje em derbazî binîya xetê sûrî bibin, min ji peyayên xwe yek bi (mûso) re hêşt got: îşev herin (horîk) şeveke di herin şikeftên (qedîştê) emê bêne wir û ji wan qetîyan, gundê min dibergeha medeye, li nav bexçe - ên gund (miho û hevalek) çûne (tillê) em çûne gundê pîrek lê, sibehtirê ez li gund di xanîde mam, heval raserî xanî di çiyayê pişt xanî dene, xwedî yê malê çû (licê) ji min re hin tiştên wek: pelên cgaran çayî û şekir şufre û bismarên solan û wekewan bîne, esra teng hat: û got: (evdurehmanê benî) hevalê te (mûso û hevalên wî) tevde di xew de kuştine laşên wan anî bûn (licê) liber serayê birêzê danîbûn, min got: liku kuştine got: lişikeftên (qedîştê) min got: raste, lê gelo evdurehman liku giyaye (mûso) û çewa pê bawer bû piştî min.ew şîret lêkir?

Bû êvar heval ji payîna çiya hatin gund ba min, min berî wê bihîstine ji wan re çend mirîşk kirîbûn û şîvawan çêkiri-bûn, danîn berwan gotin: were matujî naxûî? min got: min berî we xwarîye, biwî kederê mezin min nikaribûn tiştêk buxum, em ji wî gundî çûn li gundekdî min pîrek hêşt û neseqîn berê me li çiya, hevalan got: me ne divê em herin şikeftên (qedîştê) mûso - liwir li benda meye, min got: mûso - libenda (evdurehmanê benî) bûn ku bigîjewî wî hevalên wî biser hevde bikuje, hêj naskirin ku çima min êvarê şîv nexuwar, dawî bi awayê jêr min agahî girt:

wê şeva em jiwan cuda bûn şevaditir ligor gotina min derin (horîk) ku - evdu-rehman - û hevalên xwe li wirin, derin rûyên hev, evdurehman dibêje ew çend lite digeriyam kesê ji min re salixên we nedidan, min naskir ku (hesen)

naxwaze em bigîne hev dû, mûso - dibêje: me ev ji - hesen - nebihîstîye, ji wan re ji gund pezek dikire ji wan re xuwarinê çê dike bê ku ew gotina min bê bîra wî, evdurehman dibêje (hesen) kuda çûye? (mûso) dibêje ji min re negot, lê - miho û sebro - çûne (tillê), şeva dî mûso - dibêje - divê em herin şikeftên qedîştê wê (hesen) bê wir, derin şikeftê radizên evdurahman ji hevalên xwere dibêje: (hesen) bigîje vir, vir libame nasekine, ji milê dî em nikarin hengê wan tevan bukujin, ew dibin jime bêhitir, her yek ji wan tufengê dixê serê yekê wan di xew de dikujin, sisê ji wan ji xew şiyar dibin dest davêjin tufengên xwe wan jî dikujin, bîra - ê mûso jî dipayîne dikujin, kesê xwe bispêre dostên dostê hukumetan dawî ev e!...

2 - XELETA ŞÊX FEXRÎ

Lijor hatibûn zanîn ku (mefreza - şêx fexrî) li (qeza farqîn) bûn, bi mêrxasî di bizavê (nidalê) de bûn, li keviya (çemê Batman) ê dikevin şikeftek payîna wan li devê şikeftê bûn, payîna bi şev li devê şikeftê dibe lê payîna rojê li raserî şikeftê li derek bilnd û pêre (durûbîn) jî hebe, da ku esker ji dûrve bibîne, xelet ewbûn ku nobeta rojê li devê şikeftê bûn, payîndar hew dît ku esker ew pêçan, çî kesê ku ji şikeftê derket hate kuştin, biwê nezaniyê (18) şoreşgêr tevî (şêx) hatin kuştin.

3 - ZAZA HUSO:

zaza huso - êku hate gotin: di berfê de hate ba (şêx evdurehîm) li ciyayê (sipî), zêde mêrxas û mefreza wî bi nav û deng bûn, lê mexabin wî ji keçek mehir kir ji hevalan qetîya kete mala dostek xwe liba keçikê ma her wekî biserbestî zewicîye û çuye meha hingivî, esker dor li xanî girt, di xanî de şerkir heya ku ew û keçik ji pêre hate kuştin,

4 - ŞÊX EVDUREHMANÊ GARISÊ:

hevalên wî (mela ahmedê şûzi) jêre got: şêx bawerîya me bi (necmo) nayê ku tenê li bate bimîne, biwanre xeyidî, tev çûne gund ew ji rabû nimêja eşa dikirin liser nimêjê (necmo) tufeng xiste piştta wî kuşt,

5 - MALA ELÎYÊ YÛNIS QEWMÊ ÇIYA:

ku ji (çiyayê melato) re tê gotin, ji şoreşa (şêx seîd) pêve diwê (şoreşa ararat) de jî bûne hevpar bi fermana (evdurehman axa) ku wê di cildê diduyan van (ditin û bir hatîyên min) de wê li (sûrî) behsa wî derbaz be, nişteman perwerek zêde baqij û bilind bûn, ne mefreze lê ê wan şoreşek heremî nêzîgê duhezar şoreşgêr hebûn, di cengawirî de bi nav û deng bûn, dijarîyên zêde mezin digiyandin leşkerên turk, jiber wê çendê (îsmetê kosmoplît û xayîne miletê xwe), ji wan civîn xwest, tevî ku xwe turk didane

zanîn, lê bi xesaisên kurd qenc dizanîbûn, dema bexit bidin henan bi wan re bê bextî nakin, biweriyê bi çend kesan ve çû nav wan şoreşgîran bi wan re kete civînê daku weke caran bisond, şerefa xwe û hukumeta turk wan bixapîne, lê tu bawerî bi gotinên wî ne anîn, lê xeleta wan evbûn: serek komelê turk ketibûn destwan divabûn wî libaxwe dîl bigirin û biwî kaxizek binivîsin bidin hukumetawî bêjin: tevaya esker jivan hawîran bikşinin, an emê wî bikujin, wê ew daxuwaz bidist xistana, an bi xwera bigirtana heyânî bi jin û zarûkên xweve bigîyana sûrî hêj bila berdana ligor xesaisê xwe, di siyasetê de bext heye?

6 - XELETA AHMÊ HUSEYIN:

Her wekî liyor gotin derbaz bûye ku, dema hukumeta kemalî ji bona agirê şoreşê vemrîne û ên derve jî bikşîne hundur, hîlebaziyê efûda îlan kirin, jiber ku gund û malên şoreşgîran şewitî û piranî jin û zarukên wan li kuçe û kolanên welatê anedolê belengaz pars dikirin, piraniya şoreşgîran efû qebûl kirin ku biryarek perlimanî pê hatibûn dayîn, da ku ew û zarukên xwe bigîne hev, lê piştî hatin ba hukumetê û sîleh danîn hukumetê dest bi kuştina wan kir, ji wan kuştîyan (elî kur ê emerê faro) û zavayê wî ji xalanên min (elîyê hacî mustefa) her dû li deşta (diyarbekir) mefreza (milazim fexrî) girtin û kuştin, hingê ji pismamên (elik) (ahmê huseyin, mihê xemlikê) û yekê dî, jibona tolvedana (intiçama) herdû kuştîyan, wanjî (mufetişek tevî du jandir-

man) kuştin, hukumeta turk tevaya wê eşîra (botîyan) bi jin, zaruk û mêran ve girtin bihevre di yekcîyek de hepis kirin, ji lêdanê pêve jin û mêr bi hevre dibirin abdestxanan, heya ku ew mecbûr kirin ku wê hersîyên (mufetiş) kuştî bi girin an bikujin, xelet û nezanîya wan evbûn.

Dema hersîyan dît ku ew felaket biserê eşîrê anîn û jibo girtina wan ew berdane, divabûn hingê ji nav eşîra xwe biderketana biçûna deveçek dî, lê neçûn heya ku (ahmê huseyin) hate kuştin, (mihoyê xemlikê) û hevalê dî jî girtin sipartin hukumetê herdû jî li (diyarbekir) îdam kirin.

7 - AHMEDÊ ISKAN

Mefreza wî li qeza xêrzan li nav eşîra (pencinar) birarzîyê (cemîlê çeto) bûn bi mefreza xwe ve liber (çemê kezerê) laşê xwe dişuştin û riyên xwe kur dikirin, payîna xwe du peya lideverek bilind danibûn, herdû peyayên payînê di binin çerçîyek derbaz dibe, derin pêşîyawî hin hûr û mûran jê digrin, ew çerçî dere rastî tabûrek esker tê ji wan re dibêje niho du peyayên (ahmedê iskan) ez şêlandim, esker bi firehî hawîdor li wan digre, her çendî şer dikin lê nikaribûn hi nav wê çenbera pîraniya esker xilasbin, tevde hatin kuştin yek tenê jî jiwan xilas nebûn, her (16) de kes bûn qurbana wê bê exlaqîya herdûyan.

8 - XELETÊN HEVALAN Û BUYERÊN BI MIN RE

Her wekî rûpelên jorde hate naskirin ku, (şêx evdurehim)

/1932/ de derbazî sûrî bûbûn, çewa ku ew şoreşgêrên qewmê çiyê jî çûbûne - sûrî, mefreze - ên gotî jî biwan xeletan yek li pê yekê hatin kuştin, ji ber wan buyerên gotî mefreza dawî di welat de ez mabûm, jiber wîqasî giraniya mezin ketbûn ser min, nemaze ku (mûso) bi mefreza xwe ve jî çû û ew xayînê (evdurehmanê benî) jî kete rix esker li me degerîyan, zêde dijwarî digîyandin me, lewre tevaya şergeh şikeft dostên me li gundan jî nas dikirin, bi esker pêderpê digirtin serwan deverên gotî, jê û pêve pirîcar hevalan jî goh li min ne dikirin wek;

En ku bi cengdarîyên kumandosî ve rabûne dizanin ku kêman caran xwarinên çêkirî wek ronîştman bi dest me diketin, xwarina me nanê ku me ji gundan digirtin, pirê rojan me di şergehên xwede ji mefrezê re pezek serjê dikirin dibiraştin pê nan dixwarin, heyane êvarê tiştê nediman, lê rojek hin goşt jiber wan mabûn bixwere anîn, liser çiyakî bilind me wargeh girt, dîsa xwestin agir dadin wî goştî bibirêjin min ji wan re got: hûn dibînin bişev em cigare - ên xwe di nav destên xwede vedixun, lê hûnê çewa liserê vî çiyayê (melayîn) agir dadin? Bê fedî limin vegrandin û gotin: te navame qetandîye her û her tirsê dixîdil û heşême, ez jî hêrs bûm û min got: hûn dizanin, lê dema ku teqîya hingê bawerim dîsa ez dizanim, agir dadan ew guştê mayî biraştin û xwarin hêj razan, esker biwê dîtina agir hatine bişev hewîdor lime pêçane, berî roj hilat ez şiyar bûm gazîwan kir û got: rabin payînc, min durûbîn da yekê û jêre got: dûr nêzî çiya û herdeverên bilind û gundan bipelîne bê esker li kune bicî bike, çiyê ez lê ronîştî li pişt min di navbera du

zinaran de kevierek du mitir bilind heye, lê heval jî li hember min lidor pênc mitir di rastek nav devîyan de ronîştîne,

Êku çû payîne hêj serê wî ji min ve xuya dike min di tufeng teqand bi wê teqandinê esker ji ser wê kevira pişt min li wê koma hevalan ronîştî girêdan, dinav wê toza arîya agir de ji hev bela bûn, kude diçûn pêşîya wan esker û terqî bûn, ez dibin wan tufingên kevirê ser xwe re man esker nizanin ku ez dibin tufingên wane mame, ez jî di ser xwe re dinêrim lûle - ên tufengan wek: tilîyan di ber hev de bihev re diteqên, tevî ku kes li wir nemaye eza dema ji cî rabim ew tufing tevde dikevin singê min, diwê tengiyê de hate bîra min ku niho şeşagir divaye, min ji ber xwe kişand û ji êreve min şeşagir xiste navbera du lûke - ên tufengan rûyê wan û çep û rast ew gule baran kirin, min di ser xwe re nêrî tu tufeng neman ez ji cî rabûm min xwe da qozîya zinar û bera esker didan, lê bi awakî me nedibûn esker îrişî min dikirin rê nedidan ku ez paketê li tufenga xwe bidim, min nêrî ku yûzbaşî li dalda deviyê de emerê hucumê didewan ji tirsazabit biser minde pelû dibin, piştî zabit ket çawîş rahişte lingên wî ku jiber gulan bikşîne min çawîşî hingaft herdu bihev di kendal re gindirîn, wek: pezê bê şivan ku gur bê wan gurî liwan ket revîya, min gazî hevalan kir û got: esker şikest, werin em ciyêxwe jivir biguhêrên, kesek ji mefrezê bixûn nebû, hingê min ji wan re got: we xwe û nezani û xud binîya xwe nas kir an na?

XEWNÊN ŞEVÊ KU PÊ NE BAWER ÇEWA WERGERÎYANE RASTÎ?

Her wekî heya niho ulema - ên baylojî, seyκλοjî û asab - jî bi awakî zanistî ne giyane wê dîtina (xewan) di xwede, ew xewnên ku bê têkiliyên hewasê pêncan di laşek bê tevger de pêktên, çewa ku bi awakî teqlîdî û tekane bawerîya min jî biwan xewnên şevan ne dihatin û piştî dîtina rastîya xewnan jî dîsa biwan ne bawer mendim, lê di awirek îlmî di livê hûr bûnek divaye, ji wan dîtinên xewnan ku du caran bi min re bûne rastî û serpê hatî herdû carên jêr bûne wek:

Di /1927/ li - anedolê - di hepisxan(nigde) de min di çiyakî welat de xewnek zêde felaket bi xwe û hin hevalan ve dît, di wê xewnê de min dît kurê xalê min (evdula) xûna wî bi zinar ve hate xwar, di /1933/ li wî çiyayî ew dîtina /xewê/ bi kuştina (evdula) ve wergerîya rastiyê.

Berî li wî çiyaê gotî ew felaket bi serê me bê (kurê xal-tika) min jêre (huseyinê babêxî) dihatin gotin, ku di şoreş-gêrî de bi nav û deng bûn hingê di hepisxana (diyarbekir) de girtibûn, wî jî min re xeber şand û gotibûn, ez dizanim bawerîya (hesen) bi xewin û xirafatan nayê, lê jêre bêjin (huseyin) gotiye: ez hêvî jê dilim û divi ciyê teng de giriftarim, divê ji bona xatirê min tucar li filan çiyayî şargeh nebin, ku dîsa ew çiyabûn, gotibûn min li wî çiyayî bi wan ve xewnek ne qenc dîtîye, belê ew herdû xewin bi hev re bi awayê jêr wegerîyan rastiyê.

Her wekî di rûpelên jor de agahî derbaz bû ku piraniya wan mefrezan hatin kuştin ên ditir derbazi sûrî bûn laciyên siyasî ku hingê firansa lê mandeter bûn, di mentîqekî fireh de mefreza min tenê mabûn ne tenê lime lê di jawariyên mezin ji sitemkariya hukumetê digîyane wan belengazên welatiyan, ji bona ku em wê giraniya esker ji wan hawîrên em lê bidin rakirin, min got: divê em herin (çiyayê sipî) heremê (palo) daku esker lipême bikişiyê wan hawîran û divê emê wan bikişinin heremê. Dî da ku di jawarî bigîje esker jî, êvarek me li gundek nan xwar û ketin rê, em hink ji gund dûr ketin gotin: yek ji me livir bimîne weke herşev? min got: ne divaye, eger casûs lipê me bêjî rêya me dûre wê vegere, lê mexabin ji bona ku ew herdû xewin bêne cî, hêj em ji gund dûr neketine li pişt wî çiyayê gotî pismamek min (xelîl) di kendaş wer bû lingê wî di qevdîde ji cî derket, her çendî me kişand kete cîjî lê nikaribûn bimeşe, ji alîki dema em ji gund derketin me kesek lipê xwe nehêşt, ji aliyê dî em giyane vî çiyayê ku min û huseyin: pêve xewin dîtîye, lê çar naçar em ji bakur ve hilkişiyane wî çiyayî, çiya bilind serê çiya bi dirêjahî zirav wek: piştê kerê, di başûr de li nizmanîyê tevde gund û ji bakur ve jî di nizmanîyek roj helat û roj ava dirêj û gundbûn, lidor deh k.m. 1 di roj ava de (qeza hênê) bûn, timî dema ku me liderek şergeh digirtin, min hawîdor qenc dipelandin ku cîyê şer û vekişandinê lê hebûna hêj em lê dihêwirên, lê wê şevê ew pîlan jî nehatin bîra min, em di navsera çiya de qedere deh mitir daketin nizmanîyek nav zinarên mezin û razan, mebêj ji gundê em jê rabûn casûs lipê me bûye, heya ku em ketin şergehê ew

vegerîyaye û çûye hênê, şevên payîze ên dirêj esker anîye di wê rêya ku em têde daketine wê kortalê dagirtine, li wir min xewna sisîyan dît ku yekê qamakî di nav parsûyên min re derbaz kir êşa wî da dilê min jiber xwe şeşagîr kişand û bera wî min dît liser milê wî dûxanek sipî sekinî, diwê xewnê de ez ji xew çeng bûm, min nêri pêşîya rojê sor bûye û heval tevde di xewdene.

Min gazî wan kir û got: rabin ser xwe roj dike helê hûn di xewdene bê payîn, min dûrebîn da destê yekê û jêre got: nizim here berê li pêşîya xwe binêre û di nev devikî de ronî berê hawîdor me derverên bilind û dawî li çiyayên dûr û gundan nêrevanî bike, ew diçûn min ji lê dinêrin nêzigî ku serê wî derkeve wê kemera serê çîya, hew min dît xwe avête erdê û got: hesen esker, bigotina wî ji bakur wê niqeba em tere daketibûn û ji zinarên raser me roj helat û roj ava em gulle baran kirin, em di wê korta de ew raserî me tu talde û çeperên şervanî di destme de neman weke caran min xwest ku ji baûr ve li wan bizivirim, lê min dît ku zinar zêdeyî bist mitir bilin de, hingê bicarek bê hêvî bûm, mirina me tevan hate ber çavê min, lewre em wan nabinin lê wan em kirine amanc .

Diwê hindavê de yekê ji nav esker bi kurmancî gazî min kir û got: ma tu hilfirî ezmanan ji tu xilas dibî, ma te bîra vê rojê ne dibirin biserda ji dest bi gotinên ne qenc kir, hingê min naskir ku (qaso) ji gundê êvarê em jê rabûn ew lipê me bûye û esker anîye ser me, hiwan xeberên (qaso) heş diserê min nema min gazî kir û got: hey xayîne xwe firoş xeber ji devê teresan dertên de tu û ew zabîtê ku te ji

wî pişt kirtîye xwe bigrin ez hatim we, ew neqeba ku em tède daketibûn wir (35) tufeng di wir de bûn, esker hew dîtî ez ketim nav wan, eger devê tufengên xwe heldana diketin singê min, lê bêku tirs wê bîne bîra wan weke kîsoyan reqreqa potînên wan bi çarpîkan direvîyan ber bi daristan û zinarê roj ava ve çûn, kuştina wan ji min re nebû daxwaz, lê çavên min li - qaso - digerîyan min dît li hember min pişt daye min û di ser devîyan re çeng dibe, min got: kesê xwediyê wan gotinan nareve hey bê namus, min sêderb bera wî dan mexabin yek jî lê neket, tevî ku ew çend sekman bûm jî, liwir wan eskerên li wî zinarî cî girtî, tevan ez kiribûm amanc, min sê paket liwî zinarî girêda tufenga min (almanî) li kevir zêde tasîr dikirin dûxanek sipî li ser wan sekenî, ew dûxana ku min di xwena xweya sibehê de dîtibûn, piştî min eskr ji wî zinarî jî derxist, min gazî herçar peyên xwe kir, hêj ji wê bê keysiyê derketin hatin û gotin: me got tu hatî kuştin, lê ji milê dî me ji hev re digot: piştî - hesen - çû êdî gulle hew têne me û li wir şer zêde germe ma esker bi kêre şer dikin? min got:

Divê em vir berdî eger em bixwazin jiberdana eniyê pêve hin dijwarîyên mezin bigînin esker, divê em ji bîr nekin ku (hênê) dibêr me deye, qereqola li gundê me dengê tufingî dere wan, mefreza ahmed çawîş di bakur de li (Hêgasûr) ew jî nêzîge, çewa ku ji bona kuştina (Berazan) tufengên neh berdane van gundan ewê jî di gazîya esker de bîn, wê li me giran bibe û êvar dûre,

Em ji wir di bakurê çiya de daketin giyane nav rezên (ênîhîr) ê yanî gundê wî qasoyê xayîn, hêj jî tufengên wan

eskeran weke berê diteqîyan piştî em zêdeî pênc kilomitir ji wan dûr ketine, em ji rezan ber bi rojhelat ve ku di pişt çiya de çemek havînan zuha lê zivistanê têre av dere ser çavîya gundê me ku jêre (çemê dibûri) tê gotin, em li kemîna eskerê ku digazîya wan eskeran de dihatin qulibîn, em di hundurê wî çemê zuha de di meşin ji raserî me serê çiya ji nişkave gule lime barîyan, ciyê me hêji wî ciyê berê bi gelek xirabtir bûn, di teqandina pêşîn de ew (evdulahê) ku min li (hepîsxana nigdê) pêve xewin dibûn (şehîd ket xûna wî di kevir de hate xwar çewa min ditibûn, bira - ê min (sîrac) birîndar bû, em di wê nizmanîyê de ew ji bilind cî raserî me em bê keyis man, ew eskerên sibahê jî giyane qada şerê me, xelkên pênc gundan xwedîyên wan tufengên nehber ewjî bi wan re em hatin pêçandin, dunya meha payîza navîn em di wî çemê zuwa de ji tînan bêhêz bûne, hêj esir êvar jî dûre, min ji herdu pismamên xwere got: wan çete - ên bilind ciyê hember me bihna, bihna me çikandine - ezê herim wan, eger min ew ji wir rakirin hingê keysa min li wî eskerê raser me tê, ez nahêlim ku serê xwe hilidin, hingê hûn jî bi hêsanî digîne min, lê bira - ê min birîndare divê hûn wî nehêlin, di şerê wan eskerên serê çiya de ezê her bi dûrebînê jî li wan nêrevanî bikim, dema ku min li fitikê da hingê ji ciyê xwe rabin û bigîne min,

Di navbera min û ciyê wan çetan de erdek rast pirêza nis-kan hebû, min da nav rastê û bi bazdan ber bi newalê ve diçûm, çetan gazî esker û qumandan kir û gotin: eve - hesen - tevan li min girêdan, pêşî û dor min jiber guian toz bûn, dinav wê toz û axa ji ber gulan radibûn pirîcar ez ji ber

çavê wan nepenî dibûm, di newalê de li wan zivirîm û ji par ve çûme wan, min ew ji çeperên wan rakirin lê kuştina wan ji min re nebû daxwaz, piştî min şûna wan girt keysa min li wan eskerên serê çiya ên ku raserî mebûn hat, min nehêst ku serê xwe rakin û li fîtêkê da ew jî hatin giyane min ji wê çemberê rizgar kirin, her weki hate gotin berê giraniya eskerî ketibûn gera me, nemaze ku bihîstin birîndar bi mereye û di wan sê mehan de heval jî ji me çetîya bûn ku hin ji wan çûbûn sûrî em çar man ji ber wêjî tirsî me liser gundiyan jî nema bûn, me nikaribûn jibona derman kirina bira - ê xwe çîyek peyda bikin her wekî:

çi deverên asê û çiya hebûn esker û çete - ên kirê girtî tevî wî xayînê (evdurehmanê benî) lime digeriyan, jê û pêve hukumetê emir dabûne keyaên gundan ku her gund divê çiyayên xwe qenc bipelînin, dema esker wan lidor gundên we wan bibînin hûn tvede nefiyê andolê dibin, ji berwê çendê her gund weke derkevin hêla kewan li çiya, daristan, newal û şikeftên dor gundê xwe digeriyan, belê em ji tevaya gund û çiyayê bê hêvî man ji mervên me û pêve ji mere dost jî neman, welat lime bû dûjeh birîndarê me baskên me şikêndine em nikarin ji welat jî derkevin,

wê sitemkariya hukumeta kemalîsî bi kuştinek tevayî, şewata gundan girtin, lêdan û zindan, nefîya anedolê, sera-serê welat lime kiribûne dûjeh mija mirin û belgaziye gertibûn ser kurd û kurdistan, ew landika jiyîna meye lê peyda di çav mede reş kiribûn, terka welat, dûrbûna ji dê, bav bira, xuşk, pismam, heval û hogiran, dibûn xewn û xiyal nav pêlên derya felaketên xerîbîye jî mere bûbûn daxwazek yeke-

mîn, me ji xwe re digot: geleo wê ew roj hebe ku em ji awan bi awakî bigîne - sûrî - firansa ê mandater me laci qebûl bike da ku em diwê derya xurbetê de noq bibin? ew welatê xerîbiya ku em tiştêk jê nizanin, emê di wir de biçî awayî bijîn wêjî nizanin, emê çeqas li wir bimînin? careke dî vegerin welat an na em wêjî nizanibûn, tenê me zani ku welat lime bûye (zindana memê) jibo me welatî dost, heval û meruvên me mane sitember û giriftar, berî xwe me dixwest ku wan ji wê sitemkarîya kesnedî xilas bikin, belê sitemkarî giyabûn wê hindavê ku wê (diya mina dilovan) ku bi dîna min xwe ew çend dilgeş û bextiyar didît , wêjî digot : kurê min livir mesekinin rojek berî rojê derbazi biniya xetê tirênê bibim, tevî ku nizanibûn ku wê di saxîya xwede cereke dî min bibîne an na, çewa ku me hev nedît! Belê - dê, bira, xuşk, mirin min ew nedîtin, ezjî divê nivisarê de umrê min giyaye (76) salan ezjî dinav van pêlên derya xerîbî de dimrim ewjî min nabînin, çewa ku felsefa xebata niştêman perwerî van bernaman di xwede digre, lê daxwaza bilin û pîroz ewe ku mîletê me ji me razî be,

Belê her derketina ji welat û çûna xerîbiyek bê dawî me kiribûne armanc, lê divabûn ew birîna bira - ê min hêsanbe daku karibe wê rêya dirêj bike bergeh, jibona birînê ji ne derman û neji duktur û neji cî hebûn ku bi hindikî em (20) roj lê biminin û bi hin dermanên kurmançî ez wî derman bikim, her wekî li jor hate gotin: tevaya çiya daristanên wan heremên em lê esker û çeteên xain lê digerîyan, her gundî jî sînorê xwe dipelandin, jiber wî qasî peyda kirina ciyek nepenî gelek dijwarbûn

Dawî jibona ku tu guman ji ciyê me neyê kirin, linavbera gundê me û (qeza licê) (20) kilomitir li roj helatê (biryas) xirabe bajarê (hûrîyan) pêşiyên kurd, (500) mitir di başûrê rêya ku ji (hênê) dere (licê) dirix rêya çixir (şûse) de, li erdek rast di nav divîyek mezin de me şargeh û nixweş xane girt, daku kesek gumana wer neke, lê dema ciyê me bihatana naskirin hingê em herçarî? dihatin kuştin, jiber ku ne ciyê şer û paraztinê bûn, ji milêdî jime û roj helat lidor pênc kilomitir goma xesûya min hebûn, em nikaribûn bişev jî herin gomê, jiber ku esker lê payîn dikirin, jumere li dûrê gomê derman û xwarin biroj di anîn liser darek dada nîn me bişev diçûn jiser wê dara çolê di anîn, derman evbûn:

1 - jibona ku birîn ne axiv di şûna derzîyên (penselîn) de me (hingiv û xweyi - dinav hevde dikelandin, dibûn wek hevîr hingê me dikirin weke bismaran - liser kaxiz dadanîn heya zuha dibûn, ew fitila hişk me ji her dû aliyan di birin re derbaz dikirin û têde dihêştin heya ku di birînê de meheliyê, ji lêketina gulle dijwar tir bûn,

2 - piştî sê rojan hêj mi merhem ji birînêre çê dikirin, ku ewjî evbûn şim'ei hingiv, beniştê darê kizwan û rûnê nivîşk - ewjî dihevde dikelandin, di kitanek paqij didan û bi badan dixistin birînê - jê û pêve nebûn,

3 - dema birîn bi axivîyana hingê me karek serjê dikirin çermê wê karê digirtin ser birînê ew werim dadixistin, ew derman çêkirin û duktorê birîna bira - ê xwe jî her ezbûm,

belê bişev û roj çavê me li birînê bûn, daku hineke hêsanbe pir hindik karibe rêve here, daku em pišta xwe bidin welat û berê xwe bidin xeribiyê bin wê çadira reş,

lewre meha payîza dawîn weqtê berf û baranan biser mede dihat, birin li rehnê wî hestî negirtibûn, devê birînê ketehev me ji wê devîya xwe xatir xwest, heyanî deşta (diyarbekir) me birîndarê xwe bi siwarî bir, lê jê û pêve me nikaribûn hespê bixwere bibin, lewre me rê nas ne dikirin tenê berê me li başûr, em bişev pêde dimeşin, ku dunya dibûn sibe me xwe didâne çiyakî heyanî bibe tarîya şevê dîsa em diketin ser wê rêya ne nas, çewaku rê çiqas dûr û nêzig me ew ji nizanibûn, diwê rêwîgiya dirêj de dîsa birîn xûn jê dihat,

biwê giriftariyê di şeva /6/ kanûna pêşîn 1933 - de em li xetê hesinê tirêna (toros) sînorê - sûrî - qelibîn û derbazê binê hesin bûn me zanî ku em ketin cizîra sûrî, êdî nimêja sibê bûn, li pêşîya me gundek xuyakir, em çûne gundê (ehûcerad) ê ku dikeve navbera (derbasi û amûdê) derbazi malek bûn, xwedîyê malê dest nimêja sibê digirtin, me silav lêkir bê ku zanibin ereb an kurd de jiber ku -'egal - liserê wîbû , lê me bi erebî nizanibû mi bi kurdi jêre got: apo tu mêvanan qebûl dikî an na? wî got: ma tu kurdi mêvan veg-erandine, fermo derbaz bin ser çavan, me dît beroşa wan liser agir şorba nîskê dikelî, mejî du roj berê tişteke ne xwarîye û dunya ji sare, lê gelo apo şorba gerim bide me an na, piştî jinikê beroş ji ser agir daxist, bera leganê da hawîdor nanê tenûrê û pîvaz danîn mêrik got: fermo, hingi em birçî û sar ew tama wê şorba apo hêj dibira mindeye, piştî me têr xuwar camêr cigarejî daneme hêj min jê pîrsî û got: apo ma livir kurd hene? wî got: bira zî ev cizîra biniya xetê tirênê heyanî (hesîça) tevde eşîrên kurdin, jîmere (eşîra kikan) tê gotin, min got: ma çîma egal liserê

we û çekên we dirêjin? got: jiber ku başûrê me tevde ereb emjî ketine teqalidê wan, me ji navê (derbasi) yê pêve ne bihistibûn. min jê pirsî got: li pişt xaniyên me rêya otomopilan heye bidin ser hûnê herin hundirê (dirbêsi) yê, saetek rêve heye, me xatir jê xwest em ketine rê çûne (dirbêsiyê), li çayxanekî me çayi vexwar û pirsî qîşla eskerê (firansa) kir pêşme kirin, em çûn payîna ber derî got: hûn çi kesin? min got: em lacyên siyasîne, hingê rê da me em derbazî hewşa qîşlê bûn, yutnanê firansa hate pêşîya me bi destê megirt (bonjûr) yanî roj bi xêr got, em derbazî hundur kirin bi destê xwe cigare dame, jimere qehwe da çêkirin, piştî vexwarinê min ji eskerên wî re ku tev file - ên torê bûn got: ji qumandan re bêjin: birîndarê me heye, eger li ba we derman û duktor hebe me divê hûn derman bikin, gazî duktor kir dema li birîna biraê min nêrî got: ev çima xûn û kêmbi derpiyên wî ve heye? min got: duktor meyê li ku derman bikirana, ji welat heya vir em dinav şerde hatine, ji mefrezekî (29) kesan em çar giyane vir, duktor bi îspirto paqij dikirin û derman dikirin, qumandan jî raserî wî serkinî lê dinêrîn û dipeyivîn, min ji wan eskeran pirsî û got: yutana - çi dibêje: wan got: dibêje:

Ma jivê felaketê mezintir jivî milletê bextreş re çi hebe? ew milletê ku çarsed kilometir bê derman bi birîna xweve bi peyatî dimeşe, di welatê xwede xerib û mehkûme! hatine vir welatê wan û nav milletê xwe, em ji - firansa - hatine welatê wan, ew di erdê xwe de jime huqûqê lacî dixwazin, dema em wan qebûl dikin sipas dibêjin û minetkarên mene,

Numroyên tufeng û şeşagirên me nivîsîn û dîsa dane me,

tenê her yek jime du narincok (humba) ên destavêj ji piştve bi rextên meve bûn, ew ji me girtin û got: ev qedexê ne (memnûîn), min qumandan beg em ketine xerîbîyê dibe ku em bê xercî bimînin, hingê emê van sîlehan bifroşin, got: we divê niho bifroşin tu pirsîyarî jiwe nayê kirin, me nivîsîne û kaxiz daye we ku eskerên me têkilî we nebin, got:

- jivê saetê pêve hûn li sûrî laciyên siyasî hatin qebûl kirin, lê mayîna we livir an daxil ev sipartiyê mewqû qumandanê (qamişlî) ye kaxiz nivîsî jibo qumandan da dest min, em rabûn ku herin got: no ronin, nivro xwarin dame û şand otomopîl anî ber derîyê qîşlê me xatir jê xwest û siwar bûn, min ji şufêr pirsî heqê te çiye? qumandan heq daye, min got: qamişlî - çiye û liku dikeve? got: ev - dirbêsi - û lipêşiya me (amûd) heye, herdû nahyene lê qamişlî qezaye, ber bi roj helat (60) kilometir heye em derin,

em giyane qamişlî liber qîşla eskerî em peya kirin, êvar bûn, me kaxiz dawan jimere gotin herin otêlek sibehê werin, min got: sîleh bi merebe dibe? belê bi sîlhên xwe herin mayotnan kaxiz nedaye we? min got belê, kesek nikare têkilî we bibe tu hîsaban ji kesî mekin,

Em wê şevê cara pêşîn bûn ku bi serbestî libajarek bi sîlehen xwe ve herin otêlan û li nav bajêr biroj bigerin, sibehê em çûne ba qumandanê mewqûî ê firansa, wîjî wek yutnanê (dirbasî) bi dilgeşî em hember kirin, cigare û qehwe dame û got:

Hûn dixwazin herin hundurê sûrî an livir bimînin? min got: me nizanîbûn ku cizîr tevde kurdin, piştî me ev zanî dixwazin di nav miletê xwe de bimînin, wî got:

Di resmîyatên diwêlî de nabe laciyên siyasî liser sînorê jê hatî bimînin, bi hindikî divê (50) kilometir ji sinor dûr bimînin, lê em dikarin bi awakî insanî we livir bihêlin. Lê hingê weke daxil di abûrîde ji were alikarî nayê kirin û divê hûn navê xwe - ê rastî bi navek dî biguhêrin, herin lidor serayê istidaçiyên bi erebî dinivîsin hene. wî navê mustear li xwe kin heryekjî sê kilîşên xwe bigrin jibo nifûsê û umrê xwe jî mezin daynin, min got: çima? wî got: jibo biservan felaketên xwede hukumeta sûrî we nebe eskerî.

weke gotibûn me çû nivîsî û anîne bawî, wî ji li bini bi firansewî nivîsî ew hewale - î emenê kirin, em çûne bawî bi kurmançî jime pirsî û got: gelî xortan hûn ji kune? min got: em xelkên - diyarbekirin - got serçavan hatin. wî jî bi hin nivîsaran em şandin ba nifûsê, di cîde nifûs dame herçaran em bûn muwatinên sûrî, min got:

li vir tî, karê me nema divê em ji bajêr derkevin vegezin (amûdê) lewre li çayxana (dirbasîyê) yekê file ji min re got: (mihê şerîkê) li amûdê ye, ku yek ji mefreza min salek berê ew û diduyên dî ji min qetîyan hatibûn binê xetê, divê em xwe bigînin wî her tiştên vir jime çêtir dizane, li pêşîya me gundên kurdin emê êvarê li gundek bibîne mêvan ji razana otêlan çêtire, di dest pêka mayîna xerîbiyê de em li (amûdê) heyanî buharê man,

livir perda filmê tarîxa (dîtin û bîrhatiyên min) hate hildan derbazî - dîtin û bîrhatiyên - (49) salên li sûrî (çermê diduyan) dibe, ku di wan dîtin û bîr hatîyan de (çar) cild hene di wan bigerin, bê çewa ji (mesela kurd û kurdistan) felaket û têkilîyên diwêlî dagirtîne,

ENCAMÎ Û KURTÎYA TÊDE Ê NIVÎSARÊ:

Agahî ji têde - ên nivîsarê, her wekî agahe her (dîtin û bîrhatî) an (jîyîn û dîtin) ku bi (erebî muzakerat) tên gotin, tevde xelekên zeman û mekanin bi zincîra tarîxê ve têne girêdan, di nivîsandina wande ji seykoljîya nivîsevan pêve, dîtin û bîr hatîyên nivîsevanên her nejadek li gor buyer serpehatîyên wan ji danezan û uslûbên nejadek dîtir cudane ji milê dî ew - (dîtin û bîr hatî) di nivîsandinê de bi dîtina du awiran ve lêkve dibin wek:

1 - Muzakeratên zatî - ewin ku nivîsevan bi dîtinek teng ji hin kirdeên xwe û hevalên bi wan re edwrek siyasî an civatî diwê çenbera zeman û mekanê têde derbaz bûyî salixek ve dide, jiwê nivîsarê re gotin: muzakeratên zatî - wek (muzakerata qedrî beg cemîl paşa),

2 - Muzakeratên gelerî (şebabî) ew (dîtin û bîrhatîyên) wî biher awayî bi gel ve tê girêdan û jê salix vedide, weke van (dîtin û bîr hatîyên) min ku bi awakî gelempirî (umûmî) gel bixwere dikşîne ber mirêka tarîxê ji - rewşa gel bi tevayî, di warên - civatî, abûrî, zanistî, teqalîd, adat, seykløjî, siyasî, li hember mafê siyasî biç berevanîyan ve rabûne, diwan berevanîyên şervanîde çi giriftarî dîtine? çima nikaribûne bigîne daxwazê, sebebên der û hundur çibûne? jivan danezan û nivîsaran re têgotin: muzakeratên gelerî,

Jiber wî qasî di uslûb û armanca herdû bêşên (qismên) muzakeratên gotîde ne wek hevîyek ê derpêş kirin, divî çermî û herçar çermên dîtir van (dîtin û bîr hatîyên) minde,

tevaya wan salixan hatine paraztin ku bi awakî kin û kurt ew armanc di girêkên jêrde têne vekirin:

1 - Muzakeratên kesên tekane ne heqbên zeman lê heqbên esrek bixwe digrin, tenê dihin munasebetên jêderîya (menşea) wî nejadîde ji agahîyên mêje (tarîx) ên dûrve tîrêj liwan muzaketan ve didin, çewa ku ew muzakerat bixe şaxek ji dara ku jêderîya wî nejadî dide zanîn, çewa ku min (5) cild tarîxa kurd nivîsiye, cildê pêşîn /8000/ sal berî zayinda (îsa) jêderîya nejadê kurd bixwe digre ku pêre (asar) şahidin, jiber wan agahîyên tarîxî dihin mîsalan de wan tarîxên dûr têkilî bi van (dîtin û bîrhatîyên min) kirîye ku yek ji mentîqa nivîsarê ye,

2 - Her wekî agahe dema ku bi danezanên tarîxî re asar tunebin mentîqa edebê bixwe nagre, wiharengê ew muzakeratên ku di buyerên zeman û mekanên wan de not pê nehirtibe, nikare wan dîtinan bi awakî rast û duru bîr bibe, min ji dîtina xwe pêve di zeman û mekanên wan buyerande not girtibûn, tevî ku tevaya wan buyeran bi min ve girêdayîne, ez têde û ji dîtîn û serpe hatîyên xwe salix ve didim,

3 - Çima ev dîtîn û bîrhatîyên min ne zatîne? jiber ku ne li bajaran, lê di nav geleriya gundîyan de hatime peyda jiyîndar û biwan re hatime perwerde kirin, jiber wê çendê bi her awa û tevgerên milletê xwe bi awirek geleri ne arîstûqirati dizanim, ku di nav wan perde - ên zemande bi wan re ew giriftari min dîtine û jê dipeyîvim, ewe ku her awayên jiyîna xwe û nejadê xwe wek: teqalîd, adet, abûrî, nizamên eşayîrî, zemîndarî, tubê sihrî ên - şêx û melan - bê çi dij-

warî giyandine miletê min, yeko yeko wek perde - ên filim liber çavên min derbaz bûne lew ku bi ci û carag didim zanîn ku yek bingehê muzakertanin,

4 - Bi navê xelife ê dinê eslami, wan selatînên turkên (usmani) çewa bi dil bijokiya roja paşdawî (qiyametê) çûna - bihuşta zer û nav komên suruştan (horiyan) heşê wan moru-
fin kiribûn, bê daxwazek huqûqê xwe ê qewmî û kerameta insani dibin lihêfa dîn de ew bi zemanek dirêj xistibûn xewê, jibo çêkirina impiratorîyek mezin, bi sed hezaran xortên kurd li (baqan, derbendê qafqas, sînorê îran, welatên ereb û aferîqa) didane kuştin bê ku daxwazek wanî siyasî liwan welatan hebe,

5 - Ji cenga cihanê a pêşîn ve ku dewletên empiryalî, em bi welatê me ve wek: (xaliya eywana - kesra) lêkve kirin, diwê parçe kirin û parve kirinê de bi her awayên sitemkarî çi dij-wariyên mezin giyandine me û digînin, awirek lê hatiye vedan, lê di awirek siyasî de zêde rohnî kirin li cildê (5) can van (dîtin û bir hatiyên min) têne dîtin,

6 - Ji /1923/ ve ku pîraniya impiratorîya (usmanî) hate vegirtin, tevaya welatên ereb û aferîqa bê hisab di destwan de defterek sipî ji bin wê sîdarîya turk derketin, em tenê di nav wê bahoza herbêde di bin wê çadira reşde man, ew selatîn bi cumhûriyeta turkên kemalistî hate guhartin, em tek û تنها jiwan karwanên azadiyê bi şûnde man, ji /1925 - 1938/ emji bi doza mafê xwe ve bisê şoreşên xûndar û maldar ve rabûn, diwan şoreşan de bidor jibona mesalihên xwe ên xûn mijî dewletên şerq û xerib ji hukumeta (kemalistî re) bûne destegîr û piştegîr, diwê sitem karî conta eskerî û hukmê

faşist de, çi felaketên na dîde bi serê milletê me - ê bed bext anîne û dîtî ji %30 min daye rohnî kirin, jiber ku ji dane zaneke tevayîre ne ez neji dehên weke min nikarin jiwan felaketên kes nedî bi tevayî salix bidin,

7 - Di xwendinê de hate naskirin ku piraniya nivîsarê (şoreşa şêx seîd û ararat) dike bergeh û jê salix hatiye vedan, armanca şoreşgêrî her paqij û pîrozbûn, lê di ketina bajaran û girtina cebhan de nezani û xelet hebûne, daxwaza danezanê ji wan xeletan ewe ku şoreşên di xwe jiwan kêmaniyan bi parêzin, çewa ku di cengdariyên şevgêrî (kumandosî) de jî me xelet dane zanîn daku nekevin wan xeletan, çewa ku li hember wan xeletan me rêzan û uslûba cenga şevgêrî daye zanîn daku biwan rêzan û rêderîyan bigîne qunaxên rizgarî.

8 - Divê partîzan, ronak û siyasîyên kurd berî her tiştî zani-bîn ku di navbera herdû cengên cihanê û dawîya cenga diduyan de, di navbera herdû leşker gehên çep û rast de, jiyogirafya kurdistan çi îstiratîjîyek - siyasî, eskerî, abûrî û bazirganî - bixwe girtîye, diwê kêşmekêşa îstiratîjîya welatê me her şoreşan çi selbiyet li pêşîya xwe dîtine û dibînin? ew kesên lîvan hesasîyetan awir ve nedî an jêre ne pêkar bin dest bavêjin hevsarê siyaseta milletê xwe divê zanibîn ku wan xwe di gola qîtranê werkirîye,

9 - Xwenda - ên delal bawerim ku di xwendina nivîsarê de hûn pê agah bûn ku, jîwan danezanên tarîxî zêdetir di pêş-xistina zanistîya zimanê xwe ê maderî de xebitîme ku ji min re daxwazek yekemîn bûn, ji - 1935 - ve heya van nivîsaran her û bi zanistîya ziman ve bendewar mame, di herdû kova-

rên (HAWAR Û RONAÎ) û roznama (ROJA NÛ) de nivîsevan bûm, jê û pêve ligor pêkarînen xwe di emeliyatên pirsan de min istîlahatên nûçê dikirin wek: di şûna muqtedir de (pêkar) di şûna ehdas de (buyer) di şûna mesder de (jêder) di şûna şîrîgatî an îştîrakî de (hevparî) di şûna teawînî de (tevkari) di şûna tarîx de (mêje) muerix (mêjevan) kitêb (nivîsar) feqre (bergeh) melak (zemîndar) birjiwazî (sermayedar) û weke vana, biwan xebatên ronakên bilind wek (bedirxanîyan) û hin hevalên di tefsîr û tabîrê de filojîya ziman giyaye vê usluba îlmî ku van nivîsarên di rêj em dinivîsin bê ku divayê pirsek biyanîyan bibin, lewre zarê kurd bi her pênc zaravan ve dewlemenê zarên roj helatê navîne,

DANEZANEK JI FERMANDARÊ ŞOREŞA ŞÊX SEÎD EFENDÎ:

(şêx seîd efendî) pêşwayê şoreşgêriya kurd, ji kurdîstana bakur roj ava li wilayeta (erzerum) li (qeza xinûs) ê ronîşt man bûn, lê kalê wî (şêx elî) ji (eşîra elikan bavîkê cindikan) ku dikeve (qeza elmedînan), xwendina dînî xwendîye (xelîfe - ê mewlana xalid) bûn, pêre çûye (şamê) piştî wefata (mewlana xalid) vegeşîyaye kurdîstan, li deşta (diyarbekir) gundê (qerdilek) meruvên wî hebûn, jiwir çuye (palo) ku jêre (şêx elîyê palo) tê gotin, piştî wefata wî kurê wî (şêx hesen) li palo maye lê kurê dî (şêx mehmûd) çuye (keleha xinûs) ê, liwir keça axayê (tekmanê) mehir kirîye jê (şêx

seîd, diyaedîn, buhaedîn, tahir, evdurehîm, mehdî) çêbûne,
(şêx seîd) di xwendina dinî yanî fuqhe de alimek bilind
bûn, ji terîqeta (neqşebendî) tê gotin: lê (şêx seîd) zêde ji
xirafatan zivêr bûn, bi seykløjîya xweve meruvek geleri û
nişteman perwer bûn, dixwestin di her bêşên ilmide kurd
pêşxe, biwê daxwazê xwest ku (zanîn gehek) wek (ezhera
misrê) li bajarê (wan) ê bide çêkirin ku dikeve nîveka kur-
distan, lê jîwan (şêxêntaxê hezret) pêşî li wê daxuwaza wî
girt,

di awirên siyasîde (1908 - 1922/ her têkilîya wî biwan saz-
manên li sitenbol (kurd tealî tereqî, teşkilatê ectimai, hêvî)
hebûn, çewa ku di /1915/ de yanî salek berî ku leşkerên
rûsya bikevin erdê kurdistanê ku hingê (evdurezaq beg
bedirxanî) li (tîflîs) ê bûn, di navbera wan de liser mesela
kurd û kurdistan dayîn û sendin hebûn, jiber wê çendê
(nûrî weysî paşa) ew ji (xinûsê) şande (pîran) ku qezakî
(diyarbekir) re di /1923/ de ew sazmana (erzerum) biserekiya
(lîwa xalid beg cibirî) dîsa bi xebata wî bûn, lewre nifûsa
(şêx seîd) ji (diyarbekir heya erzerum) berge digirtin,

di maldarîya xwede li welatê serhedê dewlemendek tek
bûn, kurên wî salê zêdeî pênc kerî pezên sor dadixistin
(helep) wiha renga (sitenbol) di bazirganîyêde zêde zana
bûn, wî zikata pere - ên xwe didane belengaz, feqe û melan,

şêx seîd weke şêxên dî ne dihêştin kesek here destêwî, an
lihemberwî liser çokan ronîn, ji sofî û melan zêdetir ji kesên
zana û ronak û sîleh şorên cengawir hesdikirin, çewa ku
nizanibûn tirs çiyê û di giyanê wîde tirs ne bûbûn heval,
lewre min di şoreşê de û di îfade - ên ber mehkemê de jî ew
dîtîbûn, dema bi şoreşa (1925) ve rabû umrêwî (75) sal
hebû .

ANNUAL REPORT OF THE
COMMISSIONER OF THE
GENERAL LAND OFFICE
FOR THE YEAR 1906

6

INSTITUT KURDE DE PARIS

NAVEROK

PÊŞGOTIN

BIRÊ YEKAN: 5

- Jêderê jîna min kurdistan. bi cemalek fizikî ve!. 17
Di bin sîdarî û çar sînoren diwêlî de giriftare!

BIRÊ DIDIWAN:

- Kurdên Lema Arî, jêderê pêşketina cihanin. 79

BIRÊ SISIYAN:

- cenga cihanê li Erdê Kurdistanê. Leşkerên Kurd li
meydanê. 146

- Rûsya di vegirtina çar wilayetan de. 169

- Siyaseta Ingilîz, Firensa û peymanan lozan. 177

- sitemkariya Ingilîzê empiryalî li kurdên Îraqê. 186

-Çûna min a eskerî û Destpêka felaketan. 203

BIRÊ ÇARAN:

- Di dawiya cenga cihana pêşî de rewşa Turk û
behlewaniya kemal. 213

- Di 27 Tebax 1922 de kongirêsa MODANYA. 221
- Mufetişê umûmî Abdîn uzmen 231

BIRÊ PÊNCAN:

- Ji sazmana Erzerum bi doza mafê kurd Rabûna şoreşa şêx seîd efendî. 239
- Çima berî progirama biryar dayî şoreş çêbû?! 245
- Kongirisa çiyayê ÇANÊ 251

BIRÊ ŞEŞAN:

- Dest pêka şoreşa şêx SEÎD 259
- Emeliyatên her pênc eniyan. 262
- Hatina Qolorduya nehan ji Anedol a heştan ji Erzerum. 282
- Ji wan çetan pêve sê Qolordû di meydana şer de. 285
- Simiko û Turk di komîdyak diramî de. 299
- Piştî berdana eniya Turk di qetil'ama Kurd de. 303

BIRÊ HEFTAN:

- Şoreş di cenga Kumandosî de. 313
- Di jênosîta kurd de mentîqe qumandan 327
- Mentîqe qumandanê Hênê Elî Barûn. 332

BIRÊ HEŞTAN:

- Qesabxana îdam û nefî bi navê Istiqlal mehkemesî. 337

- Di wê mehkema Idama wan de tiştên kes nedî çêbûn. 353
- Ji Dyarbekir çûna Xarpêt an roja mehşerê? 362

BIRÊ NEHAN:

- Dijwariya rê û nefiya Anadolê. 389
- Li hepîsxana NIGDE 396

BIRÊ DEHAN:

- Vegera min ji NIGDE ber bi welat. 412
- Ber bi kavişên xirabe nav koma sêwiyan. 427

BIRÊ YANZDAN:

- Şoreşgeriya didiwan û derketina ji welat. 441
- Şoreşa ARARAT di sazmanek cengdarî de. 446
- Pêçana sînorên diweliş li şoreşê. 451
- Ji Ararat û Îran dûsa vegera welat. 456
- xewnên şevê ku pê nebawer çewa wergeriyane rastî? 478
- Encamî û kurtiya tede ê nivîsarê 490
- Danezanek ji fermendarê şoreşa şêx seîd efendî re. 494

Pirtûkên wî yên neçapkirî ev in:

- 1 - Pênc cildên dîroka kurd ji (8000) sal berî zayînê heyani qirnê (19) an de.
- 2 - Pênc cildên - dîtin û bîrhatinên min - ji sala (1914 - 1983) an de.
- 3 - Dîwanek ji helbestan.
- 4 - Zerdeşt û Noroz Bûza û Konfişyos.
- 5 - Felsefa Xebata welat.
- 6 - Gazî û hawara navbera Zagros û Zara.
- 7 - Erûda Kurdî.
- 8 - Kirasê sipî û destê reş.
- 9 - Nozde hejmar ji kovara AGAHÎ.
- 10 - Muzekeratên (Qedrî beg) wergerandin.
- 11 - Deh muzekeratên ku min dane şoreşa Îraqê.
- 12 - Şoreşa şêx Seîd û Araratê.

Institut kurde de Paris

● Hesên Hîşyar, di sala 1907 an de li gundê Serdê - di navbera Hênê û Licê - ye hatiye dinê.

● Di nav salên 1920 an de bi tevgera kurd re dikeve danûstendinê. Li herêma Farqînê xebata ramiyari dike. Têkiliya Ihsan Nûri paşa bi navçeyên Licê û Hênê pêk tîne.

● Di liberxwedana netewî ya sala 1925 an (şêx Seid pîran) de bi şeweyekî kariger cidigre. Piştî şikestina liberxwedanê birîndar tê girtin. Di dadgehê de tê arihkirin (pêşi ferweri bi darvekirinê didin). Lê ji ber biçûkiya temenê wi darvekirinê dikin 15 sal heps.

● Piştî hûriya giştî ya 1928 an ji girtigehê derdikeve, diçe Diyarbekirê, û dikove karê dewletê dibe kargêr û rêveberê cergeya tabûya Qulpê.

● Liberxwedana Agiri destpêkir. H. Hîşyar xwe digihîne Agiri û di liberxwedanê de weki şervanekî çî digre. Piştî têkçûna liberxwedana Agiri li gel Ihsan Nûri paşa derbasi Îranê dibe.

● Di sala 1934 an de tê sûriyê û li kurdîstana sûriyê (cizirê) cîwar dibe.

● Hesên Hîşyar, ne tenê şervan û miletperwer bû; belê nivîskar, helbestvan û dirokanekî navdar bû. Bi sê Zîmanan (Erebî, Farisî û Turki) dizani bû, pêvi zîmanê bavûkalan û zaravayên kurdi. U nivîskarê her si korarên nardar (Hawar, Ronahi û Roja nû) bû.

● Di navbera salên 1953 - 1957 an de têkili û danûstendina wi bi kovara Wîcdan û Huriyet re bû.

● Di sala 1956 an de «komela zanistî û alikariya kurd» bi destê wi û çend rewşenbîrên kurd hatiye damezirandin.

● Di sala 1966 an de ewi bi tena xwe kovara Agahî derxist. hejmarên vê kovarê gihane nozde hejmaran.

● Hesênê kurd - Hîşyar, di 14 - Îlon - 1985 an de çû ser dilovaniya xwedê.

Ev celeb ji toreyê, danandineke birhanin û maldar e. Rewşenbîriya xwendevan, berfireh û bi cî dike. Toreyekî ji serpêhatiyên jiyanê pir giranbiha ye. Bi awayekî pêjirandî û jîwerî xwendevanê xwe diguhezîne koç, bûyer û cihaneke ku ewi bi çavê serê xwe neditiye. wi agahdari gelek tiştên nû dike. Xwendevanên xoşewîst: Ev bîrhatinên di nav destên we de, havil û berhemên têkoşin û xebata şoreşger û têkoşerê heja H. Hişyar e, ku di şoreşa Şêx Seîd û raperîna Agirî de beşdar bû, û bi şeweyekî karîger cî girti bû.

Bûyerên vê bîrhatinê, nivîskar ji biçûkatiya xwe û ger-diş, danûstendin, serhawe û berhawên kurdan destpêdike. Bi nerînek dîrokî, ramyarî, abûrî û toreyî rewşa gelê kurd û welatê Kurdistan berbiçav dike. Li hêlekê mêraniya vî mîletê «bextereş» diyar dike. Û nav û nişanên gelek ji şervanên leheng bi cî û war dike. Li hêlekê din ji, bêrûmetî û xiniz bûna hin serekên êl û eşîran diyar dike.

Bi dûrbîneke hûr û zelal, sedemên her serpêhatî û bûyerekê dîtî û jiyayî, bi nav û nişan rave dike. Çi peymanên diwêlî û xapandina kurd; perçekirîna Kurdistan û sinorên çêkirî; xinizî û dijmintiya (axa, beg û şêx) an û setem û zordestiya dijminê hov û çî nepejandina nîrên şoreşê (1925) ên derva û hundir?!...!

Ji ber van mijadên pêwîst, em dikarin bêjin ev bîrhatin belgeyê dîrokî pir giring e, ku her xwendevanek wê bixwîne, û ji serpêhatiyên wê sûd û kêrekê bibîne.

Dilawerê Zengî